# KOBANÎ ÇEPERA RUMETÊ

## BERGA -I-

MERYEM KOBANÊ

**KOBANÎ ÇEPERA RUMETÊ**

**BERGA -I-**

**MERYEM KOBANÊ**

**BERG Û RÛPELSAZÎ: SELAHEDÎN YÛSIV**

**ÇAPA YEKEMÎN 2020**

**WEŞANXANEYA ŞILÊR**

**QAMIŞLO**

**weshanashiler@gmail.com**
**www.shiler.info**




BAKUR Û ROJHELATÊ SÛRIYÊ




**KOBANÊ DI NAVA NEXŞEYA SÛRIYÊ Û ROJAVA DE**



**BAJARÊ KOBANÊ**

***Sipasi***

*Ji bo hevala Nûgiyan ku di nivîsandin, honandina wêjeyî û parvekirina hest û ramanê xwe ya di her kêliya nivîsandina pirtûkê de hevaltiyeke giranbiha nîşan da, sipasî dikim. Dîsa ji ber xwendin û şîrovekirina pirtûkê sipasiya hevalê Nûman Amed dikim ku alîkariyeke bêhempa raber kir.*

*Ev pirtûk diyarî ye ji bo lehengên ku di hemû şaneyên bedena min de wek volkanên ne vemirin û di her kêliyê de bedenên xwe kirin çeperên mayînde da ku tu hêz nekare wan bihejîne.*

*Diyarî ye ji bo lehengên ku bi ken, mirin pêşwazî kirin û bûn hêviya bindestan. Lehengên evînê yên ku evîna Kurdewarî mîna biskên jineke Kurd li hemberî tarîtiyê hûnandin. Diyarî ye ji bo lehengên ku bi laçika xwe ya sipî, bi kopal û berên xwe û yên bi lewendiyên zendên xwe sînorên bi têlan rêsiyayî çirandin. Diyarî ye ji bo her mirovê ku bi xwîn û xwêdana xwe, heriya Kobanê av dan û bûn bingehê gulistana pêşeroja mirovatiyê û hêviya bindestan.*

**NAVEROK**

BEŞA YEK: ÇÎROKA DILEK ÇAR BIRÎN ........ 11

DI HAVÎNÊ DE BARAN LI HERIYA KOBANIYÊ DIBARE........ 34

DEBABE Û HESIN ........ 66

KEMERA KUŞTINÊ........ 91

BÊHNA DÎROKÊ JI AXÊ DIHAT........ 107

EL NUSRA Û ŞERÊ SIRÎNÊ ........ 128

SERDEMA EL BEXDADÎ ........ 135

DESTPÊKA ŞERÊ NAVXWE YÊ SÛRIYÊ Û EL QAÎDE

ÎSYANA BEXDADÎ, RAJÊRBÛNA COLANÎ........ 136

ÎDEOLOJIYA DAÎŞ'Ê........ 137

EMBARA GENIM ........ 148

Û NEWROZ HAT; ........ 155

GIRÊ SÊVÊ ........ 183

KUN HEFTAR ........ 189

BEŞA DUYEM: BERXWEDANA ENIYA ROJAVA

ZORMIXARÊ........ 209

Tola Şekrokên Me Hat Girtin ........ 259

BEŞA SÊYEMÎN: ŞERÊ LI ENIYA ROJAVA........ 293

GOTINA ÇETEYEK DAÎŞ'Ê: JINEK KURD HEBÛ........ 312

XETA FIRATÊ ........ 324

Burkan El Firat........ 331

GUNDÊ MIŞKO Û ÇALAKIYA GUNDÊ BERKELÊ........ 346

HIRÇA RÊDÛR .......... 402
KELHÊN HEMDEM .......... 406
PARASTVANÊ LEFARCÊ: EBÛ ŞÊRO .......... 419
XEWNEK .......... 436
XEWNA RASTIYÊ .......... 446
RONDIKÊN ŞENGALÊ Û DENGÊ KOLANÊN KOBANÎ .......... 473
ÇEKÊN MEYDANÊ .......... 494
KEÇÊN KALO .......... 520
EMÊ MIRINA BI RÛMET BI KEN PÊŞWAZÎ BIKIN .......... 547
GUNDÊ EHMEDIYÊ .......... 561
BERXWEDÊRÊN KOBANÊ .......... 593

## BEŞA YEK

## ÇÎROKA DILEK ÇAR BIRÎN

Ax û welatê herkesê/î şirîn e. Lê li gorî çîrokbêjên me, yê me ji hemû welatan şirîntir û xweştir bû. Warên me li dilê bihuşta di hemû pirtûkên pîroz de dihat behskirin û cihê Huriyan bû. Tam li nava bihuştê, cihê herî xweş, dewlemend û bedew bû ax û warên me. Dema ez zarok min bihuşta dihat behskirin buhuştekî di ol û baweriyan de, di pirtûkên pîroz de dihat behs kirin dizanî bihuşta çirokbêjên me digot. Lê dema ez mezin bûm, ez nû pêhesiyam ku bihuşta dihat behskirin Kurdistana ku di dilê Mezopotamya de cih digire ye ya di çirok û şevbêrkên zarokatiya me de dihat gotin bi zimanekî çîrokî. Min wê demê zêtetir nirx û qîmeta çirok û çîrokbêjên di dema zarokatiya xwe de zanî.

Çîrokbêjên me hiş û dîroka demboriya me bûn. Dîroka me li ser zimanê wan, bi çîrokên dihatin gotin ji nifşên nû re dihat ragihandin. Çanda me, zimanê me, hişê me yê dîrokî û civakî di wan çîrokan de dihat parastin û bi riya çîrokbêjan derbasî nava zeviya hişê me zarokên vê axa dêrîn û gelê wê hatî parçekirin dibûn. Mezinên me lewma di heman demê de çîrokbêjên şevbêrkên zarokatiya me bûn.

Ji ber bi wan çîrokan em bi ra û rîşên demboriya xwe ve dihatin girêdan. Me jan û êşên gelê xwe, dewlemendî û bedewiya welatê xwe ji wan çîrokan dibihîst û em bi

çanda xwe ya resen mezin dibûn rexmî hemû êriş û destwerdanên li ser hişmendî û xeyalên me yên zarokatiyê ji aliyê hêzên serdest ve dihatin kirin. Wan çîrokan dihêla em resen bijîn, bi çanda xwe bijîn. Wan çîrokan dihêla zimanê me teşe bide giyana xewn û xeyalên me. Em bi wan diketin ferqa heyîna gel û civaka xwe ya resen û tevî qedexeyên serdestan ên li ser nasnameya me, em dibûn xwedî nasname bi wan vegotinên hêj hişê me têra watedayîna wan nedikir.

Wisa bû ku her şeva me bi çîrokekê derbas dibû. Li ser axa welatê me her temenmezin çîrokbêjeke di heman demê de. Em demboriya xwe ji dengê wan fêr dibûn. Jan û xweşiyên li ser axa me hatîn jiyîn, bedewî, ciwanî, şer, talan, xela, birsîbûn, derbederî û mişextî wekî nexşeyekê li ser rûyê dengbêjên warê me disekine. Dibistana her zarokek vê axê ye deng. Her dengbêj û çîrokbêj mamostane di vê dibistanê de. Carna dapîr, carna bapîr, carna jî dayîkên me vê ristê digrin û ji wir derbasî nifşên nû dikin. Û paşê em zarokên rabirdûyê dibin çîrokbêjên pêşerojê û ji me derbasî nifşekî din dibin çîrokên me. Awayê xweparastina me ya herî bihêze ev çand. Û em bi çanda xwe li ber xwe didin ev bi sedsalan e.

Di her çîrok û destanê de dilê min siwarî hespekî bayê bû, ez bi lehengên çirokên min guhdarkirî re geriyam li dîrok û demboriya ax û welatê xwe, min pir leheng û çeleng naskirin di van geran de. Pir caran min xwest yek ji wan bim. Li gel wan di çeperan de şer bikim, ji bo

parastina rûmet û kerameta gel û welatê xwe. Wêrektiya wan, egîdî û çelengiya wan qehremanên çirokên min guhdar kirin, mina efsûnekê ez bandor kirim. Min temaşeyî mirovên li kêleka xwe dikir, ji xwe dipirsî çima niha mirovên wisa leheng û çeleng nemane. Her carê min bersiva “ev tiştên di çirokan de ne” digirt û bi xeyalên carekê di rastiyê de jî mirovên wisa bibînim diketim xewê. Di xewnên xwe de dibûm yek ji wan çelengan.

Paşê mezinbûm. Rastiyên min dîtin çîrokên min guhdar kirîn asayî kirin li pêş çavên min. Bi sedan serpêhatiyên ez bûyîm şahid hene. Niha ji wan tenê dixwazim yek çîrokê bêjim ji we re. Lê ez dixwazim ji we re vê yekê bêjim; ev çîroka rastiyê ye. Ez şahida vê rastiyê me û ne pesindarî, ne fişal û ne jî pirgotine ya ez bêjim. Ez şahida lehengî û çelengiya li Kobanê me. Ez şahida Şoreşekî heyîn û nasnameya xwe afirandinê ya gel û netewekê me. Ez şahida wêrektî, bawerî, dilsozî, egîdî û çelengiya bi sedan jin û mêrên dilên xwe ji bo azadî û rûmeta gelê xwe, heyîn û parastina gel û xaka xwe kirîn mertal im.

Niha ez dengê we dibihîsim. Hûn bêjin tu kî yî? Ez jinekî kurd im. Zarokatiya min li serxetê, li pişt sinorên têlên rêsayî derbas bû. Ez zarokekî ya bajarê Hezexê, kelha Berxwedanê Botanê me. Zarokatiya min li ber têlên rêsayî, sinorên çêkirî, sinorên di xewn û xeyalên zarokatiya min de xwedî cihek balkêş e derbas bû. Hêj di serê tiliyên xwe de li germî û sariya wan têlên rêsayî yên

min di zarokatiya xwe de dest lê dayîn dihesim dema dihizirim.

Li ber wan têlan kombûna malbata min a sînoran kirî parçe, awirên malbat û xizmên min ên bi jan û bi wan têlan ve dizeliqîn wêneyekî zindî yê hişê mine. Pir biçûkbûm dema bi malbata xwe re diçûm ser sînorê serxet û binxetê ji bo dîtina xizmên xwe.  Salê du caran em diçûn wir û bi rojan pêş de amadekariyên çûyînê dest pê dikirin. Diya min destên xwe li malê dipeland, ji bo xizmên me yên ku bên ber têlên sînor û em wan bibînin, li gorî derfetan li malê çi heye dest bi amadekirina diyariyan dikir. Nav dihatin jimartin, diyariyên wan ji hev dihatin veqetandin, li nav boxçikan dihatin girêdan. Li malên serxetê, amadekariyên çûyîna ber sînor ji yên cejnan bi coştir bûn. Ji xwe tenê me di cejnan de dikarî em hev bibînin ji dûr ve. Kelecan û coşa bi xem a dayîk û babên me, em jî tevlî xwe dikirin û heman coş me jî dijî. Coşa wan a dîtina nas û xizman bû, ya me zarokan jî girtina xemîrokên kun bû.

Roja cejnê em diçûn ber sînor. Ji herdu aliyan bi sedan kes dihatin. Ji ber herdu alî xizm û mirovên hev bûn. Hinekan dayîk li aliyekê bû, hinekan bira, hinekan xwişk. Wê rojê bi qasî ken û keyfxweşiyê, têlên rêsayî şahidiya girî û şînan jî dikir li wir. Ji her du aliyan, ji bo xelk xizm û nasên xwe bibînin ber bi têlan ve diçûn û dihatin. Bi deng gazî hev dikirin, bi sedan nav derbas dibûn di wan dengên hewl didan sînoran derbas bikin de. Li wir, li pişt

têlan temaşeyî hev dikirin, bi dengê bilind daxivîn û bêrî û hezkirinên xwe, derd û kulên xwe, xweşî û nexweşiyên xwe ji hev re digotin; pir caran di ber axaftinan re qirik tijî girî dibûn û bi destmalan rondik dihatin maliştin. Kesê/î nedikarî derbasî aliyê din bibe. Têl hebûn li pêşiya hevgihînên me yên fizîkî. Lê me dengê xizmên xwe dibihîst. Wan dengê me dibihîst. Di wan dengan de em digihiştin hev rexmî hemû têl û sînoran. Ji ber em yekbûn. Fêkiyên heman darê, zarokên heman dayîk û axê bûn. Têl û sînoran nedikarî derbasî pêşiya dilên me, hezkirin û bêriyên me bibin. Tevî wan jî me û xizm û mirovên xwe hev nas dikir. Me ew dizanîn, wan jî em dizanîn.

Lê bi qasî me ew têlên rêsayî di dilê wan re jî diçûn. Ew jî bi qasî me ji wan têlan aciz bûn, kîn û hêrsa wan hebû li hember wan sînorên çêkirî yên di navbera me û wan de. Li ser wan têlan re me diyarî didan hev. Binxetê ji me re çay, qehwe, sabûna Helebê, qumaş û xemîrokên kun dianîn. Serxetê jî tiştên li çiyayên me şîn dibûn, berhemên sewalvaniyê, diyariyên ji avhewaya çiya dibirin ji wan re. Me diyariyên xwe li ser têlan re davêtin ji hev re. Û pir caran diyariyên me jî mina awirên dayîk û babên me yên bi jan û xemgîn bi wan têlên rêsayî ve diman. Herî zêde em ji riştina xemîrokên xwe didirsiyan wekî zarok. Ji ber ew sînor di zarokatiya min de wekî cihê hatina xemîrokan maye û her xemîroka me ya diket nav wan têlan, di dilê me de hêrsek cuda avadikir li hember wan têl û sînoran.

Lewma di her xewna piştî çîrokeke me xwe têde leheng didît de, me destpêkê ew sînor û têl radikirin. Di xeyalê her zarokek serxet û binxetê de rakirina wan sînor û têlan hebû. Ji ber me pişt têlan merek dikir. Navê wan zarokên li pişt wir me didîtin. Lîstokên wan dilîstin. Malên wan, cihên wan ronahiyên me ji dûr ve didîtin mereqa me ya wir zêde dikir. Lê me nedikarî em wan sînoran derbas bikim. Di lîstokekê de destên hev bigirin li gel zarokên xizmên xwe yên binxetî. Ew jî wekî me bûn. Lê tevî her tiştî em şad dibûn bi dîtina wan a ji dûr ve jî. Heta dema xatirxwestinê em beramberî hev li ber wan têlan diman. Paşê dema xatirxwestinan dihat. Ken vedigeriyan girî û bi hêviya hatina cejnekî din û hevdîtinekî din kêliyên hestyar dest pê dikirin. Mêran bi koşeyên kefiyên xwe, jinan bi lewendî û dawên kirasên xwe rondikên xwe paqij dikirin, berê xwe didan malên xwe. Em zarok jî li ber têlan ve dibezîn, me û hevtemenên xwe jî ji hev re dest dihejandin.

Ji diyariyên dihatin xemîrok para me zarokan bûn. Em li gel diyariyan bi pirs û nakokiyan jî vedigeriyan cihên xwe. Lê pirsên me piştî bidawîbûna xemîrokan dest pê dikirin. Dayîkên me xemîrokên me didan me. Me her yekî xemîrokên xwe digirt û em şad vedigeriyan malê. Min piştî her vegerê xemîrokên xwe dibir û yek bi yek bi tave dikir, dikir ristik. Ji bo zû xelas nebin, her carê min yek jê vedikir û cardin ristika xwe li cihekî nepenî vedişart. Ew ristikên me yên xemîrokan ji bo me ji gerdeniyên zêr bi qedirtir bûn. Ji ber ew ji cihekî me nas

nedikir dihatin. Cihekî me mereq dikir, cihekî me nedizanî li wir çi heye dihatin.

Li gorî me cihekî balkêş bû binxet. Zilamên wan, an ku xal û mamên me yên li wir ne wekî bab û mamên me, xal û xizmên me yên li vî alî bûn. Zilamên li gel me şal û şapik, şelwar li xwe dikirin. Lê yên ji wî alî dihatin ber sînor bi fîstanên dirêj û fireh bûn. Li gorî min ew hemû şêx bûn. Lê em ne malbatekî şêxanbûn, babê min, xizmên min ên li gel me kesî wisa cil li xwe nedikirin. Ev yek ji nakokiyên min bû di zarokatiya min de. Dayîka min û jinên din kiras û fîstanên bi lewendî li xwe dikirin. Jinên li wî alî cilekî bi navê xiftan li xwe dikirin û vê yekê zêde bala min dikişand. Em xizm û mirovên hevbûn. Lê ew cudahiyên me ji çi bûn? Çima cilên dayîka min û jinxala min ya li wî alî nedişibîn hev? Ka em xizmên hev bûn?

Mînak me her du aliyan jî bi kurdî daxivî. Lê di axaftinên wan de pir peyvên balkêş ên em nezanin hebûn. Li gel me quran tişta herî pîroz bû. Lê li ser her diyariyekî wan parçeyekî nivîsa quranê hebû. Diyare hemûyan quran dizanî û li gel wan quran li tiştekê pêçan ne guneh bû. Lewma piştî her çûyîn û hatinê min li gel diyariyan çend nakokî û pirsên wisa jî bi xwe re dianîn. Piştî her hatina me ya malê pirsên min ji bo babê min dibû sedema vegotina çîrok û serpêhatiyekî dirêj û min serpêhatiya serxet û binxetê di zarokatiya xwe de herî zêde ji babê xwe guhdar kir. Min wisa zanî zilamên kiras li ber hemû

neşêxin, ew nivîsên li ser wan diyariyan ne quran e û em li ser axa xwe dibin desthilatdariya du dagirkeran de dijîn; sedema cudahiyan heyîna wan a li ser ax û welatê me ye.

Pirsên min herî zêde bala birayê min ê mezin dikişand. Di aliyekê de şad dibû ez nakokiyên xwe bilêv dikim û dipirsim, ji aliyê din ve çavên wî tijî dibûn ji ber gotinên babê min û li ser şaneşîna xaniyê me berê xwe dida çiyayê Bagokê û keserên kûr dikişand. Ez paşê pê hesiyam ku ew têl û sînor dilê birayê min birîn dikin û temaşekirina wî ya çiyayê Bagokê ji ber kûrahiya birînên wî ye. Bi çend deqîqeyan bê navber berê serê xwe radikir jor û temaşeyî çiya dikir. Mîna ku baya çiya pifî birînên wî bike û agirê nava wî vemirîne kûr keser dikişand û bayên çiya dikişand cergê xwe.

Li pişt navçeya me silsileyek xwe ji çiyayê Bagokê berdida hebû, heta ber ava Cizîrê dihat. Xelkê devera me ji wî silsileyê re digotin çiyayê Bêxêr. Hinekan jî digot çiyayê Spî. Darên li wî çiyayî ne mezinbûn. Piranî kurs, devî bûn. Ji ber kêm av bû, Xelkê deverê nave Bêxêr lê kiribû. Birayê min ez çend caran bi xwe re birim ser wî çiyayî û me ji wir temaşeyî binxetê dikir. Binxet deştekî kûr û fireh, wekî cihekî dawiya wê neyî dihat ji min re. Birayê min navê gund û bajarên binxetê, kî malbata xizmê me li kî aliye nîşanî min dida. Lê dîsa jî ya min herî merek dikir nebûna çiya bû. Ma gund û bajarekî çiyayê wî neyî dibû? Li gorî min ji bo gund û bajarekê neyîna

çiya, wekî nebûna bab û dayîkê bû. Çawa malbatek bê bab û dayîk nedibû, gund û bajarek jî bêyî çiya sêwî û bê star bûn. Gund û navçeya me wisa bi aramî pişta xwe dabû Bêxêr û Bêxêr pişta xwe wisa dabû çiyayê Bagokê ku li gorî min ti hêz nebû stara wan xirap bike. Hestên min dijîn ev bûn û ji ber wê jî dilê min bi binxetê dişewitî ji ber nebûna çiya.

Lewma ji ber van hestên xwe min pirsa çiya dikir ji birayê xwe. Birayê min firşkê hezkirina min a çiya bû ji bo min. Mîna klamekê bêje bi dengê xwe yê xweş û aram navê çiyayên Kurdistanê ji ji min re digot. Min çiyayên binxeta welatê xwe destpêkê ji wî bihistin û xema min a ji ber nebûna çiyayên binxetê wisa derbas bû. Wê rojê şekrokên kun, şekrokên reng bi reng ên binxetê jî bi qasî wê agahiyê ez şad nedikirim. Ji ber ez pêhesiyabûm ku dayîk û babên wan gund û bajaran hene. An ku bi qasî yên me nebe jî çiyayên wan jî hene. Vê yekê keyfa min xweş kiribû.

Rojekê jî birayê minê din Dilxwaz ez birim ser kelha Mêrdînê û me ji wir temaşeyî Binxetê kir. Ji min re behsa çîrok û serpêhatiya Serxet û binxetê kir. Ez ji wî hînbûm çima Serxet û Binxeta welatê me heye. Ez ji birayê xwe hînî rastiya welatê xwe bûm û min zanî welatê me yê bi xêr û bereket di destên dirindeyan de hatiye parçe kirin û dilê me Kurdan bûye çar parçe bi sedsalane. Li gel çîrokbêj û dengbêjên çanda welatê min a dêrîn, herî zêde birayê min bû hişmendiya min a welatparêzî û hezkirina

welat. Min nakokiyên bindestiyê bi çavên wî dît, wî di hişê min de tovê daxwaza azadiyê çand û hêrsa min a li dijî koletiyê bi gotinên wî ber digirt.

Hêj pir wext bi ser wê çûyîna me re derbas nebûyî birayê min beşdarî tevgera azadiya Kurdistanê bû. Li devera me PKK hebû. Min heyîna gerîla dizanî êdî. Lê bi çûyîna birayê xwe mereqa min a naskirin û fêmkirina doza PKK jî zêde bû. Salên 1990'î salên xurtbûna PKK'ê ya li herêma Botan û Mêrdînê bû. Bi hêvî û baweriya ku PKK'ê avakirî gelê Kurd li herêma me ketibû nav coşa pêkanîna xeyal û armancek mezin û bi armanca yek kirin û azadî û serxwebûna Kurdistanê dest bi têkoşînek civakî jî hatibû kirin. Li gel geşbûn û gurbûna şerê gerîla, gel jî dest bi serhildanan kiribû. Qad û kolanên bajarên herêma me wekî zeviyên biharên Kurdistanê bi rengê kesk, sor û zer dixemilîn û hişê me yê koletî nedipejirand bi vîna PKK'ê dayî avakirin diket tevgerê. Bi sedan ciwan beşdarî nav refên gerîla dibûn û her roja diçû me zêdetir xwe nêzîkî azadî û serxwebûna welatê xwe didît. Ew sînorên wekî striyan di dilê me re diçûn, di hişê me de zelaltir dibûn û me baş dizanî dermanê dilê me rakirina wan sînoran û yek kirina welatê me ye. Hema her mirovek Kurd êdî dizanî dermanê kewandina birînên li dilê me, rakirina wan sînoran e û ev xewn û xeyala bi sedsalan bû. Ji bo pêkanîna vê xeyala mezin û dîtina dermanê dilê Kurdan berdêlên giran hatin dayîn. Her şer xwedî encame û ti şer bê berdêl nabin.

Paşê birayê min ê havênê hişê min, ê netewî li pişt çiyayê ez û ew diçûnê, li Çiyayê Bagokê di pevçûnekê de şehîd bû. Şehîdbûna birayê min riya pêşeroja min diyar kiribû. Dibêjin jiyan bi xwe xwedî zagone û tevî hemû planên tu bikî zagonên xwe pêk tine. Jiyanê tevna pêşeroja min raçand û rengê ku dê bigire ji aliyê wê ve hat diyarkirin wekî destpêk. Carnan tu li ser tercîhên bikî nahizirî. Jiyan hinek tercîhan derdixe pêşiya te û tu ji wan yekê hildibijêrî. Tercîha te hilbijartî çarenûsa jiyana te diyar dike. Lewma çarenûsa her mirovê/î di destên wî/ wê de ye.

Paşê min dest li çar birînên dilê xwe da. Min jana van birînan di hemû şaneyên giyana xwe de hîs kir. Me di serdemek herkesê/î behsa azadiyê dikir de li pey misogerkirina jiyana gelê xwe ya fîzîkî dilên xwe kirin mertal û wekî min bi hezaran mirov di vê riya pîroz de meşiyan. Bi hezaran kes giyana xwe tevlî vê axa pîroz û dayîka xeyalên me kir. Ala armancên me her bilind ma bi destên wan û her yek ket singa axê, al derbasî destê yekî din bû. Xwîna çar parçeyên dilê me, di vê têkoşîna dijwar de tevlî hev bû. Me bi xwînê mohra yekbûnê saz kir û sînorên xwedestî nekarîn çar parçeyên dilê me yên di kodika yek singî de lê didan asteng bike. Me nexşeya dilê xwe ya parçekirî cardin bi xwînê kir yek û li çar parçeyên welatê xwe ji bo başbûna birînan berdêlên mezin da.

Lewma dema yek ji min dipirse û dibêje ‘tu ji kû yî?’ dilê bi sedan kes di dilê min de lê dixe û ji vê nexşeya bi xwînê hatî çêkirin dibêjim; “Ez Kurdistanî me.” Bakur, Başûr, Rojhilat û Rojava her yek parçeyek ji dilê me ye û dilê me ji van çar parçeyan pêk tê. Gelo Kurdek heye ku ne Rojhilatî, Rojavayî, Bakurî û Başûrî be? Ma welatperweriya rast ne ew e dema bê xwestin tu ji bo çar parçeyan jî tişta pêwîst bikî? Ez ji tevgera azadiyê wisa fêr bûm. Lewma ti caran nav û cihên cuda, parçe û sînorên xwedestî nekarî pêşiyê li daxwaz û vîna me ya têkoşînê ya li ti parçeyî bigire. Min li her parçeyekê xwe li Kurdistanê dît û min ji bo heman armancê şer kir. Her wiha min bi hezaran mirovên wisa naskirin û em li welatê xwe ji xwişk û bira jî nêzîktirî hev bûn di vî şerî de. Şerê me di wateyekê de çîroka şerê sînoran e. Ji ber ev şerê hebûn û xwebûna me bû. Di duwem çûyîna xwe de jî heman demboriya bi jan a li ser sînoran xwe li hişê min xist û ez xistim nava hizrên kûr ên li ser rastiya sînoran.

Dema sînor tevlî jiyana mirovan bû, ti kesî nezanî ev xelekên sînoran rêzanê bêtawan ên sînorên bêdawî ne. Herî dawî ev sînor bûn sînorên mirovên destûra van sînoran dayîn. Yên destpêkê ji wan sînoran re gotin erê, bûn dîlê van sînoran. Gelo sînorên destpêkê çawa hatin çêkirin û mirovan çima xwe xistin nav van sînoran? Hinek mirovan çima mirovên din xistin nav van sînoran? Ger em pirsên wisa bikin, dibe ku bersiv hîn hêsantir bê dîtin. Ger ne wisa bûya hinek kes nedibûn xwediyê şadî

û malvaniyê. Sînorek li ku hebe, li wê derê kedxwarek heye.

Sînorên biçûk bi demê re hatin guhertin û bûne cûr be cûr. Her tişt xistin nav van sînoran. Sînorên malbatê, sînorên eşîrê, sînorên beg û axa, sînorên zindanan û herî dawî jî sînorên herî mezin ên dewletê. Bêgûman ev jî bes nehatin dîtin û sînorên ramanê, sînorên pênasê û herî girîng jî sînorên dilan lê hatin barkirin. Cîhan her çû bû cîhana sînoran û bi têlan, bi mayînan, bi qerekolan rûyê cîhanê ji hev hat qutkirin. Herî dawî jî pirsgirêka ez û tu; bi nijadperestî, olperestî, şer û pirsgirêkên sînoran rûyê erdê hat jehrkirin. Cîhan her çû li mirov hat tengkirin.




Wekî dilê her zarokekî/ê her mirov di xwezaya xwe de hemwelatiyê/a cîhanê ye. Gelo sedema tekoşîna her

şoreşgerekê ne ev tişte? Lê li kêleka vê em vê ti carî ji bîr nakin. Hezkirina cîhanê ne haşayî li welatê xwe anîn e. Her mirov dixwaze li ser axa xwe bê veşartin. Ev xwestekek bê eman û pênaseya wê gelek zore. Mîna mirov li malzaroka dayika xwe bizîvire her dixwaze li ser axa xwe bijî û bê veşartin. Ev jî welatparêzî ye.

Dema mijar dibe sînor rewşa Kurdan balê dikşîne ser xwe û hîn girîngtir dibe. Ji ber sînorên me gelek zêde ne û mal ji malê hatine qutkirin. Ji ber vê ye Kurd yekane ne. Li nava mala me têl hatine kişandin û dilê me kirine çar parçe. Ger tu rêwiyê ji Başûr ber bi Bakur ve bî silava pêşiyê têl didin te. Ev rêwîtî ji Rojhilat ber bi Rojava ve jî wisa ye.

Hûn di jiyana xwe de çiqasî sînoran hîs bikin, hûn ewqasî Kurdîtiyê jî jiyan dikin. Ger ti peywendiya we bi sînoran re nebe, diyare hûn rewşa welatê xwe jiyan nakin. Berî tu van sînoran çareser bikî, sînorên din li pey tên. Sînorên ziman… sînorên çandê… Ger hûn van jî hîs nekin, divê hûn li ser çokên xwe rûnin, serê xwe têxin nav herdu destên xwe û baş bihizirin.

Gelo we mîna mahkûm û mişextekê ti carî sînor kun kirine? Ger bersiva we ji vê pirsê re erê be, tiştên tên gotin wê hemû bên fêmkirin. Ger bersiv na be, divê hûn hêj ji nêz ve li jiyana Kurdan temaşe bikin. Mişextên li şûna mişextiya xwe, termê babên xwe radikin û derbasî aliyê din dikin, an jî piştî çend salan hestiyê xizmên xwe kom dikin û derbasî gorê dikin dilê mirovan diguvêşin.

Lê mixabin ev rastiyeke. Çîrokên evînên demborî yên li du milên sînor dilek mîna ji têlên sînor xwîn bûye diêşê û xwe dubare dubare li van têlan dixe. Destanên wan zindî dike û evînek bêhêvî li ser têlên polayî libadibe. Mîna stiriyên di nîva gora Mem û Zînê de, stirêyên hendem hatine honandin. Ba, roj, ewr, baran, şev û tav parvekirin çîroka her Kurdek li ser sînor e.

Dengên Kilam û dengbêjên me li têlan dikevin û dipengizin. Li ser şop û şûnên kanzayên serê tîrên lehengên vê axê mayînên nûjen hatine çandin. Şopên simên hespên lehengan, ji beriya Mûsilê heta beriya Ruhayê mîna dengên miriyên bin erdê xwe li perdeyên guhên mirovên bi hîs dixin. Deng ji vê axê tê û bi hezaran giyan geh gazî vî milî dikin, geh gazî milê din. Vê her dubare dikin şêniyên vê axê. Zindiyên vê axê jî wisa ne û bi perestîjên qedexe termên xwe bin ax dikin. Ti term bi temamî nayên veşartin. Hemû gorên derdorên sînor nîv nîvîne. Parçeyek li hundir û parçeyek li derve ye. Ji ber vê jî ti carî nayê bawerkirin term hatiye veşartin. Parçeyek dibin axa bêrê, ya din jî bi ber devê halet û gêsinên cotyarekê dikeve. Lav û gotinên dawî jî her nîvîne. Tişta bi awayekî temam ji ser gorê dizîvire di mirovan de metirsiya wê rojekê bimire ye.

Sînor mekanên mirinê û zeviyên Ezraîl in.

Gelo Kurdan çima xwe ji van zeviyan dûr nexistin? Bersiva vê pirsê cewherê Kurdewariyê ye. Ji ber ev zeviyên Ezraîl di heman demê de mekanên hêviyê ne jî.

Mirin û hêvî…raza Kurdan.

Aliyê sînor ên din; biratî, yekîtî û evîne.

Ev hêvî û dengê xwe li vîna sînorên siyasî dida, bi şêwazê xwe bigihîne nifrînekê bi bedena wan re tevlî axê dibû û vê çembera li derdora Kurdan teng dibû xwe li sînorên hunerê dida. Feleka Mihemed Şêxo, sewta Cemîl Horo û berî wan jî serpêhatiyên Nûrî Dêrsimî ku li derdorên Efrînê hiştibûn, mîna nifrînek li felekê bê kirin li ser gora wî hatibû nivîsandin.

“Min jî li ser vê rêya dijwar kire gelek qîr û hawar

Da ji bo me jî rojek dinya bibe gulbihar”

Sînoran dil bi xwîn kirin. Serxet û binxetê gelek hunermend û siyesetmedarên Kurd bi navên cihêreng û dilê mirovan daxdidin li pey xwe hiştin. Sembolên ti carî neyên ji bîr kirin li derdora hêviyên azadiyê xwe bi cihkirin. Bîra qederê ku hîn jî rû û resmê mala Bedirxanan nîşan dide li ser vê axa Rojava tevlî serpêhatiyên van lehengan bû. Helbest û awazên dilan zîz dikin li ser vê axê hatin lorandin. Dengê Seydayê Cîgerxwîn li pişt van têlên kembax xwe hildikaşand panava Omerî, Dêrik, Gabar û çiyayê Cûdî. Bi hêviya Eşhed û sekeratên li ser bedana Kurdan têne xwendin bişikîne bi dengê gur bang dikir.

Ey felek, ka ew sera û

Birc û qûnaxêt min?

Ka rez û bostan dar û

Kanî ew baxêt min?

Ç|îçek û nêrgiz heriştin

Tev ji bîna sorgulan

Surperî nayên semayê

Kanî qozaxêt min?

Qeb-qeb û dengê kewan

Nayên li ser lat û çiyan

Kûrekûr e rengê bûman

Nalêya zaxêt min

Ser bi zêr û çox bi surme

Dest li ber, rû nalenal

Dê bi kê xweş bin di dil de

Ev key û daxêt min?

Gotinên Nûrî Dêrsîmî yên li ser kevirên gora wî hatine nivîsandin, di her kêliya tê xwendin de dilê mirovan dilerzîne. Ji ber ev gotin çîroka gelek şoreşgerên Kurd e. Ev gotinên yan li ser kevirên goran, an jî di ristên helbestekê de hatine honandin gelek balkêşin. Kerwankêşek, an jî ji çûkekî ku mizgîniyê ji axirzemanan tîne, bûye zimanê hunera Kurdî. Li ser kevneşopiya helbesta Nûrî Dersimî ya bi navê tolhildanê, bi destana Derwêşê Evdî ya Babê Salih ku lehengek ti carî li evîna xwe îxanetê nake her zindî hate hiştin. Dîlbera Teyran a bi şêwazê evînek bêmirin bûye berjenga evîna welat, ji aliyê Aram Tîgran ve heman tiştî dibêje. Bilbil û stêrka berbangê ji nîvê Cûdî xwe hildide jor û kerwanên berên xwe didin Bakûrê Rojava hest û ramanên Kurdên Rojava dide der. Bilbil ji ku ve firî û li ser kîjan çiqilî danî? Stêrka Berbangê li ser xalîçeya jêre dibêjin El Cizîre ango Dêrika Hemko xuya dike, ji bircên Bêxêra soringî

hildikşe û xwe wisa dide der. Ev bû helbest an jî stranên êl û koçerên şêniyên vir. Kerwan wisa bi rêket û Tîrêj wisa ev kişande nav ristên helbestê. Mîna berdewamiya wî jî stranên bi gotinên “li ser sînga welatê min xaçek ji têlan çêkirin” hate gotin.  Bilbilê Dilşah awaza netewa Kurd û rika li hemberî vê xaça ji têla ye.

Ey bilbilê dilşadî hela wer bike fîgan

Derdê me giran e ey bira birîna me kûr e

Gorî te dikin cerg û dil û mêlak û hem can

Dengê te ye xweş tê ji ney û nay û bilûrê

Sê hawe tê deng, yek ji sira bayê siba ye

Hawî dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye

Hawa sisiya ji bêhna şemamok û gula ye

Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e

Kerwanê me va bi rêket lê şev reş û tarî

Serma ye terez kulyên berfê her dibarî

Bahoz e çelapk têne me ji her çar kenarî

Warê me welat e ey heval rêka me dûr e

Çar hawirê me diz û keleş in têk dane dijmin

Me ji hev radiqetînin bir bir heyf û mixabin

Qet çare û hêviya me nemaye bilbilê min

Meydan e ji bo hirç û çeqel gur zûrezûr e

Belê ev bi zimanekî cuda vegotina çîroka Rojava ye. Serxet û binxet mîna Serhada mezin a navbera Celalî û Şikakiyan xeta navbera nîvê welat e. Ger Dêrika Hemko nebe hemû şênî û eşîrên Cizîrê bi Cizîra Botan ve girêdayîne. Dêmana wan bûye çarenûsa wan a bin xetê. Xeyal û hêviyên Herekol û Çiravê bi navê Eşîra Mîran heta niha didome. Rik û berberiya navxweyî û derveyî mal ji hev qut kirine û eşîr kirine du parçe. Kembaxiya sînor jî bûye jehra vê çîrokê. Ermenî, Sûryanî, Kiçî, Hesinî, Teyî, Omerkî, Omerî, malbatên wekî mala Haco, Elîkê Betê û kit mitên eşqiyayên Serhedî û Ferqînî bûne şêniyên binxeta parçeyê mezin. Ji serê Kaniyê heta Rimêlan heman çîrok û serpêhatî derbasdare. Kobana ku bingehê vê pirtûkê dihone jî ji vê ne kêmtire. Sînor bi sînor heta Efrînê heman çîrokê vedibêje.

Kobanî bi eşîretên xwe navdar e. Hemû xelkê Kobaniyê ji eşîretan pêk tên. Eşîreta herî mezin, Berazi ne, Berazî bi xwe weke konfedrasyona Eşîretan e. Di nava wê de eşîretên weke Mîran, Kêtikan, Şêxan, Oxî, Dinnan, Zirwar, İlêdînî, Şedadî, Mi'ef, Pîjan, Bêskan û gelek eşîretên din jî hene. Berazî heta bi Ruha, Mereş, Entab û Erzrûmê belav bûne. Mezinê eşîreta Berazan, Bozan Beg û Hirço beg bûn. Bozan Beg di dema xwe de parlamenterê Rihayê bû û di meclisa millî ya mezin a Enqereyê de cih digirt. Biraziyê Hirço, Şahîn Beg, di salên 1950'yan de li Şamê parlamenter bû. Hirço yek ji damezrênerên Komeleya Xuybûn bû. Li ser vê Eşîretê gelek gotegot hene û koka wan bi gelek cihan ve tê girêdan. Li gorî hinek lêkolînvanan koka wan diçe heta Kotola Rojhilat. Kêtikî û Katikî wisa bi hev ve tên girêdan û li gorî hinek zanyarên din jî ew êzîdî ne. Li gorî navên Kêtikî li xwe dikin û navên êzîdiyan pir nêzî hev in, gihiştine encamek wisa. Navên olî û kevneşopî wisa tên rêz kirin. Balo, Fedo, Kedo, Mîxo, Pîso, Gewrê, Besê, Berfo, Kinno, Hedêy, Hansê, Şîno, Kunno, Reşêy, Bazo, Kewê, Ketto, Balêy, Nao, Xino, Şero, Şirey, Şêr, Domo, Dondey, Înno, Lotê, Misto û Temo... Bêgûman armanca me ne lêkolîna van eşîretên e, lê em dizanin navên Kurdî yên kevnin û Kurd ji xwe Êzêdî bûn.

Binxeta ku dêmana Koçer û Eşîretên Kurd bû, bi demê re bû cihê kedîkirina gelê Kurd. Xetên li singa Kurdistanê hatin kişandin ev der kirin Rojavayê Kurdistana ku tenê di xeyalan de mayî. Ber û karên wan êdî zivîrî Hema,

Himis, Şam û Libnanê. Gelek ji wan ji ber Bakurî bûn bi salan nebûn hemwelatiyên Sûriyê jî. Her çiqas zoriyên wisa hebin jî jan û serpêhatiyên serhildanên Kurd bi mirovên ji şûr rizgar bûne her zindî man. Xoybûn û gelek nivîskar û hunermendên revî bûn mêvanên binxetiyan. Hêvî û xwesteka azadiyê di her çirûskek serhildanê de bala wan dikişand û xwestin tevlî bibin. Ji Mala Barzan heta tevgera PKK'ê tevlîbûnek xurt dan çêkirin. Bi xebatên PKK'ê û hêviya da çêkirin bi hezaran şervan piyê xwe avêtin Botan, Mêrdîn, Dersim, Zagros û Gerzanê. Nav û dengên wan ji Simaîl heta Mihyedîn, ji Eliyê Dirêj heta fermandar Xelîl, ji Dicle, Şervîn û Şîlan heta Rûstem Cûdî serdemek dan girtin û yek din vekirin. Ji Dirêkê heta Efrînê, xeta bin xetê di pehnava ji Qamişlo û Hesekê bi awayekî dirêj hildikşe û dibe Rojavayê welatê Rojê. Piştî sala 2000'î bi avakirina PYDê re êdî pêngavek nû hat destpêkirin.

Di jiyana mirovan de kêliyên wisa hene ku tu bi bihîstina hinek tiştan ji şimik heta kumik dihejî. Bihîstina min a çûyîna Rojavayê welat tiştek wisa bû. Li Rojava qonaxek nû dihat jiyîn û di vê qonaxê de cih girtin û şahidiya vê qonaxê kirin di min de lerzek balkêş dabû avakirin. Ev lerza min hinek ji kelecanê, hinek ji mereqê, hinek ji tirsa berpirsyartiyê û hinek jî ji nediyarbûn û şêlûbûna rewşa li qadê dihat jiyîn bû. Bêguman, min qad nas dikir. Rojava cihê dibistana min a şoreşê bû. Min waneyên herî mayînde yên şoreşê li wê derê ji Rêber Apo girtibûn û min li ser wan waneyan berê xwe dabû qada şer. Di her

kêliya zor û zehmetiyê de dengê wî li hişê min dixist û min qonaxên dijwar wisa derbas dikirin. Piştî bi salan ez rêwiya heman dibistanê bûm. Bêyî xeyala dîtina mamosteyê xwe, min berê xwe dida şûn û şûnwarên wî yên pîroz û erk û berpirsyartiya li ser milê min lerza dilê min zêde dikir. Lê dîsa em ji wî fêr bibûn ku hevaltî û dostaniya herî rast dilsoziya bi dozê û xeyalên azadiyê ve ye. Ji ber ew doz û xeyala wî dayî pêşiya me, mohra hevaltî û dostaniya bi xwîn û xwihdanê, bi kedê hatî sazkirin bû.

Çîroka ez niha ji we re behs bikim jî dilopek ji van hestên mohra xwînê li ser ketiye. Hestên dilsoziya bi ax û welat ve, hestên evîn û hezdariya azadî û wekheviya jiyanê ya zarokên gelê min, şervan, egîd û çelengên vê xaka dil hatî parçekirin e. Ev çîroka şer û berxwedana Kobaniyê ye. Çîroka lehengî û berxwedaniyekî mezîne ya min jê re şahidî kiriye. Her gotin û peyv xwe dispêre dîtin û şahidiyên min ên vî şerê hebûnê.

# DI HAVÎNÊ DE BARAN LI HERIYA KOBANIYÊ DIBARE

## ENIYA ROJHILAT: 20'ê Tîrmeha 2013'an

Dibe ku berê wekî min bala gelek kesan kişandibe vî navî. Dihat çi wateyê û li gorî tewanka zimanê me pêveka girtî ji kû dihat? Dibe ku gelek kesan mereq kiribe wekî min. Zimanê me peyvan ditewîne. Li welatê me gelek gund û mezrayên bi navê kopê, kop û kopan hene. Kobanî jî di serê min de cihekî wisa bû. Li gorî serpêhatiya navê Kobanî jî ev nav ji navê Kompanî dihat. Lê bi demê re navê Kobanî hatibû hêsankirin û li şûna Kobaniyê Kobanî dihat nivîsin. Li welatê me ji nav û bajaran kevintir stran û destanên qala evîn û axê dikin hene. Em berê axê nas dikin. Dema min peyva heriyê ya Kobaniyan bihîst, min got ha, ev e! Xweza bigiyan e û şopên xwe li ser zindiyên lê dijîn dihêle. Xwezaya Kobanî wekî dirûvekê li ser rûyê her mirovek Kobanî diyar e. Zuhabûn û şilahiya xwezayê di her kêliya hebûna jiyanê de nexşeyên mayînde di rûyên wan de ava kiriye. Rûyên mirovan parçeyekî axa welatê wî/wê ye ku bi gotina Kobaniyan heriya warê wî/wê ye. Bajarekî biçûk ku dibin hilehila bajarê kevnar Ûrfayê de winda dibe, mîna xalekê li ser nexwşeya cîhanê xuya dike. Tê bêjî qey deqek biçûk a li eniya deşta Heranê hatî kutan e. Ji kevin de rûyên mirovên kal bala min dikşand. Lê heta ez

neçûm Kobanî min sedema vê tiştê fêm nekir. Rûyên mirovan nexşeya welatê wî/wê ye. Dema mirov her kal û pîr dibe demboriya xweza û civakê bi hemû giraniya xwe kêlî bi kêlî di herike ser xetên rûyê mirov. Ev rastî ji vê ye her bûye jêdera wênekêşên kêrhatî. Lê bi qasî vê rastiyê jî bi mîlyonan dîmenên ku di kûrahiya çavên mirovên bi pirs de xwe veşartine hene. Piçekê jî ev dibe bîranîn û serpêhatiyên bêmirin û dibe parçeyekî jiyana mirovan. Tiştekî gelek balkêşe, dema mirovên Kurd kal û pîr dibin şîrîn dibin û hemû hebûna wan mîna wêneyek têr dîmen li ser rûyê wan tê dîtin. Rûyê mirovên Kurd wekî temen û çarenûsa welatê xwe ne. Liv û tevgera welatê wan di rûyê wan de xuya dike. Belê bi qasî kelecana tekoşinê tişta bala min kişandibû ser xwe ev rûyên kal û pîran bûn. Gelekî du-sê hezar sale cara yekê bû ku rastî derfetek azadiyê ya mîna şoreşa Rojava dihat, bi qasî germiya şoreşê bi kelecan bû. Li gorî bîr û baweriyên gelê Kobanî kehanet diguherî û gelek gotinên pirtûkên pîroz bi cih dihatin. Azadî û hesta azadiya welatê me ti carî naşibe azadiya xelkê. Kal ciwan bibûn, pîrik zindî bibûn. Ger gotin di cih de be kelekela havîna Kobaniyê de baran li heriya wan dibarî. Peyva heriyê jî mîna kalikên Kobaniyê bala min kişandibû ser xwe. Diyar bû hêj gelek tiştên bala min bikişînin ser xwe wê derbiketiyan pêşiya min. Peyva heriyê di nava gelemperiya zimanê Kurdî de di wateya şilbûn û rohnbûna axê de tê bikaranîn. Lê di nav Kobaniyan de ji axê re herî tê gotin. Hêviya şilahiyê û axa têrbihar di gotina heriya Kobaniyan de ji qalûbela heta niha dibû

rastiyek jiyanê. Kobanî difûriya û ji giyana miriyan heta giyana mirovên zindî hevbeşiyek têrcoş jiyan dikir. Belê, tevnên jiyana şêniyên vir hêdî hêdî dihat honandin.

* * *

Bi ser rizgarkirina Kobaniyê ya ji rejîma Baas tam salek derbas bibû. Wê Kurdan liv î bajarî salvegera rizgarbûna xwe ya ji dagirkerekî Kurdistanê pîroz bikiriyan. Coş û kelecana amadekariyên pîrozbahiyan bi hemû germiya xwe ve dewam dikir. Her wiha bûyer û rûdawên nû, pêşveçûnên nû çêdibûn. Di warê siyasî û leşkerî de li tevahiya Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê tiştên dihatin jiyîn, nîşaneya dîtina demên pêşbûn jî. Rewşa hêzên me, Artêşa Azad her wiha guhertinên di civaka me de çêdibûn em ber bi demek nû û dijwar ve dibirin. Eşkere bû ku wê şovên rûyê mirovên vê xakê hêj bi gelek gêsnê xweşî û janan bihatiyan kêlan û wê heriya Kobaniyê şahidiya gelek tiştên nû bikiriya.

Şerê salekê berê li Sûriyê dest pê kirî hêj dewam dikir. Em ketibûn sala 2013’an û diyar bû wê çarenûsa şerê li Sûriyê û Rojava wisa ne demkurt be. Beriya Şoreşa Rojava ya Azadî û Demokrasiyê ya 19’ê Tîrmeha 2012’an di bin pêşengiya gelê Kurd de hatî lidarxistin jî gelek hêzên din ên wekî Artêşa Azad, El-Nusra ji derên wekî Dêr El-Zor, Reqa, Cerablûs, Minbic û gelek cihên derdora bajarokê Kobaniyê ji Rejîma Baas rizgar kiribûn. Lê belê li vê derê gelek bajarên wekî Girêspî, Minbic, Cerablûs û Reqa hebûn ku hêzên me yên bi navê Cephet El-Ekrad li

van deran gelek serkeftin bidest xistibûn. Li cihên Kurd lê hebûn, hêza me jî hem ji bo parastina gelên herêmê, hem jî ji bo paqijkirina herêmê ji hêzên rejîmê li wan deran hebû. Her çend hejmara me hindik be jî me hêzên xwe li wan deran bicih dikir û bi desteka gelên herêmê û beşdarbûna ciwanên herêmê li nav hêzên parastinê hejmara hêzên me jî roj bi roj zêde dibû û berfireh dibû. Bi taybet li cihên wekî Girêspî, Reqa û hwd. Di destpêka rizgarkirina van herêman de hêza me cihê xwe girtibû û rola xwe lîstibû. Dîsa li bajarên Cerablûs û Minbicê jî hêzeke me ya xurt hebû û dibin fermandariya Ebû Leyla de grûbek wek ketîbeyeke Artêşa Azad a ku Cephet El Ekrad an jî Eniya Kurdî ya xwe bi rêxistin kirî di nav van de Kurd, Ereb jî hebûn. Di gelek şerên hatibûn meşandin de vê hêza me tevlîbûnekî xurt raber kiribû. Dîsa di şerên li Heleb û Ezazê de vê hêza me cihê xwe girtibû û roleke pêşeng lîstibû. Ev hêz xurt bû û gelek şervanên xwediyê lêgerînên jiyaneke azad û demokratîk ên ji neteweyên cuda di nav de cihê xwe girtibûn. Ji ber vê di derdorê de xofek ya vê hêza me hebû û bi taybet jî li ser muxalefeta dixwest li herêma me bibe serwer.

Artêşa Azad salekê berê di roja 8'ê Mijdara sala 2012'an de li Serêkaniyê dest bi şerê bi rejîma Baas re kir. Şer hefteyekê domand. Rejîma Baas ji Serêkaniyê hat derxistin û em û muxalefeta Sûriyê bi hev re di Serêkaniyê de bi cih bibûn. Bi destpêkirina şer re artêşa Sûriyê bi balefiran li hêza Artêşa Azad xistin. Wê demê me bi dewleta Sûriyê re dest bi şerekî çekdarî nekiribû.

Lewma dema Artêşa Sûriyê êrişî Artêşa Azad kir, Artêşa Azad ji me xwest ku bên li gel me bimînin û xwe ji êrişên hewayî biparêzin. Heta wê demê hêzekî wan a hindik di bajêr de bû. Li ser daxwaxa wan me destûra hatina gel cihên xwe da wan. Dema hêzên artêşa Sûriyê ji bajêr derketin û me destûra hatina gel xwe da Artêşa Azad, wan ji derve hêzek mezin xwestin û bi pêncî û şeş ketibeyan hatin nav bajêr. Me plana wan tam nedizanî û li gorî xwe me ew hevbeş û hevalbendên xwe dizanîn. Ew ketibeyên ku hatin bajêr ji aliyê Tirkiyê, ji ser sînor hatin. Dema ketin bajêr li pişt me zivirîn û xwestin cihên di destên me de ji me bigirin û me ji bajêr derbixin. Di nîqaş û guftûgoyên me yên berê de biryarên me yên hevbeş hebûn li gel wan. Wan digot, "cihên hêza dewletê lê hebe emê êriş bikin." Lewma dema wan li Serêkaniyê dest bi şer kirin, me jî bi rêzê Dirbesiyê, Tiltemir, Amûdê û hinek cihên Qamîşlo ji dewletên girtin û em di wan cihan de bi cih bûn. Ji xwe me berê gelek cihên li Dêrikê girtibûn û pergala xwe li wê derê serwer kiribû. Me ji wan re got, "Hûn nikarin êrişî cihên me ji dewletê standîn bikin û egerek hûn biçin wan cihan nemaye. Ji xwe me hêzên dewletê derxistine û ev dever di destên me de ne. Li Serêkaniyê jî me bi hev re hêza dewletê derxist. Em dikarin li cihên xwe bin, hûn jî beşên ku we girtîn kontrol bikin." Lê wan ev daxwazên me nepejirandin û di 19'ê Mijdarê de êrişî ser hêza me ya li bajêr kirin. Di encama vî şerî de çil endamên Artêşa Azad hatin kuştin. Di encama pevçûnan de hevserokê PYD yê bajêr Abid Xelîl şehîd bû.

Ji ber di şer de şikestin vegeriyan û me cihên xwe parastin. Lê cara diduyan di 12'ê Kanûna heman salê de dest bi êrişan kirin. Êrişî ser cihekî me kirin û çar hevalên me di wî şerî de şehîd bûn. Hevalê Goran, Ferhat Qewaz, û Hemîd. Piştî vî şerî jî cardin di 23'yê mehê de êriş kirin. Dema me dît dest ji êriş û dijminahiya xwe bernadin, me li dijî wan pêngavek da destpêkirin û me çete ji piraniya bajêr derxistin û cihên wan ketin dest me. Di vî şerî de jî du hevalên me şehîd bûn. Hevalê Lewend û hevalê Serhat. Me di wan rojan de li Girzîro pêngavek da destpêkirin. Girzîro cihek girîng bû û xeta petrolê tê re derbas dibû. Me dixwest em wê derê bigirin û bixin bin kontrola xwe. Di encama pêngava me ya li ser Girzîro de me Girzîro girt. Piştî girtina me ya Girzîro, cara yekê dewleta Sûriyê li hemberî me balefirên şer bikar anîn û bi balefiran êrişî hêza me ya Girzîro kirin. Di encama êrişan de hevalek me şehîd bû, yanzdeh hevalên me jî birîndar bûn. Lê me Girzîro girt û kontrola wê ket dest me.

Piştî bi awayekî rasterast dewlet ji gelek cihan hat derxistin û her wiha êrişên Artêşa Azad ên li ser me destpêkirin û şûn de, me biryara avakirina hêzek xurtir a parastinê û artêşbûnê da. Heta wê demê rêxistina me ne rêxistinekî çekdarî bû. Gelê me bi derfetên kêm li herêmê li hember êrişan parastina xwe dikir û cihên xwe ji dewletê distand. Navê hêza me YXK an ku Yekîtiya Xweparastina Kurdistanê bû. Lê piştî girtina gelek cihan û zêdebûna êrişên li ser me, di derbarê pêkhateyekî nû

de nîqaş hatin kirin û tevgera Kurd li Rojava biryara Konferansekê da. Konferansa me di 1'ê Çileya sala 2013'an de bi beşdarbûna 336 delegeyan hat pêkanîn. Di vê konferansê de biryar hat girtin ku Yekîneyên Parastina Gel YPG bê avakirin. Di heman Rojê de îlana YPG hat kirin. Di konferansê de ji bo meclîsa leşkerî 49 kes hatin hilbijartin. Ev hêz ji jin û zilaman pêk dihat û têkel bû. Her wiha di vê konferansê de ala YPG û rêziknameya wê hat diyarkirin. Yek ji biryarên konferansa me di derbarê nêzîkatiya me ya ji gelê herêmê re bû. Konferansê biryar girt ku ti ferq û cudahî xistina nava gelan neyê kirin û vê di rêziknameya me de jî wekî xalek sereke cih girt. Di konferansê de xalek din a girîng biryara avakirina hêza xweser a jin bû. Konferansê biryara vê yekê girt. Li ser biryara di vê konferansê de hatî girtin konferansekî xweser a jinan çêbû û YPJ di 4'ê Nîsana heman salê de hat îlankirin.

Damezirandina YPG, YPJ ji bo me bû destpêka qonaxekî nû. Hêzên dixwestin li ser herêmê bibin serwer û cih û warên Kurdan dagir bikin, piştî avakirina hêza me ya leşkerî wekî berê êdî nekarîn bi hêsanî bikevin êrişê. Ji ber bi avakirina hêza leşkerî di navbera me û Artêşa Azad û komên li herêmê dixwestin bibin serwerde hevsengiyekî ya hêzê çêbû. Heta her roja çû, hêza me ya wan derbas kir. Gelê Kurd bi moral û baweriyekî mezin, bi vîn û wêrektiyek mezin dest bi kar û xebatên rizgariya ax û warên xwe kir û beşdarî nav van hêzan bû.

Bi bi şerê me li Serêkaniyê û Helebê da meşandin û derbeyên çeteyan li wan deran xwarin, Artêşa Azad û rejîma Sûriyê dîtin ku em nahêlin kes bikeve bajarên Kurdan û cihê Kurd lê hebin, wê ew bi xwe parastina xwe bikin. Ji xwe beriya wê jî herêmên wekî Efrînê, Kobaniyê û bajarokên girêdayî Cizîrê hatibûn rizgarkirin. Dîsa di şerê Serêkaniyê yê li hemberî Arteşa Azad hatî kirin de û binkeftinên wan jiyan kiribûn jî gelek tirs xistibû nava dilê wan. Bi vê yekê ve girêdayî, em dîsa diketin pêvajoyeke nû. Weke hêza Kurdî bi navê YPG-YPJ'ê ji bo xweparastinê artêşek me hatibû çêkirin û her roj bi dehan ciwanên xwebexş dihatin û beşdar dibûn. Van ciwanan perwerde didîtin, dihatin rêxistinkirin û di parastina herêmên xwe de erk digirtin. Di vê pêvajoyê de di nava gelê Kurd de coşekî mezin dihat jiyîn. Kurdan bi şoreşê hêz bi dest xistibûn. Gelê me bibû xwedî derfeta bikare bibe leşkerê xwe bi xwe. Bikare xwe bi xwe biparêze, bi hêza xwe ya cewherî parastina xak û rûmeta xwe bike. Vê hestê di gelê Kurd yê li Rojava de di asta herî bilind de coşek dabû avakirin. Ji ber gelê Kurd evîndarê azadiyê bû. Bêrî û bendewariyên gelê me yên di warê azadî û xwe gihandina mafên xwe de xwedî demboriyekî dûr û dirêj bûn. Ev coş mina lêhiyekê belav dibû û her diçû hêvî û baweriya serkeftinê bilind dikir. Bi vê coş û baweriya serkeftinê gavên nû dihatin avêtin. Her wiha gelê me xwe gihandibû pergalekê û bi pergala xwe dihat birêvebirin. Di hemû sazî û dezgehan de xwe bi rê ve dibir.

Piştî destpêkirina şoreşê salek qediya bû. Bi germahiya Tîrmehê re herkesî/ê xwe ji pêvajoyekî nû re amade dikir. Coş û germiya şoreşê li her devera Rojava serwer bû. Bi taybet jî ji ber cihê destpêkê ji rejîmê hatî rizgarkirin Kobanî bû, hem di warê erdnîgarî û hem jî di warê dîrokî de xwedî cihekî girîng bû. Ji ber dema pergala Baas Kemera Ereban danibû, xwestibû cih û bajarên Kurdan ji hev qut bikin û ew Kemera Ereban wekî sînorên navxweyî danibûn navbera xaka Kurdistanê. Xaka Kurdistanê ya berê bibû çar parçe, bi vê polîtîkayê li parçeyê Rojava cardin hatibû parçekirin û sînorên din jê re hatibûn diyarkirin. Tirsa ji yekbûna Kurdan, di tevahiya dîrokê de hiştibû ku neyarên gelê Kurd bi hemû hêza xwe ve wan ji hev qut bikin û sînoran bixin navbera wan de. Kemera Ereban jî wekî encama vê tirsê hatibû çêkirin. Dinavbera Serêkaniyê û Kobaniyê, di navbera Girêspî û Kobaniyê, Girêspî û Serêkaniyê, Cizîr û Kobaniyê de, Kobaniyê û Efrînê de, bi kurtasî li seranserî Rojavayê Kurdistanê ji bo qutkirina cih û warên Kurdan, her wisa ji bo parçekirina civaka Kurd Erebên ji cihên din hatibûn bicihkirin. Kobanî wekî giravekê bû di nav vê kemerê de.

Rejîma Baas bi van polîtikayan xwestibû zilm û zordariya xwe, desthilatdariya xwe li ser gelê Kurd ferz bike û bi demê re civaka Kurd asîmîle bike. Her wiha bi bandora Erebên li wir hatîn bicihkirin çanda civaka Kurd lewaz bike, kengê bixwaze li herêmê Kurd û Ereban berde hev û bi vî awayî pergala xwe ya qirêj bigire bin

ewlekariyê. Vê kemera rûreşiyê bajarên Kurdan ji hev parçe kiribû. Gelê Kurd gelekî nirx dide jiyan û çanda gelên din. Di tevahiya dîrokê de dijberî û zilim li ser çand û civakên din nekiriye. Ev kevneşopiya Kurd, li Rojava jî bûye sedema polîtikayên rejîma Baas encam negirin. Tevî ku car carnan bi destên desthilatdariyê fitne û fesadî hatibin kirin, hinek bûyer û rûdawên nexweş di navbera Kurd û Ereban de hatibin jiyîn jî wekî pergalê xwestî dijminahî neketibû navbera gelên Kurd û Ereb. Çanda Kurdan a kevnar û ji pir rengî û dewlemendiyên çand û civakên din re rêzdar, bi aheng û dilrehim hêlaye ku li Rojava polîtîkayên şoven ên pergala Baas vala derkevin. Tevî hemû nakokî û pirsgirêkên heyîn bi demê re hev naskirin, bi hev re zewac û danûstandinên di navbera gelan de bibûn û dibûn kêmek be jî pêşî li dijminahiyan girtibû.

Di rastiyê de xaka Kurdan hatibû dagirkirin. Ax û zeviyên wan li Erebên ji derve hatîn, hatibû belavkirin. Derfetên herî baş ji Erebên herêmê re hatibû dayîn û gelê Kurd ji hemû derfetên jiyanê hatibû bêpar hiştin. Ti gel û netew dagirkerî û mêtîngeriya li ser xaka xwe wisa hêsan napejirîne. Zilm û zora lê hatî kirin ji bîr nake. Kîn û hêrsa xwe nekare eşkere bîne ziman jî li benda derfetekê dimîne ku mafên ji dest hatîn girtin paşve bistîne. Lewma her çiqas gelê Kurd, li hember gelê Ereb dijminatî nekir jî lê kîn û hêrsa wî ya li hember desthilatdariyê ti carî kêm nebû. Lewma tevî ku li Rojava ti carî şoreşekî dorfireh ku bikare li hemberî pergala

Baas serî rake derneketibe jî gelê Rojava dilsoz û girêdayî têkoşîna azadiya Kurdistanê ma. Tevî parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê bû, ked û berdêlên mezin di têkoşînên parçeyên din de da. Di warê madî û manewî de hemû derfetên xwe ji şoreşên başûr û bakurê welat re pêşkêş kir. Bi sedan şehîd û berdêlên giran da di têkoşîna azadiya Kurdistanê de. Girêdayî çand û zimanê xwe ma. Tevî her awayê polîtîkayên rejîma Baas ên tinekirin û tinehesibandinê hebûna xwe ya çandî û civakî, zanebûna xwe ya netewî, zimanê xwe parast. Lewma hêviya rizgariyê, hêviya girtina maf û azadiyên xwe, bi kurtasî daxwaz û baweriya bi azadiyê, bi mafên xwe girtinê ti caran kêm nebû li vî parçeyê Kurdistanê. Bi têkoşer, rewşenbîr û çanda xwe ya welatperweriyê her tim parçeyekî berxwedêr û alîgirê têkoşîn û şoreşên ji bo doza azadiya Kurdistanê bû. Bi bandora têkoşîna PKK û heyîna Rêber Apo ya bîst salan jî gelê Rojava xwedî zanebûn û ezmûnekî kûr a polîtikayê bû. Ev hemû ji bo şoreşa Rojava bingehekî pir bi nirx bû.

Lewma gelê Rojava piştî 19'ê Tîrmehê, bi hêvî û baweriyekî mezin beşdarî şoreşê bû. Bi hêviya girtina azadî û mafên xwe, li dora pêşengên şoreşê kom bû. Ji ber daxwaza li ser axa xwe ya kevnar bi hebûn û nasnameya xwe azad jiyankirinê di asta herî jor de hebû. Ev daxwaz wekî vîn û baweriyekî mezin di şoreşê de şênber bû. Herikî nava kar û xebatên şoreşê.

Destkeftên şoreşê şênber dibûn. Gel êdî pirsgirêkên xwe bi xwe çareser dikir. Dada civakî baweriyekî mezin dida avakirin. Ji ber her cihê me girtî û her cihê em lê hebûyan de, li wir Malên Gel hebûn. Rêveberên ji gel hebûn. Civakê xwe rêxistin dikir. Pirsgirêkên xwe dikarî nîqaş bike û çareser bike. Ji xwe armanc ji avakirina Malên Gel ew bû ku civak bi ezmûna xwe, bi vîna xwe bikare pirsgirêkên xwe di nava xwe de çareser bike. Li Minbicê, Cerablusê û Grê Spî Malên Gel hebûn. Ji xwe li hemû bajar û deverên di destên me de Malên Gel hebûn. Civakê bi xwe pirsgirêkên xwe nîqaş dikir û dadweriya xwe pêk dianî. Mijarên heyîn bi hişekî hevpar digirt dest û çareser dikir. Aqilê hevpar ê civakê û nîqaşên dihatin kirin dihişt ezmûnên civakê jî xwe bidin axaftin û li ser çareseriya pirsgirêkan hevpariyek derkeve holê. Vê yekê hêz û gêwlekî mezin dida. Vê yekê dihişt bala hêzên derve jî bikişe ser me û dijminên gelê me bikevin nava tirsê. Ji ber êdî pergalekî me ya me bi xwe rêve dibir hebû. Her roja diçû aliyên erênî yên vê pergalê li ser jiyana civakê encamên erênî derdixist holê û hişmendiyekî nû avadikir di civaka me de. Lewma ji tirsa zû pêşketin û bibandorbûna pergala me, pêlekî nû ya êrişan jî bi xwe re anî.

Bi ketina sala 2013'ê re, piştî ku me rejîma Baas ji herêmên Rojava derxist, vê carê jî hêzên wekî Cephet El Nusra û Artêşa Azad ên li wan deran bi cih bûyîn xwestin deverên me bi dest xistîn dagir bikin. Dagirkeriya rejîmê bi dawî hatibû, vê carê jî van hêzan

xwest dagirkeriyê li ser gelê Kurd bimeşînin. Lê di rastiyê de Kurd ne Kurdên berê bûn. Ji ber hêza me ya parastinê hebû. Xwedî pergal û rêxistin bû gelê Kurd. Xwedî hêza berxwedanê û xwesteka girtin û bi destxistina maf û azadiyên xwe bû. Ev vîna xwe bi têkoşînekî dijwar danibû holê û gihiştibû derfet û destekfiyên girîng. Berê di vê çarçoveya daxwaza dagirkirinê de van hêzan li Serêkaniyê dest bi hewldanên wisa kiribû. Xwestin carek din bi destek û piştgiriya Tirkiyê Serêkaniyê dagir bikin.

Li Kobaniyê amadekariyên pîrozbahiyên cejna rizgariyê hebûn. Kobanî di nava coş û kelecanekî mezin de bû. Ew bi rojan bû Kobanî dihat xemilandin, her der bi rengên kesk, sor û zer xemilîbû. Ev cejin ne dişibiya cejnên olî. Hemû beşên civakê, jin, zilam, zarok û temenmezinan hemûyan xwe ji bo vê cejnê bi kelecan amade dikirin û coşa cejnê dihat jiyankirin. Bi rojan bû xelkê bajêr ji bo cejna pîrozkirina rizgarkirina bajarê xwe di nava amadekariyên pîrozbahiyê de bûn. Hefteyekê beriya cejnê, li Girêspî jî amadekariyan dest pê kiribû. Her wiha hemû gundewarên Kobaniyê di nav coşa vê amadekariyê de bûn. Jinan cilên xwe yên rengîn amade kiribûn. Yên maşînên wan heyîn al pê ve kiribûn. Herêm bi rengên biharê xemilî bû. Wê kelecana pîrozbahiyan her kes xistibû nav coşekî mezin.

Xelkê Girêspî jî wê bihatiyan Kobaniyê û li bajêr cejna xwe pîroz bikiriyan. Tam di wê demê de an ku di 16’ê

meha Tirmehê de êrişek dijwar li ser Serê Kaniyê pêk anîn. Piştî wê bi du rojan an ku 18'ê heman mehê mala Gel a li Girêspî teqandin. Hêza me ya Cephet El Ekrad li wir bû. Artêşa Azad û alîgirên xwe ji hêza El Ekrad xwestin ku bi çek li nava bajêr negerin û xwestin Malên Gel ên li bajêr bên girtin û dîsa xwestin alên me yên li wir bên daxistin. Ji xwe beriya şer dest pê bike, gotibûn; "dive hûn alên xwe li bajêr daxin. Divê hûn Malên Gel bigirin. Ji ber ev cihê me ye, hûn wekî ku dixwazin nikarin li vir bigerin. Hûn nikarin kar bikin, sazî û dezgehên Kurdan çêbikin. Em napejirînin ku li vir alên Kurdan bên rakirin, em destûra tiştekî wisa nadin we." Nîqaşên destpêkê wisa dest pê kiribûn. Ji xwe dixwestin beriya salvegera rizgarkirina Kobanî êrişî ser Kobaniyê û derdora wê bikin. Tevî gefên wan ên ji hefteyekê zêdetir jî me û gel amadekariyên pîrozbahiyan dikir. Heta ji me hat, me hewl da em neyên lîstikan. Me guh neda provakasyonên wan. Lewma rojeva sereke ya deverê pîrozbahî û amadekariyên wê bûn. Lê beriya cejnê em tam pê hesiyan ku ev hêz dixwazin êrişî me bikin. Piştî me dît amadekarî û hewldanên wan ên êrişkirinan zêde bûn, me jî dest bi amadekariyên xweparastinê kirin. Ji ber me êdî eşkere dît ku dixwazin êrişî ser hêzên me û gelê me bikin. Dê çi bikin, çawa bikin, em hinekê li ser vê rewşê rawestiyan. Me dît cihê di serî de dixwazin êrişî ser bikin yek jê bajarê Reqa, yê din jî Girêspî ye. Çima Girêspî? Ji ber têkiliyên van hêzan bi Tirkiyê re hebûn. Piştî êrişa li Serêkaniyê, em pê hesiyan ku dixwazin di serî de li Girêspî êrişî ser hêzên

me bikin û wir bi dest bixin. Li Reqayê jî gotin, "Nabe hûn li vir bimînin. Em xwedî û serwerên vir in. Em napejirînin ku Malên Gel li vir hebin. Divê hûn van malan bigirin û desthilatiya me bipejirînin. Ger pirsgirêkên we hebin, hûn dikarin bên gel me û em çareser bikin. Em bi eşkere dibêjin, em hebûna we Kurdan a li vir napejirînin."

Bêguman, em ne dijberên ti gelî bûn. Me wekî hêza leşkerî û gel jî dikarî em bi gelên deverê re wekî xwişk û bira bijîn. Pirsgirêkên gel û civaka me yên bi vî rengî nebûn. Lê em civakek bûn. Em civakekî xwedî rêxistin û hêz bûn. Em ne li dijî jiyana hevbeş bûn. Lê me dixwest em pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin. Ev mafê me bû. Nêzîkatiya me ya sereke ev bû. Me dixwest em xwe bispêrin hêza xwe bi xwe. Em dagirkeriya ti hêzekê nepejirînin. Me tevî ku bi zimanekî aştiyane ev daxwaz û nêrînên xwe parve dikirin jî ya li ser me dihat ferzkirin şerekî desthilatdariyê bû. Di van hêzan de daxwaza li pêş şerkirina bi me re bû. Hebûna me nas nedikirin. Hewlên me yên bi hev re jiyankirinê paşguh dikirin û li ser me şer ferz dikirin. Rejîmek faşîst û şoven çûbû, yekî din xiraptir, bê rêzik û bêpîvantir hatibû şûna wê. Bi her awayî serweriya xwe li ser me ferz dikir. Tevî me Reqa bi hev re girtibû, tevî me ewqas hewlên bi hev re jiyankirinê dabûn, wan hebûna me nedipejirandin û hêza me nas nedikirin. Lewma ji bo parastina hebûna xwe, tu neçarî hêza xwe ya parastinê, hêza xwe ya çekdarî xurt bikî. Divê tu civaka xwe baş rêxistin bikî û

zana bikî. Divê di hemû beşên civakê de tu xwe xurt bikî û bikî hêzek xurt. Nexwe ya li ser te tê ferzkirin, 'zagona yên bi hêz, yên bêhêz dixwe ye." Tevî hemû hewldanên me yên aştiyane tişta li ser me dihat ferzkirin şer bû. An divê tu bibî hêz, an jî hêza li hemberî te dê te wekî bablîsokekê bigire nava xwe û te bifetisîne. Ji ber bi her awayî eşkere heyîna te înkar dike. Ji ber her çiqas rejîm hatibe guhertin jî cewazî di navbera hişmendiya hêza çete û rejîma berê de nîn e. Her du hêz jî li ser înkar û tinekirina Kurdan wekî hev dihizirin. Kurdan nas nakin, hebûna Kurdan napejirînin.

Ev hêzên min behs kirin, ne xwedî paradîgmayekî wisa bûn ku bikarin bi hevre jiyankirna gelan bipejirînin. Ne dikarîn xwe li hember hevsengiya di navbera gelan de ragirin. Hêzên paşverû bûn, ne xwedî felsefe, çand û giyanekî wisabûn vîn û baweriya hemû civakê, hêzên li deverê nas bikin û rêz bidin daxwazên beşên din ên civakê.

Lewma tenê riyek dima li pêşiya me. Diviya em zend û bendên xwe ba bidin û ji bo parastina gelê xwe, mafên civaka xwe, em xwe ji bo şer amade bikin. Ji ber tevî hemû zilm û zordestiyan, civaka me, gelê me ticaran bêdeng nemaye. Dibe ku hêj maf û azadiyên xwe wekî civak bi dest nexistibin. Lê her tim vê civakê li hember zordestiyê li ber xwe daye.

Beriya pîrozbahiyên 19'ê Tirmehê bi şeş rojan, ev hewla tevlîhevî û şerderxistinê ya çeteyan zêde bû. Ya balkêş

ew bû ku ev hêz herî zêde ji awayê rêxistinkirina me ditirsiyan û êrişî saziyên me yên rêxistinkirinê dikirin. Dema me dixwest em bi hev re li cihekê bimînin, wan digot, “hûn wisa dibêjin, lê hêj mehek neçûyî hûn her tiştî dixin bin bandora xwe û rêxistina we li her cihî serwer dibe. Ji ber we em nikarin kesî bînin gel xwe. Em di bajarên ku em lê dimînin de malên we yên gel naxwazin. Hûn bi riya van malan serweriya bajêr dixin dest xwe. Pêşiya gel vedikin, ti desthilatiya me li ser civakê namîne.” Me bajêr bi hev re ji rejîmê girtibûn. Lê wan derketina ji bajêr li ser me ferz dikirin, her rojê bûyerekî nexweş a nû rû dida. 18’ê Tirmehê hevalan agahî dan me û gotin Mala Gel a Girêspî hat teqandin. Ev ji bo me dihat wateya peyama şer. Ji xwe hêza me ya leşkerî ne di nav bajêr, li derveyî bajar dima. Biryargeha me ya bajêr li gundê Yapsê bû. Hevalê Dilovan, hevala Şîlan Guyî û Kawa Ûrfa rêveberiya vê eniyê bûn. Ji bo bûyer mezin nebin û em bi hêzên muxalefetê re nekevin şer, me biryar da em pirsgirêkan bi riyên diyalogê çareser bikin. Bi vê armancê hevalê Dilovan çû gel berpirsên Artêşa Azad û bi wan re hevdîtin kir. Di hevdîtinê de biryar dan ku şerê me nekin, lê gotin hêza xwe ya li bajêr vekişînin. Her diçû daxwaz û xwestekên wan ên dagirkirina axa me zêde dibûn. Lê tevî her awayê gef û êrişan jî coşa me ya ji bo pîrozbahiyan jî dewam dikir.

Gotina “her mirov dişibe erdnîgariya xwe” herî zêde li gelê Kurd tê. Bi rastî jî civaka me dişibe ernîgariya

Kurdistanê. Di warî giyanî û derûnî de jî ev rastî xwe di her kêliyê de dide der. Wekî xwezaya Kurdistanê, xwezaya civaka me jî pir renge û hemû werzan di nava hev de dijî. Tevî nakokî û aloziyên me yên li gel van hêzên Artêşa Azad û El Nusra, şerê li Serêkaniyê û Girêspî jî amadekariyên pîrozbahiya 19'ê Tîrmehê temam bûn. Di heman rojê de bi hezaran gel daket meydana ku me jê re digot Qada Azadiyê. Ji hemû gund û derdora Kobaniyê gel herikî qadê, wekî pêşiyên me gotine, te ax bavêtiya hewa li erdê nediket ji ber qelebalix û zêdebûna mirovan. Kobaniyê mîna demsala biharê xwe bi hemû rengan xemilandibû. Gelê Kobaniyê bi xweşî û ahengekî li hevkirinê ji bo cejna xwe pîroz bikin berê xwe dabûn qadê û Qada Azadiyê wekî baxekî kulîlkan lê hatibû ji reng û şemala xelkên Kobaniyê.

Pîrozbahiyan tevî her tiştî dest pê kir. Êdî Kobanî ne bi rengekê bû. Hemû reng di nava xwe de dihewand. Jinên kurd qad bi cilên xwe yên rengîn, ciwanan bi alên rengê bihara welatê me qad xemilandibûn. Li ber dengê dahol û zirnê govendan dest pê kir. Hemû gelê Kobaniyê bi coşek mezin ketibûn govend û dîlanê. Poşiyên li serê jinan di ber reqsa wan re dihejiyan û dengê pirpirk û xemlên wan jî tevlî dengê dahol û zirnê, dengê dirûşm û tililiyan dibûn.

Hinek kêlî hene, mirov di şirovekirina hestên di wan kêliyan de zehmetiyan jiyan dike. Ji ber di çavên wî gelî de birq û ronahiya hêvî û coşa azadiyê hebû. Di

qermûçkên rûyê kalên me de li gel şadî û serfiraziya dijîn, jan û derdên demboriyê jî xwe didan der. Dema te li rûyê kal û pîran dinêrî, wekî dîroka vê civakê ji te re pir tişt digotin. Hestyar bûn. Ji ber bi çavên xwe dîtibûn ax û warên wan ji dest wan hatibûn girtin, li biyaniyên axa wan hatibûn parvekirin û ew li ser axa xwe bê nasname hatibûn hiştin. Zilm û zora serdestan dîtibûn. Bi salan kul û derdên bindestiyê, êşên koletiyê jiyan kiribûn. Ew demborî jî li ser wê axê jiyan kiribûn. Lê wê rojê bi coşek mezin rizgarbûna bajarê wan dihat pîrozkirin. Coşa pîrozbahiyan ew dibirin serdemên berê û wan xweziyên ku 'de bila yên pêşiya me, yên bi hêviya van rojan bi salan têkoşîn, rizgarî û azadiya vê axê mirad û mexseda wan bû jî ev roj bidîtiyan' bi awirên tijî wate li derdora xwe temaşe dikirin. Lewma roja pîrozbahiyê ji hemû rojên din cuda bû. Ji ber êdî li ser wan dewsên demboriyê mohra xwe lêdabûn, an ku di qermîçkên rûyê pîr û kalên me de rondikên keyfxweşiyê diherikîn. Lewma tevî wan rondikên keyfxweşiyê çavên wan jî dibiriqîn û bi wateyekî cuda temaşeyî coşa li qadê dikirin û beşdar dibûn. Wekî ku li şûna yên bi wê hêviyê ve koça dawî kirîn û ketîn singa wê axê de jî cejin pîroz dikirin.Tevî gefên derdor jî tirsa gelê Kurd nemabû. Dema çavên wan bi hêzên YPG û YPJ diket, serfiraz dibûn, dengê tilîlî û dirûşman bilindtir dibû. Ruhekî nû, hestekî nû, vîn û baweriyekî ji ya berê bihêztir derketibû holê di gel de. Ev hesta xwe wekî mirov dîtin, hesta dîtin û pêhesîna bi çand û nasnameya xwe jiyankirinê û dilxweşiya wê bû.

Li Kobanî pîrozbahiyek bi heybet çêbû. Roja pîrozbahiyê êvarê çeteyan li Girêspî êrişî taxên Kurdan kir. Kurdên li bajêr û hêza me li ber xwe dan û nehiştin bikevin taxên wan. Me jî ji bo destwerdanê hêzek nû şand wê eniyê. Lê heta em gihiştin, gel dest bi şer kiribû. Hejmarek çek ji ser çeteyên El Nusra rakiribûn. Lewma piştî vî şerî çeteyan derdora bajêr girt û nehêlan kes ji bajêr derkeve derve. Em jî li derdora bajêr man. Wan biryar dabûn ku bi ti awayî nehêlin em bikevin bajêr û li wê derê bimînin. Me jî biryar dabû em dernekevin û pêwîst bike bersivek hişktir bidin êrişan. Roja 20'ê Tîrmehê Kurdên li bajêr di meydana bajêr de kom kirin û xwestin wan dîl bigirin. Di aliyekê de me nedixwest em bi van hêzan re şer bikin, ji aliyê din ve wan gef li me dixwarin û gelê me dîl girtibûn di bajêr de. Hinek komên biçûk ên di taxan de mayîn li ber xwe didan û hêj di bajêr de bûn. Di heman rojê de Fermandarekî El Nusra yê bi navê Ebû Mishef li gel şeş çeteyan bombeyên xwe girêdabûn û berê xwe dabû baregeha me ya li tenişta bajêr. Hevalê Rêzan berpirsê wê derê bû. Agahî da me û got; "Ebû Mishef bi çend kesan re hatiye baregeha me û gefan li me dixwe. Dibêje divê hûn ji bajêr derbikevin. Em dixwazin wan dîl bigirin, biryara we çiye?" Li ser gotina wî me nêrîna wan erê kir û hevalên me Ebû Mishef û koma li gel wî dîl girtin. Ebû Mishef, El Nûsra û Artêşa Azad herî zêde bi çekên xwe bawer bûn. Em berê bi hev re mabûn, wan dizanî ku çekên di dest wan de heyîn di dest me de nînin. Lê tiştek ji bîr dikirin hebû: Berxwedan û vîna Kurdan. Lewma wisa bi quretî hatibû û gotibû derkevin. Hevalên

me Ebû Mishef û koma li gel dîl girtin. Lê ji derveyî Ebû Mishef du kesên yêlekê bombekirî li ser di hewşê de mabûn û destên wan li ser pîmên bombeyên wan bûn. Digotin, “hûn nêzîkî me bibin emê xwe biteqînin.” Kêliyên bi kelecan, nediyar û dijwar dihatin jiyîn. Di aliyekê de me Ebû Mishef girtibû, ji aliyê din ve çeteyan li bajêr Kurd hemû li meydana bajêr kom kiribûn û ji me re digotin, “beramberî Ebû Mishef emê Kurdên bajêr hemûyan bikujin. Ger tiştek bi hevalên me bê, emê hemû Kurdan di kolanên bajêr de serjê bikin. Hejmara Kurdên di bajêr de nêzî du hezar kesî bûn. Ji xwe di wê navberê de çeteyan bi ser gundê Silûk de jî girtibûn û gundiyên Silûk jî anibûn bajêr û dîl girtibûn.

Me ji hevalê Rêzan xwest ji derveyî hişedaran kesî di baregehê de nehêlin. Ji ber ne diyar bû wê çi bibe, çeteyan bombeyên xwe biteqandina wê bi dehan hevalên me jî şehîd bibûyan. Di aliyekê de me hêza xwe ya li baregehê derxist, ji aliyê din ve jî em bi Ebû Mishef re ketin nav diyalogê û me xwest dawî li vî şerê di navbera me û wan de tê kirin bîne. Ya rast me dizanî fermandarekî çeteyan e. Lê me nedizanî kesekî ewqas girîng e. Piştî me Ebû Mishef girt û şûn de em bi vê hesiyan. Ji ber girtina wî deng veda, medyaya cîhanî cih da mijara girtina wî û em wisa pê hesiyan ku damezirînerê El Nusra ye. Di dema dîlgirtina wî de bênavber diyalogên me çêbûn. Li ser rewşa heyî nîqaş hatin kirin. Ji ber hejmarek zêde Kurd di destên wan de

bûn û ya rast rewşa gel a li bajêr em neçarî li hevkirinê dikirin.

Hêj nîqaşên me yên bi Ebû Mishef re dewam dikirin, li ser hev ji bajêr agahî hatin û li ser telefonan çeteyan gel didan axaftin. Dengê qîr û girî, dengê hewara wan agir bi dilê me dixist. Her yekê bi telefonê di axivî bi sedan deng ji derdorê dihatin û digotin; "Heval, wê me hemûyan serjê bikin. We serokê wan girtiye, hûn bernedin yek ji me nikare derkeve û wê me hemûyan bikujin." Piştî nîqaşa şev û rojekê me wekî rêveberî biryar da em li gel Ebû Mishef li hev bikin. Şertê me yê yekem ew bû ku bêyî gel zirar bibîne destûr bê dayîn ku ji bajêr der bikevin. Şertê diduwan jî wê El Nusra û Artêşa Azad li dijî me şer neke. Me şertên xwe ji wî re got û me jî wan re jî got, "Ji xwe em jî bajêr vala dikin û emê we jî berdin." Li ser vî bingehî me li hev kir û Ebû Mishef bi telefonê li gel berpirsên hêza xwe ya li bajêr axivî. Piştî axaftina wî destûr dan gel ji bajêr derkeve. Gel rojek û nîvê di destên çeteyan de dîl ma. Her wiha Ebû Mishef û hevalên xwe jî di dest me de bûn. Piştî gel bi tevahî ji bajêr derket û şûn de, me di saet çar û nîvan de Ebû Mishef berda. Lê piştî nîv saetê berdana wî, di saet pêncê êvarê de wan êrişî cihekî me yê nêzîkî bajêr kirin û cardin şer derket. Bi vî rengî soza xwe negirtin û peymana di navbera me û wan de piştî nîv saetê betal bû.

Di wê pêvajoya ku li ser me dixwestin van ferzkirinan pêk bînin de, derfet û mecalê civaka me ji her demê zêdetir hebûn ku bikare li ber xwe bide û xwe biparêze. Lê ji bo tevkujiyek li ser gel neyê kirin, me biryara valakirina bajêr girtibû û me gel ji bajêr derxist. Me pêşeroja têkoşîna xwe, bîr û baweriya gelê xwe ya bi tekoşînê dizanî. Me baş dizanî ku wê temenê wan çeteyên ji giyana civak û erdnîgariya me dûr li wê derê ne dirêj be. Wekî tedbîr tişta rast ew bû ku em pêşiyê li tevkujiyê bigirin. Ji ber hêzên çete ji pîvan, siyaset û bi hevre jiyana gelan fêm nedikirin. Li Eniya Rojhilat şer dewam dikir. Pîştî ku me xeta xwe ya parastinê saxlem kir, me cihên pêwîst jî girtin. Gundê Cirn heye. Xelkê gund hemû bi çekên xwe ve hatin gel me. Ji xwe du tabûrên me yên pispor hebûn. Tabûra şehîd Dîcle û şehîd Agir. Tabûra şehîd Dîcle hevalên jin bûn. Berpirsê tabûra şehîd Agir hevalê Emîn Erkendî bû. Hevalê Emîn li eniya Rojhilat bû. Hevalê Dilovan, hevalê Emîn û hevala Şîlan berpirsên eniyê bûn. Piştî li wir heval Dilovan şehîd bû, rewş hat guhertin. Hevalê herî zêde cih û riyên wir nas dikir ew bû. Hevalê Dilovan ji gundê Şêranê yê girêdayî Kobaniyê bû. Hevalekî ciwan bû, temenê wî bîst û pênc salî bû. Hevalekî bejna wî navîn û lewaz bû. Hevalekî esmer û çavreş bû. Tevî ciwaniya xwe jî bi ezmûn û têgihiştîbû. Di demek kurt de di asta rêveberiyê de cih girt û pêşengiya şer kir.

Piştî vê şehîdbûnê me hinekê di warê naskirina wî alî de zehmetî jiyan kir. Min ji hevalê Rostem û hevalê Mistefa

re got; “Yên di vê xetê de berê qaçaxtî kirîn kîne? Ki heye gazî wan bikin û bila bên gel me. Ji ber ên van riyan, van cihan herî baş nas dikin ew in.” Berê jî ev ezmûna me hebû. Kesên qaçax erdnîgarî, rê û cihên çûyîn û hatinê baş nas dikirin. Di têkoşîna me de alîkarî û sûdekî wan a mezin çêbibû. Ji ber ên herî zêde sînoran nas dikin, xwe li sînoran didin ew in. Piştî hevalan gazî kir, du kes hatin. Navê yekî Teslîm bû. Bi xwe re xizmekî xwe jî anibû. Min ji Eşîr û hevalê wî re got “ez dixwazim hûn gund bi gund deverê ji min re bêjin. Kijan gundên Kurdan in, gundên Ereban kîjan in, çi eşîr li vê deverê dijîn, têkiliyên wan bi kîjan hêzan re hene, gundên dost an jî dijminahiya me dikin kîjan in û navê hemûyan, riyên diçin wan ji min re bêjin.” Piştî rewş ji me re gotin sûdekî mezin da me. Yek jî min ji wan xwest dost û nasên wan li nav bajarê Girêspî jî hebe navên wan jî bidin me. Me kesên deverê dizanin û li ser ernîgarî û aqara wir serwerin bi riya wan nas kirin. Ji ber dema mirov dikeve cihekê de, ji xalên herî girîng ên mirov dibe serkeftinê yek jê naskirina erdnîgariyê ye. Ya din jî naskirina civak û çanda li wir e. Teslîm qaçaxî kiribû berê. Ji malbata wan re digotin mala Cimo. Mala Cimo, di wê herêmê de bi mêrxasî û wêrektiya xwe dihatin naskirin. Bapîrê wî navbang bû, heybetekî wan hebû li ser xelkê. Dema navê mala Cimo dihat bihîstin jî tirs û sehmek diket dilê mirovên alîgirên rejîma dagirker yên li herêmê hatîn bicih kirin. Ji ber piştî çêkirina Kemera Ereban, li herêmê malbata bi rêbazên dewlemend li ber xwe dayî yek jê mala Cimo bû. Berê jî komên çekdar ên ji malbatê hebûn û devera xwe

diparastin. Hemû xizm û mirovên hev bûn. Piştî têkiliya me bi wan re çêbû, hemû hatin gel me. Yên hatin hemû bi çek bûn. Ji wan re digotin 'Ketibeya Mala Cimo' û xwe bi nave malbata xwe didan nasîn. Mala Cimo li hember rejîma Baas û Erebên pişt re li herêmê hatîn bicihkirin şer kiribû. Nehêlabûn kar bidestên dewletê bikevin nav axên wan û tapûyên axên wan vegerînin ser malbatên Ereb. Xwedî dîrok û serpêhatiyekî balkêş bû ev malbat. Di derbarê vê mêrxasiya wan de li deverê gelek çîrokên cuda dihatin gotin. Teslîm jî wekî kurê vê malbata berfireh a mêrxas xwe ji ti karî neda paş û got, "hûn çi karî bidin pêşiya min ez ji bo pêkanînê amade me." Ew helwest û sekna wî girîng bû. Ji ber dema tu nû dikevî cihekê, pêdiviya te bi rêber û rênasan heye. Pêdiviya te bi mirovên wî cihî baş nas dikin, dizanin heye. Lewma min piştî erka wî diyar kir, ji bo têkiliya di navbera me de qut nebe, min telefon û cîhazek jî dayê û ew şand cihê lê peywir bike. Beriya biçe ji bo em deverê nas bikin, bi me re hem di warê ziman de, hem jî di naskirina deverê de bibe alîkar kesek bi navê Hecî ku pismamê wî bû da gel min. Paşê min ji hevalan re got, ji bo em bikarin vê xetê baş bigirin, divê em eniyekî din jî ya parastinê ava bikin. Armanc ji vê ew bû ku em pêşiyê li dijmin bigirin, nekarin li pişt hêza me ya li wir bizivirin. Dema me xwest em vê eniyê çêkin, hevalan sê kes anîn. Bala min kişandin van sê kesan. Navê hersiyan jî Evdulah bû. Ji wan re Evdo digotin. Li gorî hevalê Mistefa ji min re gotî, yek Evdoyê Lehênî, yek Evdoyê mala Tûjo, yek jê, Evdoyê Terzî bû. Evdoyê Tûjo ji gundê Kizelî bû û

malbata wî bi min dan naskirin. Em çûn gund, min ji her siyan re jî peywir diyar kirin. Min karê cihên çûyîn û hatinê da Evdoyê Terzî. Dê karê wî anîn û birina gelê deverê yên dihatin eniya parastinê bûya. Erka kontrolkirina noxteyên kontrolê yên di destên me de jî ji Evdoyê Tûjo re hat dayîn. Me ji Evdohê Lehênî re jî got, tê biçî li nav gundan bigerî, hêzên nû rêxistin bikî û bînî. Ji bo vê me hevalek jî da gel wî. Bêyî ti nerazîbûnan raber bikin, peywirên xwe pejirandin û dest bi kar kirin. Min ji wan re got emê eniyek din a nû çêkin. Ji bo avakirina eniya nû em çûn gundên din jî. Em çûn gundê Hewalikê û me ew jî nas kirin. Malmezinên deverê bûn. Me ji wan xwest ji ber şer û pevçûnan zarok û jinan ji gund derbixin. Ji ber fîşekên hêzên dijberî me digihiştin gundê wan. Lê helwestekî xurt raber kirin û gotin, “Em ne jin, ne zarokên xwe ji gund dernaxin. Ev der ax û cihên me ne. Heta dawiyê em amadene şer bikin, lê em derketina ji gundê xwe napejirînin. Bi rastî jî kes ji gund derneketibûn. Dema me ev helwesta gelê deverê dît, di warê erênî de bandorek pir li ser me çêkir. Me biryar da ku em wê xetê bigirin, wan jî got “em dikarin vir biparêzin. Lê divê hûn cihên din ên li derdora me biparêzin û li wan deran hêz bi cih bikin. Piştî me li hev kir û şûn de, min gazî hevalê Dilsoz kir. Hevalê Dilsoz hevalekî ciwan bû. Min jê re got “sê hevalên din jî bigire gel xwe, bi gel re amadekariyên parastina vê xetê bikin, em herdu gundan jî digirin. Amadekariyên xwe baş bikin. Ji xwe hûn dibînin gel amade ye alîkariyê bide.” Piştî amadekariyan me ew xet jî wisa girt.



Piştî em ji gel wan vegeriyan, em hatin gundê Kizelî û bûn mêvanê mala Tûjo. Em çûn mala Ehmedê Tûjo. Mamê Ehmet mirovek temen mezin bû. Birnoya xwe xistibû milê xwe, li ser banê xaniyê xwe çeper çêkiribû û di çeperê de bû. Dema em gihiştin nêzîkî malê, bi keyfxweşî ji ser ban di pêpilkan de xwe berda jêr û hat pêşiya me. Em bi germî pêşwazî kirin, hembêz kirin.Wê xwepêçana wî ya bi rext û fîşekan, cil û bergên wî, birnoya li milê wî şervanên Kurd ên kevnar anî bîra min. Leheng û xweşmêrên min di çîrokan de bihîstin ketin bîra min û coşek mezin ket dilê min. Piştî silavdayîn û

rewşa hev pirsînê em derbasî hundir bûn. Avek dan me, dema me av vexwar min jê re got:

-Mamo, ez şad dibim hûn axa xwe wisa diparêzin. Lê bila ev zarokên biçûk ji vir biçin. Tu dibînî fîşek digihêjin ber derî.

Ji dêmên Mamo diyar dibû ku gotinên min li xweşiya wî neçûn. Di esmeriya dêmên wî de çîrokên heriya Kobanê diyar dibû û bala mirov dikşande ser xwe. Piçek beşişî û bala xwe da min. Gotin bi xwînsariyek kûr û lib bi lib ji devên wî derketin.

-Na mamo, bila zarok li vir bimînin. Bila bi rastiya vê axê re mezin bibin. Bila zarokên me bizanin ev der Kurdistane û cihê şer û pevçûnên giran e. Divê zarokên me Kurda li derveyî rastiya em dijîn mezin nebin. Ma dê heta kengê bi bindestî û tirs bijîn? Bila lîstikên wan jî bibin şer. Ji ber ev rastiya vê axê ye.

Gotinên mamo her çiqasî li derûnî û ezmûna serpêhatiyên Kurdan dihatin jî diviya ji aliyê min ve bihatana îknakirin. Xwînsariya wî bala min dikişand û diviya gotinên min ji vê ezmûna kûr re çareyek bidîtana. Dem dema kurt axaftinê bû û hemû pêşketin bi hemû giraniya xwe, xwe berdabû ser mêjî û dilê me. Lê diviya herî şertên zor jî em ji rêya pê bawer dûr nexistana. Min jî bidengek nizim û hêdî bersiva mamo da.

-Raste, lê derûniya wan bandor dibe, ne başe. Yên çek dikarin rakin bila bimînin, lê zarok nebaşe li vir bimînin.

Mamo mala xwe kiribû baregeha şer û bi çanda eşîrî mal û zêçên xwe li sîngerên derdor belav kiribû  û gotin jêre peyda nedibûn. Bi rewiştek fermandarî diaxifî û di rastiya xwe bê ku em baş fam bikin dilê me jêhatî dikir. Bê ku ji ya xwe were xwarê zîq li nava çavê min temaşe kir û gotinên xwe domandin.

-Binêre keça min. Wileh ger navê min Ehmedê mala Tûjo be, ez destûr nadim yek mirov ji vî gundî derkeve. Em li vir in, çi dibe bila bibe. Çar kurên min niha li eniyên şer in. Yek jê hevalê Çiya ye. Kurê minê herî biçûk e, niha li gundê Kendalê ye. Tu van gundên derdorê hemûyan dibînî. Di her eniyek şer a di van gundan de niha kurek min dimîne. Ez jî li gundê xwe me. Min ji wan re jî got, hûn biçin, bila evder ayîdî min be.

Ji dêvla ez mamo qanih bikim, her diçû gotinên wî bi ser ên min diketin û ez neçar mam vê pêla wî ya hêrs û ji xwe bawer veguherînim amadekariyên gund.

-Mamo, tu berpirsê gundî, wê demê tu dikarî gundiyan baş bi rêve bibî.

Hinekê kenî, wekî ku bêje ‘tu mamê xwe nas nakî’ got:

- Ji xwe ez rêve dibim. Mereq neke, heta destên mamê te bikarin birnoyê bigirin, dê ti kes nekare ji derve bikeve

gund û dagir bike. Dê kes nekare nêzîkî cihên me, gund û malên me bibe.

Mamo mîna fermandarê kelehek kevnar bersiv dida û sînga mirov radikir hewa. Demarê şervantiya eşîrên kevin bi her awayî ji dêm û bedana wî dibarî. Tiştekî ez zêde jêre bêbijim nemabû ji bilî parastina zarokan. Weke şêweyê berî rabûnê min destên xwe danîn ser herdu çokên xwe û bi rûkenî min berê xwe da cihên em pêve biçin.

-Mam Ehmed, destûra te hebe em dê rabin. Me çaya te jî vexwar, sohbetek pir xweş û watedar bû ji bo me. Lê divê em biçin, karê me zehfin.

-We çaya me vexwar. Lê divê hûn qehweyekê jî vexwin. Ka em qehweya xwe jî vexwin, hûn paşê ser ser û çavên min re biçin.

Me li mala mamê Ehmed qehwe vexwar û em derketin ber derî bi hev re. Hevalê Dogan li gel min bû. Wî berê jî ew dever nas dikir. Ji mamê Ehmed pirsî û got:

-Mamê Ehmed, ev gundê Ereban ê cîranê we çawa ye ?

Mamê Ehmed berê xwe da gund, hêrsa wî xwe di çavên wî re da der. Paşê li hevalê Dogan vegeriya û got:

-Wî gundî hemûyan çek rakirine û li dijî me şer dikin. Gotibûn emê biçin gundê Kizelî, mal û cihên wan talan bikin. Lê di êrişa îro de min tenê çendek ji wan dan erdê.

Me nehêlan gavekê pêş de bên. Lê çend hevalan bişînin van gundên pêşberî me, bila ev çat eli pişt me ne zivirin. Bextê wan nîne, ji bo talanê tên. Dagirkerin, dixwazin mal û axa me ji me bigirin. Baweriyê nedin wan, ne diyare dê kengê êrişî me bikin. Ji xwe ez ji we pir aciz bûm, we çima Emîrê wan berda?

Nîqaş li ber derî germ bû vê carê. Min dît bi rastî pir aciz bûye û min got:

-Mamo, ger me ew zilam radestî wan nekiriya, dê ew bikiriyan hêcet û gel qetil bikriyan. Ji bo gelê me zirarê nebîne me berda.

Gotinên min ên dawiyê hêrsa mamo zêdetir kir. Destên xwe danî ser milên min û mîna ez baş çanda li çanda heremê ne serwerim bi şêwazê şîretan axifî.

-Wile ev rexneya min e ji we re. Fêrî bêbextiyan bûne. Ji ber bi me Kurdan nikarin. Dema di çarçoveya kemera Ereban de li van deran hatin bi cihkirin jî rejîmê li dijî me dan bikaranîn. Niha pêlîstikên hinek hêzên din in. Ji wan bawer nekin, dîrok û rastiya vê axê heye. Divê hûn vê bizanin. Divê hûn ti caran pişta xwe nedin van, bi van bawer nekin. Ev wesiyeta min e ji we re.

Mamo rast diaxifî ji bo mirovên wisa, lê diviya ev çarenûsa hanê bihatana guhertin. Serê me ji şîretên mamo tijî dibû û mîna şîretek dîrokî wê her li cem me bimayîna. Lê dîsa jî diviya me ev xefik xirakiribûna.

Xwesteka me ya dawiyê ku xwe li derdora mêjiyê me dipêça çiqasî mamo jê famdikir nizanim lê nîqaşek xweşbû.

-Mamo, xwedê temenekî dirêj û tendurist bide te. Niha destûra te hebe emê biçin. Ger derfet çêbû, em rojekê dikarin van tiştan bi dirêjî baxivin.

-Hûn ser ser û çavên min biçin. Oxira we ya xêrê be. Serkeftin be ji we re.

# DEBABE Û HESIN



Li gorî gelek gotegotan xelkê hesin dîtîne Kurd in û di gelek zimanên Ewropî û Aryenan de jî navê hesin çavkaniya xwe ji vê peyva hesin a Kurdî digire. Xelkê hesin peyda kirî niha bê hesin e û li gorî gotegotên din jî hesin ji aliyê dayikê ve hatiye lanetkirin. Tevî ku navê vî heyberî di nav pîrozên Kurdî de derbas dibe jî lanetkirina wî gelek balkêş e. Hes û heste ango hesin mîna tîpa t yê jê hatibe birîn hatiye lanetkirin. Tiştên ku mirov ji gotegotên dîrokê fêr bibin hene. Îcad û afirîneriyên mirov gelek caran dibin dijberî mirov jî. Xofa van îcadên heyî ji navên wan diyare û gelek tiştan ji mirov re dibêjin. Di gelek cihan de peyv bi hev re şer dikin. Lê mîna laneta dayikê rast derbikeve her li Kurda zîviriye û pê hatine kuştin. Lê li vê Kobaniya ku piyên min li erdê ne, gelek peyvên min dadixin kûrahiya dîrokê li derdorê min dizîvirin. Belê bi rastî jî peyv şer dikin. Gelê hesin û gêsin peyda kirî û sina wan zivîriye sîm di

wateya simya û kimyayê de li wan dibare û di nav axek bi bereket de bê axin. Amûra ji vî hesinî hatiye xemilandin di zimanê Erebî de mîna dêw derbas dibe û di gelek ayetên Qûranê de jî heye. Pênaseya debabeyê ku mîna Dâbbetu'l-arz tê bi lêvkirin hema hema li gorî navê xwe ye. Hesinê ji bo bereketê hatibû afirandin, bibû sedema kuştina afirandinên dayê û heta niha her dikuje. Ev hesinê kujer xwedî berjengek balkêşe. Serê wî wekî serê Ga, çavên wî çavên Beraz, guhên wî guhên Fîl, şaxên wî şaxên Bizinan, bejna wî bejna çûkên Hêştirme û sînga wî jî sînga Şêr e. Belê wê Daîş li heriya Kobaniyê bi vê debabeyê bigere û xofek bêhempa biafirîne. "Kuraten El Jahîmo" jî wê bibe navên topên cehenemê û mîna Kurd dibêjin toza Ereban wê pêl bi pêl ji Reqayê li ser heriya Kobaniyê bibare. Lê hêj ev toza çavan kor dike li ezmanên Kobaniyê nexuya ye û em di rojên destpêkê de ne. Hesin peydakirin, mîna hesinkarên kevin em xistibûn nav liv û tevgerek bê pênase.

* * *

Me xatirê xwe ji mam Ehmet xwest û em ji gel wî derketin. Em ji gundê Kizelî çûn gundê Cirn. Dema em ketin gund, me dît nêzî dused mêran li gund kom bûne. Hinek ji wan bi çekên xwe yên ji malê anîn hatine. Hinek jî li bendê ne ku çekan werbigirin. Ji xwe re bi dengê bilind sohbet dikirin. Ji ber qehwexaneyên li bajêr hatibûn girtin, ew der ji xwe re wekî qehwexanê bikar danîn, lê kom dibûn. Dîmenek gelekî balkêş bû. Bi rastî jî

kêliyên ku ji mirov re nabin bersiv mirov her dehfî kûrahiya dîrokê dikin. Wekî lavlavk û leflefkên ji kûrahiya erdê ji jor ve hildikşin, dîrok jî ber bi roja me ya îro ve hildikişî. Komekî mirov bi hemû şêweyê resentiya xwe li pêşberî me bûn. Her ji ber çiye ez nizanim, lê ax û mirovên vê derê mîna çavkaniya destanên Kurdî di hişê min de bi cih bibûn. Tovê yekitiya Kurd wekî li benda roj û avê be ducaniyek balkêş dixist nav hişê mirov. Destanên nîvçemayî bi dengê Baqî Xido li vê axê bilind bibûn, kon û êlên Kurda zindî dikir li pêşberî mirov. Şopên hespên Derwêş bi hemû resenstiya xwe ve xwe didan hîs kirin. Her çiqasî bi perdeyek zirav dîmenên kêliya em têde jiyan dikin serwerbin jî di rastiya xwe de hiş û hestên me ji zû ve ji aliyê zeman ve hatibûn dîl girtin. Bayek kevin dibarî ser hinav û cergên me. Ji ber rastiya Rêber Apo ya bi girêdana dîrokê ve em jî fêrî vê rastiyê bibûn. Bi rastî jî em li ser demarê dîrokek gelek kevin bi cih bibûn. Heriya Kobaniyê bi her awayî şil bû. Ji bermahiyên Xerabreşkê heta yên Telxilaf, şopên kevnar bi gir û kortalên xwe yên li ber çav mîna zincirek dîrokî li rûxarên Kobaniyê rêzkirî bûn. Dewsên me pê li hev dikirin bêyî ku hayê me ji hev hebe. Dused mêrên li pêşberî me wekî ax û avhewaya xwemalî kêlî bi kêlî kevir û şînkahiyên xwe distewînin hatibûn stewandin. Şopên tîrêjên rojê û tîna wê ji rûyên wan di barî. Xwihdan û tîna rojê li ser eniyên wan kom bibûn û bi giraniyek nazik xwe ji serî û milên wan ve berdabû jêr. Du çandên ji qalûbela ve li tenişta hev in bi hemû giraniya xwe, xwe li wan pêçabûn. Mîna zeman bûn. Kit

û kit ciwanên ku bi cil û libasên xwe ji demê para xwe girtibûn jî di nav koma heyî de bi cih bibûn. Kiras û egalên Ereban mîna şal û şapikên Kurdî bi rengê qemîsên Ereban ku koka xwe ji cilên şevê digirin bi ser bejna xwe de berdabûn. Yên wisa kêmbûn, lê têra bala min bikşînin ser xwe kiribûn. Şal û şapikên kurdî berê jî bala min dikişand û car carnan bibûn sedema pirsên min ên têgihiştinê jî. Şeb ji şevê dihat û resentiya van cilan diçû heta zerdeştê kal. Di çanda Ereban de jî li gorî şert û mercên çolê bibûn qemîs. Ji bedena hin mirovên temen mezin xwihdanek li ber çav xwe berdabû ser cilên wan û bedena wan a li ber kela tavê qemitî di xwihdanê de mabû. Ev tiştên ez dibêjim di kêliyek kin de di serê min de çûbûn û hatibin jî.  Jiyana heyî bi lez ez kişandibûm nava xwe û ez xistim nav liv û tevgerê.

Me agahî dan hevalên li bajêr, ji wan re xwarin û vexwarin anîn. Piştî herkesê xwarina xwe girt, xwe dan aliyekê û xwarina xwe xwarin. Paşê min gazî wan kir, hemû kom bûn. Min ji wan re got,

-Niha hûn hemû li vir in. Lê nabe hûn li meydana gund kom bibin û wisa rawestin. Divê em xwe rêxistin bikin. Her yek ji me dikare karekê bike. Me eniyekî nû ya şer vekir. Yên dikarin biçin şer û çekên wan heyîn bila xwe bidin aliyekê. Yên nikarin biçin şer, dikarin çeperan bikolin, dikarin xwarin û vexwarinê û cepxanê bibin ji hevalên li eniyan de şer dikin re. Yên dimînin bila li derdora gund noxteyên kontrolan ava bikin, çûyîn û

hatinan bişopînin. Bi vî rengî nabe. Niha yên dikarin biçin şer bila xwe bidin aliyekê.

Piştî van gotinên min nêzî bist kesên xwedî çek xwe dan aliyekê. Lê çekên piraniya wan çifte bûn. Jixwe hemû mirovên temenê wan mezin bûn, di nav wan de ciwan kêm bûn. Hinek gelek kalbûn, lê çifteyên xwe girtibûn û hatibûn wê derê. Hêj ez daxivîm dengê hinekan bilind bû û gotin, "heval, çek û fîşekan bidin me. Çekên me nînin, ma em dikarin bi çi şer bikin?" Ji xwe li bajêr ji bi dehan kes dihatin çek û fîşek ji me dixwestin. Lê di warê çekan de hinekê tengaviyên me hebûn. Têra herkesî nedikir çekên di destên me de. Lewma me biryar da yên çekên wan heyîn bila bînin û em fîşekan bidin. Me bangî gel kir, pir kesan çekên xwe anîn. Min heman tişt ji bo wan jî got. Min ji wan jî xwest biçin bajêr, hevalan bibînin û ji bo xwe parastinê fîşek, ger hebin jî çekan bigirin. Yên çekên wan neyîn jî bila biçin navendên me navên xwe binivisîn.

Di ber vê axaftina min re pîremêrekê dengê xwe bilind kir û got;

-Ev du roje em li vê derê ne. Ez tiştekê ji we fêm nakim. Hûn ne dewletin. Çekên we nînin, tiştekî we nîne. Hûn dibêjin xwe biparêzin, ma emê xwe bi çi biparêzin?"

Min pirsa wî kir, gotin kesekî ticar e. Hewl dide di nava gel de dudilî û tirsê belav bike. Li gorî agahiyên min

girtîn berê jî bi hinek nêzîkatiyên xwe xwestibû di nava gel de sarbûnê çêke. Min jê pirsî û got:

-Tu bi dilê xwe hatî, an hinekan gazî te kiriye?” Bi rûyekî tirş berê xwe da min û got:

-Ez bi dilê xwe hatime.”

Min li ser gotina wî axaftinek kir û got:

-Ev rastiyeke, em di warê peydakirina gelek tiştan de zehmetiyê dijîn. Em hêzekî gel Em ne dewletin her çek di destên me de hebin. Lê em gelek berxwedanvan, xwedî dîrokek tijî lehengî û têkoşîn in. Ji hûr heta giran, ev civak neçarî xwe parastinê ye. Ma kes ji me bi zorê hatiye vê derê? Nexêr. Tu bi xwe jî dizanî ev neçariyeke. Lê tu bawer dikî ji ber kêmbûna derfetan em Kurd wê winda bikin? Me li parçeyên din ên Kurdistanê bi çekekê dest bi têkoşînê kir, îro em bûne artêşek mezin. Em gihiştine derfet û destkeftên mezin. Divê ev rastiya xweragirî û berxwedana gelê me neyê ji bîrkirin. Em bi van bêderfetiyan winda nakin. Li gorî min agahî girtine telefona te di berîka te de ye. Rojane çi diqewime, çend heval şehîd û birîndar dibin tu agahî digirî û belav dikî. Tu propagandaya dijmin li nav gel dikî. Dibêjî ji aliyê Reqa, Silûkê hêz hatiye, wê dijmin êriş bike û tirsê dixî nava gel. Mafê te yê kirina van tiştan nîne. Mirovên wisa bi salanbû nûkerî û cehşitiya dijmin dikirin. Lê vîna gelê me heye. Em bi van tiştan bandor nabin. Kurd dixwazin êdî leşkeriya xwe bikin, rûmet û şerefa xwe biparêzin.

Civaka şer bike wê bibe xwedî çek, xwedî ezmûn, xwedî derfet û her tiştî bi dest bixe. Lê ev tişta hûn dikin xizmeta vê nake. Ev tevlîhevî ye hûn dikin. Ev civak, ev gel ji we re êdî napejirîne van tiştan. Îro bi hezaran keçên me di çeperan de şer dikin. Ev şerê namûs û şerefê ye, şerê parastina xak û welat e. Şerê azadiyê ye.

-Bi qasî saetekê ez axivîm. Gotinên min zêde fêm nekiribûn. Ji ber devoka min hinekê li gorî ya wan cuda bû. Lê gotina şeref û namûsê ya di nav axaftinên min de derbas bûyî fêm kiribûn. Lewma ji nav komê çend kes axivîn, helwesta xwe û biryardariya xwe ya berxwedanê danîn holê. Piştî nîqaş û axaftinan, bi awayekî lez me ew rêxistin kirin. Hevalê Dogan ên ku ji bo eniya şer xwe dayîn aliyekê birin li eniya şer, aliyê gundê Salincê cih kirin. Yên mayîn jî li gorî kar û peywirên pêwîst hatin rêxistinkirin. Ji xwe me dixwest em wê şevê li gundekê bixin. Ew gund ji bo me girîng bû. Diviya em parastina xeta me çêkirî ava bikin.

Me li gundên wê deverê jî pergala xwe saz kir, tedbîrên pêwîst girtin. Lê di navbera hêzên me de valatî hebû di hinek cihan de. Gundên me negirtîn hebûn. Ji bo em hemû xeta xwe bikin yek, hêzên xwe bigihînin hev, diviya em hinek cihên nû bigirin. Lewma me biryara çalakiyên nû girt. Gundê me wê li ser çalakî bikiriya, gundekî girîng bû. Berê me heval şandibûn gund, xelkê gund gotibûn kes di gundê me de nîne. Lê paşê derket holê ku ne wisa ye, çete di gund de bûn, xelkê gund ew

veşartibûn. Wan jî dengê xwe dernexistibûn ku bikarin di wir re carê êrişî cihên me bikin. Ji bo çalakiyê min gazî hevalê Cûdî kir. Hevalê Cûdî ji eniya aliyê Ebû Sirê hat. Min ji hevalê Cûdî re gotibû, "divê tu di nava saetekê de xwe bigihîni gel min. Dawet heye, dereng nemîne." Lê hevalê Cûdî li gel komekî heval, di bîst deqîqeyan de xwe gihandin gel me. Me biryar da em êrişî gundê Birkêtikê bikin. Diviya em wî gundî bigirin ku parastina eniya nû ya me çêkirî baş bibe.

Me bi lez û bez plana çalakiyê çêkir. Me biryar girt em ji du milan ve êrişî gund bikin. Yek ji aliyê gundê Kupirlik, yek ji aliyê gundê Kizelî ve. Me ber bi êvarê di çarçoveya plana hatî çêkirin de vesaziyên hevalan çêkir û êrişî gund kir. Gund ne tenê di aliyê cihê xwe de stratejîk bû. Di gund de birkên avê hebûn. Ev jî xalek girîng bû ji bo wê eniyê. Dema me êriş kir, hevalek me li wir şehîd bû, hevalek jî birîndar bû. Lê me gundê Bîrketkê girt. Jimarek cidî kuştiyên wan çêbûn, hejmarek çekên biçûk û mezin ketin destên me. Dema me ev gund girt, dîtin ku em di mijara girtina wê xetê de cidî ne. Lewma piştî çar rojan wan jî êrişî gundê Kendalê kirin. Piştî êrişî gundê Kendalê kirin, li wir şerekî dijwar rû da. Hevala Vîyan û hevalê Rostem di êrişa li ser gundê Kendalê de, di tîma êrişê de şehîd bûn. Ji ber piştî êrişê demekê ketin nav gund. Me di wir de êriş kir, heval li wir şehîd bûn. Lê me gund girt, jimarek pir zêde kuştî û birîndarên dijmin çêbûn. Cara yekê di vî gundî de me ji ser hêzên dijmin tankek desteserkir. Wan digot emê biçin Kobanî talan

bikin, lê dikirin ne dikirin nedikarîn xeta me bişkînin. Her cara êriş dikirin, sed kes bihatiyan deh vedigeriyan û deh bihatiyan yek vedigeriya. Ji xwe piştî me tank jî bidest xist, vê carê tirs û xofa hêzên me ya li ser dijmin tam serwer bû. Bi şehîdbûna hevala Vîyan û hevalê Rostem re li ser gel bandorek cidî çêbû û beşdarbûn û xwedîderketin zêdetir bû. Me wisa karî em wê xetê saxlem bikin. Hevalê Dogan berpirsê wê eniya di navbera gundê Bîrkêtê û Kizelî de bû. Me hevalê Baz û hevalê Xemgîn jî li wê eniyê bi cih kirin. Hêza me ya din hemû ji gel bûn û xelkê deverê bi xwe bûn. Paşê me ji bajêr hêz xwest. Ji ber pirsgirêka me ya çekan hebû. Ji ber şer û pevçûn zêdebûn, çekên me radikirin û cepxaneya me desteser jî dikir têra me nedikir. Hevalan piştî wê ji me re hêz şandin. Di eniya me ya şer de ciwanek hat ku biçe şer. Birnoyek di destan de bû. Ji ber çek nebûn, hevalan birno dabûyê. Lê nedizanî bikar bîne. Hat pêşberî min û got;

- Heval, ez dixwazim biçim şer. Lê ez vê çekê nizanim, min leşkerî nekiriye. Ez nizanim ev çek çawa tê bikaranîn. Niha ezê bi çekekî jê fêm nakim çawa şer bikim?

Dema wisa got, min ferq kir ku di warê perwerdeya serweriya li ser çekan de pirsgirêkên me yên cidî hene. Divê em zêdetir giraniyê bidin perwerdeya leşkerî û perwerdeya fêrbûna bikaranîna çekan. Ji ber diviya hêza me li ser hemû çekan serwer bibe. Nexwe dê ev gel xwe

çawa biparêze, dê çawa şer bike? Paşê min ji hevalê Azad û hevala Peyman re xeber şand, min ji wan xwest ku kesên dişînin berî wê divê çend rojan bên perwerdekirin. Ew helwesta wî ciwanî bû dersek baş ji bo me. Lewma me biryar girt ku li her cihî li gorî derfetan di serî de ciwan bên perwerdekirin. Herî kêm li ser çekan serwer bibin. Ev pirsgirêk a ciwanan bû. Ji ber ên temenmezin di mijara bikaranîna çekan de pirsgirêk jiyan nedikirin.



Di şer de tişta herî zêde bandorê çê dike ji ser dijmin rakirina çekan e. Piştî me di şerê li ser gundê Kendalê de tank ji dijmin girt, vê hêzek mezin da gel. Di aliyê din de tevî dijmin dizanî ti çekêm me yên giran nînin jî ew şerkeriya ciwanên Kurd, xelkê deverê, wî ruhê êrişkirin

û berxwedanê tirsek ava kir li ser dijmin. Di hêzên me yên li wê eniyê de jî bi xwe bawerkirin û moralek mezin çêbû. Derûniya 'em dikarin bi derfetên kêm jî serkeftinên mezin bi dest bixin' li ser hêza me û gelê me yê li wir serwer bû. Ji xwe di rastiyê de jî wisa bû. Her wiha piştî serkeftinên me yên li gundê Kendalê û deverê gel wekî pêlan herikî nav kar û xebatan. Tevlîbûnekî xurt a ciwanan çêbû. Di vê bawerî û seknê de, di avabûna vî ruhî de bandora şerkirin û awayê êrişê ya hevalê Rostem hebû û fedayîtiya hevala Viyan hebû. Bi giştî di vê eniya me de jiyan hinekê hat guhertin. Me pergala xwe saz kir, lê li gel wê asta şer jî bilind bû. Êdî roja bê şer û pevçûn nebû. Roja zarok û gelê deverê dengê fîşek û teqînan nebihîstiya nebû. Wekî hewarê herkes di aliyê xwe de dixebitî. Li gorî hêza xwe her kesî karek dikir. Ji bo em jî bikarin baştir parastina cih û deverên xwe bikin, me hêzekî kolandina çeperan jî ava kir. Ji ber ew alî hemû deşt bû. Bi germbûn û pêşketina şer û pevçûnan re, ezmûn û danehevên hêzên me yên şer jî çêdibûn. Lê li hemberî hêzekî pispor a şer, rêxistin û xwe amadekirinekî zêdetir dihat xwestin. Lewma ji bo pêkanîna vê yekê, me ji Efrînê alîkarî xwest. Ji ber hevalên me yên rêveberiyê kêm bûn. Piştî wê hinek heval hatin şandin û gihiştin gel me. Lê her ku çû di vê eniya me de şer geş û gur bû. Li vê eniya şer bi sedan keç û xurt tevlî bûn. Pir heval hebûn berpirsê yekînê bûn, lê me xistin berpirsên gundekê. Jimarek zêde tevlîbûn çêbû, Rostem û Viyanên deverê pir bûn.

Di kêliyên wisa de herî zêde ez ji coş, bawerî û vîna gel bandor dibûm. Lê di rastiyê de dema mirov di şer de berpirsyar be û devera diçiyê baş nas neke hinek zehmetiyan dijî. Wisa lê tê ku tu nikarî xew bikî, nikarî bêhna xwe vekî. Kêliyên wisa her çiqasî di kêliya xwe de mirov tengav û ji hal bixin jî tevn û honana serpêhatiyên mirov ên herî baş in. Xew mîna risasa helandî diherike ser pêluyên çav û mirov ji hal dixe.  Ji ber berpirsyartiya ewqas mirov, mirovên ku di rastiyê de neçarî şer hatine hiştin, ne şervan, ne leşker in giran bû. Lê lehengiya min li wê derê dît, baweriya min a serkeftinê ji her demê zêdetir xurt kir. Min bawer kir ku ger tu rast temaşeyî gel bikî, rastiya wî gelî bizanî, tu dikarî bi rê ve bibî. Ji xwe berê digotin Kobanî cihê mêran e. Jinan napejirînin. Lê min di rastiya gelê Kobaniyê de ev dît. Rêzdariya li hember jinan û baweriya bi jinan min dît. Min serbilindahiya gelê Kobaniyê ya bi jinan dît. Dema didîtin em hevalên jin diçin, zêdetir rêz raber dikirin û gotinên me guhdar dikirin. Fermanên jinan didan jî dihatin guhdarkirin. Vê coş û hêzek mezin di me de ava dikir. Bi qasî serbilindiya wî gelî ya bi me, em jî bi gelê xwe keyfxweş û serbilind dibûn. Tevî bêderfetiyan û germa havînê jî kelecana li eniyên şer dihat jiyîn, coş û herîkîna gel a ji bo kar û xebatan vîn û baweriya me şervanan xurtir dikir. Hêza jina Kurd rengê xwe di şer de jî diyar kiribû. Jin di her qadên jiyanê de bi rola pêşengiyê rabibû. Ev şanaziyek mezin bû ji bo gelê Kurd.

Di wê demê de hevala Sozdar û hevala Nûcan hatin û gotin em dixwazin çeperên me yên şer li pêşiya yên hevalên xort bin. Min li wan nêrî û ez hizirîm. Min berê hevala Nûcan nas dikir. Em di şerê li Serêkaniyê de bi hev re bûn. Baweriya min pê dihat. Lê roja tevlîbûna hevala Sozdar û hevala Roza hat bîra min. Di beşdarbûna xwe de jî bi kelecan bûn. Bîr û bawerî di herikî ji çavên wan. Wekî mirovên di şer de demdirêj mayîn, di ezmûnên şer de gihiştîn, ji xwe bawer û kêrhatî diyar bûn. Xwedî înîsyatîf bûn. Cihên xwe bi xwe diyar dikirin, dihatin pêşniyar dikirin. Baweriya wan bi wan hebû, dikarin di çeperên pêş de şer bikin. Min jî ew bawerî dida wan. Lewma min ev daxwaza wan pejirand. Ji ber bi rastî rik û daxwazek mezin, vînek şer a xurt di wan de hebû. Yek jî wekî ceribandinekê me xwest em gavekê bavêjin. Me li gundê kêleka cihê em lê diman de çeperên hevalên jin cuda kirin. Wê rojê hinek pîremêr hatin serdana me. Gotin, “keça min, ma we çima hiştiye ev keçik çeperên xwe cuda bikin, biçin pêş?” Babê hevala Sozdar jî hatibû. Wî bersiva zilamê pîr da û got; “baweriya min bi keça min heye ku ji deh xortan zêdetir şer bike. Min ew dît ka çawa şer dike. Ger keça min wisa be, niha yên hinekê bi ezmûn çawa şer dikin tu bi xwe bihizire. Serkeftina vê şoreşê di vîna jinan de ye. Qet nebe te ji hevalekî zilam re bigotiya. Ma ya tu jê dipirsî jî bi xwe ne jine xwedê jê razî?” Kalê ku ev pirsî wekî li ber xwe ketibe bêdeng bû û berê xwe cardin da çeperên hevalê jin. Ez jî di ber xwe de kenîm û min jî temaşeyî cihê çeperan kir li gel wan. Hevalan çeperên xwe

girtibûn. Moral û coşa wan zêde bû. Her wiha gundê hevala Roza jî li pêşberî wir bû. Ew hêz û baweriya min di wan de dît, coşa xwe di çavên wan de dida der, ez serfiraz dikirim. Ji ber êdî bi xwe bawer bûn. Pêdivî bi ti bersivên din nebû ez bidim. Ji xwe bersiva herî rast jinên Kurd di çeperan de, di eniyên şer de didan. Piştî me çeper cuda kirin bi rojekê şûn de li wê derê şer çêbû, pevçûn derket. Wekî van hevalan bi dehan heval hebûn dixwestin xwe di şer de pêş bixin. Hevalên wekî Sozdar, Roza, Peyman, Zelal, Viyan, Gulistan û ciwanên mîna Sadiq û çiya hebûn. Dixwestin di vî şerî de bibin fermandarên xurt, pêşengiya şer bikin.

Piştî pevçûna li wir bi rojekê şûn de, min dît hevalek tê û dest û lingê xwe girê daye. Doşkaya xwe anî li ser girekî gundê Kopirlik danî. Min navê wî pirsî, paşê min ferq kir ku hevalê Baz e. Min got, “Hevalê Baz ev tu yî? Min tu nas nekirî destpêkê. Tu birîndar bûyî, tu li vir çi dikî? Tu çûyî doktor an ne?” Rengê wî zer bibû, rengê wî hatibû guhertin. Li min vegeriya û got; “Erê hevala Meryem, ez im. Doktor hat li vir tedawiya birînên min kir. Ez naçim doktor, ma ez çawa doşkaya xwe bihêlim û biçim? Yê baş dizane vê doçkayê bikar bîne û li ser serwer ez im. Birînên min sivik in, ma ne şerme ez ji bo van birînên sivik biçim doktor?” Tevî hemû israrên min jî min nekarî ez wî bişînim doktor.

Di aliyê din de hêza li hemberî me biryar dabû ku nehêlin em di wê eniyê de pêş ve biçin. Bi hemû hêza

xwe êriş dikirin û di êrişên xwe de bi biryarbûn. Her roj li cihekê bi gotina Alah û Ekber û anîna tekbîrê êriş dikirin. Lê her cara dihatin jî li rastî ruhê berxwedanê yê şervanên Kurd dihatin, jimerek cidî kuştiyên wan çêdibûn û neçar diman paş ve vegerin. Paşê ferq kirin ku em bi êrişên wisa naşikên. Ji ber em her roja diçe bihêztir dibin. Me jî baş dizanî, li hember her gava me, dijmin jî dê bixwaze gav bavêje, bi taktîkên nû êriş bike. Me hewl dida em li gorî wê tedbîr bigirin. Ji xwe li eniya Rojhilat şer qet nesekinî. Şer her hebû, pevçûn dewam bûn. Êdî hem li bajêr, hem jî li gund û deverên derdora Kobaniyê, rojane bi sedan mirov dihatin û navên xwe dinivîsin li navendên me. Bandora çalakiyên me yên li eniya Rojhilat, bi taybet çalakiya Kendalê yên erênî dewam dikir. Em ne ew hêza hefteya destpêkê li wir bi cih bibûn. Me erdnîgarî, gelê deverê, cihên ku dijmin lê xurt nas dikir êdî. Gelê deverê bi hemû hêza xwe ve beşdarî têkoşînê bibû, li gel me bû. Me xwe li wir rêxistin kiribû, pergala xwe ya parastinê xurt kiribû. Di vê pêvajoyê de carna destgirtî, carna xwişk û bira, bab û keç, dayîk û kur bi hev re dihatin dixwstin tevlî bibin. Seferberiya parastinê hebû û gelê biryara tekoşînê dabû di asta herî jor de beşdarî vê pêvajoyê dibû. Dema me xetên xwe yên parastinê xurt kirin, me biryar da em xebatên civakî jî bimeşînin. Di nava gel de civîn, perwerde, li ser pergala em dixwazin nîqaş divê bên kirin. Ji ber eşkere  bû ku Kobanî dibû qadekî şer a demdirêj. Lewma li hemû cihan xebatên xurt ji bo şer hatin kirin. Ji xwe asayîş hêdî hêdî pêş diket, sazî

dezgehên me hewl didan xwe xurt bikin. Di herêma Kobaniyê de hinek jinan xwe rêxistin kirin ku ji bo hêzên di şer de amadekariyên xwarin û vexwarinan bikin. Ji ber her jina di Kobaniyê de an keç, an kur, an hevjîn, an bab, an bira, xwişk, xizm û nasek wê di eniya şer de bû. Her koma xebatê ya hebû, rojane tekmîlên xwe didan, rewş çiye rêveberî agahdar dikirin.

Kobanî ne Kobaniya berê bû. Lîstikên zarokên li Kobaniyê hatibûn guhertin. Di kolanan de zarokan lîstikên şer dilîstin, ji bo hinek nebin çete di lîstikan de şer çêdibûn. Yên bab, bira, xwişk an jî kesek din ji malbatê di nav hêzên YPG û YPJ de qebûl nedikirin di lîstikan de rola çeta bilîzin û li ser vê xir û cir derdiketin. Ji ber her zarokî/ê şev bi guhdarkirina serpêhatî û lehengiya şervanên ku nas dikir derbas dikir. Rojeva malbatan şer û pevçûn, lehengî û berxwedana şervanên Kobaniyê bûn. Lewma her zarokek Kobaniyê, di lîstika xwe de dixwest bibe yek ji wan lehengan. Bi darikên di destê xwe de, bi keviran êrişî ser cihên koma zarokan a wekî çete rol dilîst dikirin û dirûşm davêtin. Kurê hevalê Sadiq jî yek ji van zarokan bû ku babê wî di lehengiya xwe de nav û deng bû li Kobanî. Her şev guhdarî çîrok û serpêhatiya şervaniya babê xwe dikir û wisa dinivist. Di lîstikan de jî nedixwest bibe çete û her tim di koma şervanên Kurd de rol digirt û dilîst. Wekî mezinan, rojeva zarokan jî bibû şer û şervaniya şervanên Kobaniyê. Hinekan xwe wekî asayîs didan nîşan, li ser kolanan xalên kontrolê çêdikirin. Hinekan xwe dikirin

fermandar, bi kevir û alavên di destên xwe de ferman didan şervanên xwe û ew dişandin ser çeperên çeteyan. Hinekan jî navê bab, bira, xwişk û xizmên xwe, an jî şervanên li herêmê pir behsa şervanî û lehengiya wan dihat kirin li xwe dikirin û wisa gazî hev dikirin. Tişta herî balkêş û hem mirov pê xemgîn dibû, hem jî pê şa dibû alavên pêlîstokê yên di destên zarokan de bûn. Hinekan dar wekî çek dixistin destê xwe, kevir wekî narincokan dixistin dest xwe, hinekan jî ji qutîk û dewlikan alavên wekî dûrbîn, cîhazên bêtêl çêkiribûn. Li her kolanê çeperên zarokan çêkirîn hebûn. Bi rêzekeviran cihên lîstokên xwe diyar dikirin, çeperên xwe çê dikirin. Hinekan jî ji bo saxlemkirina çeperên xwe bi destên xwe ax ji derdor kişandibûn û li derdora wan keviran reşandibûn. Nifşekî bi şer mezin dibû, ji nêzîk ve şer didît û şahidiya şerên dijwar dikir hebû. Di her derbasbûna me ya di kolanan re em ji aliyê wan ve bi dirûşman dihatin pêşwazî kirin, dihatin pêşiya me û digotin dema em mezin bibin, em jî dê bibin şervanên YPG û YPJ. Şerê Rojavayê Kurdistanê rastiyek raxist pêş çavan. Zilm her çiqas di asta herî jor de bê kirin, zordestî zêde bibe jî zilm û zor her tim nagihêje armaca xwe ya sereke, an ku tirsandin, radestgirtin û tepisandina vîn û baweriya mirovan. Zilm û zorî encamên wên berevajî jî hene. Mirovên li dijî zordestî û zilmê bi hêrs, evîndarên azadiyê, mirovên ji bo azadiyê li hember her awayê zilmê heta dawiyê li ber xwe didin, dibin xwedî vîn û baweriyên mezin jî di afirîne. Gel û zarokên Kobaniyê,

civaka Kurd ev wekî pir caran ispat kiriye, di van şeran de jî ev rastî radixist pêş çavên her kesî.

Ez bawerim ji bo mirovên şervan beriya her tiştî bawerî pêwîst e. Çeka herî bihêz a şervanekê baweriye di delîveyên teng de. Baweriya xurt di mirovan de wêrektî û vinê ava dike. Dema zanebûna têkoşîna tu didî di te de xurt be, te pê bawer kiribe, tu dikarî ji bo wê her tiştî bikî. Di hinek kêliyan de tişta herî zêde mirov lê digere ew bawerî û zanabûna têkoşînê ye.

Di Kobaniyê de li aliyê eniya Rojhilat şer qet ne rawestiya. Şer û pevçûn dijwar bûn. Di wê eniyê de şehîd û birîndarên me jî çêdibûn. Carna hêza me têrê nedikir em bi her tiştî re bigihêjin û pêdiviya me bi hêza nû dihat dîtin. Kesên deverê baş nas dikin, dikarin riyên veşartî bikar bînin, xwedî bawerî û wêrek ji me re pêwîst bûn. Ji ber şer ne karê herkesî/ê ye. Şer xwedî sehme, di şer de mirin heye, birîndarî û dîlketina dest heye. Rojekê dema me bihîst hevalên birîndar li gundekê mane, min ji yekê re got çend kesan ji gund bigire, biçin hevalên şehîd û birîndar ji wî gundî bînin. Lê gotin em nizanin ew cih li kû ye. Tirs û dudilî hebû di wan de. Ji ber min baş dizanîn ku xelkên wir in, wan gundan hemûyan baş nas dikin. Dema min ev bersiv bihîst ez hêrs bûm û min got;

- Hûn çawa nizanin, hûn xelkê vê derê ne? Bi lez xwe amade bikin, biçin wan hevalên şehîd û birîndar binin.

Dema min hinekê dengê xwe bilind kir, min dît kesek di maşînekî spî de ye û hat li pêşiya min sekinî. Got;

- Heval, ez bawerim pêwîstiya we bi tiştekê heye. Hûn çi peywirê bidin pêşiya min ez amade me. Ez vê deverê hemûyê pir baş nas dikim.

Hatina wî ji bo min hestek cuda bû. Wekî rizgarvanekê bi hewara me hatibû. Min navê wî pirsî, navê wî Birahîm bû. Pismamê xwe yê bi navê Êriş jî anibû. Her du jî ji gundê Lêhînê bûn. Ji min navnîşana ku dê biçinê xwest, min navê gund û cihê biçinê ji wan re got. Xwest bi maşîna xwe biçe û ket rê û çû. Dema wî ew helwest raber kir, min ji xwe re got, tevî her tiştî mirovên di kêliyên teng de dibin fedayî hene. Ev civak deyndarê mirovên wisa leheng e. Ger ne ji heyîna mirovên wisa bûya, ne civaka me bûya, niha ev ax deh caran hatibû dagirkirin. Ji ber şerê dihat meşandin, şerekî dijwar û bê sînor bû. Hêzên dijber bi hêrs û kînek mezin êrişî gel û axa me dikirin. Lê di saya mirovên di ferqa vê têkoşînê de, mirovên baweriya wan bi mafdariya têkoşîna azadiya gelê wan dihatin di her mercî de xwe dikirin mertal û nedihêlan dijmin bigihêjin armancên xwe.

Piştî ji gel me çû, panzde deqîqan şûn de, min dît hevalên birîndar li maşînê kiriye û anî. Wê jîrî û jêhatina wî, wêrektiya wî ez pir şad kirim. Coş û kelecanekî mezin çêbû bi hatina wî. Piştî hevalên birîndar anîn û danîn cihê pêwîst hat gel min. Min dilxweşiya xwe ji ber tiştên kirî got, ew sekna wî pîroz kir. Paşê ji min peywir xwest

û go; “Ez her tim amade me. Hûn çi peywirê bidim pêşiya min, min bişînin çi karî ez ê bikim.” Me hevalê Birahîm erkdar kir ku di pêvajoya şer de biçe eniyên şer, hevalên şehîd û birîndar dibe bigire û bîne. Min rewşa wî ya çekan pirsî, lê tiştek nexwest. Çek û rextê wî amade bû, xwe tam li gorî şer amade kiribû. Di wê pêvajoyê de hevalê Birahîm wekî rênas û rêberekê di navbera her du eniyên me yên şer, eniya Rojhilat û Ebû Sirê de kar kir, çend caran çû hevalên birîndar anîn. Hevalek li kû giran birîndar bibûya ew diçû û tanî. Her carê dihat tekmîla xwe dida. Maşîna wî wekî ambulansekê rol list. Xwe ji ti karî neda paş, bi giyanekî fedayî tevlî kar bû.

Di eniya Ebû Sirê de me xwest em çend cihên girîng bigirin. Gundê Tiya, Ermîş û Riya Ermîş. Riya di navbera Heleb û Cizîrê de bû. Hevalê Cûdî li ser vê eniyê disekinî. Hevalên me yên xebatên civakî dikirin hebûn. Me ji hevalê Xebat yê di wê xetê de kar dikir re got, “dive hûn ji bo wê xetê gel rêxistin bikin, hêz peyda bikin. Ji ber divê gel bi xwe parastina xwe bike.” Hevalên di xebatên civakî de li wir xelkê pêncî gundan kom kiribûn. Agahî dan me ku em biçin ji wan re civînê çêkin. Dema ez ji bo çêkirina civînê çûm, ez hizirîm. Dê gel çawa moral bigire ku bikare bajarê xwe, gundên xwe biparêze. Ji xwe di tevahiya bajêr de du tabûrên me yên pispor hebûn. Divê em vî gelî hemû wekî hêzekî leşkerî rêxistin bikin, perwerde bikin. Nexwe bi yek du tabûran ev kar naçe serî. Dema ez çûm pêşiya gel, min cavên xwe lê gerand, nêzî çarsed kesî amade bûn. Ji xwe li meydana cihê

civînê konekî mezin vedabûn. Ez gihiştim bin kon, me dest bi civînê kir. Ez bi çek û rext çûbûm. Di destpêkê de min hinekê axivî, paşê me xwest em destpêkê nirxandinên gel guhdar bikin, pirsên wan bigirin. Hemûyan pirsên di derbarê rewşa şer de kirin. Hemûyan fikarên xwe yên di derbarê nebûna çek û cepxanê de anîn ziman. Gotin, "Ev dijminekî har e. Çekên me kêmin, çekên me yên giran nînin. Dijminê li hemberî me bi çekên giran êriş dike, li hemerî vê dê çi bê kirin" û hwd gelek pirs hatin divê derbarê de.

Min di axaftina xwe de giranî da vegotina pêvajoya destpêkirina şoreşê û qonaxên piştî wê me jiyan kirîn. Me çawa dest pê kir, şerê Serêkaniyê çawa hat kirin, me çawa çekên ku niha em bikar tînin li ser dijmin rakirine, em niha di qonaxekî çawa re derbas dibin, şer û berxwedana şervanên me ya di çeperên şer de xwe dispêre çi, çima tevî hemû êrişan jî bi me nikarin? bi dirêjî behs kir. Paşê bi giştî rewşa siyasî, leşkerî û civakî çiye, bi taybet di warê erdnîgariya xwe de Kobaniyê xwedî girîngiyekî çawan e? lê hat zêdekirin. Min xwest ez wê giyana berxwedanvan a gelê herêmê bînim bîra wan. Piştî min behsa van hemûyan kir, min cardin xwest ew baxivin. Di destpêkê de yekî got: "Hesinên me nînin, an ku çek. Emê çawa şer bikin?" Di herêmê de hinek kesên di bin bandore partiya demokrata Kurdistanê de hebûn, bi sorkirina ji derve dixwestin bêbaweriyê belav bikin. Ji ber ji wan re hatibû gotin ku nerazîbûn nîşan bikin, bêjin 'çekên we yên giran nînin, ma hûnê çawa

parastina me bikin. Evqas gel heye, dijmin dijwar êriş dike. Bihêlin bila artêşa azad were û vir bigire. Jixwe li hemberî rejîmê şer dike.   Van kesan jî ev nêrîn di nav gel de wisa belav dikirin. Piştî wî yekî din rabû. cilekî spî û dirêj li ber bû, egalek dabû serê xwe. Piyên xwe bi ser hev re avêtibû, ji xwe razî diyar bû. Got:

-Ez dixwazim ji te pirsekê bikim. Hûnê çawa parastina evqas gund bikin? Leşkerê we çiqas e, çiqas çekên we hene? Divê hûn bihêlin bila artêşa azad bên. Ew artêşekî rêk û pêk in.

Yekî din jî got;

-Hûn pir ji xwe bawerin. Lê ev têrê nake. Hûn çima bi Artêşa Azad re nabin yek û li dijî dijmin şer nakin?

Gotinên wan ez pir hêrs kirim. Lê min xwest ez li pêşiya hêrsa xwe bibim asteng û nîşanî wan nedim. Ji ber min armanca van gotinan dizanî, lewma min nexwst ez bikevim xefka van gotinan. Min bi dengekî aram û ji xwe bawer got:

-Ev der ax û welatê me ye. Em gelê bi hezarsalane li ser vê axê dijîn, ji derveyî vir cihek me yê din nîne. Erka parastina vê axê, erka namûs û şerefê ye. Hûn wekî girgire û mezinên malbatên van pêncî gundan beşdarî vê civînê bûne. Biryardarî û sekna we, dê çarenûsa vê derê bandor bike. Hûn divê vê baş bizanin ku kes ji derve nayê me naparêze. Me ji bo parastin û bergiriya li vê

xakê, li gel pêşiya ti hêzê negirtiye. Lê em destûr nadin ti hêz ji derveyî vîn û daxwaza gelê me li vir bixwazin hinek lîstikan bikin. Artêşa Azad ne hêzekî wekî navê xwe ye. Me bi hev re li dijî rejîma Baas şer kir, rejîm ji van cihan derxist. Lê piştî derxistina rejîmê wan xwest dagirkerî û mêtîngeriyê, zilm û zorê li ser gelê me bikin. Êrişî cih û navendên me kirin. Hûn şahidên vê rastiyê ne. Hêzekî hebûna vî gelî, vîn û rastiya vî gelî neke, tu çawa dikarî pêre tev bigerî, an jî li gel kar bikî? Em ne muhtacê ti hêzekî ji derve ne. Em gekekî berxwedanvanin. Ew hêza me heye em bikarin axa xwe, gund û bajarên xwe biparêzin. Tenê divê mirov neyê lîstikên neyarên xwe, ji şerê wan ê derûnî bador nebe. Raste çekên me yên giran nînin. Lê bi sedan keç û xortên vî gelî yên ku bi vîn û baweriya xwe li hember her cure çekên giran li ber xwe didin, nahêlin dijmin van axan dagir bikin hene.

Di demên wisa de aqilê mirov cuda dixebite. Ber bi dawiya civînê tiştek ket hişê min. Min ji gel re got;

-Ez dixwazim ji we re tiştek din jî bêjim. Hûn dizanin me karxaneyekî ya fîşekan çêkiriye. Lê divê ev agahî veşartî bimîne, neçe derve. Ji ber em naxwazin dijmin bi vê bihese û bizane karxaneya me ya çekan heye. Her wiha em li ser zirxekê dixebin ku fîşek lê neçin. Me biryar daye em fîşekan bidin her kesê ku çeka wan heyî. Hûn xelkê Kobaniyê ne. Ma mala ku çek tê de neyî heye? Her mal xwedî yek an du çekan e. Hûn werin, çekên xwe bînin em fîşekan bidin. Yên çekên wan heyîn bila bên

fîşekan bigirin, yên çekên wan neyîn jî bila navê xwe li gel hevalan binivîsin ku em çekan bidin wan. Lê ez dîsa bêjim, divê ev agahiya karxaneya çekan belav nebe. Hûn di mijara çekên giran de jî xeman nexwin. Em hêzekî xurt û şerker in. Dê di nava çend rojan de çekên me yên giran jî çêbin. Emê çekên giran ji ser dijmin rakin. Em bi her awayî xwedî hêz û şiyana parastina vî gelî, vê xakê ne.

Di civînê de bi awayekî mafdar gel fikarên xwe tanîn ziman. Lê dîsa hinekan bi zanebûn dixwest tevlîheviyan bike û ji ber nebûna çekên giran di dest me de moral û baweriya gel têk bibin. Ne tenê li hember çeteyan, me li hember hewldanên çêkirina bêbawerî û vîna gel şikandinê jî şer dikir. Şerê dihat meşandin ne tenê leşkerî bû. Siyasî, civakî, aborî û derûnî bû jî. Lê tevî her tiştî civîna me gihiştibû encamekî baş. Di dawiya civînê de li ser bingeha nîqaşên hatîn kirin, me ji bo avakirina eniyek nû ya şer heval erkdar kirin.

Her wiha, gotina min a me karxaneya fîşekan çêkiriye bandorekî mezin kiribû. Gotina min ya em li ser zirxek fîşek lê neçin dixebitin jî di nava gel de belav bibû. Di rastiyê de hewldanên me yên wisa hebûn. Ji ber gelê Kobaniyê di mijarên wisa de jêhatî bû. Lê tevî hewldanan jî encamekî me bi dest xistî nebû. Lê aliyê herî bi bandor bûyî, gotina divê hûn ji kesî re nebêjin bû. Ev agahî wekî efsaneyekê li nava gel hatibû gotin, her yekî ji yekî din re gotibû û dawiyê hêzên dijmin pê

hesiya bûn. Wê gotina me ya bi armanca propagandayê û aramkirina gel hatî gotin wisa bandorek mezin çêkir. Bi rastî jî dijmin tirsiya bû, gotibû ku biqasî bikarin karxaneyên çekan çêkin ji kê alîkarî û destek digirin?

Bi kurtasî civîna me kirî encamên baş derxistibû holê. Hevalên bi amadekariyan re mijûl bibûn di demekî kurt de hêzekî xurt li wir ava kirin, me ew enî wisa ava kir. Ji xwe piştî wê bi demek kurt tabûrek hêz ji me re hat. Di nav wan de çend hevalên me yên kadro jî hatin. Hevalê Masîro û Mehmûd jî gihiştin gel me. Êdî di qadê de jimarek ya kadroyan çêbû. Me piştî wê tabûrek ava kir. Hevalê Dilgeş bû berpirsê tabûrê. Ev tabûra me ji ciwanên herêmê pêk dihat. Ji wan hinek jê bîst rojek bû tevlî şer bûyîn. Me tabûrek bi tevger avakir ku dema li cihekê pêdivî pê bê dîtin ew bikarin destwerdan bikin. Di vê tabûrê de taximek hevalên jin hebûn, berpirsyara wan jî hevala Nûcan bû. Hevala Nûcan di şerê Serêkaniyê de jî cih girtibû û bi ezmûn bû. Piştî me li her cihî amadekarî kirin, bi rastî gel bawerî bi me anî, bawer kir ku em dikarin parastina wan bikin. Ji ber ên diçûn çeperên şer, di wan de wêrektî, bawerî pêş diket. Ketin ferqa hêza xwe ku dikarin pir tiştan bikin. Yek piştî çalakiyan û serkeftina çalakiyan, ya din jî şehîdbûna hevalan bandorên mezin li ser gel çêkirin. Şehîdbûna heval Viyan, hevala Peyman, hevalê Rostem, hevalê Ehmed û hevalê Dilovan, hem gel rakir piya, hem jî berpirsyartî û daxwaza karkirinê di gel de zêde kir. Di wê eniyê de hevalê Siyabend jî xebatên rêxistinkirina

YPG dikir, ew jî di nava gel de pir dihat hezkirin. Gel pir pê ve hatibû girêdan. Dema di şer de jî derket pêş, gel hêz û moralek mezin jê girt. Li vê derê gundê Qeremox hebû. Bi rastî li Kobaniyê û derdora wê bi nav û deng bû. Wî gundî jî tabûrek bi serê xwe ava kirin. Hinek du bira, hinek bab û kur, pismam, hemû xizmên hev bûn. Tabûrek pir xurt bû. Tabûrek di her warî de pir xurt bû. Bi wêrekî û egîdî tevlî pêvajoyê bûn, di demekî kurt de, ciwanên ji devera Kobaniyê giştî tevlî bûyîn ezmûnên xurt girtin di şer de. Şêwaza şer, taktîk û ziraviyên şer girtin. Fêrî şerkirin û şer meşandinê bûn. Ev destkeft û serkeftinên mezin bûn di pêvajoya şoreşê de.

## KEMERA KUŞTINÊ

Hinek peyv wisa ne bêtawan û ji rêzê ne. Kemera Ereban yek ji van peyvên tijî tewanbarî û kirêt e. Ev peyv navek bi xof û paşverûtiya zayendî ya xwe bi navê kemera namûsê rave dike tîne bîra mirov. Çawa ku heta jan û derûniya vê lanetê ji jinan neyê pirsîn nikare bê fêmkirin; ev nav û kiryara kirêt jî wisa ye. Bêyî ji Kurdan bê pirsîn, ez bawer nakim ev deqa lanetê bê fêmkirin. Di derbarê civakan de gelek tişt hatine nivîsîn. Lê ji bilî arşîvên dewletên dagirker haya ti kesî ji van kiryarên bi sosret nîn e. Amûrên kedîkirinê yên mirovan ji bo ajalan rewa dîtine, bi demê re ji bo mirovan, civakan jî hatine bikar anîn. Xefk û kemera em behs dikin di wateya

karegeriya xwe de ji hev ne cuda ne. Yek ji dîlgirtina lawiran, yek jî bo mirovan hatiye bikaranîn. Ev xefka bi rengê kemer û toqê hesap kirine, bi vê xwestine Kurdan bi temamî ji holê rakin. Ger Kurd hezar salî jî li dijberî vê lanetê şer bikin, mafdarin. Destavêtina namûsê û kemara namûsê bi awayek pêkan xwedî wateyên nêzî hev in. Ev kiryarên wisa her çiqas nebûbin mijara gotegotên serdarên Kurd jî wêjeya Kurd ji zû ve ev dîtiye û dilopên bi xwîn ji dilên wêjevanên Kurd daye barandin. Xanê hezar heyfê lê vê rastiyê tîne û Cîgerxwîn jî wekî cergên noqî gola xwînê bikin, alavek têr xwîn li bejna navê xwe dipêçe. Dil di westîne ev rastî û ez her girêdanek wisa bi mirovên xwedî wîjdan re çêdikim. Dema navdarên Kurd dilê wan disekine an jî têra vê trajediyê nake her ev rastî tê bîra min. Dema ji dil dibin welatparêz û ji welat hezdikin, wekî ev rastî noqî dilê wan bibe, dil raneke û dawiyê li jiyana wan tîne. Bi hezaran mirovên Kurd ên bi vî halî dawî li jiyana wan hatîn hene. Belkî jî hunermend ji ber dilnazik û rastiyê ji kûr ve hîs dikin, ev kemera lanetê dilê wan dorpêç dike. Ji ber vê xemgîn in, ji ber vê sewtdijwar û bi keder in. Dilperîşaniya Mihemedê Şêxo û feleka wî gelo kî dikare ji vê rastiyê qut bibîne? Di navbera dil û felekê de çûnûhatin bibû hêviyek bê derman di awazên hunera vê axê de.  Bilbil ti carî nehatibû şadkirin, her çiqas bi hêviyek stêrka berbangê ve hatibe girêdan jî. Derwêş li vê axê ji bo evînek bêderman bibû nîşana rimên zingar girtî û Edûl jinek bênesîp.

Xefk û kemerên li nava vî welatî hatibûn pêçan, heta serê vê serdemê jî awazên girî fûrandibûn ser rûxarên welatê min. Şerê niha dihat jiyankirin hêviya hemû mirovên diljan, evîndar û azadîxwazan bû. Ziyaret û mabetên Kurdan veguhuzîbûn şehîdgeh û şadiyên azadiyê. Li dar û berên ziyaretgehan paç û cilên şervanên xwe dipêçan û tewaf dikirin ji bo wan. Pîrozahiya şervanên vî welatî naşibe yên ti derê. Li bajarê zilaman êdî çîrokên jinên şervan dihatin gotin. Senger dikolan, çek paqijdikirin û awirên wan li ser xetên êrîşa dijminên wan bûn. Keç û kurên Kurdan bi dilên xwe yên wêrek tovê gihiştina mirad û mexsedên vî gelê evînên wan her dibûn xwelî di xweragiriya xwe de diçandin û ji xweliyên demboriyê qevdegulên hêviyê pêşkêşî civaka xwe dikirin.  Şer jî bûbû hêviyek bi vî rengî.

* * *

Li Eniya Şerqê an ku Rojilatê Bajêr şer dewam dikir. Piştî wî şerî dijmin dît ku nikare di eniyekê tenê de Kobanî lewaz bike û bixe bin dorpêçê. Du eniyên nû yên şer vekirin. Di 17'ê Tebaxa heman salê de, li eniya Rojava dest bi êrişekî nû kirin. Eniya Rojava di xeta Firatê de ye. Cihekî di hêla  erdnîgarî û dewlemendiyê de stratejîk bû. Yên ku bixwestiyan li ser deverê bibin serwer, diviya wî cihî bigirin. Riya ku herêma Kobaniyê bi Minbic, Cerablus û Helebê ve dide girêdane. Girêdayî wê xetê ye, li ser ava Firatê ye. Erdnîgariyekî ji bo şer jî destdayî ye. Piştî Kemera Erban a ji aliyê rejîma Suryê ve hatî çêkirin,

li wê deverê li gel Kurdan jimarekî zêde Ereb lê hatine bicih kirin. Kurd û Ereban di nava hev du de jiyankirine. Lê di rastiyê de Erebên li wir dijiyan ne xelkên wê deverê bûn û ji cihên cuda yên Sûryê ji bo wir hatibûn anîn. Gundên Kurdan hatibûn valakirin, eşîrên Kurdan hatibûn derxistin û li şûna wan Ereb hatibûn bicih kirin. Lê di navbera Ereb û Kurdên wê deverê de dostaniyek hatibû pêkanîn. Bi salan bi hev re jiyan kiribûn, danûstandinên wan bi hev re hebûn. Gelek malbat û eşîrên Kurd û Ereban xizmanî bi hev re kiribûn, keçên xwe wekî bûk dabûn hev. Ev eşîrên Ereban ên li wir piranî ji derdora Heleb, Reqayê anîbûn. Lê tevî heyîna Ereban a li vê deverê jî Kurdan ev cih wekî yê xwe dizanîn û Erebên li wir wekî mêvan didîtin. Di ferqa dagirkeriya rejîma Baas de bû xelkê Kurd.

Ji ber vê zanebûna dîrokî ya gelê herêmê, berê jî di navbera wan û Erebên paşê li herêmê hatîn bicih kirin de şer û pevçûnan carna rû dabûn. Xelkê herêmê yê Kurd digotin, “Ev axa me ye. Her çiqas ji derve Ereb hatibin anîn jî ev polîtikaya dewleta Suryê ye. Lê çi dibe bila bibe, kes nikare me ji axa me derxe. Kes bi Kurdan nikare li vê deverê.” Di Eşîrên herêmê de bi xwe baweriyekî xurt hebû. Ji ber di demên derbasbûyî de ji vê xweragiriya wan, pergalê nekaribû hemûyan ji wir bajo û tevahiya deverê bike Ereb. Lewma di dema şoreşê de jî xelkê vê deverê bi xwe bawer bû.

Lê piştî ev derdorên Artêşa Azad û hin derdorên Cephet El Nusra hatin, xwestin wan Erebên li herêmê tûj bikin û berdin Kurdan. Xwestin têkiliya di navbera hêzên me yên li Minbic û Kobaniyê ji hev qut bikin. Her wiha di navbera cihên me de jî bendan çêkin, hêzên me ji hev parçe bikin. Dixwestin êdî nehêlin çûn û hatin çêbe. Bi armanca rêya giştî ya li ser ava Firatê qut bikin, dest bi êrîşê kirin. Di êrişên destpêkê de xwestin gundên Kurdan bigirin. Ji xwe gundên Kurd û Ereban ji hev cuda ne. Destpêkê êrişî gundên wekî Borêz, Qinêye, Cebil Ferec û gundên din ên Kurdan kirin. Bi kordîne êrîşî vê herêmê dikirin û dixwestin zû encam bigirin. Gelê me yê li vê herêmê eşîrên xwecih bûn. Amadekariyên xwe yên diyar kiribûn û li hemberî êrişan tedbîrên xwe girtibûn. Di êrişên destpêkê de gel li dijî van hêzan şer kir. Gelê deverê bi xwe parastina xwe kir. Ji xwe Erebên herêmê li gel van hêzan êriş dikirin û dixwestin cih û malên Kurdan ji dest wan bigirin. Roja yekê ya şer, heta nîvro jî gel şer kir, li ber xwe da. An ku hêzekî me ya leşkerî ji derve neçûbû wir. Gel bi hêza xwe, derfetên xwe li ber xwe da. Piştî nîvro, tabûrekî hêza me ya leşkerî hat şandin û gihiştin wir. Di destpêka êrişan de hêzên li dijberî me derbeyên giran xwarin.

Ji ber gundên Kurdan û Ereban di nav hev du de bûn, xelkê herêmê jî hev baş nas dikirin. Di wê tabûra me ya destpêkê çûyî de hevalê Munzur hebû. Hevalê Munzur xelkê Efrînê bû. Di destpêka şerê Rojava de, di Serêkaniyê û şerên li gelek cihên din de cih girtibû.

Dema hevalê Munzur bi hevalê Dilsoz re dikevin gund, herdu heval li wir hatin şehîd kirin. Çeteyên ku ketibûn nava gund, êrîşî ser malên Kurdan dikirin, dixwestin malan talan bikin. Ji xwe armanc ji şerê vê derê ew bû ku şer di navbera Kurd û Ereban de bê derxistin. Hişmendiya li pişt van êrişan ev bû. Dixwestin nakokiyên kûr û dijminahiyê belavî nava gelan bikin. Ji bo şerê vê deverê mirov dikare bêje şerê xal û xwiharziyan bû. Ji ber li gelek malên Ereban keçên Kurdan ên bi wan re zewicî hebûn. Her wiha li malên Kurdan keçên Ereb ên bi Kurdan re zewicî hebûn û zarokên wan, xelkê deverê şerê hev dikirin. Di vî şerî de, an ku êrişên destpêkê de me doşkayek desteser kir. Şer hefteyekê ajot. Êdî piştî êrişa roja destpêkê mirov dikare bêje ku Kobanî ket nava çemberekê. Ji xwe çêkirina çember û dorpêça li ser Kobaniyê bi şerê Eniya Rojava re dest pê kir. Êdî riyên çûyîn û hatinê yên li ser Kobaniyê re bi giştî qut bûn. Bi vê re rêya di navbera Kobanî, Heleb, Bab, Efrîn, Ezazê, Minbic û Cerablusê de jî qut bû. Hinek hêza wan ji derve jî hatibû û dixwestin vî şerî hêj geştir bikin.

Piştî şer û pevçûnên li vir, em neçar man ku eniyekî din a şer li vir jî vekin. Eniya Rojava wisa hat vekirin. Ev eniya şer di pêşengiya rêhevalên me yên hevala Hêlîn, hevala Jiyan û hevalê Nûhilat û du kesên ji heremê ve hat vekirin. Ev pergala rêveberiyê ji pênc kesan pêk dihat. Ev sê hevalên me yên bi ezmûn ji berê de li wir bûn. Ev komek hevalên me yên bi ezmûn bûn ku demek bû li wir

bûn. Ev cih, berê cihê akademiya me ya perwerdê bû. Ji bo wekî eniya şer rêxistinkirina vî cihî van hevalan kar kir. Piştî wê Eniya xeta Firatê jî ket nav pêvajoya şer de. Ji xwe gelê deverê eşîrên bihêz bûn. Ev dever bi giranî Kêtikî bûn û di hêla berxwedaniya xwe de bi nav û dengbûn. Daxwaz û xweragiriya bikarin axa xwe biparêzin pir li pêş bû. Bi şehîdbûna herdu hevalan re ev daxwaz û xweragiriya gel zêdetir bû. Wan jî dixwestin gund û deverên xwe biparêzin. Berê jî di astek diyar de rêxistina wan hebû. Lewma hêza me ya Eniya Rojava, piranî mirovên ji deverê bi xwe bûn. An ku gelê sivîl bû. Piştî van êrişan gel xwest heval wan perwerde bikin ku bikarin hêza xwe baş rêxistin bikin, parastina herêma xwe bi xwe rêve bibin. Piştî Şehîdbûna hevalan, tevlîbûnekî pir xurt çêbû li vir. Ji ber êdî bi çavên xwe dîtin ku hêzên li dijî me şer dikin, hêzên dagirker, hêzên diz û talanker in. Êrişî mal û rûmeta xelkê deverê dikin. Ger li ber xwe nedin, an dê bên kuştin, an jî neçarî koçberiyê bimînin. Ji ber di pêvajoya çend rojên şer ên destpêkê de çend gundên Kurdan ji aliyê van hêzan ve hatin girtin û paşê me cardin ew gund ji destên wan derxistin.

Piştî ev eniya şer hat rêxistinkirin, eniyên şer li Kobaniyê bûn du enî. Lewma piştî avakirina vê eniyê, ji bo em bikarin li gorî rewşa li Sûryê û Kurdistanê heyî tevbigerin, em ketin nava lêgerînên nû. Me baş dît ku di herdu eniyan de jî li ser axa Kobaniyê dijmin lewaziyekê li kû bibîne dê di wir re êriş bike. Rewşekî cuda rû dabû.

Dijmin berê rejîm bû, niha qaşo hêzên muxalefetê li ser bingeha dijminahiyê êrişî gel û nirxên me dikirin. Bêguman, hêza xweragiriya gel û şervanên Kobaniyê ji bo dijminên me jî rewşek cuda bû. Piştî wê me jî riya di navbera Minbic, Girêspî û Serêkaniyê de girt. Me jî destûr neda ew wan riyan bikar bînin. Paşê me biryar girt ku em xeta dinê, an ku riya diçe Sirînê jî bigirin. Me li ser riya Sirînê jî xetek çêkir û eniyekî din a şer jî li wir hat avakirin. Me hewl da em lewaziyan di xeta parastina Kobaniyê de nehêlin. Ji ber me baş dizanî ku ew ê her firsendê bikar bînin, di cihên lewaz bibînin re êrişî ser me bikin.

Van êrişan, em li ser tedbîrên divê bên girtin dan hizirandin. Hiştin ku em piralî planan çêkin, tedbîr werbigirin. Hinek hêza me ya li aliyê Firatê diket xeterê. Her wiha diviya hêza me ya li Minbicê di bin fermandariya Ebû Leyla de jî xwe baş rêxistin bike û ew hêza me jî tedbîr bigire. Di encama êrişên hatin kirin de tişta di serî de zelal bûyî ev bû; ev şer ne li ser çend pirsgirêkên biçûk, hesabên biçûk tê meşandin. Armancên van êrişan ên stratejîk hene. Ev êriş û çavsoriya tê meşandin, tê wateya nepejirandina şoreşa Rojava, tê wateya nepejirandina hêz û vîna gelê Kurd. Êriş li ser nirx û heyîna gelê Kurd e. Ev hêz naxwazin gelê me ti statûyê bi dest bixe û êrişî van destkefên me dike.  Ji bo ku em bikarin van armancên wan vala derbixin, tiştên ku em bikin çine em li ser wan kûr bûn. Em gihiştin wê encamê ku tişta sereke bê kirin, hêza

parastinê xurtkirine. Hemû hêz û gelê xwe rêxistinkirine. Hêzên me yên ku bi rastî jî xwedî rolên girîng hebûn. Ev hêzên me di nav Artêşa Azad de jî xwedî cihên girîng bûn, berê bi hev re beşdarî gelek şerên dijwar bibûn. Ji van hêzên me yek hêza me ya li Minbicê bû. Hêza me ya Cephet El Ekrad bû. Ev hêzên Cephet El Ekrad yên Minbicê hinek xurtir bûn û hinek jî zêde bûn. Ji ber xwedî rêxistinekî baş bûn û di şerê Heleb û Babê de rol lîstibûn. Pir caran bi Artêşa Azad re li hemberî hêzên rejîmê, dema ku êrîş kiribûn, encamên baş bi xwe re anîbûn. Vê jî rewşeke cuda bi xwe re da avakirin. Tirsa hêzên dijberî me ji vê hêza me hebû. Bi taybet tirsa wan ji hêza me ya li Minbicê hebû. Hesabên wan dikirin, nedikarîn wisa bi hêsanî nêz bibin. Çenda caran xwestin bi şêweyên qomplogerî nêz bibin, lê nekarîbûn. Ji ber ev hêza me li Minbicê xwedî bandor bû li ser civakê. Her wiha li ser Kurdên me yên di Artêşa Azad de cih digirtin bandora wan hebû. Ji ber hêza li dijî rejîmê pir şehîd dayî û rolên mezin lîstibû di gelek cihan de. Di nav hêza me ya li Minbicê de jimarek zêde ciwanên li wir tevlîbûyîn û birîndar bûyîn hebûn. Cih û rola vê hêza me ya di şerê li dijî rejîmê de bala gelek hêzên derdor kişandibû ser xwe û di gel de bibû cihê rêzdarî û hezkirinê. Gel pê bawer bû. Lewma her çiqas çeteyan xwest çend caran nakokî û pirsgirêkan jî derbixin, bandorekî wekî ya li Girêspî nekir. Yek jî di warê jimarê de jî zêde bû ev hêza me. Di rizgarkirina gelek cihên li deverê de pêşengî kiribûn, vê yekê di gel de hêlabû li hemberî wan pêbawerî û hezkirinek mezin çêbe. Em li

Minbicê xwedî avantaj û hêz bûn. Lê tevî vê jî pêdivî bi tedbîr û xwe baş rêxistinkirinê hebû. Pêdivî bi şiyar tevgerkirinê hebû.

Li derdora Kobaniyê bi xwe de cihên me dizanî xeterin hebûn. Ji ber piştî li Eniya Rojava şer derket û şûn de, rê û rêbarên bên Kobaniyê hatin girtin, bazirganî û têkiliyên bi derve qut bûn. Kobanî ket pêvajoyekî nû. Vê hişt em li eniyên din jî hinekê bikevin tevgerê. Hewldana me ya bingehîn ew bû, em li aliyê Sirînê jî amadkariyan bikin û me amadekariyên xwe li wir jî kirin. Her wiha li xeta me jê re digot Ebû Sirê, me li wir jî amadekarî kirin ku em nehêlin dijminên me nêzîkî bajêr bibin. Me hewl da em bikarin gund û deverên Kurdan bigirin nava çarçoveya parastinê ya me çêkirî û em hêzên dijber dûrî wan cihan bigirin. Ji bo wê me hêzên xwe yên heremî li van deveran bicih kirin. Armanca me ya sereke parastina gelê me bû. Me dixwest em gel rêxistin bikin, em bikarin gel li ser bingeha xweparastinê bixin tevgerê. Di vê demê de hewl û lêhûrbûna me ya esasî bû ew ku em bikarin gund bi gund tabûrên parastinê çêbikin û hêza parastinê lê bicih bikin. Ji bo vê jî lêgerînên xurt çêbûn. Ji ber di wê pêvajoyê de ji hundir û derve de destwerdanek li ser Artêşa Azad hebû, dixwestin wan berdin gelê Kurd û destekftiyên Kurdan bi riya vê hêzê ji destê Kurdan derbixin. Lewma ji bo pêşîlêgirtina vê yekê me hewl da em xetekî parastinê ya bi hêz ava bikin. Ji aliyê Helebê ve hin caran rejîma Sûryê, hin caran jî Artêşa Azad êrişî herêmên di bin kontrola me de dikirin. Piştî me hêzên

xwe bi cih kirin, çend caran ji bo lewazkirina hêza me êrîş li ser eniyên me yên xeta parastinê bûn pêkhatin û xwestin vê hêza me lewaz bikin. Lê ji ber li vê deverê berê jî ji ber şer û pevçûnên di navbera eşîran de ezmûnekî şer hebû, hêzên me bersivên dijwar dan û wan hêzên dijberî me nekarîn zêde bi pêş de bên. Hêzên me ew xetên ku me destpêkê girtibûn parastin. Ji xwe êrişa wan a li ser eniya me ya Rojava, ji bo me bû wekî şiyariyekê. Wê êrişê hêla ku em hêzên xwe zêdetir pispor û xurt bikin di şer de.

Di nava gel de jî me zêdetir giranî da xebatên xweparastinê. Wisa bû ku ji bo gel jî li gundan çeperên xwe yên şer çêkin, hêza xwe bikin yek xebat hatin meşandin. Di vê pêvajoyê de hevala Şîlan a ku fermandara me ya eniyê bû, birîndar bû. Hevalên me yên di wê eniyê de birîndar bûn jî berxwedanekî dijwar kirin. Lê bi birîndarbûna hevala Şîlan û çend hevalên din re, hêza me ya YPJ hinekê kêm bû. Lê tevî vê jî hêzên me yên herêmî ezmûnekî baş a şer girtibûn. Hevalên me yên ji herêmê, li wir tevlîbûyîn di pêvajoyên şer de ezmûn girtibûn, ji berê baştir dikarîn şer bikin û cihên xwe biparêzin. Di warê xwe parastinê de kêrhatîbûn êdî. Ev rastiyeke, şer bi xwe hêza xwe di afirîne. Piştî pêdiviya xwe parastinekî bi hêz, van hevalên me yên ji herêmê jî xwe di şer de ava kirin. Şervan çêbûn di encama van pêvajoyên bi zehmet de. An ku hevalên berê amadekariyên wan kêm bûn, xwe zêdetir amade kirin, li ser şer û taktîkên şer lêhûrîn kirin, hinek din pispor bûn.

Şer, hêza xwe jî ava kir. Eger ku ji beriya şer jî mirov amadekarî bike, xwe li gorî giyana demê û guhertinên rû didin rêxistin bike, wê demê dikare zû bikeve tevgerê û li gorî konjoktûra heyî tev bigere. Lewma ji bo em bikarin encamên rast bigirin, têkoşîna em dikin bi destkeftiyên gelê me encam bibe, diviya em her kêlî û fersenda heyî baş binirxînin. Lewma me her kêliya wext baş nirxand, giranî da perwerde û rêxistinkirina hêzên xwe yên leşkerî. Me bi hêza gelê deverê hêzek cidî ya bi azadî û mafên xwe bawer, dilsoz û girêdayî têkoşîna azadiya Kurdistanê rêxistin kir û gel di çeperen de şer kir û berxwedanek mezin raber kir. Ji ber dema gel, civakek ji bin nîrê koletiyê derket, cardin ketina bin wî nîrî wekî mirinê tê jê re. Ji bo parastina azadiya xwe, rûmet û axa xwe, gelê deverê şerekî nedihat payîn kir. Lewma hêzên wekî Artêşa Azad û Cephet El Nusra nekarîn li hemberî gelê me li ber xwe bidin. Tevî hemû êrişan jî vîna gel a berxwedanê nehat şikandin. Ev heqîqetek bû. Gelê me ev rastî raxist pêş çavan ku gelekî xwe rêxistin kiriye, dikare li gorî wê rêxistinbûna xwe tevger bike ye. Ruh û giyana demê fêm kiriye, xwedî zanebûn û ezmûna dîrokî ye û li gorî wê tevger dike. Lewma me hêza xwe li ser vê yekê rêxistin kir. Me karî êdî em bi xwe deverên xwe kontrol bikin.



Ji bo me jî ev pêvajoyekî ezmûngirtin û xwe plankirinê bû. Me êdî dever nas dikir, serweriya me li ser deverê çêbibû ku em bikarin hêzên xwe li her cihî rêxistin bikin û wan bi cih bikin. Di herêmê de gelek kesayetên wekî hevalê Botanê Reş hebûn. Hevalê Botan ji Eniya Xerbê, gundê Cibnê bû. Hevalekî ciwan bû, zarokekî gundê Cibnê bû. Lê di demekî kurt de, di şer de bû fermandarê şer. Di nava şer de ezmûn girt, kesayeta wî pijiya. Mîlîtan û lehengekî têkoşîna azadiyê bû. Xwe kiribû kesayetekî pêşeng. Bi şerkerî, wêrektî, jîrbûn û jêhatina xwe pêşengiya gelê xwe dikir. Rastiya gel a ez behs dikim, di kesayeta wî de şênber li pêş çavan bû. Gelê me bi biryar bû ku carêk din destûr nede ax û welatê wî bê dagirkirin. Vê giyana berxwedanvan, bandorekî mezin li ser tevahiya civakê dikir. Gel ji hev, ciwanên xwe yên wêrek û şerker hêz digirt. Şerê eniya Rojava ezmûn û nîşaneyekî pir girîng bû ji bo gel. Piştî şehîdbûna hevalên

me yên li eniya Rojava, gel zêdetir şiyar bû. Pê hesiya ku ger xwe neparêze, hêzên dijber bi armanca tinekirinê bi ser de tên. Xwe parastin bi qasî nan û avê girîng e û ev ciwanên leheng bi wê zanebûnê tevlî şer bûn. Piştî şerê li eniya Rojava, amadekariyên me yên li Sirînê jî temam bûn. Bi rêxistinkirina vê eniya Sirînê re, êdî dijminên me êrişkirina ser hêzên me negirtin ber çav. Tirsiyan, ji ber li hemberî xeta me ya parastinê hêzekî wan a ewqas mezin jî nebû. Lewma ji êrişkirina ser hêzên me zêdetir, bi rêbaz û taktîkekî din xwestin me radest bigirin. Taktîka dorpêçê. Li derdora hêzên me çemberek danîn. Xwestin di demek kurt de bikarin serdestiya xwe li ser me ferz bikin. Ji xwe re digotin, dê bi vê çemberê mecbûr bimînin radestî me bibin û xwestin tawîzan ji me bigirin. Ji me re digotin; “vaye em heta filan cihî digirin, ev der, ew der ya me ye.” Wan jî li gorî nexşeya rejîma Baas diyar kirî tevger dikirin û dixwestin bi heman hişmendiyê nêzîk bibin. Li hember wê hişmendiya ku dixwestin li ser gel û civaka me ferz bikin, helwest û berxwedanekî hişk a gelê me û hêzên me yên şoreşger û azadîxwaz hebû.

Di şer de xalek din a sereke aliyê derûnî ye. Şerê derûnî, di qonaxên şerê dijwar de ji şerê çekdarî ne kêmtir rol dilîze. Van hêzên mijara gotinê ne, dema ji şerê çekdarî yê li hemberî hêzên me encam negirtin, serlêdana şerê derûnî kirin û xwestin bi tirsê, gefan, propagandayê gel bitirsînin, vîna gel lewaz bikin, bi tacîz û dorpêçan vîna gel û hêzên me bişkînin û di cihê lê lewazî dîtin re jî êriş

bikin. Piştî şerê li eniya Rojava û şûn de, demekê şerekî wisa dan meşandin. Ji ber di nava şerê gelê şoreşgerî de rola civakê mezin û girîng e. Civakekî bêparastin be, dê li her derê û her tim di nava tirsê de bijî. Lê ger bi rêxistin û xwedî tedbîr be, dê bikare aram û bêtirs bijî. Me di eniyên xwe yên şer de, di nava civaka xwe de xwest em vê rastiyê bi gelê xwe bidin fêmkirin û wekî tedbîra li hember wî şerê taybet ê dijberên me dida meşandin gelê xwe rêxistin û perwerde bikin. Piştî demekê tevahiya gel êdî fêrî van taktîkên şerê derûnî bibû. Gelê me di pêvajoya berxwedana xwe de ev rastî eşkere dît ku çiqas xwe rêxistin dike, êrişên dijmin ewqas dişkên. Çiqas xwe bi hêz dike, hêza dijmin ewqas lewaz dibe, ewqas ditirse êriş bike. An ku gel û hêzên me dîtin ku binketina hêzekî xwedî rêxistin ne hêsan e. Di vê pêvajoya şer de ev jî wekî ezmûnekê hat dîtin. Ji ber di rastiyê de her çiqas hinek ji me ne biyaniyên şer bûn jî cara yekê bû ezmûnekî me ya şerê deşt û bajaran çê dibû. Cara yekê Heleb û sere Kaniyê em kiribûn xwedî ezmûnek şerê deştê û bajaran. Hêza me piranî xelkê herêmê yê hatibû rêxistinkirinbû. Hêza me ya çekdar jî ne hêzekî wisa kevin û xwedî ezmûna şer bû. Piştî şoreşa Rojava cara yekem bû êrişên wisa bi plan û demdirêj dihatin kirin. Di encama van êrişan de hêza me ezmûnekî girîng a şer qezenc kir. Êdî dema ev rastî hat dîtin, awayê jiyanê guherî. Wêrektî û baweriyekî mezin çêbû. Civakekî her roj çavên xwe bi şer vedike, çivakek dibîne ku her roj li ser ax, milk û malê wê, azadî û mafên wê êriş tê kirin, dagirkerî û koletî li ser tê ferzkirin ji bo xwe bi parêze

tenê riya parastinê dibîne. Mirovên xwedî dijmin, neçarin ku dijminên xwe baş bişopînin. Ji ber mirov pir tiştan ji dijminên xwe hîn dibe. Gelê me di encama van êrişan de rastiya ku dijmin dixwaze hebûna wan tine bike bi çavên xwe dît. Ev pêvajo ji nêzîk ve jiyan kir. Lewma pêdiviya bibe hêz dît. Xwe rêxistin kir. Fêrî şer bû. Di her warî de ruhê berxwedanê di xwe de pêş xist. Li kêleka vê rastiyê jî gelek kes direvîn û mal û milkên xwe ji dijminê xwe re dihiştin. Lê dîsa jî hêza berxwedanê serwer bû û gelê me bi ked û hewldana pêşengên xwe ev rastiya dijminên xwe baş dît. Karî rast helwest bigire. Di encama vê dîtina rast de, biryara berxwedanê da. Nexwe ji civakekî sivîl, bêyî ezmûna şer, ji civakekî xetereyê li ser hebûna xwe nebîne derketina lehengên mîna hevalê Botan zehmete. Lê civaka ku bikare rastiyan bibîne, dibe xwedî hêza biryarê. Civaka me biryara berxwedanê da. Bingeha vîna şerê li herêmê dîtina vê rastiyê û biryara berxwedana civaka me bû. Di eniya Rojava, eniya Firatê de jî ev rastî derket holê. Ji ber gel û civaka me xwediyên vê axê yên bingehîn bûn. Bi hezarsalan berê dapîr û bapîrên me li ser wê axê jiyan kiribûn. Girêdan û dilsoziya gelê me ya bi ax û welat re wisa ji holê rakirin, vîna civaka me şikandin ne hêsan bû. Lewma di asta herî jor de vîna berxwedanê, şerê xwe parastinê danî holê. Ev welatparêziya rast, dilsoziya bi ax û welat ve bû.

# BÊHNA DÎROKÊ JI AXÊ DIHAT

Çalekiya Sûsikê

Meha Îlonê bû, lê hîna jî agir dibarî ji ezmanên Kobaniyê û germahiyek dijwar ji rûyê erdên wê difûrand nav valahiya erdu û ezman. Tîna rojê boziyek gewr bi rûyê erdê xistibû û li cih cihan xalên reş di nav pirêzeyên erdê Kobaniyê de xuya dikirin. Paçê şer, xwe bi her awayî berdabû ser giyana Kobanî. Mîna lerzên erdhejê hêdî hêdî xwe ji şerek mezin re amade dikir. Dilê erdê û yê me bi hev re lê dida li van şûnwarên şêniyên Telxilafê. Bêhna dîrokê ji axê dihat û girikên çanda ez bi behs dikim, ji me re bibûn wekî asoyên Zagros û çiyayên Xwedê. Hilm û şilahiya çemê Firatê mîna bi germahiyê re di nav şer de be, leylanên dîmenxoş li ser sînga xwe belav dikir. Çemik û rûbarên şerefdîn û êlên Heydaran bi hemû serma û qerisandina xwe tevlî pêlên germahiya Firatê dibûn û bi sedsalane ji war û gundên Milan û Beraziyan bibû hêviya jiyanê. Nav û gund kevin bûn li vî warî. Gelo ev navê Sûsê ji ku dihat û çima ev navê lê kiribûn kesî nedizanî. Beriya derdorên Firatê tijî Sûs bûn. Sûlav, sûberî û sû ku dibin heta bajarê Sûsê û bûye mijara hozanê Kurd Ehmedê Xanê bi rengê Şûşeya Cemşîd tê bîra me. Gelê Kurd bi qasî axa xwe ji hebûn û hişê xwe jî hatiye dûrxistin. Şûşeyên ku sûs tê de tên vexwarin, bi rengê ji navê sûsê bê bûye şûşe û ji Xanê xelas nebûye. Cemşîd bi vê şûşeyê hemû gerdûnê dibîne, lê mixabin Kobanî hîna di rojên destpêkê de ye. Dil û

hişê me yê fêrî berxwedanê bûye, gelo dikarî di destpêkê de çiqasî dengvedana dilê Kobaniyê hîs bike? Bêhna dîrokê ya ji van axan dihat çi ji me re digot? Dengvedan ti carî bê berxwedan nabe. Dengvedan û berxwedan bi qasî hev giran in. Hêza nav û peyvan hêzek nepenî dixe nav cerg û dilê mirovan. Lingên mirovan bi erdê ve didirû û mîna şûrê efsanewî yê di tehtê de hatî kutan û asê bûyî mirovan dikişîne xwe. Ev ax a kê ye, wê di şer û berxwedana wan de diyar bibûya. Di şerê me de jî di pêngava destpêkê de taxtîkên cihêreng pir zêde nebûn û me giranî dabû rêxistin û parastinê. Ji vê rewşa heyî jî Artêşa Azad sûd werdigirt û her di êrîşê de bû. Pêngava bi navê Bihara Ereban wêrektiyek xurt bi wan dabû avakirin û pir rihet bawer dikirin ku wê li Kurdistanê jî wisa bikin. Ji ber vê baweriya wan diviya bersivên tund bihatiyan dayîn.

Em zarokên vê axê bûn. Ra û rîşên me xwe berdidan kûrahiya giyana wê. Qutbûna me ya ji axê û warên me, dihat wateya mirin û tinebûnê ji bo me. Yên herî baş ev rastî dizanîn cardin em Kurd bi xwe bûn. Her girikê axa em li ser bûn, ji me re behsa serpêhatî û çîrokên kevnar ên dîroka me dikirin. Diviya em binê wê axê baş bixwînin û bikarin encamên rast jê derbixin. Tevî ku me ev rastî baş dizanî jî zanîna demboriyê têra her tiştî nedikir. Hêzên li hemberî me teknîk û çekên herî pêşketî yên demê li hemberî me bikar dianîn û dixwestin me ji ax û warên me bikin, welatê me dagir bikin û cardin çarenûsa evînên me bikin xwelî. Lewma diviya em li gorî

vê rastiyê jî tevbigerin. Rêbaz û taktîkên heta wê demê em hinekê diparastin. Lê têra pêşî lêgirtina êrişan nedikirin. Lewma pêdivî bi tiştên nû hebû.

Van pêdiviyan em xistin lêgerînên nû. Piştî şerê eniya Rojava û şûnde, me pêwîstî dît ku em bi şêwazekî din çalakiyan bikin. Me ji dijmin re çalakiyên sûrpriz plan kirin û em ketin qonaxekî nû ya taktîkî.

Jixwe her rojê şer bû, rojên ku şer nebûn hema hema nebûn. Şêwazek balkêş a şerê Artêşa Azad hebû. Çend kes dihatin xwe li cihekê diceribandin, bi dengê Alah û Ekber diqêriyan û gazî dikirin. Her carê ketîbeyekî wan dixwest xwe biceribîne. Carna li Serêkaniyê, carna li Kobaniyê, hin caran li Cizîrê. Xwestin cihên me bi dest bixin û ji bo wê hema bêje her rojê dihatin. Ji xwe di wê pêvajoyê de li aliyê Cizîrê jî gelek şer hebû. Di wê demê de ji bo Kobaniyê jî pêwîstî bi hewldanekî xurt hebû. Ji bo em bikarin hêj xurt bersiv bidin û serweriya di warê derûnî de di dest xwe de bihêlin, pêwîstiya me bi qonaxekî taktîkî ya nû hebû. Gel jî li benda şêwazekî nû bû. Li ser tespîta hinek pêdiviyan me dest bi vê qonaxê kir.

* * *

Me 18'ê meha Îlonê ya sala 2013'an biryara çalakiya Sûsikê da. Sûsik gundekî biçûk bû, lê ji bona şer cihekî gelekî stratejîk bû. Kemera kuştinê li ser nava Sûsikê dihat dijdandin û ti wateya sînor nemabû. Ji liv û

tevgerên artêşa azad ev rastî baş diyar dibû. Sûsikê mîna qiloçê marê reş, li ber devê çeperên me bû. Ji aliyê dewleta Tirkiyê ve ev mar her dihate xurtkirin. Dema El Nusra li Grê Spî ala xwe rakir jor têkiliyên wan û dewleta Tirk pir xurt bûn. Me êdî baş fam dikir ku Grê Spî baregeha Mît'ê û El Nusra ye. Sûsikê gundê Kurdan bû û ji aliyê artêşa azad ve hatibû valakirin. Li milê Tirkiyê Akçakale û li milê Sûriyê Grê Spî ji aliyê şaredar û kaymeqamê Akçakaleyê dihate rêveberin. Pişketinên li Grî Spî rûdidan me neçar hişt ku em şêwaz û taktîkê xwe biguherin. Her çiqasî li gorî êrîş û tevgerên wan em car carinan tevgerî bin ji, êdî diviya şêwaz û taktîkek me yê şer hebûya. Derûniya li deştê û bajar şerkirin her parastinekê bi mirov re dide çêkirin. Gel û bajar ê te ye û divê ji şervanan bêtir girîngiyê bidê. Di rastiya xwe de heta vê kêliyê jî gelek şarvanên me  mîna gel bûn û hew cil û bergên wan cuda bûn. Ji bona me zeman gelekî girîng bû ku em bi lez bikarin şervanan zêde bikin û cihên vala bikarin dagirin. Kobanê bi nav Kobanê ye, lê deştek heta çavê te bibîne fireh û mezin e. Tu avekê berdî ser pêxêra wê, wê bi herike heta çemê Firatê. Dijmin jî mîna avê li her cihek vala diherikî û dibû gol. Gundê Sûsikê û Grê Spî jî hema hema mîna vê nexşeyê di şibiya teştek hevîr. Jixwe herhal deşt û teşt ji yek kokê tên. Xeteriyên vir zêde bûn. Rêya trênê dikete hindirê Sûriyê û derdorên wê heta Grê Spî bi axê kiribûn mit. Lê kêleka vê mita hanê jî cuhek mîna du metreyan fireh û yek metrê kûr hatibû kolandin. Çeteyên El Nusra di vê cuhokê re bi hêsanî derbasî milê sînor ê din dibûn û dîsa

vedigerîn. Akçakale mîna bajarek Sûriyê lê hatibû û şaredarê wê raste rast di nav têkiliya çeteyan de bû. Rûdanên vê kefdestka biçûk polîtikayên dewleta tirk ên gire gire vedihewand û girêza xeyalên tewş ên Osmanî jê dirijiya. Berî roja çalekiya Sûsikê ji bona em ji nêz ve li çalekiyê temaşe bikin, me xwe hilkişandibû ser Girê Sor. Ev jî bi nav gire, lê di rastiya xwe de bi qasî gavek gopalê kalan bilind e. Min, hevalê Emîn Êrkendî û çend hevalên din nîqaşên cara dawiyê yê çalekiyê kir. Ji milê sînor yên din dengê motorên avê dihat ber guhên me. Car caran dûmana li pê seyareyên leşkerî tirk diket, derbasî vî milê sînor dibû. Avhewa diguherî û keskahiyek xwerû xwe li tawanê ezman pêçabû. Bayê dihat êdî li ser germahiya heremê serwerî çêdikir û xwêdana li ser bedenên mirov dicemidand. Jixwe li welatê me payîz wisa ye. Germ û hênkahî dikevin nav pevçûnek mezin û her diçe têhna sermayê xwe berdide jêr. Axa ku di germahiya havînê de bûbû xulî, bi ber bayê diket û mîna parsûyên wê derbikevin der,  rip û tazî dibû. Sih her diçe tîr dibe û reşiya wê baştir xwiya dike. Ewqasî baş xwiya dike ku tu bikarî bi rêya dûrbînê siya kêleka malekê jî bibînî. Dema min bi dûrbûnê li derdor temaşe kir, cihê ku hevalan di nîqaşa çalekiyê de pêşniyar kiribûn bi ber çavên dûrbûna min ket. Gundê Bîrguno jî yek ji van gundan bû, lê bi min gundekî ne stratejîk bû. Li kêleka Sûsikê diket û ne xwedî bandoriyek mezin bû. Tişta min ji şer famkiribû, di kêliyên wisa dijmin amadekarî dike û li cihên bi xwe bawer divê tu parasûyên wan bişkînî. Gundê Sûsikê mîna parasûyê El Nûsra bû. Ger tu parasû

bişkînî tu dikarî xwe bigihînî dilê wan jî. Bi rastî jî wisa bû. Gundê Yapsê, Kendalê, Evdiko û Melûh mîna hestiyên alîkar parasûya gund temam dikir. Diviya El Nusra bi vê çalekiyê em baş nasbikirana ku em hêzek ne ji rêzê ne. Li gorî tevgerên dewleta tirk û vê hêza hanê nîşa dikir, ji Raqayê heta Girî Spî avakirina xetek leşkerî bû. Bi vê xetê dixwestin hemû opozusyona Sûriyê bi rê ve bibin. Rêya trênê ya derbasî Tirkiyê dibû û xeta Girê Spî û Reqayê rêya karên tarî bû. Ji ber vê jî Sûsikê parasûyê vê marê reş bû. Em mirovên ku welatê wan hatiye dagirkirin jî carinan li fîlman temaşe dikin. Dibe ku her fîlm bala me nekşîne, lê hinek ji wan çîroka me vedibêjin. Fîlmê Mel Gîbson ê bi navê Dilê wêrek ku çîroka dagirkeriya Îngîlizan a Îskoçyayê dileyze, têra xwe taktîkê şer nîşan dike. Dilê wêrek William Wallace, heta demekê şerê parastinê dike, lê dema piçekî xurt dibe û her êrîş tên ser wan biryara êrîşa bajarên Îngîlîzan dide. Parastina herî rast êrîşe. Belê gundê Sûsikê gundekî biçûk bû; çalekiya wê jî pir ne mezin bû, lê vê çalekiyê wê biryar û şêwazê me ya şer diyar kiribûna. Me yê bi şev û ji cihên qet texmîn nedikirin êrîş kiribûna. Di ber sînor re mîna xişîna mar hêdî hêdî, lê bi vedanek mezin wê pêkhatibûna. Di nîvê şevê de me yê bi parasuya vî canewirê hanê vedana.

Ji bo amadekariyên çalakiya Sûsikê hêzên me hemû kom bûn. Piştî vegotina plana çalakiyê, komên biçin çalakiyê hatin diyarkirin. Di hêza biçe çalakiyê de komek hevalên di şer de xwedî ezmûn û pispor jî beşdar bûn. Di nav

hêza çalakiyê û koma pispor de hevalên jin jî hebûn. Fermandarên komên êrişê hevala Sozdar, hevalê Cuma û hevalê Siyabend bûn. Dê sê kom biçûyan çalakiya Sûsikê. Êriş ji sê aliyan ve bihatiyan pêkanîn. Dê komek ji wan li pişt cihê çeteyan biziviriya û mayîn daniyan. Di aliyê din de dê koma dî êriş bikiriya, koma sisiyan jî wekî parastina wan cih bigirtiya. Koma parastinê dê di heman demê de biketiyan nava gund. Hevalê Emîn Erkendî jî koordîneya vê çalakiyê dikir. Koma li gel hevalê Emîn jî diçû wê li ser gundê ku li kêleka Sûsikê çalakiya tacîzê pêk bianiyan. Dê ji sê aliyan ve gund bihatiya dorpêçkrin. Plana çalakiyê berfireh bû. Ji ber me bi vê çalakiyê tiştên nû armanc kirin. Bi hêza ku em pê li gundê Sûsikê bidin û bigrin, piştî Sûsikê, em dê bikarin li cihên din jî bixin û wan cihan bigirin bin kontrola xwe. Armanc derbeyên dijwar li dijmin xistin bû. Lê dîsa jî me biryar da em li gorî rewşa şer şêwaza xwe ya çalakiyan jî her dem binirxînin û li gorî wê taktîkên nû pêş bixin. Hêdî hêdî wext dibû êvar, rojê cihê xwe ji tariya şevê re dihişt. Hêzên li ser sînorên Rojava û Tirkiyê hemû di nava hewildanan de  bûn. Wê şevê bêdengiyekî seyr hebû. Beriya çalakiyê bi çend rojan, dijmin ji aliyê Reqayê û hinek cihên din hêzekî mezin anîbû deverê û gelek cih bi dest xistibûn. Bi hatina vê hêzê re moralekî baş girtibû, xwe di nav ewlekariyê de didît. Xwe di warê şerê fizîkî û derûnî de jî serwer dihesiband û nedixwest vê serweriya xwe ji dest bide. Lewma ji derve hêz anîbû deverê û ev hêza hatî li derdora Kobaniyê bi cih kiribû. Lewma baweriya dijmin jî bi xwe hebû. Bi hêza ji derve

anîn re, topên hewanê, doşkayên 23 ku ji wan re dibêjin Şêlka û gelek çekên din ên giran anibûn. Hema kengê yek aciz dibû, dixwest xwe li ser hêzên me biceribîne. Di dema amadekariyên çalakiyê de jî heman tişt çêbû. Dengê doşkaya 23 bilind bibû û te digot qey ji ezmanan kevir dibarin. Ji ber dengekî wisa li ser bû, te digot qey kerika guhê te kun dike. Di dema ev deng zêde bûn de, hevalê Cuma got, "tu bavêje, bavêje. Ji xwe temenê te nemaye, temenê te kêmek maye. Xeman nexwe, piştî çend saetên din ez ê li ser wê doşkayê bim û ez ê bikar bînim. Dema min berê wê zivirand aliyê we jî ezê nîşanî we bidim ka hûn kê diceribînin."

Di kêliyên beriya şer dest pê bikin de, li gel tirs, kelacan û coşê jî kêliyên xemgîn û hestyar tên jiyîn. Ji ber şer ne çûyîna govendê ye. Şer tiştekî cidî ye. Mirovên herî egîd û çeleng jî carna bi fîşekekî biçûk diçin. Lewma kêliyên beriya pevçûnê her mirov hinekê di hizire ka dê di encama çalakiya bê kirin de kî vegere, çi bi kê bê, encam dê bibe çî. Ev tevî vîn û baweriya herî mezin, wêrektî, egîdî û çelengiya herî bihêz jî wisa ye. Ev hestekî mirovî ye. Di vegotina plana çalakiyê de jî ji derveyî dengê gurmîniya çekan tenê çav di axivîn û mirov di awirên hevalan de ev mereq û kelecan didît.  Piştî xwendina navê hevalên di koman de qediya, hejandina xanî ya ji ber dengê teqînan jî rawestiya bû. Êdî dema xwe amadekarinê û xatir xwestinan bû. herkesê/î xwe amade dikir. Hinekan li hev dinêrî, hinek dikenîn û hinekan jî bi hev re daxivîn. Hinek heval cara yekê bû tevlî çalakiyan

dibûn. Hinek heval jî berê tevlî çalakiyan bibûn û xwedî ezmûn bûn. Hinekan rextên xwe yên bi bombe li xwe dipêçan, hinekan jî bi çekên xwe re daxivîn. Hevalekî ciwan li kêlekekê bi çeka xwe re daxivî û digot; “Îşev erk û berpirsyartiyên te zêde ne. Divê tu bi min re hevaltiyekî baş bikî, hevaltiyekî rast. Divê tu min di nîvê rê de nehêlî û nesekinî.” Di wê navberê de hevalê Qehreman, ku wekî Qehremanê biçûk dihat naskirin jî got; “Ez ji doşkaya 23 baş dizanim. Ez diçim ser doşkayê.” Li gel baweriya ku ‘divê teqez çalakî bi ser bikeve’ jî hestyariyek jî hebû. Gelo dê îşev çawa derbas bibe, kî dê ji çalakiyê venegere, dê carêk din heman coş û kelecana niha tê jiyîn bi hev re bijîn an ne. Pirsên wisa di serê herkesî re derbas dibûn. Lewma dilê her hevalekê xwe di awirên wî/ê de dida der û dilên wan mîna çûka di qefesê de û bixwaze bifire dipekiya. Di ber birqandina çavan re, kela hestên tijî re herkes ji bo çalakiyê di amadekariyan de bû. Mirovên şerker dema bejn û balên xwe bi çekan dipêçin, heybet û ciwaniyekî wan a cuda xwe dide der. Biryardariya divê çalakî bi ser bikeve di her hevalî/ê de xwe dida der. Bi wan bejn û balên bi çek û rextan hatîn xemilandin, bi biryardarî û vîna serkeftinê dest bi çûyîna çalakiyê hat kirin.

Tevî hêj bi roj germ bû jî êvaran hewayekî hênîk xwe berdida deştê. Di meş û riyên dirêj de, van bayên hênik mîna destên dayîkên me yên dil bi rehm li guliyên şervanan dida û dilê wan difirikand. Germa tavê ya bi roj li ser eniyan dibû xunav û xwe berdida jêr, bi şev jî cihê

xwe ji bayên hênik û hestên tenik re dihişt. Li ber stêrkên ku wekî çavên ciwanên şervan dibiriqîn, piştî meşek dirêj hevalan xwe gihandibû nêzîkî cihê çalakiyê. Ev çalakiyekî di warê taktîkî de nû bû. Diviya bi sedî sed destûr ji kêmasî û nebesiyan re nehatiya dayîn. Diviya her kes di vê çalakiyê de berpirsyartiya dikeve ser milan di asta herî jor de bi cih bîne. Ev hesta berpirsyartiyê di her hevalê/î de hebû.

Di meşên li deştan de tişta herî nexweş ew e ku divê li cihên xeterî heyî tu xwe bitewînî. Ji ber deşt rûte û ger tu ji piya bimeşî, dibe ku tu dîmen bidî. Ji xwe Ronahiyên dewleta Tirk a dagirker li ser sînorê Kurdistanê danîn di aliyekê de dibû sedema pêşiya xwe dîtin, ji aliyê din ve neçariya xwe tewandinê dida çêkirin. Her çiqas ronahî bawerî û germiyê jî çê bike di dilê mirovan de, lê ev yek ji bo mirovên diçin çalakiyekê ne heman tişt e. Lewma heyîna wan ronahiyan dibû sedema kîna li hember dagirkeran zêde bibe. Lewma hevala Sozdar li hevalê Tirêj vegeriya û got:

-Hevalê Tirêj, xwezî ev ronahî nebûna dê çiqaş baş bibûya. Ev ronahî û meşa me ya ji ber van ronahiyan min pir aciz dike. Hema tenê ji bo rakirina van sînoran be jî hêjaye mirov di vî şerî de bê kuştin jî.

Ji ber diviya di ber sînor re biçûyan û li pişt cihên dijmin biziviriyan. Tirêj jî bi dengekî nizim got:

-Erê hevala Sozdar. Xwezî nebana. Ji bo te jî xwe li erdê dirêj nekiriya, neçar nemaya wekî qazan bimeşî. Te destên xwe bihejandiya û wisa biçûya çalakiyê. Ma tu diçî bêriya pez? Ev şere, dijmine hevala Sozdar. Dijminê Kurdan ê herî mezin dewleta Tirk e. Ger ne wisa bûya, çi pêdivî bi çûyîna vê çalakiyê hebû? Ger em Îro li vir di vê rewşê de dijîn, sedemê wê ya esasî yek jê dijminahiya dewleta tirk a li hember gelê me ye. Ma tu nabînî çeteyan çawa diparêze, ma em dikarin wekî wan bikevin nav axa wî aliyê sînor? Ger me îro berê xwe daye nava vî şerî, mîna em biçin govendê me xwe xemilandibe û em bi dil û daxwaza xwe hatibin, sedema wê kîn û hêrsa me ya li hember van sînoran e. Sînorên ku bi têlên rêsayî hatîn danîn, têlên di dil û mejiyên me re diçin. Aha temaşeyî wî alî bike. Hemû xizm û mirovên me ne. Bawer bike em ji bo wê diçin çalakiyê. Nexwe em ne ewqas şerxwazin û me hişê xwe nexwariye em berê xwe bidin mirinê.

Li ser gotinên Hevalê Tirêj, Hevala Sozdar got:

-Tê bêjî qey min tiştek cuda got, te semînerek dîroka Kurdistanê da min. Ez jî dizanim. Lê em nêzîk bûn, ez niha nikarim bersiva te ya çûyîna bêriya pez bidim. Başe, em lez bikin û xwe bigihînin cihê xwe. Piştî çalakiyê emê hev bibînin, ezê bersiva gotinên te bidim.

Diyar bû ji gotinên Tirêj hinekê aciz bûye û bi wê acizbûnê lez da meşa xwe.

Piştî koma hevala Sozdar û hevalê Tirêj ji koma giştî veqetiyan, xwe gihandin cihê ku wê mayînan lê bicih bikin. Di kêleka sînor re li pişt cihê dijmin zivirîbûn. Li ser riya ku piştî çalakiyê dibe dijmin ji bo desterdanê di wir re bê mayîn bi cih kirin û vegeriyan û derbasî aliyê din ê gund bûn. Hêzên dijmin rûniştibûn û haya wan ji tiştekê nebû. Qîre qîra wan bû, bi dengê bilind di axivîn. Dengê muzîka guhdar dikirin bilind dibû. Hinekan jî ji aliyekê digotin 'Tekbîr' ên din ji bersiv didan û digotin 'Alah û Ekber' û dengê wan bi ser gund diket. Hinek jî nivistî bûn. Wan bawer nedikir ku dê di wê dema şevê de û li wî cihî li ser wan çalakî bê kirin.



Di wan kêliyan de koma hevalê Cuma jî gihişt cihê xwe. Xaniyê ku çeteyan wekî navenda biryargehê bikar danî

di armanca koma hevalê Cuma de bû. Li gorî gotinên hevalê Qehreman ên piştî çalakiyê, beriya çalakî dest pê bike koma çeteyan a di hundir de ji hev re behsa talan û êrişên xwe yên berê dikirin. Talan û zordestiyên xwe mîna mêrxasiyên mezin ji hev re digotin û dikenin. Hevalê Cuma biryara lêxistinê da, çar hevalan narincok di destên xwe de avêtin hundirê xanî. Piştî hevalê Cuma, Mazlum, Baz û Qehremanê Biçûk narincokên xwe avêtin hundir, bi dengê teqînan bêdengiya şevê kun bû. Pêta narincok û agirê fîşekên wan ji dûr ve wekî pêtên bi hev re direqisin xuya dikirin. Bi teqînan re dengê qîr û giriyê çeteyên di gund de bilind bû li gel dengê bombe û fîşekan. Dijmin ne li bendê bû em êriş bikin. Bawer nedikirin û dema êrişa me ya li ser wan wekî bizotên agir bi ser wan de hat şaş bûn, ji nişka ve şaqiz bûn.

Çalakiya me ya sûrprîz bandorekî mezin kir. Dijmin behitî bû. Ji ber ne li benda tiştekî wisa bûn, di navbera sê baskên çalakiyê de şaş bibûn, nedizanîn dê çi bikin. Êdî ji bo yên sax mayîn riya revê jî nemabû. Hevala Sozdar, Siyabend û Cuma bi komên hevalan ên li gel ketin gund, di nava pênc deqîqeyan de gund ji çeteyan hat rizgarkirin. Hêj hewara xwe negihandîn hêzên xwe yên din, doşkaya wan jî ket dest hevalan. Doşkaya hevalê Cuma digot, 'ka raweste, temenê te kêm maye' jî ket dest hevalan. Qehremanê biçûk çûbû ser doşkayê, berê wê dabû hêzên dijmin û li ser çeperên wan gule dibarandin. Di nava deh deqîqeyan de Hevalê Botan û Hevalê Kendal jî xaniyên li nava gund kontrol kirin û gund bi giştî ji

wan hat paqijkirin. Ji bo hêzên li hewara çeteyan bên jî mayîn hatibûn danîn, kemîn hebû. Ji xwe dema hatin ketin kemînê. Di paşvegerê de jî mayîn bi wan ve teqiyan. Lewma yên mayîn jî nezanîn çi bikin, berê xwe dan parastvanên xwe dewleta Tirk û ber bi sînor ve reviyan. Cara yekemîn bû ku di çalakiyekî wisa dorfireh de di destpêkê de me windahî nedan. Lê piştî çalakî bi dawî bû, çeteyên ji êrişa me rizgar bûyîn xwe gihandibûn gel leşkerên artêşa Tirk ên li ser sînor. Ji wan alîkarî xwestibûn, li ser vê wan gule li ser hevalên me reşandin. Di encama gulebarana artêşa Tirk de hevalê Baz şehîd bû. Ji ber ku gund li ser sînor, li ber têlan bû. Di vê çalakiyê de ji derveyî şehîdbûna hevalê Baz, çalakî serkeftî bû. Tevî çend caran dijmin xwest êriş bike jî hevalan bersiv dan û dijmin nekarî destwerdan bike. Di vê çalakiyê de bi şehîdbûna hevalê Baz, em neçar man ji berê zêdetir tedbîrên xwe li hemberî artêşa Tirk û aliyê sînor jî bigirin. Ji ber bi awayekî eşkere êrişî me kirin û piştgiriya xwe ya ji bo çeteyan diyar kirin. Di encama çalekiyê de pêncî cenazeyên wan ketin destên me. Jimarek zêde çek hatin desteserkirin. Me berê jî carêkê çekên giran li ser dijmin rakiribûn. Di vê çalakiyê de cara yekê me bi hejmarek zêde çekên giran rakirin. Me du topên hewanê yên 120 û 60 milîm rakirin, lê mixabin me piştre dît ku bê derzîne. Li gel wan me doçkayekî du namlu ya 23 û çarde û nîv girt. Hemû li ser wesayîtan bûn û me bi wesayîtên wan ve desteser kirin. Her wiha li gel van 40 çekên kesî û hejmarek zêde fîşek û guleyên

çekan bi dest xistin. Piştî çalakiyê du rojan gund di destên me de ma.



Di şer de her kêliya demê xwedî girîngî û wate ye. Carna çend çirke dikare jiyana mirovekê rizgar jî bike, dikare mirov bikuje jî. Lewma di şer de rola wext divê neyê paşguhkirin. Piştî çalakiya Sûsikê me di vî alî de şaşiyek mezin kir. Me biryar girt ku em ji gund derkevin. Ji ber bi alîkariya dewleta Tirk jî dijmin amadekariya êrişekî mezin kir. Diviya em zû derbiketiyan. Lê em derneketin. Ev xetaya me bû sedema encamên cuda. Şîroveyên me yên sîyasî ji yên leşkerî serwertir bûn û diviya me tevger û encama çalekiyê li gorî taktîkên leşkerî domandibûna. Sûsikê cihekî stratejîk bû, lê nêzî sînorê tirkan bû û pir bi lez dikarîn destwerdana çalekiyê bikin. Me li gorî tevgerên wan ên piştî çalekiyê tevger kir û diviya me ev

berê ji hev derxistibûna. Piştî du rojan şûn de dijmin bi alîkariya dewleta Tirk êriş kir û di encama êrişa wan de hevalê Cuma yê mohra xwe li serkeftina çalakiyê dayî şehîd bû.

Ger ne ji şehîdbûna hevalê Baz û hevalê Cuma bûya, vê çalakiyê dikarî wekî çalakiya herî serkeftî ya demê derbasî dîroka şerê me yê li Rojava bibe. Lê tevî hemû kêmasî û nebesiyên me jî di aliyê encamên çalakiyê de me serkeftinên mezin bi dest xistibûn. Çalakiya me ya sûrprîz bandorekî cidî li ser dijmin çêkiribû. Hema bêje demek dirêj wekî şil û şehtan lê hatibûn. Lewma ji encamên çalakiyê, êdî demek dirêj hêzên dijmin nekarîn nêzî cihên me bibin, êriş bikin û xwe komî ser hev bikin. Di warê derûnî de têkçûnek cidî jiyan kiribûn. Vê çalakiyê di aliyê eniya Rojava de jî bandorên cidî çêkir. Tirsek ket nav dijmin. Gotinên wekî "yên diçin li dijî Kurdan şer dikin, êdî bi paş ve venagerin. Kes nikare bi van, li dijî van serkeftin bi destxistin ne gengaz e" belav bûn. Piştî vê çalakiyê demek kurt, çeteyan ji me termên kuştiyên xwe xwestin. Me termên kuştiyên wan radest kirin. Ji ber ew demek bû termên wan di destên me de bûn. Ev çalakî ji bo hemû hêzên me bû wekî henase girtinekê. Ji ber pêşiya vê çalakiyê bi taybet êrişên dijwar li ser herêma Cizîrê û Kobaniyê dihatin kirin. Çalakiyê bi giştî li ser şerê me yê li tevahiya Rojava jî bandorek erênî kir. Bi taybet li ser şerê li Kobaniyê. Ev çalakî û encamên wê ji aliyê rêxistina me ve jî hatin pîrozkirin. Hem di warê taktîk, wêrektî û çalakbûna di

çalakiyê de, hem jî di warê ruh, asta berpirsyartî û hesta kûr a welatparêziya şervanên ku di çalakiyê de cih girtin, her wiha şêwaza şer a encamên xurt derxist holê bû sedema hêjayî pîrozkirinê bê dîtin. Ji ber di hevalên di çalakiyê de cih girtin de, biryar û vîna teqez divê em bi ser bixin hebû. Girêdan, hezkirin û dilsoziyekî mezin bi welat û gel ve hebû. Çalekî û taktîkekî li gorî ruhê demê bû. Vê çalakiyê û encamên wê ji me re jî ev yek eşkere danî holê ku ger tu li ser şer baş bihizirî, pêdiviyên heyî rast tespît bikî, li gorî wê taktîk û planên pêwîst pêş bixî, tu dikarî serkeftinên mezin bi dest bixî. Di her şerî de yek ji xalên ku bi xwe re serkeftinê tîne rola pêşengên şer e. Fermandarên ku pêşengiya vê çalakiyê dikirin xwedî bîr û baweriya bi azadiyê bûn. Xwedî vîn û hêzekî berxwedanê ya xwe disipart zanebûnekî kûr a dîrokê bûn. Xwedî ruh û biryar bûn. Ji gel û civaka xwe, ji axa welatê xwe hez dikirin. Ji ber her şer, di rastiyê de beriya şer dest pê bike an tê qezenckirin, an jî tê windakirin. Lê di çalakiya gundê Sûsikê de beriya çalakiyê serkeftin hatibû bi destxistin. Ew vîn û bawerî, wêrektî û biryar li wir hatibû raberkirin. Serkeftinên çalakiyê encamên van bûn.

Tevî xetaya me ya dereng paşvekişînê, çalakiyê bandorek mezin kir. Bi çalakiya Sûsikê re tirsek mezin di dijmin de çêbû. Her wiha gel û hêza me ya leşkerî hêz û moralekî mezin girt. Coşek xurt afirand. Herkesî ev rastî dît, ger mirov hêza xwe baş rêxistin bike, bikare wê hêzê li gorî pîvan û rastiyên şerê demê bikar bîne, dikare

encamên baş bigire, serkeftinên mezin bi dest bixe. Her gav û serkeftina me ya di şer û çalakiyan de, kevirekî din lî dîwarê hêz û baweriya gelê me ya berxwedanê zêde dikir. Em ber bi pêş ve dibirin. Gelê me ket ferqa vê hêza xwe û li derdora wê xwe rêxistin kir. Vê çalakiyê keyfa gelê me xweş kir. Piştî çalakiya li Sûsikê hat kirin, êrişên Artêşa Azad ên li cihên wekî Heleb, Cîzîr û Minbicê jî kêmtir bûn. Bi kêmbûna vê hêzê re, hêza Cephet El Nusra giraniya xwe da herêmê. Jixwe Cephet El Nusra destpêkê beşekî yê Artêşa Azad bû. Piştî vê çalakiyê Cephet El Nusra hêzên Artêşa Azad ji herêma Girêspî derxist û ew bi xwe hatin û têde bicih bûn. Ev yek nîşaneyên qonaxekî nû bûn. Serweriya li wir dest guhert. Wekî ku ji Artêşa Azad re bêjin; "hûn nikarin li hemberî Kurdan şer bikin, rabin em li şûna we li dijî wan şer bikin." Lewma demekê şûn de Cephet El Nusra, li aliyê Rojava êrişek pêkanîn. Ji ber jimara Cephet El Nusra ya di nav Artêşa Azad de ne hêzek biçûk bû. Lê wan jî nekarîn encam bigirin, tiştên dixwestin nekarîn pêk bînin. Êdî hinekê jî pêvajo hat guhertin. Artêşa Azad û Cephet El Nusra binketin. Bi piştgirî û alîkariya hem rejîma Baas, hem jî dewleta Tirk xwestin li herêmê bibin hêz. Lewma li ser vê destek û pişgiriyê Cephet El Nusra xwest bikeve dewrê. Bi hêza ku avakiribûn li aliyê Minbicê çend cihan hewldan li dijî hêzên me êriş bikin. Di navbera me û wan de li wir pirsgirêk û nexweşiyên cidî çêbûn. Xwestin gel li hemberî me û Kurdên li wir rêxistin bikin, bi Erebên wir xwestin me û gelê me yê li wir bidin derxistin. Ji bo wê hewldan gelê Ereb li

hemberî me bikar bînin, bi wan me bidin derxistin. Li van cihan ceribandinên cur be cur kirin. Lîstikên qirêj lîstin. Ji xwe di warê leşkerî de jî xwestin gundên wekî Bîrgûno, gundê Kendalê bigirin. Lê di êrişên li ser van gundan de şikestin, pênc termên wan di destên hêzên me de man. Di vir de jî piranî çekên giran bikar anîn. Lê tevî wê bi ser neketin.

Piştî wê xwe li eniya Rojava ceribandin. Dema xwe li eniya Rojavayê Kobaniyê ceribandin, ji aliyê Zormixarê ve êriş kirin. Di vê êrişê de jî şikestin, gundên me berê negirtibûn jî ketin destên me. Me çar-pênc gundên din jî ji wan girtin. Paşê me çeperên xwe yên li wan gundên me girtîn, wekî gundên Qinê, Borêz saxlem kirin. Ji ber me fêm kir ku yên êriş dikin ne çeteyên ji gundên Ereban ên deverên derdorê ne. Hêzekî pispore li dijî me şer dike. Bi demê re me dît ku şêwaza şerê xwe guhertine û bi rastî jî bi biryar şer dikin. Ne ew hêza berê ya dihat çend gule davêt û vedigeriya malên xwe bû. Me dît hêza li hember me, hêzekî xwe ji bo şer û desteserkirina deverên me amade kiriye. Me jî li gorî vê xwe amade kir. Bi dîtina vê rastiyê re me êriş kir. Em ji awayê parastina pasîf derketin. Dema me êrişî wan kir, me hinekê êrişên wan şikandin. Vê carê jî xwestin di aliyekî din re êriş bikin. Xwestin li aliyê gundê Qîzelî re çend êrişan pêk bînin. Dema wan êriş kir, me bi bersivekî tundtir êriş kir. Piştî me yek du gund ji wan girtin, zanîn hêza me ne hêzekî wisa ji rêzê ye û êriş şikestin. Dema di êrişan de şikestin, cardin taktîk guhertin û vê carê bi awayê vedizî

û nehênî ve hatin. Li gel komên vedizî bikevin cihên me, komên êrişê dihatin. Êdî cihên ku ji destên Artêşa Azad derketin, ketin destê Cephet El Nusra. Heta meha 10-11'an li hemû cihan hema hema Cephet El Nusra serwer bû. Hatina Cephet El Nusra şêwaza şer bi giştî da guhertin. Ji meha 10 heta meha 12'ê ya sala 2013'an me şerê Cehpet El Nusra kir. Me meha dehan civînek çêkir û di vê civînê de me biryarên nû girtin. Her wiha me di vê civînê de biryar girt ku em civîna salê ya dorfireh çêkin, rewşa heyî bi giştî binirxînin û li gorî wê bikevin sala nû. Ji ber bi derfetên kêm şer meşandin ne hêsan bû. Hêza El Nusra ne dişibî hêza Artêşa Azad, bi taktîk, teknîk û jimarek zêde û pisporane şer dikirin. Rewşa heyî diyar dikir ku dê şerekî dirêj çêbe, ev şer dê ji şerên beriya wê jî dijwartir bin. Şerê me heta wê rojê meşandî, di warê taktîk û teknîk de rewşa me, di ware derûnî û pêdiviyên rojane de rewşa gel, di warê teknîka di destên me de pêdivî bi nirxandin û encam derxistinê hebû. Em neçar bûn rewşa xwe baştir binirxînin. Li beramber şerê li dijî me dihat kirin divê em çi bikin, tedbîrên bên girtin çibin; emê şêwaz û taktîkekî çawa bimeşînin, di warê teknîka şer de kêmbûnên heyîn wê çawa bên çareserkirin, pêdiviyên xwarin û vexwarina civakê û hêzên me yên li devera Kobaniyê dê çawa bên pêkanîn. Bi giştî rewş di civîna me de hatin nirxandin. Berê du sê akademiyên me yên perwerdê hebûn. Lê têrê nedikirin, diviya em hêzekî xurt a parastinê ava bikin. Me biryar da her enî hêza xwe ya şer perwerde bike. Me hêza parastinê ava kir, me biryar da ku ev hêz perwerdeya leşkerî li her cihî bibîne,

em gel jî di warê bikaranîna çekan de perwerde bikin. Me di vê civînê de biryara avakirina Eniya Sirînê girt. Bi vî awayî jimara eniyên şer li Kobaniyê derket pênc eniyan. Divê her hêz bikare perwerdeya xwe ya heftane, panzde roj, li gorî derfetan bide, hêzekî têra xwe dike ava bike. Divê bikarin xwe bi rê ve bibin. Hem di aliyê cepxaneyê de, hem di aliyê şer û pevçûnan de, hem di aliyê rêxistinkirina gel de erk û berpirsyariyên nû ketin ser milên eniyên me yên şer. Di aliyekê de em rû bi rûyê hêzekî dirinde û êrişkar a şerê fizîkî bûn, ji aliyê din ve jî li ser gel û civaka me şerekî derûnî dihat meşandin. Kobanî ketibû çemberê, li ser Kobaniyê goşegirî hebû. Kesekî nedikarî biçe tiştekê ji derve bîne. Bajêr bi tena serê xwe ma bû. Hindek caran ciwanên Kobaniyê yên ku berê diçûn Helebê carê ew jî diçûn û dihatin girtin. Hindek caran jî di rêyên qaçax re diçûn ji bo ku bikarin ezmûnên xwe temam bikin. Wekî din çûyîn û hatin, derketin û ketina bajarê Kobaniyê nemabû. Bi taybet piştî meha dehan a sala 2013'an hema bêje Artêşa Azad li derdora me ji holê rabû. Di dema Artêşa Azad de ewqas şerekî dijwar û pir alî nebû. Ji xwe ne hêzekî xurt bû, zû têk diçû û ditirsiya. Lê di hêza Cephet El Nusra de biryardariya şerkirinê hebû. Biryara tinekirina me û gelê me hebû. Ji derveyî şer û berxwedanê tiştek em bikin nemabû. Vê hêzê ji diyalog, nîqaş, lihevkirin û parvekirinê fêm nedikir. Bi kurtasî em gihiştin wê encamê ku divê em eniyên xwe yên şer û parastinê di asta herî jor de xurt bikin, gelê xwe baş rêxistin bikin ku bikare parastina xwe li hemberî van hêzan bike.

## EL NUSRA Û ŞERÊ SIRÎNÊ

Me salekî tijî şer û pevçûn li pey xwe dihişt. Her diçû rewşa herêma me tevlîhev dibû, asta şerê dihat meşandin, êriş û hewlên dagirkeriya li ser herêma me zêde dibûn. Dawiya salê li ser esasê nirxandina rewşa heyî, asta amadekariyan û çêkirina plana xebatên sala nû me biryar da em civîna salê çêkin. Fermandarên herêma Kobanê hemû kom bibûn. Mijarên me di civînê de nîqaş bikiriyan zêde bûn. Di her alî de ji ber nediyarbûna rewşa heyî hem heyecan, hem jî fikarên cidî hebûn. Hêza ku heta hingê xwe rêxistin kirî, dema wan derbaz dibû. Li Sûriyê û gelek cihên din hêza ku xwe wekî Artêşa Azad û Cehphet El Nûsra îlan kirî û ji xwe re digotin "em rizgarvanên gelê Sûriyê ne" rengek nû digirt. Ev guhertin ji nişka ve çêbû. Di carekê de rengê cilên wan hatin guhertin, reşiya hizrên wan xwe li ser cilên wan jî diyar kir û hemûyan cilên reş li xwe kirin. Te digot qey bayekî bablîsokê ye li deştên Sûriyê dixe û çi bidaya pêşiya xwe bandor dikir. Vê hêza nû di nava çend rojan de xwe li her cihî îlan kir. Gotin, "Em hêzekî nû ne. Em xwediyên rast ên vî welatî ne." Lê di rastiyê de piraniya wan biyanîbûn, ji welatên derve hatibûn. Cilên rengê wan reş û li ser çokê re li ber xwe dikirin. Rih û porê wan dirêj bûn. Dimena didan mirov ji vê serdemê dibir demên kevnar û ne dişibîn mirovên niha. Ne tenê cilên wan, kiryar û dilê wan jî reş bûn. Hema ji hemû aliyên cîhanê wekî zêrîna konzirkirtan li ser herêmê civîbûn û dest bi hewlên dagirkirina cih û axa xelkê kirin. Li gorî xwe xwedî zagon

bûn. digotin, “Nabe jin servekirî bigerîn. Nabe cilên bi reng li xwe bikin. Cigare kêşan gunehe û yên vî gunehî bikin wê bên cezakirin. Gotina azadiyê gotinek kafiran e. Tiştek wisa nîne. Her tişt bi şer û şûr tê dest xistin û divê herkes li gorî vê tevger bike.”

Destpêkê li Dêr El Zor destpê kirin û paşê berê xwe dan Reqayê. Destpêkê bûyerên wisa li van cihan hatin bihîstin. Bi hatina xwe re zagonên nû jî anibûn. Ji ber zagonên xwe bi xelkê herêmê bidin pejirandin kiryarên hovane pêk anibûn. Derketin û gera jinan guneh bû. Ger jinek wisa bihatiya dîtin kesek bi şûr li ber disekinî û serê wê dibirî. Bi bihîstina çend bûyerên wisa tirs û xofa wan wekî melkemût xwe berdabû ser dilê mirovên herêmê û tirsek mezin dihat jiyîn. Pêla hovîtiya li Reqayê dest pê kirin, di çend rojan de belavî bajarokên derdor jî bû. Xwestin her cihî bi dest bixin. Riyên çareseriyê dixetimandin. Kesên radestî wan nedibûn an dihatin kuştin, an dibûn penaber. Ên radest dibûn jî neçarbûn beşdarî şerê wan bibin, wekî koleyên serdemê xizmeta armanca wan a qirêj bikin. Li gel şantaj dikirin, jin û zarokên xelkê dîl digirtin. Jiyana xelkê deverê her diçû bi pêşketina vê hêza dijî mirovatiyê re reş dibû. Ne tenê cilên mirovan, hêvî û baweriya wan a bi jiyan û pêşerojê jî reş dibû. Lewma wekî şaneyên jiyanê tevizîbin, awirên mirovên derdor cemidî bûn. Tariya şevê destê xwe gihandibû ser ronahiya hêviyên wan û her tişt ji bo xelkê deverê wekî cilên wan hovan reş bibû.

Gelê herêmê yê ketî xefkek bê hêvîtiyê û bablîsokên tirsê li ser serê wan diziviri û her diçû hêviya xwe winda dikir. Lewma beşdarbûna vê hêzê jî zêde dibû. Cihê diçûnê talan dikirin. Gel şahidiya talan û serjêkirinan kiribû. Beriya ev hêz bigihêje cihekê bûyer û kiryarên wan, tirs û xofa wan digihişt. Li gorî zagonên wan ev fitû bû. Digotin ji me re fitû hatiye û ev neçarin li gorî wê tevger bikin. Piraniya fitûyan li ser kuştin û talanê bû. Kuştin û serjêkirina mirovan wekî fitûyekî ji jor hatî û fermana xwedê li ser xelkê herêmê pêk tanîn. Ji xwe digotin, "Em tenê fermanên xwe ji xwedê digirin. Tenê xweda heye, yên li ser rûyê erdê nûneriya xweda dikin em in." Em nûnerên xwedê ne. Xwedê ev ax ji bo misilmanan afirandiye. Qedera vê axê wisa hatiye nivîsin. Yên ku van zagonên me nas nekin, emê bibin ezraîlê ruhê wan." Herema ku ev gotin lê belav dikirin, bi tevahiya xwe xelkê misilman bûn. Bi çand û baweriyên xwe çawa jiyan kirine, di kêliya ev gotinên tewş dihatin belavkirin de jî wisa bûn. Di rastiya xwe de bawerî û mirovbûna şêniyên heremê sed qatî ji ya van tevgerên hanê rastir û paqijtir bû. Hemû pêkhateya vê tevgera xwedênenas ji pêxwasên kolanên bajar û cihên ku civak lê nemaye pêkdihat. Tişta sosret jî fetwayên wan ên bawerî û exlaqê bûn. Paçek reş li ser bedenek bê avdest kişandibûn û her kêliyê baweriyên pîroz şilû dikirin.

Li gel van gotin û kiryarên xwe, gelek kes bi pere û muçeyan jî digirtin gel xwe. Ji xwe xofa mirinê ya dayîn avakirin, mirov neçar dikirin ku berê xwe bidin gel wan.

Ti rê û çareyên din ji xwe re nedidîtin. Piraniya mirovan ne bi dil, bi neçarî zagonên wan erê dikir û çûyîna qel wan qebûl dikirin. Di vê dema bi vî rengî tevdigeriyan de êrîşê Minbicê kirin. Ji xwe li aliyê Reqayê şer dijwar bibû. Xwestin Minbicê jî bigirin û ji xwe re bikin navenda êrişên wê deverê. Ji wê derê şer kordîne bikin, bikarin bajarokên derdor bigirin. Minbic di vê wateyê de cihek girîng û stratejîk bû ji bo wan. Bi vê pêngavê dixwestin rêya ji Helebê diçe Kobanê, diçe Cerablusê, Sirînê û bajarokên din ên derdor bixin bin kontrola xwe. Bi van armancan dest bi pêlek êrişan kiribûn û dixwestin pêş bikevin.

* * *

Civîna me ya salê di nav van pêşketinên nû de pêkdihat. Bayek hişk û sar, bayê çiyan ên dêmên me fêrî wê bibûn, wekî lêketina teyroka Adarê ya li pelên daran xwe li rûyê me dida û derbaz dibû. Herikîna bayê, xumînek û gumênekî bi dol û mesîlêyên xwe ji deşta Sirûcê têxe û ev deng wekî melodramekî niştecihên vê derê dehfî amadekariyên zivistanê dikir ku bi peyvan nayê bilêv kirin. Rê û rûbarên wekî tayek şehitî yên li derdora vê xakê, dîrokek bihezaran sal radixe ber çavan. Rêkên şivan, gîskvan, gavan, cotkar û kerwanên Ereb û cihûyan mîna rûpelêk ji dîrokê di nav vî bayê heyî de xwe li hiş û dîmaxê me dida. Ger dîrok rast bê xwendin û mirov parçeyekî dîrokê be, bi hemû camêrî û ne namerdiya xwe, xwe berdide nav cergên mirov. Hewa sar bû û li

gorî salnameya filehan bîst û heştê Kanûnê xwe ji roja pişt re amade dikir. Hewa sar, lê civîn bi pêkhateya xwe di nav nîqaşek gelekî germ de bû. Dahûrandina rewşa siyasî tişta herî zor bû. Li vê qada vegeriya bû qada şerek cîhanî, destên kê di berîka kê de ye bi rastî jî nediyar bû. Hêdî hêdî destwerdanên derve li ser xaka Sûrî zêde dibûn û rêxistinên opozîsyonê mîna moriyan zêde dibûn. Çawa ewrên reş baranek xunavî dirijand ser heriya Kobanî, civîna me jî ji hemû pêşketinan re vekirîbû. Rewşa Sûriyê ya siyasî û veguherîna Artêşa Azad a El Nusra, rewşa rêxistinbûna me û ya civakî, amadekariyên kantonan, rewşa pratîka me ya derbasbûyî û ji nû ve destgirtina şêwazê şer û lihevanîna şerên me ya li gorî şerê deştê mijarên civinê yên sereke bûn. Ev mijar cara yekê bû bi awayek hûrgilî li ser wan dihat sekinandin û teşeyek konferansê dida civîna me. Di rojên civînê yên dawî de hevalê Ebû Leyla ji Minbîcê hat Kobanî. Di rûyê wî de rewşa awarte xwe dida der û hema hema bi mijarên me yên civînê re di dehma hev de bûn. Hemû derûniya hevalê Ebû Leyla xwe li dêmê wî dida û nekarîbû veşêre. Karekterê wî di rûyê wî de diyar bû. Awirên me hemûyan bi lêvên gir yê fermandar ve daleqayî mabûn. Xendeyek têkel dêmê girover yê Fermandarê bejin navîn nuxumandibû. Helwestek jixwe bawer xwe ber dida nav hemû tevgerên wî. Çavên wî yên gir, baweriyek bi ser asayî re dida derdorên xwe. Dojeh dikir bihuşt bi awirên xwe yên hezkirinek kûr lê dagirtî.



Hatina Ebû Leyla, şîrove û pêşbîniyên me yên civînî piştrast dikir. Kombûna fermandariya hêza Koban'i derfetek baş bû ku em bi lez bikaribin bernameyekê pêşbixin. Bêhnek balkêş û awarte di pêşketinên nû de xwe dida rû û êdî ti tevger û bernameyên me diviya ne mîna berê bûna. Pêlek giregire û bi xof mîna toza çolê, ji Reqayê ber bi Rojavayê Kurdistanê ve diherikî. Ev dihat dîtin û hêzek ku dixwest hemû ketîbeyên cûrbecûr û bi gelek navan di bin sîwana xwe de kombike xwe dida hîskirin. Hevalê Ebû Leyla, pêşketinên ku em qala wan dikin bi berfirehî rave kir û rewşa dawî ya Minbicê vegot. Hêzek bi biryar ku rêbazên heta niha nehatine ceribandin li ser heremê ferzdikir. Bi taybet, rêbaza kuştina serfermandarên ketîbeyên heremê pirsên gelek dijwar di nava mêjiyê me de diçikiland. Xwesteka hemû

hêzên derdor bi şêwazê bê fermandar, di bin sîwana xwe de komkirin tiştekî nû bû. Vê pêşketinê metirsî û tedbîrên şênber li me dida ferzkirin. Vê hêzê dixwest hêza me ya bi navê Cebhed el Ekrad jî beşdarî civîna wan bibe û ji xwe hevalê Ebû Leyla li ser vê xwestekê hatibû cem me. Gûman nîne ku tişta diyar pêk neyê û gotina pêşiyan a dibêje ‘şêr li cihê radizê diyar dibe. Li gorî saloxên Ebû Leyla vê hêza bi navê El Nusra dixwest hemû ketîbe di bin ala wan de kom bibin û ger ev pêknehatiya jî devê şûrê kevneşopiyê nîşanî herkesî didan.

Ebû Leyla li gorî derfetên xwe hinek agahiyên nivîskî ji sîteyên Erebî kom kiribûn û ev nivîs bi me re parve kir. Jixwe hevalê Ebû Leyla piçekî jî ji van tiştan berpirsyar bû û derfetên têkiliyên ketîbeyên Ereb baş bikartanî. Diviya me ev hêza nû baş nasbikiriya. Ebû Leyla nîvîsên anî derxist û dest bi xwendinê kir. Piştî demekê min nivîsên Ebû Leyla xwendîn ji înternetê daxistin. Nivîs bi vî rengî bû:

*Rêxistina ''Cemeata Tevhîd û Cîhadê'' ya ku 2003'an li dijî destwerdana DYE'yê ya li Iraqê derketî holê dibe zemîna DAÎŞ'ê. Serokê vê rêxistinê ku rajêrî Usma Bîn Ladîn bûyî û li Efganîstanê şer kirî, Ebû Musab ez -Zerkawî piştre navê rêxistinê kir ''Qaîdeya Cîhadê ya Mezopotamyayê''*

*Zerkawî ku piştî destwerdana DYE'yê ya li Efganîstanê vegeriyayî Iraqê û heta niha li ser rêxistina ''El Qaîdeya Iraqê ya 2006' an hin komên bi navê ''Ceyş el Fatîh, Cund*

*es- Sahaba, Ketîbeyin Ensar el -Tevhîd el Sunne, Ceyş el-Tayife el-Mansure'' jî tevlî rêxistinê kir û ''Konseya Şewrê ya Mucahîdan'' ava kir. Piştî ku Zerkawî 2006'an ji hêla DYE'yê ve hat kuştin şûngirên wî Ebû Eyyûb (Misrî) û Ebû Omer el Bexdadî hin bermahiyên êlên Sinî û Partiya Beasê ya Iraqê tevlî xwe kir û navê wê bû ''Dewleta Îslamê ya Iraqê''.*

## SERDEMA EL BEXDADÎ

*Rêxistina ku li Selehaaddîn, Enbar û Diyalayê armanc dikir dewleteke Sinî ava bike, piştre bi El Qaîde re pisgirêk jiya. Pitşî ku Ebû Omer û Ebû Eyyûb 2010'an hatin kuştin rêveberiya rêxistinê kete destê Ebûbekir El Bexdadî. Rêxisina ku di navbera 2004-2012'an li gelek bajarên Iraqê çalakî kirî, bû sedema mirina bi hezaran mirov. Rêxistina ku Bakûka ji xwe re paytext didît, 2006'an li nêzî Bexdayê Dêra bi dest xist û bi darê zorê kir ku gelek Xiristiyan koç bikin an jî cizyeyê bidin. 2007'an di êrîşa bombeyî ya ser Şengalê ya bûyî sedema mirina bi dehan kesî, rola El Îslam hebû, ku piranî ji Kurdan bûn û ji hêla Mele Kirekar ve hatibû avakirin û her wiha rola ÎTC'ê hebû, ku ji hêla MÎT'a Tirk ve hatibû avakirin.*

## DESTPÊKA ŞERÊ NAVXWE YÊ SÛRIYÊ Û EL QAÎDE

*Bi destpêka şerê navxwe yê Sûriyê re Ebûbekir El Baxdadî alîkarê xwe yê berê Muhammed Colanî danî ser rêxistiniya Sûriyê. El Qaîdeya ku bi navê Cephet El Nusra rêxistina xwe pêk anî di demeke kurt de gelek cih bi dest xistin. Li gorî nêrînên herî dawî Bexdadî got; El Nusra bi destê wan hatiye avakirin û êdî Dewleta Îslamê û Cephet El Nusra ya xwe kiriye yek navê wê bûye Dewleta Iraq Şamê (DAÎŞ). Lê Colanî got pê nehatiye şêwirandin û haya wî ji tiştekî wiha tine. Diyare hîn nakokî di navbera wan de hene.*

## ÎSYANA BEXDADÎ, RAJÊRBÛNA COLANÎ

*Pirsgirêka di navbeyna du aliyan dest pê kir û Hezîrana 2013'an lîderê El Qaîde Eymen El Zevahîrî got divê Dewleta Îslamê ya Iraqê li Iraqê û El Nusra jî li Sûriyê tevbigere. Lê Bexdadî bi dengê tomarkirî ragihand ku ew vê nas nake û li dijî El Qaîde derket. Piştî vê îsyana Bexdadî, Colanî jî ragihand ku ew rajêrî El Qaîde dibe. Lîderê El Qaîde Zevahîrî berî niha mehekê Mijdara 2013'an got ti têkiliya DAÎŞ'ê bi El Qaîde re nîne û nûnerên wan ên li Sûriyê El Nusra ye.*

# ÎDEOLOJIYA DAÎŞ'Ê

*DAÎŞ'ê îdeolojiya xwe her çendî li ser fikra 'cîhadê'' ya ku El Qaîde jî li ser vê ye ava kiribe jî tesawûra wê şîroveyeke tund a Selefîtî û Wehabîtiyê ye. DAÎŞ bi taybetî li ser şîroveya Ibnî Termiye, Muhammed bîn Abdulwehab û Seyyîd Kutup, bi hişmendiya 'cîhada global' tevdigere û hemû şîroveyên derveyê vê jî mîna 'murtedî' û 'tekfîr'ê sûcdar kir. Yek ji navê girîng ê DAÎŞ'ê Ebû Enes eş-Şamî ku 'serjêkirin', 'şewirandin' û 'komkujî' disparte ser Quranê û sinetê, bi gotina, ku tê gotin ya pêxemberê Îslamê Muhammed e, ''Her kî di rêya Xwedê de yekî ne Misilman bikuje Xwedê wê dojehê li wan qedexe bike'' nexşereyêya DAÎŞ'ê diyar dike. Her wiha ayeta 12'an a sûriye Enfalê ji hêla DAÎŞ'ê ve di organên wên de pir tê bikaranîn, ku ayet dibêje, ''Wê demê Rebbê we ev wehî dida melekan: Ez li gel we me. De îmana xwe qeyîm bikin. Ez ê felaketê bi ser dilên kafir de bînim, hema li stûyê wan bixin, li tiliyên wan bixin.'' Ev rastî jî diyar dike wê navenda wan bibe Sûriye.*

Fermandarekî ne ji rêzê Ebû Leyla. Xwedî bejnek dirêj bû, rûken bû. Ti carî girnijîn ji rûyê wî kêm nedibû. rihên wî reş û dirêj bûn, şalgerdanek li serê xwe dipêça. Bi jêhatin û wêrektiya xwe ya di şer de cihek taybet di dilê şervanên qadê de çêkiribû. Di destpêka şer de vî navî her bala min kişandibû û min ji xwe re digot gelo çima Ebû Leyla? Lê ezê paşê jê derxim ku bi vî navê balkêş jî di nav şerekî gelekî mezin de ye. Li cihên Ebû Leyla lê şer dikir, fitûya destpêkê di derbarê jinan de bû. Di vî

şerî de yên herî hewceyî azadiyê jin bûn û ji ber vê rastiyê navê xwe kiribû babê Leylayê. An ku Ebû Leyla. Ebû Leyla bi koka xwe ji xelkê Kobanî bû, lê ji ber bêderfetiya jiyanî derbasî Minbîcî bûbûn. Ebû Leyla li Minbîcê hatibû dinyayê û bi qasî mirovekî Ereb çand û erda deverê nasdikir. Jixwe li vê derê jiyan têkel bû û sê gelên bi zimanên cuda di nav hev de jiyan dikirin. Fitûya çeteyan ji bo hemûyan bû û herkesî bi qasî hev jê xeterî dîtibûn. Dema şer dest pê dike, Ebû Leyla mîna fermandarek xwezayî derdikeve pêş. Tişta pêwist dikir piçekî wêrektî û hezkirina jiyanê bû. Lê jan û êşên Ebû Leyla ji yên cîranên wî hîn kûrtir bûn. Di encamê de ji bona wî û gelî wî ti cewaziya Baas û hêzên dijberî Baasê nebû. Kevir li ser sîng bû û bi hejandina yek kêliya kevir êdî serî li hewa bû. Jixwe ji ber vê rastiyê ye em ji tekoşînê re dibêjin serhildan. Serhildana Ebû Leyla ew bi lez pêşxist û ji Heleb heta Eyn el Îsa'yê xist nava şerek gelek mezin. Ji ber van rastiyên hanê Ebû Leyla, ji aliyê me ve gelekî dihat hezkirin û bawerkirin.

Ev delîlên di destê Ebû Leyla de ji aliyê hinek hêzan ve dabûn televizyona El Cezîre jî. Ebû Leyla dema nivîs werdigerand Kurdî car caran hevokên heyî bi pişketinên nû piştrast dikir. Gotinên Ebû Leyla bala hemû hevalên civînê kişandibû ser xwe û ev gotinên hanê bi qasî çarenûsa hemû şerê Sûriyê diyar bike girîng bûn. Ez bêyî ku destê xwe rakim,  ketim navbera axaftinên Ebû Leyla û min wisa got:

-Pêşniyara min çi agahî hebin bila werin parvekirin. Ji ber li Sûriyê gelek pêşketin çêdibin û çend bajarên mezin ketin destên hêzek nû. Ez dixwazim ji bilî nivîsa heyî çi agahî hene were parvekirin.

Pêşketinên hêzên cîhadî û tevgerên Ereb li milê Menbicî xurtir dihate nîqaşkirin û hayê tevgerên li wir ji wan hebû. Heleb navenda hemû nîqaş û pêşketinên cîhadî bû. Hevalê Ebû Leyla ji ber fermandartiya hinek hêzên wir dikir, ji gelek tiştan agahdar bû. Nûçeyên li wir ji bona me çarenûs bûn. Dema deng ji hevalên civînê derneket, Ebû Leyla kaxiz danî erdê û dest bi axaftinê kir:

-Koma ku di dema destpêka şerê Irakê de ava bû û paşê di sala 2004'î de girêdana xwe bi El-Qaîdê îlan kiribû herî dawî navê El-Qaîdeya Iraqê li xwe kir. Ev koma hanê di bin konê xwe de bi giranî tevberên Sûnnî bi cih kir. Konseya Şûra ya Mûcahdîdîn, El Qaîde, Jaysh el-Fatîhen, Cûn el- Sahaba, Katîbeyan Asnar el-Tevhîd vel Sûnneh, Ceîsh el- Taîfa el- Mansûra. Koma ez qala wê dikim alîkariya van hêzan hemû digire. El Nûsra mîlîtanên Sûriyê yên El kayîde ne. Daîş jî yên Irakê ne. Dema Seddam ji desthilatdariyê hat xistin, ên herî zêde alîkariya wan dikir Bişar Esad bû, lê piştî Bihara Ereban ev hat guhertin. Li gorî di belgeya nivîskî jî derbas dibe, her çiqasî ji aliyê serokê El- Qaîdeyê gotina me şaxê Sûriyê tasfiye kir derbas dibe jî Emîrê Daîşê Ebû Bekir el- Bexdadî, ev biryara tasfîyê red kir û got emê operasyonên xwe yên li Sûriyê xurtir bikin. Li gorî em ji

pêşketinên çêdibin dixwînin jî piştî ketina Deyr el Zorê êdî Daîş serwer e. Diyare di nav El Nusra ya Sûriyê de alîgirê Bexdadî hene. Jixwe Daîş yekîtiya herdu El Qaîdeyên li Irakê bûn û niha berê xwe didin Sûriyê. Mîlîtanên Muhacir girêdayî Bexdadî ne û hêza El Nusra ya herî xurt jî evin.

Hevalê Ebû Leyla destpêkê bi Erebî xwend, paşê jî nivîs wergerand Kurdî. Me piştî ev nivîs xwend rewşa heyî baştir zelal bû û diviya em bi lez û bez tevbigerin. Hêzên me yên bi navê Şems El Şîmal li gorî vê rewşa nû diviya hatibûna bicihkirin. Li gorî rewşa heyî Minbîc ji bo El Nusra cihekî stratejîk xuya dikir û me jî ev rastiya zû tespît kir. Li kêleka van pêşketinên siyasî rewşa me ya rêxistinî a şer û rêveberiya wê jî diviya ji nû ve diber çavan re bihata derbaskirin. Heta vê civînê pêşketinên şer bi xwe re hinek karekter jî peyda kiribû. Di şer de xelat û ceza gelekî girîng e. Bi rastî jî hinek karekter hewceyî nivîsandinên wêjeyî û romanê ne. Di nav şer de leheng tenê nînin, li kêleka wan gelek mirovên pûç û bêkêr jî hene. Di cêvînê de peydakirina van mirovên xapînok mijarek sereke bû. Ev kes hemû enerjiya xwe ji bona nekirinê û bêbaweriyê belav bikin bikartînin. Du şêwazê zelalkirina pêvajoyê hene. Şêwaza yekê, jibona amadekariyên xurt bên kirin tê bikaranîn, a duduyan jî rewşa avarte ji bona tiştên neyînî û girêdana dest û milan tê kirin. Rewşa ku Ebû Leyla ragihand civînê, ji bona em baştir amadekariyên xwe bikin bû, lê li kêleka vê jî kesên xapînok ev rewş berevajî digirtin dest û vê

rewşa hanê jixwe re dikirin palgeh. Xwe pê rast derdixistin û bêkêriya xwe li pişt vê rastiyê vedişartin. Van kesan berê jî digotin wê êrîşên mezin çêbibin, lê ev êrîş ji bona rêya reva xwe dinirxandin. Bêvla mirovên wisa tirsonek zû bêhn digire û qiyametê li serê mirov radikin. Yek ji van kesan jî Kawa Riha bû. Kawa Riha karekterek gelekî balkêş bû ku di şerê heyî de hêdî hêdî tevna karakterê wî bi ber dawiyê ve diçû. Gelekî balkêşe ku ev mirovên heyî hemû xwedî zimanek gelekî şîrîn in û ji herkesî re şerbetê belavdikin. Li gorî wî me şervanên xwe diavêtin nava agir. Ti amadekariyên me nînin û yên heyî jî têra şerê Kobanê nedikirin. Destpêkê çek kirin bahane, paşê gel xistin rojevê, hîn paştir asta perwerdê rexne kirin û herî dawî jî tespîtên me yên pêvajoyê xistin rojava xwe. Di dîroka hemû tekoşîn û şeran de kesên wisa di qelîşokan de xwe vedişêrin û bi saxa lehengan sax dimînin. Dîn û îmana wan ezezî ye. Dilê wan biçûk e û çavên wan melûl in. Ev kes ti carî nekarîn tava rojê bibînin û her di tariyê de jiyan dikin. Ji ber vê rastiya wan jî bêvla wan gelekî xurt e. Bi bêhnê tevger dikin û li rêya revê digerin. Yek sedema ku ji tariyê jî hezdikin ev e. Li gorî wêjeya şoreşgerên Sovyetê, şoreşgeriya kesên wisa li ser mêzeya şerabê ye. Her çiqasî mînakên me ne wisa bin û ev di çanda me de nîn be jî ev kesên wisa şoreşgerên civîna ne. Li hemberî vê pênaseya Rûsan gotinek me Kurdan a pir xweş heye. Tê gotin "fişkiyên hespê bi lez firk dikeve erdê." Kesên mîna Kawa jî bi devan û gotinên xweş, şer di rojekê de bi ser dixistin an jî winda dikirin. Di civînan de xwedayê şer in, lê dema

dor tê cihê kar û şer mixabin tu kesên wisa nabînî. Di civîna me de keseyata Kawa baş hat dahurandin û ji erka heyî hate dûrxistin. Me li şûna wî Botanê Reş guncav dît. Jixwe ev vesazî keseyata Botanê Reş jî baş dide dest. Şervanekî di şerê Kobanê de pijî bû û gelekî dilnizm bû. Heta wê kêliyê jî fermandarê taximê bû, lê piştî şîrove û biryarên civînê ku avakirina tabûrek xurt û bi tevger hate dayîn, me Botanê Reş ji bo vê erkê guncav dît. Ev pîvana şerê me ye. Dilnizmî û wêrektî pîvanek me ya îdeolojîk e. Ger di şer de dilnizmî nîn be, ji kesayetên şer cinawir peyda dibin. Ger li hemberî şervanên xwe dilnizmiyek nînbe, ti carî şerek xurt jî nade û pêk jî nayê. Botanê Reş ji gundê Cibnê bû. Di zimanê me Kurdî de reş tê tu wateyan. Yek di wateya reşiyê de gotinek li şûna tofan, ferman, rojên gelekî xirab ango berjengek wêrektiyê ye. Dudu jî ji bona dêmên mirovan bikartê û Botanê Reş li gorî wateya duduyan bûbû Botanê Reş. Ji ber civaka me reng û reng e û di hemû rengan de mirov hene. Zer, sor, reş û spî. Taybetmendiyên Botanê Reş ên sereke dilnizmî bû. Li kêleka vê dilnizmiya hanê jî mirovekî wêrek û bi moral bû. Jixwe ji bona şer jî ev hersê taybetmendî bes in. Çanda me wisa wateyê dide şer û me wisa Botanê Reş erkdar kir. Çend kesên din jî yên mîna Kawa hebûn.

Me di civînê de fermandariya Ebû Sirê jî şorove kir û hinek hevalên li wir dahurand. Hevala Evîn Dêrik fermandarê xeta Ebû Sirê bû. Sekin, şêwaz û xîtaba wê ji bona şer lewaz hat dîtin û me ew kişand baregehê. Dîsa

hevala Rojda ji ber fîzîka xwe kêm bû û giranî çêdikir. Me li şûna wê jî Jiyan Rojhilat û Biharîn Kobanê erkdar kir. Hevala Rojda pir zêde di nav xetên şer de erk girtibû û gelek caran birîndar bibû û ji bona pêngava nû ne bes bû. Bi vî şêwazî me du eniyên xwe yên şer xurt kirin. Eniyên Rojavayê Başûr û Rojhilat ji bo Kobanî gelek girîng bûn û me li gorî vê vesazî çêkir. Me li Eniya Başûrê Rojava ku bi navê xeta Sirînê tê bilêvkirin, Piling Semsûr ji erk girt û me li şûna wî jî Emîn Êrkendî erkdar kir. Kesên ji erkê hatin xistin jî me ew dan eniyên paş û karên lûjîstîk û îstîqamê.

Piştî dawiya civînê Heval Feysal an ku Ebû Leyla bi bernameyek nû lez zîvirî Minbicê. Diviya El Nusra nekariya têkeve navbera me û hêza Şems El Şîmal. Li gorî vê tespîtê diviya me pişta vê hêzê dagirtiya ku ti hêz nekare têkevin navberê. Em ketin nav tevgerê û dem kurt be jî me Minbic mîna herêmek pîlot diyar kir. Kêlî kêlî şer dihat şopandin û me kêmaniyên xwe yên li hemberî vê hêza nû jî gav bi gav dişopand. Hêzek di ser texmînan re bû û xwedî bernameyek şer a taybet bûn. Rê, av, enerjî û cihên çavkaniya xwarinê dikirin armanc û bi taybet êrîşî van deveran dikirin. Serwerî dixwestin û ev tişt bi rêbazên hovane yên di dil û mêjiyên mirovan re derbas nabe pêkdianîn. Zagonên şerê Rojava an ku Sûriyê bi vê tevgera destpêkir. Wê kî li ber xwe bide, wî kî radest bibe, wê kîjan hêz li hemberî hev şer bikin hema hema diyar dibû. Ti şop û dews ji ketîbeyên dervî Şems El Şîmal li hemberî vê hêza nû li holê nemabûn.

Mirovên dijberî xwe serjê dikirin û derbasdibûn. Me car carnan bi rêya telefonê be jî dijwartiya şerê wê derê texmîn dikir ku di çi astê de ye.

Qiyamete û her kes ji aliyekî ve direve. Dê li weledê xwe xwedî dernakeve. Dengê top û tankan, erebeyên diteqînin, mirov û çekên tevlî hev dibin û xwimînek bi ser asayi re bi qelaçên beriya Minbîcê dixist. Perçeyên ji bombeyên zikê erdê di qelişînin di peyitin û darê zeytûnan ji bin ve radikin. Dema ev erebeyên bi teqemeniya têr, li kû deverê diteqe, şînatiyê li wê derê nahêle û derdora xwe dikir xwelî. Wekî ava germahiya wê gihayî sed pîleyan, seranser dikeliya ev dever. Di navbera çend demjimêran de, keda bideh hezaran sal û ji aliyê bidehan nifş ve hatî afirandin, tine dikirin. Dîwar li dora erdên zeytûnan û ti stare li dora nevçeyê ne hiştibûn. Ne darên zeytûnan, ne yên sêhr û ne jî bêhr hiştibûn. Ne gund û ne jî rêyên diçin gundan mabûn. Dûyê ji derbên guleyan, bombe û erebeyên diteqiyan radibûn, girên ewrên fêris li ezmanan çêdikirin. Deng, dol û newalan dadigre û wekî hewar bike, dibe ser çemê Firatê. Bêhna têz û TNT'ê tevlîhev dibe û stûna pozan dilerizîne.

Hêza me li hemberî vê qiyametê li berxwe dida û di rojên destpêkê de serkeftî jî bû. Nêzî bîst emîrên wan dîl girtibûn û şandin Kobaniyê. Ev pêşketinek nû bû û cara yekê bû ewqasî fermandar diketin destên me. Diyar bû bername û texmînên di derbarê me de kiribûn gelekî şaş

bûn. Ha ji wan em ê jî wekî ketîbeyên din ala xwe deynin û serweriya wan bipejirînin. Lê ne wisa bû. Kevanek ber fireh li derdora hêza me avêtin û ev avêtin nîşaneya berxwedana hêza me bû. Nedixwestin zeman winda bikin û di vê navberê de berê xwe dabûn Cerablûsê. Tam danzde rojan di nav qiyamet û tofanê de hêzek biçûk li ber xwe dida û vê berxwedanê ew şaqiz kiribûn. Kevan û çember diyar bû stratejiyek a şerê El Nusra bû û ber bi Cerablûsê ve serê kevanê gihiştibû sînorê Tirkan. Bi teqandina çend maşînan bajarê Cerablûsê virt û vala bibû. Li serê kevana din jî mîna pêlek lehiya tijî herî ji milê Reqayê ve ber bi Sirînê ve bi awayek lez pêşve dihat. Gotin di cih de be hêzên Artêşa Azad hatibûn jihevxistin û bêyî li paş xwe binêrên mîna keftarê bîrîndar direvîn û ber bi me ve dihatin. Tank, çek û hemû alavên wan ên leşkerî ji wan standibûn û di hêla parastinê de ew rût û tazî kiribûn.

Hewa sarbû û çend roj di ser civîna me re derbas bibûn. Bi salnama Kurdî em nû derbasî çileya zivistanê dibûn û bi ya filan jî me deh rojên Çilê li pey xwe hiştibûn. Li welatê me demsal li gorî xwezaya xwe ye. Ji ber vê jî salnama Kurdî li gorî vê hatiye çêkirin. Sêzdeh rojan piştî salnameya Mîladî ango filehan meh tên guhertin. Êvar bû û kêmek berf dibarî. Berfek li ser reqbûna heriya Kobanî bi hemû ziwabûna xwe wekî kayek havînî ya zûwa derdor gewr kiribû.  Şev gewre. Berfa bi hemû ziwabûna xwe dibare bi hewa ve direqisî û dihat xwarê. Kobana belekî lê nemaye dibêjîqey çarikek xwerî spî

wergirtiye. Dûkêlên gewrîn û reş ji lûleyên sopên gazê derdikevin wekî bablîsokê bilind dibin û di nav tevna spî de winda dibin. Zeraqên zerîn û lewaz yên ji kulekên kitên xaniyên li beramber vedidin, ji der ve wekî çurûskek bê hal digihatin ber çavan. Car carna gurîniya maşînan, bê dengiya şeva spî kun dikir. Dibêjîqey xweza, mirov û her tişt ji vî konê spî re ketiye silavê û şikira wê dike. Lê mixabin zivistana herî dijwar ketibû dil û mêjiyên şêniyên derdor. Zivistana herî dijwar ev bû. Nûçe û rûdawên li derdor belavdibûn nîşaneyên qiyametê bûn.

Zivistana herî sar û req ketibû dilê Artêşa Azad û ne cihê revê ne jî cihê starê ji wan re mabû. Hêzên me bi bername bûn û hêdî hêdî ji milê Minbicê ber bi pira Karakozaqê ve vedikşiyan. Mijek dijwar xwe berdabû ser peravên Firatê. Pêlên gewr hilm û bixarek sar ji çiyayên Gawir û milê Erzînganê qut dikir û xwe li dêmên mirov dida. Ava Xweşûkanî, Ezaz, Xeran wekî tefşên zebeşekê beriye ji hev vediqetînin û dirijîne çemê Firatê. Mîna tîrek kevanê pira Karakozaq ku kevana dijmin lê dihat dorpêçkirin, di destên hêza me de mabû û li dijminê xwe vedizeliya.

Di nav hewaya van pêşketinên heyî û germahiya civînê em ketin nav liv û tevgerek xurt. Hêza me ya li pêşiya El Nusra têra êrîşa wê bişkîne nedikir û ji xwe pêşketinên Minbicê ezmûnek gelek girîng bû. Me li tevahiya Kobaniyê seferberî îlan kir. Me xwest kesên dikarin

çekan bigirin bên eniyên şer. Rewşa Artêşa Azad derfet dida ku em vê hêza heyî hîn xurtir bikin hewl bidin ku wan jî tevlî xwe bikin. Ji bilî me ti riyên din jî nemabûn ku bikarin pê ve biçin. Rewşa wan a Cerablusê bibû ezmûnek baş. Ji hev ketibûn û mîna mirîşka serjêkirî li wan hatibû. Ew li cihekê dayîna sekinandin hunera cambazan dixwest. El Nusra wekî ewrên reş ên xerbê hêdî hêdî xwe berdidan nav beriya Kobanî. Xeber û hewarên nexweş ji milê Sirînê dihatin guhên me. Vê hewarê ketîbeya bi navê Siwar El Reqa jî tevlî me kir û me xetek xurt li başûrê asfalta mezin a Helebê kişand. Yanî li gorî tê zanîn xeta Sirînê ya li pêşiya El Nusra me wisa pêkanî. Dîrok balkêşe û di her bûyerek wê de sirên xwedî gelek trajedi veşartîne. Sirîn ji bo me Kurdan piçekî jî sir bû. Her amûrek derdor nexşeyek xwînê li ser dilê gelê me dabû çêkirin û vê dîrokê bi awayek berevajî xwe li pêlên zemanê me dida. Her şoreşek derdor, pelek tarî li dîroka gelê me zêdekiribû. Karakozaq, Tişrîn û bendava şoreşê ya Reqayê bibû navê koçberî û kemera mirinê ya ji bo gelê me. Hemû gundên derdora Sirînê yên Ereb di encama çêkirina bendava şoreşê ya li Reqayê li vir hatibûn bi cihkirin û Kurd jî ji vir hatibûn derxisitin. Me jî bendav çêdikir, lê bendeva me kemer li derdora ti civakê çênedikir û berevajî vê rastiyê, me bendava xelaskirina gelên heremê çêdikir. Avakirina Komara Sûrî bi vê bendavê dihat pîrozkirin û ev pîrozahî bibû mirina gelê me. Kemer û koçberî, koçberiya li Himis û Hama li Bîrûd û hemû pesarên Sûrî. Di nav vê tofan û mahşerê de hebûna civaka Kurd dibû xelaskerê cîranên xwe.

Pêşketinên çêdibûn gotinên me, tespîtên me piştrast dikirin. Li nîvenga Sirînê serokeşîr û dazdeh mirovên wî, wekî dermaleyên salê serê wan hatibû jêkirin û dest avêtibûn jinên wan. Dema ev xeber gihişt me, em çûn hewara wan. Dîmenên heyî mîna kiryarên goştfroş ên li ser termê congeyê ji serjêkirinê direvî bû. Şopên berî serjêkirinê bi hemû hovitiya xwe li ber çavan bûn. Bi taybet ên şêx dilê mirovan diguvaşt û mirov hêrs dikirin. Birîna li nava serê wî aliyê rastê ji êvarî ve baranê şûştibû û ewqas zelal û vekirî li holê bû ku te digot qey di nexweşxaneyek teybet de hatiye paqij kirin. Çermê serê bê por, ji her du aliyê birînê ve şemitîbû. Hestiyê di bin çerm de bibû du qet û tiştek wekî singer kun-kunî û wekî şeba spî, di navbera hestiyên bûyîn qet re pimpişîbû. Li gorî salnemeya filehan yanzdehê meha yekê bû.

Me kesên ji vê xopanê sax mane rakirin û anîn cihên bi ewle. Bi awayek fermî şerê di navbera me û El Nusra bi vê dîrokê destpêkir. Me dizanî wê êrîşê me bikin û li gorî vê rastiyê em tevgerîn. Ji xeta karaqozaq heta Embara Genim ku nêzî Grê Sêvê ye, me çeperên xwe xurt kirin.

## EMBARA GENIM

Zagonên şer gelek caran mirovan matmayî dihêlin Û bi qasî zarok pêbikenin hêsan û ji rêzê tên dîtin. Ne mirovî ne, lê mixabin bi hezaran dibistan û mirov li ser van zagonan serê xwe diêşînin û zeman dimezixînin. Dijminê te yê duh îro dibe dostê te û li kêleka te dikeve nav

şerekî mezin. Artêşa Azad nêzî salekê qûtê devê zarokên Kobanî qut kiribû û nedihişt libek genim derbasî aşên kobaniyê bibe. Em xerîbin, em biyaniyê rastiyê wisa ne û em nizanin qûtê ti kesî ji devê wan bikin. Her bijî ji dê û bapîrên me re ku ev çand berdane nav şanikên me yên herî veşartî jî. Em li ser wê axa kevnar in ku bi destên terikî tovên destpêkê berdane nav rûçikên vê axa têrberhem. Ev hewldana me ramûsîna wan destên pîroze û em şervanên wan destên pîroz in. Ev rastiye dijminê te yê duh îro dike dost, li hemberî rastiya me matmayî bêhile. Ev rastiye ku şêr şêre çi jin e û çi mêre dike rastiya van rojên herimî. Nav jî wisa ne, navên kevnar, navên hatine dizîn. Sewam ango embar mîna tovên genim ji yek malzaroka dayika têrberhem afirîne. Ne erebîne û ne jî farîsîne, peyvên fêrisin û Kurdî ne. Sem-behr bi şêwaza –hem- tê xwendin û peyveke tê wateya hem-bahr û bi demê re di nav zimanê heremê de bûye embar. Çawa genima Kurdî bi Erebî bûye cendûm ev nav jî heman tişt hatiye serê wan. Genim mîna vê çandê cumerd e û mîna simbilên xwe li nav axa beyar bûye têrberhem.

Em şerê genim dikin, me da û em para xwe digirin. Ev nêzî selekê bû Kobanî di çemberê de bû û genim roj dijmartin. Şerê li ser embara genim dest pêkiribû û berî dijwar bibe diviya me genim ji vê embarê derbasî Kobaniyê bikiriya. Êdî ev embara genim û şerên li derdora wê bû sembola şerê Kobanî ya destpêka 2014’an. Embarên genim ji genim zêdetir her tiştî tîne

bîra mirov. Avahiyek bilind û bi xof e. Dîmenek mîna bi dehan bircên bedena Amadê li pê hev hatibin rêzkirin û bi kemerekê bi hev hatibin gêridan xwe li çavên mirov dida. Ev avahî li hemberî hemû afatên xwezayî û ne xwezayî sexlem hatibû çêkirin. Ji ber vê sedemê jî embara genim li hemû erdnîgariya Sûrî bibû sembola şer. Mîna kuç, zinar û sîngerên beriyê bibû cihê ewlehiyê. Herkesî bi xwarinê hevdu terbiye dikir û ev bibû taxtîkek şer. Sê ajoyên mirov ên sereke ji aliyê ketîbeyên şer ên Sûrî bi awayek hovane dihatin bikaranîn. Mîna hêzên karakter û hestên mirov li hemberî van hêzên kêmmirov şer bike, dîroka vî şerî dihat honandin.



Me hêzên xwe yên leşkerî û sivîl ji bo kişandina genim rêxistin kirin. Beriya ku em vê rixistina kişandina genim pêkbînin, di derbarê emberê de me pirsgirêkek gelek cîdî jî çareser kiribû. Embara genim ji aliyê xebatkarek

rejîmê ve hatibû miftekirin û ev kes jî li Sirinê dijiya. Bi hewildanek mezin me rê û rêça vî mirovî şopandibû û herî dawî me ew li Sirînê peyda kiribû. Mifteyê çarenûsa şerê me mîna dîtina genciniyek têr zêr diyar dikir. Di encama gera pazde rojan de me mifte peyda kiribû û me pê embar vekir.

Hêzên El Nusra her diçû nêz dibûn û gav mabûn ji bo desteserkirina embara genim. Diviya me lez bikiriya û li bajêr çi maşîn, kamyon û traktor hebin me rêxistin kir ji bo kişandina genim. Dema me dora embarê girt, diyar bû wan jî fam kiribû em dixwazin embarê vala bikin û yekser ketin êrîşê. Barê maşîna ne cebilxane û ne jî şervan bûn, lê ji herduyan jî ne kêmtir bû. Li ser şerê Rusan û Elmanan gelek tişt hatine gotin, lê tiştek hatiye ji bîrkirin. Drûşmeya şerê hewayî ya pîlotên Rusan "Za Rodinu Za Stalîn" bû. Yanî "ji bo Welat, ji bo Stalîn" li hewayê dihate gotin û çîrokek wê ya balkêş heye. Dema firokên Rus û Elmanan li ezmanan şer dikirin diviya nêzî hev bibûna. Berê difna xwe didan hev û bi ser hev ve diçûn. Ger vîna kîjan pîlotî xurtbûya firoke heta dawiyê bi ser a dijminê xwe difirand. Pîlotê vîna wî lewaz bûya, berê firokê diguhert û dibû sedema derbe xwarinê û ji vê re digotin şerê rikê. Dema pîlotên Rusan bi guleyên xwe firoka Elmanan dixistin bi yek dengî qîr dikirin û digotin "Za Rodînû, Za Stalîn." Her çiqasî şerê me ne şerê firoka bû jî lê ajotina maşîna ya ser emberê hema hema dişibiya hev. Rik û vînek xurt dixwest van kêliyan. Ji sê aliyan cebilxana ji artêşa Sedam û rejîmê girtibûn bi ser

maşînên me ve dirijandin û wê kîjan kêliyê kîjan maşîn derbê bixwe ne diyar bû. Viz viza dengê hewan û doçkayên bîst û sisê bûn. Du şev û du rojan vê rewşê domand. Rika herdu aliyan ji şerê fetihkirina keleyên berê hîn dijwartir bû. Bi rastî jî ev sewam ango ambara genim ji bo me cihekî wisa bû. Ji kêliya destpêkê heta roja dawiyê ji bilî kêliyên berbangê, rewşa heyî qet neguherî. Hew kêliyên berbangê cuda bûn û tariyê wekî berevanan diket navbera aliyên şer de û ji bo demek kurt jî be agirbest îlan dikir. Bayê sibê yê nû destpê kirî, bibêhna têz û TNT'ê barkirî dest pêdikir û dibêjî qey xweza vekişaye quncika xwe û qad ji dengê doçka, top û tankan re dihişt. Mirovên sivîl ji derveyî çend kitan maşînên xwe ji hevalan re dihiştin û nedikarîn vê rewşê rakin. Di vê kişandina genim de me danzdeh cangorî şehîd dan. Embara genim êdî bibû keleha pêşî ya parastina Kobanî. Bi hemû dijwariya xwe şer li ser embarê didomiya û Daîş'a dibin kulavê El Nusra de şer dikir, ji bo ketina Kobanî kêlî dijmartin. Digotin emê nimêja înê li Kobanî bikin û li ser vê fitû belav dikirin. Ev şerê bi nav û deng ku dişibiya tofana sibatê ji 11'ê Sibatê heta 18'ê Adarê dewam kir. Daîşê bi dehan caran êrîş kir û xwest embarê ji me bigire. Lê di her êrîşê de şikestin û bi dehan windahî dan. Di nav vê nexşeya şer de lehengiya tabûrên me jî hêdî hêdî xwe dida der. Bi qasî fermandarên bi ezmûn, ên nû jî derdiketin pêş û me êdî hêza wan a şer bi çav didît. Tişta moral û coşa me zêde dikir jî ev tişt bû. Ne tank, ne top û ne jî hejmara zêde şûna vê dadigirt. Çeka me ya herî xurt ev rastî bû. Bi qasî

fermandarê kevin û bi ezmûn yên wekî Emîn Êrkendî, Dilgeş, Roza û Botanê Reş jî mohra xwe li vî şerî didan.

Di dîroka şer de gotinên fermandaran tên xwendin, lê sekin û vîna fermandaran kêm bûye mijara dîroka şer. Li gorî ez ji şer fêmdikim, tişta şer dibe serkeftinê ji van gotinan zêdetir sekin û vîna fermandare. Hevala Roza yek ji van kesan bû. Çawa di dema şerên eshabiyan de, eshabî bi hespên xwe re dibezin û xwe diavêjin ser zînê; tevgerên hevala Roza jî wisa bûn. Ji bo hewara embara genim yekîneya hevala Roza dikeve tevgerê. Hevala Roza li benda pîqabê namîne û dibêje em bi meşin. Heta pîqab bizîvire emê çend gavan biçin pêş. Hevala Roza fermandarek wisa bû. Hem ew, hem jî şervanên li gel wê şer dikirin hemû hiş û texmînên Artêşa Azad ser û bin kiribûn. Di serê wan de dîrok dihejiya û dirixumî. Çîroka Kobanî tê zanîn, lê her şerek derdora Kobanî çarenûsa wê parve dike. Li her derê çember dihat avêtin û her sînger mîna şerê Kobanî hatiye parastin. Şerê Embara Genim jî wisa bû. Aşê Don Kîşot hîn jî tê xwendin û mîna lehengiyek li hemberî çekê tê pejirandin. Peyva “Çek derket lehengî nema” di şerê embarê de vala dihat derxistin. Lehengiyê li hemberî çekê şer dikir û li berxwe dida. Dîrok berevajî dibû û jixwe di rastiya şervantiya jinê de ev hîn eşkere bû. Xortan di bin fermandariya jinan de şer dikirin û dîrok berevajî dikirin. Hemû awirên Kobaniyan zîvirîbû ser embara genim. Mîna dîmenên filmek şer, pêtên agir li kewarên embarê dipekîn û dûkêlek reş li pey xwe dihiştin. Her der

dişewitî û şewqa ji agirê şewatê vedida, her der ronahî dikir. Dews û darên li ber şewqa agir ji dûr ve di xuyan, rût û tazîbûn. Te digot qey destpêka meha Sibatê bû. Derbên kanzayên embarê radikirin û dîwarên wê kun dikirin ji dûr ve diyar dibûn. Roja şer a sêyem e. Ev sê roj û sê şeve, Artêşa qijakan bi du hezar pêxwas û bidehan top, tankan rûyê embarê dihingavtin. Me li berxwe da û me şehîd jî dan. Lehengên vî şerî yên şehîd hevala Derya hevalê Rohat, hevalê Erdal û hevalê Serxwebûn bûn. Ji gel jî heval hebûn.  Hevalên ku sozdane, pir ciwanên ji gel li wê derê şehîd ketin, birîndar bûn. Malên wan hebûn, zewicî û xwedî zarok bûn. Jin hemû derketibûn ser serê banan dinêrîn. Mîna ku gokeke ji agir, çirûsk jê vedide li her derî belav dibe. Her kesî wê serê sibehê bala xwe dida Sewama Sirînê. Çavê her kesî li wê derê bû ka wê gotineke çawa were kirin û wê dawiya wê bibe çî. Pêxwasên El Nusra êdî gihiştibûn binê Embarê û nîvê qata jêr ketibû destên wan. Şer êdî gihiştibû asta sîng bi sîng. Mana hevalan a di embarê de hêdî hêdî diket xeteriyek mezin. Agahiyên heval Emîn didan ev xeterî piştrast dikir. Bi pêşniyara Heval Masîro û tevlîbûniya hevalê Mehmûd, hevala Narîn ez jî neçar bûm tevlî wan bibim. Metirsiyên min hebûn, lê pêşniyara hevalan baştir û guncavtir bû. Bi hevbeşiya van hevalan me biryar da em xeta parastinê bikşînin Grê Sêvê. Me roja 18'ê Adarê sala 2014'an ber bi sibê hêza xwe ji ambarê vekişand.

Êdî piştî ku em ji embara Sirînê paşve kişiyan cara destpêkê bû me cihekî berdida. Jixwe destpêkê ne em

têdebûn, Artêşa Azad têde bû. Lê belê cara yekê bû me cihekî digirt û berdida. Dijmin  ji vê paşvekşandina me hindekê hêz girt. Berê jî gelek cih ji destên rejîma Sûriyê û Artêşa Azad girtibûn. Pir bi xwe bawer bûn û di şerê xwe de gav paş ve ne diavêtin. Ji bo bikarin zêdetir pêş bikevin, diviya eniya me ya Rojhilat bigirin. Ji ber ev enî li ser deverê serwerbû û cihek stratejik bû. Di eniya Rojhilat de berê Artêşa Azad gelek êrîşî gundên Girê Sor, Kendalê, Evduko, Bîrkêtkê, Qizalî yên wê eniyê kiribû. Lê ev êrîşên wan bi ser neketibûn.

## Û NEWROZ HAT;

Newroze îro. Helbestvan û dengbêj li hemberî vê newazeya xwezayê mest dibin û dilê wan bi awaz û ristan difûre. Ev jiyaneke û bê ti qalibên mirovan ji hev cuda bike xwe berdide nav şanikên mirov. Ev kale, ev pîre, ev zarok e û ev şervanek bi hemû kanzayên parastinê ye. Îro herkes helbestvan e. Ji cil û bergên keskahiya gûzê heta cilên renglîlozî ahengek xwe tevlî vê newazeya xwezaya dayîkê dike. Mirov dibe xweza û xweza jî dibe mirov. Xonçeyên di nîvenga gulebûkê ku çawa nexşeyên reş li soriya soringî dixe, cil û bergên botanî jî nexşeyên reş di nav kirasên sor bicîh dike. Mîna baweşînek renga reng xwe çep û rast tevlî vê ahengê dike. Îro herkes Botanî, Hewrami, Behdînî, Soran û Amedî ye.

Berbangên vê rojê xweş in û xwezî li mirov dikin ku ji bo bên jiyan kirin. Hilatina Stêra sibê, nîşana berbangêye. Aso, ji zû ve ji nav hev kişaye. Çav se û guran bihêsanî ji hev vediqetînin. Ronahiyên li ber peravên heriya Kobanî wekî stêran xuya dikin, yên xeta sînor in û heta vê kêliyê jî tiştek ji şewqa xwe winda nekirine. Bayê beyaniyê li dêmê ava gewrîn ya Çemê Firatê dide û pêl pêlûkan radike. Pêlên dibin vedana ronahiya asoyê de leylanok dikevin rûyê wan, bê navber hev dişopînin.



Belê demsal bihare. Bêhna axê ji zû ve cihê xwe ji bêhna gul, nêrgiz, beybûn û endekoyan re hiştiye. Dibêjî qey li vê deştikê, li deşta dora Miştenûr wekî xanerengînekî xwezayê pêşangaha rengan rayêxistiye. Çend gul, kulîlk û rengên xwezayê li vî girê biçûk û bi beriyên pehn û fire

hatiye dorpêçkirin de milê xwe dane hev û bi lêketina bayê re wekî vedana leylanokên li ser avê û pêlên deryayê hestên mirovan mest û serxweş dikin. Kulîlka xecxecok an jî gulebûk, bi hemû îhtîşam û spehîtiya xwe wekî berxika li ber dayikê dileyîze û bê tebat hembêza wê ya li ber bayê dikeve çep û rast diheje. Miştenûra wekî heyva çarde şevî girover, ji jêder û mizgîniya jiyanek nû di nîvê deştê de bi xemla xwe şad dibe.

* * *

Piştî kêmekî zarokên daw şewitî, pêxas, rû qemitî û yên cilên YPG- YPJ'ê li xwe kirî bi awayek têkel û hil-hil li ser dilê wan ketî her yek ji aliyekî ve ketin nav qada Newrozê. Newrozê êdî destpêkiribû. Cilên YPG û YPJ'ê bibûn sembola vê Newroza 2014'an. Diyariya ji bo zarokan a herî xweş ev cil bûn. Ristên hozan Cîgerxwîn li tevna simbilê vê xakê lefandibû dibû jiyan û rastiyek jêneger. Karê me Kurdan ev e; şer, dilan û ceng e mîna drûşmeya Newrozê li ser heriya Kobanî li ba dibû. Gelek hevalên me yên di çeperan de cih digirtin xwedî zarok û mal bûn. Yek ji van jî hevalê Sadiq bû. Hevalê Sadiq dibêje, ezê bi roj biçim cejna zarok û malbata xwe pîroz bikim. Vê carê jî diyariyeke din ji lawê xwe re dibe û destek cilê YPG'ê jêre çêdike û wekî diyarî jêre dibe. Dema ku diçe malê kurik ji berî wî ji dayîka xwe pirs dike û dibêje, " Ma roja Newrozê jî babê min nayê serdanê?" Dayîka wî di ber pirsên wî re cilên wî yên Newrozê amade dike. Bi pirsên wî re dibêje, "Kurê min,

niha tu van cilan li xwe bike ka em bizanin çawa ne. Wê babê te bê serdana me bike, ji te re xelatan bîne. Niha zêde bêriya te kiriye. Ma çawa nayê serdana te?” Êvarê hevalê Sadiq diçe serdana malê. Cilên wekî diyarî dibe dike ber kurê xwe. Hevalê Sadiq wekî navê xwe bû. Lewma dixwaze kurê wî jî wekî wî sadiqê welatê xwe be, bi dilsozî têbikoşe. Bi dayîna wan cilan dixwest ew jî wekî wî girêdayî xaka xwe be û ruhê welatparêziyê têde çêbibe. Dema ku wan cilan dibîne coşa herî mezin jiyan dike. Cilên xwe li xwe dike. Bi ser bilindahî diçe nava hevalên xwe. Dibêje babê min cilê YPG’ê ji min re anîn. Zarok hemû lê dinêrin û jê dihesidin. Dibêjin xwezî babekî me jî weke babê te hebûya. Dema dilîzin dibêje “ez hinek din jî mezin bibim, ez jî wê bibim şervanekî babê xwe.” Li her derê bi wî ruh û biryardariyê mezin dikin. Erdal jî diçe serdana Keça xwe. Keça wî şeş roj bû ji dayîk bûyî û navê wê kiribûn Peyman. Bi komek hevalên xwe re diçe û cejna Peymanê pîroz dikin. Peyman zaroka wî ya yekê ye û nû çavên xwe li jiyanê vekiriye. Dema hevalê Sadiq û Erdal hemû bi hev du re diçin cejnê dibêjin, “êvarê emê li filan cihî li hev kom bibin. Emê biçin Çeperên xwe.” Tên cejna xwe pîroz dikin û xatirê xwe dixwazin. Dema ku roj diçe ber bi ava ve ew xwe amade dikin. Dîsa çek û rextê xwe digirin, ji zarok û malbatên xwe xatir dixwazin û tên çeperên şer. Êdî ev dîtin û xatir xwestina wan ya dawiyê bû.

Êvara roja 22'yê mehê li gundê Kendalê di saetên serê sibehê de şer destpê kir. Beriya şerê gundê Kendalê dest pê bike, herkes di çeperên xwe de bû. Hêj ji êvarê ve gelek heval dizanin wê sibê şerekî dijwar dest pê bike. Bi vê hîs û hişyariya heyî hevalê Siyabend diçe ser çeperan û hevalan çavdêrî dike. Dibêje; "Hevalno îro xwe amade bikin. Hûn ji duh ve ji ber Newrozê pir westiyane. Ez dizanim we pir dîlan kiriye. Hûn pir bi coş bûne. Lê divê hûn bizanin dijminê me tim dixwaze coşên me di nîvî de bihêle. Ji bo vê jî pêwîste amadekariyên we yên xurt hebin û hûn tim amade bin." Ev taybetmendî, taybetmendiyek çanda fermandariya Egîtan e. Berî berbanga sibehê wekî rabûna tewafa rojê ger û çavdêrî îbadeta karên leşkerî ye.

Hevalê Siyabend piştî çavdêriya hevalên xort xelas dike, vedigere û diçe çeperên hevalên jin çavdêrî bike. Bi dengê piyên heval Siyabend re bersiv tê dayîn û dibêjin; "Em şiyarin, mereq neke. Em şiyarin, hûn dikarin biçin cihê xwe." Hevalê Siyabend bi dilek aram û gavên hêdî ber bi cihê xwe ve dizîvire. Bi berbangê re wekî ewrên reş ên xerbê ku berî baranê bibarînîn çawa bi hile hil û xuminiyekê xwe tajon ser reşahiya erdê êrîşek dijwar destpêkir. Di amadekariyên heval Siyabend û pêşdîtinên heval Hebûn Amed de tiştên hev nedigirtin hebûn û pêşdîtinên heval Hebûn rê li pêşiya sistbûnê vekiribûn. Li gorî agahiyên ji heval Hebûn re hatibûn; wê El Nusra êrîşî cihekî din bikiriya. Lê piştî me êrîşa wan a ser Kendalê bihîst me fêm kir tiştên wisa bi zanebûn li

derdor belav dikin, dixwazin şêlûbûnê di agahiyan de çêkin. Bi hîsekî ji kûrahiya dilê min dihat, ez ne aram bûm û min her li telefonê temaşe dikir. Di wê navberê de heval Hebûn li min geriya û got, “şer destpêkiriye.” Li gorî agahiyên dan me nîvê Kendalê ketibû destê El Nusra. Ez bi lez û bez ketim nav tevgerê û min gazî heval Masîro kir. Li gorî heval Hebûn digot, telefona heval Masîro ne di şebekê de bû û nedikişand. Saloxa ku El Nusra di derbarê êrîşa Reqa de kiribû piçekî bandor çêkiribû û hêzên me sist kiribû. Dema heval Masîro derket, min rewşa dawî ragihand û min got em bikevin nav tevgerê. Bi awayekî lez hevalê Masîro tabûra hevalê Dilgeş girt û çû teqiwiya şer. Me jî du yekîneyên din amade kir û em ketin nav tevgerê. Heta ku em gihiştin Kopirlîk tabûr ji beriya me gihiştibû û pevçûn pir dijwar bû. Dema ku em gihiştin cihê xwe saet pênc û nîv bû. Vêca heval Hebûn dengê wî di cîhazî de dihat û şer koordîne dikir. Dema em çûn gihiştin ber Kopirlîk, mirov digot qey roja qiyametê destpê kiriye û li hemû cihî şer û pevçûn hebû. Ji Bêrkêtkê heyanî ser sînorê Tirkiyê li hemû cihan xumxuma çekan û dengê cîhazan mirov ker dikir.

Qiyamete. Hem qiyameta mirovan hem jî ya xwezayî bi hemû giraniya xwe şertên şer dijwartir dikir. Baran bû û teqereqa ewran û ketina biruskan ji dengê çekan ne kêmtir bû. General xweza bi hemû îhtişama xwe têkelî şerê me bibû û astengiyên ne libendêne diafirand. Herî bi rastî bibû herî û gengeşiyek navan jî tevlî vê

tevliheviya heyî bibû. Rewşa heyî mîna sitila dimsê pilqepilq jê dihat û hemû heriya Kobanî şil bibû. Wekî şerê cîhanê yê duyemîn çawa top û maşîn di heriyê de diman, rewşa heyî ji vê ne kêmtir bû. Kendalê di nav şer de bû û hevalên wir her taqwiye dixwestin. Gundê Evdiko piçekî nêzî wir bû û her gazî wir dikirin. Hêzên me yên wir hevalên jin bûn. Kendalê ha ket ha wê biketiya. Baranê rika xwe zêde kiribû û ewrên jor mîna bixwazin tevlî vî şerî bibin li ser vê heriyê kom dibûn. Tîr dibûn, reş dibûn û baranek ji guleyên çekek zêdelez hîn bi leztir li ser erd û şervanan dibarand. Li gel kê ye ne diyar bû û hevalek bê alî bû. Lê herî zêde em asteng dikirin.

Çîroka ji vir û pê ve gelekî balkêşe. Ger şer orjînal bin, tiştên orjînal diafirinîn. Şerê Kobanî jî ji destpêka xwe ve wisa bû. Neviyên dayika hosta û mîmarê ma gelo wê ji heriyê bitirsin? Bi hezar salan ev herî sitrandibûn û kiribûn bingehê vê şaristiniya şîr heram. Kiribûn kertpiç, kiribûn sênî û kiribûn tenûr. Hevalên jin dema temaşe dikin maşîn nikare biçe û bi xwe jî di tevgerê de zoriyê dikşînin, çareyek şîrhelal dibînin. Tabûra hevalê Dilgeş jî li ser heman riyê pêşve tên û rastî  şikêra ji pêlavan çêbûye tên.  Hevalê Botan ji hevalê Dilgeş re dibêje; “Hevalê Dilgeş, ev pêlavên hevalane. Pêlavên wan li vê derê ne. Gelo dijmin hatiye hevalên me bi dest girtine?” Heval Dilgeş ji xwe re dibêje, “Apocî ti caran bi dest nayên girtin. Gelo di xew de girtine? Ger saxbin û li ser hişê xwe bin ez nebawerim ew têkevin dest û wê

bombeyên xwe di xwe de biteqînin. Lê ev dîmena heyî gelek balkêşe. Ji dayîkbûna xwe heta vî temenî ez rastî tiştek wisa nehatime. Mîna henekek gelek li ser hatiye hizirandine.” Henek û metirsî di heman giraniyê de di serê heval Dilgeş re tên û diçin. Henekên şer jî cîdî ne û baldariyek cîdî jê re divê.

Heval Dilgeş di wê kêliyê de dudiliyekê jiyan dike û li derdora xwe dinêre, çavên xwe li derdor digerîne. Guhê xwe bi baldarî dide ser derdora xwe, dixwaze bizane gelo çi bûye. Çima ev pêlav di vê rêkê de ne. Bi dengeke bi temkîn bi hişyarî ji hevalê xwe re dibêje, “ Hevalno, bi baldarî bimeşin. Pêwîste em fêm bikin ka çi çêbûye.” Lê diduliya wî ji derbas nabe. Ji bilî pêşdeçûnê ti nişêt û nîşaneyên dudiliya heval Dilgeş ji serî bavêje nayê dîtin. Pirsên dilê wî dilerîzînin xwe li şanikên mejiyê wî didin û bersivên erênî têra van pirsan bidin aliyekê nakin. Zeman wekî avhewaya heyî tîre û pirsên neyênî li meşa wan tên barkirin. Yek xelas dibe ya duduyan bêyî ku bersiva ya yekê bê dîtin li pişt pirsê tîk sekiniye. Ji xwe re dibêje; “Gelo dibe hevalên jin revîbin û sîngerên wan ketibin destê dijmin? Na na, ger wisa bûya niha me ji zû ve bihîstibû. Lê ketibin dest û nehiştibin ti agahiyê bidin me wê çawa bibe? Ma wisa dibe, ger wisa be ev dîwarê ji pêlavan hatiye lêkirin çiye? Gelo dijmin nîşanek wisa balkêş li şûna xwe dihêle, ev jî nabe, lê çi?” Pirsên wisa bê bersiv dirêj û dirêj dibin di serê fermandarê me de. Hêdî hêdî nêzî gund dibin û dengê çekan tîrîtiya avhewayê didewîsîne. Nuxma hewayê radibe û hewaya

şer wan dorpêş dike. Tam di vê kêliyê de telefona hevalê Siyabend lê dide û yên digerin hevalên jin in. Ger şerm be, ger jî poşmaniya pirsên di serî de çûbûn û hatibûn em nezanin, lê hevalê Siyabend bersivê nade û telefonê dide hevalek jin. Dema dengê hevalên jin li derdor tê bihîstin Botanê Reş xwe diavêje holê û dibêje, "keçên welatê me ewin ku ti caran heta dengê tilîliyên wan were, nakevin bin dagirkeriyê.Ev xak êdî nakeve bin dagirkeriya ti desthilatdariyan. Berê bab û kalên me, dayîkên me tilîlî didan, lê çekên wan nebûn. Lê niha hevalên me yên keç bi çekin. Were hevalê Dilgeş, were keçikên şoreşger ji beriya me xwe gihandine çeperan. Heyfa zilaman ka were, me digot ka ew çûne cihekî din. Em çi qas xirabin û em xirab fikirin. Xwedê ji me nerazî be. Em şoreşgerin, lê me hêj gelek tişt derbas nekirine. Hişmendiya me hêj di bin bandora kevneşopiyan de ye." Ev pirs û hizirandinên di serê wan de derbas bibûn, demekê di navbera xwe de veşartin. Wekî tayê çirkeyan paşve bizîvire, şûna hizirandinên neyênî tiştên baş girtibûn û dilnizmiyek bi ezmûn xwe li bedana hevalê Dilgeş dilefîne.

Ezmûna jiyankiribû vêca berê pirsan dabû wî û li pey sedema diduliya xwe ketibû. Li gorî digot ji xwe pirsî bû û gotibû; "Gelo ez li hemberî hevalê jin bêbawerim, çima pirsên wisa tewş di serê min re derbasbûn? Çima heta niha van pirsan ez dîl girtim û min nekarî ez xwe jê rizgar bikim?. Ma wê heta kengî kiryarên hevalên jin vê dudiliya di hundirê min de ji holê rakin? Hem jîr û hem jî

ji me çelengtir in. Beriya me gihiştine hewara hevalan û cihê xwe di nav şer de girtine. Bi rastî jî ez ne mirovek başim. Di bin fermandariya min de bi dehan hevalên jin hene û qaşo ez fermandarê wan im. Şerme ji min re şerm. Dilgeş şerme ji te re û divê ev mînak ji te re bibe dersek herî mezin.” Van pirs û nîqaşên hevalê Dilgeş bi xwe re kirî, bi rastî pratika wî ya piştî wê demê guhert. Heta di kêliya heyî de derûnî û şêweyên xwe di dêmê wî de didin rû pir cuda dibin. Bi vê rewşa xwe dikeve nav henekan û hewaya berê hatibû çêkirin di kêliyê de ji holê radibe. Hevalê Egîd xwe ji henekên wan xelas dike û dibêje; “Ka werin. Beriya em xwe rezil bikin em vî gundî bîstînin. Nexwe wê gunehê van jinên şerker li ser stûyên me bimîne.” Pênc malên li dawiya gund mane û hola gund ji cenazeyan nayê derbaskirin. Hemû zindiyên gund para xwe ji vî şerî standibûn. Di nava şilahiyê de kiziniya şewatê li derdor belav dibû û tîna agir û baranê bi hev re şerdikirin. Li milekî agir, li milên din jî baran hebû. Toz û dûyê radibe, belçimên rengîn yê bilbizêk, gulebûk û qîvaran dilewitîne. Helak bixweye. Her der hatiye lewitandin. Giha, kulîlk, dehl, zevî her tişt, li ser bihara xwe xemdare. Têr bi bihara xwe şad nebûne. Kelaşên mirîşk, elok û qazan di nav kavlên gundan de milê xwe dane hev. Yên birîndar bi awirên neçar li guleyên ji hewa ve dizivirin dinêrin. Yên sekeratê dikin jî êdî, awirên wan mirinê jî na fitirînin.

Guleyek ya topa sed û bîst, Botanê reş ji xilmişiya şer şîyar kir û veciniqand. Vizîniyek perda guhan biqetîne

ew derbas kir û nîvê mala li berbû bi xwe re li ber hewayê xist.  Ev kêliyek bû Siyabend dîtibû. Dema xwe ji dengê topê rizgar kir bedena hevalê Siyabend li hemberî xwe dît. Di nav şilahiya cilên li ber bû de, rengek tîr yê şil xwe berdida nav axê. Heval Siyabend şehîd ketibû. Bi qîra hevalê Botanê Reş re wekî tu agirekê berdî pûşê deştê li tabûrê hat. Dema gotina navê hevalê Siyabend tê çavê wan sor dibin. Li derdora dinyaya wan stêrk çêdibin. Tiştek li ber çavên wan xuya nake. Her yek li milê xwe de wekî şêrê ji qefesê derbikeve, êrîşê ser wan dikin. Dema ku êrîş dikin, xwe digihînin hevalên xwe yên din. Dikevin êrîşê û milê xwe didin milê hevdu û bi tilîliyên hevalên jin xwe digihînin çeperan. Di demek kurt de gund ji destê El Nusra hat girtin. Yên ji gund di revîn jî  ji aliyê hevalên sekvan ve dihatin kuştin. Êdî hewar veguhezîbû aliyê wan û bê navber ji çar aliyan ve alîkarî dixwestin. Însiyatîf ketibû destên me û me ew ji hev belavdikirin. Bi taybet doçkayên ser maşîna ji bo kêliyên wisa xweşin. Berde û berde heta gule bi weste li ser beriyê diçe. Yê ku westana wê bisekînin xwedê bi wan re bibe alîkar. Ger ew kêlî bê bîra wan. Gula vî şerî hevalê Kawa yê ji Serêkaniyê bû. Bejna wî kurt û gelek bi tevger bû. Ji ber bejna wî kurt bû û dijmin gelek bêzar kiribû, bi erebî jêre digotin;“sexîr.” Mîna teyroka li zinara bikeve geh li vir geh li cihekî din bû. Bêyî ku bê dîtin diçû heta ber difna dijmin û narincok diavêt çeperên wan. Ji hemû çeperên dijmin baldariya vî hevalê bejin navîn tê kirin. Gund hat rizgarkirin û hevalan dest bi oparasyonê kirin. Nîvenga gundê Nendûh bibû bazara

term û kanzayên ji teqandinê filîtîne. Dema heval dest bi oparasyonê dikin ji malên paşê tankek dikeve ber malan û xwe winda dike. Li pey tankê çend cehş jî hene û xwe digihînin kêleka gund. Hevalê Hebûn balê dikşîne ser van malan û bi xwe jî dikeve êrîşê. Serkeftina dawî û coşa hevalê Sadik a roja Newrozê ku cil ji zarokê xwe re biribû di bîrê de bû û dixwest bi vê serkeftinê bizîvire. Serkeftin teqez bû û li benda guleyên dawiyê bû. Tam di wê kêliyê de guleyek ne diyar xwe li bedana hevalê Hebûn da û ew dehfî erdê kir.

Coş û hêviyên me yên siberojê hêza me ya şer xurt dike. Me ji şer narevîne û dibe sedema şerê meyê hebûn û tinebûnê. Wê hebûn her hebe. Ji ber hebûn jiyan e û ne navê yek kesî ye. Hebûn navê jiyana Sadiq e jî. Sadiq bi awayekî lez û bêyî ku ti kes bibihîse ji lawê xwe xatir dixwaze û dibêje;

“Lawê min, min xatirê xwe xwest. Lê ez bawerim tu yê rêça min bigirî. Tu yê çeka min li erdê nehêlî.”

BKC’î ya xwe digire û ji bilî çav û awiran bi hemû giyana xwe slavekê dide hebûn û dikeve êrîşê. Hebûn li pêşiya wî ketiye. Êdî cîhan li ber çavê wî tarî dibe. Xwe di nava heyecanekê de dibîne. BKC’î ya xwe dixe destê xwe û ber bi dijmin de diçe û lê dixe. Xaniyekî digire, di xaniyê duyan de cehşekî birîndar wî şehîd dixe. Ew jî dibe soza hebûn û jiyanê. Hevalê Sadiq heta wê kêliyê jî BKC’î ya xwe ji xwe qut nekiribû. Bîksiya wî bibû perçeyekî jiyana wî. Carekê jî li ser çeka wî qêrêj ango zingarek nedihat

dîtin. Mîna zaroka wî ye lê temaşe dikir û diparast. Çeka wî jî li kêleka wî dikeve û cara yekê ye Sadiq nikare wê paqij bike. Xwîna Sadiq diherike ser şerîd û gewdeya çeka wî. Ew û çeka xwe dibin nîşana paqijî û serfiraziya civaka Kobaniyê. Mîna şanikên jiyanê ên bedena vê civakê bi xwîna xwe dide jiyîn. Çîroka Hevalê Sadiq dibe Sadiqê welatê xwe. Ew jî dibe kulîlkek Newroza destpêka biharê re reng dide xwezayê. Dihêle ku her kes bi ruhê Sadiqan, Hebûnan, Welatan tevbigerin. Dema ku Erdal dibîne hevalên wî şehîd dikevin û di çeperên li pêşiya wî de dijmin heye, bang dike û dibêje;"Hevalno ka werin, pêwîste em nehêlin yek ji wan sax ji vir derbikevin." Lê dixin û heft cenazeyên wan di yek kêliyê de mîna pençeyên baz li termê nîçîra wî dikeve dixin erdê. Dîsa yekî ku ew dibêjin qey mirî ye, ew jî careke din li wir guleyekî malxirab ber dide û tê li hevalê Erdal dikeve. Êdî Peyman jî dibe Peymana Welatê xwe. Peymana şeş rojî ku carekê babê xwe dîtiye, êdî wê bi çîrokên wî, wêneyên wî mezin bibe. Wê bi çîrok û şêwaza lehengî û fermandariya babê xwe bijî. Peymana jiyanê di giyana Erdal de bi axê re hat çêkirin û tevna jiyana peymana biçûk pê hat raxistin.

Piştî şehîdbûna hevalan êrişek dî pêk hat û hemû cihên çeteyan girtîn ji dest wan hatin derxistin. Me cardin gundê Kendalê girt. Ji gel û hevalan herkes li benda mizgîniyek a xêrê bû. Bi dehan mirov berê xwe dabûn eniya lê şer heyî û li benda zarok û şervanên xwe bûn. Dema hevalan agahî dan û gotin me gund girt, coşek

mezin di gel û hevalan de peyda bû. Rûyê mirovan ji bin mija nediyariyan rizgar bibû. Kenek bi mereq û xemtêkel li ser rûyê gel û hevalên me diyar bû. Ji ber hêj encama şer nedizanîn û agahiya wan ji şehîd û birîndaran nebû. Di wê navberê de babê hevalê Erdal çend caran li telefona wî gerî bû. Lê her cara geriyabû bersiv negirtibû. Wekî dilê wî bi şehîdbûna hevalê Erdal hesiyabe ji hevalê li kêleka xwe re gotibû; "Ez dikim nakim, destên min çeka min nagirin. Dilê min dibêje Erdalê min şehîd bû. Hemû hestên min dibêjin ezê wî carek dî nebînim. Ez xweziyê bi hevalên ne zewicî û bê zarok tînim. Ji ber mirina herî mezin ew e, mirov mirina zarokên xwe bibine." Hingî heval hewl didin wî aram bikin û dibêjin ji çeperê derbikeve jî ew ji çepera xwe dernakeve û dibêje; "Hûn vê hestê nizanin. Dilê min pê hesiyaye kurê min şehîd e. Lê ehd li min ketibe, heta ez tola Erdalê xwe ranekim, ez ji vê çeperê dernekevim. Bi rastî jî wisa kir û di çeperek li gundê kêleka Kendalê de ma.

Dema hevalan cenazeyên hevalên şehîd birin bajêr, dayîkan sond xwaribûn ku destpêkê neçin ser termê zarokên xwe. Gotibûn; "Emê destpêkê biçin ser termê fermandar Siyabend û Hebûn. Ji ber ew ne tenê lawên me, fermandar û pêşengên me ne." Dayîkan soza xwe girtibûn û destpêkê çûbûn tabûtên hevalê Siyabend û Hebûn hembêz kiribûn. Paşê çûbûn ser tabûtên zarokên xwe. Jinên Kurd di rojên şîn û hewarê de ne tenê dayîkên çend zarokan, dayîkên civakê ne. Jinên Kobanî jî wisa

bûn. Li hev civîbûn, çûbûn ser termê hevalê Siyabend û Hebûn û bi hev re tilîlî dabûn. Diyardeya dayîktiya li Kurdistanê jî hatibû guhertin. Dayîka te li cihê te lê şer dikir bû. Her jina li wê deverê dibû dayîka te. Tu wekî kezeba xwe pêşwazî dikirî. Ji ber dayîkên wan hevalan ne li wê derê bûn, hemû jinên Kobanî bibûn dayîkên wan, destpêkê li dora wan civîbûn. Rondikên destpêkê li ser wan barandibûn û lorîkên destpêkê ji bo wan gotibûn. Giyana şervanan di kêliyên şer de wisa dibû yek, dayîka kesekê dibû dayîka me hemûyan. Tu li kû bûya dayîka te dayikên li wê derê bûn. Wan tu di dilê xwe de dihebandî, rondikên wan ji bo te dibarîn. Her şervan û lehengek diçû, parçeyek ji kezeba wan dayîkan jî bi xwe re dibir. Rewşa dayikan û tevgerên wan mirov dida fikirindandin û qewal û cejna Şengaliyên kevnar dianî bîra mirov. Li gorî xwe ketibûn nav rîtuelek gelek bi wate. Wekî pêçeka zarokekê li ser destê wan be, herdu destên xwe li raserî terman rast û çep dibirin û tanîn. Te digot qey dixwazin zaroka di pêçeka li ser destê xwe de binivînin û ji wan re bi dengek kezepşewat dilorandin. Ew awayê vegotina êşa dayîktiyê bû nizanim. Lê bi wê dîmenê diçûn heta beriya çend salan ez nizanim. Dibe ku ew awayekî vegotina hezkirinê, êşa qutbûna ji zarokên xwe ya dayîkan be.

Dayîk li wir kom dibin. Heta ber bi êvarê li wê derê dimînin. Dayîkan dixwest êşa ketî dilê wan, bikeve dilê dayîkên ew êş bi wan dayîn jiyankirin jî. Dixwestin termê çeteyên zarokên wan şehîd kirîn bibînin.

Dixwestin bi çavên xwe rakirina tola zarokên xwe bibînin. Rewşa dawiyê ya kujerê zarokên xwe mereq dikirin. Dibe ku ev êşa dilê wan xelas neke. Lê bawer dikirin dilê wan hinekê aram bibe bi dîtina mirina kujerên zarokên xwe. Hevalan termên çeteyên hatîn kuştin kom kirin. Di dema komkirina terman de hejmarek zêde çek û alavên leşkerî jî hatin bidestxistin. Me ew cepilxane kom kir û anî gundê Curnê.

Dema em hatin gundê Curnê, çeteyan xwest êrişî gundê Bîrkêtkê bike. Lê dîsa Nûcan li gundê Bîrkêtkê bû. Dengê hevala Nûcan bilind dibe û dibêje; "Xwe zû bigihînin hevalan, em li vê derê besin. Emê bikarin Bîrkêtkê biparêzin." Heval xwe zû digihînin çeperên pêş û nahêlin çete bi pêş de bên. Di êrişa yekem de li ser hev çeteyan nêzîkî şêşt endamên xwe yên pispor di yek pevçûnê de winda kirin. Şêst endamên wan hatin kuştin. Cara yekemîn bû bi rengek pisporane ji sê aliyan ve êrişî yek eniya me dihat kirin. Dixwestin vê eniya me bixin û ber bi pêş ve bên. Li eniyên Rojava û Qulban jî bi rengê sabotaj, sekvanî û çekên giran êriş hebûn. Li hemû eniyên me pevçûn hebûn.Di şerê Kendalê de ji bo çeteyan jî destpêk hebûn. Cara yekê bû bi hêzek ewqas zêde û pispor ji sê aliyan ve êriş dikirin. Piştî girtina gund di demek kurt de me gund cardin ji wan girt û ev di dîroka şerê wan de jî destpêkek bû. Li gorî wan jî ev rekorek bû ji bo me. Cara destpêkê bû DAIŞ'ê cihek girtibû û me di nava çend deqeyan de dîsan ji wan girtibû. Yanî di rastiyê de Kendalê ezmûnekî pir

girîngbû. Me Daîş di şerê xwe yê Kendalê de xist nava şoqekî mezin. An ku di şevekê de bi hêzekî ewqas pispor û çekên ew qas giran êrîşekî pir mezin dikin. Di kirokiya me li ser wan girtî de plana çalakiyên wan hebû. Ji her eniyê bi komên şêst û pênc kesî, endamên xwe yên pispor êriş kiribûn armanc. Li gorî tiştên diyar kirîn armanc ew bû di nava demek kurd de Kendalê û hemû gundên derdorê bigirin. Ya rast hêzek şerker bû. Ji xwe bi vê hêzê gelek cih ji Artêşa Azad û rejîma Sûriyê girtibûn. Bi xwe bawer bûn û digotin emê di çend deqîqeyan de van gundan jî wisa bigirin. Hem di warê çawanî, hejmar de, hem jî di warê çek û serdestiya teknîkî de hêza wan hebû. Lê wekî dibêjin 'ew ware, lê ne ew bihare' rastî vînek ji pola ya şervanên Kurd hatibûn û bi dayîna ewqas windayî şok derbas kiribûn. Sedema êrişa gundê Kendalê hebû. Hema ne êrişek ji rêzê bû. Gundê Kendalê wekî mifteya deriyê wê eniya me bû. Dixwestin di milekê de derî vekin û hêviyên gel ên bi me bişkînin. Dixwestin vîna me di vê eniyê de têk bibin û bihêlin ku em eniyên xwe yên şer berdin. Hesabê wan hêj li ser tiştên kevin bûn. Me berê Embara Sirînê berdabû. Wan dîsa heman hêvî dikir û digot qey emê vê eniyê jî wisa berdin. Hewl didan erda li ser şer dikin fireh bikin û bi armanca carek din jê dernekevin şer dikirin. Lê encamên me jî ji şerên berê derxistîn hebûn. Me jî biryar dabû em cihên ku dikevinê bigirin û biparêzin. Ev biryara me bû, taktîka şerê me li gorî wê hatibû diyarkirin. Em jî cihê ku têde ne dixwazin biparêzin. Biryar û teqtîkê me eve.

Di wan kêliyan de min jî xwest ber bi gundê Evdiko ve biçim. Sorxwînê bang kir û got; “guleyên B7’ê ji me re bînin.” Ji ber maşînan nedikarî biçin. Min hewlda bi rengekî rast biçim, min gule xistin destê xwe û ber bi pêş ve çûm. Min dît keseke kal li beramberî min sekini û got; “Keça min tu yê bi ku ve biçî?” Min temaşeyî mamo kir, kalek şirîn bû. Diyar bû westiya ye, lê di çavên wî de biryardarî û vîna têkoşînê wekî çirûskekê dibiriqî.  Min got: “Mamo heval guleyên B7’ê dixwazin, maşîn nikarin biçin, ezê ji wan re guleyan bibim.” Mamo temaşeyî rûyê min kir, serê xwe hejand. Paşê dawa kirasê xwe yê erebî xist nav didanên xwe de, dest avêt guleyên di destê min de û ji min girt. Serê xwe rakir û got; “ Keça min, hêj mamê te heye. Tu li vê derê bi şervanên xwe re baxive keça min, ezê biçim. Tu ne ji bo birina guleyan li vê derêyî. Tu şervanên xwe bi rêve bibe.” Ji aliyekê ve ez şad bûm, ji aliyê din ve jî min dil neda ez guleyan bidim wî û ew bibe. Min jê re got; “Mamo tu rê nas nakî?” Ya rast armanca min ji vê pirsê ne ew bû, lê hema carekê ji devê min derketibû. Serê xwe cardin hejand, kenê wî yê şirîn wekî xunavek tenik li rûyê wî belav bû û got; “Keça min, ez zarokê vî welatî me. Ez dizanim li ku derê çend bost erdê me heye. Navê min Hesen e. Ez xelkê vê derê me.”  Min cardin xwe negirt û got; “Mamê Hesen, tu guleyan bide min. Tu kalî, tu nikarî bibî.” Vê carê li ser gotina min bêyî bihizire kenek bi tinaz rûyê wî dorpêç kir. Paşê bi tona dengekî cidî got; “Keça min, di şer de kalbûn nîne. Tu xeman nexwe, te hêj mamê xwe nas nekiriye. Ka tu bibîne ezê di nava çend deqeyan de

guleyên B7'ê bigihînim destê wan." Hêj gotina xwe ya dawiyê tam neqedandî berê xwe zivirand û ber bi cihê hevalan ve ket rê. Ji keyfxweşiyê û hesta şanaziyê qirika min tijî bû. Mamo li ber çavên min wekî bazekê xwe berdabû singa deştê û bi bazdan diçû. Mamo jî peywira pêve diçû baş dizanî. Ger guleyên B7'ê bigihîne wê tank nekaribin bikevin nava gundên din. Ji ber çeteyan dixwestin bên termên xwe yên di dest me de mayîn bigirin.

* * *

Pîrên Kobaniyê xwîn şîrîn in. Ya rast hemû pîrên Kurd xwînşirîn û dêm zarok in. Demek dirêj bû ez li ser dêm û giyana kalên Kurd dihizirîm. Di jiyana mirovên Kurd de du demên jiyan û temenê wan pêwistiya lêkonê li ser heye. Demên wan ên zaroktiyê û pîrbûnê hêjayî serêşandinê ne. Pîrbûn û li jiyanê çavên xwe vekirin gerdûnek bê sînor e. Temenê navîn cîhanî ye û diyare mirovên Kurd ev jiyan nepijarandine. Jiyana koletî, jiyana navîn e û ev aqil ji aliyê mirovê Kurd ve hatiye lanetkirin. Mîna civaka xwe ye, di berbanga civakbûnê de hemû şoreş şoreşên vê civakê ne. Lê mixabin temenê navîn ên şaristaniyê bi aqilek heram û şîrheram jiyan kiriye dojeh û mirovên Kurd di vê jiyanê de ti hêviyê nabînin. Vê têgîn û derûniyê xwe berdaye nav şanikên bedana wî û bêyî hemdê xwe tevger û nexşeyên genetîk diafirîne li ser vê bedenê. Gelek kes car carnan ji pîrên Kurd re dibêjin xurifîne. Lê bi nêrîna min ev bertaka li

hemberî vê jiyana kembax û ji rê derketiye. Mirov dema zarok û pîre nêzî dayikê dibe û ev rastî herî zêde di mirovê Kurd de xwe dide der. Ji ber civaka ev hafiza winda nekirî, ev civak bi xwe ye. Vegera li xweza û dayikê wekî azadiyê tê dîtin. Kalo jî mirovek wisa bû. Ji bilî xwînşirîniya xwe, xwedî bejnek navîn û zirav bû. Simbêl û riyên wî mîna axa peravên Firatê spîgewrî bûn. Esmeriya wî weke çarikek ji teniyê reş bibe bi tîrêjên rojê reş bibû. Dibe ji tava biharê be jî lê reşiyek xwînşirîn bû. Çavên di nav dêm û rûyê esmer de dibiriqîn, wekî ciwanek çarde salî dida nîşan.  Çav pîr nabin. Çav wekî xelata xwezayê dayî mirovan her ciwan in.  Xweza ji bo xwe ciwan bibîne, dîtin li çavên mirovan barkiriye û kiriye mizginiya hebûnê. Kalo û xweza xwedî şirîkiyek balkêş a jiyanê bûn di çavên min de. Bihare û bêhna axê ji zû ve cihê xwe ji bêhna gul, sosin, beybûn û terezinan re hiştiye. Giyayên wekî tolik, xerdel, xulîşîr, kerbeş û qîvar jî li çokê didin. Dîmenek ji derveyî bermayên şer gelek xweş kalo dorpêç dikir. Çav, bi lezek ti caran makîneyên dîmenan nedikarî xwe bigihînin leza wan dîmen li pey dîmenê dikişand û di hişê min de tomar dikir.

Gotinên kalo li wêneyên serê min zêde dibûn û gotinên wî yên beriya biçin xwe berdidan ser perdayên guhên min. Ji nav wêneyên heyî de bi carekê ve min dît çavê wî di nava serê wî de sorbûne û got; “Ezê nehêlim ew tank werin van terman bigirin. Emê wan terman hemûyan bînin vê derê.” Bi rastî mamo bi rev guleyên

B7’ê gihandin wan û tankan nekarîn bênterman bigirin. Piştî pêşî li êrişa çetayan hat girtin û paşve revîn, hevalan pîqapek birin ji bo anîna termê çeteyan. Mamo li pêşiya pîqabê siwar bibû. Dema gihişt gel me, bi rûyekî ji xwe bawer û şad got; “Keça min, min ji te re negotibû em nahêlin ew bên? Te mamê xwe dît? Ez mamê te me. Min kêm şer û zehmetî nedîtine. Belkî ez nikarim wekî van ciwanan bibezim. Lê dema erd û warê me, dema mijar bû şervanên YPG’ê, YPJ’ê dizanî yên kor dibînin. Yên ker dibihîsin. Yên bêling dikarin bimeşin. Êdî doza me bûye dozeke mezin keça min. Bila dilê te nemîne, lê li şûna ev ciwan şehîd bikevin, bila ez li dewsa wan şehîd bikevim. Bila hema ev tank were li ser cenazeyê min re derbaz bibe, heyanî heval xwe amade dikin. Min ji bo wê nexwest tu biçî. Nexwe baweriya min bi qasî çiyên Kurdistanê bi we heye.” Gotinên kalo di serê min de diçûn û dihatin. Mirov bi per dikir û difirand. Giyana bûye çardesalî bi hemû ciwantiya xwe derbasî nav dilê me dibû. Ev ruheke, kalên welatê me jî dizanin ev şereke demdirêje. Kiryar û gotinên Mamo ji fîşeng û hemû çekên şer hîn xurtir bûn. Digot; “Emê carek din nehêlin ev erd were dagirkirin. Me berê pir ji destê vê dagirkeriyê xwariye. Êdî em nikarin weke berê nêzîk bibin. Pêwîste kal, jin, zarok her kes tevlî bibin. Ez dikarim guleyên B7’ê ji hevalan re bibim. Ezê vê bikim. Yekî din dikare di mewziyê de be yan jî bikeve êrîşê bila wê bike.” Ez bi gotinên wî re kûr çûbûm. Gotinên wî bandorek mezin li ser min kir û wî jî ev yek dîtibû.

Mamê Hesen keserek kûr kişand û got; “Keça min emê her yek bi rengekê tevlî bibin.” Ma em ji fermandarê xwe çêtirin? Ji Hebûn, Erdal, Welat û Sadiq? Van qehremanan û yên ku pêşengî ji me re kiribûn ciwanbûn û nû gihiştibûn bihara temenê xwe. Bûkên desthinekirî di mal de hiştin. Ger ez bimirim jî tiştek li min nabe. Xwezî ez li cihê wan hemûyan şehîd bibûyam. Zarokên wan bê bab mezin nebûyan.” Bi gotinên dawiyê re çavên wî şil bûn. Xema di dilê wî de di rûyê wî yê li ber tavê qemitî de wekî giyayê ji bin axê serê xwe rake diyar bû di wan şoven qermûçkan ên kûr de. Min dizanî ez nikarim pêşiyê li xema wî bigirim. Min destê xwe danî ser milê wî û got; “Mamo, ev şer e û şer rastiyek dijwar e. Lê em soz didin heta ji me bê em hewl bidin êdî zarokên gelê me bê dayîk û bab mezin nebin. Nebin penaber, li kolanên xelkê bêxwedî neminin. Ji bo azadiya vî gelî çi, ji bo çavên dayîk û zarokan êdî rondikên janê ne rijînin çi ji me bê emê bikin. Ma em çi bikin azadî tiştekî zore. Eger bedela azadiyê ne wisa giranbûya, emê îro ne li vê derê buna. Azadî bê bedel nabe.” Te digot qey ji asîmanê dilê kalo çend taviyên xemê li ser dilê min barîne. Ez jî bi şiliya di çavên xwe de hesiyam. Kalo serê xwe rakir, çavên min û wî yên şil rastî hev hatin. Destê min xist nav kefa destên xwe û got; “Keça min bi rastî tu dizanî ax ji hemû tiştî şirîntire. Tiştek wekî axê nîne. Eşqa axê, eşqa xaka pîroz na şibe ya ti tiştî. Berdêla wê bi ti tiştî nayê pîvan. Bila her tişta te hebe. Lê ger axa te nebe, welatê te ne azad be, ti wateya heyîna tiştên dî nîne. Ti tişt nabe ax û welat. Mirovên bê welat, bê ax dimînin miriyên sax in.”

Mamo bêyî ku bisekine, wekî bixwaze gotinên di temenê xwe hemûyê de kom kirî bêje destê min şidandibû. Gotinan ji devê wî wekî libên tizbiyekê kit û kit bi pergal derdiketin û xwe li perdeyên guhên min didan. Destê min hinek dî şidand û got; “Dibe ku zarok bê bav û bê dê bimînin. Dibe ku mal xirab bibin. Ma eger azadî nebe ev jiyan ji çi re ye?  Ka bêje me çi jiyan kir keça min? Qey jiyan tenê henase girtin, xwarin û vexarin e?” Te digot qey kalo gotinên Rêber Apo bijartine û dibêje. Ji min re wisa dihat ku ez guhdarî gotinên Rêber Apo dikim. Şîret û gotinên wî hestek xweş û aram di dilê min de çêkir. Min ji xwe re got; “kalên welatê me zanyar û zana ne. Gotinên Rêber Apo baş fêm kirine û di jiyana xwe de pêk tînin. Kalo jî dizane ger azadî nebe ti kes nikare bibe xwedî mal û milk.” Min li çavên wî temaşe kir. Wekî bêje ewqas hestyar nebe, beşişî û çavên xwe danî ser hev. Min ji xwe re got; “Êdî kiyê bikare hêviya vî gelî bişkîne? Vî gelê dikarî sera mirîşkekê, li ser bostek ax, çend kesan ji hev bikuje niha bûye xwedî zanista Rêber Apo û zanayên wekî kalo.” Wekî ku kalo nava dilê min, hest û ramanên min di çavên min de bibine hizrên min bi gotinên xwe piştrast dikir. Got; “Ha, ev erdên niha em li ser şer dikin tu dibînî? Me berê ji bo van erdan gelek mêr ji hev kuştin. Lê bi kêrî ti tiştî nehat. Paşê Ereb anîn û li ser axa me bi cih kirin. Hem me ji hev kuştin, hem jî me û gelên din mirov ji hev kuştin.  Lê niha ev şer naşibe wan şeran, ev şer şerekî pir cuda ye. Ji bo ev erd êdî bêxwîn û şer bimînin niha ev şer tê kirin. Ev erd û axa bab û kalên me ye. Daxwaz û hêviya min ji xwedê ew e,

beriya ez bimirim ez dawîbûna vî şerî û azadiya Kurdistanê bibînim.”

Piştî vê nîqaşê û şûn de bi nîv saetê min dît kale me û ciwanên ku li wan derdoran hebûn hatin. Hevala Peyman jî di nav wan de bû û bi spehîtiya xwe ji dûr ve diyar dibû. Pora wê ya dirêj ku bi ser cilên wê YPJ’ê ve xwe berdabû jêr bala mirov dikişand. Te got qey bi ava zêr hatiye şûştin anjî têlên zêrîn in. Dema hevala Peyman hat ser doçkayê û dema doçka avêt, kalo li derdora wê dizivirî û digot; “Bijî Serok APO û ha kezîzera min wisan lê bixe.” Bi vî awayî cihê gule bên avêtin jêre tarîf dikir û dest bi koordînekirinê kiribû. Got; “ha bavêje vê derê, ha erebe ji wir de tê, ha tank di wir de diçe. Biavêje ez çiçikê te bixwim” Her ku hevala Peyman guleyek diavêt kalo xwe li erdê dixist û digot; “hey tu çavê minê, hey tu ruhê minî.” Û dest bi moraldayîna derdor dikir. Hemû li derdora doçkayê kom bibûn. Ez çûm û min got; “çima hûn hemû li derdora doçkayê kom bûne.” Mamo bersivek şîrîn da min û got; “bihêle, bihêle hûn dizanin di welatê me de çiqas guhertin çêbûne. Zilam sekinî ne û keç şer dikin. Keça min bihêle bihêle, bila eşqa vê jiyan bikin. Tu dibînî Peymana me çawa lê dixe?” Min got; “Niha hewanek bê nava we bikeve hûn hemûyê şehîd bikevin, tiştek nebaşe ji vir biçin.” Kalo got; Ka bihêle, ka bihêle bila bi dilê xwe bikin. Keça min, tu dizanî ev hestek çawa ye?” Wekî ku min fêm nekiribe min got; “Mamo hestek çawa ye?” Mamo mîna lehiya biharê diherikî û ji coşa wî re gotin

nebû. Pêl bi pêl diherikî û wisa bersiv dida; “Ho, ho mamo. Dema berê, me ji keçên xwe re di got nikare biçe ber derî û piyanek av bîne. Îro em bîst-sih zilam li derdora wê kom bûne. Çawa doçkayê davêje û li hedefa xwe dixe. Tu dizanî ev hestek çawa ye? Belkî te ev tiştên ez dibêjim jiyan nekirine. Lê ji bo me hemûyan tiştek cuda ye. Tê bêjî qey filmeke û em lê temaşe dikin. Aha, Rêber Apo ev civak ava kir. Ma ji vê xweştir çi hest heye?” Dema wisa got bi rastî, dilê me nexwest ku ji derdorê biçin. Lê min îşaret da Peymanê û min gotê tu hinekê doçkaya xwe ji wê derê bibe. Min nêrî kalo got; “Ho ho, hema em şehîd jî bikevin tiştek nabe.” Min jî got, “mamo wê derê nebaşe hûn hemû li wê derê kom bûne.”

Wê gavê rûyê hevala Peyman sor bibû. Dema min li Kalo û Peymanê temaşe dikir min sedema rûsorbûna Peymanê fêm nekir. Di nav wê qiyameta sor de pilqînî û şerma rûyên hevalan bi min balkêş hatibû. Mamo xwe windakiribû û her diçû sorbûna ruyê hevala Peyman zêde dibû. Çend hevalên xort pişta xwe dabûn Mamo û dikeniyan. Ha ji mamo morala wan bi gotinên wî zêde dibe û gotin li ser gotinê dikir. “Ha lêxe peymana min, ez çiçikê te bixwim.” Mîna hevalên xort jî ji bîr nekiribe; “Van kuçikan hîn gunreşê me nedîtine. Ka bila bên dora mirinê ya wan e. De lêxe çavê mino, berxê mamê xwe.” Bi gotinên Mamo re ji şerma baldariya şer ji bîr kiribûn û li dora doçkayê kom bibûn. Min jî bi dengkek bilind gazî kir ku ji hev belavbibin da ku çekên dijmin tiştekî bi wan nekin.

Êdî dijmin dît kû ev hêzekî ne hêsanî ye. Yanî hem şerê Kendalê, hem jî şer û pevçûnên di Sewana Sirînê de hatî kirin bi dijmin da qebûl kirin ku eger dixwaze li hemberî vê hêzê şer bike, divê bi rengekî din şer bike.

Ala Kurdistanê bi dîmen û bûyerên şênber di hate nexişandin. Beriya Kobaniyê bi xerdel û gulebûkan tijî bibû. Xwîna hevalên me û xweza têkel hev dibû di vê bihara rengîn de. Alên gelan jî wisa tên nexişandin û bi nirxin. Pêwîste ev dîmen ti caran ji ber çavên mirov neçin. Ev dîmenê ku min di wê kêliyê de dîtî, di dîtina her çavên hevalekî de tê bîra min. Wê demê ez dizanim ku bedelê azadiyê ne hêsaniye. Wek Rêber APO jî dibêje, "Eger azadî hêsanbûya mirovan bedena xwe nedişewitand." Lê azadiya tu li serketina wê digerî, pêwîste tu di mejiyê xwe de baş bi cih bikî. Tu wan kesayetên ku navên xwe bi tîpên zêrîn nivîsandine, pêwîste ku tu tim zindî bihêlî. Wê rojê ber bi êvarê êdî gel berê xwe dida Gundê Cirin. Bi qasî sed-du sed maşîna tijî hatin gundê Cirin serdanê. Bi coşek pir mezin digotin; "Raste me şehîd dane. Lê me dijmin şikand." Termên çeteyan ên ku bi hêjmareke zêde li panava Gundê Cirin hatibûn rêzkirin rastî vê serlêdanê hat. Her çiqas me nexwestibe li vî dîmenê nexweş bê mêzekirin jî bûyerê ji zû ve însiyatîfa me derbas kiribû. Dema ku wan kal û dayîkên dilşewitî li wan dinêrîn digotin; Ma heqê we çiye, me êrîşî we nekiribû, we êrîşî me kir."

Hewaya vê hêza hov û kirêt li derdor dabû avakirin, gotina ayetên wan berevajî kiribû û kê yek ji van kuştibûna wê biçûna buhiştê. Gelekî seyre ku van kirêtan hestek mirovahiyê di derbarê xwe de nehiştibûn. Herî hebûna bihest gûman jêre nîne ku dayike. Lê mixabin nîşanek nêzî mirovbûnê nehiştibûn û mirov li ser laşên xwe jî hêrs dikirin. Mirovên xwedî dê û bab bûn. Ev tiştekî mirovî ye. Lê ev têgîn jî nemabû ji bo wan. Ji bo xwe ji halê mirovbûnê derbixînin gelek perwerde dîtibûn û bi ser jî ketibûn. Dayikên me ji dûr ve li wan dinêrîn û li hemberî vê dîmena heyî li mirovbûna xwe dihatin şikrê. Nimeta herî mezin mirov mayîne û li hemberî vê dîmenê ev bi dehan caran dihat ispatkirin. Em ji cejna hezdikin û bi xwezayê re lihev in. Hewaya cejna Newrozê xelas nebibû û êşên vê hêza hov reşandibûn ji aliyê baya Newrozê ve difirî û dipekî.

Gelê me yê hatî vir xwarin û vexwarin anîbûn û bi tilîliyan wekî cejnê pîroz bikin tevdigerîn. Digotin, “Wan xwestin Newrozê ji me re tarîbikin. Lê emê bi rik nehêlin. Emê bi ruhê Newrozê her roj Newrozê pîroz bikin.” Ji bo wê van şehîdbûnan û berxwedana li vê derê hat kirin, di berxwedana Kobanî de cihek girîng girt. Tevî êrişên hovane jî ew pêla tirsê wekî cihên din belavî nav civaka me nebû. Pêşiya wan bi lehengî û berxwedana hevalên me hat girtin. Vê berxwedanê di gel û hemû hêza me de bawerî û vînek mezin çêkir. Hişt ku mirovên me careke din li hemberî dijminê xwe bibine xwedî biryarek herî mezin. Bi rastî jî çekên ku me bidestxistin

jî moralek pir xurt da avakirin. Raste me bedel dan, lê me hemû êrîşê wan şikand û me hertişt berevajî kir. Cara yekê bû El Nusra ango Daîş li ser xaka Sûrî dihat şikandin û hêviya wan a serkeftinê lewaz kiribû. Diviya baş bihizirin ku li hemberî kê şer dikin. Serê wan li tehtê ketibû û ji serxweşiya serkeftinê hişyar bibûn. Tişta li vir dihat pîrozkirin, berdewamiya Newrozê bû. Kurdan cangoriyên xwe bi cejna Newrozê pêşwazî dikirin û datanîn ser dilê xwe. Newroza me piçekê jî şer û berxwedane. Xebera şehadeta hevalê Siyabend belav bibû û hemû eniyên me dixwestin cihê fermandarê xwe bigirin. Berî em werin wan nespêrin axê. Hemûyan digotin divê em hevalên şehîd bibînin û wisa li axê bên spartin. Kobanî piştî vî şerê destanî ketibû nav liv û tevgerê. Vî şerî bandor li ser herkesî kiribû. Bandora vî şerî xwe berdabû nav hemû şanikên zindeweriyê. Kurê hevalê Sadiq heta vê kêliyê jî cilên xwe ji xwe nekine û li benda babê xwe ye. Di êvara 22 yê mehê de şehadeta babê xwe dibihîse û bi bazdan diçe ber tabûta babê xwe. Çep û rast diçe û dike qîr. Dayika wî, wî digire û bi hev re diçin ser tabûta wî. Di wê kêliyê de dayika jêre dibêje; “Lawo ezê negirîm. Ji ber babê te cil dane te ji bo tu mezin bibî. Tu jî weke babê xwe bibî qehremanê welatê xwe. Tu jî weke babê xwe bibe Sadiqeya serê xaka xwe.” Dayik jî mîna lawê xwe dil bi êşe û ji kurahiya dilê xwe dilorîne; “Kurê min ezê negirîm. Ezê rondikan nebarînim. Sadiqê min bû sedeqeya welatê xwe. Nebû rêwiyê ku di rêyekê de mir, nebû nexweşekî di nava nivînên xwe de mirî. Nebû keseke ji bo tiştekî xirab hatî

kuştin. Ew bû sedeqeya welatê xwe. Ewê azadiyê mîsoger bike. Welatê min, lawê min divê tu xemgîn nebî. Tu ne bê babî. Tu nebêjî babê min nîne. Babê te bû stêrkek li ezmanan. Wê her roj biriqandina xwe bide ser û çavê te. Êdî tu yê bi gotinên bavê xwe û pesnê babê xwe mezin bibî kurê min.”

## GIRÊ SÊVÊ

Li ser vê xakê gir gelek pîroz in û ez bawerim ji berê ve wisa ye. Dema mirov li van deveran şerê mirin û mayînê dide hîn baştir sedema pîrozbûna wan fêm dike û dizane çima gir ewqas pîroz in. Peyvên kevnar dema li cihên xwe tên pêşberî mirov, hêza xwe baştirîn didin hîskirin. Ji ber van rastiyên hanê giyana peyvan heye. Pirsên bê bersiv û ji kûrahiyê bêpar hest û mêjiyên mirov ditevizînin û dixin nav şanoyek mat mayî. Ezmûna zeman û mekan a li hemberî peyvên kevnar şermiyek veşartî diafirîne li ser wîjdana mirov. Peyva gir û gloka ji tayên teşiyê peyda bûye di ser yek demarî re xwe berdaye nav sînga axê. Bermahiyên ji wan kêliyan mane bi awayek lal û bi hêrs siya xwe berdidin nav dîmoxa mirov. Ji glokê heta peyva gir û têgîna mezinbûnê bi zemanên qetandî xwe radîxîne ber çavan. Qetandin û ji azadiyê dûrketin bi hemû giraniya xwe, xwe di kêliya vî zemanî teng de bi me dide hîskirin. Mêjî û hîsên mirov gelekî balkêşin ku gelek caran fêrbûnên demê perdeyek

şilû datîne ser wan tiştên balkêş. Di wê kêliyê de, di nav têz û kanzayên goştçir de wêneyek Rêber Apo hate bîra min. Herdu destên xwe pesartibûn dîwarek kelhê û dîwar dafdida. Gelo ev wêneyê hanê çima hate bîra min û mêjiyê min çi ji min re digot? Zemanên qetandî bandoriyek gelekî mezin li kar û tevgerên me jî dikir. Dîrok di mêjiyê me de hatibû qetandin. Di rastiya xwe de temenê me jî wisa bû. Qetandina ji zaroktiyê û ji dîrokê yek tişt bû. Min niha baştir Rêber famdikir. Ger dîrok baş bê xwendin xwedî hêzek gelekî mezin e. Di nav rûbarên ku herîkîne ser bendava Sumer ê herî mezin li kêleka me diherikî. Çanda ku xwe ji rûyên axê xişilandibû nav gund û bajarên Sumer jî li hemberî me bû. Neviyên Sargon û Gûtiyan piştî çend hezar sal şûnde dîsa li hemberî hev bûn. Bajarê ku navê Agade lê hatibû kirin, li gorî gelek arkeologan ji peyva azadiyê dihat ango azadî ji wir. Ji ber berî zilma Agade ti wateya azadiyê nînbû ku peyva wê jî bê peyda kirin. Sargon li ser bajarê Sumeriyan Agade avakiribû. Azadiya Agade bi laneta xwedavenda pêk tê. Hêzên Gûtiyan bi hewara xwedavendê tên û bajar dûz dikin. Dibe peyva azad û Agad ji yek wateyê jî bên. Kêliyên em li ser vê axê jiyan dikin, hestên wisa dîrokî bi mirov re dida çêkirin û jixwe dîrok niha ye.

Ew nêzîkî du mehan bû, şerekî derûnî û serkeftina derûniyê dihat jiyankirin. Daîş hatibû sekinandin û hêzek ne li bendê derketibû pêşiyê. Hêza ku gef li dewletan dikir û bajar di nîv saatê de dixist destê xwe hatibû sekinandin. Daîşê dixwest her deverê reş bike.

Şerê rengan jî li dijberî hev bû û hêzek renghez ketibû pêşiya vî ewrê reş û tarî. Deng xweşên xwezayê, dengbêjên van deveran şalûl, bilbil, hechecîk û firindeyên din bidengê xwe yên di bin hiş de tevlî coşa renghezan dibûn. Bihar li vêdê ji her aliyê cîhanê biheybetir û biwatetir tê pêşwazî kirin. Ji ber ku hişiyarbûna xwezayê ya li ser vê erdnîgariyê jiyaye ji her derî mûhteşemtire. Gerdûn, xweza her tişt li vêdê herî kêm biqasî mirov zindî û candar in.

* * *

Girê Sêvê girek biçûk be jî kî dizane xwediyê kîjan serpêhatiyên mezin bû.  Kî dizane kîjan leheng, şahînşah, dilhev û dilevînên vê xakê çokên xwe li ser tewandine û temaşeyî vê xwezayê kirine. Ez vê nizanim, lê tişta dizanim bi qasî kela Amedê pêwistiya me pê hebû. Ev dever ji bo herkesî stratejîk bû û bala hêzên şer dikişand ser xwe. Raserî rêya M-5 ku mîna demarê şah yê Sûriyê tê zanîn e. Daîşê êrîşê vî girî kir û 12 hevalên me şehît xist. Hevala Hêlîn Amed, Xabûr, Rengîn û Zelal bi wan re jî hinek hevalên din jî şehîd ketin. Şahadeta wan hevalan bandorek zêde li ser avanî û derdorê kir. Gumanên me çêbûn ku agahî girtine, lewma wisa hêsan êrîş kirin. Ji ber gelek gundên Ereb jî nêzî me hebûn. Ew gir ji bo me jî gelek girîng bû. Gotibûn emê êvarî vir bigirin û sibehê jî gundê Boxazê bigirin. Di nav van pêşketinên heyî de me yekser wek rêveberî civîna xwe lidarxist. Me biryar da ku çi dibe bila bila bibe, divê em vî girî îşev ji destên

wan bigirin. Hemû hevalên rêveberiyê di mijara girîngiya vî girî de di yek nêrînê de bûn. Di nava gel de jî guman pêş ketin ku ger ewder di destê dijmin de bimîne kes nikare li gundê xwe bimîne. Şahadeta heval Xabûr û birayê wî jî bandorek mezin li gel kir. Diviya em di warê siyasî û leşkerî de bandorek erênî bikin. Ji ber me ewder weke kelhekê xurt kiribûn û me wisa dikarî em wan gundan biparêzin. Gelek şehîdên herêmê jî hebûn. Heval Xabûr û birayê xwe ji gundê Berxbotanê bûn. Gundê herî girîng jî ew gund bû. Me ewder ji dijmin re bihiştiya diviya em hemû gundan vala bikin. Li wê derê deh gund hebûn.  Me hêza xwe ya veşartî kom kir û biryara êrîşê da. Di pêşengiya fermandar Emîn Erkendî de komek heval xwe plan kirin. Piştî çalakiya Kendalê ger li wir bimayan dê moralek mezin bigirtiyan. Dixwestin ji aliyê Sirînê ve jî êrîş bikin. Lê me ev şans ne da wan û me ewder jî girt. Her hevalek rêveberiyê li ser gurubekê bi baskên bakur, başur, rojhilat û rojava ve xwe birêxistinkirin û tevlî guruban bûn. Di çavê hemû hevalan de kîn û nefretek pir mezin hebû. Bi rastî jî ne di 24 saatan, di yek saatê de ev gir ji çeteyan hat paqijkirin. Hatibûn genim, lê ji garisê malê jî mabûn. Êdî nekarîn garisê malê jî biparêzên.



Di cîhazan de qîr dikirin me Girê Sêvê girtiye. Ji ber cihek stratejîk û li ser ava Firatê serwerbû. Ne dibû di dest dijmin de bimîne. Ger dijmin di wî girî de bimaya wê ji aliyê taktîk ve jî em bixistiyan nav xetimandinek mezin. Ne tenê ji aliyê taktik ji aliyê civakî, taktîk, aborî, derûnî û her weke din ve jî bandorek neyênî çêdikir. Me jî ne dikarî em çeperên xwe berfireh bikin. Wan çawa ji nişkê ve êrîşî me kir û gir ji destê me derxist; me jî bi heman rêbaza ew qet ne li bendê bûn êrîş kir û me gir girt. Di çûna ser gir de ger me gir negiriya wê rewşek ji herdemê xetertir derbiketiya pêşiya me. Hemû hevalan bi hêrsa tolek mezin êrîş kirin. Li ser hemû cîhazan qêrînek mezin a serkeftinê bilind bû. Wan jî texmîn ne dikir emê di heman şevê de êrîş bikin. Heta saet yekê şevê me gir hemû girt. Heval Rênas û Rûken Amed di gir de şehîd bûn. Me doçkayek 23 û yek 12,5 û çekên wan tev rakirin. Çek û cepxaneyek zêde li ser wan hat girtin. Ji bo me jî ev

cepxane gelekî girîng bû. Pêdiviya me jî bi van çekan hebû. Vê çalakiyê rojevek mezin û erênî ava kir. Ti hêzan ne karîne di heman saetan û rojê de cihekê ji Daîşê bigire. Lewma bi çavek cuda li me temaşe dikirin. Êdî wan jî hemû hêzên xwe yên pispor dicivandin û wisa bi plan êrîşî me dikirin. Êdî wan jî ji xweber êrîş nedikirin. Dema lewazî didîtin êrîş dikirin. Di çalakiya Girê Sêvê de dijmin dît ku hêza me fedayî ye. Dema em dixwazin em dikarin her cihî bigirin û êrîş bikin.

Şerê Kobaniyê mîna vingîniya kevir a li ser avê çemberên hemrêz li pey xwe çêdike bû. Vî şerî têra xwe Kurd anîn gel hev û di yek dilê de bi cih kir. Di dîroka têkoşînê de rastiya herî balkêş sekna Gelê Bakur a li ser sînor bû. Ji aliyekê ve gel li hember dagirkeriya Tirk berxwedanî dikir, ji aliyek din ve jî di eniya Rojava de şervanên azadiyê şer dikirin. Her du aliyan hêzek mezin dida hev. Sekna wan a li gel eniya şer bi xwe serkeftina azadiyê mîsoger dikir. Têlên hatibûn raçandin hemû hatin pûçkirin. Gel bi hêz, berxwedanî, têkoşîn û vîna xwe hemû planên Sykes-Pico vala derdixist. Vî şerî eşkere danî holê ku hest û ruhê hemû beşên Kurdistanê bi hev re ye. Rastiyek din jî bi xwe re derxist holê. Her hêzê dît ku hêza gelek hatî rêxistinkirin û biryara azadiyê dayî şikandin wisa ne hêsan e. Gel kêlî bi kêlî nefes bi nefes şer dişopand û bi me re jiyan dikir. Vê jî dihişt hêz û manewiyata me ya şer û berxwedanê bilind bibe.

## KUN HEFTAR

Şev zîze. Fîşekên xetat yên ji eniya DAİŞ ve diteqîn wekî rasthatî belav dibin. Dengê fîşekên cor bi cor tevlî dengên Firatê dibin û winda dibin. Xwimîn û gumîna çemê Firatê hemî dengên heyî didabelîne û bi xwe re dûr dibe. Elenda heyvê wekî zeraqî dadikevin ser rûyê Firat. Pêlên Firat yê dibin tîrêjên şewqê de bi şev jî tên dîtin xwe bi kubarî li ba dikin. Pêla nîvî wekî masûra keziyan bi ser hev ve tên hunandin û ber bi ne kifşbûyînekê ve diherikin.

Şevên havînan berî xweş e û çavên mirovan têr dike. Baya hênik a li rûyê axa qemîrî dikeve bêhnek beriyî li henaseya mirov zêde dike. Şemamok û fêkiyên bostanan wekî para xwe lê zêde bikin buhiştek ji bêhnê çêdikin. Ji çav û difna mirov re dîmen û bêhnxweşiyên bêmînak rû didin di van kêliyên beriyê de. Dîtinek bê pîvan a erd û ezman sehekên mirov bi cezbê dixin. Mîna talibên bê şêx û mela zikrek xwezayî li bedana mirov dilefîne. Tîrêjên tariyê diqetînin, wekî cergebezekê nexşa ronahiyê radixin. Mîna û mînakên bê dawî dibe para çavên şevînî. Gir û girikên li sînga beriyê çikilandî, dibin hevbirê bayên hênik ên ji çar alî ve tên û dilê mirovan zîz dikin.



Li raserî Firat Girê Kun Heftarê hebû. Wekî şervanên gelê Kurdistanê YPG-YPJ ji bo em bikarin Kobanî ji êrîşên Daîş biparêzin, me biryar da em li ser Girê Kunheftarê kelhekê çêkin. Ji ber ku Kunheftar di qada xwe de girek serwer bû. Ji Pira Qere Qozaqê bigre heta bi girê Sêvê û aliyê Rojava robarê Firat diket di bin çavdêriya Kunheftarê.

Me wekî boseyekî li derdora gir xendekek kola. Di hundirê boseya mezin de me boseyek din çêkir. Navbera her du boseya bi qasî pênç, şeş metra bû. Boseya duyemîn me wekî coyek sergirtî çêkir. Me di hundirê wê de dîwarek biqasî metreyek û nîv stûr lêkir. Banê wê jî me bi betonek stûr girt û me ew bose veşart. Me di boseya duyem de du derî hiştin û me derî jî xef çêkirin. Boseya duyem me bi axê nixwimand û bi giştî veşart. Me

hesabê em bikaribin bi mehan di wî girî de şer bikin dikir. Hizra me ev bû; em di boseya yekem de şer bikin û di boseya duyem de xwe bi parêzin. Me boseya duyem ewqas qayim û xef çêkir, ew karkerên di çêkirina wê de xebitîn jî nezanîn deriyê wê li kûye. Tenê hostayên wê û hevalên me yên berpirsên gir dizanîn ew derî li kû ne.

Vê kelhê bala dijminê me jî kişandibû. Rêya giştî di nêzîkî Kunhefatrê re derbaz dibû û rojane bi sedan tirimpêl diçûn û dihatin. Dîsa bi xebata dihat kirin dijmin pê hesiyabû em Kunheftarê vedegerînin kelhek bi wezbet. Kunheftar girek serwerbû û heke xebata tê kirin biqediya, wê ev ji bo dijmin jî bibûya kelemek mezin.

Nîvê şevê nû wexirîbî. Hê çêkirina kelha Kunheftarê dewam dikir. Xendeka duyem nû qedabû û me hewl dida em bircek ya çavdêrkirinê di nîvê gir de ava bikin. Ji êvara wê şevê ve eniya DAİŞ’ê bi tevger bû. Ji hemî rewşa wan kifş bû dê wê şevê êrîşî eniyek me bikin. Nêrîna hevbeş a hevalan, dijminê êrîşê Girê Sêvê bike. Lê demjimar 12.45 êrîşî girê xweser yê YPJ kirin. Berpirsa girek yê parastina Girê Sêvê dike hevala Roza ji berya hingê demekî nêrîna xwe ya ‘dijminê êrîşî girê xweser bike” bi me re parvekiribû.

Hevalên jin ên di bin fermandartiya hevala Diljîn de hew dinêrin cehşên DAİŞ’ê ketin di nav wan de. Heval bi bombeyan li wan didin û dijmin bi şûn de direve. Di heman demê de ji dûr ve Girê Sêvê jî gule baran dike. Teybet bi çekên giran li Girê Sêvê didan.

Piştî van êrîşên derdor yên qismî min guman kir dijmin dixwaze hedefê şaş bike. Ji bo bala me belav bike êrîşên qismî tîne ser hedefên cuda. Di şeran de ev tektîkek kevin û tê zanîne. Ji bo tu bala dijminê xwe belav bikî, êrîşî hedefên li derdora hedefa esîl dikî. Bi êrîşê û vekişandina çeteyan re hêza li rastî êrîşî hatî dihizire ku êrîş beralî kiriye û hêstên şkestina dijmin wê hêzê bêtetdbîr dihêle. Ha, di wê xalê de dijmin êrîşê hedefa xwe ya esîl dike û di rûxîne. Ji ber vê îhtîmalê min hemû heval û bi teybet hevalên Kunheftarê hişyar kirin.

Ya ez fikardar dikirim qewimî bû. Armanca Esîl ya cehşan Kunheftar bû. Demjimarek û nîv piştî nîvê şevê êrîşê Girê Kunheftarê kirin. Ji berya hingê me eniya gir ya dikeve aliyê dijmin mayin kiribû. Dijminê dixwaze biçirize xendeka mezin ya gir bose dike, dikeve di nav mayînan de û şer destpêkir. Dijmin bi hemî çek û şiyana xwe êrîş dikir. Ji bo Girê Kunheftarê bêxin û nehêlin kelha tê çêkirin biqede bibiryar bûn. Biqasî pênç-şeş KM eniya dijmin diket bin venêrîna vî girî û heke ev gir were asêkirin eniya Firatê ya dijmin jî wê bikeve tengahiyê de. Lewma ji bo ev çeper neyê asêkirin dijmin bi biryar bû her tiştî bike.

Di gir de heta demjimara sê ya berê sibê şer ajot. Êrîşên dijmin şikestin û yê bişkên. Dijmin bê qeyde kuştî dabûn û me jî bawer kiribî ku dijmin şikest. Tam di vê demê de dijmin li gir dizivire û êrîşê çepera xwecihan dike. Çepera xwecihan ya qontrola rê dikir û me wekî asayîş

bi nav dikir dişkêne û cihê xwe berdidin. Bi vê xala vale mayî re dijmin li hêza me ya gir diparêze dizivire û bi piş ve dubare êrîş dike.

Maşînek doçka barkirî di xala hêza xwecih, asayîşê re berê xwe da gir û hevalên di gir de gulebaran kirin. Hêza xwecih ji beriya wê demjimarekê cihê xwe berdabûn û revîbûn. Di şer de pişta hevalê xwe berdan û revîn tewanek girane. Hêza cihê xwe berdayî jî di ferqa vê rastîyê de bû û newêrîn me agahdar bikin. Heke dema cihê xwe berdayîn em agahdar bikiriyan, me yê cihê wan dagirtiya.

Piştî maşîna doçka barkirî ket di gir de em hemû şaş man. Hêza me ya di gir de dihizirî ku maşîn ya me ye. Ji ber vê, destpêkê ne xwestin li maşînê jî bidin. Piştî ji hevalên derdor pirskirin û zanîn maşîn ya dijmin e, maşîn û pêre jî cehşên peya gihan xendeka mezin. Tarî bû û me ti tevgerên wan ên mirovan nedidît. Nîşana êrîşa wan kanzayên agirî yên tariya şevê diqelaştinbûn. Xumînî bi bêtêlên wan ketibû û ev jî ne xebera xêrê bû. Tîrêjên fîşek û stêrkan hev hembêz dikir û têkelî hev dibûn. Stêrkên agirî strihên gir derbasdikirin û mîna gelewêjan dipekîn.

Demjimar ji çarê berê sibê kêmekî derbas bibû. Dijmin bi çekên giran û bi hêzek mezin ya cehşan gihiştibû Kunheftarê û serdestiya şer ji hevalan standibûn. Di rastiyê de heval şewilîbûn û yê çibikin nedizanîn. Ne dixwestin Kunheftarê berdin. Heke Kunheftar biketiya

destê DAİŞ'ê de, di serî de girê xweser û hemî derdor diket xetertiyek mezin. Hevalê Kendal (kordîna giştî) û Fermandarê Girê Kunheftarê hevalê Azad bi rêya bêtêl û telefonê li çareyekê digeriyan.

Piştî heval û dijmin di gir de biqasî bîst deqîqeyan sing bising şer kirin, hevalê Kendal ji Fermandarê hêza Kunheftarê, ji Hevalê Azad re got;

"Xwe ewle bikin. Bi teybet haya we ji wan hosta û karkerên sifil hebe. Bila tiştek bi wan neyê, zarokên wan sêwî nemînin. Ezê ji hevalê Cûdî re bêjim, bila bi çekên giran li dijminê di gir de bide."

Segurê hevalan bi giştî xwe vekişandin tûnêlê û hêza DAİŞ'ê bi giştî gir girt. Piştî hêza dijmin bi giştî gir girt û ne kes, ne jî termê kesî ne dîtin şaqiz mabûn. Me guhdarî bêtêlên wan dikir; ji hev re digotin; "ji berya pênç deqîqeyan di vî girî de bi dehan kesî şerê me dikir û niha ne sax û ne mirî ti kes di holê de nîne." Vê rastiyê tenê hêza dijmin ne şaqiz kir û hem jî rewşa wan ya ruhî ji bin ve hilweşand. Ditirsan û nezanîn wê çibikin. Li gorî wan erd şeqitî û hêza me di tê de çûbû xar. Yan jî hêza me bûye xefkek û yê aha niha wan daqurtîne.

Piştî berbanga beyaniyê bû. Roja sor bi tîrêjên xwe aso dikuta. Taritîya şevê qul bibû û dinya keşaf bû. DAİŞ, bi hêzek mezin, top û doçka ketibû girê Kunheftarê û hevalên me jî di çembera xef de asê mabûn. Ew kesên xwecih yên çepera xwe berdayîn û revîn çûbûn gund û

agahiya dijmin Kunheftar girtîye û hemî hevalên di gir de şehîd xistine belav kiribûn. Nûçeya nexêr zû belav bibû û sehwek dilqelqîn hemû gundî rakiribûn ji piya. Kom bi kom gundî kom bûne û li rêyek ya revê digerîn. Qêr û qelebalixek xwirîmiye û yê çi bikin nizanin. Bi rastî gundî mafdar bûn. Heke Kunheftar bikeve mayîna gundiyên derdor ne gengaze. Heta dikarim bêjim yên can şîrîn ji zû ve xwe gihandine gundê Boxazê jî.

Hin kes hene ne fermandarê mezinin, lê di xala mayîn û nemanê de dikairin bi dehan genaralên şer bavêjin quncikekê û bibin suweyda ser dilan. Aha Hevala Roza jî şervanek wisa bû. Di xala herî teng de derdiket holê û ya tu xebîrên şer texmîn nekin ewê dikir.

Dema destpêkê dijmin êrîşî Kunheftarê kirî û piştî Hevala Roza texmîn dike hevalên di gir de ketine di tengahiyê de, bi serê xwe du hevalên jin digre, doçkayê tîne û xwe dighîne nêzîkê gir. Û çaverêyî wê bêhna bibe suweyda ser dilan dimîne.



Piştî dinya keşaf bû, hêza dijmin hevala Roza bi doçkaya wê ve li ber pozê xwe peyda kir. Roza, bi doçkaya xwe bê navber gir dihingê ve. Ji hevalên di gir de re digot; “Hûn li kûne bêjin, da ez bikaribim li dijmin bidim.” Hevalan

got; “Pirsa me neke. Tu serbestî. Li her cihê dikarî bide.”

Mîla demjimara elefirîgî nû ji pêncê borî bû. Ser tîrêjên rojê tarîtiya şevê bi giştî tinekiribû û Girê Kunheftarê rût û tazî li holê mabû. Hêza DAİŞ’ê wekî zerzûla qirên reş gir nixwimandibûn. Hevala Roza bi doçkayê li wan dida û cendek diqulipandin ser hev. Hêza cehşan pê hesabûn heval di tûnêla bin erdîn de ne û di kulekokên nefes girtinê re bombe tavêtin hundir de. Lê, bombeyên tavêtin tesîr ne dikir û ji bo hevalên di hundir de mayîn tine bikin,plan li ser planan çêdikirin. Dawî biryar dan qazyaxê bînin û hevalan di hundir de bişewitînin.

Diviya me tiştek bikiriya û hevalên xwe bi gir ve ji destê cehşan rizgar biriyan. Ez, Hevalê Sefqan û hevalê Kendal hatin cem hev. Me li ser lingan civînek pênç deqîqeyî kir. Me biryar da, em fermanê bidin Fermandarê Çekên giran hevalê Cûdî û bi çekên giran gir bombebaran bikin. Di bin bombebarana çekên giran de êrîşê Kunheftarê bikin û ji cehşan rizgar bikin.

Di vê navberê de hevalê Cûdî bi çekên giran ve gihat cem me. Ji bo bi serê xwe êrîşî gir bikin hevalê Şoreş bi du hevalan ve, hevalê Şivan bi du hevalan ve û hevala Nûcan bi hevalekî ve hatin cem me. Jixwe hevala Roza bi hemî karîna xwe Kunheftarê dihingêve.

Hevalê Cûdî berê doçka, hewan û topên xwe li gir Heftar rastkirin û qiyameta sor di serê hêza cehşê ya ketî gir de anî. Hevalê Kendal bi hêzek heval ve ber bi gir ve çû. Me

her sê hevalan di nav xwe de kar parvekir. Ezê bi hevalên di hundir re eleqeder bibim. Hevalê Sefqan bi teqwiya hevalan ve û hevalê Kendal wê bi hêza çekên giran re tevbigere.

Heta demjimar heşt û nîv, nehê me bi çekên giran li gir da. Aliyê gir yê baskê Çemê Firatê ve ji me ve naxweyî û hêza cehşê xwe vekişandiye wî alî. Hêza cehşê û 22 hevalên di hundirê tûnelê de mayîn li ber hev didin. Cehş hewl didin hevalên di hundir de tine bikin. Lê çawa? Dikin nakin çareyekî peyda nakin. Li ber dîwarê tûnelê mayînan ditqeînin lê tesîr nake. Bombeyan tavêjin di hundir de dîsa tesîr nake. Fermandarê wan bi rê ve dibe bi bêtêlê ji wan re dibêje; "çi dibe bila bibe, di vê hûn wan kesên di tûnêlê de tinebikin û qetiyen gir bernedin."

Fermandarê cehşan ji wan re got; "ezê ji we re mazotê rêkim. Paçan li mazotê hilînin, bêxin kulekê bêhn standinê de û agir berdinê. Bi vî awayê hemî kesên di hundirê tûnêlê de wê bifetisin."

Heta hingê kêm jî be ez dilniyabûm. Ez ji tûnêla me çêkirî bawer bûm û min digot; "Heta em Daîş'ê ji gir derxînin nikarin tiştekê bi hevalan bikin." Lê vê plana Daîşê dinya li ber çavên min tarîkir. Rika singa min li dilê min teng bû û di bêhn sitandinê de min zehmetî kişand. Wextê min nemabû û divîya bi lezgînî tiştekê bikim.

Hevalên di hundirê tûnêlê de mayîn jî heta hingê kêm jî be dilniyabûn. Ema piştî vê fik û agahiya Daîş'ê êdî ew jî

tirsihan. Fermandarê hêza di tûnêlê de mayî Azad Rojhilat, cêhgira wî hevala Dêrsim, Arjîn, Zîlan û hosta û karkerên sifîl yên bi çêkirina bircê ve mijûl tam 22 kes di tûnêlê de asê mabûn.

Êdî sebra gundiyên derdor jî nema û ref bi ref ber bi Girê Kunheftarê ve dihatin. Ti kesî pakî ji top û guleyên dehşê ne dikir û her kes amadebû êrîşî gir bike. Qiyameta sohr rabûbû û diviya tiştek hatibûya kirin.

Demjimara hev tajot û roja sor bi tîrêjên xwe ava Firatê dihingavt. Toz û dûmana ji ber çekên şer radibû çêlên tozê radikirin û dibêjîqey ev girên tozê wê rojê dabelînin. Gel bi zarokên xwe yên di hundirê tûnelê de mayîn re bi telofênê taxivîn û agir bi kezeba dayikan diket. Gel, li cihê cebilxaneya me lê ye kom bibû û rê nedida heval cebilxaneyê derxin.

Zilamek Kobanî yê bi temen hebû. Ji berya demekî keçek wî ya bi navê Sozdar di nav refên HPG'ê de şehîd ketibû û em jê re dibêjin Bavê Sozdar. Qûtvantiya hevalên wir dikir û mirovek pir wêrek û dildar bû. Keçek û kurek yê wî jî di tûnelê de mabûn. Hat cem min û qet ne axivî. Lê awrên wî, xetên rûyê wî ji bo em zarokên wî rizgar bikin lave dikirin. Min cesaret nekir li awrên bavê Sozdarê binêrim. Min ji Hevalê Azad Rojhilat re got; “Telefonên hevalên di hundir de kom bikin, bila kes bi derve re ne axive.”

Her ku dem derbaz dibû hêvîya rizgarkirina hevalên di hundir de jî kêm dibû û derûniya wan xirab dibû. Ji nivî bêhtir hevalên di hundir de hosta û karkerên gundên derdorin. Zarok û hevjînên wan hatine cem me û bi telefonê bi wan re taxivin. Fermandar Hevalê Azad Rojhilat û cîgira wî hevala Dêrsim hewl didin moral bidin hevalên di hundir de. Lê heke em di demek pir kurt de tiştekê nekin û xalekê ne deynin pêşya vê çûyînê diyare ya em jê ditirsin nêzîke.

Cehşên DAÎŞ'ê li ser pişta tûnêlêne û bîst û du hevalên di tûnêlê de asê mane. Cehşik bi hemû hêz û karîna xwe hewl didin kunekê li tûnêlê vekin û hosta, karker û şervanên kurdên di tûnêlê de bi awayek herî xwînxwar tine bikin. Di navbera mirin û hevalên me de tenê bostek betona hişk heye. Heke kunek herî piçûk jî li tûnêlê vebe an jî deriyê tûnêlê bibînin her tişt xilas dibe. Dijmin di kulekên nefes standinê re bombeyan tavêje, li ber dîwarê tûnêlê bombeyan diteqîne, li derî digere, bi tevr û bêran li cihê gomana vekirinê dikin dikulin û ji bû kunekî li tûnêlê bikin her tiştî dikin. Hevalan bi qelandinê, birajtinê, ser jêkirinê û her tişta xof barkirî tehdît dikin. Êdî heval û cehş bi hev re sohbetek tehl dikin. Heval bi bêjeyên ew bi xwe jî jê bawer nakin û cehş bi peyv û gotinên misoger gefan li hev dixwin.

Keçek Bakurî hebû, ne ji zû ve tevlî YPJ bibû. Jixwe razî û pir qure bû. Bi bin xwe re li her tiştî û li her kesî dinêrî. Hema bêje her kes bi paşverûtî û feodaltiyê tewambar

dikir. Dilxwede hatibû me hemûyan pêş bixe û wekî xwe modern bike. Ew jî di nav wê refê de bû û di wê tûnêlê de mabû asê. Serê gavê bi min re bi telefonê taxivî û biqêr û helaket digirî. Di rastiyê de wê kesê ji bilî Fermandar Azad û cîgira wî Dêrsim bandorek neyînî li tevayê avaniyê kiribû. Hin kesên di hundir de mayîn vexwimabûn, hin ji hiş çûbûn û her ku diçû hîvîya xwe ya rizgar bibin winda dikirin.

Hamirek ya me ya destçêkirî hebû. Hostayên hêsinkar tirimpêlek asayî bi hêyînê pola pêçabûn. Me xwest em bi wê tirimpêlê bikevin di gir de û heval û gir ji cehşan rizgar bikin. Di ketina gir de cehşan çend bisfing li nav guhê hamira me dan û şervanên di hamir de hemû gêj kirin. Bi zor û kutekî hamira me xwe ji nav lepên cehşê rizgar kir. Kêr gihabû hestî û yek saniya em winda bikin ne mabû. Li bakurê Kunheftarê çend kêlometran cihek hebû. Kobaniyan jê re digotin “mezrê.” Xaniyek du mezel yê hişedarê kozê li wêderê bû. Me jî wekî tedbîr hin cebilxane danîbû wî xanî de. Gundî, dê û bab û tevayê gelê gundên wê herêmê li derê wî xanî kombibûn. Qir û qiyemet bû. Dor li cebilxaneyê girtîbûn û dixwestin em zarokên wan rizgar bikin. Hevalê Sefqan û hevalên din yên li wêderê kerixandibûn û êdî hevalan nedikarî ji ber wan cebilxaneyê derxin û derbas bikin.

Hevalê Sefqan hewara xwe gihand min û got “ez nikarin gel bidim sekinandin!” Dema dîtin ez hatim tevayê girsê ber bi min ve hat. Pora dayikan qij bûye, tozê dêmên

wan nixwimandiye. Hêstirên ji çavên wan dibarin li ser hinarkên rûyê wan cok çêkirine û ev cok di erzinga de diçin xar. Bab şebikîne û nav milê wan daketine. Ji her devî laveyek û ji her zimanî gazindek bilind dibe. Kes dengê kesî nake û herkes ya xwe dibêje.

Piştî êrîşa me ya bi hamirê encam negirt, jixwe hevala Nûcan bi hevalek keç ve, hevalê Şivan bi du hevalan ve û dîsa Hevalê Şoreş bi du hevalên din ve wekî dildar û bi pêşniyara xwe, xwe amadekirine bi şêwazek fedayî êrîşî gir bikin. Hevalên navborî li cem hevalê Kendal rawestane û ji bo êrîş bikin xwe amade dikin. Lê dixwazin pir bombe bi wan re bin û cebilxaneya me ya bombe tê de jî di nav girseya gel de maye û heval nikarin ji gel xwe bigihînin cebilxaneyê. Di rastiyê de ji bo ez bikarim gel ji rêya cebilxaneyê bidim aliyekê û heval bombeyan bigihînin refên fedayî hatim.

Refên fedayî amadene û bi yek nîşana min bê xişwaşî wê êrîşî Kunheftarê bikin. Ne tenê refên wekî dildar xwe amade kirîn, bê şik hemû avaniya me fedayiye û amadene êrîşî gir bikin, cehşê derxînin û hevalan rizgar bikin. Lê, ev fedayiyên çiqasî bigihîne armancê ew ne diyare. Ji ber ku cehşê bi hêzek mezin Kunheftar girtiye. Jixwe me bi destê xwe Kunheftar vegerandiye kelhek ya şer û niha cehş di wê kelhê de ye û yên keleh jî çêkirîn di bin gir de bi mirinê re têkoşîn dikin.

Ez hewaketim ser pişta tiripêlê û min bi dengek qêr got "ka guhdar bikin, ji bo em bikaribin bi hev re baxivin!"

Bawerim ji dengê min zêdetir ji dîtina min bandor bibûn. Ji ber ku rewşa min ya dîtinkî ji ya wan dayikan pir kambaxtir bû. Her biskek ya pora min li aliyekê dinêrî, li ser dêmê min teqna herîyê çêbibû. Toz û xwihdan tevlî hev bibû û rûyê min di nav de mabû.

Ez derketbûm ser pişta tirêmpêlê, min bi çend qêran û bi bandora dîtina xwe ya ne asayî girse bê deng kirîbû. Lê niha ezê ji wan re çi bêjim min ew nedizanî. Di jiyana xwe de cara yekê bû gotin bibû girêkek kor û di qirika min de asê mabû. Qirika min a ji têhna, ji qehra, ji kerba qelişî, te digot qey bûye depoqan û gotina bernade. Cehş çaverêyî hatina mazotêye û canê hevalên me yên di tûnêlê de mayîn bi saniyan ve daleqayî mabûn.

Çavên tevayî girseya li beramber bi lêvên min ê şeqitî ve daleqayî mabûn û ew gotinên hêvî barkirî ji nav lêvên dernediketin.

Li ser gotina min çend dayikan bi hev re gotin, "Erê lawo tu nebîyî dayik û tu nizanî kezaba dayikan çawa diperite!"

Van qêr û gotinên bişewat yên dayikan ez hê bêhtir ji derb xistim û vehejandim. Dilê her dayikekî carekê di şewîtî. Lê bi rastî jî yê min wê bêhnê bîst û du cara. Lê ezê vê rastiya di hinavê min de erdhejê çê dike çawa ji van dayikan re vebêjim, min ew nezanî.

Dîsa Serok APO giha hewara min! Dema refên hevalan ber bi welat ve ji cem Pêşengtiyê, ji akedemiyê vediqetan Serok digot; "Bi erzanî şehîd nekevin, bi ketina her hevalî re xwîn ji dilê min tê!" Min jî ji dayika û bavan re got; "Belkî her yek ji we carekê dilê we dişewite, lê yê min bîst û du caran. Roj ne roja xwe şebikandin û girî û lavaye. Yan xwe ji rêya cebilxaneyê bidin aliyekê ji bo em bikaribin bombeyan bigînin hevalan, yan jî keremkin em bi hev re êrîşî Girê Kunheftarê bikin û mayîn û mirinê bi hev re jiyan bibin."

Li ser vê gotina min dayika Sozdar derket pêş. Dayika sozdar, jinek gir û bilind bû. Terlikek qetayî bi lingê wê ve dixirikkî û rengê rûyê wê di nav toz û hêstaran de hatibû guhertin. Jixwe Sozdar ji berya wê demekê şehîd dabû û niha jî keç û kurek yê wê di tûnêlê de li ber mirinê ne.

Dayika Sozdar, li girseya rêya cebilxaneyê girtî zivirî û qêrek dijwar da û got; "Hevala Meryem rast dibeje. Dem ne dema girî, gazind û lavaye. Heke em dixwazin zarokên me rizgar bibin, divê em bi şervanên xwe re bibin alîkar."

Û ji hevjînê xwe re got; "Rabe here ser karê xwe û qût û xwarinê bigihîne hevalan." Paşê jî da ber tilîliyan! Vê hêlwesta dayika Sozdarê ji hezar serkeftinan bêhtir bandor li min û herkesî kir û girse hejand.

Tam di wê navberê de zilamek dîn ji nav girseyê derket û yekser berê xwe da min. Ji xwe êlekek xwe ku ji paç û maçan çêkiriye. Serê qetek qeblo bi êlek ve kirî ye û serê din di nav tilîyên xwe de hişk girtî ye. Şûtikek kesk û sor û zer bi enîya xwe re hişk şidandiye. Biskên pora wî ya dirêj tevlî hev bûne. Delingên şalê xweyê meydan ji salan re dixwendin kirine ber goraya xwe ya sak sist de. Pêlavek mekaba qetayî, pehniya wê şikandî di lingan de ye. Bi awrên tûj û dijwar ber bi min ve tê.

Dîno, bi devoka Kobanî û bi helwestek aciz got; "Ev çito dibêje!"

Hevalekê ji Dîno re got; "Ev fermandara me ye."

Dîno, bi awayek şaqiz mayî kêmekî li ser û guhê min temaşe kir. Bi pişt re tevayî kelaşê min di moxila çavên xwe re derbaz kir û bi helwesta leşkerek bibiryar hat ber min û silavek leşkerî da min û got;

"Ez dixwazim biçim gir xwe bi teqînim!" Û li girseya gel zivirî.

"Hevala Meryem rast dibêje. Heke hûn mêrin, dem ne dema girî, gazind û laveye. Werin em bi hev re êrîşî Girê Kunheftarê bikin û xwe biteqînin!"

Di şeran de hin bêhn hene mergê fermandarên herî dil qayim digrin, diguvêşin û di nav lepên xwe de perîşan dikin. Tam di wê gavê de helwestek herî biçûk neyênî an jî erênî bandorek kilamet li mergan dike.

Aha ew helwesta dînîtî ya Dîno bandorek ewqas erênî li min kir ku peyva vê spehitiyê bîne ziman belkî jî hêj mirovtiyê peyda nekirî ye.

Dema min hewl dida rêya cebilxaneyê vekim û bombeyan bigihînim refên fedayî, hevalên fedayî bi hevalê Kendal re planek nû çêkiribûn û ketibûn tevgerê.

Hevala Nûcan, hevalê Şoreş û Şivan her yekî du hevalan girtibûn û li hamirê siwar bibûn. Hevalên din jî bi çekên giran wekî taviya teyrokê gule dibarandin ser gir û nedihiştin hêza cehşê serê xwe rake. Kengê hamir nêzîkê hikmê çekên cehşê dibe hevalên fedayî xwe ji hamirê tavêjin û hamir bi şûn ve direve. Cehş ferq nake heval ji hamirê daketine. Şivan bi du hevalan ve ji milekê ve, Şoreş bi du hevaln ji milê din yê gir ve dikevin êrîşê. Hevala Nûcan ya derê tûnêlê bas nas dike jî di parastina hevalên ketîn êrîşê de xwe digîhîne deriyê tûnêle û ew jî dikeve di tûnêlê de. Bi pê re jî hevala Roza ji aliyê Girê Sêvê ve, Ebu Leyla ji aliyê Çemê Firatê ve û Hevalê Dilgeş jî ji aliyê Pira Qereqozan ve êrîşî gir kirin.

Di navbera deh deqeyan de hêza cehşa Kunheftar girtî maliştin û cehş ber bi çemê Firat ve revîn. Hêza hevalê Ebu Leyla, ji bo pêşî li cehşên direvin bigre ket tevgerê. Evê jî zeravê cehşên direvin qetand û bêhna mirinê li ser patika xwe hîskirin.

Hevala Nûcan ketiye tûnêlê de û hewl dide hevalên ji têhnan, ji tirsan û ji psîkolojiya cehşê bi gefên xwe li wan

barkirî ji nîvî zêdetirê wan vexwimayîn moral bide wan û hêvîya rizgariyê di ruhê wan de biçîne. Piştî Nûcan dikeve di tûnêlê de jixwe hevalên ew heft demjimar û nîve bi mirinê re têkoşînê dikin pir şad û keyfxweş dibin. Hatina Nûcanê bê şîrove nîşanên serkeftinêne.

Hingê destpêkê refa fedayî êrîşî gir kir û yek ji deriyê tûnêlê bidest xistin û hevala Nûcan ket di tênêlê de hevalên fedayî ne xwestin heval zû ji tûnêlê der bikevin. Dixwestin gir baş ji cehşan paqij bikin û pişt re heval derkevin. Bêguman di serî de Hevalê Azad Rojhilat, Dêrsim û hin hevalên din zû derketin û tevlî şer bûn. Lê di serî de karker û hosta û hin şervanên ji têhna vexwimayîn û pir tirsayîn jî di kunê de man.

Gav li pey gavê em hemû gihiştin gir. Cehş direvin û heval di pey wan dene. Mejîyê me hemûyan li şer qulf bûye û bi vê kelecanê me hevalên di kunê de mayîn ji bîrkirin. Derî vekirîye. Yên di tûnêlê de li ser hişê xwe hene û dikarin derbikevin. Lê ewqas tirsane û hêvîya rizgarkirinê windakirine hêj jî bawer nakin hevalan Cehş ji gir derxistine û newêrin xwe bilepitînin.

Piştî ez gihiştim ser girê Kunheftarê hevalan cebilxane û kelaşên cehşa yên li cêh mayîn di nîvê gir de kom kiribûn. Di vê navberê de hin hevalan xwestin tûnêlê venêrin. Piştî heval ketin di kunê de û temaşe kirin, piranî hevalên di kunê de hêj jî di kunê de ne û qismek ji wan vexwimayî ne. Hevalan ji min re gotin, hin heval şehîd ketine. Ez jî çûm. Bi rastî jî qismek heval vexwimyî

û bê hiş li erdê bûn. Piştî me nabza wan temaşekir, me dît tenê ji ser hişê xwe çûne. Piştî heşt demjimara me bîst û du kes sax û silamet ji Kuna Girê Kunheftarê rizgar kirin. Û kelha xwe ya Kunheftarê jî.

# BEŞA DUYEM

# BERXWEDANA ENIYA ROJAVA

## ZORMIXARÊ

Zormixarê gundekî li ser ava Firatê ye. Nêzikî Cerablûsê ye, tenê av di navbera wan de heye. Dema xeta trênê çêkirine, pirek çêkirine, têkiliya wir û Cerablûs wisa dibe. Gir li raserî gunde. Gir ji ber avê û xîza li ber avê hatî bûye gir. Gundê Zormixarê jî li jêrî vî girê xizê hatiye çêkirin. Gir wekî qeleyekê hatiye çêkirin, qereqoleke. Metre û nîv dîwarê wê heye, ji ser wî girî hemû taxên Cerablûsê tên dîtin. Hevalên me digotin em vir bikin kelha keçikan. Ji ber hevalê jin gir diparastin û gir di bin berpirsyartiya wan de bû.

Navê Cerablûsê Kirkamîş e. Darên çam lê hene, ew rê diçe heta Amanosê. Li gorî mitosekê ewder cihê Gilgamêş e. Dibêjin ji bo avakirina şaristaniyê û bajaran dar ji wir birine, li ser ava Firatê berdane heta ku gihiştine cihên xwe. Di her demsalê de çandini lê dibe. Aliyê bakur hemû darên zeytûn û fistiqanin, milbimil, rêzin. Tê bêjî qey li ser paçekê hatiye nexşkirin û ji destên hostayekî nexş derketiye. Li aliye rastê yê gund, gundên Ziyareta bakûr û rojava hene. Zormixarê gundekî nêzîkî Kobaniyê ye.

Di wî gundî de hêzekî me ya çekdar hebû, parastina cihek girîng a xeta Rojava dikir. Li wê derê di bûyerek bi jan de, di bin fermandariya hevala Berfîn de komek heval şehîd bibûn. Ji wan hevalan heft hevalên jin bûn. Şehîdbûna van hevalên me ya di demekî wisa nazik de, wêrektî da dijmin. Li gorî agahiyên hevalan dayîn, me çete bi roj dikevin nav darên zeytûnan û veşartî heta nêzîkî hevalan tên. Ew bi mehan bû hevalên me di çeperan de û li wê eniyê gelek caran êriş pêk hatibûn, lê êrişên çeteyan hatibûn şikandin. Cehşan demek dirêj plana êrişek veşartî kiribûn, hevalên me şopandibûn. Saet nehê sibê piştî heval derdor çavdêrî dikin û bawer dikin tiştek neyênî nîne, ji derveyî hişedaran hevalên dî dinivin. Destpêkê dikevin cihê hevalan, hêj heval di xew de êriş dikin û pevçûn derdikeve. Paşê bi çekên giran dikevin gir, pevçûn dijwar dibin û di encama berxwedanek mezin de heval şehîd dibin.

Piştî rojek derbas bû û êriş ne sekinîn, me hevalên mayîn paşve kişandin. Berê êriş dikirin û di demek kurt de an pêş ve dihatin an jî bi wê êrişê re sinôrdar diman. Lê vê carê heman tişt nebû. Bi tank û çekên giran ketin gir, di gir de man. Piştî rojek-du rojan me dît ku ev di êrişên xwe de pir bi rikin û dixwazin van cihan bidest bixin. Bi awayekî lez êriş dikirin. Êrişên wan ne wekî yên berê bûn. Berê êriş dikirin, piştî êrişan vedigeriyan. Lê vê carê cihê ku êriş dikirin digirtin û lê bicih dibûn. Di wan rojan de Rêber Apo rewş li Îmraliyê şopandibû, biryara serferberiya giştî ragihandibû ji bo Kobaniyê. Ji ber

dorfirehiya êrişan ji me baştir dîtibû. Ev êriş ne ji rêzê bûn. Di heman rojê de li aliyê gundê Kunheftar û gundê Sebetê yê Ereban jî êriş kiribûn. Van êrişên hemwext û dorfireh armanca wan eşkere dikir; dê bimayan, li herêmê xwe bicih bikiriyan. An ku êrişên dagirkirinê bûn. Di xwestin bi van pêş êrişan hêzên me yên li eniyên pêş lewaz bikin, ger ji wan bê hemûyan tine bikin û xwe bigihînin navenda bajarê Kobaniyê. Her di wan rojan de li Cerablûsê gel kom kiribûn, ji wan re gotibûn; "Xwe amade bikin, heta roja înê, biçin nimêja xwe ya înê li navenda Kobaniyê bikin.  Bi taybet li Cerablûs, Minbic û xeta li rojavayê Kobaniyê gel ji bo vê amade kiribûn. Dixwestin bên Kobaniyê dagir bikin, kesên aligirên wanin lê cih bikin.

Gundên Kurdistanê yên li du aliyên sînorê di navbera Bakur û Rojava de jî li beramberî hev in. Di vê xeta ez behs dikim de gundên wekî wekî Zormixarê, Aşmê, Ziyaret, Çariklî û gelek gundên din hebûn. Ev gund li ser sînor in, tenê di navbera wan û gundên li bakur de têlên sînor hebûn. Çeteyan dixwestin wê xetê bigirin. Ji ber di wê xetê de, ji aliyê sînorê Tirkiyê ve ji wan re teqwiye dihat. Tevî berxwedan û pevçûnên dijwar ên du rojan, Zormixarê ji me girtin. Dema ku gihiştin gundê Ziyaretê, xwestin hevalên me bixin çemberê û li pişt wan bizivirin, çemberekî teng li derdora hevalên me bigirin.  Ji xwe demek bû di hemû êrişên xwe de heman textîk bikar tanîn. Dema diketin cihekê, hewl didan derdora hêza li hemberî xwe bigirin, wan bixin nava çemberê û wisa

tine bikin. Di aliyê xeta Firatê re, an ku ji aliyê sînorê Tirkiyê ve xwestin navbera hêzên me qut bikin. Hemû hesab û planên xwe li ser wê çêkiribûn. Me jî li beramberî vê hewldana wan hewl dida, em êrişên wan bişkînin. Di vir de ya baş ew bû ku me êdî dorhêla êrişên wan fêm kiribû, textîka dimeşandin dizanî. Ne tenê ji aliyekê ve êriş dikirin, çend cih di carêkê de didan pêşiya xwe û wisa êriş dikirin. Hemwext êrişî Qulban, xeta Sirînê û Eniya Rojava kiribûn. Beriya wê gelek caran di aliyê eniya Rojhilatê Kobaniyê re êriş kiribûn, lê êrişên wan bê encam mabûn. Bêguman, wan jî li gorî xwe textîk û stratejiyekî ya şer dimeşandin. Bi qasî me ew jî li ser riyên encamgirtinê dihizirîn. Ji ber di şer de ne aliyek, du alî hene. Her du alî lewaziyên hev, aliyên hev ên xurt û lewaz dipîvin, li kêliyên firsendan digerin. Wan jî bi pêngava xwe ya nû hewl dida ji vê taxtîkê encam bigire, wekî berê ne tenê li cihekê, di gelek cihan de êrişkirin xistibûn pêşiya xwe. Di şer de her hêz li pey encamgirtinê ye. Hewl dide hêza xwe li gorî pêdiviyên heyî rêxistin bike, bixe qada şer û bi taxtîka dimeşîne xizmeta armancên xwe yên sereke bike. Armanca çeteyan ax û welatê me dagirkirin bû. Me jî li beramberî wan bi berxwedanekî mezin şer dikir, dixwest em rê li pêşiya dagirkerî û êrişên li ser axa xwe bigirin, gelê xwe ji tevkujî û talanan biparêzin. Armancekî diyar, hêzekî bi vê armancê re girêdayî û ji xwe bawer dike dê axa me dagir bike hebû li hemberî me.

Di pevçûnên kurt de derfeta henasegirtinê heye. Lê di şer û pevçûnên domdirêj de tu nikarî yek çirkeyê jî xwe ji cih û çepera xwe bidî paş, henase bigirî. Di vê eniyê de bi rojan bû şer hebû. Hêza me ya şer ne tenê li hemberî çetayan, her wiha li hemberî germayê, tîbûnê, birsîbûnê, westan û bêxewiyê jî li ber xwe dida. Tava rojê wekî bistên hesin germiya xwe berdida nava bedena me, ji germê bedena me dihat daxdan. Bi wê germê re xwihdanê xwe ji laşê me berdida û bi çûyîna her dilopek xwihdan re tîna me zêde dibû. Neyîna avê qirikên me zuha dikir, her xwezîdaqurtina me dibû mîna dasiyekê û li qirika me asê dima. Hin roj hebûn mîna şevê bûn ji ber toz û dûkêla ji çek û bombeyan bilind dibû. Ji aliyekê ve çekên kesî, ji aliyê din ve bi topên hewan û lûleyên tankan ax dihat kutan û ji singa axê toz û dûmanek reş bilind dibû. Di kêliyên wisa de mirov şev û roj tevlîhev dikirin. Ji ber pevçûn û şerên giran, birsîbûn, tîbûn û bêxewiyê bedena mirov diweste. Carna mirov di rakirina laşê xwe de zehmetiyê dijî. Di her gav avêtinê de tu dibêjî qey du beraş bi piyên te ve girê dane, bedena te dibe giraniyek li ser giyana te.

Ji bo şervanekê çepera xwe parastin, heta kêliya dawî li hemberî dijmin şerkirin rûmet û serbilindahiya herî mezin e. Lê carna hêza bawerî û vîna mirovan li hember xwezaya mirov dişkê, ji nişka ve tiştên tu nexwazî derdikevin pêşiya te. Ew kêlî di encama deswerdanekî berevajî xwezaya mirovan de rû dide. Mirov li hember birsîbûnê dikare li ber xwe bide. Lê laşê me yê ji sedî

heftî û pênc ji avê pêk tê, piştî çend rojan li beramberî şertên zehmet xwe ranagire. Lewma carna di çeperan de hevalên me ji tîna ji ser hişê xwe diçûn. Dibe ku ji bo yên demên wisa dijwar nejiyayîn ev yek sosret bê dîtin. Lê divê neyê jibîrkirin ku mirovên şervan jî tevî hemû hêz, vîn û baweriya xwe ya bi serkeftinê mirovin û ne heyînên awarte ne. Di wan kêliyên ku dengê fişekan jî ji me re wekî dengê avê dihat de, carna me berê xwe dida ezmanan. Tirêjên tavê jî mîna me di reşiya dûkêla çekan de winda dibûn, wekî jinek bi rûpêş rûyê rojê xwiya nedikir. Tenê di nav toz û domanê de hinek tirêjan xwe digihand erdê.

Di jiyana mirovan de her lebata laş xwedî girîngî ye. Lê di şeran de çav, guh, ristek cuda dilîzin. Di rewşên tengav de tişta herî zêde zehmetiyê çêdike, nebûna hêza te ya di warê hejmarî de ye. Ji ber li hemû eniyan şer hebû, me nedikarî em hêza xwe ya di çeperên şer de jî biguherin, hejmara me têrê nedikir. Bi rojan heman hevalan di çeperan de şer dikirin. Lê piştî çend rojan wisa lê hatibû ku di kêliyên pevçûnê de jî ji bo çav bibînin, hevalan ji hevalên kêleka xwe re digotin, "Heval, ez êdî nabînim, tu şer bike, heta ez pênc deqîqeyan çavên xwe vehesînim." Bêxewî êdî astengiyek cidî bû li pêşiya dîtinê jî. Ji xwe dengê çek û teqemeniyan jî bandor li guhê kesekî nedikir, nedibû sedema revandina xewê. Xewê jî li gel westan û birsîbûnê, li gel çeteyan êrişî me dikir. Lewma pênc deqîqeyên xewê wekî xewa pênc saetan biqîmet bû di wan kêliyan de. Wa pênc

deqîqeyan dikarî mirovekê li ser piyan bihêle, hêza dîtin û guhdarkirinê bide mirov.

Çeteyan her roj hêzên xwe diguhertin. Lê hejmara me nebû em hevalên xwe biguherin û heman hevalan çeperên xwe diparastin û şer dikirin. Ji xwe şer jî bênavber bû, em bîst û çar saetan bênavber di pevçûnan de bûn. Ya balkêş û dibe ku hinek matmayî bimînin û 'bêjin ma tiştên wisa dibe' ew bû ku di van şeran de me şehîd nedan. Panzde hevalên me birîndar bûn. Di nav hevalên birîndar de hevalê Denîz hebû. Ciwanekî ji Rihayê bû. Bejindirêj, spî, keşxe bû. Çavên wî dexelî bûn. Te digot qey biharê renge xwe ji çavên wî girtibû. Porek reş û hilû li ser sere wî bû, ji xwe razî bû. Zanko qedandibû, xwedî zanebûn bû.  Ew 6-7 meh bû tevlî YPG'ê bibû. Di wê dema kurt de bibû fermandarê tîmekî şervan. Hevalê Denîz berê di tabûra me ya bi tevger de bû. Wî hevalî di wî şerî de jî rolekî mezin lîst, bi lehengî şer kir. Ji xwe piraniya hevalên me yên şer dikirin, ji hevalê Denîz ne cuda bûn. Hema bêje di warê temen û ezmûna xwe ya şer de nêzîkî hev bûn. Di vî şerî de ji ber me şehîd nedan û kuştiyên dijmin pir bûn, hevalên me hêz û moralekî mezin girtin. Di vê eniyê de bi dehan car êriş kirin, lê her carê êrişên wan bê encam man û nekarîn cihên me girtin ji dest me derxin. Bi tankan hatin, tankên wan li rastî mayînên me hatin û hatin teqandin. Di her êrişekê de jî jimarek cidî ya kuştî û birîndarên wan çêbû.

Piştî çete di êrişên xwe yên li vê eniyê de bi ser neketin, bi planekî nû xwestin navbera gundên Beyadî û Zormixarê qut bikin û bigirin. Ev der jî erdnîgariyekî ku darên zeytûn û fisteqan lê hebûn. Hevala Medya Kobaniyê û yekîneya xwe li wir bûn. Hevala Medya berpirsyara yekîneyê bû û yekîneya wan di navbera gundê Bayedî û Zormixarê de dima. Çeteyan bi taxtîka xwe vedizînê ve xwestin êriş bikin. Lê di çend êrişên destpêkê de ji aliyê hevalan ve hatin ferq kirin û pevçûn çêbûn, nekarîn encam bigirin. Roja yekê ber bi êvarê êriş kirin, hevalan li wan xist û çete neçar man vegerin. Roja din danê nîvro êriş kirin, ev êrişa wan jî hat şikandin û jimarek cidî ya kuştiyên wan çêbû, termên wan ketin destên hevalên me. Ji ber li wir amadekariyekî baş hatibû kirin, tevî hemû awayê êrişên xwe jî bi ser neketin. Di dema êrişan de komekî wan bi mayînan hatin kuştin. Her wiha bi Hamir' an hatin. Hevala Hêlin Amed, hevalê Rêzan Amed di wê xetê de rolek sereke lîstin, hamirên wan bi mayîn û guleyên çekên hevalên me hatin rûxandin. Wê rojê heta êvarê bênavber bi awayên cuda êriş kirin û xwestin wê navberê qut bikin. Ji ber ji gundiyên gundê Beyadî yên Ereb agahî girtibûn. Dizanîn jimara hêza me ya li wir û heyîna hevalên jin. Di civakên feodal de ji aliyê jinan ve hatina kuştin wekî kêmaniya mêraniyê tê dîtin. Berpirsyara wê derê û piraniya hevalên li wir hevalên me yên jin bûn. Ne serketin û binketina li hemberî jinan çete hêrs û har dikirin, ev quretiya wan dibû sedema zêdetir êrişî wir bikin. Lê jinên Kurd di wan çeperan de pozên wan di erdê re

dixirikandin. Her cara êriş dikirin çend termê din li pişt xwe dihiştin û paş ve vedigeriyan.

Wê rojê ber bi êvarê di saet sisiyan de êrişên çeteyan şikestin. Lê ji her aliyên eniyên şer agahiyên nû dihatin. Ji Eniya Gulban agahî hat dayîn û hevalan got, bi qasî sed maşînan hêzekî teqwiyê ji çeteyan re hatiye. Li gorî tişta tê dîtin dê êrişî vê eniyê bikin. Hinekan digot tank hatine, hinekan digot ji aliyê Helep, Cerablûs, Minbicê hêzekî pir mezin anîne qadê, amadekariyên êrişek dorfirehtir tê kirin. Di pêvajoyên şer de agahî zêde dibin. Hinek bi niyeta baş agahiyan didin, hinek jî bi niyetên xirap, wekî şerekî derûnî agahiyan belav dikin û dixwazin baweriya te ya bi serkeftinê bişkînin. Ev belavkirina agahiyên fişal di şer de wekî rêbaza şerê derûnî tê bikar anîn. Lewma rast nirxandin, ji agahiyên heyîn encamên rast derxistin çarenûsa şerê tu dikî diyar dike.

Wê rojê me wekî rêveberî biryar girt ku em kom bibin. Ji ber em ji pevçûnên dijwar derketibûn, hejmarek zêde ji çeteyan hatibûn kuştin û em dihizirîn ku ji bo tolhilgirtinê ew bi hêzek mezintir êrişî me bikin. Di mijara êrişê de em zelal bûn. Lê dê çawa û li kû êriş bikin nedihat zanîn. Beriya em kom bibin me agahî da hemû eniyan û hevalên di çeperan de ku şiyar tevbigerin, li hemberî êrişek ku dibe ku bibe tedbîr wergirin. Piştî me eniya Qulban, Sirînê û Rojava şiyar kir û şûn de, em êvarê li gundê Çariklî kom bûn. Kela germê hinekê

şikestibû, cihê xwe ji bayekî bi toz û dûkelekî bêhna barûtê jê dihat re hiştibû. Lê tevî toz û dûkêlê jî wê baya êvarê wekî ku bayê zozanan li laşê me bixe xweş dihat ji min re. Te digot qey jiyan bûye bayek têhnşîr û xwe di rayên laşê me de berdide nav giyana me. Piştî westan, bêxewî, birsîbûn û tîbûna çend rojan ew kêlîyên aram, bêdengiya çekan û teqemeniyan dibû sedem ku em zêdetir bi bêhaliya xwe bihesin.

Hevalê Masîro li aliyê eniya Rojhilat bû. Ez, hevala Narîn, hevalê Sefqan û Mehmûd Berxwedan, hevalê Heqî em li wir bûn. Dema em hatin gund, ji bo em baş bikarin eniyên şer bibînin, em çûn ser banê xaniyekê. Me ji wir li cihên eniyên xwe yên şer dinêrî, di ber re jî me rewşa heyî nîqaş dikir, cihên ku dibe ku êriş li ser çêbin di ber çavan re derbas dikir. Lê ya rast ez nikarim bêjim çavên min tiştek didît. Ji ber westan û bêxewiya çend rojên di pevçûnan de, çavên min wekî ku bi qîrê hatibin girtin ketibûn ser hev, tevî hemû hewldanên xwe jî min nedikarî ez çavên xwe vekim. Ji xwe dema hevala Narîn li hevalên din jî temaşe kir kenî û got; "Heval di xewnan de plansaziyan dikin. Hevalno, ka hinekê werin ser xwe, em plana xwe çêkin paşê xewnan bibînin." Bi gotina Heval Narîn re min çavên xwe vekir, bi rastî jî hevalên din jî bi xew ve diçûn. Hevala Narîn hevalekî reng genimî, bejna wê dirêj bû. Mirovek xwezayî û ji dil bû. Dema dikenî te digot qey li dinyayê ti şer û nexweşî, xem û jan nemane. Çavên wê yên reş li ser pehniya rûyê wê aramiyek cuda dida mirov. Bi kenê wê re çavên wê yên

gir biçûk dibûn, serê xwe ber bi paş ve bilind dikir û ji kûrahiya dilê xwe dikenî. Vî kenê wê hêzek vegiriyê hebû û kenê wê belavî hevalên din jî bû û em jî bi halên xwe keniyan.

Di wê kêliyê de çavên min bi rûyê hevalên din ket. Tevî dikenîn jî rûyê wan westiyabû. Xwihdanê li rûyê wan dirb vekiribûn. Ji eniya wan heta digihişt ser singê wan cihên herikîna xwihdanê bi alîkariya toz û dûkêlê şopên xwe hiştibûn. Yê nezaniyan wê bigotiyan qey ji temenmezinbûnê mijangên wan spî bûne. Di tozê de gewr û boz diyar dikirin di wê tarîgewrkê de. Ya rast tevî ku min rûyê xwe nedidît, rûyê hevalên li pêşberî min eynikên herî rastbêjbûn û min dizanî ez ji wan ne cuda me.

Hevalê Kendal, Ebû Leyla, hevala Roza û Mizgîn Serêkaniyê berpirsyarên eniya Qulba bûn. Me nîqaşek berfireh kir tevî rewşa xwe ya westanê. Me piştî nîqaşê got, dê êrişî eniya Qulban bikin. Ji ber hevalên li wir agahî dan, gotin çeteyan çekên giran anîne wir û ji nîvro ve bikar tînin. Ji Embara Sirînê bigire heta ber ava Firatê xetek berfireh dabûn pêşiya xwe û bi çekên giran gulebaran dikirin. Di encama nîqaşan de em gihiştin wê encamê ku wê li Qulban bixin. Me li ser wê encamê plansaziya xwe çêkir. Li gorî plansaziya me çêkirî, diviya taximek heval çekên giran bibin aliyê eniya Qulban. Ji ber agahiya çekên giran anîne wê xetê, me hewl da em wê eniyê bihêz bikin. Me xwest em çekên giran bibin wê

eniyê û pêşiyê li êrişên cehşan bigirin. Lê hêj me ev yek nîqaş dikir, heval Narîn digot, “ez wekî we nahizirim, ez wisa hîs dikim wê îro êrîşî vir bikin. Wê êrîşekî giran bînin ser vê derê. Tişta dikin xapandine, dixwazin balê bikişînin ser cihekî din. Lê wê bi hêz û çekên giran ên anîn êrişekî dijwar li ser vir bikin.” Bi rastî cara yekê bû ku hest û hîsên min ji min re tiştek nedigot, bêliv û tevger bibûn. Lewma tevî pirsên min ji xwe dikirin û min digot, ka ez çi dihizirim jî ji ber westanê, bêxewiyê hestên min rawestiya bûn. Hişê min têra bersivdayînekî rast nedikir, çavên min ji ber xwe ve dihatin girtin. Lê ji derveyî hevala Narîn, hemû hevalan digot wê êrişî eniya Rojava nekin. Ger êriş bikin wê windahiyên mezin bidin. Lewma nêrîna hevbeş ew bû ku wê çete êrişî eniya Qulban bikin. Hevalan nêrîna min jî pirsîn. Min got hema hûn çi biryar bidin ez jî tevlî wê dibim, ji ber ez ne di rewşekî bikarim bihizire de me. Ya rast bi wê rewşê min nedikarî ez biryar bidim. Ji ber hiş û hestên min ketibûn bin penceyên westanê û min dikir nedikir nedikarî xwe komî ser hev bikim.

Heta demekê em li wir man, piştî plansaziyê jî me xwest em rewşa li eniyan fêm bikin û li gorî wê bikevin tevgerê. Hevalên li Zormixarê agahî dan me û gotin du hevalên me yên birîndar hene, yek jî ji bo me lezgîn av pêwîst e. Dema hevalê Sefqan hatibû bi xwe re pênc heval ji bajêr anibûn. Di demên wisa teng de hevala Peyman û hevalên li bajêr ji me re endam dişandin. Gel di delîveyên wisa teng de dihat alîkariya me û tevlî şer

dibû. Her yek ji me got ez diçim. Lê hevalê Sefqan bi rih siviktiya xwe cihe rabu got ez bicim, pênc hevalên li gel xwe girt û got; "hûn pir westiyane, ezê biçim hevalan bînim. Yek jî ev pênc heval bila demekê cihên hevalên din bigirin ku bikarin bêhna xwe vekin. Ezê maşînan eyar bikim, bila heval me bigihînin wir. Emê hem av û pêwistiyên din bibin, hem jî di vegerê de hevalên birîndar bi xwe re bînin. Yek jî ez dixwazim rewşa hevalan bibînim, di cih de dîtina rewşê baştir e."



Di şer de tevî ku hemû hevalên berpirsên eniyên şer, hevala Medya, Harûn, hevalê Şivan agahî didan jî hevalê Sefqan biryara çûyînê da. Piştî çûyîna xwe di demekî kurt de vegeriya. Hevalên bi xwe re birîbûn, li şûna

hevalên ku ew pênc rojbûn di çeperan de şer dikirin hiştibûn. Hevalê birîndar anibû û hat gel me. Heval Sefqan piştî gihişt gel me, got “ti liv û tevger li wî alî nîne. Bêdengî heye li wir. Lê ev bêdengî ne valaye, dê di aliyê din de êriş bikin. Ji ber derbeyek mezin xwarin van pênc rojan. Dê niha ji bo moraldayîna şervanên girêdayî xwe, hêzên xwe yên çekdar êriş bikin. Ji xwe di bêtêlan de sozên tolhildanê didin hêzên xwe û dixwazin hêza wan moral bigire.” Ev şêwaza şerê çeteyan bû. Dema windahî zêde didan, piştî wê bêdudilî êriş dikirin, dixwestin tola windahiyên xwe rakin û moral bidin hêza xwe.

Piştî vegera hevalê Sefqan jî me qederekê nîqaş kir. Nêrîna hevbeş ew bû ku wê êrîşên xwe li ser milê Zormixarê bikin. Em hemû gihiştin wê baweriyê ku dê di aliyê Qulbanê re êriş bikin. Tenê hevala Narîn dîsa digot; dê êrişî vir bikin, gundê Bayedî bigirin û di nêrîna xwe de israr dikir. Saet 11’ê şevê min taximek heval girtin, hevalan got, lez bike û xwe bigihîne eniya Qulban. Lê ji ber hevala Narîn ne qanebû wê êrişî wir bikin, ji min re got, “neçe eniya Qulban bi xwe. Li kêriya jor bimîne, li wir cîhaz û telefon baş dikişîne. Ez bawerim ku wê êrişî vir bikin. Tu li wir dikarî baştir bişopînî, ger êrişî vir bikin jî wekî taqwiye xwe zû bigihînî vir.” Dema hevala Narîn wisa got, di dilê min de jî waswasek çêbû. Min jî hinekê bawer kir wê êriş di wî alî de çêbin, lê hişê min têra biryardayînekî rast nedikir. Ji ber piraniya nêrînan li ser aliyê din bû, min jî guhdarî wê dikir. Ya herî rast nêrîna hevala Narîn bû. Ez li kêriya jor bimînim, ji bo

kîjan eniyê pêwîstî çêbe ji wir destwerdanê bikim. Ji xwe hevalên li eniya Qulban jî di vê nêrîna giştî de xwedî rol bûn. Agahî didan, digotin, êrişî Girê Sêvê kirin, êrişî Kunheftarê kirin, êrişî Kobûnlê kirin. Qelebalixek zêde hebû. Lê di rastiyê de ev taxtîkek bû, dixwestin balê bikişînin ser wî alî. Tevî hevalan wisa tekmîl didan jî ya rast pêkanîna hevala Narîn bû. Beriya em bikevin rê jî hevala Narîn got, “hevalno, dilê min ne aram e, ez pê dihesim wê li vir bidin.” Min cardin li wir bi heval Medya, Şivan û hevalê Harûn re axivî, rewşa wan pirsî. Hemûyan gotin rewşa me başe, bêdengiye, ti liv û tevger diyar nakin. Dema wisa me li ser hev rewşa wan pirsî, hevalan henek kirin û gotin, “em başin heval. Heta ger êrişî me neyê kirin, me li bere em saetekê xew bikin. Xeman nexwin, emê dengên bi Erebî yên dibêjin ‘hûn kîne’ deynin ser cîhazên xwe û çeteyan bitirsînin.” Tevî ku min dizanîn henekan jî dikin, di kêliyên wisa de cidîyet pêwîst bû. Min ji wan re got; hevalno, dijmin di tevgerê de ye, divê hemû heval şiyar tevbigerin. Xew nabe, em jî wekî wene û pir şiyar bin. Ez diçim eniya Qulban, hevalê Mehmûd, Sefqan û hevala Narîn li vir in. Piştî gotinên min, şiyariyên min kirîn hevala Medya got, “Na hevala Meryem, em henekan dikin. Ma kî dikare me bigire. Em di çeperên xwe de ne, haydarin xeman nexwin.” Moralê hevalan pir xweş bû. Ji ber wê rojê derbeyên giran li çeteyan xistibûn. Ez bi wan bawer bûm, min dizanî henekan dikin. Lewma ez bi dilekî aram ketim rê.

Em di saet du û nîvê şevê de gihiştin cihê me diyar kiribû em lê bimînin. Êdî hevalan nedikarîn ji maşînên xwe jî peya bibin. Min ji hevalên Qulban re got em nêzî we ne, eger tiştek çêbû emê zû xwe bigihînin we. Ger li aliyê we tiştek çêbû em li gunde boxaze  jorî we ne, zû agahiyê bidin me. Ji xwe di navbera me û wan de zêde rê nebû. Telefon û cîhazan jî li wir baş dikişandin. Me biryar da em xwe tam bernedin çeperên pêş, ji bo ger pêwîstiya eniyên din çêbe em bikarin ji wan agahî bigirin. Hevalên eniya Qulban ji me çar-pênc heval xwestin, me pênc heval şandin ji bo teqwiya Kunheftarê. Min bi hevalên biçin Kunheftarê re axivî û got, "dema êriş pêk hat û pêdivî bi teqwiyê çûbû, hûnê alîkariyê bidin hevalan." Dema me heval şandin û şûn de hevalên mayîn ji maşînan peya nebûn, hema di maşînên xwe de bi xew ve çûn. Ez çûm ser banê xaniyekê ku bikarim derdor baş bibînim. Li ser wir telefon û cihazê ji cihên din baştir dikişand.  Min demekê guhdarî dengê cîhazan kir, pişta xwe da dîwarê ser ban û wisa bi xew ve çûm. Saet bû derdora sê-sê û nîv. Ez rabûm. Deng û qelebalixek ji cihazan hat. Ji bêtêlên çeteyan dengek zêde dihat, me guhdar dikir. Digotin "hindik maye em bigihêjin cihê xwe. Me dît, erê em gihiştin çeperên wan. Em lê bixin? Em gihiştin nêzîkî gund. Hay ji mayînan hebin, pê li mayînan nekin, ger koma destpêkê pê li mayînan bike jî bila koma din biçe. Li pişt wan bizivirin, wan bixin çemberê." Ji her qenalekî cîhazê dengek dihat, ferman didan hev, qelebalixek zêde çêdikirin. Me dizanî di cihekê de ketin êrişê, lê me tam fêm nekir. Min gazî

hevalê Kendal kir bi cîhazê. Nasnavê wî yê cîhazê Amargî bû. Min got, “Amargî, tu cîhazan guhdar dikî, qenalên dijmin guhdar bike, di cihekê de ketine êrişê. Hemû hevalan şiyar bikin û haydar bin. Hûn nizanin ev li kû êriş dikin?” Hevalê Kendal bersiv da û got, “Raste heval em jî guhdar dikin. Lê em nizanin li kû êriş dikin.” Min gazî hevalê Şivan kir. Me dixwest em bizanin ka cihê herî dawiyê zêde mayîn bi çeteyan de teqiyayî kijane û em li ser wê fêm bikin ka bi kû ve diçin. Hevalê Şivan bersiv da û got, “heval raste, ev nasnavên cîhazan ên aliyê me, eniya rojava ne. Lê di aliyê me de êrişek mezin tine ye. Dibe ku taxtîk be, bixwazin di warê derûnî de me têk bibin, an jî me bixapînin. Ji ber dizanin em guhdarî cîhazên wan dikin. Lewma dixwazin derûniyek wisa li ser me bidin çêkirin ku gihiştine çeperên me.” Di cîhazan de heman deng zêde dibûn û digot, “Bi çekên giran lê bixin. Êrişî çeperan nekin, li pişt wan bizivirin, bixin nav çemberê.” Min gazî hevalên din kirin, wan jî gotin heval tiştek li gel me nîne. Piştî me nîv saetê guhdarî cîhazan kir, bi hevalan re axivîm û şûn de, ez cardin bi qasî nîv saetê bi xew ve çûm. Ji xwe di nava şer de mirov di xew de jî şer dike, wekî di çeperê de ye xewnên seyr dibîne. Min got qey ez xewn dibînim. Deng ji cîhazê dihat û digot, “Xwe zû bigihîne me, li jêr pevçûn heye.” Min jî digot qey ez xewn dibînim. Lê her çû dengê cîhazê bilind bû, pê re jî dengê telefonê hat guhê min. Ez veciniqîm, rabûm ser xwe. Min telefona xwe vekir, hevala Narîn gazî dikir. Min bersiv da, hevala Narîn got, “heval Meryem, xwe zû bigihîne me, çete ketin gundê

Beyadiyê.” Heta ez rabûm, min gazî hevalan kir û em ketin rê deh deqîqe derbas bûn.

Ber bi sibê bû, bayek hênik dihat. Piştî westana pênc rojên di pevçûnan de derbas bûyîn derfeta xewê ketibû destên me, heval bi xew ve çûbûn. Xewek wisa şirîn û xweş ketibû çavên me, te digot qey di cîhanê de ji xewê xweştir ti tişt nîne. Lê xewa hevalan a şirîn bi dengê min ê “hevalno zû rabin, êrişî gundê Bayediyê kirin, em xwe zû bigihînin wir” bi dawî bû û xewnên xewa saet û nîvekê cardin bi dengê hewarê hatibûn qutkirin, em ketibûn ser riyan, me berê xwe dabû cihê pevçûnan.

Gundê Bayediyê ji bo me ciheki stratejîk bû. Ji ber gundê Bayediyê girtin, dihat wateya hêza me ji hev qutkirin û ketina çemberê ya hevalên me yên dimînin wî aliyê gund. Lewma hevalan gazî dikir, dixwestin em xwe zû bigihînin wir. Ji ber çekên wan ên giran nebûn, ger em zû negihêjin wê bikevin çemberê. Her gazî dikin û dibêjin, “heval, zû çekên giran bînin, rewşa me nebaş e.” Ez bi hevalên din re jî axivîm. Min gazî hevala Medya kir. Medya ji gundê Helincê bû. Medya zer, navin, porê wê zer û xelek bû. Çavên wê hewl bûn. Ji bo hewlbûna çavên xwe digot, “dema ez ji dayîkbûme xwedê li gorî nîşanê çavên min çêkirine.” Ji eşîra Kêtikan bû. Digot “an ez guyî me, an jî zaroka îskender im.” Dilnizm û rû biken bû. Hevalan jê hez dikir, li derdora wê kom dibûn. Taybetmendiyên dayîktiyê pê re hebûn. Tenê ji ber bêhntengiya wê carna zû aciz dibû û ev aliyê wê dihat

rexnekirin. Li ser cîhazê bi dengekî bênkutkî got“li pişt me zivirîne, gundê Bayedî girtine û em niha mane di çembera wan de. Xwe zû bigihînin me.” Dema gotin Bayedî girtine, me êdî nedizanî em çawa diçin, ger baskên me hebûyan em ê bifiriyan. Ji ber girtina Gundê Bayedî ji bo me ne ji rêzê bû. Nêzîkî 70-80 hevalên me di çemberê de diman. An divê xetek bê vekirin û ew heval xwe tê re rizgar bikin, an jî ev dihat wateya tevkujiyek cidî. Ger em wê rojê êrişa çeteyan neşikînin, dê bi dehan hevalên me şehîd bikevin. Ji xwe hêza me ya herî zêde li wê eniyê ye, ew jî piranî li wî aliyê gund mane û têkiliya me ya bi wan re qut bûye. Ew heval di çeperên eniyê yên pêş de ne. Lê wekî ku di cîhazan de gotîn, hatine li pişt çeperan zivirîne, hêza me ya li wê eniyê xistine nav çemberê. Ji bo me jî riya xwegihandina hevalan cardin girtina gundê Bayedî ye. Derveyî wê ti riya em bikarin biçin wan hevalan rizgar bikin nîne.

Dema em ber bi gundê Bayedî ve diçûn, em di rê de rastî gel hatin. Warê Kitêkan vala bibû, gel ketibû ser riyan û hewl didan xwe bigihînin cihên ewle. Hûr û gir, jin û zarok ketine ser riyan. Gundiyan pez û dewarên xwe, tiştên ku karîbûn bînin bi xwe re anîbûn û ber bi deverên din ve direvîn. Li ser wê riyê dîmenên bi jan ber bi çavên min diketin, di rûyê kal û pîrên li ser wê riyê de xem û jan hebû. Zarok bi piyên xwas, bi çavên tijî tirs xistibûn dawiya maşînan û xistibûn ser wê riyê. Ji xwe yên dewar û pez dajotin jî bi piyan diçûn. Wê kêliyê ew westana me ya çend rojan vegerandibû hêrsê, me

dixwest em bibin balinde û bifirin cihê pevçûnê. Ji ber me gelek caran dîmenên wisa bi jan ên gelê xwe dîtibûn. Ev gelê bêguneh, ji derveyî daxwaza jiyanekî azad ti zirar û ziyana wan ji bo kesî nebû, neçarî penaberî, derbederî, kuştin û talanê dihat hiştin. Çeteyan wekî hovan êrişî war û cihên wan dikir, talan û dizî dikirin. Dema çavên wan bi maşînên me ketin, dîtin ku em ber bi cihê dijmin êriş kirî ve diçin, dayîkan em bi tilîliyan pêşwazî kirin, dengê dirûşmên "Bijî serok Apo, bijî YPG-YPJ bilind bûn. Zarokan bi çavên tijî mereq temaşeyî me dikirin. Ji maşîna pêşiyê kalek temenmezin derket pêşiya karwanê maşînan û xwest gel maşînên xwe bidin aliyekê ku em bikarin zû derbas bibin. Kalê heftê salî destên xwe rakirin hewa û got; "rê bidin şervanên Kurdan. Rê vekin, bila ev egîd û çelengên Kurd tola me ji neyaran rakin. Bila destê xwedê li ser serê we be, ez qurbana we bim babo. Hûn hêvî û baweriya me ne. De rê vekin, êdî çete nikarin bigihêjin me. Vaye zarokên me, şervanên me li hewara me hatin."Piştî dengê kalo yê bilind, her kesî maşîn dan kêlekekê, em li ber dengê tilîlî û dirûşmê wan, di nav wan re derbas bûn.

Di rê de her hevala Narîn û Sefqan gazî dikin, dibêjin xwe bigihînin me. Em bi lezek wisa diçin, tê bêjî qey maşînên me di pêşbirkekî ya lezê de ne. Em dixwazin kêliyekê zûtir xwe bigihînin gund, nehêlin heval di çemberê de bimînin. Di kêliyên wisa de mirov xweziyê li balindeyan tîne, dixwaze bifire. Di hişê me hemûyan de yek tişt derbas dibû; gelo em dê bigihêjin hevalan, em dê

bikarin pêşiyê li ketina wan a nava çembera çeteyan bigirin? Ji xwe hêj deh deqe derbas nebûyîn, ew gundiyên ku bi maşînan zarok û jinên ji warê Kêtikan derxistin û me di rê de dîtin jî malbatên xwe li gundekî pişt xeta me girtî danîn û vegeriyan eniya şer.  Lê heta em gihiştin gundê Bayediyê hatibû girtin, gund ketibû destên çeteyan. Vê agahiyê em şebikandin, deng ji me dernediket. Diviya em riyekê bibînin. Min gazî kesekî bi navê Lokman ê ji gundê Çariklî kir. Navî wî di nav xelkê gund de Miçê bû. Miçê dever bost bi bost nas dikir. Kesek jêhatî bû. Min got, “Miçê, ka were. Em nikarin di jor de riyekê vekin û pêşiya hevalan vekin, hevalan rizgar bikin?” Me ji hevalan re jî got xwe bidin aliyê xeta sînorê bakur. Ji xwe li ser xeta sînor demek bû gelê bakur hebû, agahî didan me. Digotin li filan cihî hene, an jî filan cih vekiriye. Agahî didan digotin ev der girtiye, an jî hûn dikarin di filan riyê re biçin. Wan em ji wî alî kordîne dikirin. Cihek li ser sînor hebû, DAÎŞ’ê ji aliyê Tirkiyê ve dixwest di wir re derbas bibe û bê wir bigire. Me agahî da Gelê Bakur ku wê xetê bigirin, pêşiya wan asteng bikin, nehêlin bên ku heta em hevalên xwe ji wir der dixin. Ji xwe çeteyan di her alî de çekên giran bikar tanîn, bi tankan êriş dikir. Li cihên ku ketînê, pêşiya xwe gulebaran dikirin, ber bi pêş ve dihatin. Bi wê hêza teknîka giran karîn gundê Bayedî bigirin. Dema em çûn, me dît hevalan doçka danîne gundê Çariklî. Hevalê Baz doçkaya xwe daniye nava rê de, her guleyan davêje gundê Beyadiyê. Dengê çekan bi ser her derî dikeve,

pevçûnekî giran rû daye. Ji dengê teqemeniyan, dengê cîhazan, liv û tevgera hevalan wekî roja reş bû.

Li jorî gund cihek hebû. Min ji hevalan re got kes lê heye, gotin na. Mirov bi maşînê nedikarî biçe wir, diviya maşîn li pişt wir bizivire heta bigihêje jor. Min ji hevala Tekoşîn re got çeka xwe ya B-7 bigire, ji nişka ve me berê xwe da wî girî. Ji ber li piştê zivirandin dihat wateya wext windakirinê. Ji ber me dît ku tank dihat, pêwîst bû em xwe bigihînin wî girî. Em bi lez û bez diçûn. Dengê dilê me, henaseya me jî tevlî ya çekan dibû. Dema em ber bi jor ve çûn, hevalê Mehmûd û hevalê Rojhat ê li gel wî jî berê xwe dan gir. Lê em bi giştî çar kes bûn. Hevala Narîn ji jêr gazî kir û got, “tu bi kû ve diçî, kî li gel te ye?” Min got “em diçin vî girikê li pêşiya xwe bigirin.” Diviya em wan hevalên bi min re hatîn jî hemûyan bixin çeperan, ji ber hemû bi çekên giranbûn. Lê gotin ji min dernediket, em ber bi jor ve dibezîn. Ji ber diviya gundê Çariklî nekeve dest çeteyan ku em bikarin hevalên xwe di wir de ji çemberê derxin. Karê li çeperan cihkirina hevalên bi min re hatîn ma bi hêviya hevala Narîn ve. Ji ber hema di kêleka me re hevalê Mehmûd û hevalê Rojhat jî berê xwe dabûn jor û ber bi gir ve dihatin. Em gihiştin serê gir, Miçê jî gihişt wir û got, “Hevala Meryem, ew girikek din li jor heye, ger em wî bigirin tank nikare derbas bibe. Hûn rast biçin, ezê li piştê bizivirim. Hevalê Mehmûd ew jî gihiştin gir. Ji xwe ew ji wan gundan bûn, herêm baş nas dikirin. Em gihiştin ser serê girikê Miçê digot, hevalê Mehmûd ew jî çûn girikek li jor girtin. Li

aliyê ber têlên sînor girek hebû, Kobaniyan jê re digot 'kuç' û ew kuç ji bo me ketibû rewşekî stratejîk de. Ji ber cihê herî bilind ê wê deverê bû, dema me ew der bigirtiya em li ser herêmê serwer dibûn.

Di dawiya lez û bazdanekî zêde de me kuç girt. Hema em gihiştin serê gir, çeteyan em dîtin û bi tankan gule avêtin me. Di dema çûyînê de me nedikarî em baxivin. Ji ber berpirsyariya mirovên şervan ji her tiştî zehmetir e. 80'î kes di bin berpirsyariya me de ketibûn çemberê, şehîdbûna wan ji bo me dihat wateya mirinê. Di wê kêliyê de me tirsa ku dê çi bi me bê ji bîr kiribû. Di şerê deştê de girikekî axê jî avantajan çê dike. Bilindahî dibe sedema tu bikarî liv û tevgera derdor bibînî, serweriya şer dixe destên te. Piştî me her yekî xwe gihand girikên ku diviyan bên girtin, gundê Bayadî diket jêrî me, me liv û tevgera li wir baş didît. Di herdu giran de jî em çar kes bûn. Çekên di destên me de nedigihiştin dijmin. Lêxistina me bêbandor bû, lê dîsa jî şopandina liv û tevgera wan, dîtina eniya şerê germ lê dihat jiyîn, serweriya li ser erdnîgariyê hêz dida me tevî fikarên me yên zêde.

Piştî em gihiştibûn gir, hevalê Loqman gotibû ezê di aliyê din re bizivirim û ji gel me çûbû. Hevalê Loqman, ji gundê Çariklî bû. Temenê wî sih-sih û pênc sal bû. Mirovek bejna wî navîn û dagirtî, reng genimî bû. Porê wî xelek bû, ew heftiyek bû rihên xwe kur nekirî û rihên wî jî hinekê hatibûn. Lê rengê pora wî, rihên wî di toz û

dûkêla çekan a çend rojan de winda bibû, rengekî boz girtibû. Ji xwe mirovên demdirêj li ber tava deştê dimînin, pêstê wan diqemire. Hevalê Loqman jî ewqas li ber tavê mabû, ger ne ji hildana zendên wî yên di kêliyên karkirinê de bûya, te yê bigotiya kesekî esmer e. Lê beriya dest bi kar dikir, zendên xwe hildidan, di wan kêliyan de mirov rengê pêstê wî yê genimî ferq dikir. Gomlekekî kesk ê nîvmil û pantolonekî kod li ber bû wê rojê. Demanceyek bi kemer ve xistibû navtenga xwe, yêlekekî şarjorên kilêşê yên YPG li ser gomlekê xwe de xistibû ber xwe. Kesek gurc û jêhatî bû. Hevalê Loqman birayê hevalê Heqî bû, hevalê Heqî jî berpirsê eniyekî şer bû. Piştî çûyîna wî bi nîv saetê, min dît deng ji jêr hat. Di wê kêliyê de dengê dilê min bi ser hemû dengan ketibû. Ez û hevalê Mehmûd, Tekoşîn û Rojhat, em li pişt xwe zivirîn, yekser çavên min bi maşînekê ket. Maşînekî rengê wê sor, tipê pîqabê bû. Ne maşînek nû bû, lê wekî ku pêdiviya wê bi cadeyan nebe, xwe li ser her tiştî re diqevast û di xetekî jêrî me re ber bi me ve dihat. Dema çavên min bi maşînê ketin, yekser mîna ku taviyek baran li dilê min bike, kel û forînek ji nava dilê min ê ji ber janê qemitî bû, bilind bû.

Loqman, demek dirêj li ser wê xetê qaçaxî kiribû, ew cih baş nas dikir. Gundê em lê li rojavayê Kobaniyê bû. Li bakurê rojava jî gelê Bakur li ser xeta sînor gundê Ziyaretê çadir vedabûn, ji wir piştgirî didan têkoşîna me. Di ber têlên sînor re, di demên kevin de xeta trênê derbas dibû. Demek dirêj bû ew xet êdî hatibû betalkirin.

Li pêşiya xeta trênê jî ji aliyê Rejîma Baas ve xendek hatibûn çêkirin. Ev xendek ji bo qaçax nekarin hêsanî derbasî sînorên bakur bibin, hatibûn çêkirin. Tevî xendekan jî ew sînor ti caran bê qaçax nemabûn, bazirganiya di navbera sînoran de dewam kiribû. Loqman jî pisporekî vê riya qaçaxiyê, şarazayê derbaskirina sînoran bû. Dema maşîn li pişt gir zivirî, çavên min bi maşînê ket, ez wisa hestyar bûm ku min nezanî êdî çi bêjim. Maşîna dihat a hevalê Loqman bû. Loqman di ber wan xendekan re maşîna xwe ajotibû, çûbû eniya hevalên me lê asê mayîn. Ji wir deh heval siwarî maşînê kiribûn, bi lez ber bi girê em lê bûn ve dihat. Bi hatina wî, hêviyê xwe li dilê me pêça. Riyek hebû. Riyek em bikarin tê re hevalên xwe ji wê xefka mirinê rizgar bikin, plan û hesabên çeteyan vala derxin hebû. Lehengiya Loqman hişê me livandibû, wê hesta kembax a beriya çend kêliyan cihê xwe ji hesta hêviyê re hiştibû. Carna di kêliyên wisa de mirovek dikare jiyana bi dehan kes rizgar bike, mohra xwe li çarenûsa demekê bixe. Hevalê Loqman bi deh hevalan re vegeriyabû, lê hêviya rizgarkirina 80'î kesan ji me re kiribû xelat. Pêşî li şikandina eniyekî me ya şer girtibû, agirê ku dibe ku bikeve bi dehan mal tefandibû. Hesta me ya bêçariyê vegerandibû hêviya serkeftinê. Me bi hatina wî re du heval hiştin ser gir, ez û hevalê Mehmûd ber bi wî ve daketin jêr. Maşîn gihişt me, di hundirê maşînê de deh heval hebûn. Tenê tiştek digotin, "heval, avê bidin me, em fetisîn, ger av hebe avê bidin me." Av di wê kêliyê de ji jiyanê biqîmetir bibû. Ji xwe vala negotibûn, "av jiyane"

û di deng û awirên wan hevalên me de rastiya ku av jiyane şênber bibû. Loqman wisa ji dil dikenî, te digot qey tirêjên rojê xwe berdaye nava kenê wî, ji wir birq û ronahiyê belavî derdor dike. Di ber wî kenê xwe yê şirîn re bi bêhnkutkî got, "hevalno, ezê hevalan li vir danim, biçim hevalên din bînim. Min rê peyda kir, ji aliyê dijmin ve ev rê xuya nake. Lê divê em lez bikin, ger bigihêjin ser xendekan, em êdî nikarin bilivin." Ji xwe kelecan û coşa wî her tişt digot. Pêdivî bi gotinê nehiştibû bi wê jîrî û lehengiya xwe. Lewma tenê çavên me daxivîn, heyranî û hezkirina me ji wî re digotin. Hevalê Loqman, hevalên ku anî li wir danîn, cardin berê xwe da cihê heval lê mayîn. Ji xwe riyek ne dûr bû. Di şertên asayî de di navbera me û hevalan de bi maşînê deh deqîqe rê hebû. Lê ji ber ew di xendekan re diçû, li pişta gund vedigeriya û diket nava gund, ev rê dibû bîst deqîqe. Piştî hevalê Loqman vegeriya û biçe hevalên din bîne, me bi hevalan re axivî, me ew şandin gundê Aşmê. Me ji wan re got, xwe bigihînin wir, li wir bicih bibin, avê vexwin, vehesin. Her çiqas hevalan xwest li gel me bimînin jî me ew şandin. Em cardin vegeriyan serê gir. Lê vê carê bi hestekî cuda, bi dilxweşî, bi moralekî mezin em çûn serê gir.

Piştî me zanî di wî alî de rêya maşînan heye, me agahî da hevalên jêrê, ji bo maşînên çekên giran derbasî wê xetê bikin. Hevala Narîn jî li gorî rewşa nû heval bi cih kirin. Piştî dijmin ketibû Bayediyê, hevala Medya û hêza li gel jî şûna ber bi Çariklî ve paş vekişin, berê xwe dabûn gundê Zormixarê. Di axaftina me ya herî dawiyê de

hevala Medya gotibû, “ma kî heye bikare me bigire, em haydarin, xeman nexwin.” Ji ber wê jî piştî dijmin li pişt wan zivirîbû û neçarî paşvekişînê bibûn, ew jî çûbûn Zormixarê û ew çar saet bû di pevçûnê de bûn. Niyeta wan a paşvekişandinê nebû. Ji ber berdana gundê Bayedî li ber xwe ketibûn, biryar dabûn heta kêliya dawiyê li Zormixarê şer bikin û gund bernedin. Piştî çûyîna hevalê Loqman bi demekê, hevalê Şivan bi cîhazê gazî hevalê Mehmûd kir. Di cîhazê de tekmîla rewşa li Zormixarê da û got, “Heval, rewşa me başe. Heta niha ti hevalên li vir Şehîd nebûne. Ev çar saete şer dewam dike, moralê hevalan başe. Lê ji bo pêkanîna fermana xwe ya dawiyê hinek pirsgirêk hene. Hevalên jin biryarek girtine, tevî fermana giştî jî niyeta wan a pêkanînê nîne. Dibêjin, ‘heta kêliya dawiyê jî em ji vir dernakevin, nabe em çeperên xwe ji dijmin re bihêlin. Em li Bayedî bi xafil hatin girtin, lê em li vir dikarin li ber xwe bidin û gund biparêzin.’  Ger hûn bi xwe gazî wan bikin û rewşê ji wan re bêjin dê baş be. Divê em lez bikin, lê ji ber wan em wext winda dikin.”

Piştî tekmîla hevalê Şivan dayî, hevalê Mehmûd gazî min û hevala Narîn kir ku em bi hevalên jin re baxivin. Min bêtêla xwe girt, li ser gir gazî Medya kir. Min û hevala Narîn bi wan re axivî. Me ji wan re got; “hevalno, di şer de paşvekişandin nayê wateya radestbûnê. Çi pêwîst be li gorî wê tevgerkirin, guhdarî fermanan kirin, erka şervanekî dilsozê doza xwe ye. Awayê berxwedana hûn li ser me ferz dikin xwekuştin e, em ne tevgerekî wisa

bêçarene li cihê ne pêwîst de bikevin nava seknên wisa. Soz di nava çend rojên din de, emê cardin wan gundan bigirin, ala xwe li ser serê banan bilind bikin. Dê çete li cih û warên me bicih nebin." Di dengê pêşberî me de şermê xwe dida der. Ji ber ku gotinên xwe yên bi şev, piştî wê ketina gundê Bayedî ya destên çeteyan morala hevala Medya xirap bibû. Hevala Medya berpirsa yekîneya li Bayedî bû. Me ji denge wê zanî tiştekî neyênî heye. Di axaftinê de zehmetî dijiya, gotin di devê wê de dibûn qet û me tam fêm nedikir. Lewma me jê xwest tekmîla xwe zelal bide. Hevala Medya bi dengekî xemgîn got; "Heval, çar hevalên me li gund man û şehîd ketin. Me nekarî em xwe bigihînin wan. Xelkên gund bûn, hevalên temenê wan mezin in. Emê paşê berfirehiya agahiyan bidin." Me hemûyan ev hest baş dizanî. Ji ber me hevala Medya, hevala Hêvîdar Kobanî ya berpirsa hêza me ya li Zormixarê, alîkara wê hevala Bêrîtan jî baş nas dikirin. Di şerê xwe de bi rik, jêhatî û bi biryar bûn. Jinên wêrek bûn. Ya din jî di bin berpirsyariya wê de çar hevalên wê şehîd bibûn, tevî şehîdbûna wan jî neçarî paşvekişandinê bibûn. Vê hestê ew hestyar kiribû, dabû şermê, xwe tewanbar didît. Lê me hewl da vê derûniya xwe derbas bike, wekî fermandar erka xwe pêk bîne, fermana paşvekişandinê pêk bîne.  Ji wan hemûyan jî bi riktir hevala Avesta hebû. Avesta ji gundê Kizalî bû. Jinek ciwan, bejin zirav û dirêj bû. Porek reşê qetranî û dirêj li ser serê wê bû. Ger gotin di cih de be, rûyê wê mîna eynikekî dibiriqe bû. Çavên wê yên reş û mezin, mijangên wê yên bor û dirêj, birûyên wê yên rêk û pêk

ciwaniyek zêdetir li rûyê wê bar dikir. Hevala Avesta di wan eniyan de deng dabû di şerê xwe de. Jinek şerker û kêrhatî bû. Di warê fizîkî de jî xortan ew derbas nedikirin. Herkesî du narincok radikir. Lê narincokên hevala Avesta diviya ji şeşan kêmtir nebin. Ji hevalên dirwariya cilên me dikir xwestibû jê re qalikekî narincokan çêkin, wan jî jêre tiştekî taybet çêkiribûn. Cihê şeş narincokan li ser kemerekê çêkiribûn, hevala Avesta ew wekî şeleme li pişta xwe girê dida. Li gel çar şarjoran, di tûrikekî bi milê wê ve jî sed û pêncî fîşekên qilêşê zêde radikir li gel xwe. Hevala Avesta ji cihekî şer û pevçûn lê heyî paşvekişandin zehmet bû. Me hevalên rêveberiyê hemûyan ev rastî dizanî. Bi biryardarî û sekna xwe hevalên derdora xwe jî sor dikir, ji bo paşvekişîn çênebe ew jî îqna dikirin. Ji bo van nêzîkatiyên wê, me çend caran cihê wê yên di eniyên şer de guhertibû. Me çend caran şiyarî dabûyê ku li gorî rêzik, pîvan û pêdiviyên şer tev bigere. Piştî axaftina min û hevala Narîn a bi hevalên jin re, hevalên din îqna bibûn paşve vekişin. Lê hevala Avesta gotibû ;"ez naçim, ez ala YPJ li ser ban nahêlim û ji vir dernakevim." Çend caran ji bo alê ji ser ban bîne xar hewl dabû biçe ser ban. Di her çûyîna wê de çeteyan gule lê reşandibûn. Herî dawî li ser zik xwe xuşikandibû, gihiştibû ber darê al pêve hatî daliqandin. Benê alê girtibû, al anibû xarê û xwe berdabû jêr. Dema hevalan ev tevgerên wê yên xeter rexne kiribûn jî gotibû, "Min sond xwariye, cihê ez lê destê dijmin negihêje wê alê. Ji bo destê wan ên kujer û bixwîn negihêjin wê ala me ya bi xeyal û hêviyên bi hezaran

şehîd xemilî ye, ez neçar bûm biçim wê bînim. Ma hûn çawa vê rexne dikin? Qey ji bo wê armanca pîroz hatina kuştin ma tiştek ji rêzê ye? Qey we nedîtiye dema li cihekê ala me tînin xwar çend har dibin, bi rojan di televîzyon û înternetan de anîna xwar a ala me didin? Dema ala me dikeve destên wan wekî serxweşan ji ser xwe diçin bi hesta daxistina ala me?" Lewma di qanekirina hevala Avesta de me zehmetî jiyan kir. Hema bêje em hemû hevalên rêveberiyê axivîn, piştî wê me karî em qane bikin. Piştî me heval ji bo vekişandinê qanekirin, vêca diviya em wan ji bûyîna armanc a tank û çekên dijmin biparêzin, balê bikişînin ser aliyê xwe.

Di wê navberê de tankan em dîtin û girên em lê dan ber guleyan. Dema jimar hindik be, mirov dikare xwe ji guleyên tankan biparêze. Yek jî cihê me girbû, me xwe davêt aliyê din heta gule diteqiyan. Ji ber guleyên tankan ne wekî yên hewananin, nikarin bi qews biçin. Rastin û tu baştir dikarî li hemberî wan tedbîr bigirî. Min gazî hevalê Harûn kir, hevalê Harûn berpirsê eniyê bû. Min jê re got, "tu gazî Şivan bike, bila ji bo vekişandinê amade be. Ew cihên ku bi tankan lê dixin cihên me ne. Bila li gorî wê tevbigerin. Lez bikin, wext winda nekin. Agir berdin cihên ku pêwîst dikin, bila dûkêl çêbe. Her carê sê- çar hevalan derxe, bila xwe bigihînin cihên ewle." Di wê navberê de hevalê Loqman cardin bi maşîna xwe vegeriya, çend hevalên din anî û hat gel me. Got, "heval Meryem, ma heval ne li gundê Çeloglu ne? Ezê niha biçim pêşiya wan û wan bînim. Dîsa bi heman kelecan û

coşê bû. Li gorî cara din zêdetir westiyayî bû, lê lez dikir, hêj min gotinek nekirî berê xwe da jêr. Min vê carê cardin gazî hevalên me kir û got, “hemû derya, hemû derya. Maşînekî sor ber bi we ve tê. Haydar bin, ew ji aliyê Tekoşîn tê. Bila haya we jê hebe, tiştek pê neyê.” Maşînekî pîqaba sor e. başe. Silav û rêz.”

Em çar kes li ser wan herdu girikan bûn. Her tankan li me dixist, me xwe dida aliyê din, em di aliyeki din re derdiketin ser girik. Lewma dijmin digot qey em wir bi jimarekî zêde digirin û berê tankan li ser me girêdabûn. Lê beriya tank guleyan bavêje deng jê dihat, me dizanî amadekariya avêtinê dike. Ji xwe dûkêl jê diçû, me bi çav didît. Lewma me zû tedbîr digirt. Ji xwe ger tu bikarî xwe pêncî-şêst metreyan dûr bixî ji guleyan, tu dikarî xwe biparêzî. Li girekê ez û hevala Tekoşîn bûn, li girê din jî hevalê Mehmûd û hevalê Rojhat bûn. Paşê hevalê Dilsoz jî xwe gihand gel hevalê Mehmûd wan, ew bûn sê kes. Lê te digot qey em ji sed kesî zêdetirin, berê hemû çekên giran vegeriyabû ser wan herdu giran. Li wir di navbera me û çeteyan de lîstikekê dest pê kiribû. Yên ku nezaniyan, dê bigotiyan em ji xwe re bi keyf dilîzin. Bazdan, liv û tevgerên me, awayê şerkirina me ya li wir wisa bû. Min gazî hevalê Mehmûd kir, min rewşa wan pirsî û got; “hevalê Mehmûd, ger em van hevalan xelas nekin, wateya jiyana me nîne.” Hevalê Mehmûd di aliyekê de şer dikir, di aliyê din de jî bersiva min da û got, “Raste heval. Lê çi dibe bila bibe, emê vê çemberê bişkînin, hevalan ji çemberê derxin. Ger ev hêza me li

wir îmha bibe, wê bi vir re sînordar nemîne. Wê dijmin hêz bigire û êrişî gelek cihên din bike. Ev çember şikandin wê çarenûsa rojên pêş diyar bike. Lewma çi dibe bila bibe heta dawiyê divê em li ber xwe bidin. Divê em nehêlin ew zêdetir pêş ve bên. An emê li vir şehîd bikevin, an em nahêlin ew bi pêşde bên û emê êrişa wan bişkînin." Herkes di ferqa vê rastiyê de bû. Lewma çi ji kê dihat dikir, bi hemû hêza xwe ve şer dikir û dixwest pêşiyê li wê pêla dagirkeriyê bigire. Bi rastî jî ew der ji bo me bibû xala diyarkirina çarenûsa pêşerojê, şerê li eniyên din.

Ji aliyekê ve jî me bi hevalên di çemberê de mayîn re diaxivî. Carna ez û carna jî hevalê Mehmûd ew kordîne dikirin. Min bi hevalê Harûn re axivî:

-Harûn, çavê min, baweriya min heye hûnê hevalan xelas bikin ji wê çemberê. Dê hinek din lez bikin, hevalan biparêze. Hay ji xwe hebin. Em nahêlin çete bigihêjin we.

-Başe heval. Çi ji dest me tê em ê bikin. Em bi hemû hêza xwe hewl didin çemberê bişkînin. An emê bi li ber xwe bidin û rizgar bibin, an jî wê şehîdbûnek bi rûmet bibe para me. Ti hêz nikare me radest bigire.

-Niha rewşa we çawa ye?

-Tankek nêzîkî me bû. Heval lê dixin. Aha, Agir bi tankê ket, hevalan roketek lê dan. Bijî bijî destê te saxbin heval. Tankê derbe xwar, agir pê ketiye.

Ji aliyekê ve hevalê Harûn li ser cîhazê tekmîl dida, ji aliyê din ve jî destxweşî li hevalê tank îmha kirî dida û dengê wî bi kelecan li ser cîhazê bilind dibû. Her wiha ji aliyê bakur ve deng bilind bûn, gelê me yê didît ku agir bi tankê ketiye dikirin qîr, bi tilîlî, çepik û fîtikdanê dilxweşiya xwe didan diyarkirin. Toz û dûkêl ji cihê tankê lê derbe xwarî bilind dibû. Dema ku tankê derbe xwar hinekê êrîşên wan sekinîn. Ji ber çeteyan xwe didan paş tankan û wisa êriş dikirin. Bi wan çeperên ji pola bawer bûn. Lê vîna şervanên Kurd a ji hemû polayan qayîmtir ew baweriya wan şikandibû. Guleyên roketê li nav tankek wan ketibû û agir bi ser tankê ketibû. Di wê navberê de dengê hevalê Şivan hat ji cîhazê. Gazî kir û got;

-Heval, hammr ber bi me ve tê, kêmek maye bigihêje me. Heval lê dixin, em niha nikarin bilivin.

Di wê kêliyê de bêdengiyek çêbû, em dihizirîn ka em dikarin çi bikin. Cardin hevalê Şivan axivî û got;

-Hevalê Agir bi B-7'ê lê xist. Hinekê paşde vekişiya, xwe xistiye nav daran. Em lê dixin, nikare bilive. Çete ji hammrê dernakevin. Em vedikişin, çend heval li Hammr'ê dixin. Rewşa me başe, em li gorî fermana we dayî tev digerin.

Hêj em wisa bi hevalan re taxivîn, hevalê Baz me li gir dibine û dibêje qey yên gihiştîn serê gir çete ne. Hevalê Baz li ser doçkayê bû. Ji aliyê din ve bi rastî çete

gihiştibûn gir û hevalê Baz bi doçkayê li wan dixist. Kesî bawer nedikir me xwe gihandiye wê derê. Lewma hevala Narîn bi kelecan di axivî û bi cîhazê pirsa rewşa me dikir. Ji aliyekê ve hevalê Baz bi doçkayê derdora gir dida ber guleyan, ji aliyê din ve çeteyan berê çekên xwe yên giran hemûyan dabûn herdu giran û bê navber gule li me direşandin. Piştî me derfeta bersivdayînê dît, hevala Narîn henaseyek kûr girt. Lê ev ji ber saxbûna me bû. Nedizanî hevalan riya vekişandinê dîtine û hevalê Loqman wan tîne. Lê tevî wê jî morala hevala Narîn bi agahiya saxbûna me bilind bibû û vê yekê xwe di dengê wê yê li ser cîhazê de nîşan dida. Ji ber girtina wî girî hêviya rizgariyê ava dikir û girek bilind û li ser riya vekişandina hevalên me bû. Em ketibûn wan herdu giran û tevî hemû êrişên çekên giran jî em hêj sax bûn.



Di aliyekê de ji her alî ve em li çeteyan dixin, dixwazin bala wan ji ser riya hevalan a vekişînê belav bikin. Ji aliyê din ve jî hevalên vedikişin jî şer dikin û hewl didin

xwe bigihînin xendekên li ber sînor ku bikarin di wir re derbasî aliyê me bibin. Hêj şer bi hemû dijwariya xwe didomand, hevalê Loqman cardin vegeriya. Vê carê li pey xwe maşînekî din jî anibû. Hem maşîna me ya cepilxanê, hem komek heval bi xwe re anibû. Tekmîla xwe da û got, “heta niha me bîst heval anîn. Lê hêj heval mane, divê em biçin pêşiya wan û bikarin wan jî bi lez ji wir xelas bikin.” Ji çemberekî wisa bîst kes rizgarkirin ne tiştek kêm bû. Li gorî şertên me dijî serkeftinekî mezin bû. Gavekî mezin bû. Hêj min guhdarî hevalê Loqman dikir, hevalê Mehmûd gazî kir û got, “deh heval gihiştine gel me. Hevalên me yên ji vê herêmê ne, xelkên van gundan in. Hinek ji wan birîndarin, lê birînên wan sivik in. Pir bêzar bûne, ez wan dişînim gundê Aşmê. Bila biçin wir vehesin.” Di wê kêliyê de coşek pir mezin ket dilê min. Ew westan, bêzarî, tîbûn û birçîbûna min ji bîra min çû. Ez zindî bûm, wekî ku bi rojane ez di vehesînê de me li min hat. Te digot qey ew ferşê giran ê ji sibê ve dilê min di bin xwe de didewisîne ji ser dilê min radibe, ez dikarim bi hêsanî henase bigirim. Hevalê Loqman cardin vegeriya û çû pêşiya hevalên hewl didan ji çemberê derkevin.

Ez tam vedigeriyam ku biçim cihê xwe, çavên min bi kal û pîrekê ket. Min dît jin û mêrek temen mezin serê çêleka xwe girtine, benê çêleka wan di destê wan de ye û ber bi me ve tên. Wexta min ew dîtin, ez matmayî bûm. Di nava ewqas çek û teqemenî re li wir çi dikirin. Ez bezîm pêşiya wan, min ji wan re got;

-Hûn li vê derê çi dikin?

-Keça min, em di gund de mabûn. Mal û milkê me ev çêlek e. Ma em çawa wê bihêlin? Ji xwe hingî fîşek dihatin, me nedikarî em xwe zû bigihînin vî alî.

-Mamo, xwedê ji te razî, ma dema anîna çêlekê ye? Tu rewşa dayê nabînî, nikare baxive, gav bavêje êdî. Xwe di vir de berdin jêr, li gundê Aşmê hevalên me hene. Bila bi we re mijûl bibin, cih, xwarin û avê bidin we. Bibore, ez niha nikarim kesekî bi we re bişînim. Lê hema vê riyê bernedin, xwe rast berdin gund. Li pêşiya we dijmin nîne, hêdî hêdî biçin, ji vir dûr kevin.

Kalo wisa westiyabû û ji hal ketibû, heta peyvek dikir çend caran xweziya xwe dadiqurtand. Çavên wî yên di rûyê wî yê esmer de kûr bûyîn ji zimanê wî zêdetir di axivî. Hinek dî xwe nêzîkî min kir û got:

-Erê keça min, me di rê de, hema li pişt we çar hevalên we dîtin. Hevalek birîndar bû. Pêncî metran li jêrî vir bi xew ve çûne. Me kir û nekir, me nekarî em wan ji xew rakin. Li hewara wan biçin, emê xwe hêdî hêdî berdin jêr. Bila xwedê alîkarê we be, destê xwedê li ser serê we be berxa mamê xwe.

Dema Kalo daxivî, pîrê serê xwe dihejand û gotinên wî erê dikir. Lê çavên wê tijî rondik bûn, wekî bi awirên xwe lêborînê bixwaze û xweziyê bi ciwaniya xwe bîne digot, “me nekarî em wan ji wir bînin, em kal û pîr in. Li

me biborin.” Min pîrê hembêz kir, gotin ji devê min derneket. Ji ber tiştek min bikariya ez bêjim nebû. Me ya diviya bê kirin dikir, me bi bihayê canê xwe ew xak diparast. Min zimanekî din nedizanî. Ma ji xwe dê çi tişta din bikariya birînên di dilê Kalo û Pîrê de dikelin bikewînin? Dê çi gotinan bikariyan wê mija xeman a li ser awirên wan rake? Tam min xatir ji wan xwest û min xwe berda jêrtir, Tekoşîn kir qîr û got,

-Xwe bavêje erdê!

Bi dengê Tekoşîn re teqînek mezin çêbû, ji cihê Min Kalo û Pîrê lê hiştin toz û dûkêl bilind bû. Guleyekî topa hewanê li wir ketibû. Ez ji pişt kevirê min xwe avêtibû pişt derketim, min di nav wê tozê de çavên xwe li derdor gerand. Min ji xwe re got, heyf, piştî ewqas êş û azarên rê, pevçûn, fîşek û guleyan, tam di gihiştina cihê aram de şehîd bûn. Ev hizir hemû di nava çend çirkeyan de di hişê min re derbas bûn. Min dît, li jêr cihê teqînê çend metreyan reşiyekê xuya kir. Bu kuxte kuxta Kalo, rabû ser xwe, pîrê jî li gel wî. Hêj benê çêlekê di destên Kalo de bû. Min wê kêliyê bi dîtina dayîk û babê xwe jî hestekî wisa xweş jiyan nedikir. Ez ber bi wan ve bezîm, kalo çavên xwe yên xemgîn li rûyê min gerand û got

“Keça min, ka av li gel te nîne? Em xeniqîn ji tîna.

Av li gel min nebû. Mirov di kêliyên wisa de dikare roniya çavên xwe jî bide. Lê mixabin çavên min nedibûn av û tîbûna wan nedişkand. Piştî min got av li gel min

nîne, ew jî ji rewşa min matmayî man, wekî ku ji pirsa xwe şerm kiribin bêdeng ketin rê û berê xwe dan jêr. Min li pey wan got;

-Qet nesekinin, ev der xeter e. Xwe zû bigihînin gund. Xeman nexwin, emê niha biçin wan hevalan jî bînin.

Ez çûm cihê Kalo nîşanî min dayî. Min dît çar heval li wir ketine erdê, êdî nikarin gav bavêjin. Di wê kêliyê de min bi telefonê gazî hevalê Loqman kir, min xwest bizanim ka li kû ye. Hevalê Loqman nêzîkî me bû, ber bi me ve dihat. Ji cihê ez lê xuya nedikir. Lê got, “ez nêzîkî girê hûn lê bûme.” Piştî çend deqîqeyan dengê maşîna wî hat guhê min, pîqap tijî heval kiribû û ber bi me ve dihat. Bi saetan bû Loqman di navbera girê em lê û eniya heval lê vedikişîn de diçû û dihat. Piştî Loqman gihişt gel me, çar hevalên li wir jî li maşînê siwar kir û ji min derbas bû. Ji xwe di kêliyên vekişandina hevalan de, ciwanên bakur ji gundê Aşmê û Ziyaretê yên serxetê dest bi dehfdana têlan kiribûn. Leşkerên Tirkiyê çeperên xwe yên li ser wê xetê vala kiribûn, gel û ciwanên bakur ketibûn cihên çeperên wan. Alîkariya ji wî aliyê bakur jî bi me re hat kirin, kordîne û agahiyên wan bi riya telefonan didan me, bû sedem ku tevî hemû dijwariya êrişên çeteyan jî em hevalên xwe yên di çemberê de mayîn ji wir rizgar bikin. Ji xwe piraniya hevalên ku nedikarîn bimeşin û ji westanê şebikîbûn, hevalê Loqman bi maşînê anîn. Yên din jî xwe gihandibûn xendekan û di wan xendekan re ji çemberê derketin. Saet didu û nîvê nîvro ji derveyî

hevalê Şivan û hevalê Harûn, hemû heval gihiştin gel me. Ew fermandar bûn, heta hatina hevalê herî dawiyê jî wan cihê xwe bernedabûn. Bi hatina hevalan re, herkesî henaseyekî kûr kişand. Hema hevalên digihiştin gel me, me li wir nedihêlan, yekser dişandin gundê Aşmê yê Rojava.

Di komekî hevalê Loqman gihandî gel me de, Babê Êzda hebû. Keça wî tevlî me bibû, navê xwe kiribû Êzda. Ew û babê xwe bi hev re hatibûn eniya şer. Herduyan gelek caran di heman enî û çeperan de şer kiribûn. Babê Êzda, kesekî temenmezin û qelew bû. Giraniya wî bi qasî sed û deh-bîst kîloyan bû. Kesekî gir, ji xwe bawer û dilsozê doza xwe bû. Lewma ji keça xwe, hatina wê ya nav refên şervanan pir serbilind bû. Bi xwe jî ti caran ji pevçûnan paş nedima, di cihên xeter de cihgirtin ji bo wî xelata mezin bû. Babê Êzda, wisa tî bibû, lêvên wî yên stûr qelişîbûn. Xwîna ji lêvên wî hatî hişk û reş bibû. Ji xwe ji ber dûkêl û toza heyî jî ew xwîn li ser lêvên wî mîna tamîzkan diyar dibû. Tevî giraniya gewdeya xwe bi vînekî mezin li ber xwe dabû, xwe gihandibû cihê ku heval bikarin wan bi maşînê jê bigirin. Çeka xwe ji milê xwe nedanîbû. Lê ji ber germaya zêde êlekê xwe ji ber xwe kiribû, wekî çeketekê avêtibû ser milê xwe. Dema gihişt me, min xwest ez destên wî bigirim, pê re bibim alîkar û bikare zû bimeşe. Lê ewqas gir û bilind bû, ez û ew li gel hev wekî xal û baneşanê diyar dibûn. Dema min destê wî girt, bi çavekî tijî hezkirin temaşeyî rûyê min kir û got;

-Keça min, nikarî vê qewdeya min a qelew ji erdê rakî.

-Xem nake, qet nebe ez dikarim hinekê barê te sivik bikim. Ka em we zû derbasî aliyê din bikin. Ji ber bi topên hewanê li vir dixin, nabe hûn li vir bisekinin.

-Bila Kurd nanekê bixwin, dehan bikin gorî û qurbana we jinên Kurd.

Dema wisa got, di ber xwe de kenî û temaşeyî hevalên jin ên din jî kir. Di wê kêliyê de lêva wî ya qalik girtî cardin tekqî, dilopek xwîna sor di nav wê birîna bi toz de biriqî. Min dît ku taqet tê de nemaye bikare bimeşe. Ji bo li ser me nebe giranî li ser çokên xwe dixuşike, destên xwe dide erdê û bi çarlepkî xwe berdide jêr.

Min xwe li ber wê hewldana wî negirt. Min ji çend hevalên temenê wan ciwan xwest ku xwe bixin bin milên wî, heta wî digihînin cihekî ku guleyên topan jê nagirin. Me çek û alavên li gel rakir, çend hevalan xwest bikeve bin milên wî û em ji wir dûr bixin. Lê me kir û nekir, wî destûr neda em wî bibin. Li me vegeriya û got;

-Em di şer de ne. Ma dibe ez çar şevranan ji eniya şer bi xwe ve mijûl bikim? Hûn vegerin çeperên xwe, ez dikarim biçim.

-Babê Êzda, ka wê demê em te bibin jêrtir, nexwe em naçin. Mereq neke, heval li wir hene, em niha başin. Tenê bi çekên giran guleyan davêjin. Rewşa hevalan baş e, heval hemû ji çemberê derketin.

-Ez bawerim keça min. Min şerkerî û egîdiya hevalan dît. Xwelî bi serê van dijminan ku ketine hemberî van xweşmêr û şêrejinan. Lê xwezî av hebûya, tenê qurtek av. Baweriya te hebe, dijminê herî mezin bê avî ye.

-Tevî hemû dijminan jî hûn gihiştin vir. Raste wile heta mirovên wekî we bi vîn, dilsoz û fedakar hebin, kes bi me nikare. Lê mixabin av li gel me nîne. Ka xwe bide ber van keviran, ezê ji hevalan re cihê te bêjim, bila bên te bibin gund.

Rewşa ti hevalê/î ji ya babê Êzda ne cuda bû. Hemû ji tîna ketibûn, nedikarîn bimeşin. Me ji wan re mizgîniya rizgarbûna hemû hevalan dida, lê wan digot 'av' û bi erdê re dibûn yek. Hinek hevalên ku hêza gav avêtinê di wan de mayîn, dikarîn çend peyvan baxivin jî destên hevalên din digirtin, dixwestin moral bidin wan ku bikarin wan bigihînin gund. Me Babê Êzda li nav kevirên reş danî pişt kevirek hinekê mezin, pala xwe da kevir û em vegeriyan çeperên xwe. Hevalên herî dawiyê gihiştîn xendekan jî her carê çendek bi maşîna Loqman digihiştin gel me, me bi wan re jî daxivî û ew dişandin jêr. Ew cara çendê bû Loqman bi maşîna sor diçû dihat, êdî wî jî jimara çûyînhatinên xwe ji bîr kiribû. Di vegera wî ya herî dawiyê de çeteyan li maşîna wî xistibûn. Çend guleyên BKC li teniştên maşînê ketibûn. Bi zorê ji şehîdbûnê filitî bû. Piştî gihişt nêzîkî me, heval jê peya bûn, maşîn di cihê xwe de sekinî. Maşîna sor a ku bibû sembola serkeftina rojê, tevî hemû hewldanên ajotina

Loqman ketibû rikê, di cihê xwe de nedilivî. Her cara Loqman pêl li gazê dikir, tekelên wê di cihê xwe de dizivirîn, toz bi ser maşînê diket. Wekî ku bêje 'min erka xwe pêk anî, rola xwe lîst' nazdariyên xwe li xwediyê xwe yê leheng dikir. Di kêliyên wisa zor û zehmet de, hinek kes hene mohra xwe li demê didin. Hevalê Loqman yek ji wan kesan bû. Naskirina wî ya erdnîgariyê, wêrektiya wî, pisporiya wî ya di ajovaniyê de, xwînsarî û dilsoziya wî ya bi hevalên wî, gelê wî re hêlabû em çemberekî mirinê bişkînin. Loqman û rêbaza wî, bibû navê hêviya wê rojê. Ger di wê dema teng de hevalê Loqman nebûya, me ew rê nedizanî û heta êvarê jî hevalan bi meşê xwe ne digihandin me. Ji xwe wê bikariyan an ne, ew jî mijarek dine. Lewma wê rojê herkesî destxweşî li Loqman dikir. Ya rast hêjayî hemû pesindariyan bû tişta kirî. Her wiha piştî hemû heval ji çemberê derketin û xwe gihandin cihên ewle, me gazî maşînekê kir û hat maşîna sor a bûyî sembola rojê ji wir bir bajêr ji bo tamîrê.

Piştî hemû heval hatin û derbasî gundê Aşmê bûn, hevala Narîn bi telefonê gazî kir û got;

-Hevala Meryem, emê komek heval bişînin şûna we.

-Na heval, hûn cihên xwe bigirin, saxlem bikin. Ji hevalan zêdetir hûn dikarin ji me re hinek av bişînin. Ger av bigihêje me, pêdivî bi hatina hevalan nake.

Ji ber tevî ku çember şikestibû, heval derketibûn jî wan dixwest wî girî bidest bixin, ji wir êrişî gundê Çariklî jî bikin. Ew der cihek bilind û serwerê deverê bû. Ger biketiyan wir, me nedikarî em li jêr bimînin. Piştî axaftina me demekî kurt, hevalê Hogir bi komekî heval re hat girê em lê. Hevalê Hogir kesekî di nav têkoşîna me de kevin bû, bi ezmûn bû. Lê li qada Kobaniyê di xebatên civakî de cih digirt. Dema gihişt gel me, şad diyar bû. Hinekê westiya bû, lê diyarbû ji rizgarbûna hevalan keyfxweş bûye. Berê xwe da min û hevala Tekoşîn û got;

-Hevalno, hewceyî gotinê nake, diyare hûn çiqas bêzar bûne, westiyane. Min çend hevalên ji gundên derdor anîne. Hevalên sivîl in, zêde ezmûna wan a şer nîne. Lê xem nake, ezê li gel wan bimînim. Ezê çend hevalan bişînim girê hevalê Mehmûd jî lê dimîne. Hûn xwe berdin gel hevalên li jêr, bila çeperên girê Zagros xurt bikin. Heta hûn hinekê vehesin, emê li şûna we bimînin.

Çeteyan li ser girê Zagros jî êrişek mezin pêk anibûn, lê êrişa wan hatibû şikandin. Her wiha êrişî gundê Mala Berkel kiribûn. Mala Berkel malbatekî şerker û kêrhatî bû. Tevî ku gund ji heft-heşt malan pêk dihat, berxwedanekî mezin raber kiribûn, li gel hevalên li wê eniyê êrişa çeteyan şikandibûn û tankekî çeteyan rûxandibûn. Gundê Mala Berkel nêzîkî gundê Cibînê ye. Tabûra hevalê Bişar li wir bû. Hevalê Bişar berpirsê tabûra endamên eşîra Kêtikan bû, bi xwe jî ji wê eşîrê bû. Eşîra kêtikan tabûrek hêza leşkerî avakiribûn, gund

û devera xwe diparastin. Di demjimêrên em bi derxistina hevalan a ji çemberê ve mijûl bûn, me dengê hevalan ê Bişar li ser cîhazan dibihîst. Her kesî gazî Bişar dikir, dixwest bizane ka li wir çi diqewime. Bişar bi dengekî têr û tijî ji xwe bawer digot;

-Em başin, êrişên dijmin şikestin. Em mereqa hevalên li Zormixarê dikin, ka rewşa wan çawa çêbû?

Heta ji me dihat, me li ser cîhazên bêtêl bê şifre ne di axivî. Lê hinek hevalan carna ew rêzik pêk nedianîn, bê şifre di axivîn. Piştî heval ji çemberê derketin û şûn de, hevalan mizgîniya rizgarbûnê dan hevalê Bişar. Di nav me de carnan mizgîniyên wisa bi kêfxweşiyek xweş dihate raber kirin. Di cewherê xwe de ev girêdana bi hevaltiyê re bû. Ji ber vê jî li ser bêtêlê vekirî dihate axaftin. Wî jî hema vê carê bêyî ti şifreyan bikar bîne li ser cîhazê got;

-Em destxweşiyê li hemû hevalan dikin. Hevalno, bila ev hovên pêxwas bizanin, ew bi şervanên Kurd nikarin. Em bi rizgarbûna hevalan pir keyfxweş bûn, niha hegî çete xweşmêrin bila êrişî me bikin. Bi vê moralê em dikarin deh rojên din bênavber şer bikin. Em serkeftinê ji hemû hevalan re dixwazin, silav û rêz.

Gundê Cibnê û Mala Berkel, ew herêm wekî herêma eşîra Kêtikan dihat nasîn. Eşîra Kêtikan, bi taybet gunde cibne u  Mala Berkel di şer û wêrektiya xwe de navbandg bû. Tevî hemû êrişan jî gotin em ji gundên xwe

dernakevin, heta yek ji me maye wê çete nekevin gund û warên me. Berxwedanekî bêhempa raber kirin, wê rojê li gel hêza me ya li wê eniyê nehêlan gund bikevin destên çeteyan.

Piştî hevalan cihên me yên li gir dagirtin, me xwe berda jêr. Li gundê Aşmê dibistan hebû, hemû heval li wir kom bûn. Piştî gihiştibûn wir, yekser ketibûn, kesek li ser piya nemabû ji koma di çemberê de mayîn. Kî gihiştibû wir, piştî av vexwarinê yekser xwe di cihê xwe de dirêj kiribû. Dema em gihiştin wir, çavên min bi dîmenên balkêş ket. Ger ne ji livandina singa wan bûya, kesî bawer nedikir ew mirov saxin û dijîn. Hevalan xwarin amade kiribû, lê kê dikarî wan ji cihê wan rake. Westanê, bêxewî û tînê ew bêzar kiribûn. Piştî gihiştîn cihê xwe wekî ji hiş çûbin bi erdê re bibûn yek. Şer bi dawî nebibû, diviya ew heval rabin û xwe komî ser hev bikin. Em ketin hundirê dibistanê, me gazî hevalan kir ku rabin xwarina xwe bixwin. Piştî hewldana demekî dirêj kit û matê hevalan karîn rabin ser xwe. Me êvarê hemû heval şiyar kirin, me bi wan re axivî û got; "Hevalno, êriş û hewlên dagirkirinê yên çeteyan berdewam in. Niha em rewşa we dizanin. Lê ji derveyî parastinê çareyekî me ya din nîne. Lewma hinek heval bila xwe amade bikin, biçin çeperên pêş bigirin. Bila hevalên mayîn jî vehesin, em kom bi kom cihê hevalan biguherin ku heval bên ser xwe." Piştî wê kombûnê sih heval man, hevalên din ji bo çûyîna çeperan xwe amade kirin.  Me got, bila hevalên

mayîn vir heta sibê binivin, emê sibe cihên hevalên din biguherin û wan bişînin.

Piştî derketina hevalan a ji çemberê, em bi du tiştên girîng hesiyan. Du bûyerên ku em di wan rojan de şad kirin. Yek girêdayî agahiya şehîdbûna çar hevalên li Gundê Bayedî mayîn bû. Ya din jî agahiya desteserkirina sê kesên payebilin ên çeteyan bûn.

Me piştî heval şandin çeperan, ji bo plansaziya roja dî em kom bibûn. Êriş berdewam bûn, diviya em li gorî êrişên mezintir xwe amade bikin. Hêj me dest bi nîqaşa plansaziyê nekirî hevalek bi lez hat gel me û got; “Hevalên şehîd bûyîn hatin. Heval hatin, gihiştin me.” Ewqas dikenî û dilxweş bibû, me gotinên wî tam fêm nedikirin. Ji bo em rewşê bizanin min hinekê bi dengekî hişk got; “Heval, tu çi dibêjî şehîdên çi, hevalên kî derê? Ka normal bêje em bizanîn tu dixwazî çi bêjî.”Di hişê kes ji me de nebû ew hevalên me yên li gundê Bayedî sax vegerin û em carek din wan bibînin. Ew heval jî wekî me bi wê şaqiz bibû, ji keyfxweşî û matmayînê tenê digot “heval hatin, hevalên şehîd hatin. Piştî gotina min hinekê kenê wî rawestiya û got; “Çar hevalên me yên li gundê Bayedî mabûn û me digot şehîd bûne xwe gihandine hevalan. Heval saxin. Xwe di gund de veşartine. Piştî bûye êvar ji gund derketine û xwe gihandine vê derê. Niha li dibistanê li gel hevalan rûniştîne. Min bi xwe dîtin.”

Bi gotina wî re me dest ji nîqaşa plansaziyê berda û em rabûn ser xwe. Kelecan û coşa wî derbasî me jî bibû. Lê her çiqas em bi gotinên wî bawer bûn jî wekî em bixwazin bi xwe bibînin daxwazek mezin a dîtinê di me de çêbû. Em gihiştin ber deriyê dibistanê, dengê ken û henekên hevalan eywan tijî kiribû. Heval hemû li derdora wan kom bibûn. Wan jî behsa serpêhatiya xwe dikirin. Em gihiştin gel wan, me hev hembêz kir û em bi hev re rûniştin. Hevalan xwarin û çay ji wan re amade kiribûn û danibûn pêşiya wan. Lê ji ber mereq û pirsên hevalan xwarin di cihê xwe de mabû û wan her yekê ji aliyekê ve dixwest behsa serpêhatiya jiyan kirîn bikin. Hevalekê çaydana çayê girtibû dest xwe û piyale tijî dikirin. Çaydan hinekê rakir jor, ji lûleya çaydanê av berda hundirê piyale û got; “Ev çay ji bo xatira hevalên me yên şehîd e. Min berê gotina şehîd namirin bihîstibû. Lê bi rastî ez cara yekê bi xwe dibinim.” Di ber gotina wî re hinek hevalan destên xwe bi stûyê wan hevalan alandibû, hinekan destên xwe li milên wan didan û keyfxweşiya xwe ya ji ber hatina wan diyar dikirin.

Her çar heval jî sivîlbûn û şêniyên gundê Bayedî bûn. Hevalekî ji wan ji ber kefyxweşiya hevalan wisa hestyar bibû nedikarî pariyê nanê xistî devê xwe daqurtîne. Ji keyfxweşiyê girî qirika wî tijî kiribû. Hevalekê berê xwe da me û got, “Mamo, ka tiştên we ji me re gotin ji hevalan re jî bêjin. Hêj zimanê wan venebûye, şaqiz bûne. Ez bawer dikim hêj bawer nakin hûn saxin û dibêjin qey xewn dibînin.” Bi gotina wî re hemû çav vegeriyabûn ser

rûyê endamên rêbeberiyê. Dengê kenê hevalan jî bilindtir bibû. Min jî got; “Wile raste, em şad bûne. Ji ber îro tekmîla wan wekî şehîd hat dayîn û niha em wan bi xwe sax dibînin. Bi rastî em mereq dikin.” Hersiyên din li zilamê hevalê me jê re gotî mamo temaşe dikirin. Ew ji hemûyan mezintir bû, diyar bû dixwestin ew baxive. Mamo pariyê nanê xwe daqurtand, henaseyek kûr kişand û got; “Hevalno, wile em jî ne kêmî we şad bûn. Lê diyare xwedê hêj qedera me temam nekiribû. Çete destpêkê ketin taxa me lê şer dikir. Hevalên din paşve vekişiyan û wan gotin qey em şehîd bûne. Li gel me bêtêl jî nebû. Hema dema çete ketin taxê û me dît jimara wan zêde ye, çekên giran li gel wan hene, me got ya herî baş em xwe veşêrin. Ji xwe agahiya me ji hevalan jî nema. Em ketin hundirê kadînek kayê. Du çete ketin hundir, yekî got, ‘ka em agir bi xanî bixin.’ Yê din got, ‘na na. Bila mal saxlem bimînin, ji xwe me gund girtiye. Emê paşê bên lê cih bibin. Em çima xaniyên xwe bişewitînin. Êdî bûn yên me.’ Ya rast dema yê destpêkê behsa şewatê kir rih di me de nema. Lê bi bersiva yê din me got em dengê xwe nekin û heta êvarê di cihê xwe de bimînin. Paşê behsa şer, cihên heval lê heyîn kirin. Me bi riya wan zanî xeta hevalan girtî kijane. Hema tarî ket erdê, em ji kadînê derketin û me ber bi xeta hevalan ve baz da. Me derdora gund baş nas dikir. Ji xwe gundê me bû. Di encamê de hûn dibînin em sax in û em gihiştin we. Elhemdûlîlah. Dema em gihiştin vê derê me zanî heval jî ji çemberê derketine, tiştek bi kesî nehatiye. Me vê carê kefen çirand. Heta carek dî xwedê kerîm û delil e.”

Me piştî bi qasî nîv saetê guhdarî wan kir û şûn de, em cardin ji bo çêkirina plansaziyê ji gel wan çûn. Bi derketina me re cardin dengê ken û henekên hevalan eywan dagirt û heta em çend metreyan dûr ketin jî dengê ken dihat guhên me. Me piştî çêkirina plansaziyê hêza xwe li gorî rewşa nû cardin bi cih kir. Me her di wê şevê de dest bi girtina cihên ji me hatîn girtin kir. Roja dî me dest bi êrişan kir. Gelê me yê bakur li ser sînor, li gundê Ziyaretê kon vedabûn. Me li kî alî şer bikiriya, wan jî konên xwe tanîn pêşberî me vedidan û ji wê derê alîkarî didan me. Li aliyê me şerê li dijî çeteyan, li aliyê din jî berxwedana gel a li dijî leşkerên artêşa Tirk û çeteyên wan hebû. Li gundê Ziyaretê leşker û polîsan êrişî gel kir, birîndarên wan çêbûn. Lê gel bi biryar di cihê xwe de ma û serî li hember êrişan netewand.

Çeteyan ji aliyê sînor ve çend caran êriş kirin, her carê êrişên wan hatin şikandin. Hevalê Hogir ji têkiliyên bi aliyê bakur berpirsyar bû. Çi çêdibû agahiya wî çê dibû, ji vî alî ve ew kordîne dikirin. Li gorî plana me, hevalê Harûn û hevalê Heqî li gel hêza di bin berpirsyartiya wan de li xeta gundê Aşmê, Çariklî û heta digihişt ser sînor disekinîn. Hêza di bin berpirsyartiya hevalê Harûn de wekî du baskan bi cih bû. Hevala Medya û hêza li gel wê li aliyê xeta gundê Cibnê, Mala Berkel heta digihêje ser ava Firatê hat bi cih kirin. Hevalê Harûn, Şivan û hevala Medya berpirsên vê eniyê bûn. Hevalê Heqî berpirsyarê xeta di navbera Serxet û Binxetê de bû. Hevalê Heqî ew der baş nas dikir û bi xwe jî ji gundê Çariklî bû. Hevalê

Hogir û hêza li gel wî jî xeta li ber têlên sînor heta bigihêje ser girê Çarixlî bi cih bû. Ew xet di warê çûnûhatinê de ji bo me stratejîk bû, diviya bê girtin. Me xwest hevalê Hogir wê xetê bigire. Berê wî berpirsyariya wan gundan dikir û dever nas dikir. Dema me bi hevalê Hogir re axivî û peywira wî got, hevalê Hogir bi dengekî ji xwe bawer û ji dil got;

-Hevalno, ez bi xwe jî dixwazim li wê eniyê bim. Ger em di rojên wisa de erkên xwe yên demê pêk neynin, emê kengê pêk bînin?

Em di tevgera avakirina eniyan de bûn. Tabûra hevalê Bişar li Cibînê bû, bi çûyîna çend hevalên din re jî ew der hat xurtkirin. Xwecihên gundên ku ji me hatibûn girtin, hemû di xeta Dîkmetaşê de bi cih bibûn. Gel li dibistanan diman, di dibistanan de bi cih bibûn. Ji xwe piranî xizm û nasên hevbûn, endamên heman eşîrê bûn. Pez û dewarên xwe anibûn û li gel wan diman. Diviya me êvaran xeta parastina derdor xurt bikiriya. Me li gorî wê hêza xwe rêxistin kir û di çeperan de bi cih kir. Me ji aliyekê ve jî perwerdeya çekan dida hevalên ku perwerdeya leşkerî nedîtibûn. Ji xwe wan rojan komek heval ji bo taqwiyê ji me re hatibûn. Bi hatina wan hevalan re destê me hinekê xurt bibû. Piştî bi cihbûna hêzên me, wê rojê pevçûnên giran çêbûn. Şer li ser erdnîgariyek bi qasî 30 kîlometrî pêk dihat. Ev xeta me dayî pêşiya xwe ji gundê Aşmê heta ser xeta Firatê gundê Qumlix bû. Ev dever ji bo şer dest dayî bû. Bi

taybet di derdora Çemê Firatê de ernîgarî tam li gorî dil û daxwaza me bû. Dar û devî hebûn, erdên çal û kurtik, kevir û dolikên biçûk serweriya şer dabû me. Li gorî plana me dayî pêşiya xwe, cihên me kirîn armanc hemû hatin girtin. Cih cihan pevçûn hebûn, lê vê pêla êrişên me hêza me ya şer wekî agir gur kiribû. Her wiha gel jî moralek mezin girtibû.

## Tola Şekrokên Me Hat Girtin

Di wan kêliyên şer û amadekariyên me bi hev re dewam dikirin de, gote gota ku dê gelê me yê li bakur, ku li ser sînor kom bibû derbasî Kobaniyê bibe hebû.  Piştî van gote gotan hêj hefteyek derbas nebûyî, gel di aliyê gundê Aşmê ya serxetê re hewl da sînor derbas bike. Hevala Viyan agahî da me. Bi dengekî tijî kelecan daxivî û got;

-Heval Meryem, gelê Bakur derbasî Kobaniyê dibe.

Dengê hevala Vîyan, xwe li quncikê hişê zarokatiya min da, di kuçe û kolanên demboriya min de deng veda. Wekî hezar dengan li guhên min zivirî. Gelê Serxetê, sînorên di wêneyên li ser awirên zarokatiya min ve zeliqîn ji holê radikir. Ew têlên rêsayî yên li ser awirên şikestî yên dayîk û babên min ên serxetî û binxetî, ew têlên şekrokên zarokên welatê min dadiqurtandin, ew têlên ku her roj dilê keç û xortên warê min birîn dikirin, bi hêz, vîn û baweriya gelê min dihatin rakirin. Çi hestek

bêpênase bû ew kêlî. Ez bibûm zarokek heft salî. Min şekrokên xwe yên kun ji ser wê axê kom dikirin, dikirin gewlaz û bi gerdena pêşerojê ve dikir. Ez çend çirkeyan çûbûm zarokatiya xwe, lê ne dema wê bû. Diviya ez vegerim wê rojê. Beriya wê bi çend çirkeyan dengê hevala Viyan dihat, lê min nedizanî çi dibêje. Ez rêwiya demekî dûr û dirêj bûm. Çend çirkeyên kurt û bi qasî temenê min dirêj. Dengê hevala Viyan ji telefonê bilind dibû û digot;

-Dê di jêrî çeperên eniya hevalê Hogir lê dimîne re derbas bibin û biçin Kobaniyê. Bi hezaran mirov xwe li sînor dane, ber bi Kobaniyê ve ketine rê.

-Başe heval, agahiyê bidin hevalê Hogir.

Hevala Viyan, telefon girt, çend çirke derbas bûn hevalê Hogir geriya û got;

-Heval, agahiya me jê heye. Me komek hevalên rê baş nas dikin şandine pêşiya gel. Ji xwe têl derbas kirine, dê derbasî Kobaniyê bibin.

Tam jî di demên wisa de mirov pêdivî bi kesên wekî hevalê Hogir dibîne. Hevalê Hogir beriya em tiştekê bêjin, tişta pêwîst kiribû. Li gorî pêdiviyan heval şandibûn pêşiya gel. Gav û kiryarên wisa mirovan şad dikin, baweriyê, hêzê didin mirov. Pişta te germ be, kesên di zanabûna erk û peywirên xwe de li gel te hebin,

pêdivî bi tirsê, fikarê nîne. Ji xwe ya pêwîst hatibû kirin. Vê agahiyê ez zêdetir şad kirim.

Min piştî axaftina li gel hevalê Hogir gazî hevalê Mehmûd kir û got;

-Em biçin pêşiya gel. Divê em gelê xwe yê berxwedanvan, leheng û egîd pêşwazî bikin.

Di wan kêliyan de gotina hestên mîn bîne ziman nebû. Ji coş û kelecanê dengê min direcifî û te digot qey dilê min ti qasidê ji bilî xwe qebûl nake. Ne hewceyî ziman ne jî çav û cihên min ên din dikir. Bi hemû xwerûbûniya xwe, xwe li dêmên min dida û ez ji halekî dixistim halekî din. Ji coşê kelek girî wekî gelê min ê sînor çirandî li qirika min dixist û dixwest riyekî herikînê ji xwe re veke. Min çend caran li ser hev xweziya xwe daqurtand, hewl da ez wê kelecana xwe derbas bikim. Paşê min bi telefonê gazî hevala Peyman kir û min jê xwest ji me re cîhazê bişînin. Heval ji wê israra min a cîhaz xwestinê şaş mabûn. Hevala Peyman got;

-Hevala Meryem, tu başî?

-Belê ez başim, ji vê baştirbûn tine ye.

-Tu çima ewqas cîhazê dixwazî, çi bûye?

-Heval, hûn seyrin, şere, pevçûne. Pêdiviya me pê çêdibe.

Min wê demê nedizanî ji ber çî heval wisa nêzîk dibûn, saetek çû hêj hevalan cîhaz ji me re neşandibûn. Ez paşê pê hesiyam, hevalan di navbera xwe de axivîne û gotine, “rewşa hevala Meryem ne başe. Tê bêjî qey dîn bûye. Heval di pevçûnê de ne, şer heye, şûna çek, alîkarî û cepilxanê bixwaze her dibêje ka cîhazê bişînin. Lê piştî demek kurt pê hesiyabûn ka ez ji bo çî wisa wekî dînan cîhazê dixwazim. Min dixwest ez bi cîhazê agahî bidim hemû eniyên me yên şer, mizgîniya rakirina sinoran bidim hevalan. Me dixwest em bi aparloran dengê dirûşm û tililiyan belavî hevalên di çeperan de bikin. Ji ber min baş dizanî ku her mirovekî li ser vê axê ji dayîkbûyî,  bi xeyala rabûna wan sînoran mezin bibûn wekî min. Lewma ew mizgînî ji min re, bi qasî agirê Kawayê Hesinkar pê xistî û mizgîniya azadiyê dayî pîroz û girîng bû. Ji ber tola şekrokên me hatibû girtin. Tola cangoriyên me yên li rastî wan têl û sînoran hatîn, li ser wan sînoran ketîn singa vê axa kevnar de hatibû girtin. Xeyala bi milyonan mirov bibû rastî wê rojê.

Bi rêketina gel a ber bi Kobaniyê ve em jî ketin rê. Ez û hevalê Mehmûd jî ji bo pêşwazîkirina gel ber bi wan ve çûn. Dema em gihiştin gel wan, dengên dirûşm, tilîliyan bilind dibû. Gel bi yek dengî digot, “Bijî berxwedana YPG-YPJ, Bijî Serok Apo,” û ber bi me ve diherikîn. Hevalê Hogir û komek hevalên din jî gihiştibûn gel wan, alîkarî dabûn wan ji bo bikarin têlan derbas bikin û di cihên bê mayîn re derbas bibin. Dema em gihiştin gel

hevalê Hogir, dengê bêtêlên hevalan bilind bibû, agahî didan yek û digotin;

-Hemû derya, hemû derya, mizgînî, mizgînî. Îro gelê Bakurê Kurdistanê Sînorên dagirkeran çirandin, herikîn axa Kobaniyê. Bi hezaran mirov ber bi bajarê Kobaniyê ve diherikin.

Ji bêtêla Hevalê Hogir dengê dirûşman, dilxweşiya hevalên li eniyên şer bilind dibû. Di ber wan dengan re dengê çekan jî tevlî dengê dirûşman dibû. Hatina gel bawerî û moralek mezin dabû hevalan. Bi wê coşê şer dikirin. Dema em û gel gihiştin hev, kêliyên derbaskirina bêriyên bi sedsalan dest pê kiribûn. Gelê me, em li şûna hemû şehîd û şervanên xwe, egîd û çelengên di ber maf û azadiya wan de xwe kirîn gorî hembêz dikirin. Bêriyên xwe, keserên xwe bi wê hembêzkirinê dişkandin. Bi mizgîniya şikandina sînor re, li bajar û gundên Kobaniyê hemûyê bû wekî roja cejna Newrozê. Gel herikî gundê Aşmê yê binxetê. Em bi gelê ji bakur re hatîn û çûn gundê Aşmê. Li gundê Aşmê amadekarî hatibûn kirin, coşek mezin çêbibû. Dema em gihiştin gund, li ser navê YPG'ê hevalê Mehmûd, li ser navê YPJ'ê min axaftinek kir. Hevalê Mehmûd derket pêşiya gel, xêrhatina gel kir û got;

-Gelê xweragir ê Kurdistanê, hevalên hêja. Em bi navê hemû şervanên azadiyê bi xêrhatina we dikin. Dil dixwest îro me hûn bi hezaran heval pêşwazî bikiriya. Bi rojane hûn jî dibînin ku li hemû eniyan şerekî dijwar

heye. Dijminê gelê me dixwaze xaka me, welatê me dagir bike. Gelê me neçarî jiyanekî kole, bindest bike. Lê tevî hemû êrişan, em wekî şervanên azadiyê, zarokên we vî gelê hêjayî jiyanek azad, bi vîn û bawerya em ji we digirin, bi hezkirin û dilsoziya bi we ve li ber xwe didin. Emê nehêlin ew jiyanekî koletî, bindestî bikin para we vî gelê leheng û berxwedanvan. Emê her tim hewl bidin layîqî vê sekna we ya wêrek û azad bin. We îro bi berxwedana xwe, şikandina sînorên dagirkeran bersiva herî rast û di cih de da hemû neyarên gelê Kurd. We îro xeyalên bi sedan zarokên xwe yên wekî min û ê din anî cih. We xeyalên min ên bi sedan caran ku li van sînorên xeyalbir temaşe dike pêk anî. Gelê Kurd û şervanên xwe ji vê sekna we hêz û baweriyê digirin, dijminên gelê me jî jê ditirsin. Ji ber hûn westiyane, ez naxwazim dirêj bikim. Dubare bi navê hemû hevalên di çeperên azadiyê de li ber xwe didin, ez dibêjim hûn bixêr hatîne bajarê Kobaniyê. Em bi we şanaz û serfirazin. Bijî berxwedana gelê me.



Gel bi heyranî û baldariyek mezin guhdarî Hevalê Mehmûd kir. Hevalê Mehmûd jî li ber wê coş û kelecana gel ketibû nava kelecanekê, rûyê wî geş bibû. Tevî westan û bêxewiya çend rojan, çavên wî dibiriqîn di ber axaftina dikir re. Bi peyva dawiyê re cardin dengê dirûşman bilind bû. Piştî hevalê Mehmûd, dora axaftinê gihişt min. Ya rast li hemberî wê sekna gel min nedizanî ez çi bêjim. Ji xwe gel gotina xwe bi kiryar anibû ziman. Min di ber wan hizran re dest bi axaftinê kir û çi ji dilê min hat min wisa axivî;

-Gelê bi rûmet, dayîk û babên şehîd û qehremanên azadiyê. Ti gotina min tişta we kirî derbas nake. Min hûn li ser sînor dîtin, we bi dest û tiliyan, bi vîn û baweriya azadiyê têlên sînor çirandin. Dema hûn derbasî vî alî bûn, kî derbas bû axa Kobaniyê maç kir. Ez dizanim ew maçkirina we hezkirin û dilsoziya we ya bi Rêber Apo û şehîdan ve ye. Hezkirina we ya ji welat, azadiyê re ye. Ez dikarim bi navê hemû jinên di têkoşîna azadiyê de têdikoşîn vê yekê bêjim we; hêjaye mirov ji bo gelekî wekî we hezar can jî hebe di ber azadiya we de bide. Em ji vê serbilind û şanaz in. Îro bi hatina we re Kurdistan hemû hatiye Kobaniyê. Ne tenê hûn, bi milyonan mirov di hest û dilê we de li vir in. Dilê bi milyanan Kurd, hiş, mejî hest û xeyalên bi milyonan li vir kom bûne. Kurdistan bi rakirina wî sînorî bû yek, we sînorên dagirkeriya li ser Kurdistanê rakirin. We xeyala bi sedsalan pêk anî. We ji hemû cîhanê re got, ‘Kurdistan ne çar parçe ye, Kurdistan yeke û dilê Kurdistanê li

Kobaniyê lêdixe îro.’We îro bi vê sekna xwe, berxwedana xwe derbeyekî mezin li peymana Lozanê xist. We mohrên li ser peymana Lozanê hatîn xistin avêtin sergoyê dîrokê. Ez bi navê hemû şervanên Kurdistanê, hevalên YPJ dest û rûyê we, dilê we yê wêrek maç dikim. Ez ji sedî sed bawerim ku şervanên xwedî gelekî wekî we, zarokên dayîk û babên wekî we, wê di her şerî de bi ser bikevin. Dê ti dagirker nekarin dilên me yên bi hezkirin û evîna azadiyê tijî reş bikin, vîna me ya bi ramanên Rêber Apo siqa bûyî bişkînin. Em dizanin Kobaniyê Kurdistane û dê ti hêz nekare Kobaniyê têk bibe. Hûn bi xêr hatîn ser axa xwe, warê lehengan, şehîdan, hêlîna egîd û şervanên Kurd.

Di wan kêliyan de ji aliyekê ve gel şad bû, ji aliyê din ve ji ber axaftina min a hestyar gelek kes digiriyan. Piştî axaftina min jî gel dest bi dirûşman kir, dengê tilîliyan gihişt ezmanê Kobaniyê.

Ji xwe hatina gel ji aliyê hemû herêma Rojava ve hatibû zanîn. Hevalan li bajêr amadekarî kiribûn. Hevala Peyman maşîn eyar kiribûn, gotibû emê bi wan maşînan ve biçin pêşiya gel. Ji xwe hema li wan gundên nêzîk kê maşîn hebûya lê siwar dibûn û dihatin wir. Piştî demek kurt me biryar da em biçin bajêr. Gel siwarî maşînan bû, me berê xwe da bajêr. Di rê de kî hebû li maşînên derbas dibûn siwar dibûn. Zarok, jinên pîr, ciwan, herkes ber bi bajêr ve hetibûn rê. Dengê qorneyên maşînan, tilîlî, stran, qir, fîtik û dirûşm û çekan têkil hev bibûn. Hevalên

li çeperan jî ji bo destek dayîna wê coşê çek diteqandin. Lê ji ber pirsgirêka me ya cepilxanê hebû, me hevalên li çeperan şiyar kirin, û ji wan xwest derveyî pevçûnan çekan bikar neynin. Ew hatina gel, bû sedema moral û baweriyek mezin di gel de. Hemû Kobanî wê şevê li ser piya bû. Çavên Rojava û Kurdistanê vegeriyabû ser Kobaniyê. Fikar û xemên gel bi hatina gelê bakur re firiyabûn, cihê xwe ji coş û dilxweşiyê re hiştibûn.

Dema em bi rê ketin, me agahî da hevalên li eniyan. Wan bihîstibûn ku du hezar gerîla di sînor re derbasî nava Kobaniyê bûne. Hinek hevalan bi zanebûn agahiyek wisa belav kiribûn, li ser cîhazan, telefonan ji herkesî re gotibûn. Du hezar gerîla! ev dibû gurzek tirs û xof û diket dilê çeteyan. Ji xwe armanc ji vê agahiya nerast jî ew bû. Yên hatîn gelê sivîl, ciwan, jin û zilamên bakurê Kurdistanê bûn. Çeka wan, vîn û bawerî, hezkirin û dilsoziya wan a bi tekoşînê bû. Ji derveyî wê hemû bêçek bûn. Hevalan jî li ser van agahiyan hesaba pêdiviyên eniyên şer kiribû, her eniyê ji me hêz dixwest. Min jî bi zanebûn negot yên hatîn sivîlin, lê min ji wan re got, du hezar şervan bi gel re hatine. Hevalê Kendal li ser cîhazê bi kelecan got;

-Heval, çiqas heval hatine? Hûnê kengê bikarin ji me re tabûrekê bişînin?

-Du hezar kes hatine. Hûn cihê xwe biparêzin, em sibê ji we re tabûrekê rê kin. Hûn êdî hêzê nexwazin, kengê derfet çêbû, emê ji we re bişînin.

Wekî hevalê Kendal çend eniyên din jî ji me hêz xwestin. Me heman bersiv da wan jî. Ji ber ev ji bo me rêbazekî baş a şerê derûnî bû. Me dixwest dijmin bizane hêzek mezin hatiye, em bi wê hêzê dikarin wan li ser axa Kobaniyê bikin xwelî û ji wan deran hemûyan bimalin. Di rastiyê de jî bandorek wisa li ser çeteyan kir, derûniya wan bandor kir. Me jî bi zanebûn ev agahî her çend kêliyan carêkê digot û belav dikir.

Wê şevê heta sibê kesekî li Kobaniyê xew nekiribû. Ji bo pêşwazîkirinê bi hezaran mirov qulipîbûn qadan. Karwanê wesayîtan ê ber bi bajêr ve diçûn, bi qasî 40-50 kîlometrî dirêj bibû. Ji hemû gundên derdora Kobaniyê gel diherikî bajêr. Di riya em tê re diçûn de, ji gundên heyîn maşînên nû beşdarî karwanê me dibûn, her ku diçû zêdetir dibû. Ji her alî dengê tilîliyan dihat. Dengê tilîlî û dirûşman, dengê ken û stranan kerikên guhê şevê diteqandin û xwe digihandin asîmanan. Di koma ji bo banga seferberiyê ya serok Apo kirî hatibûn de, gelek jê zewicîbûn, xwedî jin û zarok bûn. Lê ew têl derbas kiribûn, bi hewara Rojavayê Kurdistanê ve hatibûn. Hatina wan ji bo gelê Rojava, bi taybet Kobaniyê bibû hêvî, bawerî, coş û vîna li berxwedan û têkoşînê. Rûyê mirovan ên bi fikar geş bûn, gelê herêmê hêza li pişt xwe dît. Heta wê rojê, carna ji nava gel gazindên zehmetiya jiyanê dihatin kirin. Hinek kesan digot, “gundên me çûn, malên me çûn. Tiştek me nema, ma em dikarin wisa heta kengê bijîn?” Lê bi hatina koma gel a ji Bakur, ev deng vegeriyan dengê hêvî û baweriyê, dengên ku digotin,

“divê em li ber xwe bidin, em dikarin cardin bibin xwedî tişt, gundên xwe bigirin, malên xwe çêkin. Lê divê em koletiyê, bindestiyê, dagirkeriyê nepejirînin” bilind bûn. Vê hatinê bawerî û moralek mezin da şervanan jî.

Di dema gelê Bakur derbasî axa Kobaniyê bûyî de, min gotibû komek hevalên me çûbûn pêşiya wan. Dema gel xwe li sînor dide, têlan derbas dike, hevalên me wan pêşwazî dikin li vî aliyê têlan. Di wê navberê de sê kes bala hevalan dikişînin. Kesek jê gir û bilind, bi cil û bergên pak û paqije, çenteyekî kompûterê bi milê wî ve ye. Herduyên din jî her li kêleka wî disekinin, bi wî re tevger dikin. Dema derbas dibin, liv û tevgerên wan bala hevalan dikişînin, heval jî wan dişopînin. Bi pêhesîna şopandinê, ew zêdetir ditirsin, şikberiya wan hevalên me dixe tevgerê. Heval ber bi wan ve diçin, ew xwe davêjin erdê û dibêjin, “nêzîkî me nebin, em ê bombeyên li ser xwe biteqînin. Lê çar heval û çend ciwanên ji bakur derbas bûyîn xwe davêjin ser wan û wan desteser dikin. Bi rastî jî piştî desteser dikin, dibînin ku her yek ji wan çend bombe li gel in. Lê heval destûra ew bikarin bombeyan biteqînin nadin wan, wan digirin û bi xwe re tînin.

Piştî pêşwazîkirina gel û çûyîna me ya Kobaniyê, em

ji bo fêmkirina bûyerê çûn cihê heval lêpirsînê dikin. Tiştên me li wir dîtin û bihîstin, xetera li pêşiya me zelaltir danî holê. Ev hersê kes hatibûn ku di wir re derbasî Cerablûsê bibin. Ev kes wekî qazidên plana nû

ya li Tirikiyê di navbera rêveberên DAÎŞ û Tirkiyê de hatî çêkirin derbas bibûn. Li gorî belgeya fermî ya di navbera Tirkiyê û rêveberên DAÎŞ'ê de hatî çêkirin û mohrkirin, dê di hefteya pêş de Kobaniyê bi giştî bihatiya dagirkirin. Ev hersê kes jî kesên di asta jor de ji têkiliyên DAÎŞ'ê yên bi dewleta Tirk re berpirsyar bûn. Piştî heval vegeriyan, me ji bo lêpirsînê ew şandin cihekê. Ji xwe hevalan çente û kelûpelên li ser wan jî anibûn. Lê ji ber hatina gel, me nekarî em yekser pê re mijûl bibin. Di encama lêpirsîn û belgeyên li ser wan hatî girtin de xalên hatibûn nivîsandbûn wisa bûn :

-Divê Kobanî bê girtin.

-Ji bo vê şêweyê şerê heta niha bê derbaskirin, ji hemû eniya Rojava, xeta Firatê ve, ji sînorê Tirkiyê ve êriş li ser enî û çeperên YPG-YPJ bên pêkanîn. Cihên ku hatin girtin êdî neyên berdan.

-Piştî bajarê Kobaniyê hat girtin, wekî navendekî rêvebirina şer bê bikaranîn. Kordînekirina şerê li dijî deverên din ji wir bê birêvebirin.

-Waliyê ku ji aliyê Tirkiyê ve hatî amadekirin û li Bîrecika Rihayê dimîne derbasî bajarê Kobaniyê bibe, rêveberiyek hevbeş a Tirkan û DAÎŞ'ê bê avakirin.

-Dê Tirkiye di warê siyasî, leşkerî, aborî ve piştgiriyê bide, birîndarên wan li Tirkiyê bên dermankirin.

-Petrola bikeve dest wan di deriyê Murşîtpinarê yê Tirkiyê bikeve bazaran, sînor ji bo bazirganiyê bê vekirin.

-Ji bo hêsankirina girtina Kobaniyê, Girêspî bê girtin, ewlekariya xeta sînor bê xurtkirin.

-Piştî girtina herêmê dê eşîrên Ereb ên alîgir û hevalbendin li ser cih û warên bên girtin bên bicihkirin.

-Di dema şer de ji bo Kurdên li Kobaniyê birevin û derbasî Tirkiyê bibin, dê Tirkiye di çarçoveya plana teşwîqkirina revê de wargehên Afadê li ser sînor çêbike, derî ji bo penaberan veke.

- Hinek Kurdên di nav îhtîlafê (Enks) jî cihê xwe digirin, li vir bên hiştin û bi wan re hevbeş bê tevgerkirin.

Me di encama van belgeyan de planên dewleta Tirk û DAÎŞ'ê ditin. Em hîn bûn ku dagirkirina Kobaniyê kirine armanc, axa Kobaniyê li eşîrên Ereb belav kirine. Bi gelek eşiran re axivîne, ji bo piştgiriyê bikin soza dayîna ax û cihên Kurdan dane wan. Her wiha ji bo pêkanîna van planan ji Minbic û Cerablûsê hêzek mezin a şer, çek û alavên şer ên giran li wê xetê kom kirine û êrişên li ser Zormixar û Bayedî, wekî pêngava destpêkê ya vê planê pêk hatine. Aqilmend û şêwirmendê wan bibû dewleta Tirk. Çawa ku Hîtler di salên 1941'ê de êrişî Stalîngiradê kiribû, beriya êriş bike agahî dabû û axa Stalîngiradê li ser kaxezan belav kiribûn, parve kiribûn, dewleta Tirk û

çeteyan jî heman tişt kiribûn. Ji xwe dê wargehên Afadê jî wekî cihên helandin, bişaftin û têkbirina Kurdan bihatiyan bikaranîn. Ev plan hemû bi ziravî di belgeyan de hebûn.

Rêber Apo, ji me baştir rewş dîtibû. Lewma gotibû, “divê gelê Kurd ji bo Kobaniyê seferberiyê dest pê bike, hemû Kurdistan li Kobaniyê xwedî derkeve. Her wiha divê gelê Kurd li her cihî xwe li gorî şer rêxistin bike, her mala Kobaniyê wekî çeperekî şer bê rêxistinkirin.” Lê em kesên ku di nav şerê germ de, em bi vê rastiya dijwar û berfirehiya planan nehesiyabûn heta wê kêliyê. Ji xwe du rojan ji ber hatina gel a ser sînor û daxwaza gel a derbasbûna Kobaniyê, plan û êrişên wan dereng ketibûn. Nexwe li gorî planê diviya êrişa li Kuçê Çarikli, xeta Firatê, bi giştî eniya rojava du roj berê dest pê bikiriya. Lê gelê bakur bi bersivdayîna banga seferberiyê ew plan dereng xistibû.

Piştî hatina gelê Bakur bi du rojan, êrişî Girê Kuçê Çariklî, gundê Mala Berkel, Çarqirê, Cibnê, Xirabeto û hemû eniya rojava kirin. Di van êrişan de armanca sereke dagirkirina Kobaniyê û riya vekirina deriyê dagirkeriyê yê Rojava bû. Lewma êrişa piştî du rojan hatina gelê Bakur, ji êrişên heta wê rojê hatîn kirin dorfirehtir û dijwartir bû. Êriş hemwext û bi plan bûn. Armanca din a dijwariya van êrişan jî peyam dayîna gelê Kurd ê li parçeyên din bû ku piştgirî didan Rojava. Dixwestin wê hesta yekbûna Kurdan bişkînin, coş û

morala piştî hatina Gelê Bakur têk bibin. Di van êrişan de ev peyam hebû: “An birevin û radest bibin, an Kurd hemû jî bên vê derê, çarenûsa we hemûyan mirin û kuştin e.” Li eniya Rojava hêzek me ya şerker hebû. Hevala Medya, Roza, Zîlan, Viyan, hevalê Hogir, Harûn, Heqî, Şivan, Bişar berpirsyarên vê eniyê bûn. Di êrişên li ser gundê Mala Berkel, Çarqirê, Cibnê, Xirabeto de hevalan berxwedanekî mezin raber kirin. Heta nîvro nîvê gundê Cibnê ket destên wan. Lê di demekî kurt de cardin bi êrişa dijber a ji aliyê hevalên me ve gund hat girtin. Divê mirov vê rastiyê jî bêje, gundiyên van gundan jî berxwedanekî mezin raber kirin. Ji hûra heta giran, herkesê ku bikare çek rake ket nava şer, gund û devera xwe parastin. Bi taybet jî berxwedana gundiyên gundê Cibnê bi serê xwe destanekî lehengî û wêrektiyê ye. Dijmin tevî hemû teknîk û hêza anîn jî li van gundan nekarîn pêş de bên, rastî berxwedan û şerê gel û hevalên me hatin.

Dema ku xwestin van cihan bigirin û nekarîn, vê carê zêdetir giranî dan girê Kuçê Çariklî ku diket pêşberî gundê Çariklî û raserî Aşmê. Girtina vî girî dihat wateya ketina qundê Çariklî, Aşmê û pêşdeçûna çeteyan. Lewma hevalê Hogir û hevalên li gel bi hemû hêza xwe ve gir diparastin. Pevçûnek dijwar bi rê ve diçû li wî girî. Di hemû aliyê gir re êriş dikirin. Lê ya rast heta wê rojê me nedizanî dewleta Tirk bi leşkerên xwe li ser sînor alîkariya wan wisa eşkere dike û ew jî guleyan li çeperên me direşînin. Dema çend caran bi komên mezin êriş

kirin û nekarin gir bi dest bixin, berê tankan dan gir. Xwestin bi tankan bikevin gir, riya berê maşîna hevalê Loqman tê re diçû û dihat bikar tanîn. Dema ku bi tankan hatin jî Hevalê Agir B-7 xwe digire, li pişt gir dizivire û davêje tankê. Hevalê Agir bi eslê xwe Ereb bû. Me jê re digot Agirê Ereb. Bi çûyîna hevalê Agir re, ji aliyê din ve jî heval Dilsoz dikeve tevgerê, ew jî bi heman çekê guleyan davêje tankê û tanka çeteyan li wir dirûxe. Ketina wî girî şikandina eniya me ya şer bû. Hevalê Hogir û hevalên li gel wî, bi vê zanebûnê tev digeriyan. Hevala Viyan, Dilsoz û hevalê Agir bi çekên giran ji sê aliyan ve li gir digerin. Her koma tê, dibe armanca rokêtên çekên wan. Ez bi hevalê Hogir re axivîm û min rewşa gir pirsî. Hevalê Hogir got;

-Em li ber xwe didin. Êrişek pir dijwar e, lê çi dibe bila bibe em çeperên xwe bernadin. Hemû heval bi heman baweriyê şer dikin. Gelek termên wan di jêra gir de rêz bûne, em bi dehan term dibînin. Cihê me serwere, me tanka wan rûxand, heval xurt lê dixin.

Piştî nîv saetê agahiya şehîdbûna hevalê Hogir gihişt me. Dema me agahiya şehîdbûna hevalê Hogir girt, ez û hevala Tekoşîn di aliyê gundê Aşmê re ketin rê ku em biçin wî girî. Di rê de her dîmenên hevalê Hogir ên du roj berê li pêş çavên min bûn. Hevalê Hogir mirovekî zexim û dagirtî bû. Reng genimî bû. Porê wî şayîk û firk bû. Lib lib tayên sipî ketibûn nav porên wî. Bi qasî porên wî riha wî jî firk bû û hev temam dikir. Rexmî temenê wî pêncî

salî bû jî bi qasî ciwanekî zîrek û bi tevger bû. Bi rastî dema ew li gel te bûya, te xwe di her warî de di ewlekariyê de hîs dikir. Lê di wî girî de dema li ser çeperan geriyabû, gihiştibû çepera dawiyê ya hevalan û li wir bi fîşekên çeteyan şehîd bibû. Vê agahiyê êş û janek mezin xistibû dilê her hevalên ku şehîdbûna hevalê Hogir bihîstîn. Dema em gihiştin gundê Aşmê, em çûn gel çend malên li ber palekê bûn. Me dixwest em ji wî alî ve li pişt gir bizivirin, ji pişt gir ve bikarin alîkariyê bidin hevalan û xwe bigihînin gir. Me maşîna xwe li ber malekê hişt. Min got em çend kesan ji gund jî bibin û biçin alîkariya hevalan. Di aliyekê de ez bi hevala Tekoşîn re daxivîm, di aliyê din de jî bi rê ve diçûm. Çavên min li pêşiya min bûn, agahiya min ji derdor nebû. Min Hammr a ku li kêleka gir nedidit. Lewma ez aram dimeşîm, min hay ji ti xeteriyê nebû wê kêliyê. Hêj me çend gav avêtibûn, min dît em di nav tozê de man. Min serê xwe hinekê rakir, fîşek ji pir aliyan ve dihatin. Min di wê kêliyê de gazî hevalê Mazlum kir. Bi xwe jî ji Kobaniyê bû. Hevalê Mazlum qîrek da û got, “xwe bavêje erdê, ew DAÎŞ e. Lê deşte, tu xwe bavêjî erdê jî tiştek zêde nayê guhertin. Min berê xwe da cihê hammr lê, bi dehan çeteyên DAÎŞ’ê wekî qijikên reş ber bi gir ve hildikişin. Ji wir dixwestin gir bidest bixin, an ku aliyê gundê Aşmê yê ku hevalan hesabê hatina wan a di wir re nedikir. Gule wekî taviyê baranê dihatin aliyê me. Toz bi ser herderî ketibû, fîşekên dihatin teq û req li derdora me, li ber piyên me, serê me, kêleka me diketin. Min ji hevalan re got;

-Ev doçqa ya leşkerên Tirk e, ma ew davêjin me?

-Erê, Tirk piştgiriyê didin wan, ew jî bi doçqa davêjin. Xwe bide aliyê pal, zû bikin xwe bigihînin ber xanî.

Bi dengê hevalê Mazlum re, min dît kalekê bi destên min girt û ez kişandim. Bi dengekî hêrs û aciz got;

-Hûn bi kû ve diçin? Ma hûn dixwazin me wekî pezê bêşivan bihêlin? Ji xwe hevalê Hogir şehîd bû, ev mafê we nîne hûn wisa dikin.

Me bi hatina Kalo re bi bazdan xwe gihand ber dîwarê xaniyekê. Kalo cigareyek ji berîka xwe derxist û pêxist. Cigara xwe xist nav lêvên xwe, çend pêş li ser hev li cigarê da. Lê mija çavên wî ya xemê, ji dûkêla cigara wî zêdetir bû. Destên wî direcifîn, lê ne ji tirsa mirinê, ji tirsa mirina me bû. Li gorî wî mafê me yê mirinê nebû. Nedibû em wisa hêsanî bimirin. Her dîsa bi wî dengê xem têkel bûyî û çavên şil got; "Hûn çima xwe naparêzin? Hûn pêşengin, nabe hûn wisa bêberpirsyarî nêzîkî jiyana xwe bibin. Nabe hûn wekî hevalê Hogir me bi tenê bihêlin. Bi gotina dawiyê re rondikan xwe berda ser rûyê wî yê bûyî nexşeya xeman û bi destên xwe yên li ber tavê qemer bûyîn, hewl da rondikên xwe ji me veşêre.

Wê dîmena wî ez gelek êşandim. Lê ez bi cîhaza xwe ve mijûl bûm. Min dixwest zû agahiyê bidim hevalên li gir. Min gazî kir, hevala Viyan bersiva min da.

-Heval, ji piştgir ve, di aliyê gundê Aşmê re dixwazin gir bi dest bixin. Ji jêr ve êriş dikin, dixwazin xwe bigihînin jor.

-Başe heval, em tedbîr digirin.

Piştî du deqîqeyan hevalên li ser gir di wî milî de gule li ser çeteyan reşandin. Çeteyên ku dixwestin bigihêjin jor, neçarî vekişînê bûn. Kalo keserekî kûr kişand û got;

-Keça min, ez niha li vir şehîd bibim jî nabe sedema windabûnek mezin. Lê hûn pêşengin, dengê we jî hêz û moralê dide şervanan. Divê hûn vê bizanin. Em ji heyîna we wêrektiyê digirin, dikarin şer bikin. Her yek ji we heta bi hezaran çete nekuje, nabe hûn şehîd bibin. Niha çi karê te heye li vir? Min û hevalên din bişîne. Hûn li cihekê bisekinin, me bi rêve bibin. Ma tu nizanî ev tişta tu dikî xeter e?

-Di hemû şeran de xeter hene mamo. Lê min nedizanî çeteyan xwe gihandiye wir.

-Ew kêmasî û nebesiya te ye. Divê tu bizanî. Xwezî îro li şûna Hogir hersê kurên min bihatiyan kuştin. Ez ewqas ne diêşiyam.

Bi vekîşîna çeteyan a ji gir, şikestina pêla êrişa dijwar ez hinekê aram bûm. Me pişta xwe da dîwarê xanî, ez li ser gotinên Kalo hizirim. Rexneyên wî rast bûn. Tevî ku wî dibe ku çend caran hevalê Hogir dîtibû, lê digot bila sê kurên min bûya, ne Hogir bûya şehîd ketî. Mafê me yê em şaşiyê bikin, ne di cih de bimirin nebû. Kalo rast digot, tevî hemû nebesiyên xwe jî em xwedî rola pêşengiyê bûn. Min dixwest demek dirêj û aram hebe, ez dengê dilê kalê bi ezmûn, dilsoz guhdar bikim, ji serpêhatî û jiyana wî pir tiştan bigirim. Lê hêj di wê kêliyê de ji eniyên din agahiyên nû hatin.

Hevalan agahî dan û gotin, komek heval li girê Zagros di çemberê de mane û şehîd bûne. Ji sibê ve bû, çend kom diçûn ji bo derxistina wan hevalan. Lê hevalan ji wan çûyînan encam negirtibûn, agahiya şehîdbûna wan hat. Hevala Amara gazî kir û got;

-Heval xwe zû bigihînin me, gundê Berkel ket destên çeteyan. Em di çemberê de mane. Pir hevalên birîndar li gel min in. Xwe bigihînin me ku em bikarin van hevalan ji vir derbixin.

Min li ser vê agahiyê gazî hevalê Harûn kir û got;

-Heval, rewşa we çawa ye?

-Pevçûn berdewam e. Lê dema me xwest em xwe bigihînin hevalên li çeperên pêş, wan gundê Cibnê ji dest

çeteyan derxistibûn. Çete ji gund hatin derxistin. Lê girê Zagros û gundê Mala Berkel ketine destên çeteyan.

-Hevalê Harûn, hevalên birîndar hene li gundê Berkelê. Hinek heval Amade bikin, ji bo anîna wan hevalan bişînin, bila maşîn biçe wan bigire.

-Başe heval, emê li ser rawestin.

Piştî me plana dijmin zanî û şûn de, me biryar dabû ku çi dibe bila bibe em eniyên pêş bernedin. Hevalan li gorî wê berxwedanekî mezin raber kirin, bi lehengî şer kirin. Me di êrişên çeteyan ên berê de çend gund berdabûn. Lê êriş û planên vê carê cuda bûn, me nedixwest paşvekişandin bibe fêrbûnek di nav hêza me de. Ji xwe dijmin jî ne wekî berê bû, bi armanca dagirkirina hemû Kobaniyê êriş dikir. Berxwedana li van eniyan dihat kirin, bi vê zanebûnê bû. Dê riya dagirkeriyê nehatiya dayîn, çeteyan bi hêsanî nekariyan xaka me dagir bikin. Hemû hêz û şervanên me xwedî vê baweriyê bûn. Bi rastî jî heta kêliyên dawiyê jî hevalan şer kirin û çeperên xwe bernedan.

Min cardin gazî hevala Amara kir û got;

-Hevala Amara, hevalan bigihînin cihek ewle, em bikarin maşînan bişînin ji bo bikarin wan bigirin.

-Heval, ez bi xwe jî birîndarim. Lê emê hewl bidin xwe bigihînin cihek em bikarin derkevin.

-Çi dibe bila bibe, xwe biparêzin heta heval digihêjin we.

-Başe heval.

Di panzde cihan de êrişên hemwext hebûn. Toz û dûkêla çekan bi ser çemê Firatê ketibû. Li hemû eniya rojava şer dewam dikir. Her carê ji cihekê dengê hevalan ên li ser cîhazên bêtêl bilind dibû, berpirsyarên eniya hêza di çeperan de bi ferman û agahiyên didan dixistin tevgerê. Hinek cih ji dest çeteyan dihatin derxistin, wan hinek cihên di destên me de digirtin. Heta derengiya êvarê şer û pevçûnan bênavber dewam kirin. Girekî nêzîkî gundê Cibnê ketibû destê çeteyan de. Ber bi êvarê hevalan êrişî wî girî kirin ku bistînin. Di êrişa li ser vî girî de hevalê Ferhat berpirsê wê hêza êrişê bû şehîd ket. Hevalê Ferhat hevalekî kevin bû, berê jî li ser yekîneyekê bû. Her wiha demek dirêj perwerdeya şervanên nû dabû, cihekî wî yê taybet di dilê hemû hevalên li eniya rojava şer dikirin de hebû. Pir dihat hezkirin, kesekî kedkar, zana û tevî zanabûna xwe ya dîrokî, civakî, serweriya taktîk û teknîka şer, kesekî dilnizim û keyfxweş bû. Di hinek deman de şehîdbûna hinek kesan dibe cihê şikandina vîn û baweriyê. Lê şehîdbûna hevalê Ferhat û hevalê Hogir, di hevalên li eniyê de rê ji hêrs, kîn û daxwaza tolhildanê re vekir. Ji ber van herdu hevalvan, di ber hemû endamên li wê eniyê de kedek mezin dabûn, ji aliyê wan ve dihatin hezkirin. Wekî pêdiviya hezkirina bi wan re hevalan bi bawerî û vînek mezintir êriş dikir, li ber xwe didan û rika wan a şikandina êrişan zêdetir

bibû. Her wiha hevala Rojîn jî di wir de şehîd bû. Hevala Rojîn jinek ciwan, wêrek û şerker bû. Ji gundê Kizalî bû. Her wiha hevalê Awaz li wir şehîd bû. Hevalê Awaz wekî navê xwe xwedî dengek xweş bû. Beriya şehîdbûna van hevalan, dijmin li pişt wan zivirî bû, ji pişt ve êrişî wan kiribûn. Lewma derketina ji wir ne hêsan bû. Dema me rewş pirsî, hevalê Awaz got; "hevalno, ev êriş û çembera çendê ye em dişkînin. Xeman nexwin, heta dilopa xwîna xwe ya dawiyê jî emê şer bikin. Ev soza me ye, emê çeperên xwe bernedin heta henaseya me diçe û tê. Dema çavên me li vê cîhanê hatin girtin jî em bawerin dê hevalên me tola me rakin. Wê ti hêz nekare vîna me bişkîne, axa me dagir bike. Heta Kurdek li cîhanê bimîne jî dê bi berxwedana me serbilind bijî. Ma ji vê mezintir jiyan heye?"

Hevalê Awaz di destpêka şerê li Kobaniyê de cih girtibû. Gotinên wî yên dawiyê wekî peyamek xatirxwestinê bûn. Bi rastî jî hêjayî gotinên xwe şer kirin, di dawiyê de ew, hevalê Ferhat û hevala Rojîn di wî girî de şehîd bûn.Li wir her wiha şeş hevalên me yên ji wan gundan şehîd bûn.  Xelke ji wan gundan bun,  lê di parastina gund û herêma xwe de cih girtibûn. Di eniya rojava de jimarek zêde hevalên me birîndar bûn. Lê gotina hevalê Awaz pêk hat, heta saet sê û nîvê êvarê êrişên çeteyan hatin şikandin. Ew girê ku çeteyan girtibû jî hat girtin. Ji derveyî gundê Mala Berkel û girê Zagros, hemû cihên din ji dest çeteyan hatin derxistin. Me hemû hevalên birîndar anîn gundê Mişko. Li wir hevalên bijîşk dest bi

dermankirina birîndaran kirin. Yên birînên wan sivik li ser piyan tedawî dîtin, hevalên ku rewşa wan giranbûn jî piştî destwerdana bijîşka ya li wir û şûn de ji bo nexweşxaneyan hatin şandin.

Piştî şikandina êrişan jimarek zêde termên çeteyan ketin destên me. Her wiha çek û kelûpelên leşkerî hatin desteserkirin. Dema me cihên berê girtibûn ji destên wan derxistin, vê carê cardin berê xwe dan sînorê di navbera Rojava û Bakur de. Xwestin ji wî alî ve êriş bikin. Me jî hêza xwe kom kiribû, roja diduyê me hewl dida em cihên di dest wan de mayîn jî bigirin. Ji aliyê xeta Rojhilat hevalê Teslîm hat gel min û got; “Hevala Meryem, ez dixwazim pêşniyarekê ji we re bikim. Li hember van êrişên berfireh, divê em hinekê riyên li ser sînor ji mayînan paqij bikin ku em bikarin wê xetê baş bikar bînin. Me komek heval amade kirine ji bo rakirina mayînan. Em TNT’a wan derdixin, dixin mayîn û li pêşiya dijmin vedidin. Hem em ji TNT sûd werdigirin, hem jî em riyên xwe yên tevgerkirinê fireh dikin. Ger em em riya paqij bikin, gel di van riyan de dikare xwe bigihîne me, dema pêwîst be bê alîkariya me. Ji xwe diyare dê ev şer dewam bike.”

Hevalê Teslîm wisa bi kelecan û ji dil daxivî, min nexwest bikevim navbera axaftina wî. Piştî gotina xwe ya dawiyê kir, li rûyê min temaşe kir. Di çavên wî de mereqa ka ezê çi bêjim hebû. Min got:

-Tu karên gelek xeter dikî, xwe her roj li van sînoran dixî. Tê ji kû bizanî li kû mayîn hene, li kû nînin û çawa vî karî bikî?

-Hevala Meryem, ez zarokê sînoran im. Jiyana min li ser van sînoran derbas bûye. Ez lawê mala Cimo me, ma te navê mala Cimo nebihîstiye? Qey mayîn û sînor dikarin pêşiya me bigirin? Tu dizanî, babê min her digot, 'divê hûn serê xwe li ber ti kesî netewînin.' Te rastî bivê babê min kesekî wisa ye, di herêma me de bi mêrxaziya xwe tê nasîn. Vêca vê gotina 'tu bi tiştên xeter re mijûl dibî' li cihek dî ji min re nebêje, dê xelk bêjin qey ez kesek bêziravim û şikên wan çêbin ka ez kurê babê xwe me an ne.

Dema mirov bi demboriya xwe şanaz û serbilind be, di her şertan de ji xwe bawere, xwezayî ye. Lewma ew jidilbûn û xwezayîbûn dihêle ew kes bên hezkirin. Hevalê Teslîm jî wisa bû. Kesekî bejna wî navîn û dagirtî bû. Cilên li ber, porê wî, serû çavên wî di tozê de winda bibûn. Lê te digot qey li ser textê qesra paşayekî rûniştiye, wisa aram û bicoş diyar bû. Wekî zarokên heta temenekê her mijmijok di devan de û dema tu ji dev derdixî hesta valatiyê dijî û digirî, hevalê Teslîm jî cigare ji bo wî heman tişt bû. Her tim cigareyek di nav tiliyên wî re bû, yek bi yekê ve datanî û dikêşa. Ez li ser projeya wî dihizirîm, cigara xwe pêxist, pêşek lê da û got;

-Hevala Meryem, pêwîstî bi evqas hizirandinê nake. Em mayînên heyîn rakin, TNT wan derxin, li cihên din bikin

mayîn û li pêşiya tankên çeteyan vedin. Heta em vê nekin, em nikarin pêşiyê li van tankan bigirin. Derfetên me kêmin, fûze û çekên me yên din nînin. Tu dizanî piraniya tankan heta niha bi mayînan hatine rûxandin. Tu nabînî li cihê me mayîn nekirîn re çawa tên û dikevin nav me? Em hemû roketên xwe yên B-7'an li dijî wan bikar tînin. Em wan bixin xefkê, wisa bikin ku ev mayînên dijmina ji bo kuştina me kirine xefkên mirinê, em li ser serê van çeteyan bikin Ezraîl û bila bi dijminên me ve biteqin.

Bi rastî jî piştî girtina derdora Kobaniyê, di peydakirina TNT'ê de me zehmetî jiyan dikir. Lewma min dixwest ez baş guhdarî Teslîm bikim, ziraviyên projeya wî bizanim. Got:

-Ya herî baş, em komek mezin çêkin, mayînan kom bikin, bibin ji hevalê Rêzan re. Tu dizanî mayînvanekî başe û dikare gelek mayînan çêke. Em jî bi wan derdora girên me, pêşiya eniyên em lê, li ser riyên hatina çeteyan hemûyan van mayînan bi cih bikin. Ka bila hingê bikarin gav bavêjin. Di çend metreyan de carêkê wê yek bi wan ve biteqe, newêrin gav bavêjin.

Çirkeyekê navber da gotinên xwe, dît ez baldarî lê guhdar dikim û gotina xwe domand;

-Babê min digot 'berxê nêr ji bo kêrê ye. Pêwîste mêrxazek ti car di nav nivîna xwe de nemire û xelk gunehê xwe pê neynin, nebêjin çi ferqîr bû.' Vêca bila

fikara te nebe ji xeteriyan. Ez naxwazim kal bibim, ji kalbûnê li ser cihê xwe bimirim. Divê mirina min jî ne ji rêzê be. Nexwe dê hestiyên pêşiyên min bigirîn, ezê nebim mirovek şîrhelal.

Gotinên babê Teslîm, çîroka Teslîm di derbarê malbata xwe de ji min re gotî, ez birim zarokatiya min. Babê min li ser tevlîbûna birayên min a nav têkoşîna azadiyê di axivî. Behsa şer û pevçûnên Kurdan ên kevin dikir û digot, 'divê siwarek li ser pişta hespê xwe bimire.' Van mirovên zana, xwedî hişmendiya dîrokek berxwedanvan bi van gotinan dixwestin ji me re tiştekê bêjin. Min wê rojê cardin ferq kir ku lehengî û şerkeriya Kurdan xwe dispêre hişek çawa. Her çiqas leheng û şervanên me yên di dîrokê de zêde nehatibûn nivîsîn jî di gotinên pêşiyê me de, xwe gihandibûn hiş û giyana me hemûyan. Çîrokbêjên axa me, dîrok û demboriya me di dengê xwe de gihandibûn roja îro. Ew deng dibû tovê wêrektî û şerkeriyê li ser vê axê. Ev felsefeyek kevnar bû. Diviya mirov radestî ti zoriyê nebûya. Heta kêliya dawiya jiyana xwe bi şer, têkoşîn û berxwedanê jiyan bikiriya. Her wiha mirinek hebûya jî layîqî wê seknê bûya. Wê demê dibû destan, çîrok û di dengê mezinan de ji bo zarokan dibû serpêhatî û dîrok. Em zarokên vê xakê wisa bi wê hişmendiyê, felsefê mezin dibûn. Her wiha gotina Kalê li gundê Aşmê ji min re gotî, "keça min, lawo divê hûn vî pezî bêşivan nehêlin" hat bîra min. Bêguman, gelê me ne pez bû û em jî ne şivan bûn. Ev peyv şibandinek ji çanda Kurdan bû. Lê ew jî xwedî felsefeyekî kûr bû. Diviya me

kesên ku rola pêşengiyê dayîn xwe, an jî civakê ev rol dayiyê şîret û gotinên civaka xwe baş bizaniyan. Ji ber di wan gotinan de perspektîfa hemû serdeman hebû. Wî lewma digot, “xwezî hersê kurên min bûna hatîn kuştin, ne hevalê Hogir bûya.” Vala nedigot, “hevalê Hogir pêşengê me bû” û mija xeman a li ser awirên wî rastiyek dîrokî destnîşan dikir.

Dema havênê hişê civakan yek be, cih zêde ferq nake. Ji ber di tevahiya dîrokê de çarenûsa me hemû Kurdan yek bû. Gotina babê min, ya babê Teslîm, kalê gundê Aşmê û hemû zana û pêşiyên me, destan û çîrokên me, biwêj û şîretên me hemûyan ew dîroka me ji me re digotin. Riyên rizgariyê yên di wan peyvan de wekî şifre datanîn pêşiya me û dixwestin em waneyan ji wan bigirin. Hêrsa Kalo jî rast bû, rexneyên wî jî. Diviya em ji dîrokê, ji demboriyê waneyên rast derxin, pêşengiya rast bikin. Nexwe mafê axê, gelê me, civaka me, zarokên me, herî zêde şîretkarên me kal û pîrên me hebû me ji ber şaşî û neguhdarkirinê me darizînin. Ger me nezaniya em guhdarî wan dengan bikin, mafdarbûn li me neborîn. Wan dixwest em pêşengiyekî rast bikin. Dixwestin em bikarin bibin hêvî û bawerî, bibin lehengên çîrok û dîroka gelê xwe. Em ne ji mirinê hez bikin, bikarin heta kêliya dawiyê xwe li ser pişta hespên xwe yên jiyanê bigirin, erzan nemirin. Gelê me ev dixwest. Lewma dibe bi hizra ku dibe rojek wisa derkeve pêşiya me jî dema birayê minê Mezin Birahîm şehîd bibû, babê min ji me re wisa gotibû, serbilindiya xwe ya bi wî anibû ziman. Ji

diya min re digot, “hermet, negirî. Heger mirov jiyan bike bila wekî wî be, heger mir jî bila wekî wî di ber rûmet û axa xwe de be. Ji vê serbilind be, her dayîk û bab nikarin bibin xwediyê serbilindiyek wisa. Diyare kurê te şîrhelale. Heqê şîrê xwe heta dilopa dawiyê bi lehengî daye.” Çîrok û serpêhatiyên min û Teslîm ji hev re gotin dirêj kirin, em xistin geşt û gerek li kuçe û kolanên hiş û mejiyê dîroka me. Dema min behsa gotinên babê xwe yên ji bo şehîdbûna birayê xwe ji Teslîm re got, keserek kûr kişand û got;

-Ezê biçim wan mayînên li eniya Rojhilat bînim, pêşiya çeperên hevalan xurt bikim. Te dît, hemû ji me re heman tiştê dibêjin. Em jî wisa bikin. Li gorî gotinên dapîr, bapîr, bab û dayîkên xwe, hevalên xwe yên şehîd bijîn. Em ji hespên xwe peya nabin. Ha, ji xwe min komek ji bo komkirina mayînan şandiye jî.

-Çi? Te çawa tiştek wisa kir? Dibe ku zarokên wan hebin, tiştek bi wan bê em dê çi bikin?

Kenî û got;

-Hevala Meryem, niha ez bi mayînekê şehîd bibim jî zarokên min hene, ez bi nexweşiyekê bimirim jî hene. Tu dibêjî ez kîjanê tercîh dikim? Niha ez bi mayînên ku çêkim xaka xwe ji dagirkeriyê, hevalên xwe ji bûyîna armanca guleyên tankan biparêzim, pêşerojek azad ji zarokên xwe û zarokên gelê xwe re bikim xelat û ji bo vê şehîd bibim baştire, an ez ji kalbûnê li ser cihê xwe

bimirim? Min got, em peya nabin ji hespên xwe xala Meryem.

Min ev gotina Xalê ji gelek kesan bihîstibû. Destpêkê pir balkêş hatibû ji min re. Paşê ez pêhesam ku peyva herî pîroz li gel wan Xalo û Xalê ye. Ev rayekî kevnar ê çanda dayîksalariyê bû û qurmê xwe di xaka çandî ya civaka Kobaniyê de bi cih kiribû. Ji zilamên li gel wan bi qedr û qîmet re digotin Xalo, ji jinan re jî digotin Xalê. Ya rast ev dijberî çanda zayendperest a îro bû. Lewma keyfa min jê re dihat.

Teslîm ez qane kiribûm. Ji xwe hêj li gel min bû koma şandî bi telefonê lê geriyan û gotin, “Me sed mayîn derxistine, emê bibin gel hevalê Rêzan.” Êdî min dest avêt telefona xwe, ez li hevalê Rêzan geriyam û min got;

-Hevalê Rêzan, dê hevalê Teslîm û koma xwe ji we re TNT’ ya ji mayînên derxistîn binin. Hûn bi wan re eleqeder bibin. Komek hevalên ji herêmê ne, hevalê Teslîm rêxistin kirine. Ji bo ti qeza û xeterî rû nedin, hûn bi wan re bibin alîkar, nîşanî wan jî bidin ka dê çawa kar bikin. Bila girêdayî karê te bixebitin.

Di ber gotinên min re Teslîm dikenî. Li aliyê din dengê hevalê Rêzan ê bi ken hat û got;

-Tu guran dişînî gel berxikan. Ew ji me baştirin, pisportir in. Bi salan li ser van sînoran karê qaçaxiyê kirine, bi hezaran mayîn derxistine. Ji xwe hinek ji me re şandine,

agahiya min jê heye. Lê dîsa, çi bê xwestin emê bibin alîkar.

Min nedizanî beriya bê gel min hemû tişt eyar kiriye. Lê ji aliyekê ve keyfa min jî ji vê jêhatina wî re hat. Min reqema telefona hevalê Rêzan da da wî, Teslîm di bin lêvên xwe de dikenî. Keyfxweşiya wî xwe di çavên wî de dida der. Cigara xwe xist nav lêvên xwe, reqem nivîsî û got;

-Xalê, bawer bike koma me pir başe di vî karî de. Kes bi me nikare, tenê bila hevalên me hebin. Ez pir liber şehîdbûna hevalê Hogir û Ferhat ketim. Lê piştî hevalan girê Kuçê Çariklî girtin, navê hevalê Hogir dan wî girî. Tu dibînî mirov çawa piştî mirina xwe jî dijî? Dibe ku temenê mirovekê herî zêde sed sal be. Lê dibe ku hevalê Hogir bi hezaran sal li ser vê axê bijî. Nemirin ev e, Xalê. Peyama çîrokên babê min û te jî ev e. Hevalê Hogir û hevalên şehîd li vê axê zindî ne. Her yekê bi qasî sed temenên xwe temendirêj jiyan dikin. Ya girîng mirov bikare piştî mirina xwe jî bijî. Navê xwe bihêle, bikare piştî çûyîna xwe jî jiyanê bi afirîne.

-Wile babê te û yên wekî te çiqas bi we serbilindbin mafdarin. Te baş guhdar kiriye hevalê Teslîm.

-Tu dizanî dê çend kes bên vir û Hogir nas bikin? Divê mirov hêjayî bûyîna çîrok, destan, helbest û stran bijî. Bikare bibe çîrok ji zarokan re, ji nifşên nû re bibe wane û dîrok. Ger bibe sembol, xwedî çîrok, dê rojek bê û

hinekî bizanin guhdar bikin. Dê yên bikarin wateyê bidinê hebin. Hinek çîrok hene bi xwînê tên nivîsîn Xalê. Ev ne hêsane û her mirov ne layîqî bûyîna lehengên vê çîrokê ne. Ev çîroka welatê me ye. Navê wan ji yên me saxan zêdetir in. Lê em wan bi yek navî dizanin; Şehîd.

Ez ji hêza vegotina wî ya hest û ramanên xwe matmayî mabûm. Çawa dibû wekî zanyarekê, helbestvanekê, dîrokzanekê daxivî? Mirovên bi gotinên dike bawer û li gorî wê dijîn, ne tenê bi ziman daxivin. Hemû lebatên laş, ji bo herikandina wan hest û ramanan seferber dibin ji bo vegotinê. Awirên wî yên bi bawerî û coşa serkeftinê dibiriqîn, pêşengiya wan lebatên laş dikir di wê vegotinê de. Ji nav toza li pêşiya çepera ku bi fîşek û guleyan hatibû kêlan rabû ser xwe, pişta xwe rast kir û got;

-Xalê tu bizanî çend riyên din di serê min de hene. Ez niha diçim çendek ji wan jî paqij bikim. Hinekê veşartîne, lê bawer bike emê bi kevirekê du çûkan bikujin. Yek emê bibin xwedî çekên li hember çeteyan, yek jî emê riyên xwe yên em bikarin tê de baş tevbigerin vekin. Em bi vî rengî dikarin vî dijminê har bisekinînin, pêşiyê lê bigirin. Niha destûra te hebe, ez diçim.

-Serkeftin be hevalê Teslîm. Lê dîsa şiyar be, tiştek bi we neyê.

-Em venegerin destpêkê, herî zêde emê bêmirin bibin. Dê bi xatirê we, karê şoreşê ji kevaniya malê bêhedartir in.

Xatir xwest, bi rûyekî ken ber bi jêr ve ket rê û çû. Ez jî bi gotina wî ya dawiyê dikenîm. Di wê navberê de hevalê Mezlum hat gel min. Hevalê Mezlum nêzîkî me rûniştibû, guhdarî me dikir. Wî jî wekî hevalê Teslîm got;

-Hevala Meryem, em jî komekê ava bikin. Me berê jî ev kar kiriye, em şarezan e. Ji ber hevalê Rêzan gotiye çiqas TNT hebe bînin, ji bo pêşîlêgirtina tankan pêwîst e.

-Em dikarin vê rewşê paşê baxivin, ger pêwîstiya hevalê Rêzan hebe hûn jî dikarin vî karî bikin. Ji xwe hemû koma hevalê Rêzan ji bo vê di tevgerê de ye. Li gorî tê dîtin, li ser eniya te jî bûyîna endamekî koma sabotajê heye. Ji ber dijmin amadekariyên nû dike, dê zêdetir tank û çekên giran bikar bîne.

-Ez jî bawerim em dikarin ji vê encamên baş bigirin. Kengê we axivî, ez amade me.

Şer ne tenê teqandina çekan e. Şer berî her tiştî stratejî ye, taxtîk e, amadekariye, îstîxbarate. Me jî hewl dida em li gorî rastiya şerekî dijwartir xwe amade bikin, di her warî de pêdiviyên şer pêk bînin. Ji ber me dizanî şerên li pêşiya me, dê ji şerên heta wê rojê dijwartir bin. Jixwe ew demek dirêj bû, dengê çekan kêm nebibû, êriş ne sekinîbûn. Her roj di aliyekê re êriş hebûn, şer û pevçûn

hebûn. Birîndar hebûn, şehîd hebûn. Tevî wê hêza berxwedanê hebû, baweriya serkeftinê hebû di hemû hêza me ya di çeperan de. Gel jî ji berê zêdetir ketibû nava tevgerê, li gorî rewşa nû ya şer xwe amade dikir. Gelek kesên sivîl, mirovên temenmezin di çeperên şer de bûn. Hêza ku li ser banga seferberiyê ya Rêber Apo ji bakur hatibû jî dest bi perwerdeya xwe ya çekan kiribû. Perwerdeyên demkurt dihatin dayîn, me xwe ji şerekî dijwartir re amade dikir. Ji xwe êdî bi dehan ciwan ji bakurê Kurdistanê ji bo seferberiyê dihatin, piştî perwerdeyên Kurt li eniyên şer dihatin belavkirin. Çete û dagirkerên Kurdistanê xwe ji dagirkeriya Kobaniyê re amade dikirin, Kobaniyê xwe ji şerê dijwar, berxwedana serdemê re amade dikir.

# BEŞA SÊYEMÎN

# ŞERÊ LI ENIYA ROJAVA

5’ê meha heftan a sala 2014’ê çeteyên DAÎŞ’ê hewl dan carêke din êrîşî gundê Xerûs û Aşmê bikin. Di heman rojê de, xwestin êrişî Eniya Sirînê, Girê Şehîd Hecî bikin. Berpirsê wê eniyê hevalê Emîn Erkendî bû. Ew demek bû, çeteyan bi gelemperî êriş dikir, êriş hemwext dihatin destpêkirin. Ji ber di şerên pêşiya hingê de, ezmûna girtîn hebû. Wan baş dizanî ku ji aliyekê ve êrişkirin wan nabe serkeftinê, pêwîste me di hemû aliyan de bixin nava şer ku em nekarin giraniya xwe bidin aliyekê tenê. Di wê demê de hêza di bin fermandariya Hevalê Faysal, an ku Ebû Leyla li gundê Xerûs bû. Wê êvarê koma ku biçe kemînê dereng çûbû cihê xwe. Lê beriya bigihêjin wir, ferq kiribûn ku hinek di cihê kemîna wan de hene. Agahî dan Ebû Leyla, gotin; “li cihê kemînê çete hene, xwe ji bo êrişê amade dikin.”Piştî berpirsê koma çûyî êrişê tekmil dide, hevalê Ebû Leyla dibêje; “hûn derdora kemîna wan bigirin. Wan bixin çemberê.” Heval derdora koma çeteyan digirin, wan dixin çemberê, paşê êrişî wan bikin.” Ji xwe çeteyan agahî girtibûn ku Ebû Leyla û hêza dibin fermandariya wî de li wir e. Di wê navberê de hevalê Kendal li Ebû Leyla digere û dibêje; “li aliye gundê Aşmê liv û tevgera çeteyan heye. Wisa diyare ku dixwazin li vê derê jî êriş bikin. Li vê derê girê hevalên

jin lê dimînin heye, amadekarî heye ku êrişî wî girî bikin.”

Li ser agahiyên ku di pêş de tên girtin, hevalan tedbîr girtibûn. Beriya çete êrişî ser gir bikin, hevalên jin komek heval ji bo kemînê şandibûn pêşiya wan. Dema çeteyan dest bi êrişê kirin, hevalên jin ên saetek berê kemîn avêtibûn pêşiya çeteyan paşve êriş kirin, derbeyek giran li çeteyan xistin. Lewma êrişa li ser gir, bi tedbîrên hatîn girtin vala derket, çeteyan jimarek zede termen kuştiyên xwe helan û paşve revîn. Her wiha li gundê Aşmê jî gel bi xwe çeperên xwe girt, ji bo parastina gundê xwe ew jî ketin amadekariya şer. Di êrişên destpêkê yên li ser gundê Aşmê de hevalan lê xistibû, êriş vala hatibûn derxistin. Di heman wextî de li Sirînê di du cihan de êriş kiribûn. Lê di herdu êrişan de jî têk çûbûn. Li ser rewşa wir ez bi bêtêlê bi hevalê Emîn re axivîm û min rewşa wan pirsî. Hevalê Emîn bi awayekî aram got; “Heval me êrişên wan şikandin. Me beriya ew êriş bikin, heval ji bo çalakiyekê şandibûn. Wan hevalan ferq kiribû ku çete dixwazin êrişî me bikin. Lewma me zû agahî girt, me bi amadekariyek baş ew pêşwazî kirin. Di her du êrişan de jî windahiyên wan zede çêbûn, neçar bûn paşve vekişin. Rewşa hevalan başe, moral û hêza me xurt e.” Dema hevalê Emîn bi min re taxivî, ji aliyekê ve dengê wî bilind dibû, ferman dida hevalên derdorê ku rê nedin çete di ti alî re bikarin bikevin wê eniyê. Paşê min sedema fermanên wî pirsî, got, “li pêş eniya me cihek heye. Cihek avzê ye, coyekî avê ye. Çeteyan xwest di wir

re êriş bikin, heval lê dixin. Ev êrişa sisiyan e. Hevalan di wir de çete asê kirine, lê dixin. Nikarin gav bavêjin. Me biryar da ye, teqez dê nekevin eniya me.” Piştî axaftina min a bi hevalê Emîn re, me ji eniyên şer hemûyan heman tişt bihîstin. Windahiyên me wê şeve çênebûn, di hemû cihan de êrişên çeteyan şikestin.

Sibê me xwest hevalên berpirsên eniyê bên û em hinekê nîqaş bikin. Min gazî hevala Mizgîn kiribû, lê ji ber ew ne amade bû, hevala Roza ku alîkara wê bû hat. Hevala Roza, hevalê Ebû Leyla û hevalê Kendal hatin. Em her çar rûniştin, me rewşa li eniyê nîqaş kir. Hevalan çalakiyên şeva borî nirxandin, şikandina dijmin wekî serkeftinek mezin girtin dest. Lê hemû heval di heman nêrînê de bûn ku dê dijmin piştî vê şikestinê êrişên dijwartir bike.

Di rûyê hevalê Feysel de diyar bû dixwaze tiştekê beje. Lê li benda kêliya guncav bû. Piştî nirxandina amadekariyan û şûn de got;“heval, ez dibêjim di nav hêza me de kesên sîxûr hene. Duh me biryar girtibû, em li ser gundê mala Hindî çalakiyê bikin. Lê hêj me amadekarî dikir, dijmin tedbîr girt û wan êrişî me kir. Ji derveyî hêza me, kesî cihê kemîna me nedizanî. Lê dijmin ew der girt. Ev demeke em biçin kû, li wir êriş pêk tê. Wekî ku dijmin me bîst û çar saetan dişopîne, cihê me dizane, hêza me dizane tevger dike.” Piştî axaftina wî min pirsî û got; “Yên hûn jê şik dibin hene an ne?” Serê xwe rakir, li hevalên din jî temaşe kir û got; “Beriya niha çend kes ji Artêşa Azad beşdarî me bûn. Ev hêz xeter in.

Şika me ji kesekî heye, lê nabe em yekser tiştekê bejin. Ji ber çend roj berê, me li cihekê mayîn danî. Lê mayînên me bi dijmin ve neteqiyan. Paşê roja din heval çûn, gotin qabloyên mayînan hatine qutkirin. Dijmin nizane mayîn li wê derê ne. Ev karekî di hundir de tê kirine, agahî ji nav me diçe ji wan re."  Piştî gumanên xwe anî ziman, min jê re got; " Emê lêkolîn bikin. Lê hûn jî baldar bin, bişopînin." Piştî nîqaşê hevalan ji bo çûyîna cihên xwe xatir xwestin û çûn.

Hêj bi ser çûyîna wan re du saet derbas nebûyî, Ebû Leyla bi telefonê geriya û got; "Hevalan ew kes girtine. Dema xwestiye bireve, hevalekê ferq kiriye û girtine. Li gorî lêpirsîna me kirî, DAÎŞ'ê şandiye. Babê wî, birayê wî di desten DAÎŞ'ê de ne. Ji wî re jî gotine, 'tu biçe Ebû Leyla bikuje, agahiyên eniya xeta Xebûs bide me. Ziraviyên cihên wan, hejmara hêza li wir, çek, teknîk, taktîka wan fêr bibe, ji me re agahî bişîne.' Her wiha, dibêje li gorî plana DAÎŞ'ê wê îro êriş li ser gundê Aşmê, Girê YPJ, bi du bask li ser gundê Xerûs re êrişî embara genim bihatiyan kirin û ji wir biçûyan eniya Sirînê. Lê ji ber dîtiye di nav hevalan de tevger heye, agahî daye dijmin û wisa eşkere bûye." Ya rast gotin û şikên hevalê Ebû Leyla bala me kişandibû ser rastiyek din jî. Ji ber wî bi xwe digot; "Ev kesên ji derve tên, ne yên baweriyê ne. Gelek ji wan ji aliyê çeteyan ve tên şandin. Neçar dibin bên. Malbatên wan di destên çeteyan de ne. Çete gefan li wan dixwin, ger nebin sîxûr dê malbatên wan bikujin. Lewma divê şiyarbûn hebe li hember van kesan. Ji ber ev

demeke tiştên seyr çêdibin. Em bi kû ve diçin li pey me ne. Komên wan ên sekvan fişekan davêjin me. Her wiha li ser cihên me ji nişka ve êriş çêdibin."

Êvara roja 7'ê Tirmehê çeteyan êrişek nû dest pê kirin. Êvarê çeteyan bi maşînek bombebarkirî xwestin êrişî hêza me ya akademiya perwerdê ya li gundê Ebû Sirê bikin. Dema tên, dibinin heval li derdora akademiyê hene. Dema hişedar maşîna wan dibinin, bi çekan lê direşînin. Di wê navberê de ajovan şaş dibe, nikare bikeve hundirê akademiyê. Maşîna bombebarkirî li wir dihêle û direve. Hevalê Kendal fermandarê wir bû. Hevalê Kendal û hevalê êriş ku li gel wî bû, dibêjin ka em biçin li maşînê binerin, çima maşîn li wir hiştin û revîn? Hevalê Fîraz jî berpirsyarê vê xetê yê hevalên ciwan bû. Dema hevalê Fîraz ew jî diçin temaşe bikin ka çi di maşînê de ye, gazî dike û dibêje, "heval xwe dûr bikin. Ez bawerim di vî karî de planek heye." Dema hevalê Fîraz wisa dibêje, hevalê Kendal û Êriş jî digihêjin wir, dixwazin hundirê maşînê bibinin. Firaz cardin dibêje; "Hevalê kendal, vegerin. Wisa diyare ku ev taxtîkeke e. Planek wan li ser vê maşînê heye." Lê cardin jî heval mereq dikin, nêzîkî maşînê dibin. Dema Kendal diçe, Êriş li pey wî diçe. Dema Êriş diçe, kurmamê wî gevalê Birahîm jî dikeve pey wan û ew jî diçe. Li wir digihêjin nêzîkî maşînê, ajovanê maşînê jî direve. Tevî hişedar fîşekan davêjinê jî ew rizgar dibe. Dema hevalê Birahîm diçe gel wan, ji wan re dibêje; "Ez jî dibêjim di vir de

tiştek heye. Çima maşîna xwe tînin vê derê, dihêlin û direvin?”

Ez wê demê li eniya Qulbatê bûm. Saet 09:30’an hevalan gazî kir û gotin, li gundê Ebû Sirê maşînek bombebarkirî teqiya. Min beriya wê bi saetekê bi hevalê Fîraz re axivî bûm. Hevalê Fîraz berpirsê hêzek me ya ciwan bû. Di rojên ku şer demdirêj dewam dikirin de hevalên me yên li çeperên pêş pir diwestiyan. Lewma ji bo carna bikarin bêhna xwe vedin, me gazî hevalê Fîraz dikir, ji me re çend ciwan dişandin. Di kêliyên şerên germ nemayan de, wan hevalên ciwan demekê çeper diparastin, heta hevalan bêhna xwe vedidan, hinekê xew dikirin. Dema min li hevalê Fîraz geriya, got; “Ezê biçim aliye Çelebiyê. Min jivan daye hinek hevalan, dibe ku ez îro dereng bêm. Ger derfeta we hebe, hûn cihê hevalan dagirin, ezê sibe ji aliyê Çelebiyê komek din heval bînim û bêm wê derê. Lê dibe ku ez îşev negihêjim we, dereng bikevim.” Min jî bi awayekî aram got; “Başe, ger tu dereng bimînî îşev neyên. Tu dikarî sibe komek heval bînî û cihê hevalên din biguherî. Ji ber di vê eniyê de şer dijwar e, pêdiviya me bi hêzê heye. Ji xwe ev du roje tu jî westiyayî, hinekê binive, bêhna xwe veke. Ji xwe niha saet dibe neh. Heta hûn bigihêjin wê bibe danzde. Heta heval bên vê derê û biçin çeperan dê bibe dereng. Lê koma xwe amade bike, ger tiştek lezgîn çêbû, emê agahiyê bidin te, gazî we bikin.” Hevalê Fîraz kenî, bi awayekî henekî got; “Wile min bawer nedikir hûn wisa aram pêşwazî bikin. Yek jî li ser vê aramiyê bêjin bêhna xwe vekin. Spas, ez sibê zû

têm gel we. Bi xatirê we, serkeftin be. Hevalan silav bikin, emê sibe hev bibinin." Di kêliya min agahiya maşîna bombebarkirî teqiyaye girt û hevalan nav dan, ev gotinên hevalê Fîraz hatin bîra min. Di êrişa bi maşîn de hevalê Kendal, Xelîl û hevalê Fîraz şehîd bibûn. Hevalê Birahîm û Êriş jî giran birîndar bibûn. Hevalê Birahîm di dema herî zehmet de bi maşîna xwe hatibû gel me û gotibû, "Hûn çi karî bidin pêşiya min ez amade me." Mirovek xweşmêr û jêhatî bû. Ya rast ji roja detpêkê min ew dîtî ve heta ku wî di xwede tirs kuştiye bi min dabû jiyankirin. Şehîdbûna hevalan û birîndariya hevalê Birahîm di wê xetê de bandorek nebaş li ser hevalan çêkir. Di warê moral de neyênî bandor ava kir. Ji ber kes ne li benda şehîdbûnek wisa bû, sê hevalên me yên pêşeng bi wê êrişa maşînê şehîd bibûn, hevalê Birahîm jî giran birîndar bibû. Ji bo ew hêz hinekê moral bigire, xwe komî ser hev bike hevalê Masîro çû gel wan. Li xeta me şer hebû û me nedikarî em biçin. Lê şehîdbûna hevalan ne tenê li wê eniyê, li ser me hemûyan bandorek neyênî kir, xemek mezin da çêkirin.

Piştî bi maşîna bombebarkirî êrişî wê derê kirin, berbanga heman şevê êrişî ser gundê Evdiko kirin. Êrişa li ser gundê Evdiko ne êrişek ji rêzê bû. Armanc ji vê êrişê hêza me ya li eniya Rojhilat xistina çemberê bû. Ji xwe girtina gundê Evdiko, dihat wateya ku gundê Evdalê, Girê Sor û hemû gund û cihên di wê eniyê de. Ger gundê Evdiko bihatiya girtin, diviya em hêza xwe ya di çeperên pêş ên wê eniyê de hemûyê paşve vekişînin.

Derveyî wê çareseriyek din nîne. Ji ber li wir navbera hêza me ya li eniyê tê girtin. Riya diçû wê eniyê di ser gundê Evdiko re derbas dibû. Gund piranî Ereb bûn, çend malên Kurdan tê de hebûn. Beriya hemû gundan, gundê Evdiko hatibû valakirin. Di dema êrişê de bi sê-çar tankan ketibûn navbera hevalan. Ez çûbûm Ebû Sirê, li wir pevçûn hebûn. Me ji hevalan re got tedbîr bigirin. Hevalê Masîro ber bi sibehê gazî kir û got;

-Ez diçim gundê Evdiko, li wir pevçûn hene. Çeteyan bi tankan êriş kirine, şerek giran li eniya Rojhilat derketiye.

-Çawa, kî der girtine? Li ser gundê Kendalê, Girê Sor û cihên din jî êriş heye an ne?

-Na, niha tenê gundê Evdiko ye. Bi tankan hatine, navbera hevalan qut kirine. Ketine nav gund, çend malên destpêka gund girtine.

-Em bên alîkariya we, pêdivî hebe agahî bidin.

-Niha neyên. Hûn wê xetê saxlem bikin. Ev êrişek giştiye, taxtîkek cuda di van êrişan de heye. Hevalên li eniya Rojava jî dibêjin di çend cihan de êriş kirin, lê êriş li wê eniyê hatine şikandin. Lewma divê hemû alî haydar bin, em hemû eniyan xurt bikin.

Wê rojê heta êvarê wekî hevalê Masîro gotî êrişên giştî pêk anîn, xwestin di pir cihan re bikevin nava hêzên me û wan ji hev qut bikin. Hêj hevalê Masîro li wir hevalan

tekmîla eniyên din dan. Xwestibûn di hemû aliyan de êriş bikin. Lê hemû êriş hatin şikandin. Tenê li gundek aliye eniya Rojava ji ber avêtina topên hewanê hevalekî li cihê kontrolê şehîd bibû. Ew jî xelkê gund bi xwe bû, di hişedariya gund, cihê kontrola rê de bû. Hevala Narîn li bajêr bû. Me rewş ji hevala Narîn re jî got. Hevala Narîn got; “Êrişên li ser eniya Rojava tacîz in. Hemû hevalan şiyar bikin, tedbîrên xwe bigirin. Dê êrişên bingehîn li cihên din bên kirin, li gorî wê tev bigerin.” Piştî hevala Narîn gotinên xwe qedand, hevalê Masîro çû aliyê gundê Evdiko. Piştî gihişt wir, agahî da û got; “Rewş li vê derê cidî ye.  Pevçûnên dijwar hene. Jimarek mezin kes û çekên giran anîne vê derê. Her çibe niyeta van xirabe. Lê heval başin, pevçûn bi dijwarî dewam dikin.” Hêj axaftina min bi hevalê Masîro re nû qediya bû, hevalê Sefqan gazî min kir. Got; “Heval, ez diçim gel hevalê Masîro, aliyê gundê Evdikê. Ji ber li wir her ku êrişek dişkê, ya din dest pê dike. Her ku komek tê tinekirin, komek din wekî teqwiye tê, êrişê ji cihê ew lê mayîn dewam dikin. Heta serê sibê, kesek ne nivist, hemû hêz di çeperên xwe de man. Li eniyên din piştî êrişên destpêkê û şûn de êdî êriş nekirin. Hemû giranî dan gundê Evdiko, pevçûnan li wir sibê jî her dewam dikir. Hevalê Mehmûd li min geriya û got; “Li aliyê me tiştek nîne. Min komek heval ji bajêr anîne, ezê bi wan re biçim gel hevalê Masîro. Di wê eniyê de êriş her diçe dijwartir dibin. Hevalên bi min re bên riyên wê derê baş dizanin, dê bikarin alîkariyek baş bidin.”

Berê di gund de tenê hevalên jin hebûn. Paşê tabûrek di bin fermandariya hevalê Dilgeş de xwe gihandin wê derê, çûn gel hevalan. Heta nîvro, di wê eniyê de şerên herî dijwar hatin kirin. Heta nîvro çar-pênc caran hêza me ya dixwest êrişên çeteyan bişkîne hat guhertin. Hevalên ku diçin alîkariya hevalên di gund de şer dikin, an birîndar dibûn, an jî şehîd dibûn. Lê ti niyeta çeteyan a dest ji dagirkirina wî gundî berdin nebû. Hevalên me jî ew der bi hemû hêza xwe ve diparastin û berxwedanek mezin raber dikirin.

Hevaltiyên şer, rojên teng naşibin hevaltiyên ti dem û wextên din. Hevaltiyên rast, ji dil ava dibin di şer de. Dostaniyên mohra xwînê lê ketin saz dibin. Peymanên mohra wan betal nabin navên hevaltiyên şer in. Nîvro, êrişên çeteyan gelek zede bûn. Hevalê Botanê Reş û hevalê Erdal jî li wê eniyê bûn. Hevalê Botan dema ku êrişî çeteyan dike, di rê de birîndar bibû. Dema hevalê Erdal vê dibine, ber bi wî ve baz dide, dixwaze xwe bigihîne wî û rizgar bike. Lê di çûyîna gel wî de, dibine ku şehîd bûye. Di wê kêliyê de dixwaze rabe û êriş bike, çete lê direşînin. Hêj destên hevalê Botan di destê wî de ew jî şehîd dibe. Herduyan berî biçin mohra hevaltiya xwe avêtibûn. Ji hevalê Dilsoz re gotibûn; "Em demek dirêje bi hev re ne. Me biryar daye em heta henaseya xwe ya dawiyê jî bi hev re bin. Ev sond û soza me ya hevaltiya şer e. Me li pir cihan bi hev re şer kir. Îro jî em cardin bi hev re ne. Ger rojekê yek ji me şehîd bû, yê din nikare bijî. Divê em di heman rojê de şehîd bibin. Ji ber

me pir şehîd dîtin, me sozên wan, gotinên wan, hevaltiyên wan hemûyan di hevaltiya xwe de kir yek. Me biryar da em bibin navê hevaltî û dostaniya şer. Divê ev hevaltî û dostaniya me, ji Kurdan re, ji siyaseta Kurd re bibe mînak. Kurd ji hev hez bikin, bikarin li gorî hezkirinek herî mezin bijîn. Me ev hezkirin û hevaltiya rast ji hevalên xwe yên şehîd, hevalên xwe yên heta kêliya dawiyê bi hezkirin û dilsoziyek mezin bi ax, welat û hevalên xwe ve girêdayî man, li ber xwe dan, ji bo wê şehîd bûn girt. Vê hevaltiyê em ji biratiyê jî zêdetir nêzî hev kirin. Divê em hêjayî hevalên xwe yên şehîd, hêjayî hevaltiya xwe ya dozê bijîn. Ger em biçin jî divê em bi hev re biçin gel hevalên me soza hevdîtinê dayî wan."

Herdu jî ciwan bûn. Hinek kes hene, giyana navê ku li xwe dikin derbasî xwîna wan, hişê wan, liv û tevgerên wan dibin. Hevalê Botan û Erdal jî wisa bûn. Hevalê Erdal ji Efrînê bû. Hevalê Botan jî ji gundê Cibnê bû. Herdu jî ji destpêka avakirina YPG de beşdar bibûn. Hevalê Botan wekî navê xwe, kesek asî, wêrek, jîr û kêrhatî bû. Wekî çiyayên Botanê bi heybet bû, hêvî dida derdora xwe. Di çalakiya ew diçûyê de teqez serkeftin dihat bidest xistin. Di destpêka şerê Kobaniyê heta wê roja şehîd bûyî de, di hemû şeran de rolek mezin lîstibû. Hevalê Erdal jî wekî fermandar Erdal, Engîn Sîncar, hevalekî keyfxweş, ji dil, wêrek, jêhatî û dilsozê doz û hevalên xwe bû. Herdu jî di nav hevalan de pir dihatin hezkirin. Wekî du egîdên Kurdistanê, xweşmêr û lehengan di şerê xwe de xurt bûn. Jiyana wan jî wekî

hestên hevaltiya wan, bi pîvan, tijî hestên dilsoziyê, hêvî û baweriyê bûn. Herdu heval jî berê sê- çar caran birîndar bibûn. Lê dema hinekê birînên wan hev digirtin, yekser berê xwe didan eniyên şer. Herdu di hemû jiyana xwe de jî sembol û pîvanên hevaltî, dostaniya rast bûn. Ji xwe pir caran digotin; “Ger xwîna dilê me di heman coyan de neherike, divê mirov şikê ji hevaltiya xwe bike. Divê dilên hevaltiyên rast bi hev re lê bidin, nexwe di wê hevaltiyê de dê kêmaniyek hebe. Em herdu wisa bûne, xwîna me di yek dilî de diherike, dilên me bi hev re lê dixin. Di dilê me de dile bi sedan heval hene.”

Herdu heval jî endamên tabûra hevalê Dilgeş bûn. Tabûra hevalê Dilgeş di aliyê hejmarê de ne zede bû. Lê di warê çawaniyê de, tabûrek fedayî bû. Hevalên tabûrê hema bêje beşdarî hemû şerên li Kobaniyê bibûn, ezmûn girtibûn. Li kî derê tengavî, pêdiviya destwerdanê bihatiya dîtin, ew tabur li wê derê bû. Hevalên fermandar û pêşeng bûn. Koma wan a sabotajê, ya sekvaniyê, komên êrişên fedayî hebûn. Di wê tabûrê de kes nebû, du-sê caran di şer de birîndar nebûyî. Heta wê rojê, hevalê Dilgeş bi xwe jî du caran birîndar bibû. Hêj birînên destê wî sax nebibûn, cardin hatibû şer. Bi tabûra xwe re li kû şerek hebûya berê xwe dida wir. Di nav tabûrê de her hevalek bi serê xwe bibû xwedî ezmûn û jêhatina fermandarekî di şer de. Heta êvarê şer dewam kir, me biryar dabû em gund bernedin. Ber bi êvarê ji tabûra hevalê Dilgeş jî panzde heval giran birîndar bûn. Dijmin bi rikek mezin êriş dikir, her pêla êrişê ya dihat

şikandin, bi xwe re pêlek din dianî. Ber bi êvarê em cardin li hevalê Masîro geriyan. Me xwest em ji bo alîkariyê biçin, lê wan gotibû heta em agahî nedin pêwîst nake hûn bên. Hevalê Masîro di wan kêliyan de bi xwe ketibû êrişê. Lewma hevalek din bersiva min da û got, “Hevalê Masîro ne amade ye. Ketiye êrişê. Heval di hemû aliyan de êriş dikin, pevçûn pir dijwar bûne. Heta niha nêzî şeş komên cuda êriş kirin. Lê her em lê dixin û komek wan têk diçe, koma din dixin cihê wan û cardin êriş dikin. Pê li termen kuştiyên xwe dikin û tên. Niha dixwazin bi tankan bikevin cihên me.” Di dema hevalan ev agahî didan de, çeteyan bi sê tankan û hammr’an berê xwe dabûn nava gund. Me li ser rewşa wê derê hinekê bi hevalên eniyên din re axivî,  di hemû eniyan de mereqa ka li wê derê çi dibe hebû. Di wê navberê de hevalan li ser cîhazan bi dengê bilind gotin; “Tankek rûxî, tank têk çû. Hevalê Hogir bi fûzeyê li tankê xist.” Me hêj biryara ka em biçin an ne nedabû. Hevalan cardin agahî dan û gotin, “Heval, dijmin hêzek mezin li vê derê kom kiriye. Wekî ku qet dawiya wan nayê, her em dikujin hartir dibin, bi komên mezintir êriş dikin. Diyare biryar dane ku berdêla wê çi dibe bila bibe, vî gundî bigirin. Tevî ku tankek wan hat îmhakirin jî navber nedan êrişên xwe.”

Di wê eniyê de hevala Agirî hebû. Hevala Agirî, keçek ciwan û esmer bû. Hevaleke rû bi ken, jîr û kêrhatî bû. Ji ber her dem dikenî û keyfxweş bû, hevalan bi henekî digotin; “Paşnavê hevala Agirî ken e” û navê wê kiribûn Agirî Ken. Ew şeş meh bû beşdarî YPJ bibû. Lê di wan şeş

mehan de, beşdarî gelek pevçûnan bibû. Di hemû pevçûnan de bi çeka xwe ya B-7 beşdar dibû. Lê ji ber bejna wê kurt bû, çeka wê digihişt ber piyên wê. Me guhdarî muxabera wê eniyê dikir, ji dengê bêtêlan navê Hevala Agirî bilind dibû. Hevalê Dilgeş digot, "Dest xweş, her bijî hevala Agirî." Min pirsî û got; "Çi bûye?" hevalan got; "Hevala Agirî gurzên agir dibarîne ser tank û maşînên dijmin. Du tankên wan derbe xwarin bi guleyên çeka wê. Hema li deştê jî raweste dijmin nabîne. Li pêşiya tankan sekini ye û bi guleyên çeka xwe dijmin dihingêve."

Ber bi êvarê her ku hevalan xwest êrişan bişkînin jî çeteyan hemû giraniya xwe dan wê xetê. Lewma me wekî rêveberî biryar da ku em ji wê xeta pêş, gundê Evdiko hêza xwe paşve vekişînin. Ger ne wisa be, dê hêza me biketiya çemberê, dibe ku jimarek zêde şehîd çêbûyan. Hevalê Masîro di wê navberê de di komên êrişê de êrişî çeteyan dikir û ne amade bû. Lewma dema biryara vekişandinê ew ne amade bû. Hewa hinekê tarî bibû. Di derbarê vekişandinê de nêrîna rêveberiya me hemû yek bû. Hevalan beriya biryarê gazî min jî kiribûn, gotin, "Tu çi dibêjî?" Min bi qasî wan rewşa wir nedizanî. Lewma di şer de înîsyatîf dayîna kesên li qadê şer dikin, li gorî pêdiviyan rewşa mayîn an derketinê diyarkirin baştir bû. Min jî got; "Hûn çawa guncav bibinin wisa bikin. Ji ber hûn di eniyê de ne, rewşa li wir ji min baştir dizanin. Çi pêwîst be, wê bikin." Hevalê Mehmûd rewşa li eniyê ragihand û got "Hevalên jin cihên xwe bernadin.

Hevalên li Girê Sor dibêjin em dernakevin, paşve nakişin. Me çend caran bi wan re axiviye, lê dibêjin hûn çi bikin jî em ji vê derê dernakevin, çeperên xwe bernadin." Ya rast di aliyekê de vê ez pir şad dikirim. Li cihên herî xeter, li hember dijminê herî hov û xwînxwar jî jinên Kurd bi wêrektî, bawerî û vînek mezin şer dikirin. Cihê xwe bernedidan. Ev ji aliyekê ve ji bo me şanaziyek mezin bû, di aliyê din de jî ji bo me zehmetiyek bû. Bêguman, di hemû artêşan de kesên leşker ne xwedî gotin in. Ew ji pêkanîna fermanên fermandaran berpirsyar in. Neçarin li gorî wê tev bigerin. Lê em artêşekî gel bûn. Nirx û qîmet ji nêrîn û pêşniyarên her hevalek me re dihat dayîn. Carna di kêliyên şer ên germ de jî nêrîna hevalan dihat girtin. Lewma di hêza me ya leşkeri de her çiqas disîplîn û pergalek rêk û pêk hebû jî di hinek kêliyan de tiştên cuda jî derdiketin pêşiya me. Wekî biryara nevekişandina hevalên jin. Berê jî me pirsgirêkên wisa jiyan kiribûn. Lewma min bi telefonê gazî berpirsa hevalên jin ên li Girê sor kir. Hevala Zîlan berpirsa wir bû. Min jê re got; "Hevala Zîlan, me biryara paşvekişandinê daye. Hevalan ji we re biryar ragihandine. Lê we biryar pêk ne aniye. Niha însiyatîf a hevalên berpirsê eniyê ne. Ya girîng ne girtina cihekê, heta dawiyê di wir de mayîn e. Em şerê çeperan nakin. Pêwîst bike emê berdin, paşê cardin biçin bigirin. Lê em hêza xwe di cihekê de terkî windabûnê nakin. Ev ne helwestek rast e. Biryara hatî dayîn pêk bînin." Tevî ku min bi dengek aram jî di axivî, min fermana vekişandinê zelal da. Lê ji aliyê din dengê hevala Sorxwîn û Barîn jî

tevlî dengê hevala Zîlan bûn. Dengê telefonê vekiribûn, hevalan bi yek dengî digotin; “ Em nayên.  Bila hevalên din vekişin, lê em bimînin.” Dengê girî jî dihat guhên min. Heval ji biryara me dayî ne razî bûn. Piştî ewqas hevalên birîndar, şehîdbûna hevalan a li wir, paşvekişandin ji wan re giran dihat. Di rastiyê de hemû hevalên ciwan bûn, hestyar nêzîkî şer û şehîdbûnan dibûn. Ev asta hestyariyê di hevalên jin de pir zêdetir bû. Min ev rastî dizanî. Lewma ji bo bikarim wan îqna bikim, dilê wan neşkînim min got; “Hevalno, ez hestên we fêm dikim. Lê li Kurdistanê ne tenê gundek heye. Ger hûn neyên, dê heval nekarin vekişin, bikevin çemberê. Zêdetir heval şehîd bikevin. Ji ber tevî ku her der tijî termê çeteyan bûye, dîsa êriş dikin, li wê xetê hêzê kom dikin. Biryar girtine çi dibe bila bibe gundê Evdiko bigirin. Dixwazin me bêxin çemberê, di nava çembera çêbikin de bifetisînin. Vêca divê em neyên vê lîstika wan, bikarin wan vala derbixin. Werin, em li pêştir xetek nû ava dikin.”

Tevî tiştên min gotîn jî hevala Zîlan heman bersiv da min. “Bila hevalên din vekişin, em tenê bimînin.” Li ser vê gotina wê êdî ez bi acizbûn axivîm û min got; “Hevalno, vê ji min re bêjin; hûn leşker in an ne? Ger hûn leşkerbin, hûnê li gorî hestên xwe tevger nekin. Fermana çi bê dayîn, hûnê wê pêk bînin. Fermandarê we bêje hûnê êriş bikin, hûnê êriş bikin, bêje bisekinin, hûnê bisekinin. Binêre hevala Zîlan, tu fermandara wê derê yî. Berpirsyara vê biryara hevalan tu yî. Tu bi serê xwe

biryaran didî. Guhdarî fermandarê xwe yê wir nakî, guhdarî fermanên em didin nakî. Ma tu parastvana gundekêyî, dixwazî gundê xwe biparêzî? An tu milîtanî, li gorî pêdiviyên şer, rê û rêzikên vê tevgerê dijî? Ger tu fermandar û milîtaneke ya YPJ'ê yî, divê tu li gorî wê tevbigerî. Ger hûn neyên, hûnê bibin sedema plana dijmin bi ser bikeve. Binêrin, herî dawiyê hevalê Erdal, Botan û Agirî şehîd ketin. Ger hûn şervan, militan û rêhevalên rast ên şehîdan bin, hûnê fermana hevalan dayî pêk bînin. Niha ger hûn bi biryarin tola şehîdan rakin, pêşiyê li êrişên hovane yên çeteyan bigirin, fermana hatî dayîn pêk bîne, hevalan ji wir derxe."

Bi rastî gotina wan tiştan ji bo min ne hêsan bû. Di warê hestyarî de hestên min ji yên wan ne cudabûn. Lê şer tenê bi hesyarî nedihat meşandin. Şer karê hesab û planan bû. Diviya em rasteqîn nêzîkî şer bibin. Ji dengê hevalan diyarbû çiqas hestyar in. Min wate dida vê hestyariya wan jî. Ji ber ew salek bû, bi wan hestên dilsoziyê, bi vîn û berxwedanekî mezin wan hevalan gundê Evdiko ji êrişên çeteyan diparastin. Bi dehan pevçûn li wir çêbibin, wan êriş şikandibûn. Di vê pêvajoya salekê de gelek heval şehîd bibûn, li wir gelek heval birîndar bibûn. Girêdan û dilsoziya wan a bi hevalên şehîd ve hêla bû ew di her êrişê de bi ser bikevin. Serkeftinên mezin li wir hatibûn bi destxistin. Bi sedam çete di wê eniyê de hatibûn kuştin. Piştî fermana dawiyê, hevalan got; "Heval, hûn jî hinekê me fêm bikin. Ma hêsane em dest ji hevalên xwe yên li vê derê şehîd

bûyîn berdin? Em çawa dest ji cihê hevala Viyan, Peyman, hebûn, Sorxwîn, hevalê Rostem, hevalê Siyabend bi cih bihêlin? Bi dehan hevalên me li vê derê şehîd bûn. Fermandarê me li vê derê şehîd bû. Me ji bo valaderxistina plana dijmin biryarek wisa da. Lê ger hûn dibêjin wê ev biryar bibe sedema serkeftina çeteyan, emê pê li dilên xwe bikin, fermana bê dayîn pêk bînin.”

Peyva ‘emê pê li dilên xwe bikin’ zingîniyek xist serê min. Ji ber bi her hevalekê re me dilê xwe tevlî wê axê dikir. Êdî cih û mirov bihev re dihatin naskirin. Ew cihê bi dehan hevalên şehîd bû. Ne tenê gundek, çend kîlometreyên axê bûn. Ew cih dibûn erdnîgariya dilê me. Nexşeya hiş û hestên bi dehan şehîd bû. Lewma tevî her tiştî, me ew hest dizanî, ji xwe hevalan ji bo wê helwestên pir hişk raber nekiribûn li hemberî wan. Min cardin got; “Em hemû hestên we dizanin. Lê dijmin ketiye gund, heta nîvê gund girtiye. Hejmarek zêde tank, çekên giran, Hammr û çete li wir kom kirine. Piştî şikandina her êrişê, êrişek din pêk tînin. Hevalan biryar daye li gundê Kopirlik, Ehmediyê û wan gundên derdor xetek din çekin. Ev şev û rojek e we ji bedena xwe çeper çêkirin. We bi singê xwe, bawerî û vîna xwe, wêrektî û dilsoziya xwe, hevaltî û girêdana bi şehîdan lehengiyên mezin raber kirin. We bi sedan çete kuştin. Tevî hemû hêza xwe li wê derê kom kirine, çeteyan nekarî bigihêjin armanca xwe. Lê em naxwsazin zêdetir şehîdan bidin, heval bikevin çemberê. Niha berpirsyarê we hevalê Masîro çi fermanê bide wê pêk bînin. Xwe ji bo

vekişandinê amade bikin. Me çawa berê gelek cihên wan girtîn, ew cih ji wan re kirin goristan û me cardin girtin, emê gundê Evdiko jî bikin goristana çeteyan. Bila baweriya we hebe, dê yek bosta axa me jî ji wan re nebe cih û war."

Wê şevê ber bi berbangê ve heval ji gundê Evdiko, Kendalê, Girê Sor û ji çend gundên din vekişîn. Ger ev heval ji vir nevekişayabûna di navbera du dorpêçan diman. Berxwedana şev û rojekê bi serê xwe destanek bû. Heta wê rojê li ti cihî bi qasî gundê Evdiko çete nehatibûn kuştin. Tevî ewqas hatina kuştin bi rik êriş nekiribûn. Hêza me xwe dabû gundê li kêleka gundê Evdiko, di wir de xetek parastinê ya din çêkiribûn. Ji wir fîşeka klêşê digihişt gundê Evdiko. Ji xwe wê rojê heta êvarê wan ji gundê Evdiko, hevalên me jî ji çeperên xwe yên hişedariyê fîşek avêtin hev. Roja sisiyan, çeteyan xwest êrişî xeta me ya nû bike. Bi tankê hatin. Li pişt tankan jî komên êrişê hebûn. Hevalên me hatina tankê ferq kirin, hevalan çeperên xwe saxlem kirin. Di dema ku tankê xwest guleyê bavêje de, hevalê Qehreman Efrîn lûleya tankê hedef girt, fîşek berda devê lûleya tankê. Hevalê Qehreman û Şiyarê Dilkun di wê eniyê de sekvanên navbang bûn. Hêj gule di devê tankê de bû, rastî fîşekê hat, gule di lûleya tankê de teqiya. Ev karek gelekî zirav bû û bi sedatan li benda keysa lûleya tankê diman. Dema berê luleyê di hatî hîza wan nîşan li devê wê digirtin û diavêtinê. Dema tank teqî, çete şaş û maş bûn. Hevalan êrişî çeteyên dihatin kirin, piraniya koma

êrişê hat kuştin û çend kesên birîndar bûyîn jî bi paşve revîn. Bi fîşekê teqandina guleya tankê derûniya wan têk da. Lewma di dema şaşbûna wan de hevalan êriş kir, ew êriş şikandin. Piştî têkçûna êrişa wan, hevalên me yên koma sabotajê li wê xetê hemûyê mayîn danîn. Dema vê carê maşînên wan hatin kuştiyên xwe bibin, mayîn di maşînek wan de teqî û şeş kesên din jî di maşînê de hatin kuştin. Van çalakiyan hişt êdî newêrin wekî berê êriş bikin. Di wan de çavtirsandinek çêbû. Berxwedana gundê Evdiko, çalakiyên li wê xetê rastiyek nîşanî çeteyan da. Çeteyan dît ku girtin û dagirkirina Kobaniyê wekî ku hesibandine ne hêsan e.

## GOTINA ÇETEYEK DAÎŞ'Ê: JINEK KURD HEBÛ

Piştî berxwedana gundê Evdiko, çeteyek DAÎŞ'ê xwe bi riya telefonê gihand me. Me destpêkê nexwest em pê re baxivin. Lê dema behsa hevala Agirî kir, di dengê wî de diyar bû bandor bûye. Digot, "Ez dixwazim bi we re bibim alîkar, agahiyan bidim we. Sedema vê daxwaza min, berxwedana jinek Kurd e." Çeteyê DAÎŞ'ê behsa hevala Agirî dikir. Digot; "Dema me bi tankan êriş dikir, ajovanên me yên tankan digotin 'em ji ber jinekê nikarin pêş de biçin. Guleyên wê li nav tankên me dikevin. Em her dixwazin wê tine bikin, lê di kêliyê de cih diguhere, em pê nikarin.' Ev jina ku tankên me pê nedikarî jinek çawa bû? Me hemûyan ev mereq dikir. Paşê piştî me xwe gihand cihê tankan, me termê wê jinê dît, ez matmayî

bûm. Jinek ciwan, esmer, bejna wê kurt bû. Wê jinê tankên me bi saetan di cih de dabûn rawestandin. Herî dawiyê xwe gihandibû tankekî me, di ber tanka ku rûxandibû de hatibû kuştin. Termê wê, wêrektiya wê ez ji tişta dikim dam şermê. Min ji xwe re got ev ruhek çawa ye? Jinek evqas ciwan, bi vê bejna xwe çawa karî evqas şer bike, pêşiyê li tankên me bigire? Ez bi xwe Ereb im, ji gundeki cîranê we me. Jin û zarokên min hene, keçek min jî di temenê vê jina ciwan de heye. Lê ew naşibe jinên Kurd. Newêre bi şev ji mal derkeve. Lê vê jina di temenê keça min de, bi şev û rojekê şer kir, pêşî li hêzekî wekî me girt. Ya rast min şer û wêrektiya hemû şervanên we dît, ez bûm şahid ka hûn çawa şer dikin. Lê berxwedan û şerê vê jinê hişê min têk da. Min ji mirovbûna xwe, zilamtiya xwe şerm kir. Ez niha bi neçarî di nav vê hêzê de disekinim. Lê soz be, ez ti car wê jinê jibîr nekim, fişekan bernadim şervanên Kurd. Ji bo xatirê dilê wê jinê yê wêrek, çi ji destên min bê ez ji bo we bikim. Min heta niha digot qey em mafdarin. Lê xwedê îşaretek da min, bi dîtina vê jinê min zanî em gunehek mezin dikin, ti buhuşt me nahewînin ji ber gunehê em dikin. Lewma tiştên ez dixwazim bikim, min divê bibin kefareta gunehên heta niha min kirin.”

Di berxwedana gundê Evdiko de hevalê Botanê Reş, Erdal, Serhildan û çar hevalên din jî şehîd ketibûn. Termê hevalên şehîd hatibûn rizgarkirin, lê hevalan nekaribû xwe bigihînin termê hevala Agirî. Termê wê ketibû destên çeteyan. Şehîdbûna hevalê Botan û Erdal li

ser hemû hevalên li Kobaniyê mayîn bandorek mezin çêkir. Piştî berxwedana li gundê Evdiko, endamên tabûra hevalê Dilgeş tabûrek ava kirin. Navê hevalê Botan li tabûra xwe kirin. Hevalên ku di wê berxwedanê de birîndar jî bûyîn, cardin çûn heman tabûrê. Her wiha gelek şervan beşdar bûn, piştî perwerdê ew jî hatin tabûrê. Hevalê Erdal berê di komên sekvaniyê de bû. Sekvanek jêhatî bû. Piştî şehîdbûna wî, navê komek sekvaniyê jî bû Koma şehîd Erdal a sekvaniyê. Her wiha bandora hevala Agirî li ser wî kesê endamê DAÎŞ'ê çêkirî, bû sedem ku ew kes gelek caran bi telefonê agahiyên îstîxbaratî bide me. Agahiyên wî didan ji bo me pir girîng bûn, alîkarî didan me.  Hevalên me yên şehîd, di çûyîna xwe de jî mabûn. Navê wan, doza wan ji aliyê rêhevalên wan ve hatibû dewrgirtin. Gotina hevalê Teslîm li wê derê jî pêk hatibû. Heval çûbûn, lê hizrên wan, hestên wan, armancên wan, nav û lehengiyên wan li pişt wan jiyan diafirand. Dibûn navê berxwedanî û lehengiyên nû. Ew ji hespên xeyal û armancên xwe peya nebibûn. Em wekî dilsozên wan, li pey şopên wan diçûn.

Şerê gundê Evdiko, rastiyek din jî danî holê. Navendên dagirkeriyê bi çi dibe bila bibe, dagirkirin kiribûn armanc. Paşvekişandin, dest ji wan armanca berdan dihat wateya kuştina wan. Ji xwe li gorî agahiyên me digirtin, piştî biryara dagirkirina Kobaniyê bi giştî û mohrên li Tirkiyê li ser peymanên hevkariyê hatîn xistin û şûn de, berpirsên ku di şer de ji ber gule û fîşekên şervanên Kurd bi filitiyan jî ji aliyê fermandarên xwe yên

payebilind ve bi mirinê dihatin sezakirin. Çeteyan bi xwe fermandarên xwe yên şikestin dijîn dikuştin. Me ew taxtîka wan dimeşand dizanî. Dixwestin navbera hêzên me qut bikin, wekî komên biçûk me bixin çemberan û wisa tine bikin. Lewma me giranî dabû bihêzkirina têkiliya di navbera eniyên şer de. Me çeperên xwe li gorî wê çêdikirin, hêza xwe li gorî wê dida tevgerkirin. Dema ji êrişên hemwext ên li ser hemû eniyan û dorfireh jî encam negirtin, dîtin em bi berxwedanekî mezin nahêlin ew pêş bikevin, vê carê hemû hêza xwe dan çekên giran. Her wiha dest bi çalakiyên xwekujiyê kirin. Vê carê bi maşînên bomberbarkirî ketin êrişan. Di cihên lewazî didîtin de sûîqast pêk dianîn. Hêzên xwe yên fedayî hemû anîn Kobaniyê.  Li eniya Rojhilat, Rojava, Eniya Qulbê, roja ku dused- sêsed guleyên topên cehenemê nehatiyan avêtin nebû. Topa Cehenemê îcadek a Daîşê bû. Di nav Daîşê de gelek mirovên pispor ên ji çekan û tevgera wan fam dikirin hebûn. Ev topa hanê bi vî aqlê hanê, lê ji amûrên berdest çêkiribûn. Boriyek nêzî çar pênc metreyan dirêj bi rampayek ji pêlikên hesin çêkirine girêdidan û mîna torpîdoyên bin avê bi hêza hewayê gule daf didan. Guleya wê jî ji tupên biçûk çêdikirin. Ev tupê hanê perwane pê vedikirin û bi hêza hewaya hundirê boriya hanê dipekandin. Cihê ev tup lê diket hemû xira dikir. Ev xirakirina hanê, bi giranî ji aliyê sengiya (basinç) ku vî tupê hanê çêdikir dihat kirin. Ev tup nêzî pênçsed metreyî dûr diçû.  Bi van topên hanê dest bi gulebarana li ser gundan kirin. Xwestin wisa gel bitirsînin, gel herêma xwe berde.

Lê gel bi biryar bû gundên xwe ber nede. Ji ber çend rûdawan, me biryar da, em li gundên di xeta şer lê heyî de gel nehêlin. Qet nebe, jin û zarokan, pîr û kalan ji gundan derbixin. Me gundên wekî Deyenîkê, Cirin û çend gundên wisa vala kirin. Me gel şand pişt xeta me ya parastinê, me xwest em gel wisa ji êrişên çekên giran biparêzin. Me ji çend gundên li pêş çeperên şer, eniya pêş jin û zarok, pîr û kal derxistin, tenê zilamên gund ên bikarin beşdarî şer bibin, di gundan de man. Lê me kir û nekir, me nekarî em gundê Qizalî vala bikin. Mala Evdoyê Tûjo derketina ji gund nepejirandin. Gotin; "Ger kesek jî li van deran nemîne, em gundê xwe bernadin." Ji xwe kurê Evdo yê Mala Tûjo bi êrişek topên hewanan şehîd bû. Kurik neh salî bû. Piştî şehîdbûna wî jî bapîrê wî Ehmedê Mala Tûjo got; "Ev rastiya vê axê ye. Em gelek bindestin, ji bo azadiya xwe şer dikin. Ger zarokên me sax bimînin û rojên bêşer û azad bibinin, bila bizanin ka ew roj di encam xwîna çend keç û kurên vê axê de pêk hatine. Bila bi şer mezin bibin, bila bi rayên çanda berxwedanê xwe berdin nav vê axê. Ji ber mirovên paşeroja xwe nizanin, zû eslê xwe winda dikin. Xwe ji bîr dikin." Gundiyan li hev kiribûn, gotina xwe kiribûn yek. Lewma tevî hemû hewldanên me jî nehêlan em zarokan jî bişînin cihek din û ji gundê xwe derneketin. Ji ber me dizanî dê dijmin pêş de bê, me dixwest em pêşiyê li kuştina zarokan, kesên sivîl bigirin. Beriya çete êrişî gundê Evdiko bikin jî gotibûn, "Emê ji wir derbasî gundê Bexdikê, Îdaniyê bibin, wisa hemû gundên li herêmê

bigirin. Lewma em neçar diman tedbîr wergirin, ji xelkê gundan re bêjin xwe bidin cihên ewle.

Lê biryara vekişandina ji her gundekê, cihekê wekî xencerekê li dilê me diket. Em bi biryarên me didan birîndar dibûn ji dil û hestên xwe. Ji ber em zarokên vê axê bûn. Me baş dizanî gotinên Ehmedê Mala Tûjo rast in. Berdana gundekê ne wisa hêsan bû. Gund dîrok û demboriya van mirovan bû. Gund giyana pêşiyên me bû. Me bi berdana her gundekê zarokatiya xwe li pişt xwe dihişt. Me dapîr û bapîrên xwe, xewn û xeyalên xwe, bîranînên temenê xwe li pişt xwe dihiştin. Ma kê dizanî her gund bûye hêlîna çend evînan? Çend jiyan li ser destên gundekê çêbibûn, çend kesan laşê xwe tevlî axa gundekê kiribû? Çîrokên wan gor û goristanên li wan gundan hebûn. Jan û xweşiyên xwe li dîwarên wan xaniyên gundan pêçayîn hebûn. Dengên di qirika şevên wan gundan de xwe digihand hiş û meşiyê mirov hebûn. Xeyalên di paxila rojên wan gundan de dixwestin bigihêjin pêşerojê hebûn. Wekî Ehmedê Mala Tûjo digot, “ma qey hêsan bû mirov ji ra û rîşên xwe qut bibe?” Gundek bi hemû heyberên xwe ve zindî bû. Ma gundek li pişt xwe hiştin, neçarî derketinê bûyîn ji bo kê wisa hêsan bû?



Hevala Zîlan jî rast digot. Me pê li dilê xwe dikir di her vekişandinê de. Ji ber di her bostek wê axê de em li rastî kenê hevalên xwe dihatin. Em li rastî berxwedan, hezkirin, vîn û têkoşîna wan dihatin. Li ser her kevirek ji wan xwihdana eniya hevalek me hebû. Xwîna şehîdek me rija bû li ser wan axan. Biranînên me, hest û hezkirinên me, parvekirinên me hebûn li wan cihan. Di her biryara vekişandinê de qirika min tijî dibû. Min digot qey bablîsokek payîzê toza deştê di nava min de daye ber xwe û di hundirê min de dizivire. Min digot qey agirek mîna pirîzeyek poş dabe ber xwe xwe li singê min dixe, ez bêhna kizara dilê xwe dibihîsim. Kenê hevalan, dîmenên wan dihatin pêş çavên min. Çeperên heval tê de şehîd bûyîn, dengê wan, eniyên wan ên bi xwihdan, destên wan ên nazik û ciwan ên li ser tetîkên çekan dihatin bîra min. Wekî ku ew axên bi xwîn û xwihdana hevalên me, ked û berxwedaniya gelê me hatîn standin bi awirên xwe cergê min dax bidin, ez bi êşek giran dihesiyam di hundirê xwe de. Li wan kolanên valabûyîn, dengê pisîkan, kevokên li ser banên xaniyan mayîn

tevzînekên laşê min zêde dikirin. Ez carna wisa kûr diçûm, min dengê hevalên li derdora xwe nedibihîst. Lê min ji hevalan re, ji gel re digot vekişin. Çi nakokiyek mezin bû. Carna şerê di navbera hest û hişê min de, ji şerê di navbera me û çeteyan de dihat kirin zêdetir dibû. Hestên min digot; "Te dît, filan heval li vê derê çawa meşî, filan kes li wê derê çawa çeper çê dikir? Tê bîra te filan hevalî li vir bîranînek çawa got, hevalan li wê derê dîlan girtin?" Û bi sedan hestên wisa li pêş çavên min bi dîmen dibûn, ez bi wan bîranînan re diçûm wan rojên me bi hev re jiyan dikir. Lê hişê min digot; "Dijmin nirx nade hestan, hestyar tev negere. Nexwe dê pir birînên din li dilê we vebin. Ji xwe dijmin, tê wateya yê li dijî min. Hûn ji çi hez bikin, ew li dijî wê ne. Rast bihizire, rast biryar bide. Hestên xwe nîşanî derdora xwe neke, hest vegir in, dikarin te ji rastiyan dûr bixin." Hest û hişê min, li hev nedikirin. Min dixwest ez lihevhatina wan pêk bînim. Ji ber em ne wek dijminê li pêşberî xwe bûn. Me nirx û pîrozbûna hestan dizanî. Lewma min hewl dida ez dil û mejiyê xwe bikim yek, biryarên tên dayîn li gorî wê pêşwazî bikim. Tevî ku ev pir zehmet bû jî em neçar bûn hinek tiştan bikin. Ji ber diviya em xeyal û armancên wan hevalên xwe yên me li ser wê axê şehîd dayîn, baweriya gele xwe ya bi xwe vala dernexin. Diviya em baş bihizirin ku em bikarin pêşiyê li tevkujiyên dijmin dixwaze di warê çandî, dîrokî, siyasî û fîzîkî de li ser gelê me pêk bîne bigirin. Riya vê ya herî rast, xwe li hember hemû janan girtin, xurtbûn bû. Wekî xwediyên biryarê nedibû em radestî êşên xwe bibin, biryarên hestyarî

bigirin û rê ji pêkhatina armancên neyarên gelê xwe re vekin. Lewma dema me bi hevalan re daxivî, wan digot qey em wan fêm nakin, hewl didan hestên dijîn ji me re bêjin. Lê wan nedizanî dilê me yên li pişt wan fermanên me yên hişk, zarokên vê axa bi şer ên Ehmedê Mala Tûjo behs dikir bûn.

Piştî vekişandina ji gundê Evdiko, bi du rojan şûn de ez çûm eniya Rojhilat, gundê Kopirlik. Piştî gihiştim wê derê, min li derdora xwe temaşe kir. Hevalên li gundê Feyantê, di çeperên xwe yên şer de rêz bibûn, bi rêbaza sekvaniyê fîşek davetin dijmin. Dema min gundê Feyantê dît, bîra hevalê Şervan hat bîra min. Hevalê Şervan li wî gundî şehîd bibû berê. Bi dehan çete kuştibû. Wekî wî pir hevalên din di hişê min re derbas bûn, rûyê wan, kenên wan, kêliyên wan ên dawiyê di çavên min de zindî bûn. Min ji xwe re got; “Feyantê, divê tu ti caran nekevî, tu bi hêsanî neyê berdan.” Min berê xwe da gel hevalan û çûm. Piştî gihiştim gel hevalan, me rewşa hev pirsî û em rûniştin, wekî ku hevalan dengê min bihîstibe, min ji axaftinên hevalan heman tişt bihîst. Hevalan jî digot; “Divê Feyantê nekeve, dijmin pê li axa Feyantê neke.” Vê hestê ez pir şad kirim. Di her demê de ne wisa ye. Lê dema mirov bi rastî ji hev hez bike, hest û xeyalên mirovan bibin yek, mirov dikarin dengên dilê hev bibihîsin. Li wir bîra gotina hevalê Botanê Reş hat bîra min. Ji bo têkiliya xwe û hevalê Erdal digot, “Dilê hemû hevalan di dilê me de lê dixe û xwîna dilê me di heman cokê de diherike.” Wê kêliyê min dilê hemû hevalan di

dilê xwe de hîs kir. Wekî ku xwîna me di heman rayan re derbas bibe bi hestên wan dijî dihesiyam.

Em hevalên rêveberiyê li wir kom bibûn. Wê rojê cara yekê min awirên hevalê Masîro wisa bi jan dîtin. Ez bawerim wî jî wekî min heman hest jiyan dikir di derbarê paşvekişandinê de. Moral û baweriya hevalê Masîro, her tim wekî rûbarê ku navê xwe jê girtî bi coş diherikî. Masîro, çemek ji çemên Botanê bû. Dihat wateya rûbarê masiyan. Avek bi pêl û boş bû, biharan wekî lêhiyê diherikî. Hevalê Masîro jî di şerê xwe de wisa bû. Mirovek şerker, fedakar, xweragir, bi bîr û bawer bû. Hevalê Masîro ti caran bê moral nedihat dîtin. Di demên herî zêde dijmin êriş dikir, bi hejmarek mezin dihatin de jî ji hevalan re digot, “Hevalno, çend çeteyên pîsik hatine, ka em biçin wan ji ser axa Kobaniyê bimalin, bavêjin sergo.” Ew gotina hevalê Masîro navbang bû di nav hemû hevalan de. Hevalê Masîro berpirsê YPG’ê yê Kobaniyê bû. Ew du roj bû li eniya Rojhilat hem şer rêve biribû, hem jî bi xwe bi dehan car bi hevalan re ketibû nav komên êrişê û êrişî dijmin kiribû. Ji westan, bêxewiyê, êşa şehîdbûna hevalan û herî zêde jî ji ber vekişandina ji gundê Evdiko, awirên wî westiya bûn. Wekî masiya ji rûbarê xwe dûrketî û hêj dixwaze vegere cihê jê hatî, carna ronahiyekê xwe di awirên wî de dida der, cardin wekî roja bikeve bin ewran winda dibû. Hevalên din jî ji wî ne cuda bûn. Heman hest di hemû hevalan de hebû. Lê herî zêde xwe di awir û rûyê hevalê Masîro de dida der.  An jî dibe ku

em ne fêrî wê rewşa wî bûn, lewma vê rewşa wî bala me hemûyan kişandibû.

Me wekî rêveberî nîqaşek kir, plansaziya rojên pêş çêkir. Me biryara xurtkirina wê xetê da. Ji bo amadekariyên bên kirin, ziravî di ber çav re derbas kirin. Me rewşa hêza xwe ya şer, jimara hevalan, çeper, teknîk û taxtîka dê bê meşandin nîqaş kir û gihand biryarê. Her wiha me biryar da merasima bîranîna hevalên li wê derê şehîd bûyîn wê rojê bê pêkanîn. Ji ber ew du roj bû hevalan ji bo wê termê hevalên şehîd li wir sekinandibûn. Li Kobaniyê amadekariyên merasime hatibûn kirin. Me piştî qedandina civînê, bi karwanê şehîdan re berê xwe da bajarê Kobaniyê. Karwanek qelebalix bû. Dema em gihiştin Kobaniyê, hevalan û gel darbestiyên şehîdan rakirin û em ber bi goristana Şehîd Dicle ve meşiyan. Di destên dayîkan de sêniyên xemiladî yên hineyê hebûn. Bi dîtina wan dîmenan re wekî ku hemû bajarê Kobaniyê bi jin, zilam, zarok, kal û pîr, dar û kevir, erd û ezmanê xwe ve digirî. Dengê girî tevlî dengê tilîlî û dirûşman dibû, îskên dilê Kobaniyê digihiştin valahiya ezmanan. Li pey darbestan malbat, li pişt wan gelê Kobaniyê dimeşî û hevalan ewlekarî digirt. Dayîkan dixwest destên keç û kurên xwe hine bikin, wan bikin bûk û zavayên Kurdistanê. Dengê lorîkên wan bilind dibûn, dibûn girêkên janê di qirika me de. Bi kefiyên li serê xwe rondikên xwe paqij dikirin. Dema hinekê dengê girî bilind dibû, dengê dayîkên şehîdan dihat û digotin; “Negirîn, em li bextê we ne negirîn. Bila dilê dijmin bi

zarokên me şad nebe, ew ne mirin. Bûn bûk û zavayên Kurdistanê. Bila serê te saxbe Kurdistan, serê we saxbe Kurdino. Bila serê rêber Apo Saxbe, serê şervan û egîdên axa me saxbin. Serê te saxbe Kobaniyê, hêlîna şehîdan serê te sax be."

Bi gihiştina goristanê merasima bîranînê pêk hat. Dayîkan dest û tiliyên hevalên şehîd hine kirin, paşê li axê hatin spartin. Berpirsê malbatên şehîdan Mustafa Îto û Eyşê Efendî axivîn. Beriya demekê Kurê Eyşê Efendî hevalê Şervan, li gundê Feyantê di encama sûîqastekê de şehîd bibû. Hevalê Şervan û hevalê Botan, hevalên hev ên zarokatiyê bûn. Bi hev re tevlî YPG bibûn û di gelek şeran de bi hev re mabûn. Di wê kêliyê de dayîka wî Eyşe Efendî dest bi axaftinê kir, got; "Şervanê min, rabe, serê xwe rake. Vaye hevalê te yê zarokatiyê Botanê Reş û komek hevalên xwe tên mêvaniya te. Rabe kurê min, tu xwediyê malêyî, hevalên xwe pêşwazî bike. Hevalên te yên zarokatiyê, rêhevalên te yên şer hatine gel te. Hûn behsa zarokatiya xwe ji hev re bikin, behsa lîstikên xwe yên şer, hezkirina xwe ya ji axa Kurdistanê, axa Kobaniyê ji hev re bêjin." Dengê dilê Eyşe Efendî wekî zengila dilê dayîkên şehîdan deng veda û di rondikên çavên wan de, dengê şewatê bû hêrsa tolhildanê di dilên kesên beşdarî merasime bûyîn de. Paşê jî Mustefa Îto axivî û di axaftina xwe de got; "Îro em bi şehidbûna van zarokên xwe yên leheng bi jan û êşin. Lê bi qasî êşên xwe, em serbilind û serfirazin. Ma beriya vê têkoşînê me miriyên xwe wisa defin dikirin? Me darbestên xwe wekî

xêliyan pêşwazî dikirin? Nexêr, ji ber me bawer dikir ew ji gel me diçin, êdî venagerin. Lê hûn dibinin, hevalên me yên şehîd naçin, di dilê me, sozên me yên berxwdanê de zindî dimînin. Dibin sembol û navên têkoşîna me, berxwdana me. Dê navên wan bi hezaran zarokên vê axê bijîn. Ma kî ji we Botanê Reş nas nekir, kî şer bêyî wî hat meşandin? Îro bi wê bû sembola berxwedana Kobaniyê. Heta niha wekî me mêhvan bûn, îro bûn xwecih û xwediyên rast ên vê axê. Ketin dilê Kobaniyê, dilê her mirovek Kobaniyê." Piştî ku şehîd li axê hatin spartin, hejmarek ciwan tevlî YPG-YPJ bûn. Di dema sozdayînên xwe de gotin, "Em soz didin, em nehêlin cihê ti şehîdî vala bibe. Li pişt her hevalek şehîd, wê deh kes ji me çekên wan rakin, ji cihên wan hiştî doza azadiya Kurdistanê dewam bike. Dê her hevalek me li ser soza me ya berxwedanê bijî di her kêliya jiyana me de zindî bimînin. Emê bi hev re bigihêjin rojên azad ên vê axê." Hevalên ku di wê rojê de beşdar bûn, navên wan hevalên şehîd li xwe kirin. Wekî wan gotî, ji bo çekên wan li erdê neminin, berê xwe dan nav refên YPG-YPJ. Piştî bi dawîbûna merasima şehîdan, em cardin vegeriyan eniyên xwe yên şer.

## XETA FIRATÊ

Dawiya Tîrmehê bû. Li ser erd û axa Kobaniyê gel genim û cehên xwe dirûtibûn. Cihên pirîzeyên ceh û genim li ber tava germ a Kobaniyê zûha bibûn, poş û qirşikên

giya, bi baya dihat re tevlî toza derdor dibûn. Rengê xwezaya Kobaniyê behî bû, toz û germayê serweriya xwe li ser xwezayê çêkiribû. Lê ji bo me şervanên Kurd, dema bişkivandin, vebûn û pêşketinê bû. Şerê ku demek dirêj bû dihat meşandin, diket qonaxekî nû. Di her qonaxa vî şerî de em rastî tiştên nû dihatin. Me wekî rêveberî biryar da em kom bibin. Destpêkê ez, hevala Narîn, hevalê Mehmûd, hevalê Masîro hatin gel hev. Piştî kombûna me, me gazî hevala Peyman û hevalê Sefqan kir, ew jî hatin civînê. Me sibê dest bi civînê kir. Civînek dorfireh bû, mijarên em nîqaş bikin pir bûn. Civînê heta nîvro dewam kir. Me rewşa heyî bi giştî nirxand, li gorî wê, me plansaziyek berfireh çêkir. Di civînê de li ser hîma plansaziya hatî çêkirin, her hevalek hat erkdarkirin. Ji bo ragihandina encamên civînê ji hevalên li eniyan û gel re bên ragihandin, her hevalek diviya biçe cihekê. Hevala Peyman û hevalê Sefqan ji bo civînên bi gel re bihatiyan çêkirin çûn qada civakî. Em her çar hevalên din jî ji bo civînên li eniyan çêbibin, her yek ji me çû eniyekê. Em piştî çûn eniyan, me biryar û plansaziya di encama civînê de derketî ji berpirsên eniyan re ragihand. Her wiha me li her eniyê, di derbarê rewşa nû û pêşketinên heyîn de bi hevalan giştî re jî civîn çêkirin. Di eniyên me yên şer de civîn çêkirin ne hêsan bû. Ji ber heyîna şer û pevçûnan, me nedikarî em hêza xwe ya li eniyê ji çeperan derbixin û wan komî cihekê bikin. Lewma diviya em taxim bi taxim, komên biçûk bînin gel hev û wisa civînan çêkin.



Rewşa heta wê rojê hatibû guhertin, DAÎŞ li herêmên din jî xurt bibû, gelek cih bi dest xistibû. Di herêma me de li eniya Rojava û Rojhilat çend gundek bi dest xistibûn. Diviya em riyên nû vekin, li çareyên nû bigerin. Me di encama lêgerîn, nîqaş û plansaziyek dorfireh a di derbarê pêvajoya nû de, biryar da ku em li ser xeta Firatê pêngavek nû bidin destpêkirin. Vê pêvajoyê guhertinên nû bi xwe re anibûn. DAÎŞ'ê ne tenê li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê, her wiha li Iraqê û herêma Kurdistanê jî dest bi şer kiribû, gelek cih bi dest xistibû. Êrişî Şengal û Mexmûrê kiribûn, li gel çend navçe û bajarên biçûk, bajarê Musil girtibûn. Li Sûriyê jî gelek bajar û navçe bi dest xistibûn, li herêma Dêrezor û Helebê bihêz bibû. Komên berê li ser axa Rojava û Sûriyê hebûn û xwe wekî muxalefet didan nîşan, li hemberî êriş û pêşveçûnên DAÎŞ'ê têk çûbûn, gelek ji

wan belav bibûn. Hêza ku xwe li hemberî êrişan girtî, li Rojava û bi taybet Kobaniyê şerê DAÎŞ'ê dikir, bi lehengî li ber xwe dida hêza Kurd bû. Şoreşgerên Kurd ev rastî li Mexmûr û Şengalê jî raxistibûn pêş çavên herkesî. Tevgera PKK û gerîlayên Kurd bi destwerdana vî şerî re hêvî û baweriya serkeftinê di her qadê de xurt kiribûn. Pêla tirsê ya ji aliyê Daîşê ve hatibû belavkirin, ji aliyê şervanî, berxwedan û wêrektiya şervanên Kurd ve hatibû şikandin. Bi pêşengiya YPG-YPJ hêzek xurt a parastina gel hatibû avakirin, ciwanên Kurd li hember hemû serdestiya derfetên şer a di destên çeteyan de jî berxwedana xwe didomandin.

Ew nêzîkî du mehan bû li derdora Kobaniyê şer qet ne sekinî bû. Roja ku di eniyekê de êriş nebûya, çeteyan nexwestiya bikevin Kobaniyê nebû. Hemû hêz û teknîka xwe li ser vê herêmê bikar dianîn. Li gorî wan, tişta li Kobaniyê dibû ne ji rêzê bû. Wan di şevekê de bajarê Musil ji destên artêşa Iraqê derxistibû. Êrişî Şengalê kiribûn, tevkujiyek mezin pêk anîbûn. Her wiha êrişî Mexmûr kiribûn, gel ji ber êrişên wan ji Mexmûr derketibûn. Tevî şerê bi mehan bû dihat meşandin, diviya Kobanî zû bihatiya girtin. Lê di encama şerê ku di demên dawiyê de hatin kirin, dîtin ku li hemberî şervanê Kurd şerkirin ne wisa hêsan e. Lewma wan jî li gorî wê planên nû çêdikirin, her ku diçû Kobanî di çembera çêkirîn de dibû wekî giravek biçûk a li nava deryayê.

Ya rast, me di berxwedana du mehan de pir şehîd jî dan. Birîndarên me pir çêbûn. Ji xwe di warê cepilxanê de me zehmetiyên cidî jiyan dikirin. Her çiqas di hemû êriş û çalakiyên me de, me ji ser çeteyan cepilxanyek zêde digirt jî lê ji ber zêdebûna şer û pevçûna têra me nedikir. Me di anîna cepilxanê ji der ve de zehmetî jiyan dikirin. Hêza me ya madî jî nebû em bikarin zêde çek û cepilxane bikirin. Her wiha di wan du mehan de hemû hêza me di nav şer de bû, westan û ji halketinek hebû di hêza me de. Tevî van şertên neyênî hemûyan, tiştên em li ser piyan digirtin hebûn. Me dizanî ev şerê du îdeolojiyên dijber in. Em jî bi qasî wan, heta ji wan zêdetir bi mafdarbûna doza xwe bawer bûn. Ji ber me gelê xwe, xaka xwe diparast. Me êrişî hebûn û nirxên kesî nedikir. Lê hêzên li dijî me şer dikirin, li başûr, Şengalê, Mexmûr, li bajarên Suryê, Rojava bi giştî gelê me qetil dikir. Jana jinên êzidî yên di bazarên koletiyê de dihatin firotin, zehmetî û hejariyên gelê Kurd dijîn em xurt dikirin, hêrs û kîna me ya li hember çeteyan zêde dikir. Tevî hemû zorî û zehmetiyan, êrişên dewleta Tirk, qetilkirinên li ser sînor jî gelê bakurê Kurdistanê li ser banga Rêber Apo xwe li sînoran dabû, derbasî Kobaniyê bibû. Bi dehan ciwan dihatin, beşdarî şer û berxwedana li Rojava dibûn. Ev çavkaniyên me yên hêz û xurtbûnê bûn. Vê yekê morala me bilind dikir. Ji ber hatina gel, beşdarbûna ciwanên bakurê Kurdistanê, meş û serhildana gel a li Kurdistanê, Ewrûpa û gelek cihên cîhanê, nîşaneya piştgirî û dilsoziya bi berxwedana me re bû. Em bibûn hêvî, li hember hovatiya ku dewletan xwe li ber nedigirt, me bi

vîn û bawerî, hezkirin û piştgiriya gelê xwe li hember şer dikir. Me di vê çarçoveyê de civînên xwe yên giştî qedandin, rewşa nû ji hevalan û gel re ragihand.

Di civînê de me biryara pêngava li ser Xeta Firatê dabû. Me ji bo wê dest bi amadekariyan kir. Hevalên ciwan ên xwebexş û nû jî hatibûn hebûn. Me ew heval wekî tabûran rêxistin kirin. Me ji bo her eniyekî me ya şer, ji van hevalan jî du tabûr şandin. Tabûrên me ne wekî yên artêşên fermî hejmarek mezin bûn. Hejmara tabûrên me herî zêde pêncî kes bûn. Ji bo ev heval jî bikarin baş beşdarî pêvajoya nû bibin, fêrî şer bibin, me biryar girtibû ku her enî hêza xwe perwerde bike, perwerdeyên çekan ji hevalan re bên dayîn. Biryarek me ya din jî di derbarê ewlekariya gundên di eniyên pêş de bû. Me gotibû, divê gel ji gundên ku diketin pişt xetên me yên parastinê de bê derxistin, hemû derbasî pişt cihên me yên parastinê bên kirin. Her wiha divê li derdora eniyên me yên parastinê çeperên saxlem bên çêkirin, derdora gund, navçe û bajêr xendek bên kolan. Gel jî tevlî vê pêvajoya amadekariyan bibe, her kes li gorî hêza xwe tevlî kar bibe. Divê gel ji bo şerek demdirêj bê amadekirin, armanca êrişan, planên şerê taybet ên tên meşandin, rewşa siyasî, leşkerî ya heyî ji gel re rast bê gotin. Her di warê aborî û debara rojane de gel li gorî rewşa şerekî dijwar tevbigere, gel li gorî wê bê rêxistinkirin. Êdî em ji rewşa berê ya li gorî pêvajoya niha asayî dihat dîtin derdiketin. Ji xwe ev kar jî ji aliyê hevalên qada civakî ve dihatin kirin. Li her gundî, li bajêr

tax bi tax ji gel re civîn dihatin kirin. Carna dema em jî diçûn gundan, hinek ji me jî beşdarî civînan dibûn ku em bikarin vê pêvajoya amadekariyan zû biqedînin. Ji xwe me wekî encama civînê, di qonaxa nû de ev yek wekî pêdiviyek lezgîn destnîşan kiribû ku diviya herkes li gorî rewşa awarte ya nû xwe amade bike. Gel heta wê rojê ti caran em bi tenê nehiştibûn. Di hemû şeran de, di hemû eniyan de gelê me bi lehengî li ber xwe dida. Zarokên xwe beşdar dikir, bi xwe dihatin çeperên şer, şertên jiyanê yên zehmet, nebûna kelûpelên jiyana rojane ji xwe re nedikirin asteng. Gel bi hêza berxwedana heyî dixwestin bi moral piştgiriya me bikin. Tevî ku gel pêşveçûnên çêdibûn dişopand jî rewş ji gel re ravekirin, helwesta divê em raber bikin ji gel re gotin, nêrînên gel guhdarkirin û ew jî beşdarî pêvajoya amadekariyan kirin pêwîstiyek bû. Ji ber rewşa nû derketî nedişibî ya berê. Encamên wê, bandorên wê yên li ser gel jî li ser şer û têkoşîna me ya li vê qadê jî dê ne wekî berê bûyan.

Piştî me dest bi pêvajoya amadekariyan kir û çend roj şûn de, hevala Narîn hat gel min. Ji aliyekê ve me amadekariyên pêngavek nû dikir, ji aliyê din ve jî di derdora Kobaniyê hemûyê de şer hebû. Hevala Narîn ji çend gundan re civîn çêkiribû. Em rûniştin, hevala Narîn çavên xwe yên mezin vekir, li rûyê min temaşe kir û got; “Hevala Meryem, tu dizanî gelê gundê Qeremûx ji destpêka şer ve lehengiyek mezin raber kir. Gelek şehîdên wan çêbûn, lê ti carî min ti fikar û tirsek di wan de nedît. Ez ji bo civînê çûm gund, me bi wan re civînek

çêkir. Tu Mehmûd Qeremûx nas dikî. Di civînê de dengê xwe nekir. Piştî civînê gazî min kir, me xwe da aliyekê û got, 'niha hûn pêngavan dest pê dikin, hûn li bendê ne gundên ji aliyê çeteyan ve hatine girtin, cardin ji dest wan derxin. Her wiha hûn behsa vekirin û firehkirina eniya şer dikin, behsa xeta Firatê dikin. Ez ji van hemûyan agahdarim. Lê ka çi amadekarî hene, amadekarî di çi astê de ne? Ev êriş ne wekî yên berê ne, gelemperîne. Êdî dewlet xwe li pêşiya van çeteyan nagirin. Ka çiqas hêza me heye, çek, cepilxana me têra vî şerî dike? Gelo hûn wekî tevger çi dihizirin, dê çi bi vê rewşê bê? Hûn ji bo Kobaniyê çi dihizirin?' û lîsteyek dirêj a pirsan danî pêşiya min. Min ev çavdêrî li çend cihên din jî kir.Tu dizanî Mehmûd Qeremûx kesek jêhatiye, jîr e. Rewşê dişopîne, çav û guhên wî li her derê ne. Ya rast gelê me jîr û bi aqil e. Ji çend tiştên biçûk gihiştiye wê encamê ka em dixwazin çi bikin. Lê min di çavên wî de şik, fikar û guman dîtin. Diyare rewşa nû di gel de fikarên zêde çêdike. Tevî ku xwedî agahiye jî vê rewşa nû ew hinekê tirsandiye. Divê em zêdetir giraniyê bidin civînên bi gel re.

## Burkan El Firat

Ew deh rojbûn amadekariyên pêngava nû dihatin kirin. Di ser axaftina min a li gel hevala Narîn re deh roj derbas bibûn. Me amadekariyên xwe temam kiribûn. Hevalên qada civakî ji gel re civîn çêkiribûn, gel di derbarê rewşa

nû de agahdar kiribûn. Me li gorî derfetên heyîn hêza xwe ya leşkeri hinek din perwerde kiribû, plan, taktik û rêbaza pêngava dê bihatiya kirin zelal kiribû. Li gorî plana nû, diviya em xeta xwe ya parastinê xurt bikin, di nav xeta me girtî de cihên ku çete lê mane bên derxistin û em xetek rast bigihînin heta ser ava Firatê. Piraniya biryarên me di civînê de ji bo amadekariyan girtibû hatibûn pêkanîn. Di civînê de, yek ji biryara me ya herî girîng jî avakirina hêzekî nû bû. Ew demek bû, çend komên berê li gel Artêşa Azad bûn û paşê ji wan veqetiyabûn li gel me bûn. Me di vê civînê de awayê rêxistinkirina wan jî nîqaş kiribû, biryar dabû em wan bînin gel hev û hêzek nû ava bikin. Di wê çarçoveyê de jî xebat hatibûn meşandin. Ji bo pêkhatina vê hêzê demek dirêj bû ji navenda tevgerê jî perspektîfên pêwîst hatibûn dayîn, nîqaşên şêwaz û pêkanînê hatibûn kirin.

Xeta Firatê ji bo me gelek girîng bû. Di xeta Firatê giştî de, di dema avakirina kemera Ereban a ji aliyê pergala Baas ve eşîrên Ereb li vê xetê hatibûn bicih kirin. Berê jî ji ber Kurdên li deverê ev hatina wan ti car ji dil nepejirandibûn û Erebên pişt re hatîn herêmê bi piştgiriya dewleta Sûriyê zilm li Kurdên wir kiribûn, navbera wan û Kurdan nexweş bû. Dewleta Tirk bi hemû derfetên xwe ev nakokî kûr dikir û li heremê çek belav dikirin.

Ji xwe ev rastiya ku ji aliyê gelek hêzan ve dihat zanîn, lê ev rastiya tevî hemû daneyên me didan jî wekî angaşt

dihat pejirandin, paşê di çapemeniya Tirkiyê bi xwe de jî bû rojev. Ev rastî di manşetên rojname û televîzyonên Tirkiyê de wekî 'Doza Tirên MÎT'ê hatin dayîn.

Di ronahiya van rastiyan de, ji bo pêşîlêgirtina xeterên heyîn Rêber Apo di hevdîtinên bi parezeran re perspektîfên demê dabûn. Di van perspektîfan de bal kişandibû ser lîstik û polîtîkayên xeter ên li ser gelê herêmê tên meşandin. Ji bo gelên herêmê nekevin qirika hev, pêşî li dijminahî û nîjadperestiya ku ji aliyê hêzên derve, di serî de ji aliyê Tirkiyê ve tên birêvebirin bê girtin, behsa yek kirina hêzên herêmê kiribû. Li ser wan tespit û perspektîfên Rêber Apo yên di derbarê herêmê de nîqaş û lêgerînên me jî dest pê kirin. Demek dirêj nîqaş hatin kirin, ji bo pêkanîna hêzek wisa xebat hatin meşandin. Wekî tevgera şoreşger a Rojavayê Kurdistanê biryara avakirina vê hêzê hatibû dayîn. Di civîna me ya dawiyê de, ji bo pêkanîna vê biryarê jî vesaziyek hat kirin, biryar hatin girtin ku beriya pêngava em li ser vê xetê pêkbînin ev hêz bê avakirin. Ji bo vê Xebatê hevalê Mehmûd, Xalê Îsmet û Ebû Leyla hatin erkdarkirin.



Li ser vî bingehî me biryar da em komên berê ji Artêşa Azad veqetiyabûn û hatibûn gel me bînin gel hev, ji wan hêzek nû ava bikin. Diviya em xwe ji şerek dijwar û demdirêj re amade bikin. Ev perspektif ji aliyê Rêber Apo ve berê hatibûn dayîn, li ser wî bingehî banga seferberiyê kiribû, gelê bakur, ciwanên bakur jî berê xwe dabûn Kobaniyê. Me dikarî em bi pêkanîna vê hêzê, rê li hevkuştin û ketina qirika hev a gelên herêmê bigirin. Ji ber wê ev hêzek têkelbû, ji gelek beşên civakê mirov hebûn di nav vê hêzê de. Lewma di civîna beriya pêngaba xeta Firatê de, me biryar da em wan komên cuda bînin gel hev, ji bo parastina gelên li herêmê ya li hemberî çeteyan hêzek parastina giştî ava bikin. Anîna gel hev a hêz û komên li herêmê, zêdetir dikarî xurtbûnê di hêza parastinê de çêbike û em bikarin bi hêzek xurtir gelên herêmê ji êrişan biparêzin.

Di vê demê de ev xebata herî stratejîk bû ji bo me. Her çiqas ne komên mezin bûn jî dikarîn ji bo gelên herêmê bibin mînakekî hatina gel hev, nûnertiya xwişk-biratiya gelan bikin. Jiber di nava van koman de netewên Kurd, Tirkmen, Ereb kes hebûn. Ji bo valaderxistina lîstik û planên qirêj ên wisa hêz û welatên wekî Tirkiyê dixwest gelên herêmê berde qirika hev, ev pêngava me girîng bû. Ji bo pêkanîna vê hêzê hevalê Mehmûd, Xalê Îsmet û Ebû Leyla dest bi xebatan kirin. Berê me li vê deverê gelek zehmetî jiyan kirin. Ji ber pêngava me dê bidaya destpêkirin, piranî li ser devera ku gundên Ereban bû, me nedixwest gelê herêmê jî zerer bibine, li dijî me

bikevin nav helwestên berê de. Ji ber berê çend caran di encama lîstik û propagandayên deweleta Tirk de, dema me li dijî çeteyan li ser wan cihan êriş dikir, gundên Ereb ev wekî êrişek li ser xwe dihesibandin, ji me ditirsiyan. Tevî ku me berevajî tiştên dihat gotin, yekbûn û xwişk-biratiya gelan diparast, me ferq nedixist navbera gelên herêmê jî di encama şerên derûnî, propagandayên hêzên dijber de rastiyek wisa hebû ku gundên Ereb ditirsiyan. Ji xwe ji bo hêzên me, an ku Kurd jî zererê nedin wan me hewldanek taybet raber dikir. Me şer li dijî desthilatdariyê dikir. Ne ku li hember gelên herêmê yên ji nîjadên cuda. Lewma vê hêzê dikarî pêşiyê li van derew û lîstikên hêzên dijber jî bîne. Di pêvajoya amadekariyan de bi van koman re hevdîtin hatin kirin, ji bo yekbûna wan xebat hat meşandin. Ew demek bû li gel me bûn. Lê her komek bi serê xwe bû, yekbûnek di navbera wan de nebû. Lê ji ber hêza li erdnîgariya Rojava dikarî li dijî DAÎŞ'ê li ber xwe bide û şer bike em bûn, wan hêzan jî bawerî didan me, hatibûn gel me.

Di encama nîqaş û goftûyên li ser navê sêwana ku ev hêz di bin de kom bibin de nav hat diyarkirin. Navê Hêza ku ji yekbûna van koman pêk dihat, bû Bolkan El Firat. An ku Volqana Firatê. Komên di vê hêza nû de cih girtin, Lîwa El Tewhîd Baskê Rojhilat, Lîwa El Siwar El Reqa, tabûrên Şems El Şîmal ên girêdayî togayên Fecir El Huriye, YekîneyênParastina Gel (YPG) Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Seraya Cerablus, Lîwa Cephet El-Ekrad, Siwar Ûmûnaa El Reqa, Artêşa El Qesas, Lîwa El

Cîhad Fi Sebîlîllah. Ev hêz piranî ji Ereb û Kurdan pêk dihatin. Semsî El Şîmal ji Kurd û Erebên berê di nav Cephet El Ekrad de pêk hatibû. Bolqan El Firat di 10'ê Îlona sala 2014'an de hat damezirandin. Berpirsên vê hêzê Ebû Leyla û Mihemed Hemo bûn. Ebû Leyla, Kurdek bi eslê xwe ji Kobaniyê bû, berê de malbata wî çûbû Minbicê. Mihemed Hemo jî generalekî artêşa Sûryê yê kevin bû. Ji Latqiyê bû. Lîwa Tehwîd, komek mezin bû. Lê beşek wan li Kobaniyê bû. Berpirsê vê hêzê Hecî Marea bû. Navê wî yê rast Ebdulqadir Salih bû. Xelkê Marea bû. Marea herêmekî nêzîkî Helebê ye. Berpirsê Siwar El Reqa, Ebû Îsa bû. Koma Gopê jî Erebên li herêma Kobaniyê bûn. An ku ji eşîrên Ereban ên piştî Kemera Ereban li herêma Kobaniyê hatîn bicihkirin bûn. Ji derveyî Lîwa El Tehwîd, komên din bi hemû hêza xwe ve beşdar bûn. Lê Lîwa El Tehwîd komek mezin bû. Beşek wan li Kobaniyê bû. Dema biryar girtin ku beşdarî Bolqan El Firat bibin, Tirkiyê destwerdan kir. Lewma ji derveyî hêza wan a ku ji 30 kesan pêk dihat û li Kobaniyê diman pêve, yên din beşdarî vê hêzê nebûn. Ji ber ev hêz di bin bandora Tirkiyê de bû, Tirkiyê nedixwest beşdarî nav vê hêza nû bibin. Lê heta Tirkiyê destwerdan kir, yên herêma Kobaniyê beşdar bibûn. Hejmara van koman ji derveyî Lîwa El Tehwîd, di navbera sêsed- çarsed kesî de bû. Ev komên bi hejmarên xwe yên biçûk tevlî bûn hejmarek nêzî çarsed pêncsed kesî pêkanîn. Lê ji gelek herêmên Sûriyê û Rojava kes hebûn di vê hêza nû de. Piraniya wan Ereb bûn û ji Reqa, Helep, Minbic, Kobaniyê, Cerablûs, Tilheran, Tilhasil, Bab

û gelek cihên Sûriyê û Rojava bûn. Beşek ji wan jî Kurd bûn, Kurdên Kobaniyê, Minbic û derdorê bûn. Piştî damerzirandina Bolqan El Firat, Ebû Leyla, Şervan Kobanî û Ednan Ebû Emcet bûn berpirsyar. Avakirina vê hêzê bû bingeha damezirandina HSD.

Piştî amadekariyan deh rojan şûn de, me biryar da ku em pêngavê dest pê bikin. Tevî hêza me, dê beşdarbûn ji vê hêza nû hatî avakirin jî çêbûya. Li gel vê hêza nû yek me sînorên xwe yên xeta parastinê ava dikirin, yek jî bi vê pêngavê me dikarî em deriyê pêvajoyek nû vekin. Heta wê rojê xeta me ya parastinê xwarovîço bû, ji bo parastinê hejmarek zêde kes dihat xwestin. Lewma me biryar da em wan gund û cihên navberê yên di destên çeteyan de bigirin, xetek rast çêkin ku em bikarin bi hejmarek kêmtir jî parastina xwe bikin. Piştî meşandina van xebatan tevan, pêngava me ya ber bi Xeta Firatê ve dest pê kir. Xeta me dabû ber xwe û dixwest em bigirin, wekî tîpa 'U' bû. Me dê navbera du eniyên ku dijmin tê re êrişî me dikir qut bikiriya, xwe bigihandiya ser ava Firatê. Me bi destpêkirina pêngavê re çend tişt plan kiribûn. Me biryar da em di du aliyan de êriş bikin. Me yê ji aliyê xeta Sirînê û eniya Rojava ve êriş bikiriya. Armanca me ew bû em navbera navçeya Şêxler û Sirînê yên di destên çeteyan de qut bikin. Her wiha me dixwest em sînorê di navbera xwe û çeteyan de diyar bikin, çemê Firatê bikin sînor. Em bi vê armancê ketin tevgerê û pêngavê dest pê kir. Di vê pêngavê de sêsed heval beşdar dibûn. Li gel hêza me ya ku ber bi pêş de biçûya,

wê di herdu aliyên kêleka xeta me vedikir de jî komên me yên kemînê bihatiyan hiştin. Ji bo dijmin ji pişt ve nezivire, em bi tenduristî bikarin wê xetê vekin, diviya em tedbîra wê jî bigirin. Da dema ku çeteyan bixwestiya ji kêlekan ve destwerdan bikin jî nekarin xwe bigihînin hêzên me yên pêş de diçin û komên me yên kemînê bikarin wan asteng bikin, me tedbîrek wisa girt. Cihên ku me bigirtiyan, wê ji aliyê gel ve bihatiyan parastin. Bi vê armancê wê gelê gundên ku me bigirtiyan biketiyan wan gundan, cihên hatîn girtin saxlem bikiriyan. Ji bo vê dê wekî seferberî gel jî beşdarî vê pêvajoyê bihatiya kirin.

Piştî Amadekarî û plana pêngavê hat çêkirin me hêza beşdarî pêngavê bibe kom kir. Me civînek di derbarê armanca girtina xwe ya vê xetê de, her wiha awayê tevlîbûn û nêzîkatiyên bên kirin de çêkir. Piştî civînê me vesaziyên hevalên beşdar bibin çêkirin. Berpirsên hêzên me yên ji xeta Sirînê êriş bikiriyan, hevala Roza Kobanî, Emîn Erkendî, Kendal Efrîn bûn. Di wê xetê de kordîne hevalê Mehmûd û hevala Newroz Cizîr bûn. Hevalê Êriş û hevala Zozan jî nû hatibûn qadê. Ji bo di derbarê şerê li wir tê meşandin de ezmûn bigirin, li gel hevalê Mehmûd û hevala Newroz diman. Berpirsên hêza me ya xeta Rojava jî hevalê Şivan Kobanî, Edalet Gabar, Cûdî Torî, ez û hevalê Sefqan bûn. Hêza li gel min û hevalê Sefqan, hêza taqwiyê bû. Pêdivî li ku bihatiya dîtin, emê biçûyan wir. Piştî vesaziyan, ber bi êvarê me dest bi pêngavê kir. Di roja yekem de, em pir bi pêş de çûn, me deh gund

girtin. Roja diduyan me bi roj êriş kir. Lê wekî roja berê ne hêsan bû, çeteyan di gundan de xwe asê kirin û li ber xwe dan. Lewma di roja diduyan de tabûra hevalê Dilgeş wekî destwerdan hat û beşdarî pêngavê bû. Bi hatina tabûra hevalê Dilgeş re, kordîneya eniya aliyê Sirînê bû hevalê Masîro. Ji ber roja pêşiya wê hinek pirsgirêk di kordînekirinê de çêbûn, roja diduyê kordîne hat guhertin. Pêngava me bigiştî sê rojan dewam kir. Di roja sisiyan de, xeta me dabû pêşiya xwe temam bû. Em gihiştin ser ava Firatê, me navbera navçeya Şêxler û Sirînê ji hev qut kir. Her wiha me xetek rast vekir heta ser ava Firatê. Di vê pêngavê de di eniya Rojava de çar heval şehîdbûn, deh heval birîndar bûn. Her wiha di eniya Sirînê de jî bîst heval birîndar bûn û bi giştî birîndarên me dibûn sih heval.  Lê birînên wan ne giranbûn, gelek ji wan li ser piyan hatin dermankirin.

Ev xeta me girtî û derdora çemê Firatê bigiştî wekî bihuştê bû. Ji xwe rejîma Sûriyê vala vala ev xet nedabû Ereban û Kurd ji wan cihan dernexistibûn. Di aliyê erdnîgarî de herêmek dewlemend, têr dar û fêkî bû. Pêngava me dawiya heyva Tebaxê û serê meha Îlonê dest pê kir. Tevî germa van mehan jî ev herêm li gorî cihên em lê diman xwedî hewayek hênik, xweş û bêhfireh bû. Ev erdnîgarî li gorî cihên din ne rût bû. Çal, mitik, girikên biçûk, dar, kevir û şinkatiya wê pir bû. Ev der bi qasî ji bo parastinê zehmet bû, ji bo hêzek êriş dikir avantaj bû. Derfeta xweparastinê dida hêza êriş bikiriya. Me ew avantaj baş bikar anî, tevî li vê xetê sê

rojan şer dewam kir, du rojên dawiyê şerên dijwar jî rû dan, me çar şehîd dan. Bêguman, şehîdbûna her hevalekê ji bo me windahiyek mezin bû. Lê ji ber avantaja erdnîgariya wir, tevî şerên dijwar jî ev windahî ne zêdebûn ji bo girtina xetek wisa. Di girtina vê xetê de, wan hêzên me yên ji bo kemînan xwe li derdora xetê ya herdu aliyan de veşartî jî rolek mezin lîstin. Dema çeteyan dixwest ji aliyên xeta me vedikir ve êriş bike, wan hevalan lê dixist û nedihêlan çete bikarin destwerdan bikin. Bi taybet komek hevalên me yên li gundê Degîrmen, rolek pir baş û xurt lîstin. Li gir, gund û cihên me digirtin, şervanên me yên ji gel, xelkên deverê bi xwe parastina wan cihan dikirin, pişta me saxlem dikirin. Di nav hêza me ya ji gel de komên kalan jî hebûn.

Ev cihên me girtîn hemû bax, baxçe, rez û bîstan bûn. Her core fêkiyên wekî hinar, tirî, xox, hilûk, karçik, gêlaz û sêvan hebûn. Herêmek şîn û hênik bû. Piştî demek dirêj şer û pevçûnên di deşta rût, tazî û germ de hatina cihek wisa wekî xelatek mezin bû ji bo her hevalî/ê. Bi taybet ava Firatê wekî xelata herî mezin bû. Piştî toz û dûkêl deşta Kobaniyê xwe gihandina ser ava Firatê hestek cuda dida her hevalê/î. Hevalan ji aliyekê ve fêkiyên demsalê dixwarin, ji aliyê din ve heta dikarîn ji ava Firatê av vedixwarin. Dest û rûyê xwe dişûştin, baya hênik û paqij a wê erdnîgariya bêhna dewlemendî û ciwaniya Kurdistanê jê dihat dikişandin cergên xwe. Em, mîna zarokên cejnê şad bibûn bi dîtina ava Firatê û qutkirina wê xetê. Lê yên herî zêde ji vê pêngava me şad

bibûn koma kalan a di parastina gundan de cih digirt bû. Komek ji panzde kesan pêk dihat bi çifteyên xwe hatibûn alîkariya me. Ev kom temenê wan di navbera şêst û pênc, heftê salî de bû. Ya rast di dilê wan de tol û hêrsa bi salan hebû. Ger me destûr bidaya, dê wan jî bixwestiya tola xwe ji gundên Ereban ên derdor bigirin. Lê di wê mijarê de nêzîkatiya me diyar bû, ji ber wê nedikarîn tiştekê bikin. Li heremê hêza berahevdanê dikir dewlet bûn û gelek caran xelkên heremê jî hatibûn vê leyistokê. Em li hemberî vê leyîstokê gelekî hişyar bûn û me rê nedida tiştên wisa.

Du gundên bi navê Cadê hebûn. Cadeya jêrîn û Cadeya jorîn. Dema em çûn gundê Cadeya jêrin koma kalan li wir bû. Tiştek ne dikirin, lê keyfa wan hatibû ew xet hatiye girtin û li ser rewşê diaxivîn. Du kalên ji wan pişta xwe dabûn kevirekê, berê çifteyên xwe dabûn aliyê xeta Sirînê. Yekî digot, “Hêj ez biçûkbûm, di vê deşta pêşberî me de di navbera eşîra me û eşîrek Ereb de şer derket. Li gundên me bû hewar, hema yên ku bikariyan kevir jî rakin ketin ser rê û berê xwe dan vê derê. Bawer bike, hinek ji me pêxwas bûn. Em jî ciwanbûn, hema çi diket ber deste me, dar, kevir, das, bivir, tirpan, çi ber destên me ketin me girtin û em hatin cihê şer. Lê heta em hatin vî girê li pêşberî me, gunreşên eşîra me ew bi aliyê din de qulipandibûn. Paşê hewara xwe gihandin dewletê, dewlet hat û ket nav gundên me. Ma qey ava vî destî, ji destê din re dimîne? Xwezî ez li ser kewna xwe bûyam, hevala destûr bidaya ez biketiyam nav van gundan. Ehda

xwedê li min biketiya, min tola sedsalan ji van pêxwasan rakiriya. Lê keko em kalbûn, ev şebabên (ciwan) vî zemanî jî nizanin me çi jiyan kiriye. Hema dibêjin biratî û tiştek din nabêjin.”

Em li pişt wan sekinîbûn. Me dengê xwe nekir. Me xwest em wan guhdar bikin, ka li ser me çi dibêjin. Di wê navberê de dengê çekmaqê hat, kalê din cigareyek pê xist. Dûkêla cigareya wî li ser kevir re bilind bû. Bi bilindbûna dûkêla cigarê re kêroyekê serê xwe ji nav qelşa kevir derxist, temaşeyî me kir û cardin ket hundirê qelşa kevir. Dengê kalê din bi dûkêlê re gihişt me û got; “Ka cigareyekê bikêşe, bela xwe ji tiştên kevin veke. Tu dibînî, we di ciwaniya xwe de bikevir û dasan êriş kir, niha ez û tu bi çiftê hatine van cihan biparêzin. Erê wan bi piştgiriya dewleta xwe zilm û zordarî li me kirin. Lê ger em jî niha wê bikin çi ferqa me ji wan dimîne? Ez dibêjim, şebabên me, zarokên me ji me zanatir in. Wan dinya dîtiye, dizanin kes bi kuştinê naqede. Ew wekî me bi eşîratî tevger nakin, bi hizr û bîrdozî dijîn. Ma ne wisa bûya, îro Kurd û Ereban dikarî bi hev re li ser vê axê ji bo heman armancê şer bikin? Ma te ev hêza nû avakirîn nedît, wileh camêran şîrhelal derketin, şer kirin li gel me. Belkî ji ev tişt bihêle tovê neyariyê li ser vê axê biqelî. Ma heta kengê divê em hev bikujîn?”

Van gotinên kalê dawiyê ez keyfxweş kirim. Em çûn gel wan, Ebû Mazlum û Ebû Dijwar li wir bûn. Me piştî silav da hev, rewşa hev pirsî û şûn de kalên me temaşeyî hev

kirin û kenîn. Paşê kalê dawiyê axivî û got, “Keça min, niha em bi çiftê hatine vê derê biparêzin. Ev jî tiştek başe. Lê çavên me nabînin. Em panzde kesin, çavên me hemûyan nakin bi qasî yê kesek saxlem. Xwezî we ciwanek jî bidaya gel me, qene dema çete bihatiyan bigotiya ji kî milî ve tên. Te yê wê demê em bidîtiyan, ka em termê çendî ji wan davêjin erdê. Çavên Ebû Mazlum tenê baş dibînin, hema kî ji me tê cihê hişedariyê ew jî li gel e.” Dema digot jî bi rastî min ferq dikir çavên wî baş nabînin. Lewma dema diaxivî, çavên xwe li ser hev diqurmiçand, xwe hinekê nêzîk dikir û wisa temaşeyî rûyê me dikir. Lê tevî wê jî hatibûn parastina wê xetê bikin, negotibûn em kalin, em nikarin. Min ji wê sekna wan, baweriya wan moralekî mezin girt. Min ji wan re got; “Mamo, hatina we ya vê derê bese. Ez dibêjim hema çete bêhna we jî bikin wê birevin. We jiyana xwe bi şer û pevçûnan derbas kiriye. Qey cihê mirovên wekî we lê hebin çete dikarin xwe nêzîk bikin? Tişt nabe, em dikarin çend hevalan bidin gel we. Ji xwe me xet girt, wê êdî heval parastinê bikin. Lê hatina we, heyîna we hêzek mezin da me.” Kalo destê xwe li milê min da û got, “Keça min, di cihekî jin, keç, zarok û mezin şer bikin de, gotina kalbûnê şerme bê kirin. Qey em jî ne li ser vê erdê dijîn? Heke em nekarin cihên xwe biparêzin, li gel we tişta ji me bê em jî nekin, ma em dikarin bi dilek aram serê xwe danin ser cihên xwe û binivin? Ma wijdana kê dipejirîne şebabên wekî vê hevalê şer bikin û ew li mala xwe rûne, pişta xwe bide balgiyan û xwe pahn bike? Te xem pê nebe, emê heta dawiyê li ber xwe bidin.” Kalo hevala

Tekoşîn dida nişan û ev gotin dikir. Mirov ji tiştên wisa pir şad dibe. Vê yekê hêz û vîna me xurt dikir. Wan mirovan bi dilê xwe, li ser daxwaza xwe çifteyên xwe, birnoyên xwe girtibûn û hatibûn eniya şer. Di cihên me digirtin de parastin dikirin. Hevalên ku ew didîtin, bi hatina wan hêz û moral digirtin. Tevî ku hinek ciwan ji gund, welatê xwe direvîn, berê xwe didan cihên din, penaberiya li welatê xelkê dibijartin jî mirovên wisa bawermend û dilsozên doza xwe, welatê xwe bûn hebûn. Di eniyên şer de li kêleka ciwanên xwe şer dikirin. Ma ji vê wirdetir mirov dikarî çi bixwaze ji van mirovan? Ya rast bi qasî em bi wan serbilindbûn, bi hatina wan keyfxweş bibûn, wan jî ji serkeftina di wê eniyê de moral û hêz girtibûn. Lê ne tenê wan, gelê me bi giştî moral girtibû. Bi girtina vê xetê re, ew fikar û gumanên gel ên Hevala Narîn behs kiribûn, kêmtir bûn.

Gel û hêza me ya leşkeri bi serkeftina vê pêngavê hem moral girt, hem jî bawer kir ku dikare çembera heyî bişkîne. Lê girtina vê xetê nedihat wateya xeter bi dawî bûye. Tevî her gava me jî me plan û biryara dijmin a dagirkirina herêmê dizanî, wan jî li hemberî her gavek me, gavên nû diavêtin. Ji bo me perspektîfa demê diyar bû. Me bi girtina vê xetê hesab û planên Tirkiyê têk dan. Dewleta Tirk a ku ji destpêkê ve hevkarî bi DAÎŞ'ê re dikir, li bendê bû ku em bin bikevin, gel û eşîrên Ereb ên li herêmê li dijî me derkevin û Kurd û Ereb bikevin qirika hev. Her wiha dixwest eşîr û gundên Ereban bide tirsandin, wan rêxistin bike û bi çeteyan re li ser me bide

êrişkirin. Lê bi avakirina hêza nû, her wiha berxwedana bêhempa ya hevalên me di girtina vê xetê de raber kirin, plan û hesabên dewleta Tirk û serokçeteyê DAÎŞ'ê Erdogan vala derketin. Me bi vê pêngavê armancên dayîn pêşiya xwe pêk anîn, em gihiştin nêzîkî tirba Siltan Şah ê Tirk.

Hêj beriya em êrişî vê xetê bikin, me agahî girtin ku çete amadekariyek cidî ya êrişê dikin, wê êrişî me bikin. Beriya ew bikevin êrişê me êriş kir. Me wisa li ber bû ku em ji xeta Sirînê dest pê bikin, heta bigihêjin gundê Ziyaretê ku diket ser sînorê bakur û rojava. Bi vê planê me gotibû divê sînorê di navbera me û çeteyan de bibe ava Firatê û em wî erdî tevahî bigirin bin kontrola xwe. Dema me ev xet girt, tenê navçeyek biçûk û çend gund diman destên çeteyan de. Şêxler a jêr û Şêxlera jor, heta bigihêje gundê Xirabhato, Ziyaret û Zormixarê. Ji xwe armanc ji vê pêngavê ew bû ku em paşê van cihan jî bigirin, di navbera xeta xwe ya parastinê de ti cihî nehêlin di destên çeteyan de. Di qonaxa yekem a pêngavê de em bi ser ketin, me gelek gundên berê çeteyan girtibûn ji dest wan derxistin. Ev di hemû hêza me, gelê herêmê û her wiha komên me anî gel hev de jî bû sedema moral û hêz girtinê. Baweriya em dikarin çeteyan ji ser ax û erda xwe derbixin zêde bû. Bû bingeha qonaxek nû di têkoşîna me ya li herêmê de.

## GUNDÊ MIŞKO Û ÇALAKIYA GUNDÊ BERKELÊ

Gundê Mişko, gundek bi qasî sed malan bû. Gund pala xwe dabû girê Cibnê. Gundê Cibnê diket aliyê din ê gir. Girê Cibnê ne girek pir mezin bû. Li gorî cihên asê û çiyayî, mirov dikarî bêje tilmekî yê axê bû. Ji xwe di deşta herêma Kobaniyê hemûyê de ji wan tilmên axê yên bi dem û wextê re çêbûyîn re gir tên gotin. Di çavên mirovên deştê de ev der girin. Ji ber li gorî rûtbûn û tazîbûna deştê bilindahiyek biçûk jî binirx dibe li van cihan. Ev girên li herêmê piraniya wan li ser cih û şûnwarên dîrokî yên kevin çêbûne. Şûnwarên dîrok û çanda bi hezarasalan a li ser vê axê di paxila xwe de veşartîne. Tevî ku ne girek mezinbû jî wekî balgiyê li ber pişta gundê Mişko be, gundê Mişko bi aramî pala xwe dida wî girî. Her wekî mirovek xwedî dost û hevalên pêbawer be, gundê Mişko jî bi girê li pişt xwe bawer bû û tevî germa havînê ya dijwar jî ji zindîbûna xwe tiştek winda nekiribû. Gund dibû du beş. Beşek ji gundê kevin pêk dihat. Ev beşa gund xwedî mîmariyek balkêş û ciwan bû. Li derdora gund kevirên reş hebûn. Xaniyên gundê kevin bi van kevirên reş hatibûn çêkirin. Gundiyan bi kevirê reş û birî, dîwarên saxlem, durêzî lêkiribûn. Bêhna mîmarî û destxeta hostayiya Kurdan ji van xaniyan dihat. Destên hosta û kedkar mohra xwe li ser wan dîwaran hiştibûn. Ez tam nizanim temenê wî gundî çend sal bû. Lê min ji kê dipirsî, digotin hingî tê bîra dapîr û bapîrên me jî ev gund her hebû. Ji xwe di Kurdan de dîrok nayê nivîsin, tê gotin û ji dev derbasî qonaxên

pişt re dibe. Hewşên xaniyan fireh bûn, ew jî bi keviran hatibûn lêkirin. Bi demê re mîmariya wir jî ji beton û sembolên sedsala me bandor bibûn. Xaniyên li derdora gund û paşê hatîn çêkirin pirêket û beton bûn. Lê bi rastî ev dîmen li wî gundê xweşik nedihatin. Wekî nakokiyekê disekinîn li gel wê destxet û mîmariya gund a berê. Tevî demek dirêj bû li herêmê şer hebûn jî xwediyên malên kevir û gundê kevin gundê xwe bernedabûn. Lê ji ber xwediyên xaniyên hemdem bi xaniyên xwe nebawerbûn, çekên giran bandor li wan xaniyan dikir, wan zarokên biçûk ji gund derxistibûn. Lê tevî çûyîna beşek zarokên gund jî gund bi dengê zarokan tijî bû. Li gund dibistanek û xaniyekî yê dayîreya çandiniyê hebû. Dayîreya çandiniyê li jêrî gund bû, dibistan jî li nava gund bû. Demên beriya şer dest pê bike, zarokên gundikên biçûk ên derdorê jî dihatin wê dibistanê dixwendin. Lê ew dibistana demekê zarokan tê de dixwendin bibû cihê şervanên Kobaniyê yên dibistana şer dixwendin.

Ew du roj bû, em sed kes di wî gundî de bûn. Me biryar dabû em li ser gundê Berkêl çalakiyê bikin, ji bo wê du rojan me dijmin şopandibû. Ji bû amadekariyên çalakiyê em li gund bi cih bibûn. Di dibistanê de hêza me ya çekên giran dima. Di dayîreya çandiniyê de jî yekîneyek hevalên me yên zilam diman. Em hevalên jin û yekîneyek din jî ya hevalên zilam li sê malên gund bicih bibûn. Me dixwest beriya çalakî dest pê bike hevalên me bêhna xwe vekin, pêdiviyên xwe yên serşo û paqijiyê pêk bînin. Ji ber di gund de bîrên avê hebûn, her wiha di gund de

matorên mezin ên elektirîkê hebûn ku em bikarin têra hevalan avê ji bîran bikişînin. Ciwanên gund ji bo pêdiviya serşûştina hevalan mator pê xistibûn, hevalan ji bo pêdiviyên xwe av derxistibûn. Wê rojê li wî gundî wekî cejnê bû. Hinek hevalan piştî du hefteyan cara yekê bû dikarîn xwe bişûn û pêdiviyên xwe yên paqijiyê pêk bînin. Gundiyan jî ji bo me pez serjê kiribûn, dayîkan bi destên xwe yên têr çêj xwarinên xweş amade kiribûn û anîbûn ji me re. Paqijî, têrbûn; heyîna avê, eleqe û hezkirina gel raber dikir, coş û kelecana xwe amadekirina ji bo çalakiyê di me hemû hevalan de hestek xweş dabû çêkirin. Dengê ken, axaftin û sohbetên hevalan di wê germa havînê de wekî bayek hênik xwe li guliyên gund dida, coşek xistibû dilê gund. Nizanim, dibe ku ji wê coşa me bû; ew kevirên reş jî zindîtir bibûn, birqandina wan zêdetir bibû.



Ew rojek bû em li wî gundî bûn. Lê hevalan hemûyan nedizanî em ji bo çî hatine wî gundî. Dizanîn em ji bo çalakiyan hatine wir, lê nedizanin dê çalakî li kû çêbin. Tenê hevalên me yên rêveberiyê dizanîn emê li ser gundê Mala Berkêl, Cibnê û Xirabhato çalakiyê bikin. Di gund de jî hêza me ya gund diparast berê hebû. Wan hişedariya derdora gund digirt. Lê bi şev, her yekîneyê hişedarên xwe derxistin û wisa nivistin. Ji ber bi qasî me dijmin dişopand, me dizanî ew jî me dişopînin. Lewma diviya em di her kêliyê de li gorî wê tevbigerin.

Roja din sibê ez rabûm ser xwe, derketim ber deriyê mala em lê diman. Mal xaniyek mezin bû, di dawiya gund, di pala girê Cibnê re bû. Min jorde berê xwe da gund, hewayekî pak a sibeyê kişand cergên xwe. Piştî hemû heval rabûn, me taştê xwar. Piştî taştêxwarinê hevalan dest bi amadekariyên xwe kirin. Hinek hevalan porên hev dikirin kezî, hinekan çekên xwe paqij dikirin, hinekan jî bi hev re sohbet dikirin. Heta saet deh em li wê malê man. Paşê ez û hevala Tekoşîn ji bo dîtina hevalên din daketin jêr. Me piştî xwe ji mala em lê berda jêr, em li cihên hevalan geriyan. Hema me li ser piya rojbaş li hevalan dida, rewşa wan dipirsî û em diçûn cihên din. Dîmena li mala em lê diman li wir jî hebû. Hinek hevalan amadekariya firavînê dikirin, hinekan çekên xwe paqij dikirin, hinek hevalên zilam rihên xwe kur dikirin, hinekan jî xwe dabûn ber siha dîwarên xaniyan û di ber vexwarina çayê re bi hev re sohbet dikirin. Dengê axaftin û kenê hevalan ji dûr ve jî dihatin

bihîstin. Em gihiştin ber hewşa xaniyê koma hevalê Hogir lê dima, dengê stranekê bilind dibû. Dengê stranbêj yê digot “Xweziya ez kevokek bûyam li ber pencereya te” xwe di ser dîwarê hewşê re diqevast û berdida dilê gund. Dengek xweş, kûr û ji dilbû. Te digot qey bayek zozanane di wê germê de li te dixe, hestek xweş dixist dilê mirovan. Em hinekê pêşdetir çûn, gihiştin devê hewşê. Hevalan em dîtin, lê me nexwest hevalê Hogir bizane em diçin wê derê. Çavên xwe girtibû, wekî ku rêwiyê deryayek dûr be, berê hestên xwe dabûn girava Îmraliyê û strana li ser Rêber Apo dihat gotin. Digot; “Xweziya ez kevokek bama li ber devê pencereya te.” Bi rastî jî wekî ku bixwaze bifire, baskên wî çêbin bi liv û tevgerên xwe dibû kevok û ew hest derbasî mirovan dikir. Dengê wî pir xweş bû. Hevalê Hogir hevalekî temenê wî bîst û pênc salî bû. Ji Kobaniyê bû. Hevalekî spî, bejn navîn û dagirtî bû. Kenê wî ji dil bû, dema dikenî guriyek ronahî ji awirên çavên wî yê rengê hingivîn xwe dida der. Ew strana hevalê Hogir di nav hevalan de navbang bû. Hem ji dil digot, hem jî dengê wî xweş bû. Ji karê huner hez dikir. Stranbêj û dawetgerek baş bû. Hevalan ji me re jî cih veqetandin, em li gel wan rûniştin ber dara zeytûnê ya biçûk. Ji ber germ bû, hevalan xwe di dabûn binê darekî zeytûnê ya biçûk û guhdarî dengê hevalê Hogir dikirin. Dema hevalê Hogir strana xwe qedand, berê xwe da me û wekî ku bêje hûn kengê hatine vir şaş ma. Me hemûyan bi çepikan keyfxweşiya xwe ya ji ber strana wî anî ziman û paşê sohbetek germ dest pê kir. Piştî xêrhatinê û rewşa

hevpirsînê, hevalê Hogir ji hevalê Andok re got, “Hevalê Andok, ji hevalan re bêje bila hemû ava xwe dagirin. Hûn dizanin di vê kela havînê de av jî bi qasî çek û bombeyên me pêwîstin.” Hevalê Andok hevalekî keyfxweş û ciwan bû. Ew jî ji Kobaniyê bû, temenê wî bîst salî bû. Lê ji ber her dikenî û her tişt bi henek digot, mirov pir caran nedizanî ka henek dike, an rast dibêje. Hevalekî esmer bû, lê çavên wî jî bi qasî kevirên reş ên gundê Mişko yên li ber tavê dibiriqîn geş bûn. Hevalê Andok kenî û got; “Hevalê Hogir, diyare em diçin çalakiyê, ji bo wê tu van şiyariyan dikî. Lê tu bi xwedê kî dema em biçin çalakiyê ji hevalên jin re bêjin bila ji destpêka êrişê ve tililiyan nedin. Dema ew tililiyan didin, çete baz didin. Ji bo biçin bihuştê, naxwazin ji aliyê hevalên jin ve bên kuştin. Lewma hêj em negihiştin wan dest bi revê dikin. Soz ger me çete kuştin û em gihiştin dawiya çalakiyê ez jî tililiyan bidim li gel wan. Ji xwe ez ji dengê hevalan fêr bûme.” Sê hevalên jin li gel wan bûn. Hevala Avesta, Medya û Jiyan. Ez û hevala Tekoşîn jî çûbûn wê derê, em dibûn pênc hevalên jin. Bi gotina hevalê Andok re hemû hevalên zilam kenîn. Em jî kenîn, lê çavên hevalên jin hinekê vebûn, wekî ku bêjin hûn çawa dikarin wisa bêjin awirên wan tûj bûn. Hevala Avesta berê xwe da hevalê Andok, hinekê awirên xwe tûjtir kir û got; “Hevalê Andok, tu çima nabêjî ji tirsa me jinên Kurd direvin, tu dibêjî ji bo biçin bihuştê direvin? Ne wisa ye, ew dizanin ji dest me xelas nabin, ji ber wê direvin. Ne ji ber tirsa neçûyîna bihuştê. Ji ber em ne huriyên bihuşta wan a derewîn in. Rihê wan ji tirsa diqete, ji ber wê direvin.”

Hevala Avaşîn piştgiriya gotinên hevala Avesta kir û got; "Helal be ji te re hevala Avesta. Te tam rast got, ez dibêjim hevalê Andok bersivek bide vê gotinê nemaye." Hevalê Andok li ser gotina wê got, "Hevala Avaşîn rast dibêje. Bersiva ez bidim nema, lê pirsên min hene ji hevala Jiyan. Hevala Jiyan, qey we li şûna pez mişk xwedî dikirin ku navê gundê we bûye Mişko? Rastî jî ji duh ve hemû hevalên diçin hişedariyê dibêjin me gotiye qey çete hatine ji ber dengê piyên mişkan. Gelo ev kevirên gundê we ne ji ber reşbûna çavên mişkan wisa reş bûne?" Ya rast hevalê Andok bersivek jîr dabû. Hemû heval li ser bersiva wî kenîn û çavên wan vegeriyan ser hevala Jiyan. Hevala Jiyan ji gundê Mişko bû. Di vesaziyan de navê wê wekî 'Hevala Jiyan Mişko'dihat xwendin. Her carê xwe li ser vê aciz dikir, digot 'paşnavê min ne mişko ye. Hûn çima paşnavê min wisa dixwînin?' Lê hevala Jiyan vê carê xwe aciz nekir, bi awayekî aram û rûken got; "Hevalno, ma hûn nizanin lawirê herî zêde nêzî mirovan mişk in? Ji bo wê hemû dermanên li dijî penceşêrê destpêkê li ser wan tên ceribandin û paşê ji mirovan re tên dayîn. Vêca lawirek wisa bi sûd, çima nebe navê gundekê? Em ji bo wê li şûna pez, mişkan xwedî dikin hevalê Andok. Hevalno we rastî bivê, navê gundê me Miskê ye. Lê ji ber Berkêl, Cibnê û ev gundên derdor ji me hesidîne, navê gundê me kirine Mişko" Bi wê gotina wê re pilqîniyek ken bi hevalan ket. Hevala Jiyan jinek dirêj û zirav bû. Xwe ji bin çiqê dara zeytûnê hinekê derxist, porê wê bi darê ve ma. Hevalê Rênas vê carê got, "Wile ez dibêjim we bêmafî li mişkan kiriye û

gundê wan dagir kiriye. Lewma porê hevalên me bi daran ve dimîne. Hevalno, haydar bin, dibe ku mişkan xefk li vî gundî danîbin. Hevala Jiyan, gundê we jî têra xwe fêlbaz e. Ji bo hûn vê dagirkirina xwe bincil bikin, we xwestiye hûn bi gotinên zanistî, wekî ku hûn nirx didin ceribandinên zanistî vê dagirkirina xwe veşêrin. Ez ditirsim mişk jî bi hatina me ya vê derê re xwe rêxistin bikin. Niha ji me fêrî berxwedan û şer bibin û li dijî gundê we serî rakin, dê kî bêje çima van mişkan serî rakir? Ma navê gund nabêje ez yê kê me? Qey çi zagon heye bêje ev gund ne yê mişkane ku navê wan lê hatiye kirin? Ev bihezar salane dixwazin navê Kurdistanê biguherin, lê kesî nekariye. Jiber navê me li ser e. Vêca navê camêran jî heye û ev dide xuyakirin ku gund ê wan e. Dibe ku di nav xwe de bicivin, bêjin madem mirov dikarin li hemberî dagirkeriyê derkevin, êrişî çeteyên dagirker bikin, em çima li hember gundiyan serhildanekê nekin? Dibe ku ew dengên şevê din dihatin bihîstin dengên serhildana wan be" Wekî ku ketibûn pêşbirka bersivên ji hev jîrtir û xweştir sohbetek germ û xweş hebû. Em heta saet danzdeyan li wir man. Sohbet, henek nîqaş hatin kirin, em jî tevlî wê coş û henekên wan bûn. Paşê hevalan ji bo firavînê gazî kirin û em ji bo xwarinê derbasî hundir bûn.

Piştî me firavîn li gel hevalên wê taximê xwar û şûn de, em çûn gel taximek din. Em dema çûn wir jî heval kom bibûn, ji hevalê Diyar dixwestin ku stranek soranî bêje. Hevalê Diyar jî ciwanek ji başûrê Kurdistanê bû. Xelkê

Kelarê bû, dengê wî xweş bû. Di her kêliyên derfeta hatina gel hev didîtin de, hevalê Diyar dewlik, teneqe, hema çi alava deng jê derkeve hebûya digirt dest xwe, wekî derboqê lê dixist û hevalan li ber dengê wî û alava wî ya wekî derboqe govend digerandin. Em rûniştin ber dîwarê hewşa dibistanê. Hejmarek zêde heval hebûn, ji derveyî çend hevalan hemû heval li derdora me kom bûn. Henek û sohbetên wan jî li ser bîranîn û tiştên pêkenok ên girêdayî pratîkên wan ên şer bûn. Dema hevalê Diyar nû hatî, bi israr digot min bişînin girê bi navê Zagros. Wî girê Zagros wekî çiyayê Zagros dihesiband, dihizirî ku cihek çiyayî ye. Tevî ku hevalan dixwest vesaziya wî li cihek din çêke jî her ew der xwest û got min bişînin wê derê. Ji bo biçe û bi xwe bibine, hevalan ew şandin girê Zagros. Piştî çû gir dît û vegeriya, ji hevalan re got, "wey qur beserim bê. Hevalan be minî neygot, deştî Zagorose, deygotin girî Zagros. Bes şax le wê nebû, tozekî le şûnî tir berztir bû û ewende." Paşê pirsa navê wî girî kir û got, "Hevalan, be rastî bo nawî ew şiwêne bûyete Zagros?" Dema hevalê Diyar di axivî, hevalên derdorê hemû dikenîn. Herî zêde jî hevalê Andok ku bi me re ji gel taxima hevalê Hogir hatibû wir. Hevalê Diyar bi liv û tevgerên dest û rûyê xwe, bi dengê axaftina xwe jî matmayîna xwe ya ji dîtina wî girê ku wî digot qey wekî çiyayê Zagrosê ye dianî ziman. Lê ji ber bi Soranî diaxivî û gotinên wî ji aliyê hevalê Andok ve tam nedihatin fêmkirin, hevalê Andok destê xwe dabû ber erzinga xwe, serê xwe nêzî rûyê hevalê Diyar kiribû û wisa guhdarî wî dikir. Ji aliyekê ve ew rewşa wî dibû

sedema ken, ji aliyê din ve jî hevalên navê Zagros bihîstin hemûyan ew hest jiyan kiribûn û hestên hevalê Diyar parve dikirin. Li ser pirsa wî, hevalê Cûdî got, “Hevalê Diyar, ne ku dişibe Zagros ew nav lê hatiye kirin. Ji ber hevalê Zagros li wî girî mabû û paşê li wî girî şehîd bû, navê wî bû girê Zagros. Ev di nav me de kevneşopiyeke. Dema hevalek li cihekê şehîd dibe, em navên hevalên şehîd li wan cihan dikin. Ez dibêjim beriya niha heval bêjin ka em biçin civînê, tu ji me re stranek xwe ya xweş bêje. Bila Soranî be. Ji ber hevalê Andok pir ji Soranî hez dike. Ne wisa hevalê Andok?” Bi wê baldarî guhdarkirina hevalê Andok, hemû heval kenîn û çavên hemûyan ma li wî. Andok xwe hinekê rastkir, berê xwe da hevalê Cûdî û got; “Wile ez hez dikim hevalê Cûdî. Lê xwezî me her tiştê ku jê hez dikir, me bikariya em fêm jî bikin. Dema hevalê Diyar hêdî diaxive ez fêm dikim. Lê dema lez dike, dengê wî wekî qasetekî teybê ya hatî lezkirin tê guhên min. Ji bo ez bikarim tiştekê jê fêm bikim, bêyî hemdê min ez guhên xwe nêzîkî devê wî dikim.” Dema hevalê Andok ev gotin dikir, bi liv û tevgerên xwe jî nîşan dida û heval dida kenandin. Piştî nîv saet sohbet, hevalê Diyar jî li ser daxwaza hevalan stranekî ya Necmedîn Xulamî got.

Min ew kesem hemû rojê hey jîn hey jîn

Jiyanî emrom efroşim bo kirînî nanî sibey

Emroj dîsan hatûme der hey jîn hey jîn

Jiyanî emrom efroşim bo kirînî nanî sibey

Lêmnakirê xwanî nan

helayekîm pênawete jîno gero

Hey dad hey dad

Em bazare bêrehmete

Jiyan herzantire le nan

Strana hevalê Diyar a ji dil digot di hevalan hemûyan de kêliyên hestyar ava kir. Piştî gotina stranê hevalê Andok got, “Wile min gotin kêm fêmkirin, lê dengê hevalê Diyar xwe gihand kûrahiya dilê min û ez pir pê bandor bûm. Bi taybet gotina ‘jiyan erzantire ji nan’ ez pir bandor kirim. Paşê hevalê Diyar behsa besteniyê û hezkirina xwe ya ji besteniyê re got. Hevalan wê rojê bestenî anibûn û li hevalan belav kiribûn. Hevalê Diyar got, “Hevalno, tişta ez herî jê hez dikim bestenî, (dondurma)ye. Bestenî, Hevalan îro anibû, min du qutî xwarin. Lê hebe ez dikarim çend qutiyên din jî bixwim. Bestenî hebe, ez dikarim nan nexwim.” Piştî gotinên hevalê Diyar min got; “Hevalê Diyar, ka bila heval biçin, ger hebin bila ji te re bînin. Ger nebe jî soz ez ji te re bînim girê Zagrosê û li wir bidim te.” Li ser gotina min, hevalê Diyar kenî û got;

“Başe, lê ger ez şehîd bibim û negihêjim bixwim, li şûna min hûn bixwin.” Di wê kêliyê de min ji hevala Tekoşîn re got, maşînê bigirin û biçin ji gundê Derbazinê ji hevalan re besteniyê bînin. Gundê Derbazinê diket jêrî gundê Mişko. Gund di destê me de bû. Li wî gundî elektirîk hebû, çend dikanên mezin di gund de bûn. Hevala Tekoşîn û du hevalên dî çûn ku ji hevalan re besteniyê bînin. Lê piştî vegeriyan, gotin bestenî nemaye. Hevalê Andok piştî vegera hevalan got, “Hevala Meryem, xwezî we bikariya hûn besteniya Meraşê bînin. Hingî heval di rojên germ de behsa besteniya Meraşê dikin, her gotina besteniyê tê gotin, bîra ya Meraşê tê bîra min. Min pir caran ji hevalan bihîstiye û dibêjin, ‘Xwezî niha di vê germayê de çend besteniyên Meraşê li gel me bûyan û me bixwariyan. Wê demê bila deşta Kobaniyê sêqat germtir ji bûya ne di xema me de bû.’ Vêca ger hûn besteniyê bînin girê Zagros, bila besteniya Meraşê be. Qet nebe li ber westana we bikeve. Ji ber heval gelek pesnên wê didin û ji bo hevalê Diyar jî wê bibe diyariyek baş. Bi xêra hevalê Diyar, em jî wê besteniya Meraşê bixwin.”

Em heta saet diduyê li gel wan hevalan man. Piştî sohbetên me yên xweş, hevalan xwe ji bo civînan amade kirin. Beriya civînê me wekî rêveberî biryar dabû em li sê cihên cuda civînan çêkin. Me nedikarî em hêza xwe hemûyê di yek cihî de kom bikin, ji bo ewlekariyê ev xeter bû. Lewma me hêza xwe ya çalakiyê li gorî sê yekîneyan ji hev veqetan. Ji xwe me dê di sê aliyan de

çalakî bidaya destpê kirin. Lewma li gorî vesaziya çalakiyê me heval li cihên cuda komkirin û wisa civîn dest pê kirin. Min, hevalê Serdar û hevalê Zerdeşt her yekê ji komekê re civîn çêkir. Me li wir ji hevalan re armanc û rêbaza çalakiya em bikin got. Heta saet sisê û nîvê civînan dewam kir. Piştî civîn qediyan, me ji hevalan re got bila şîva xwe bixwin, xwe ji bo çûyîna cihên çalakiyê amade bikin. Bi nîv saetekê em bi fermandarên koman re jî axivîn, me ziraviyên plana ku bê pêkanîn cardin di ber çavan re derbas kirin û heval çûn yekîneyên xwe.

Di vê çalakiyê de me du cihên bingehîn dabûn pêşiya xwe. Gundê Berkêl û Girê Zagros hedefa me ya sereke bûn. Dê ji sê cihan ve çûyîna cihên çalakiyê bihatiya pêkanîn. Du komên êrişê ji gundê Mişko ve, du kom ji aliyê gundê Cibnê ve diçûn. Komek din jî dê ji aliyê gundê Xiraphato ve bihatiyan. Me bi vê çalakiyê dixwest em wan gundik û cihên biçûk ên wê xetê bigirin, gundê Berkêl û girê Zagros ji dest çeteyan derbixin. Armanca me ji girtina vê xetê, valakirina derdora navçeya Şêxler bû. Me dixwest em gundên derdor hemûyan bigirin, pêşiya xwe paqij bikin ku em bikarin xwe bigihînin navçeyê û ji dest çeteyan der bixin. Bi vê armancê dê di heman şevê de hêza me ya li aliyê gundê Degîrmen û Cibilferacê jî ji wî mîlî ve çalakî dest pê bikiriya. Dê hevalên me yên li van herdu gundan, bi awayekî veşartî êrişî gundên wê xetê bikiriyan, çalakiyên tacîzê pêk bianiyan. Berpirsên van eniyên me yên li aliyê gundê

Degîrmen û Cebilfiracê, hevalê Cûdî Torî, Êriş û hevala Zozan bûn. Dema me hedefên dayîn pêşiya xwe bi ser bixistiyan, dê wan li pey me di wê xetê de êriş bikiriyan. Emê li nêzîkî navçeya Şêxler bigihiştiyan hev. Plana me ya çalakiyê ev bû. Sed heval di eniya em lê bûn de diketin çalakiyê. Heftê heval di komên êrişan de bûn. Deh heval li gel çekên giranbûn, bîst heval jî ji bo taqwiyê li gundê Mişko diman. Ger li cihekê pêdivî bi destwerdanê çêbibûya, wê ew heval biçûyan wê derê. Hevalên berpirsên komê êrişêbûn; hevala Jiyan, Avesta, hevalê Diyar, Hogir, Rêber û Cûdî bûn. Hevalê Cûdî berpirsê hêza me ya çekên giran bû. Hevalê Serdar fermandarê eniya me ya li aliyê gundê Mişko bû. Hevalê Mehmûd û hevalê Sefqan kordîneya çalakiyê bûn. Hevalê Hogir berpirsê koma taqwiyê bû, ez û hevala Newroz Cizîr li gel koma ji bo taqwiyê diman.

Destpêka mexrebê bû. Li ber tava heyvê çavên şervanên Kobaniyê wekî stêrkên geş dibiriqîn. Her mirov dizane kêliyên tê de nediyarî hebin, li gel tirsê coş û kelecanê jî didin mirovan. Lewma hestên di kêliyên wisa de têkelin. Di van kêliyên bêhna xeteriyê jê tên de tirs, mereq, daxwaza serkeftinê, daxwaza xwe gihandina armanc û xeyal bi hev re di hundirê mirov de serî hildidin. Lê şervanên azadiyê yên li wir kom bûyîn ne biyaniyên van hestên têkel bûn. Ew cara çendê bû, şerê çendê, çalakî û pevçûna çendê bû beşdar dibûn wan jî êdî nedizanîn.

Mirov di wan kêliyan de nehedar dibe, dem dikeve konekî reş a gerdûnê û bê dawî dibe. Çavên herkesî bi baldarî li çûyîna heyvê bû. Lê heyva li rûyê asîmanan her diçû geş û bilindtir dibû. Di rastiyê de piraniya mirovên şervan di heman demê de evîndarên kêliyên wisa xweşik û bedew in. Ji ber di jiyana mirovên şervan de wext bi qîmet dibe, kêliyên aram wekî xelata jiyanê ne. Lê ji ber çalakiya dê bihatiya pêkanîn, bêhedarî û ne aramiyek hebû di derbarê wext de. Piştî tava heyvê bilind bû û bi nîv saetê şûn de, hevyê dest bi xatirxwestinê kir. Bi amadekariyên dûrketina heyvê re kêliyên ketina liv û tevgerê destpêkirin. Heyvê ji me xatir dixwest, me ji heval û hogirên xwe. Ji ber em bi qasî birqa heyvê ya li pêşberî me bû hem nêzî mirinê, hem jî di hembêza jiyanê de bûn. Em diçûn çalakiyê û çalakiya em diçûnê wisa ne ji rêzê bû. Ji xwe ti şer ne ji rêzêne, vala negotine 'fîşek navnîşanan nas nakin' û di şer de bi qasî serkeftinê, divêtiya şehîdbûn û nehatinê jî hebû ji bo her şervanekê. Lewma piştî komên çalakiyê xatirên xwe ji hev xwestin û şûn de, bi baldarî ketina meşa ber bi cihê çalakiyê ve dest pê kir. Di şer de hevalên te ji xizm, malbat û xwişk û birayên te nêzîktirî te ne. Lewma nebûna hevalên te, tê wateya nebûna te û her şervan bi zanabûna vê rastiyê ji hevala/ê xwe haydar e. Di rêza meşê de dest bi pirsîna hev tê kirin, ji destpêkê heta dawiyê, ji dawiyê jî cardin heta destpêkê tê pirsîn. Her kes dizane kî li pişt û paş wî/wê ye. Ev di şerê me de pîvan û rêzikek bingehîn bû. Ji ber di rê de westan heye, ketin heye, carna kemîn, pevçûn, şehîdbûn û birîndarî jî çêdibin di riyên wisa de.

Ev ne riyên çûyîna seyrangehekêne û her şervan li gorî vê zanabûnê piyên xwe bi baldarî davêje di van riyan de.

Piştî çend saet meşê derbas bûn, li ber birqa stêrkan heval gihiştin cihê çalakî lê bê kirin. Tava heyvê ya ji me dûr ketî, li pişt çiyayekê kêmek mabû biqulipe aliyê din. Ji xwe beriya çalakiyê pêdiviya me bi şev reşiyê hebû. Şevreşî û lêdana dilê me gihiştibûn hev. Di dilê her yek ji me de wekî çûkek xwe hilavêje teperepek dihat. Di kêliyên beriya êrişan de henaseya mirov wisa lê tê ku tu dibêji ji kîlometreyekê dûr ve tê bihîstin. Lewma wekî ku tenê bi difinê henasegirtin nabe, mirov devê xwe jî vedike, hewl dide oksîjenê bigihîne hewara cergên xwe. Ji xwe dahola di dil de bênavber lê dide. Ew kêliyên kurt, ji mirovan re pir dirêj tên. Ji ber li wir hemû hest û hişê te dikeve tevgerê, tu şerê destpêkê bi xwe re dikî. Tu tixûbên hêza xwe, baweriya xwe, vîna xwe, hezkirina xwe ya bi ax û gelê xwe, dilsozî û evînên xwe yên bi azadî, doz û rêhevalên xwe re, armanca xwe re di ber çavan re derbas dikî. Tu armanca li pêşiya xwe di dil û mejiyê xwe de wekî rojê zelal dikî. Nexwe ne hêsane di wê kêliyê de ketina tevgerê. Ne hêsane di wê tevgerkirinê de encam girtin û gihiştina serkeftinê. Ji ber herî zêde mirovên şerker sînorên di navbera mirin û jiyanê de dinasin û herî zêde ew nirx û qîmeta jiyanê dizanin ku dikarin ji bo wê bimirin.

Bêguman, mirov nikare ji bo kujeran vê tiştê bêje. Kujer û şervan ji hev cuda ne. Divê mirov vê cewaziyê jî deyne

holê. Yên ji bo domandina jiyanê, maf, azadî û nirxdayîna hebûna zindiyan neçarin şer bikin, jiyana xwe ji bo van nirxên bilind dikin qurban şervanin, şervanên azadiyê ne. Lê yên rûyê mirinê yê sar li ser jiyan û zindeweriyê ferz dikin, ji bo keyfê, zilm û zorî kirinê, talan, mêtîngerî, koletî û xirabiyê çek bikar tînin kujerin. Kujerên hemû tiştên bedew û xweşik ên girêdayî jiyan û zindeweriyê ne. Lewma dema ez dibêjim şervan, ez ne behsa kujeran, ez behsa dildarên jiyana azad dikim.

Kordîneya çalakiyê li ser lûtkeya girê Cibnê yê diket pişt gundê Mişko bû. Ji bêtêlê dengê hevalê Mehmûd hat. Got:

-Jiyan jiyan.

-Guhdare heval. Em amade ne.

-Avesta.

-Temame heval.

-Mazlum Mazlum.

-Guhdare heval, em jî amade ne.

-Agirî, agirî.

Deng ji Agirî nehat. Agirî kodê berpirsê kemînê bû. Lê tevî çend caran hevalê Mehmûd gazî kir, deng ji wan nehat. Di wê çalakiyê de erka herî girîng yek jê ya vê komê bû. Ji ber di cihên dijmin deswerdanê li çalakiya

me bikin, ji aliyê van hevalan ve dihatin girtin. Lewma bêyî ev kom bigihêje cihê xwe, destpêkirina çalakiyê hevalên din dixist xeterê. Hevalê Mehmûd çend carên din gazî Agirî kir. Lê deng cardin nehat. Di wan kêliyan de dengê lêdana dilê me hemûyan zêdetir bû. Hevalê Mehmûd cardin gazî kir:

-Avesta Avesta.

-Guhdare heval.

-Ka çend dengan gazî Agirî bike.

-Başe heval.

-Agirî.

-Guhdare. Em gelek nêzîkin, ji ber wê em nikarin baxivin. Em gihiştin malê, rewşa me başe.

-Mehmûd,

-Guhdare heval.

-Agirî li male, rewşa wan başe.

Piştî bi vî awayî tekmîla hemû koman hat girtin û her kesî cihê xwe girt, hevalê Mehmûd fermana êrişan da:

-Heval dikarin dest bi dîlanê bikin.

Bi gotina hevalê Mehmûd re, guhên me hemûyan ma liser dengê çeka B-7 û çavên me li ser gundê Berkêlê asê bûn. Bi gurmîniya dengê çeka B-7 re, wekî ku singa şevê biçire, dengê teqîn û gurme gurma çekan bilind bû. Li gel hatina deng, pêt û bistên agir ji gundê Berkêl rabûn. Bi dengê çekan re, li ser bêtêlan qîr û hewara çeteyan jî bilind bû. Heta ba di ber qirika wan re dihat, dikirin hewar û gazî hev dikirin. Me hemûyan temaşeyî cihê çalakiyê dikir. Ji ber di şer de armancên destpêkê xistin girîng bû. Lewma me meraq dikir ka hevalan armancên destpêkê xistin an ne.

Di wî gundî de jimarek zêde ya çeteyan hebû. Bi destpêkirina çalakiyê re fîşek wekî taviyên baranan dihatin û diçûn. Dengekî wisa bû ku te digot qey sed refên balindeyan bi hev re li ber guhên te difirin. Li gel dengê teqîn û teqereqê, dengê xwişîn û mişînekê jî ketibû singa hewayê. Fîşekên ku rast û çep diçûn û dihatin, wekî ber hev re derbasbûna maşînan dengê vîze vîzê derdixistin. Hêzên me bi pênc koman, ji sê aliyan ve lê dixistin. Wan jî bersiva hevalên me didan û şer û pevçûnekî dijwar a singa şevê ronî dikir dest pê kiribû. Çeteyan li ser bêtêlan bi qîr û hewar digotin, “Li pişt me zivirîn, hûn êriş bikin. Em nikarin serê xwe rakin, divê hûn alîkariyê ji me re bişînin.” Ji aliyê din bersiv didan û digotin; “Em ji nikarin, bi hêzekî mezin şer dikin, kes ji me nemaye saxlem, bila çekên giran bên, nexwe kes ji me xilas nabe” û gazî hev dikirin. Ev hêza taybet a çeteyan di nav nîv saatê de ketibûn vî halî. Wê

bêdengiya nîv saetê berê ya me ji derveyî dengê dilê xwe pêve tiştek nedibihîst cihê xwe ji qurmegurma roket û narincokan, dengê klêş, doçka û BKC ya re hiştibû. Dengê qêrîn û hewara çeteyan, dengên cîhazên bêtêl, li gel dengê tilîlî û dirûşmên hevalên me yên jin têkel bibûn. Ji wan dengan orkestrayekî şer saz bibû di di qirika wê şevê de.  Ji ber barîna fîşekan me nedikarî em serê xwe rakin. Di wan kêliyan de bîra refên qulingan ên ji zozanan vedigerîn deştê hat bîra min. Ref li pey refê fîşek ber bi me ve dihatin. Gundê ku çalakî li ser dihat kirin û cihê em lê nêzîkî hev bûn. Lê dîsa jî em raste rast ne di nav pevçûnan de bûn. Tevî wê jî bi sedan fîşek ber bi me ve dihatin.

Di wan kêliyan de dengên bêtêlên komên me yên çalakiyê dest pê kirin "Heval, ez gihiştim cihê xwe. Raste, raste heval me çeperên kirîn hedef girtin. Temam em diçin wir, kêmek maye em wir jî bigirin." Ji aliyekê ve hevalan tekmîla komên xwe didan, ji aliyê din ve jî pevçûn bi hemû dijwariya xwe ve didomiya. Şerekî giran bû. Bi qasî rika me ya girtina wir, rika dijmin jî ya neberdana wî cihî hebû. Du hêzên rikber ketibûn ber hev û şer geş û gur dibû. Ji saet yekê şevê, heta serê sibê şer dewam kir. Tiştek em ne li bendê derket pêşiya me. Me hêza çeteyan a li van cihan ewqas zêde nedizanî. Bi hêza me ya heyî dewamkirina pevçûnan dibû dezavantaj ji me re . Me piştî nirxandina rewşa heyî biryara vekişandinê da. Lê hevalên me bi biryarbûn ku gund bigirin û paşve venekişin. Bi zimanekî zelal ji me re gotin, "Di vê

çalakiya me de paşvekişandin nîne. Em venagerin, emê pêş de biçin.” Ev biryara hemû komên me yên çalakiyê bûn. Tevî vê biryardariya hevalan jî me rewş nirxand û got; “Di şer de hinek dibetî hene. Çi dibe bila bibe, divê hevalên me wisa nêzîkî şer nebin. Ger rewş hat guhertin, dibe ku tiştên di hesabê me de neyîn rû bidin. Nabe em guhdarî çend hevalan bikin û hêza xwe ya şer bixin xeterê. ” Tam me biryar da ku em cardin fermana vegerê bidin hevalan û hevalên li dijî biryara me derdikevin şiyar bikin.  Hevala Jiyan li ser bêtêlê gazî kir û got hevalên me yên şehîd hene. Koma hevala jiyan ketibû nav gund û çend malên din girtibûn. Di wê navberê de hevala Evîndar jî got li gel me du Mazlum an ku şehîd hene, bila heval bên wan bigirin.Dema hevalan agahiya şehîdbûnê dan, hevalê Mehmûd ji hevala Evîndar pirsî:

-Heval çawa şehîd bûn?

-Heval em ketin gund. Me çend malên gund girtin. Di wê navberê de heval şehîd bûn. Niha em li mala hevalê Rêdûr asê mane. Em di hundir de ne, dijmin jî ketiye eywana malê.

-Ma Rêdûr ne li gel te ye?

-Belê, hevalê Rêdûr li gel me ye.

-Bila Rêdûr şibakeyên pişta xanî bişkîne, di pencereyê re derkevin derve. Pencerê bişkînin, bihêlin bila bikevin

hundir, bi narincokan wan bikujin. Hûn xwe di wir re bavêjin derve.

Xaniyên gundê Berkêl jî wekî gundê Mişko bi kevirên reş hatibûn çêkirin. Xaniyên dîwarê wan saxlem û stûr bûn. Piştî hevalê Mehmûd bi hevala Evîndar re axivî, hevalê Rêdûr di aliyê pişta xanî re pencere şikandibû û hevalan xwe di wan pencereyan de avêtibû derve. Hevalê Mehmûd piştî pênc deqîqeyên din cardin gazî Evîndar kir:

-Evîndar.

-Guhdare heval.

-Rewş çiye?

-Heval temam e. Em derketin, me çeteyên di hundir de kuştin. Wekî we gotî ji çeteyan kes ji hundir xelas nebû. Rewşa me başe, heval saxlem in.

-Siheta we xweş, xwe biparêzin, hay ji hev hebin.

Heval gihiştibûn nava gund, şehîd û birîndarên me hebûn. Biryara me ya paşvekişandinê êdî bi kêrî tiştekê nedihat. Ji xwe hewa ber bi ronîbûnê bû, dibû sibe. Êdî di hemû cîhan de pevçûnan berdewam dikir. Pevçûnên dijwar bûn. Ji aliyekê wan êriş dikir, ji aliyê din hevalên me êriş dikir û hewl didan êrişên wan bişkînin. Saet bû pêncê sibê, koma heval Avesta û koma hevalê Diyar gotin; “em di cihê xwe de ne, rewşa me baş e.” Me berê di

wê xetê de xendek çêkiribûn. Di cihê hevala Avesta û Diyar lê bûn de, çeteyan dixwest xwe bigihînin xendekan, di wan xendekan de êriş bikin. Lê her hewl dabûn bên wê derê bigirin, hevalan lê dabûn û çete neçarî vekişandinê bibûn. Hevalên kordînê ji wan re gotin; "hûn ji wê derê dernekevin." Hêj bi ser avaftina li gel heval Avesta û hevalê Diyar re nîv saet neçûyî, me dît çar tankan berê xwe da cihê heval lê bûn. Êdî hewa ronî bibû, me liv û tevgerên li derdor didîtin. Hevalan xwe ji bo lêxistina tankan amade kirin, guleyên B.7'ê xistibûn lûleya wê û li bendê bûn. Bi nêzîkbûna tankan re hevalan li tankan xist, tank neçar bûn paşde hinekê vegerin. Di gund de jî berxwedanê berdewam dikir.

Di wan kêliyan de sê hevalên me yên din şehîd ketin. Li gel koma taqwiyê ya li gel me hem hevalên me yên bijîşk hebûn, hem jî komên ku biçin hevalên şehîd û birîndar bînin. Her wiha maşînek me ya fîşek lê nediçûn hebû, di rewşên şer de me birîndar û şehîdên xwe bi wê maşînê ji cihê pevçûnan derdixistin. Hevalan bi maşîna me ya leşkerî berê xwe dan cihê hevalên şehîd û birîndar lê heyîn û koma li wir anîn. Di wê maşîna me ya zirxî ku me wekî panzer bikar danî de, du birayên hev hebûn. Yek ajovanê maşînê bû, yek jî ji bo teqwiyê çûbû ku hevalan bînin. Gotina tiştên wisa gelek zehmet e. Lê rastiyên şer dijwar û bi janin. Hevalê ajovan û birayê xwe yê endamê YPG'ê di heman maşînê de cara duwem jî xwestin biçin hevalên birîndar bînin. Di çûyîna duwem de dijmin li panzera me xist, deriyên wê hatin girtin û asê bûn. Di

panzerê de pênc heval hebûn. Hinek ji wan piştî lêdana dijmin a panzerê ji ser hişê xwe çûbûn, hinek jî birîndar bibûn. Hevalên di panzerê de dikirin ne dikirin nedikarin derî vekin û derkevin derve. Wê kêliyê berê hemû hevalan vegeriya ser cihê panzer lê. Dijmin bi qîr û hewar, wekî hovan êrişî wî alî dikir.

***        ***

Şeqa şeqa şûr, ziminiya mertal û rime rima rimên şerên kevnar ku ji şopên hespê Derwêş xwe li kodika hişê me dialand û li ser vê axa têrşer xwe dubare dikir. Hişê vê axê têrşer bû û bi serpêhatiyên kevnar xwe li dora helbestên vê axê dipêça.

Bi qewxe bi cerdek giran hate ser

Di gunde nehiştin tu pez û dewar

Ne gicgic ne hoho li wan bû hewar

Li hespa siwar bûn li gund kes nema

Berî dane cengê bi gurz û rima

Ji şûr û rima ew dihatine hev

Ji toza siwara ku roj bûye şev

Gotina siwar û toza simên hespên wan roj dikir şev, serpêhatiyên xemgîn û serkeftinên di gewriyê de mabûn dianî bîra mirov. Talan û komkujiyên di serpêhatiyan de mabûn deng û awazên vê axê her xemgîn hiştibûn. Axên kevnar zeman û bûyeran her dubare dikin. Dem guherî, dewran zivîrî. Lê serpêhatiyên vê axê bi hemû giraniya xwe, xwe berdabûn ser peravên Firata lehîhêz. Li şûna simên hespên serkêş ên tosin, vire vira zirx û makîneyên hesin girtibû. Şopên reşikên talanker, cihê xwe ji pêxwasên çolter û çolên Îmarat û Tacîkên çavtasik re hiştibû. Ecaca derbasî nav kodika hişên Kurda bibû, bi navê waliyê Iraqê Hecac xwe li ser gewde, bejin û bala DAÎŞ'ê de berdabû. Şam lê hatibû zêdekirin û destbiratiya Mûaviye û Hecac di DAÎŞÊ de kom bibû. Li ezmanên Kobaniyê ecac hebû. Di her giyana şervanek civakî de hespek kihêl, şûr û rimek gurzkî heye. Hesin û makîne şer ji mêrantiya wê dûr kirine û ji dil û gurçikên wêrektiyê xistine. Şervanên li derdora min cihê xwe digirtin ji amûr û çekên agirî zêdetir, bi dilên xwe yên wêrek yên dema eşîran şer dikirin. Dil ji qefesa sîngê dipekî û xwe tavêt nava hola şer. Mala me ya bi zimanê Erebî beyt ul herek ku tê wateya mala dimeşî û berê di beriyê de wekî mehînek kihêl dibezî, niha di cihê simên hespê Dewrêş lê asê mayî de sekini bû.



Zeman her çiqasî cil û bergên mirovan dabe ber pêla xwe û guhertibin jî mirov ji zemanê çîrokên civaka xwe dest bi bûyerên serûbin dike. Mala ji hesin wekî zirxên Derwêş li beriya Kobanî di nav şer û agir de xuya dikir. Her çiqas lehengê vî şerî ne Derwêş be jî çîrok heman çîrok bû. Mihemedê Dahênan ên kifşkerê vê çeka parastinê wekî nalê hespî bizmar bike, zina hespî lê bike, ev mala dimeşî ji vê cenga giran re amade kiribû. Destana Derwêş, li heriya Kobanê bi hemû leheng û bûyerên xwe ve xwe dubare dikir.

Mihemed, xelkê Kobaniyêbû û bi destpêkirina şerê Kobaniyê re bibû hesinkarê tekoşînê. Te digot qey peyvên destana Dewrêş ji dengê Baqî Xido rijiyane ser giyana wî û hestên wî yên balkêş hebûn. Van pêşdîtin û hestên wî bala mirov dikişand ser xwe. Hestên Şervanên destana Derwêş û Edûlê yên ku dema ji heriya mişkan vedikşîn û hevsarên hespên westiyane hêdî hêdî

dikşînin xwe berdabûn ser cergê Mihemed. Mihemed bi hemû bedana xwe, xwe kiribû mertalê vê serpêhatiya nexêr. Nedixwest ev serpêhatî dubare bibe û hozanên destanê bi henaseyên têrxem awazên neçariyê bistirîn. Bedenên lehengên şer bêyî ku bibe tarîfa şervanên heman şerî, diviya di destên dijminên wan de nemayan. Mihemed ev ji xwe re kiribû telaqa jiyanê û li pey îcadên balkêş ketibû. Şerên Kobanî bi qasî nav û dengiya xwe bibû xwediyê gelek tiştên balkêş ên çavkaniya wan neçarî û bê derfetî bû. Dijminê me bi aqilekî jor çekên mirina me çêdikirin. Gelek ji wan berê di ti şerî de nehatibûn ceribandin. Topên cehenemê ji bo wêrankirina gund û bajarên me hatibûn afirandin û diyar bû serê xwe gelek li ser êşandibûn. Li ser kaxezê fermana tinekirina me hatibû dayîn. Mihemed îcadek ji cehenemê melekeyan rizgar bike çêkiribû. Çekên mirin û jiyanê li hemberî hev di nav şerekî gelek giran de bûn.

Me navê vê çeka Mihemed kiribû canxilas û bi qasî giyana Derwêş azad bike xwedî wate bû li gel me. Kul û jana Edûlê vedugezî coşa serkeftinê û tola hezar salan. Vê giyan û janê hêrsa azadiyê kiribû aso û heloyên nûjen li ser heriya Kobanî difirîn. Mihemed destpêkê ev çek di çalekiya Sûskê de bikaranîbû û nîv nîv serkeftin bi destxistibû. Dilê wî û derfetên wî nedihişt ceribandinên berî çalekiyê bike. Hesin bi qasî zêr bi nirx bû di şert û derfetên me de. Mihemed çeka xwe di şer de diceriband û bi ezmûna vî şerî tiştên din lê zêde dikir. Bi dehan maşîn diceriband ku bikare zirxên lê bardike hilgire.

Cemseyên ji artêşa Sûriyê mabûn û malên Ûrisan bûn bibûn amûrên ceribandina Mihemed. Li Sûsikê guleyên doçkayê canxilasa wî kun kiribûn û ew xistibû nav liv û tevgerek hesinkarî. Bala Mihemed çûbû ser polayên rayên trênê. Rayên di navbera serxet û binxetê an ku bi zimanê nivîskarek dibêje serxet û binxet:

“Serxet û binxet du beşên heman gewdeyî, yekdilê di du gewdeyên dabeşkirî de parvekirî, xwînderiya ji ber têlên li gihanê rapêçayî, hesreta di dilan de şikestî, lorîna li ser lêvên biyên ku ocaxên wan di şeveke tarî de li ser têlên Serxet û Binxetê de vemirî. Axîn û xewna bi jan ya malbatên li vî alî û wî aliyê xetê.

Kirîv, bira, birazî, keç, keçxal, xal û xwiharziyên destjihevqetandî. Eşîr û êlên dabeşkirî Torî, Mêrsînî, Milî, Omerî, Deqorî, Kêdikî, Berazî û Şêxî cîh û warê Apê Osman Sebrî, Seydayê Cegerxwîn, Mîr Celadet Bedirxan… Hawar û Ronahîya dibistanên herdem vekirî. Stargeh û malvekiriya biewle ya ji bo fêris û lehengên berxwedanên her çarparçeyên Kurdistanê. Welatê xwedî ax û zeviyên ripûrast lê bi xêr û bereket, heta tu bêjî jî berdar û maldar.”

Mihemed di nav pençeyên dêwek du serî de li nêçîra hesin digerî. Di bin bircên çarvdêriyê yên leşkerên Tirk û çeperên Daîşê de li hesin digerî. Wekî biçe çalakiyê baldar tevdigerî û xwe dixist xeteriyek mezin. Mihemed du carî tevlî çalakiyê dibû. Çalakiya hesin û çalakiya agir. Di çalakiya Sûskê de motor û tekerên canxilasa Mihemed

derbe xwaribû û hiştibû çareyek mayinde ji vê re bibîne. Zirxê canxilasê jî bi heman lêgerîna maşîneyek motora wê xurt hatibû çareserkirin. Hesinê rayên trênê bibûn zirxê canxilasa Mihemed. Me navê çeka Mihemed a destpêkê kiribû dupişk. Lê çeka wî ya nû gelekmezin bû û navek li gorî wê hat dîtin. Navê vê çekê êdî canxilas bû û Mihemed ji bo hevalên bîrîndar rizgar bike, ev çek afirandibû. Bi şev li gel çeka xwe dinivist û wekî ku hevalek wî be lê temaşe dikir. Li gorî Mihemed diviya ev çek nekeve destên Daîşê û di her tevgerê de ji bo şewitandina maşînê hundirê wê tijî mazot dikir. Mihemed nav û çîroka jiyana xwe bi stran û destanên Kurdî ristî bû. Gelek ji strana Xelîl Xemgîn a bi navê Mihemedo hez dikir. Dema kar dikir awaza stranê li hemû kolanê belav dibû û herkesî dizanî ev karê Mihemed e.

Ji ber êdî şer dijwar bû û dijmin bi hêzek mezin êriş kir, em hemû ketin nava pevçûnan. Her hevalî/ê ji aliyê xwe ve dikir qîr û digotin, divê em wan hevalên di panzerê de biparêzin. Çarenûsa wî û çeka wî bibû yek tişt û em niha di kêliyek wisa de bûn. Destên min li ser dilê min bû. Dilê min bi hemû hêza xwe xwîn dehfî demarê min dida û di gelek kêliyên wisa de ez şahîdê vê rewşa dilê xwe bûm. Dil bedena min ji zû ve dîl girtibû. Di rewşên wisa de dilên bi heman armancî lê didin pir nêzî hev in û wekî ku di yek kodikê de lê bidin, dibin yek beden. Canxilasa Mihemed û Mihemed bi xwe li beriya Kobanî ketibûn nav singa kunmişkan û rêzikên destana Dewrêş û Edûlê

di ber çavên me re derbas dibûn. Wekî çakûçê li ser sindê hesin siqa bike, dengên kanzayî xwe li perdeya guhên me didan. Mihemed kêli bi kêlî çarenûsa jiyana xwe bi destên xwe diyar kiribû. Ji çarenûsa ku kiribû çîrok û destan re hevalên xwe jî qane kiribû û hêviyên jiyanê di mirinek bi rûmet de bi dawî kiribû. Dîmenên li ber çavên me dihatin jiyîn û Daîşê li ser me ferz dikir ji bilî mirinek dirinde ne tiştekî din bû.



Hevalên di panzerê de jî bi me re daxivîn û digotin; "Em saxin, tenê birîndar bûne." Ez ne kordîne bûm, lê min bi telefonê bi hevalên di panzerê de asê mayîn re diaxivî. Diviya Mihemed û hevalên wî jiyan bikiriyan. Zeman li ser du serikên dijberî hev dilê me diguvaşt. Mirin û jiyan bi qasî ti carî nêzî hev nebin bibûn ciwiyên hev. Zagonên hebûnê yên kevnar di vê kiliyê de bi hemû tazîtiya xwe li

pêşberî me bûn. Ji bo biryara ne dil, ne ne cerg, ne hişê me erê dike, em dereng bixin me bi zeman re şer dikir. Paletên Canxilasê derbe xwaribûn û Canxilas ji aliyê deriyê xwe ve pelixî bû. Derî asê bibû û yek kesî dikarî hevalên di hundir de mane derxe. Panzêr nêzî Daîşê bû û her diçû dibû nîşana guleyên wan. Dema her guminiyek dihat, em li şûna xwe vediciniqîn û mîna teqîn di dilê me de çêbibe henaseyên lerzok em dorpêç dikirin. Hiş û hestên me bi pêlên kanzayî yên dirinde neditebitî û hemû baldariya me diçû ser liv û tevgerên guleyek cangirte. Mihemed dixwest panzêrê bişewîtîne û çîroka lehengiyê ya di serê xwe de çêkiribû bi xwîn û jiyana xwe bihone. Diviya serxistina hêvî û jiyanê ji hemû lezên heyî bi leztir bûya. Pêjnên ne diyar yên li ser hiş û hestên me, bi hemû giraniya xwe çareyek ji me dixwest. Mihemed wekî sondê bîne cih, beden û hesinê xwe li hemû polat û kanzayên dijminê xwe heram kiribû. Ger mirinek hebe bila bi destên hevalê min be. Ger ez destûra dawî hatina li jiyana xwe bidim, bila ev jî bi destên hevalên min be. Hêstên Mihemed gelekî cuda bûn ji yên mirovên din. Dewrêşê hemdem nedixwest ji Edûla xwe qut bibe û dixwest dilê xwe di kefa destê wê de tevlî axê bike. Karekterê Mihemed bi werîsên deqorî bi kevneşopiya welatê wî ve girêdayî bû.Bedenên evîndarê vî welatî ger jiyan nekin jî li kêleka hev hatine veşartin û bi şadiya Mem û Zîn a li bihuştê bi dawî bûye di rûpelên destanên vî welatî de. Gelo me yê ev çîrok û destan çawa bidaya guhertin? Bersiva vê pirsê hişê me xistibû baya bezê. Lê bersiva wê di xwîn û tekoşînek bê hempa de

veşartîbû. Çareya Mihemed bedenek bê jiyan û Edûlek li ser bedena lehengê xwe çokşikestî û xemgînî bû. Ev serpêhatiyên kevnar bi leza brûskê di serê me de diçûn û dihatin.

Mihemed ji me daxazek balkêş dikir. Ne dixwest bi saxî bên dîlgirtin û Edûla wî bikeve destê cehşan. Tevî hemû êrişên cehşan jî me hêj nehişbibû bigihêjin cihê hevalên me lê asê mayîn. Lê ji dûr ve wekî taviyan gule li Canxilasê diketin. Her diçû dengê Mihemed hêviyên jiyanê bi dawî dikirin û zimîniya lêketina guleyên Daîşê yên li ser Canxilasê digihiştin guhên me. Ji bo biryara dayî bi me bide erêkirin, zextên dilsote ber bi dilên me ve davêt. Pêxwasên Daîşê mîna deng û lerza dilê me bibihîsin xwê li birîna me wer dikirin. Di nav wan gumînî û teqreqên heyî de gumineyek bi xuşîn û bi qasî baya wê li porê me bixe li gel me qewimî. Ger gotin rast be hema hema dilê min sekinî. Rûyê min bi lezek bê hesap li rûyê birayê Mihemed zîvirî. Kêliyekê be jî di rûyê min de hemû zindî cemidîn û bê xwîn bûn. Ax bi ser çavên min de barî û min pêşiya xwe nedît. Hemû serpêhatiyên Mihemed di kodika hişên min de ji hemû lebetên rûyê min dûr kom bibûn. Zeman sekinî. Çinginiyek lerz ji hundirê guhên min ve ber bi derve ve herikî. Gelo dawî û xelasbûna hemû çîrokan wisa ye ez nizanim. Lê avek cemidî li min barî.  Mîna hemû hestan, hêrs û coşê ji giyan û bedenamin bar kiribe, ez zip û zuha bûm. Ji dengên metalî zêdetir tişta ez xistim vî halî dengên hundirê min bûn. Dema ev herdu deng bûn yek, tişta min

dixwest şûnde bavêjim bê parastin mabû û van herdu dengan bi hemû hohoya xwe êrîşî hundirê min kiribûn. Mîna awirên min şerm bikin ji rûyê birayê Mihemed direvî û çavên min nedixwest dimenê rûyê wî tomar bike. Çavên min ti carî wisa newêrek nebibûn di jiyana min de.

Di kêliyên wisa de dîmenên rûyê mirovan zevt kirin, têra xwe tiştan ji mirov re dibêjin. Her çiqas kûrahî û pêlên bin van dîmenên heyîn fêmkirin wext bigire jî cewaziyên ji jiyana asayî xwe zû didin dest. Piştî qerisandina şan û nîşaneyên rêyên mirov, germahiyek ekvatorî xwe berdide ser bedana mirov. Mirov dikeve halên gelek cuda û xwe naskirin gelek zor dibe. Giyanên kêliyên wisa giranbihane. Hişê min henekê xwe bi min dikir. Çavên herkesî bi Canxilasa Mihemed ve kilît bibûn û hemû pêşbîniyên min ji kokê ve dabû guhertin. Xuşîniya li ber guhê min çêbû hewla astengkirina Daîşê bû. Hevalê li kêleka min guleyek bêsîvingê avêtibû Daîşê. Lê ez çima ketibûm rewşeke wisa ku min hertişt şaş famkirbû? Mihemed ez jî bandor kiribûm û diviya min xwe ji xwestekên Mihemed rizgar bikiriya. Mihemed dixwest berî Daîşê em Canxilasa wî birûxînin. Kêliyekê jî navber neketibû gotin û xwestekên wî. Destên wî li ser galonê mazotê û dixwest dawiyê li jiyana xwe û hevalên xwe bîne. Bi rastî jî giyana min ketibû nav element û parçeyên ji hev gelek dûr û her yekê ew bi aliyê xwe ve dikişand. Hêzên Daîşê mîna qijakên çav birçî hêdî hêdî xwe nêzî hesina Mihemed dikirin. Giyana Mihemed bi

hemû baweriyên wî pîrozkirin û şabaşkirin asta dilê me derbas dikir. Derwêşbûna Mihemed tiştek destanî bû û bi dînbûna Edûl bi dawî dibû. Destan guhertin ne karê her keç û lawê babane. Azadî û guhertina çarenûsa Edûl, Derwêş, Zîn û Memên nûjen bi pêla gotinên Rêber Ocalan re xwe li qefesa sînga me dixist û digihişt dilê me. Destan zindî bû. Lê diviya çarenûs bihatiya guhertin. Vê giyanê bê peyv, bê deng, bê awazên dengxweş mîna risasê xwe berdabû ser dilê me.

Mihemed mirina xwe ji me dixwest. Fermanek gelek giran û ti şervanên cangorî nekarin pêk bînin xistibû pêşiya me. Dilê min mertalek ku rimên Bexdayî nekare kun bike xistibû pêşiya her cure nêrîn, pêşniyar û xwestekên Mihemed. Çavên hevalên derdor li ser herdu lêvên min bûn û li bendê bûn ka ezê çi bêjim û dê çi gotin ji nav lêvên min derkevin. Birayê wî wekî di kodika çepê ya dilê min de be, bîsîving radikir û datanî. Wekî bixwaze wezna biryara  min lez bike, dixwest mertalê ser dilê min rake. Berî ez biryar bidim, amade bûn û berê çekên xwe dabûn milê Canxilasa Mihemed. Bi gotina "Biavêjin" re xuşîniya berî kêliyekê dilê min diguvaşt bi zimîniyek req bi dawî bû.

Di şer de hinek kêlî hene ku mirovên ne di şer de nikarin wate bidin wan kêliyan. Dibe ku dema ji derve lê bê temaşekirin ev bûyer wekî sosretekê bê dîtin. Lê rastî tiştekî din e. Kesên şer bi rêve dibin ne ku ji teqandina çekan zehmetiyê dijîn. Zehmetiya herî mezin kêliyên

biryarê ne. Hinek biryar hene çarenûsa dem û mirovan diyar dikin. Lewma divê kesê biryar dide ne tenê wê kêliyê, tiştên di encama wê biryara dide de rû bidin bibîne û li gorî wê nêzîk bibe. Di wan kêliyên bi azar de du bijartekên me hebûn. Ku me hemû hêza xwe ya di pevçûnê de kom bikiriya û êrişî wî cihî bikiriya, îhtimala em hemû li wir şehîd bibin hebû. Ji ber tevî hemû ceribandinên me, me nekarî em pêş de biçin û bigihêjin cihê panzer lê mayî. Ev di wateyekê de xwekujî bû. An me dê xwekujî bidaya pêş çav, ji bo pênc kesan bîst- sih kes bidayan, an jî diviya em bi hesabekî mezintir biryar bidin û bi niyeta xwekujiyê nêzî bûyerê nebin. Ji ber di wê kêliyê de şehîdbûna bîst- sih kesan dihat wateya îmhabûna hemû hevalên tevlî çalakiyê bûyîn. Şehîdbûna hêza çalakiyê bi wir ve sînordar nedima. Binketina me, wê bibûya sedema ku em wê eniyê berdin, dijmin êrişî cih û warên li pişt me mayîn bike. Di rewşekî wisa de kuştina me sed kesan dibû sedema kuştina bi hezaran kes, wêrankirin û dagirkirina xaka me. Lewma tevî hemû êş û janên xwe jî diviya em çeperên xwe yên şer bernedin, em nehêlin dijmin pêş bikeve.

Di qonaxên zor û zehmetiyan de hişê mirovan jî cuda kar dike. Qonaxên wisa afirîneriya mirovan jî pêş dixin. Mirov neçar dibe li çareseriyên nû bigere. Panzer, tank û top karên artêşan, karên dewletên mezin bûn. Lê em şervanên parastina gelekê bûn. Panzer, tank û topên me nebûn, me bi hêz û vîna xwe, hezkirin û dilsoziya bi gel û welatê xwe re li hember her awayê çekan şer dikir.

Bijarteka me ya din jî ger dibetiya dijmin xwe bigihîne panzerê û hevalên me di panzerê de bigire hebe, em panzerê bi xwe îmha bikin. Ji xwe wesiyet û daxwaza Mihemed û hevalên xwe li ser me ferz dikir ev bû. Mihemed ji ber du sedeman ev yek jî dihizirî. Yek diviya hevalên me bi saxî nekevin destên çeteyan. Ya diduyan jî dijmin teknîka me ya şer nezane. Ji ber di gelek şeran de dijmin bawer dikir ku panzerên me yên rast hene, kargehên me yên helberîna teknîka şer hene. Ji xwe dijmin gelek caran wate nedabûn van panzerên me û ji wê navê panzerên me kiribûn, "Xaniyên dimeşîn."

* * *

Bi wî dengê hişk û req re wekî diwarê dilê min hilweşin tayek sar û germ li hemû laşê min geriya. Guleya bêsivingê ji lûleyê derket û li nêzîkî Canxilasa Mihemed li nav koma çeteyên ber bi Cansilasê ve dihatin teqiya. Paşê dengê fîşekan wekî xurîna kefên biharan bi ser beriyê ket. Koma êriş dikir îmha bû. Piştî têkçûna koma li wî alî, çeteyên ji bo alîkariyê hatibûn berê xwe vegerandin nava gund. Pevçûnên li nava gund dijwartir bibûn. Çeteyên ji destpêkê ve li gund bûn hatibûn kuştin û teqwiyeya ji bo wan hatî ji bo dagirtina cihê wan ber bi gund ve çû. Panzera me ya fîşek lê nediçû hêj di cihê xwe de saxlem rawestiya bû. Tenê paletên wê derbe xwaribûn û deriyên wê perçiqîbûn. Lewma tevî hemû hewldanên me jî hevalan hêj nekarîbûn derkevin. Lê tevî hemû daxwazên hevalên me yên di panzerê de jî me

biryara rûxandina panzerê nedabû. Hêviya em bikarin hevalên xwe rizgar bikin hebû û hemû hewldana me ew bû em nehêlin çete xwe bigihînin Canxilasê û hevalên tê de asê mayîn. Hewldan û biryardariya me encam girt. Me ji hevalan xwestibû hêviya xwe winda nekin, ji bo vekirina derî li çareyan bigerin. Bi tinebûna koma çeteyên li ser wê xetê êriş dikirin re, mizgîniya xêrê ya em li bendê bû gihişt me. Hevalan di dawiyê de derî vekirin û bi telefonê gotin, “Em derketin.”

Wê kêliyê rûyê birayê sisiyan yê li gel me hêjayî dîtinê bû. Ew rû bibû eyneya hestên me hemûyan. Te digot qey biharê hemû gul û kulîlkên xwe di rûyê wî de bişkivandine. Ji şadbûnê rûyê wî ji rengekê dibû rengek din. Çavên wî dibiriqîn, di nav wê biriqandinê re rondikên wî xwe berdidan jêr. Kesê ku ji sibê ve me nedikarî em bidin rûnişkandin, mîna çokên wî şikestibin ketibû ser çokên xwe û henaseyên kûr dikişand. Dikenî, digirî, di ber xwe de di axivî û tişt digotin. Paşê di ber xwe de got; “Spas ji were bira. We barê min sivik kir. Ma min çawa dikarî ez ji diya xwe re agahiya şehîdbûna we herduyan bi hev re bidim?” Her wekî ku bi wê tozê çavên xwe bişo, destên xwe digihand hev û bi rûyê xwe de dibir. Te digot qey li ser çemê Firatê çok şikandiye, tepên avê davêje rûyê xwe. Lê me hestên wî ji sibê ve jiyan dikirin dizanî. Em bi wê şadbûna wî jî şad dibûn. Piştî hevalan xwe ji cihê panzerê dûr xist bi saetekê şûn de, hevalê Rêber Silopî û hevalekî din çûn mayînek xistin

bin panzerê. Me gotinên Mihemed hemû pêk ne anîbûn. Lê me digot ger cardin êriş bikin û em nekarin panzerê xilas bikin, emê panzerê li wê derê biteqînin. Mihemed û hevalên li gel wî rizgar bûn. Lê di nava gund de pevçûnên dijwar hebûn û şer dewam dikir.

Saet bû yanzdeyê nîvro. Êdî em bixwazin hevalan paşve bikişînin jî venakişin, ji ber li her cihî pevçûnan dewam dikir. Koma hevalê Diyar û koma hevala Avesta li tankan xistin, tanka yekê derbe xwar û vekişiya. Lê paşê bi tanka diduyan cardin êriş kirin. Bi hatina tanka diduyan re hevalê Cûdî çeka xwe ya B.7 danî ser milê xwe ku guleyekê berde tankê, di wê navberê de guleyek ji pêşberî wî hat lê ket û birîndar bû. Hevala Avesta agahiyên koma xwe û hevalê Diyar li ser Bêtêlê dida. Dengê wê bi kelecan bû, ji ber dengê teqîn û fîşekan gelek gotinên wê tam nedihatin fêmkirin. Dema hevalê Cûdî birîndar bûyî, hevalê Diyar xwe gihand çeka wî û gule avêtin tanka diduyan. Paşê wê tankê jî derbe xwar û paşve vekişî. Dema tankê xwe da paş, berê lûleyên çekan li ser hevalên li wir girêdan û ew hevalên me jî li wir asê man û nekarîn paşve vekişin. Piştî demekê her ku çû tank bi ser wan de hatin. Hevala Avesta cardin rewşa wê derê ragihand û got, “Hevalê Diyar jî birîndar bû. Lê em bi biryarin cihê xwe ber nedin. Ger pê li laşê me jî bikin, em nahêlin ew derbas bibin.” Dema hevala Avesta tekmîla koma xwe û hevalê Diyar da, hevalê Mehmûd fermana paşvekişandinê da wan. Lê hêj nîv saet bi ser fermana hatî dayîn re derbas nebûyî, hevala Avesta

cardin axivî û got,” Hevalê Diyar şehîd bû.” Di wê kêliyê de gotinên wî yên beriya nîv saetê hatin bîra min. Dema me got vekişin, got; “Êdî zehmet e em bikarin vekişin. Ger em vekişin, dê bikarin vê xetê qut bikin. Lewma ya rast mayîn û ev cih parastin e. Ji xwe dijmin nêzîkî me bûye, li ser serê me li çend cihan sekvan bi cih kirine. Diyare me ew pir êşandine, niha dixwazin tola xwe li me vekin. Lê xeman nexwin, ti tirsa me ji wan nîne. Heta fîşeka xwe ya dawiyê jî em ê şer bikin. Lê divê dijmin bizane ew nikarin me bi saxî radest bigirin. Em ji şehîd û pêşengên xwe fêrî berxwedanê bûne. Niha jî tenê riya rizgariyê ji bo me berxwedan e.” Beriya em biçin çalakiyê ber bi êvarê wêneyê herî dawiyê min bi wî re girtibû. Min soza ezê beseniyê jê re bibim girê Zagros dabû. Lê beriya ez soza xwe pêk bînim, ew şehîd bû. Kenê wî yê di wêneyên me dawiyê girtin de li awirên min zeliqîn û wekî dîmenek bêdawî li wir ma.

Ber bi nîvro bû, Kordîneya me ya şer hat guhertin. Ji ber tiştên em ne li bendê bûn derketin. Dijmin di wê xetê de amadekariyek dorfireh kiribû. Çawa me dixwest em wê xetê bigirin û xwe bigihînin navçeya Şêxler, dijmin jî dixwest wê xetê bigire û xwe bigihîne girê Cibnê. Diyar bû dema çeteyan takviye dixwest wan taktîk kiribû û gotibûn ti hêz nine. Di wê kêliyê de amadekariyek hîn mezintir dikirin. Ji ber girê Cibnê ji bo wan girîng bû. Dema ew der bigiritiyan, dikarîn li ser wê eniyê hemûyê serwer bibin. Bi vê armancê hêzek mezin anibûn derdora girê Zagros û gundê Berkêl. Me berê li derdora

gundê Berkêl hemûyê xendek kolabûn. Wan serê wan xendekan girtibûn. Hêza ku jê re Mihacirîn an ku şervanên biyani digotin anibûn wir û di wan çeperên binerd de bi cih kiribûn. Lê agahiya me ji vê nebû, me tenê hêza di gund û gir de dizanî. Ji xwe dema heval destpêkê ketin gund, piştî saetekê pevçûn çêbû û şûn de, piraniya gund girtin. Lê dema hevalên me ketin gund û derbasî hundirê malan bûn, wan derdora hevalên me girt, ji pişt ve êriş kirin. Dijmin bi taqtîkekî du qonaxan şer meşand. Heta çeteyên di nava gund de hemû nehatin kuştin, wan hêza xwe ya di bin erdê de veşartîn dernexistin. Ji xwe dema cara yekê hevalên me gund girt û ketin hundirê gund, deh deqîqeyan bêdengî serwer bû. Hejmarek zêde çete di gund de hatibûn kuştin, hevalan dest bi rakirina çekan kiribûn. Me digot qey gund bi tevahî ket dest me. Hêj hevalan malên di gund de kontrol dikirin, çekên li ser termên çeteyan kom dikirin, ji carêkê ve wan ji çar aliyên gund ve êriş kirin. Di wê demê de hêza me jî şaş bû, kordîneya me jî. Lewma hevalê Mehmûd êdî di kordînekirinê de nezanî çi bike, li şûna wî hevalê Sefqan dest bi kordînekirina şer kir. Her wiha ji min di alîyeke de heval Sefkan di alîyeke de kordîne kîr. Vê êrişa dijmin a ji nîşka ve em tengav kirin. Yek jî hêza ku êriş dikir tevî çekên giran, bi pisporî şer dikir. Hêza jê re Mihacirîn dihat gotin û ji şervanên wan ên biyanî pêk dihat, piranî mirovên berê jî di artêşên welatên cuda cuda de şer kirîbûn. Xwedî şarezayiya şer bûn, di wî gundî de taqtîka ku bikar anîn û êrişa wan a ji nişka ve em xistin nava valatiyekê.  Gundê Berkêl xwedî

xaniyên bi dîwarên kevir û saxlem bû. Gundê Berkêl wekî kefa destekê bû. Cihê gund li gorî cihên din hinekê dibû çalik, girikên biçûk li derdora gund hebûn. Ji bo tu bikarî gund bigirî, pêdivî bi çekên giran, bi taybet bi hejmarek zêde guleyên çekên B-7 hebû. Lê hejmara guleyên van çekan li gel me sînordar bû. Di êrişa destpêkê de hema bêje me hemû guleyên xwe yên van çekan bikar anîn û me cara yekê gund wisa girt. Rastiya ku şer tenê bi kêrî bazirganên çekan tên, di vê demê de bi hemû tazîbûna xwe ve li pêşberî me bû. Bi rastî jî di wan şertên zehmet de ji derve çek anîn hema bêje negengaz bû. Lê yên ji derve dikarîn çekan bînin, an ku bazirganên çekan di her şerî de ev ticarêta xwe ya li ser xwînê dikirin. Me her guleya van çekan bi qasî şesed-heftsed dolarî dikirî. Ji ber Kobanî di çemberê de bû û me nedikarî em ji derve alîkariyê bigirin, bazirganên çekan firset didîtin û heta ji wan dihat bihayê çekan giran dikirin. Lê em neçarbûn van guleyan bigirin. Me li gorî derfetên di destên xwe de dikarî em bikirin û van jî têra me nedikir. Vê jî di duwemîn êrişa çeteyan a li ser gundê Berkêl de em xistin tengaviyê.

Dema heval Avesta got hevalê Diyar jî şehîd ket û em nikarin cenazê wî xilas bikin, me ji hevala Avesta re got, “Niha termê hevalên şehîd bihêlin, hewl bidin hevalên birîndar xelas bikin. Bila heval xwe bigihînin xendekên ber bi aliyê me ve, em hevalên teqwiyê dişînin ji bo wan bigirin. Hevalan bişîne, tu jî ji wê derê derkeve.” Koma li gel hevala Avesta pênc kes bû. Hevalê Diyar şehîd bibû,

çar hevalên din birîndar bibûn. Hevala Avesta bi tenê mabû. Ji aliyekê ve şer dikir, ji aliyê din ve jî bang dikir û digot; “Hevalên birîndar xelas bikin. Heval, ma hûn nikarin bên hevalên birîndar xelas bikin? Ez ji vê derê dernakevim, ez termê hevalên xwe li pey xwe nahêlim û nayêm. Hûn bikarin werin hevalên birîndar bibin. Heta ez henase bigirim û fîşekek min jî mabe, ez ji vê derê dernakevim. Bêyî çete pê li termê min bikin, wê nekarin di vê derê re derbas bibin.” Koma hevala Avesta ji sê aliyan ve hatibû dorpêçkirin. Tenê di aliyê girê Cibnê de cihek mabû vekirî û hevalên me ji wê derê êrişî çeteyên li derdora hevalan girtîn dikirin. Tevî fermana me jî hevala Avesta ji cihê xwe derneket û weki ku deh kes li wê eniyê bin şer dikir. Cihê wan pêşberî me bû. Dema hevala Avesta şer dikir, hevalên birîndar jî hewl didan xwe bigihînin xendekan.

Ji ber me bawer nedikir wê kesek jî ji koma hevala Avesta bikare xelas bibe, hatina yek hevalî jî gelek girîng bû. Di wê navberê de hevalekê xwe gihand xendekê. Herdu piyên wî birîndar bibûn. Xwe li ser enîşkên xwe dixuşikand û xwe gihand xendekê. Min ji koma kemînê re got, hûn xwe bigihînin xendekên li nêzî cihê hevala Avesta û hevalên birîndar ji wê derê bigirin. Dema ew heval ket xendekan dijmin ew ferq kir. Ji her alî ve gule lê reşandin. Derdora koma hevala Avesta tijî sekvan bibûn. Hema hevalekê xwe dilivand, wan bi sekvanî lê dixist û heval birîndar dikirin. Ji xwe çar hevalên li gel hevala Avesta wisa birîndar bibûn. Koma me ya kemînê

nekarî xwe bigihînin wê derê. Dema xwestin ber bi wan ve biçin, dijmin bi sekvanan nehişt ji cihê xwe bilivin û li wê derê jî hinek hevalên din birîndar bûn. Paşê hevalên me yên ji herêmê hebûn. Xelkê wan gundan bûn. Her kevir û bostek axa wê derê baş dizanîn. Ji aliyê din ve ew heval çûn hevalên birîndar bînin. Piştî hevalan xwe gihand wî hevalî û ew gihandin cihê ewle, me got; "Qet nebe, hevalek ji wê komê rizgar bû." Ew heval pênsed metreyî di hundirê xendekê de bi pêş ve hatibû. Her cihê laşê wî birîn bibû, enîşkên wî lûç bibûn û xwînê xwe di hemû cilên wî re dabû der.

Me cardin ji hevala Avesta xwest cihê xwe berde, xwe bigihîne xendekan û di wir de paşve vekişe. Hevalan ji aliyên din ve êriş dikirin û dixwestin êrişa li ser cihê hevala Avesta sist bikin. Her ku hevalan êriş dikir, çend çete dihatin kuştin jî wan cardin dest bi êrişek din dikirin. Hevala Avesta li ser bêtêlê dest bi tilîlî û drûşman kir û got, "Hevalno, hûn çawa dibêjin min vegere? Ma ez çawa evqas heval bihêlim û vekişim? Hemû heval ji bo em bikarin ji vê derê derkevin ketin êrişê. Niha heval di hedefa wan de ne. Ez vê derê berdim, wê gelek hevalên din şehîd bibin. Hûn vegerê ji min nexwazin. Tenê hevalên birîndar rizgar bikin. Heval, divê termê hevalê Diyar nekeve dest dijmin. Ma heval nikarin ji aliyek din ve xwe bigihînin vê derê û hevalan derxin?" Dema hevala Avesta ev gotin dikir, gelek hestyar bû. Yek ji ber kelecana şer, yek jî ji ber şehîdbûn û birîndarbûna hevalên li gel xwe dengê wê kelegirî

derdiket. Lewma hevalên ku dengê wê dibihîstin bi hêrsek mezintir diketin êrişê. Tişta ez didam tirstandin jî ev bi xwe bû. Di şer de kêliyên hêstyarî lê zêde xeteriyan jî bi xwe re tîne. Gelek caran dijminên hemberî te rewşên wisa bi zanebûnê çêdike, daku te bikşîne xefikê. Li ser bêtêlê gotinên wisa û metirsiya xwe ragihandin gelekî zor bû. Lê tecrubên me yên şer gelek bûyerên wisa anîbûn serê me û diviya me ev dubare nekiribûna.

Hevalên me yên di gund de asê bibûn û şer dikirin jî ketibûn tengaviyek mezin. Ji her alî ve li ser gund êriş dihat kirin. Çeteyan çemberek teng çêkiribûn. Ger ew çember nehatiya şikandin, ti hevalî di gund de nedikarî derkeve. Ji xwe dengê hevala Avesta, tilîlî û drûşmên wê, her wiha biryardariya wê ya berxwedanê kêliyên hestyar ava kiribûn. Di wê navberê de ji komek me ya din jî agahiya birîndarbûna sê-çar hevalên din hat dayîn. Ji bo dijmin nekare xwe bigihîne wan hevalên birîndar, Hevalê Botanê Sor dikeve êrişê. Hevalê Botan hevalekî ji Girê Spî bû. Hevalê Botan li Helebê zanko beşê kîmyayê xwendibû. Bi rizgarkirina Kobanê re beşdarî YPG'ê bûbû. Hevalê Botan ji ber sor bû me jêre digot Botanê Sor. Ev berjengên hanê ji bona hemnavên hev ji hev bên cuda kirin me bi gelemperî bi kar dianî. Ji ber gelek Botan hebûn me wisa nav lêkiribû. Hevalê Botanê reş jî yek ji wan bû. Hevalê Botan di dema zankoyê de jî gelek dihate hezkirin û bala mirovan kişandibû ser xwe. Ji aliyê hevalên wî yên wir jî hatibû hezkirin. Mirovekî giran û têgihiştî bû. Şer ji aliyê hemû aliyan ve pêdivî bi kîmyayê

dibîne û gelek teqemenî çavkaniya xwe ji zanebûna vê beşê digire. Em hêzek bi teqemeniyên gel tevdigerîn û di şerên gerîla de ji van teqemeniyan re, teqemeniyên gel dihate gotin. Hevalê Botan ji ber ev beş xwendibû bi beşdarbûna xwe ve derbasî beşê sabotajê bûbû. Di şer de beşên sabotajê bi bigiranî teqemenî bi kar tîne û hevalê Botan ji vê beşê re mina derman hatibû. Heta wê pêngavê di gelek cihên şer de rolek gelek girîng leyistibû. Hevalê Botan di beşê sabotajê de bû. Bi xwe mayîn çêdikir û demek dirêj bû di wê xebatê de cih digirt. Dema dengê hevalan bihîst bi hemû hêza xwe dice alîkariya wan. Hevalê Botan ev bi serê xwe kiribû. Hevalê Botan ji pişt xeta çeteyan ava kiribû ve ket êrişê. Di êrişa destpêkê de bi lez xwe gihandin gund. Her hevalên ji bo anîna birîndaran diçin, di çûyînê de ew jî birîndar dibûn û rewşa me giran dibû.

Di kêliyekî wisa de çavên hevalê Adil bi maşînekî ya çeka doçkayê li ser bû dikeve. Heval êrişî maşînê dikin, maşîn dikeve destê wan. Hevalê Adil û hevalekî din li maşîna doçkayê ya çeteyan siwar dibin, berê xwe didin cihê hevalên birîndar lê mayîn. Di tevgerkirina maşînê ya destpêkê de hevalan gule li maşînê reşandin. Ji ber ala çeteyan bi maşînê ve bû. Paşê hevalê Adil bi riya telefonê bi me re axivî û got; “Heval, maşîna ber bi cihê hevalan ve diçe ya me ye. Me ji çeteyan girt, em diçin hevalên birîndar xelas bikin. Bila heval li me nexin, me bi zanebûn al ji ser danexist.” Lê ji alê zêdetir, dîmena hevalê Adil bala hevalan kişandibû û digotin qey çete ye.

Kefiya çeteyekê ya reş ji ser rakiribû û dabû sere xwe. Li ser pişta maşînê wekî çeteyan xuya dikir. Lewma heta bi me re ne axivî, hevalan bawer dikir çeteye. Ji xwe çeteyan jî ji ber wê li maşînê nedixist, wan jî digot qey maşîna wane diçe êrişî cihê hevalên me dike. Piştî hevalê Adil bi me re axivî û şûn de, me bi şîfre ji hevalan xwest ku li maşînê nedin. Me got, “Ew maşîna me ye, heval tê de ne. Bila heval haydar bin, hevalê Adil ew tên hevalên birîndar derbixin.” Wê çûyîna hevalê Adil û hevalê Hecî henaseyek bi me da girtin. Lê tevî şiyariyên me jî ji ber dîmena kesê li ser maşînê cardin hevalan bawer nekirin û fîşek li maşîmê reşandin. Me cardin ferman da hemû hevalan ku li wê maşînê nedin. Ji bo maşîn jî kifş nebe û dijmin nezane ketiye destên me, me ji hevalan re got, “Bela xwe ji maşînê vekin. Hevalên me li pêşiyê hene, dibêjin bila maşîn bigihêje, me tedbîrên têkbirina wê girtine.” Heval bi maşînê ketin nav gund. Dema ket nav gund û şûn de, hevalan bawer kir ku maşîn di destên hevalên me de ye.

Di şer de înisiyatîfek wisa girtin jîrbûn û kêrhatinê dixwaze. Di rastiyê de xeterek wisa hebû ku hem em li maşînê bixin, hem jî kifş bibe çete bi çekên giran li maşînê bixin. Lê tevî hevalê Adil hevalekî ciwan bû, ne demek dirêj bû di nava şer de jî însiyatîfek wisa girt û bi wê doçkayê ve ket gund. Çeteyan jî zelal nekirin ka me maşîn girtiye an ne. Lewma li ser bêtêlan gazî ajovanê xwe û kesê li ser doçkayê dikirin û digotin, “Ebû Emer, Ebû Emer. Bi wî alî ve neçe, hay ji xwe hebe, xenzîr li wê

derê ne.” Hevalan ajovan û kesê li ser doçkayê kuştibûn, bêtêl, maşîn û doçkaya wan bi dest xistibûn. Hevalê Adil bersiva da û bi zimanê Erebî got; “Şêx, em di rewşek zehmet de ne. Em niha nikarin bi we re baxivin. Êriş li ser me zêde ye, bihêlin em bigihêjin cihê xwe, emê xenzîrên li pêşiya xwe bikujin, haya me jê heye. Ji xwe em ji bo kuştina wan diçin.” Hevalê Adil û hevalê Hecî xwe wisa gihandin koma yekem a hevalên birîndar û sê hevalan girtin gel xwe. Di rewşek wisa de xelaskirina sê hevalên birîndar bi serê xwe çalakiyekî fedayî ye. Hevalan sê heval ji gund derxistin û gihandin derveyî çemberê. Me dengê çeteyan dibihîst li ser bêtêlan. Yekî digot, “Yê li ser naşibe Ebû Wafiq Mahacirîn. Ev yekî hûrik e.” Yê din bersiv dida û digot, “Nexêr, em bi wan re axivîn, Ebû Emer û Ebû Wafiq Mahacirîn in. Li wan nexin, ketine pey xenzîran. Li wan nexin, ew maşîna me ya doçkayê ye.”

Piştî cara yekê hevalê Adil û hevalê Hecî sê heval anîn, vê carê jî ji bo xwe bigihînin cihê hevala Avesta ketin rê. Lê di dema çûyîna wê derê de hevalan fîşek avêtin maşînê. Ji ber navbera hevalên fîşek li maşînê direşandin û maşînê de kurt bû, hevalekê bi vekirî li ser cîhazê got, “li wan nexin, ew hevalên me ne. Maşîna çeteyan girtine, diçin hevalên birîndar bînin.” Li ser wê gotina wî hevalî, dijmin pê hesiya ku maşîn derbasî dest me bûye. Dema dijmin ferq kir hevalin, wan vê carê gule li maşînê reşandin. Lê hevalê Hecî û hevalê Adil bi lez maşîn ji nav çeteyan derxistin û anîn. Ev çalakiya hevalan bû sedem

ku em bikarin hejmarek hevalên xwe yên birîndar ji nav cihê pevçûnan derxin.

Di wê navberê de çeteyan hêzek mezintir ji Cerablûs, Minbic û Şêxler anîn. Hejmara wan zêde bû û êrişa li ser gund girantir bû. Wan bi rikek mezin dixwest gund biparêzin û nehêlin em gund ji dest wan derxin. Me jî bi heman rikê dixwest em wî gundi bigirin. Me gotibû ger em bîst- sih şehîdan jî bidin emê wî gundî bigirin. Ji ber ew demek bû wan gund ji me girtibûn, dixwestin di wê xetê de pêş de bên û xwe bigihînin girê Cibnê. Lewma berdêla wê çi dibû bila bibe, diviya em wê xetê bernedin. Lê ya rast em ne li benda hêzek ewqas zêde û şerker bûn.

Me di gund û derdorê de şer kir heta ber bi êvarê. Tav hêdî hêdî diçû ava. Lê hewa germ bû, bi bandora şerê dihat kirin bêhnek giran û nexweş a toz û barûtê ketibû hewayê. Ber bi êvarê bû, hevala Avesta şehîd bû. Lê şehîdbûna hevala Avesta wekî filmekê li pêş çavên me hemûyan çêbû. Cihê hevala Avesta tam di çembera dijmin de bû. Her wan êriş dikir, wê berxwedanek mezintir dikir. Liv û tevgerên wê, dengê wê yê li ser bêtêlan, tilîlî û drûşmên wê, biryardariya wê bandorek zêde li hevalan kir. Piştî hevala Avesta şehîd bû û şûn de, me xwest em hêza xwe ya mayî ji gund vekişînin, heta em bikarin xwe kom bikin û cardin êriş bikin. Dijmin hêzek zêde ji bo taqwiyê anî, hevalên me piranî birîndar bibûn, me gelek şehîd dabûn. Lewma me dixwest em

xwe qonaxekê paşve bidin, hêzek din bixin şûna wan. Ji ber me di wê navberê de ji eniyê din jî alîkarî xwest, hejmarek heval û endamên gundên derdorê jî ji bo alîkariyê hatin gel me. Lê berxwedana hevala Avesta kêlî bi kêlî li pêş çavên hemû hevalan hatibû jiyîn. Lewma tevî fermana me ya vegerê jî hevalên me yên di êrişan de gotin, "Ger yek ji me nemîne û em hemû li vê derê şehîd jî bibin em nayên. Me fermana xwe ji hevala Avesta girt, wê heta kêliya dawiyê şer kir, li ber xwe da. Tevî ku bi tenê ma jî bi saetan cihê xwe berneda û şer kir. Dikarî xwe rizgar bike, lê ji bo parstina me, me bi cih nehêle ji cihê xwe derneket. Em venagerin, ev fermana hevala Avesta ye. " Me kir û nekir heval derneketin û fermana me ya paşvekişandinê pêk ne anîn.

Hevalên di gund û êrişa girê Zagros de cih digirtin, beşek ji wan birîndar bibûn. Ji xwe heta wê kêliyê nêzî deh hevalan şehîd bibûn. Hevalan hinek din wext xwestin û gotin, "em niha venagerin. Ji xwe em bi vî awayî nikarin vegerin. Heta saetek din wext bibin me, emê li gorî wê xeber bidin." Hevalê Botanê Sor di wê navberê de dibîne çete êrişî mala ew lê dimînin dikin. Hejmarek mezin ber bi malê ve dikeve êrişê. Hevalê Botan ji xanî derdikeve, mayînekê datîne pêşiya koma ber bi wan ve tê. Pîma narincoka xwe vedike û davêje nav koma tê. Bi teqandina narincokê re, mayînekî ku berê amadekirî dixe destê xwe û xwe berdide pêşiya çeteyan. Di wê derê de bi mayîna ku çêkirî, çalakiya canbaxşane dike. Heta wê rojê awayên çalakiyên

canbaxşane yên wekî hevala Avesta heta kêliya dawiyê şer kiribûn û li ber xwe dabûn hebûn. Lê çalakiyên wisa xwe bi dijmin de teqandinê bi çalakiya hevalê Botan dest pê kirin. Çalakiya hevalê Botan, di wê wateyê de bû çalakiya destpêkê li herêma Kobaniyê. Ew bû yekemîn çalakiya fedayî. Piştî hevalê Botan xwe bi çeteyan ve teqand û pênc çete li wê derê kuştin, çete neçarî paşvekişandinê bûn. Hêza xwe ya li wir paşve kişandin. Ji ber tirsa çalakiya hevalê Botan, çeteyan nekarî êdî êrişî wê derê bikin. Ji dûr ve pevçûnan dewam kir, bi çekên giran li hevalan dixistin. Piştî hewa hinekê tarî bû û şûn de, me ji hevalan xwest xwe bidin paş û hinek cihên gund berdin. Me hêza xwe hinekê da paş, me di xetek din de çeperên xwe girtin. Em li aliyekê, dijmin li aliyê din demekê sekinîn.

Me di vê çalakiyê de panzde şehîd dabûn. Her wiha piraniya hevalên di komên êrişan de birîndar bibûn. Lewma me xwe hinek din jî da paş û em di xeta pêşiya gundê Mişko de bi cih bûn. Piştî çalakiya hevalê Botan û şûn de dijmin êrişên xwe sekinandin. Me jî hêza xwe bi paş ve kişandibû, ji ber me digot ev jî wekî berê taqtîkeke û me bi wê hêza heyî êrişkirin negirt ber çav. Me wê şevê heta sibê dijmin şopand. Lê her carê hevalên tekmîl didan digotin, di gund de ti liv û tevger nîn e. Tenê çend maşînên wan, dozer û kelûpelên wan mane.

Roja din sibê me xwe ji bo êrişek nû amade kir. Me hêza xwe ya berê di gund de şer dikir vekişandibû, li şûna

wan hinek hevalên din hatibûn eniyê û me dê bi wê hêza nû pêngavek nû bidaya destpêkirin. Hinek hevalên di wê hêza me ya berê de jî saxlem mayîn, hinek hevalên ku birînên wan negiranbûn jî beşdarî wê pêngavê dibûn. Em sibê zû çûn gel hevalên li serê girê Cibnê. Me ji wê derê baş gund didît. Her wiha hevalan bi dûrbûnan jî temaşe dikir û tiştek di gund de xuya nedikir. Dema me hêza xwe vekişandibû, wan jî hêza xwe ya mayî ji gund derxistibûn. Me digot ev bêdengiya wan taxtîke û em ji bo wê bi şev neçûn gund. Wan jî digot qey hêj gund di destên me de ye û ji bo wê termên xwe, maşînên xwe, çekên xwe li gund hiştibûn û vekişiyabûn. Piştî vekişandinê nekarîbûn cardin hêzek din bînin wê derê. Ji ber hejmarek mezin kuştî û birîndarên wan çêbibûn. Dema hevalan wisa got jî wekî tedbîr me du heval şandin ku biçin li gund temaşe bikin. Ji ber di gund de maşînek doşka li ser hebû. Ji aliyê me ve baş xuya dikir. Kesek li ser maşînê bû, wekî ku pala xwe daye doçkaya li ser maşînê xuya dikir. Her çiqas hevalan gotin ji duh ve di heman pozîsyonê de ye, me xwest em rewşê bizanin û wisa bikevin tevgerê. Piştî hevalan xwe gihandin gund, agahî dan û gotin di gund de kes tineye. Her wiha derdora gund jî vala bû. Heman heval ji gund ber bi girê Zagros ve jî çûn, di gir de jî kes nemabû. Hem gund û hem jî girê Zagros bi hev re berdabûn. Li ser agahiyên hevalan dayî me xwe berda jêr, em bi hêza nû hatî derbasî nava gund û girê Zagros bûn.

Dema em derbasî nava gund bûn, dîmenên balkêş hebûn. Çeteyan termên xwe hiştibûn û hejmarek zêde termên wan di nava gund de mabûn. Her wiha panzde hevalên me jî şehîd bibûn û bedenên heft hevalan jî mabûn li wir.  Hevalan dest bi kontrola gund kirin, sih çekên kesî, du maşînên doçka li ser, dozer û bi hejmarek zêde cepilxane û kelûpelên leşkerî ketin dest me. Bêguman, berdêla girtina gundê Berkêl û girê Zagros giran bû. Me kesî ew hêvî nekiribû, em ne li bendêbûn ku dijmin bi taxtîkek wisa me pêşwazî bike. Xetaya me ya herî mezin ew bû. Lewma me windahiyên zêde dan. Hevalên me yên di wî gundî şehîd bûn, hevalên bijare û di şerê xwe de xurt bûn. Lewma şehîdbûna wan bandorek neyênî çêkir. Di rastiya xwe de di van çalekiyan de me herdu aliyan jî hinda kiribû an jî em di hindayî de pata mabûn. Tevî wê berdêla giran, di encama fedakarî, wêrektî, berxwedan û lehengiya wan de çete neçar bûn gund û girê Zagros berdin. Ev encama şer û têkoşîna hevalên me bû.

Dema em ketin gund û hevalan tedbîrên pêwîst girtin, hevalê Ciwan, Rêzan û Serxwebûn çûn cihê hevalê Botan ew lê şehîd bûyîn. Hevala Evîndar jî komek heval girt û çûn cihê hevala Avesta û hevalê Diyar lê şehîd bûyîn. Wan hevalan mohra xwe li berxwedana gundê Berkêlê, Girê Zagros dabûn. Wan girtin û derketina çeteyan ji wan cihan nedîtibûn, lê em li ser şopa berxwedana wan hatibûn û me ew cih girtibûn êdî. Hevala Evîndar ji şehîdbûna hevala Avesta pir bandor bibû. Beriya biçin,

serê xwe rakir û temaşeyî derdor kir. Paşê keserek kûr kişand û got; “Hevalno, ger berdêla girtin û mayîna li vê derê çi dibe bila bibe, divê em êdî van cihan bernedin. Ji ber ez berê xwe bi kû ve dikim, dengê hevala Avesta tê guhên min. Dengê dirûşmên wê, tililiyên wê xwe digihînin kûrahiya giyana min û ev der êdî bûne giyana hevala Avesta, hevalê Botan û Diyar.” Paşê koma xwe girt û ket rê. Piştî çarêkek bi ser çûyîna wê re derbas bû, bi bêtêlê gazî kir û got; “Em termê hevalan peyda nakin. Em gihiştin çepera herî dawiyê ya hevala Avesta lê şehîd bû. Me kefiya wê, çeka wê dît. Lê termê hevalan winda ne, em nabînin.” Ew çeper di şerê şev û rojekê de bibûn şahidên berxwedanekî mezin. Dijmin bi heft komên cuda êrişî wê derê kiribû, koma hevalê Diyar û hevala Avesta li gel wan heta dawiyê şer kiribûn. Di dawiya êrişan de hevalê Diyar û hevala Avesta şehîd bibûn, hevalên din hemû giran birîndar bibûn. Di encama lêgerînek dirêj de, me ferq kir ku çeteyan termê hevala Avesta di bin axa xendekan de veşartiye. Paşê hevalan xwe gihand termê wê, termê hemû hevalên şehîd hatin kom kirin. Hevalê Serxwebûn hebû. Hevalekî ciwan bû, ji navçeya Sirûç abajarê Riyayê yê bakurê Kurdistanê bû. Kesek wêrek û şerker bû. Lê dema diaxivî, her wekî ku wêjevanek serwer bi peyvên tijî hest û raman baxive bandor dikir. Temaşeyî girê Zagros kir û got; “Ey girê Şehîdan. Me soz daye em te carik din nedin neyaran. Ji ber hevalên me bi bihayê xwîna xwe ev nav dane te û gotin ‘em bimirin jî paşvekişandin nine.’ Tê êdî bibî navê vê sozê. Soza em li hember çeteyan bi paşve nekişin. Tê bibî navê giyana

wêrektiyê, wê dengê Avesta û Diyar heta kêliya dawiyê ya jiyanê jî di dilê te de deng vede. Ey hevnavê çiyayê bûyî pal û pişta Kurdan, hevnavê hêlîna gerîla û lehengên Kurd çiyayê Zagros. Soz be, em li gorî pîroziya giyana lehengên te bijîn û heta kêliya jiyana xwe ya dawiyê rûmeta giyana te biparêzin. Hevalê Diyar, hevala Avesta, hevalê Zagros, hevalê Botan, hevalên şehîd, mizgînî li we, Zagros azad bû. Bila giyana we şad be hevalno." Dema wisa diaxivî, baskên xwe vekiribû, te digot qey bazeke û wê ji ser wî girî bifire. Dengê wî di dilê hemû hevalan de dibû soza berxwedan û tolgirtinê. Dengê wî dibû hêrsa li dijî çete û neyarên ku dixwestin xaka me dagir bikin, pêşiyê li pêşerojên azad ên gelê me bigirin.

Ji çeteyan cih girtin ne hêsan bû. Bi rastî dema diketin cihekê, heta me ji wan digirt me berdêl jî didan. Ji ber armanca wan diyar bû. Dixwestin gav bi gav pêş de bên û xwe bigihînin hemû herêma Kobaniyê, ji wir hemû Rojavayê Kurdistanê dagir bikin. Lewma hevalên me ji çeteyan re digotin, 'kirnî, qirnî, qijnik' û wekî qijnikan cihê digirtin bernedidan. Lê berxwedana hevalên me, ew qijnikên ku dixwestin xwîna civaka me û giyana axa me bimijîn ji wir dabûn paş û ev dever ketibû dest me cardin. Balkêşe ku roja diduyan a şer, kesên dihatin şer bi maşînên xwe yên sivîl dihatin. Hinek ji wan bi kiras û egal bûn. Hinek bi şimikan bûn. Dema çete di gund de rastî berxwedana hevalên me hatin û hejmarek zêde kuştiyên wan çêbibûn, beşek termê kuştiyên xwe

şandibûn bajarên ku lê diman. Ji ber zêde çûyîna termên wan, gelê herêmê pirsî bû ka çima ewqas term tên. Li ser wê çeteyan ji gelê herêmê re gotibûn, "Em gihiştine ber Kobaniyê. Hûn jî werin ji cihên em digirin ji xwe re mal û tiştên Kurdan bînin." Lê dema dihatin û ketin nav şer û pevçûnan, hejmarek zêde ji wan jî hatin kuştin. Li ser vê yên ku mabûn bi leza ku hatibûn paşve direvîn. Ji ber çawa girtina van cihan ji bo me bibû sedema berdêlên mezin, her wiha çeteyan jî derbeya herî giran xwaribûn. Ji hêza wan a pispor ku ji wan re digotin Mihacirîn, bi dehan kes hatibûn kuştin. Tevî ku gelek termên kuştiyên xwe biribûn jî hêj bi dehan termên wan li qada şer mabûn. Ji xwe sedema ku gund û gir berdabûn jî ev windahiyên mezin bûn. Li hember vîna şer û berxwedanê ya hevalên me di wan de şikestin çêbibû. Piştî têkçûna hêzên wan ên pispor ên din nekarîbûn destwerdanê bikin û bi paşve revîbûn. Reva ji vê derê di şerê wan de jî qonaxek nû bû. Ji ber heta wê rojê teqez cihên ku didan pêşiya xwe digirtin û di wan cihan de xwe asê dikirin. Girtina wan cihan ne wisa hêsan bû. Heta kêliya dawiyê jî li ber xwe didan, bi dehan kuştiyên wan çêdibûn. Lê heta hemû hêza wan têk neçûya ew cih bernedidan. Cara yekê bû ku bêyî hemû di cihekê de bimirin cih berdidan û direvîn. Ev nîşaneya derûniya wan a li hember şervanên Kurd bû. Bi taybet hêza çalakiyên canbexşane ya hevalên me dida nîşan.

Piştî ku me gundê Berkêl û girê Zagrosê girt, me hêza xwe di eniyê de cih kir. Zilamek bi navê Berkêl hebû.

Navê gundê wî lê kiribûn, xwediyê gund bû. Berkêl temaşeyî hevalan kir û got, "Ez bi felsefa vê rêxistinê bawerim. Ger ev neyarên Kurdan cihekê jî nehêlin, wê vîna şer û berxwedana vê tevgerê cardin her cihî ji wan bigire. Dema gundê me hat girtin û malên me çûn, xelk girîn û gotin 'malên me çûn, tiştek me nema.' Min wê demê jî got heta rêxistina me neçe, wê tiştên me, gundên me jî neçin. Emê carek din bikarin vegerin ser cih û warên xwe. Niha hebûna vê tevgerê, hebûna lehengên wekî van hevalên li vê derê şehîd bûn mal û milkê me, hebûna me hemû ye. Dewlemendiya me ya mezin hebûna we ye hevalno. Ev gel çiqas bi we şanaz be, serbilind be jî kêm e. Divê mirov binê piyên van şervan û lehengan maç bike. Ma kê di dîrokê de lehengiyên wisa, qehremaniyên wisa dîtine? Ev ciwanên nûgihayî ji bo parastina me, girtina erd û warên me xwe bi mayînên xwe bi vî dijminî ve diteqînin û ji bo pêşeroja zarokên me ya azad xwe feda dikin."

Hevalê Harûn berpirsê wê eniyê bû. Ji bo em xwe carek din kom bikin, me bi hevalan re axivî û ew di eniyê de cih kirin. Gel jî hat di xetek din a pişt hevalan de çeperên xwe girt û me biryar da ku çi bibe bila bibe em carek din wê eniyê bernedin. Ji ber şehîdbûna hevalan bandorek mezin çêkir. Gel û hevalan bi biryardariyek mezin ew sekna berxwedanê raber dikirin. Ev wekî pêdiviya dilsoziya şehîdan didîtin. Ji xwe dema me cihek berdida, ji bo girtina wî cihî me zêdetir şehîd didan. Berkêl û Zagros nimûneyên şênberbûn ji bo vê rastiyê. Bi rastî jî

wekî hevalê Serxwebûn gotî, êdî ew cih û berxwedana hevalan bû navê sonda me ya em carêk din bi paşve venekişin, cihên di destê xwe de bi ti awayî bernedin.

## HIRÇA RÊDÛR



Me piştî hêza xwe li eniya Rojava bi cih kir û şûn de, civînek berfireh çêbû. Di wê civînê de xeta û kêmasiyên me kirîn hatin nirxandin. Civînek giran bû. Ji ber şehîdbûna hevalan û xetayên di çalakiyê de derketin rexneyên giran hatin kirin. Civîn di wateyekê de bû cîvîna rexne û rexnedanan. Piştî civînê hêj em hemû di wê hewaya giran a civînê de bûn, hevalê Rêdûr hat gel me. Ew jî bi qasî me bandor bibû ji şehîdbûna hevalan. Dibe ku xwestibe wê hewaya giran belav bike. Destê xwe avêt berîka şalê xwe, pêlîstokek biçûk derxist û da destên min. Min temaşeyî pêlîstokê kir, hirçek biçûk bû.

Wekî ku ji awirên min fêm kiribe ez dixwazim bêjim ev çiye, hêj min tiştek negotî bi kenekî hinekê şerm têkel bûyî de got; “Ez dizanim di rewşek wisa de ev gotinên min wê zêde watedar nebin. Lê ev pêlîstok xurcika bîranînên min ên zarokatiyê ye. Dema em ketin hundirê mala me, çeteyan her tiştê me biribûn. Çete ketibûn eywana xanî û em di hundir de bûn. Em li ser riya çareseriya derketinê dihizirîn. Hevala Evîndar bi hevalê Mehmûd re diaxivî. Di wê navberê de çavên min bi vê pêlîstoka min a zarokatiyê ket. Di bin kursiyek şikestî de ketibû ser pişta xwe. Wekî ku bêje ‘ka min bibe, ji bîranînên zarokatiya te ez tenê mame’ temaşeyî min dikir. Min xwe negirt û xist berîka xwe.” Ez di aliyekê de bi gotinên wî, tona dengê wî ya xemgîn bandor bibûm, ji aliyê din ve jî di wan kêliyên tengav de tişta hatî bîra wî bala min kişandibû. Min jê re got;

-Te di wê kêliyê de çi jiyan kir hevalê Rêdûr?

-Te rastî bivê min gelek tişt di nav hev de jiyan kirin. Di aliyekê de dibetiya mirinê li ber difina me bû. Lê hemû zarokatiya min bi dîtina wê hirçê di ber çavên min re derbas bû. Tu dizanî di gundan de pêlîstokên zarokan ax û kevirin. Dema tiştek wisa ji zarokekê re tê kirîn, nirxa wê gelek zêde ye. Ez pênc salîbûm dema diya min ev hirç ji min re kirî.

-Ji pênc saliya te ve ev hirç her li gel te bû?

Hinekê di ber xwe de kenî, serê xwe rakir û got;

-Hinek tişt hene bi demê re ji heyberbûnê derdikevin. Ev hirça min jî wisa bû di jiyana min de. Te rastî bivê gelek zarokên gund destpêkê bûn hevalê hirça min, paşê bi min re hevaltî kirin. Cîhana zarokan tiştek cuda ye.

Serê xwe hinekê tewand, keserek kişand û got:

-Min û bi dehan hevalên xwe bi vê hirçê lîstibû. Lewma dema ez mezin bûm jî min ew hirça xwe rakir. Ji ber ew yekem pêlîstika min a ji derveyî kevir û heriyê bû. Dema min hirç li wê derê dît, wekî ku min zarokatiya xwe ji dest çeteyan rizgar kiribe keyfa min xweş bû. Ji ber ji derveyî vê pêlîstokê ti tiştên girêdayî zarokatiya min, kelûpelên mala me yên berhema bi salan bû nehiştibûn.

Paşê wekî bendavek bikeve pêşiya dengê wî, gotinên wî giranbûn. Min temaşeyî liv û tevgerên wî dikir. Hestyariya jiyan dikir xwe di xetên rûyê wî de dida der. Eniya wî hinekê qurmiçî. Xweziya xwe daqurtand, paşê got:

-Keda diya min, xwihdana babê min li ser wan hebû. Çûn û ez ketim xema çûyîna wan. Lê bi qasî îro ez ti caran ne êşiyam e. Ji ber niha di wî gundî de xwîna bi dehan hevalên min heye. Lewma heta ez saxbim, êdî ev pêlîstok wê di jiyana min de bimîne û ezê heta henaseya xwe ya dawiyê jî vê rastiyê ji bîr nekim. Li xurcika bîranînên zarokatiya min, li vê hirça biçûk gelek bîranîn û wateyê din jî hatin barkirin.

Di gotina dawiyê de qirika wî tijî girî bibû. Xweziya xwe daqurtan, wekî ku bixwaze ez giriyê wî nebînim ber bi gund ve serê xwe zivirand. Lê min rondikên wî yên herikîn ser hinarkên rûyê wî dîtin û ez jî bi wê dîmena wî re wekî zarokek li wan kolanên gund ên hîna xwîna hevalên me lê zûha nebûyî geriyam. Ji bo min jî kêliyên hestyar bûn. Em mirovbûn, ne ji polayê hatibûn çêkirin. Min digot qey dilê Rêdûr di qefesa singa min de lêdixe û li gel zarokatiya me ya bi sedcaran hatibû talankirin li wan kolanan ketibû raperînê. Hirça biçûk û xurcika bîranînên Rêdûr, em bi hev re xisitibûn berxwdanekî li hemberî êşên zilm û zoriyê û êşa şehîdbûna hevalên me. Me barek ji wê hirça biçûk mezintir lê barkiribû. Ma mirovek li axa me hebû ku zarokatiya wî/wê nehatî dizîn û hêlîna demboriya wan nehatî xirapkirin? Ev hestek bû û me mirovên vê axê di kûrahiya dilê xwe de dijî. Hirça Rêdûr bibû xurcika bîranînên wî û ew pêlîstok êdî bi giyan bibû di çavên wî de. Min destên xwe danî ser milê wî, li min vegeriya û beşişînek şikestî xwe li rûyê wî gerand. Min got;

-Dagirkerî talane, kuştin û tinekirine hevalê Rêdûr. Em îro ji bin xirbeyên ku dagirkeriyê bi sedsalan li ser hebûna me de rûxandin çanda xwe, jiyana xwe, hêvî, armanc û pêşeroja xwe derdixin. Berdêla van tiştan gelek giran e. Lê wekî te gotî ya girîng ew e ku di her tişta em dest lê bidin de ew berdêl û rastiya me bê bîra me. Ev carna darek, kevirek, pêlîstokek an jî tiştek din be jî ya girîng ew giyan parastin û ew hişê demboriya xwe

dayîna jiyankirin e. Ev hirça te bi wateyên te lê barkirî re ji dîtina xwe gelek mezintir e. Zarokatiya xwe biparêze ku tu bikarî pêşeroja xwe rast û bi exlaq bijî.

Min hirça wî dirêj kir ku ez bidimê. Wisa lê dinêrî te digot qey zindiye û bi çavan bi hev re daxivin. Hirça xwe girt, hinekê anî pêşiya xwe, destê xwe bi ser rûyê hirçê de bir û paşê xist berîka xwe. Di wê navberê de hevalan gazî min kir. Wekî ku ez û Rêdûr bi wê hirçê bibûn hevalên hev ên zarokatiyê, bêyî em tiştekê ji hev re bêjin me temaşeyî rûyê hev kir. Em herdu jî beşişîn û ez ber bi hevala gazî dikir ve meşiyam.

## KELHÊN HEMDEM

Me beriya demekê bû me li hinek çihan hinek kelhên parastinê çêkiribûn. Xelqeyek ji wan jî li eniya Ebû Sirê bû. Xeleka parastinê ji bo hemû derdorên Kobanê hatibû plankirin û me wisa di nav xwe de hevbaşiya kar kir. Ev biryarek cîdî bû ji bo me û diviya em kêlî bi kêlî li ser bisekiniyan. Di civînê de rewşa xetên parastinê û kêmaniya wan hatibû şîrovekirin. Me li gorî asta çekên xwe û hêza parastina wan nexşeyek a kelhan çêkiribû. Di deştê de çeka herî bi bandor tank bû û ev çek di destê de me de nînbû. Kelheyên hemdem wê şûna vê valatiyê bidagirtina. Me yek bi yek baragehên dijmin girt dest û xetên wan ê êrîşan şîrove kir. Xeleka kelhan li gorî êrîş û parastinê hate çêkirin. Çekên dijmin bi vî şêwazî dihate

bêbandorkirin. Çeka 120 û tank hema hema di heman hêzê de bûn û yek ji wan sabît, yek jî ji bo êrîşê bû. Tecrubeyên me ên di derbarê çekên giran de nebûn. Em di piratîkê de têdigiştin ku dijmin li gorî araziyê kîjan çekê bi kartîne. Rola doçkayên ser pîkaban çiye, 120 di kîjan demê de tê bikaranîn û dîsa tank di kîjan cihan de bibandore. Dema me encamê van çekan fam kir, me giranî da ser kelhên parastinê. Ji ber di şer de rola çekan baş bê famkirin, tu li gorî wê dikarî parastina xwe ya xurt jî ava bikî. Di deştê de li hemberî tankan şer kirin wêrektî dixwaze, lê wêrektî heta cihekê ye. Di şerê Lîbya û Îtalyayê de ku kirine fîlm jî rola herî girîng tank dileyzin. Jixwe ji ber vê rastiya hanê jî navê fîlm kirine şêrê çolê. Lê diviya encama me ne mîna encama şêrê çolê bûna. Filmê ku Anthony Quinn bi navê Omer Moxtar têde dileyze, xwedî dîmenên gelek balkêşe. Piyên xwe girêdidin û li hemberî tankan şer dikin. Wêrektiya hevalên me yên di çeperan de ji vê ne kêmtir bû, lê diviya me çareyek baş ji van çekan re bidîtina. Kelhên Hemdem ji ber vê pêdiviyê di rojeva me de bû û em lez û bez ketin nav amadekariyan.



Piştî çalakiyên demek berê me kirî, me li hemû eniyan civîn çêkirin. Me rewşa xwe ya heta wê rojê nirxand û kêmasî û nebesiyên heyîn di ber çavan re derbas kirin. Her wisa di encama nirxandina nêrîn û pêşniyarên ji civîna derketîn de, me wekî rêveberî plansaziyek nû çêkir. Li gorî wê plansaziyê, me wê dest bi pêvajoyek çalakiyên tolhildanê bikiriya. Lê diviya em amadekariyên wan baş bikin, ji çalakiyên pêşiya wê encam derbixin. Piştî civînan û pêkanîna hinek karên di derbarê plansaziya me ya nû de, kêm be jî barê min sivik bibû. Min xwe aramtir hîs dikir. Em bi roj li eniya Rojhilat bûn. Piştî karê min li wê derê qediya, min xwest biçim eniya Ebû Sirê û em ber bi wê derê ve ketin rê.

Diwarê van kelhan nêzîkî metre û nîvê stûr bûn. Me wisa hesap kiribû ku ger rokêtên B-7 û tankan jî lê bikevin bandor nekin. Dijminê li hember me teknîkek pêşketî

bikar dianî. Di destê me de jî çekên wisa giran û em bikarin di hemû eniyan de zêde bikar bînin nebûn. Lewma me li ser erdê hewl dida di cihên pêş ên eniyên xwe de em tedbîrên wisa bigirin û teknîka di dest dijmin de vala derbixin. Hevalê Dogan hebû. Hevalê Dogan bi eslê xwe xelkê Rihayê bû. Lê li Ewrûpa mezin bibû û dibistan li wê derê xwendibû. Ji Ewrûpa hatibû beşdarî me bibû. Me jê re digot Doktor. Ji ber xwedî xîtabekî nerm, aram û peyvên dagirtî bû, me ev nav lê kiribû. Wekî derûnînasan tev digerî. Li gorî derûnî û rewşa hevalan bi zimanekî nerm, aram û xweş diaxivî û hema bêje di her mijarê de dikarî kesên li pêşberî xwe qana bike. Hevalekî bejna wî navîn û dagirtî, reng genimi bû. Mirovek ji dil û fedakar bû. Dikarî hemû wexta xwe bide hevalan, bi wan re mijûl bibe, pirsgirêkên derdor guhdar bike û ji bo çareseriyê bikeve nav hewldanan. Mirovek wisa paqij û zelal bû. Vê paqijî û zelaliya wî xwe di hemû karên wî yê jiyanê de jî dida der. Kesek hedar bû. Her kar bi ziraviyan ve dihizirî, hewl dida kêmasiyek biçûk jî di karên ku dike de dernekeve. Ji ber van taybetmendiyên wî hemûyan, hevalan jê re digot Doktor. Hevalê Dogan berê ne di karên leşkerî de bû. Lê piştî şehîdbûn û birîndarbûna pir hevalan a di çalakiyên beriya wê demê de, me xwest hevalê Dogan bê gel me û li ser van karên çêkirina kelhan bisekine. Ew mehek bû hevalê Dogan li ser wan karan disekinî. Hema rojane me rewşa wan bi telefonê dipirsî û tekmîla karên dikir dida me. Lê me xwest em biçin hevalên di wî karî de bibînin û serdana wan bikin.

Beriya em bigihêjin Eniya Ebû Sirê, ez bi telefonê li hevalê Dogan û hevalê Mustafa geriyam. Lê telefonên herduyan jî derneketin. Hevalê Mustafa jî hevalekî ji gundê Ûçkardaşyan bû. Ji destpêka şer ve tevlî şer bibû, heta wê rojê bi fedakarî, dilsoziya hevaltiyê, wêrektî û vînek mezin kar kiribû. Beşdarî gelek xebatan bibû. Tam kedkarekî şoreşger û kesek şareza û têgihiştî bû. Hevalê Mustafa zewicî bû, zarokên wî hebûn. Lê ti caran xwe ji ti karî nedabû paş û her di cihên pêwîst de kar dikir. Hema bêje ew jî wekî hevalê Dogan bû. Lê rêbaza wî ji ya hevalê Dogan hinekê cuda bû. Dema ji yekî re bigotiya vî karî bike, an jî tiştek bixwestiya, destpêkê bi zimanekî gelêrî û peyvên xweş çîrok, serpêhatiyek digot û mebesta xwe di dawiya çîrok û serpêhatiyên xwe de tanî ziman. Lê her çîrok û serpêhatiya digot wisa bi mijarê re dikir yek û baş şirove dikir, guhdarkirina wî tamek cuda dida her hevalê/î. Di pir çîrok û serpêhatiyên wî de bîra zarokatiya me ya di şevbêrkên gundan de dihat bîra me. Bira çîrokên ku bi heftiyan dewam dikirin tanî bîra me. Kelecana me ya ka dê çi bi dawiya lehengên çîroka me bê cardin em digirtin. Wî tiştên dixwest bihatiyan kirin bi çîrokan watedar dikir û pêdiviyên roja îro li ser tevna wan çîrokan tanî ziman. An ku waneyên ji dîrokê bi wan çîrokên xwe rojane dikir. Dibe ku ji ber vê şibandina wan be, ew û hevalê Dogan demek dirêj bû bi hev re bûn û bi hev re gelek kar kiribûn. Ji xwe biçûyan kî derê her bi hev re bûn. Lewma hevalan ji hevalê Mustafa re jî digotin hevalê Dîroknas. Bi rastî li gel zanebûna xwe ya dîrokî û

civakî di pêkanîna kar û peywirên rojane de jî tam milîtanekî yê dozê bû.

Dema telefona herduyan jî derneket, min ji hevala Têkoşîn re got ka em biçin cihê kelhê. Kelha me ya li Ebû Sirê yekem kelhe bû. Me destpêkê ew çêkiribû û paşê me li cihên din jî dest bi çêkirina kelhên wisa kir. Lewma hevalan ji min re digotin, “Ew kelhe ya te ye.” Lê piştî me ew kelhe çêkir û şûn de hevalê Kendal li wê eniyê şehîd bû. Hevalê Kendal berpirsê wê eniya me bû. Ji ber bejna wî hinekê kurt bû, bi taybetmendiyên xwe, awayê hizirandina wî ya şer hevalan jê re digot, ‘Napolyon’ û pir dihat hezkirin. Hevalê Kendal hevalakî şerker û wêrek bû. Hevalê Kendal ji Colemêrgê bû. Piştî hevalê Kendal şehîdbû û şûn de, navê wê kelhê bû kelha şehîd Kendal. Her wisa navê nasnavê bêtêla wê eniyê jî bû Kendal.

Dema em ber bi kelhê ve çûn û ji dûr ve çavên min pêket, lerzek ket laşê min. Kelha ku me bingehê wê avêtibû, di wateya rast de bibû kelhe. Dîwarên wê bilind bibûn û tenê deriyên wê mabûn ku bên çêkirin. Min berê ji hevalan bihîstibû ku di hundirê kelhê de bîra avê kolane û av derxistine. Ji xwe armanca me ji çêkirina van kelkeyan ew bû ku ger bi mehan jî derdora wan bê girtin, em bikarin tê de şer bikin. Ji bo wê diviya cihê hemû pêdiviyan bi demdirêjî bihatiya hesibandin. Di hundir de qenalên binerd ên ku me bikariya em xwe pê bigihînin cihên din bihatiyan çêkirin. Kelhe li gorî wê

hatibû çêkirin. Dema min wisa bilindbûna kelhê dît, wekî ku çiyayê Bagokê yê bîr û baweriya zarokatiya min bû hatibe wê derê hestek xweş ket nava dilê min. Ez pir keyfxweş bûm. Em fêrî rastiya şerê deştê dibûn. Ev yek dihat wateya ku me wane ji kêmasî û xetayên xwe yên berê girtine û vê hêz dida min. Di hemû şeran de serweriya li ser erdnîgariyê xalek girîng e. Dema çeperên te saxlem û qayîmbin, hêza tê de şer dike xwe di ewlehiyê de dibine. Başbûna çeperên şer bawerî û wêrektiyê dide mirovan. Ji ber dema tiştek te ji çekên dijmin, gule û teknîka dijmin biparêze hebe, tu dikarî baştir şer bikî. Li hember çekên di destên çeteyan de, me dikarî em xurtir şer bikin di van cihan de. Min ji wê derê hinek din temaşeyî kelhê kir. Roj diçû ava, tirêjên tavê cara dawiyê destên xwe li ser pora deşta Kobaniyê re dibirin û xatirên xwe dixwestin. Ji dûr ve dengê guleyên topan dihatin û li deştê tozek bilind dibû. Piştî ku me ji wê derê hinek din temaşeyî derdor kir, em li maşîna xwe siwar bûn û ber bi kelhê ve ketin rê. Em di riyekî ax re diçûn. Maşîna me di deştê de li pey xwe toz û dûkêl dihişt û em bi hestên zelal û keyfxweş ber bi kelhê ve çûn.

Saet çar û nîvê êvarê bû em gihiştin ber deriyê kelhê. Em ji maşîna xwe peya bûn û me berê xwe da hundir. Di deriyê kelhê de hostayê kelhe çêdikir Mam Xalid hat pêşiya me û bi rûkenî em pêşwazî kirin. Ji ber destên wî di nav çîmetoyê de bûn, destê xwe rakir hewa û got:

-Merhaba ji we re, hûn bixêr hatîn.

Destên wî ji ber kar qelişîbûn û derzên tiliyê wî diyar bûn. Me guhdarî destên wî yên bi çîmento nekir, me silav dayê em çûn destên hev. Mam Xalid ket pêşiya me û em derbasî hundir bûn. Em ketin hundir, hevalên li wê derê hemû rabûn ser xwe û bi kêyfxweşî em pêşwazî kirin. Me silav da hev, rewşa hev pirsî û şûn de, min got:

-Hevalno, destên we saxbin. Quwet be ji we re, bi rastî we ez pir şad kirim îro. Ka navberekê bidin, em hinekê bi hev re rûnin.

-Spas hevalno. Bi hatina we em jî keyfxweş bûn. Lê çend kevir mane, em wan jî biqedînin wisa bên rûnin baştir e. Hûn di vê navberê de hinekê bigerin, li derdorê binêrin ka çawa çêbûye. Emê paşê bên û bi hev re çayekê vexwin.

-Bi rastî dest û dilên we saxbin, we karek gelek baş kiriye.

-Spas. Zêde nemaye, ava bîra me jî derket.

Mam Xalid daxivî û tenê wî bersiva min bi deng dida. Min ne dikarî ez pêşiya keyfxweşiya xwe bigirim û her rûyê min dikenî. Diyare hevalan jî ev keyfxweşiya min dîtibûn, ew jî bi wê keyfxweşiya min şad bibûn. Ji ber ew nîşaneya karê wan ê baş û hêja bû. Em derketin ser dîwarên kelhê, em li derdora kelhê hemûyê geriyan. Me çeper û cihên ku şer tê de bên kirin kontrol kirin. Ger

dijmin bê wê di kîjan alîyan re bixwaze xwe bigihîne kelhê, çeper ji bo şer çawanin, serweriya kelhê ya li ser derdor çawaya e, me hemû di ber çavan re derbas kirin. Em li ser dîwarê aliyê rojavayê kelhê bûn. Mam Xalid hat kêleka min û got:

-Tu dibînî me kelheyek çawa çêkir?

-Mam Xalid, divê mirov peykerê te li ser serê vê kelhê çêke û navê te li ser dîwarên wê binîvîse.

-Na birazî, navê me hemûyan li ser e. Hemû hevalan kedek mezin dan. Keda hemû hevalan e. Lê ya rast hevalê Dogan kedek mezin dide. Navê ku kelhê girtî gelek hêjayî ye û ew nav sembola ked û xwihdana me hemûyan e.

Mam Xalid her roj ji gund dihat û heta derengiya şevê li wê derê kar dikir. Du hevalên ciwan ku min berê nedîtibûn li jêrî me kar dikirin. Min ji Mam Xalid pirsî û got:

-Mam Xalid, ev herdu heval kîne, ji kengê ve li vê derê ne?

-Birazî, ew herdu kurên min in. Ev demeke ew jî bi min re tên kar dikin. Divê em beriya ku şerek dijwar li vê eniyê derkeve kelhê biqedînin. Ji bo wê ez wan jî bi xwe re tînim.

-Rewşa tenduristiya te çawa ye? Heval te pir diwestînin an ne?

-Ez gelek başim. Nexêr, heval gelek rêzdarin li hemberî min. Ti gazinda min ji hevalan nîne. Hemû heval kedek mezin didin, fedakariyek mezin dikin. Lê ger zû biqediya ezê baştir bibûyam. Beriya şerek derkeve divê em van deriyan xelas bikin.

Piştî ku mamê Xalid hevalên din jî kevirên ku dixwestin lê bikin qedandin. Paşê hatin gel me û em li ser serê dîwarê kelhê rûniştin. Hevalan xwest em li ser wê bilindahiyê çayê vexwin. Hevalan çay anîn, em li wir rûniştin û me çaya xwe vexwar. Hevalekê motora elektirîkê pêxist, xwestin ava ku ji bîrê derdikeve nîşanî me bidin. Dema hevalan av derxist, hinekê kêm hat. Min ji wan re got:

-Niha wê evqas av têra we bike.

Mamê Xelîl kenî û got;

-Li ser vî kuçê hişk û req, ev kuçê ku lawir jî nikarin lê bijîn derketina vê avê, wekî herikîna çemê Firatê ye ji me re. Tu nabînî cihek çawa qirêj û zûha ye? Lawir nikarin lê bijîn, lê me av derxistiye. Tu mereq neke, emê di hundirê kelhê de kulîlkan jî biçînin. Dê bi rihetî cihê şeş kesan yê jiyanê tê de hebe. Dema me derî jî lêxist, wê demê kes nikare êdî xwe bigihîne vê derê.

Mam Xelîl jî wekî mam Xalid hostayê çêkirina wê kelhê bû. Wî jî demek dirêj bû di wan cihan de kar dikir. Li ser gotina mam Xelîl ku got emê kulîlkan biçînin, çavên hevalan vebûn. Em hemû keyfxweş bûn û bi hev re kenîn. Mam Xelîl gotina xwe qedand, destê xwe dirêjî şekir kir ku bixe çaya xwe. Cilên wan, serû rihên wan hemû di tozê de mabûn. Piniyên çîmentoyê bi cilê wan ve zeliqîbûn. Hevalekê qutiya şekir da destê wî. Mam Xelîl şekir girt, serê xwe rakir û got:

-Birazî tu dibînî em hemû qirêjin, destên me, cilê me hemû di qirêjê de mane.

Dema wisa digot jî temaşeyî destên xwe dikir. Ez bi wê kedkarî û hewla wan a çêkirina wî cihî pir bandor bibûm. Min xwe aciz kir û got:

-Mam Xelîl, wisa nebêje. Destên we pîroz in. Wekî te gotî we li ser van kuçên jiyan lênebû jiyan afirand. We ked daye, ew dest nîşana kedê ne. Tevî wê toz û heriya pêve hêjayîne mirov rojê deh caran wan destan maç bike.”

-Birazî tu me didî şermê. Ma me çi kiriye?

-Wisa nebêjin. Hûn dikevin dîrokê. Wê rojek bê û navên we di destana berxwedana vê derê de bên nivîsin. Dê herkes mereq bike ka ev kelhe ji aliyê kê ve hatine çêkirin. Hostayên wan, kedkarên wan kîne.

Bi gotina min re piyala çayê di destê wî de ma. Çavên wî yên ji westanê bi zorê vedibûn Paşê serê xwe hinekê hejand, piyala xwe ya çayê danî ser dîwar û got:

-Wile hevalê Kendal gelek dixwest bi dawîbûna van kelhan bibine. Pir bi coş û kelecan li bendê bû. Lê mixabin beriya bibine şehîd bû. Me ji xalê Îsmet re gotiye, roja em biqedînin tê ji me re pezekê bînî. Emê qurbanekê serjê bikin û xwîna qurban li dîwarê kelhê bireşînin. Ji ber li gorî bawerî û kevneşopiya me Kurdan, cihê ku xwîna qurbanekê riyayî ser mirovan diparêzin. Dibe ku êdî em bes şehîdan bibin, kes di vê kelhê de jî şehîd nebe.

Piştî gotina dawiyê çavên wî şil bûn. Keserek kûr kişand, wekî ku li şûna hevalê Kendal jî temaşeyî kelhê bike çavên xwe li hemû aliyan gerand. Min xwest ez hinekê wê hewaya hestyar belav bikim. Min got:

-Mamo, ma hevalê Dogan û Mustafa îro nehatin gel we? Telefonên wan dernakevin, gelo bi kû ve çûne?

-Ha. Wile beriya hûn bên bi nîv saetê derketin. Çûne gundên jêr hinek kes bînin ji bo çêkirina dîwarên kelhan. Li wan gundan telefon nakişîne. Dibe ku ji ber wê be. Herdu heval jî gelek diwestin, xwe gelek diêşinin ji bo ev kar baş bê kirin û zû biqede.

Piştî em nîv saetê li gel wan rûniştin û şûn de me xatirê xwe ji hev xwest û min û hevala Tekoşîn xwe berda jêr.

Roj li ber çûyîna ava bû. Her wekî ku leza wê ya çûyîna malê hebe ber bi çûyîna ava ve dûr diket. Em jî li maşîna xwe siwar bûn, di wê deştê de ber bi aliyê rojava ve ketin rê. Di deştê de ji ber tekerên maşîna me toz bilind dibû, qirşik û zilikên pûş ji erdê bilind dibûn û li ber bayê diketin. Bablîsokên biçûk li deştê didan, toz, qirş û qewalên derdor dida ber xwe û wekî dansa maran ber bi jor ve bilind dibû. Em piştî çend deqîqeyan ketin ser riya ku diçe Bajarê Helebê. Riyek kevnar û dîrokî bû. Dema em ketin ser wê riyê, wekî ku roj direvî û em ketine pey rojê hat ji min re. Mirov di kêliyên wisa de zêdetir nirxa zimanê Kurdî dizane. Roj diçû malê, an ku diçû ava. Êvar bû, leza rojê hebû. Maşîna me jî bi lez diçû û wekî ku roj bi reve û em ketibin pey rojê em ber bi rojava ve diçûn. Wekî ku em bixwazin rojê bigirin em li pey diçûn. Tirêjên zelal li cama maşîna me dixistin. Min cama maşînê vekir û ew hewaya deştê ya bêhna toza kevir û axê jê dihat kişand cergên xwe.

Me bi beza xwe ya li pey rojê kargeha Lefar derbas kiribû. Girek li pişt kargeha Lefar hebû. Girek têr kevir bû. Me temaşeyî wî girî kir, nêzîkî bîst kargehan li wî aqarî bûn. Di wan kargehan de kevir dihatin hêran û dibûn xîz. Ew erd hemû cihên kargehên keviran bûn. Kargehan xuya dikir, li ser kargehan tozek spî bilind dibû. Te digot qey berfek hûrik dibare ji ezmanan. Her ku ez digihiştim wî cihî, min digot qey ez di nav berfê re derbas dibim. Hewaya wê derê, toz û dûkêla wê derê jî bi min cuda dihat. Nizanim, dibe ku bandora wan keviran

be, an jî ji ber min ew toza spî dişiband berfê be. Lê dîmena wê derê ji bo min cuda bû. Dema tarî diket erdê Kargeha Lefar wekî banoyekê xuya dikir. Ev kargeh wekî kelha Eyfer a Fransa çêkirine. Ji dûr ve birca kargehê mîna bejna jinek bedew xuya dike. Ronahiyên wê li gorî wê hatine çêkirin. Tê bêjî qey birca sereke banoyeke û birqên bircên derdor jî hişedarên wê ne. Çar bircên ronahiyê li derdorê ne. Bircek bilinde, yên din bi rêzê ve her ku diçe nizim dibin. Di kêliyên hewa hinekê tarî dibin de dîtina wê dîmenê ciwanî û bedewiyek cuda dida wî aqarî. Dema me ew cih derbas kir, em li rastî maşîna hevalê Mustafa û Dogan hatin. Ber bi cihê asayîşa me ve diçûn. Lê wan em nedîtin, lewma yekser derbas bûn. Em jî ber bi gundê Lefarcê ve çûn.

## PARASTVANÊ LEFARCÊ: EBÛ ŞÊRO

Dema ku em çûn milê Lefarcê, wekî her cara ez diçûm cardin Ebû Şêro hat pêşiya me. Dema Lefarcê dihat gotin, tişta yekem dihat bîra min Ebû Şêro bû. Ebû Şêro kesek ji Kobaniyê bû. Kargehek me li Lefarcê hebû, wî ewlekariya wî cihî digirt. Kesek gir û bilind bû. Hema bêje bejna wî bi qasî du metreyan dirêj bû. Kîloyên wî di ser sedî re bûn. Kesek rengê çermê wî sor, gir û dagirtî bû. Dema ku qilêş dixist destên xwe, te digot qey demanceyeke di destên wî de ye. Ji ber bilindiya bejna wî û gewdeya wî ya gir û qelew, qilêş bi qasî demanceyê biçûk dibû di destê wî de. Cilên hevalan li dirûngehên

me çêdikirin kêrî wî nedihatin. Cilên wî taybet diahtin dirûtin. Rextê xwe bi benan çêkiribû. Ji ber rextên me li gorî wî biçûk bûn. Bi bena rextê xwe girêdabû, li gorî xwe îcadek nû derxistibû di çêkirina rext de.

Her dema ku em diçûn gel wî silava leşkerî dida me. Ez jî carnan aciz dibûn û min digot çima wekî parastvanên li ber deriyên dewletê nêzîkî me dibe. Ebû Şêro dîsa hat pêşiya me, piyê xwe li erdê da û silav da me. Min gelek caran gotibû, ezê jê re bêjim carêk din wisa neke. Îro tam dema wê bû. Min hinekê rûyê xwe tirş kir û got:

-Ebû Şêro, ez dixwazim ji te re tiştekê bêjim.

-Keremke Xalo.

-Tu çima wisa dikî?

-Çima, ma ez tiştek xirap dikim?

-Dibe ku niyeta te ne tiştek xirap be. Lê ev silava te dewletê tîne bîra min. Her cara em tên wekî ku tu li leşkeriya rejîmê yî silav didî me. Em hevalin, em ne payebilindên artêşa dagirkeran in. Tu her carê ji me re dibêjî 'Seydî' û bi heman awayî silav didî. Bêje heval, normal were destên me û silav bide. Ez dizanim tu ne ji bo min tenê wisa dikî. Tu wisa silav didî hevalên din jî. Ez ji vî awayê silavdayînê hez nakim. Ger tu carek din wisa nekî ezê keyfxweş bibim.

-Te rastî bivê min ferq kiribû. Dema ez wisa silav didim rûyê te tirş dibe, wekî ku tu naxwazî silava min wergirî. Ez ji te re bêjim ka çima ez wisa dikim?

-Bibore, min berê ji hevalan pirsî, gotin keyfa wî ji me re tê ji bo wê ye. Lê te rastî bivê keyfa min ji vê tiştê re nayê. Lê ez dixwazim ji te bibihîsim.

-Min di leşkeriya xwe ya dewleta Sûriyê de du salan hişedariya cihekê kir. Ez her li wî cihîbûm, cihek li gorî wan girîng bû. Gelek kes diçûn û dihatin. Rojê bi sedan car min silav dida. Leşkerek jî bihatiya min her silav dida û digot ya seyîdî. Ji ber ez neçar bûm silavê wisa bidim. Min ji xwe re xeyal dikir, ez rojekê bi zimanê xwe silavekê wisa bidim fermandarekî Kurd. Silavdayîna leşkerên welatê min, hestek cuda dide min. Wekî ku ew xeyala min pêk hatiye ez xwe şad hîs dikim. Ev ji bo min rûmetek mezin e. Em hevalên hev in, lê bihêlin ez xeyala xwe pêk bînim. Ma çi xirabî di vê de heye?

-Bibore, wile min nedizanî xeyala te ye. Ger min berê bizaniya min ji te nedipirsî. Tiştek nabe, hema ger xeyala te ev be, ne pirsgirêke xeyala xwe pêk bîne.

-Tu dizanî heval, du salan min êşkence jiyan kir. Lê dema ez niha wê silavê didim, ez zêde keyfxweş dibim. Moralê min dibe ji sedî sed. Niha ez gihiştime xeyal û mirada xwe. Vê ji bo yekî wekî min zêde nebinin. Ji ber dema ez silav didim hevalên xort ez carêkê şad dibim. Lê dema ez

silav didim jinek Kurd a fermandar ez sêqatî wê şad dibim.

Ebû Şêro wisa ji dil di axivî, parastina silava xwe dikir ku gotin ji me re nehiştibûn. Lê heval hemû dikenîn û li hember bêdengbûna min şaş bibûn. Min tenê bi rûyekî ken lê guhdar dikir. Got:

-Niha heval dikenin, lê ev ji bo min tiştek pîroz e. Wile hûn aciz bibin û nebin, ezê her wisa silav bidim. Vêca xalo, ma kê taxmîn dikir wê bi sedan kes di bin fermandariya jinên Kurd de li ser vê axê şer bikin? Ma serbilindî û rûmetek ji vê mezintir heye? Ez ji vê jî gelek keyfxweş im.

Bi gotina xwe ya dawiyê jî helwesta xwe bi liv û tevgerên xwe jî danî holê. Destê xwe mîna ku sar maseyekê bide li çoka xwe da, biryardariya xwe nîşanî me kir. Ez kenîm û min got:

-Başe Ebû Şêro, min niha nû fêmkir tu çima ewqas qelew dibî. Tu her roj çend caran silav didî û wisa keyfxweş dibî. Ev jî dihêle tu wisa qelew bibî ne wisa?

-Wilehî dibe ez ji ber wê wisa qelew dibim.

Hevalan dest bi ken kir, Ebû Şêro jî kenî û got:

-Min navê ti hevalan aciz bikim. Madem tu naxwazî ez wisa silav bidim te, ezê silav bidim hevala Tekoşîn.

Hevala Tekoşîn hevalekî ciwan bû, temenê wê şanzde bû. Ajovana maşînê bû, her li gel me bû. Hevalekî dev li ken bû. Te digot qey ronahî ji rûyê wê dibare. Hemû hevalan pir jê hez dikir û keyfa hevalan jê re dihat. Ebû Şêro jî vê carê ji bo me bide kenandin li ber hevala Tekoşîn rawestiya û heman silav da. Em bi wan liv û tevgerên wî kenîn. Paşê me xatirê xwe ji hevalên li wê derê û Ebû Şêro xwest û em ber bi eniya Sirînê ve ketin rê.

Me piştî çeperên eniya Sirînê ku hevalê Emîn Erkendî berpirsê wê bû derbas kir, me berê xwe da bajarê Kobaniyê. Ew demek bû ez neçûyîm bajêr. Demek bû pir hevalan dixwest em biçin gel wan. Lê neçûbûm navenda YPJ, ne jî çûbûm gel hevalên birîndar ên li çend malên birîndaran ên bajêr diman. Carna heval dihatin gel me, an bi telefonê di axivîn û rexneyên xwe ji min re digotin. Lê bi rastî ji ber zêdebûn û dijwarbûna pevçûnan me nedikarî em ji eniyên şer derkevin û biçin serdana hevalan bikin. Dema em ber bi bajêr ve diçûn, em di rê de li rastî hevalê Dogan û Mustafa hatin. Ew jî ji eniya Sirînê dihatin. Me li nêzî bajêr cihekê maşînên xwe dan kêleka cadê, em ji maşînan derketin. Ew demek bû me pir caran bi telefonan hev axivî bû. Lê me hev nedîtibû. Piştî em daketin, me silav da hev û paşê em ber bi girikek biçûk ve hilkişiyan jor. Êvara dereng bû, bayek hênik û gur xwe li rûyê me dixist. Girikê em hilkişiyan ser, raserî cadê bû. Cadeyekî fitlonek bû, wekî marek dirêj xwe di wê aqarê de dirêj giribe û fitlonekan bide

xwe diyar bû. Em gihiştin serê gir, me li derdor temaşe kir. Em hemû westiya bûn. Hevalan di tevahiya rojê de kar kiribûn, li gundan geriyabûn û karkerên ku bikarin kelha çêkin biribûn cihên kelhe lê dihatin çêkirin. Êvaran jî ew vedigerandin cihên wan. Em li serê gir rûniştin, hevalê Mustefa temaşeyî min kir û got; "Hevala Meryem, ez dixwazim ji we re serpêhatiyekê bêjim. Ez ji kîjan hevalê/î dipirsim û dibêjim hûn çawanin, her dibêjin em başin. Vêca çîrokek heye ez dixwazim ji we re bêjim. Zilamek heye. Her roj sibê zû radibe, diçe nav zeviya xwe ya nîskan û dixebite. Jina wî jî her sibe jê re taştê dibe. Ji bo bikare baş kar bike û berhemên wan baş bin, jina wî jê re penîr, nîvişk û dew dibe. Her ku diçe, gazî zilamê xwe dike û dibêje 'camêr ka were taştiya xwe bixwe. 'Zilam dibêje başe, kêmek maye, ez vî cihî jî bidirûm ezê bêm.' Lê heta Zilam ji kar vediqete hewa germ dibe, xwarina wî li ber tavê dikele. Tê xwarin dixwe û nexweş dikeve. Hem ji karê xwe dibe, hem jî ji tenduristiya xwe. Ew xeyala wî ya kar zû xelas bike û berhemek baş derbixe di qirika wî de dimîne. Vêca hûn jî wisa dikin. Hûn nexweş dibin, birindar dibin, çi bi serê we tê her hûn dibêjin em başin. Baş bin, lê beriya hûn tam bikevin û êdî nekarin ti tiştî bikin, hinekê li ser tenduristiya xwe jî bihizirin, hay ji xwe hebin. Ji rengê te jî diyare tu ketî rewşa wî zilamî. Hingî tu li pey kar ketî û te gotiye ka bila ev jî biqede, tu nexweş ketî. Lê nekevin wê rewşê, paşê vegera hinek tiştan nîne." Dema wisa got, çavên hevalê Dogan jî vegeriyan ser rûyê min û got;

-Rengê te gelek hatiye guhertin, ma tu nexweş î?

-Na, ez başim. Tenê hinekê westiya me. Ji ber ev demek dirêje kar pir ketin ser hev, li her cihî pevçûn hebûn ez hinekê westiya me. Lê başim, tiştek neyênî nîne. Me biryara pêngavek nû da. Ji bo wê me li hemû eniyan civîn çêkir, pêşveçûnên heyîn ji hevalan re ragihandin.

-Hûn çûn cihên kelhan, we temaşeyî rewşa wan kir an ne?

-Erê, em îro çûn kelha şehîd Kendal. Destên we sax bin. Birastî gelek baş çêbûne. Dema min ew kelhe dît, aramiyek di hundirê min de peyda bû. Ez gelek keyfxweş bûm.

Dema min diaxivî çavên hevalê Dogan bi dezgaha derzîdanînê ya li ser destê min ket. Wekî ku tiştek seyr dîtibe got:

-Ka te digot ez başim. Lê diyare te derzî li xwe dane, hêj şûna wan li ser destê te ye.

Hevala Tekoşîn ket navberê û got:

-Îro piştî civînê rewşa hevala Meryem hinekê nebaş bû. Gêj dibû, enerjiya wê nemabû. Hevalê Doktor welat serûm dayê û paşê jî çend derzî dan ku em lê bixin. Doktor derman dane, emê bidinê.

Piştî hevala Tekoşîn rewş jê re got, wî û hevalê Mustafa li hev temaşe kirin. Li min vegeriya û got:

-Hevala Meryem, tu haydar nebî wê wekî çîroka hevalê Mustafa gotî bi te jî bê. Wê palehî di nîvî de bimîne. Vêca beriya tav li xwarina te bide bixwe, nehêle tu pê nexweş bikevî.

Li ser gotina wî em hemû kenîn û wan henekên wî û hevalê Mustafa dirêj kirin. Piştî germ û westandina rojê li cihek wisa hênik û xweş rûniştin wekî xelatekê bû ji bo me. Baya dihat li porê hevala Tekoşîn dida, her tayek pora wê bi aliyekê ve dida. Tekoşîn jî keyfxweş bû, bi henek û gotinên hevalan dikeni. Ji cihê em lê ambara navçeya Sirînê ya genim xuya dikir. Ew aqar hemû diketin pêşberî me. Li pêşiya me qonaxek dijwartir hebû, pêngava me yê bidaya destpêkirin ez didam hizirandin. Ew navçeya Sirînê jî di destên çeteyan de bû û gelek caran ji wê derê êrişî eniya hevalê Emîn dikirin û dixwestin di wê derê de bikevin bajêr. Piştî sohbet û henekên me, hevalan hinekê behsa karên xwe jî kir, di derbarê rewşa giştî de hinek pirs kirin û me nîqaş kir. Heta saetekê em li wê derê bi hev re man û paşê me xatirê xwe ji hev xwest, em derbasî bajêr bûn.

Dema ku em çûne bajêr, em destpêkê çûn serdana hevalên birîndar. Hevalên me yên birîndar li sê malan hatibûn bicihkirin. Hejmarek zêde hevalên me yên birîndar hebûn. Piranî hevalên me yên kevinbûn, di destpêka şer de heta giran birîndar bûyîn her di şer de

mabûn. Min piraniya hevalan nas dikir. Gelek hevalên fermandarên taxim, yekine û tabûran bûn. Dema em gihiştin ber mala hevalên birîndar, hevalan em dîtin û derketin ber derî. Hêj di derî de bi yek dengî gotin:

-Wey, hevala Meryem, te riya xwe winda kiriye? Wile divê em te nehewînin.

Lê hatin pêşiya me, me silav da hev. Min ji wan re got:

-Hevalno, hûn mafdarin ku min nehewînin. Ez lêborîna xwe dixwazim. Lê bawer bikin min heta niha wext nedîtiye ez bêm. Ji ber pir kar hebûn. Vêca niha derfet çêbû. Ger hûn min bihewînin ezê bêm, hûn min nehewînin jî ez çi bikim.

Ji bo neçûyîna serdana hevalên birîndar ti egerê ez mafdar dernedixistim. Ji ber kar û xebatekî me ya girîng jî eleqederbûn û mijûlbûna bi wan hevalan re bû. Lê ew demek dirêj bû ez cara yekê dihatim bajêr. Hevalê Zinar got:

-Xaltîkê, em çawa te nahewînin? Ka kerem bikin, derbasî hundir bibin.

Em derbasî hundir bûn, min hemû heval hembêz kirin û em rûniştin. Derdora me tijî heval bûn. Hinek ji wan ji çavên xwe, hinek ji dest û piyên xwe, hinek ji serê xwe û hinek gelek deverên laşê xwe birîndar bibûn. Yên piyên wan çûyîn, yên platîn di dest û piyên wan de heyîn û nedikarin bilivin hebûn. Piştî me rewşa hev pirsî û şûn

de, hevalan herî zêde pirsa hevalên li eniyên şer kirin. Rewşa cihên hatîn girtin, liv û tevgera çeteyan, rewşa siyasî û leşkerî ya pêvajoyê pirsîn. Tevî rewşa birînên pir hevalan giran bûn jî lê moral û coşa wan ez kefxweş kirim. Mereqa wan, pirsên wan, bêrîkirinên wan ên hevalan hestek pir cuda di min de da çêkirin. Min bi giştî di derbarê rewşa heyî de agahî dan hevalan, silavên hevalan ji wan re gotin. Hevalê Zinar ji milê xwe birîndar bibû. Çend şîşên hesin di milê wî re bûn. Li kêleka min rûniştibû. Piştî bi baldarî guhdarî tiştên min digotin kirin û şûn de, hevalê Zinar destê xwe nîşanî min da û got:

-Hevala Meryem, niha em hemû wekî radaran lê hatine. Tu şîşên di destê min de dibînî? Dema telefon nakişînin, heval dibêjin ka ji bo şebeke xweş bikişîne em telefonên xwe daynin ser destê te.

Bi gotina wî re dengê kenê hevalan bilind bû û li dîwarê odê deng veda. Hinek hevalan ji kena zikê xwe girtibûn. Ji ber piranî di heman rewşê de bûn, henekên wan jî li ser heman mijaran bûn. Diyar bû pir tinazên xwe li hev kirine. Li ser gotina hevalê Zinar ew henek û gotinên berê kirin jî hatibûn bîra wan û ji dil dikenîn. Paşê hevalê Mazlum jî piyê xwe nîşanî me kir. Hevalê Mazlum yekî xweş sohbet bû. Hêj kenê hevalan dewam dikir got:

-Wile karê hevalan bûye helberîna teoriyên nû. Di derbarê van hesinên laşê me de gelek tiştan dibêjin, Ji bo hesinên di piyê min de jî dibêjin, ‘hay jê hebe, bi evqas

hesin nabe tu zivistanê li cihek komî bimînî. Ji ber wê birûsk li wî cihî bixe.'

Di wê navberê de hevalekî ku min navê wî nedizanî axivî û got:

-Her wiha angaştên hevalan ên cuda jî hene. Li gorî hinek hevalan hevalê Mazlum bi van hesinan bi kû ve biçe wê hemû maknatizên derdor wî bikişînin. An jî ew hemûyan bikişîne xwe. Ez navê hinek hevalan nadim, lê wê rojê hevalê Mazlum şiyar dikirin û digotin, 'hinek mirov hene rakêşîner in. Te hay ji xwe hebe, ew maknatizên te bikişînin xwe bila ne hevalên jin bin.'

Bi gotina wî hevalî re rûyê hevalê Mazlum ji rengekê ket rengê din, sor û şîn bû ji şerma. Hevalê Mazlum li gel xwişk û birayekî xwe beşdarî me bibûn.  Dema hevalan dîtin hevalê Mazlum pir li ber xwe ket û şerm kir, hevalek din got:

-Hevalê Mazlum ne kadroyê pispor e. Gundiye, tişt nabe. Dibe ku ji keçekê jî hez bike, ma hûn çima wisa bi ser de diçin? Ka belaya xwe ji hevalê Mazlum vekin, nexwe wê ji şerma bihele.

Wan henek û kenê wan her diçû navgîn germ dikir. Min ji wan re got:

-Hevalno, ez bi vê moral û coşa we moral digirim. Tişt nabe, heval dizanin henek in. Ji bo wê ez bawer nakim ti

heval dilê xwe bihêle û dilgiraniyê bijî. Ne wisa hevalê Hogir?

Hevalê Hogir berpirsê wê mala birîndaran bû. Bi xwe jî beriya pêngava me ya dawiyê dest pê bike nû hatibû Kobaniyê û di şer de birîndar bibû. Lewma gelek xemgîn bibû ji wê birîndariya xwe ya lez. Min dixwest ew jî hinekê tevlî henek û sohbeta me bibe, lewma min jê pirsî bû. Hevalê Hogir dîsa bi awirên xwe yên şermîn berê xwe da min û got:

-Wile ez pir berxwe dikevim. Hêj min tiştek nekirî ez birîndar bûm.

-Ne wisa? Erê, hevalno, bi rastî hema hevalê Hogir hat gihişt Kobaniyê xwe avêt erdê. Hêj tiştek nekirî birîndar bû. Ma tu hinekê bihediriya, leza te çibû hevalê Hogir?

Hevalê Hogir bi henekên wisa pir bandor dibû. Rûyê wî sor bû, ji şerma gotin ji devê wî dernet. Lê bi rastî hevalekî wêrek û şerker bû. Bêşansiya wî ew bû, hema hêj nû hatî birîndar bû. Min dixwest wê derûniya xwe ji ser xwe bavêje. Lewma min henekek wisa pê kir. Paşê dema min rewşa wî dît, min got:

-Hevalê Hogir, ez henekan dikim. Di şer de tu nizanî tê di kîjan kêliyê de birîndar an şehîd bibî. Lê te şer kir, te li ser axa Kobaniyê kedek mezin da. Tekoşîna me tekoşînek piralî ye. Niha dibe ku hinek lebatên me kar nekin û em nekarin di şerê çekdarî de cih bigirin. Destên

te seqet bûne, lê ev ne astenge li pêşiya têkoşînê. Karên mirov bikarin bikin pir in. Tu di her qadê de dikarî gelek tiştên hêja bikî. Ev hêz û şiyana te heye. Baweriya min heta dawiyê bi wê hêza te heye.

Saet bibû danzdeyî şevê. Hevalan serpêhatî û çîrokên birîndarbûnên xwe ji me re digotin. Henek bi hev dikirin û belaya xwe li hev didan. Hevalên li hersê xaniyan jî piranî hatibûn wê derê. Hêj sohbeta me germ bû hevalê Doktor Welat ket hundir û got:

-Hevalno, me ne pirsî we xwarin xwariye?

-Erê, spas. Me xwarin xwariye.

Ya rast me xwarin nexwaribû. Lê qet nehatibû bîra me jî. Ji ber coş û qelebalixa hevalan, henek û sohbetên wan me hay ji birçîbûnê nemabû. Doktor Welat cardin got:

-Hevala Meryem. Ka rabin biçin bêhna xwe vedin. Tu sê roj din jî bimînî gotin û henekên hevalan naqedin. Tê bêjî qey çavên te bûne meqlaha Hecî Şukrî.

Meqlah êtûnên keviran bûn. Cihên tê de kevir dihatin hêran û dibûn kils bû. Li ser gotina hevalê Welat, dengê hevalan bilind bû û gotin:

-Hevalê Welat, hêj zû ye. Ka bihêle em nêrîn û rexneyên xwe ji hevalan re bêjin. Ev meheke nehatîn gel me. Bila guhdarî rexne û nêrinên me jî bên kirin.

Ez di wê kêliyê de hîn zêdetir bi xetayên me hesiyam. Hevalan bertekek hişk raber kirin li ber gotinên hevalê Welat. Min ji wan re got:

-Hevalno, soz ez êdî kengê derfet bibînim ez bêm serdana we. Hûn mafdarin, me di vî warî de peywira xwe ya hevaltiyê pêk ne aniye. Rexne û nêrînên we rastin.

Hemûyan bi hev re gotin, “înşalah hûnê bên.”

Em saetek din jî man, me guhdarî rexne û nêrînên hevalan kir. Min heta wê demê pêdiviya serdana birîndaran ewqas ferq nekiribû. Hevalan mereqa rewşa heyî dikirin, derûniya birîndariyê cuda bû. Her wiha êş û janên wan ên fizîkî jî hebûn. Ez di rêde li ser van tiştan dihizirîm. Em saet yekî şevê gihiştin navenda YPJ. Dema ku em çûn navendê hemû heval şaş man. Ji ber ew demek dirêj bû ez nehatibûm bajêr û min hevalên li wê derê nedîtibûn. Dema min heval dîtin ez zêde keyfxweş bûm. Hevalan jî em bi keyfxweşî pêşwazî kirin û me bi hesta bêrîkirinek kûr hev hembêz kir. Ji westanê êdî enerjî di laşê min de nemabû. Ez ji piya gêj dibûm, min diviya em zû biçin hundir û ez rûnim. Dema em derbasî hundir bûn, me rewşa hev pirsî û şûn de, hevala Agirî hat gel min. Ji ber destpêkê newêrabû bê gel min. Min pir caran rexne kiribû. Ji ber hevalekî hinekê qelew bû. Hevalek ji Kobaniyê bû, lê li Reqayê mezin bibû. Rojnamevan bû. Dema dikenî li ser lamên wê du çalên kûr çêdibûn. Kenê wê wisa şirîn û ji dil bû. Hevalekî ciwan bû. Piştî silav da û me hev hembêz kir, got:

-Hevala Meryem, tê bêjî qey tu xwarinê dixwî û ez pê qelew dibim. Ez çi bixwim dibe kilo. Lewma min got, divê ez hevala Meryem nebînim, wê min rexne bike.

-Rastî jî wisa ye hevala Agirî. Niha tu birîndar bibî wê kes nekare te ji wê derê xelas bike. Dema me hevala Newroz şand çalakiya destêkê hevalên xort gotin bila bi me re neyê. Lê wê got, 'bila heval li kîloyê min temaşe nekin û wisa biryar nedin. Ez ne li gorî kîloyên xwe me, laşê min sivik e, ez bilez tevdigerim.' Min jê re got, ez bi te bawerim. Vêca ji xwe kîlo nebaşin, lê ya girîng bawerî û rihê te ye.

Di ber gotinên min re dikenî û baldarî guhdarî min dikir. Ez hembêz kirim û got:

-Baweriya min bi min heye. Qet xeman nexwe. Lê hûn çima qet nehatin gel me?

-Ev demek bû me ji hevalan re civîn çêdikirin. Me rewşa heyî ji hevalan re radigihand, amadekariyên dema pêş dikirin. Ji ber wê wexta me çênebû. Lê niha hinekê karê me rûnişt, ez dikarim êdî carna bêm serdana we.

Saet bû yek û nîvê şevê, hevalan ji ber rewşa westana me dest bi amadekariyên xewê kirin. Ne dixwestin me zêdetir biwestînin. Beriya ku ez binivim, min dixwest ez tiştên wê rojê me dîtin û çavdêriyên xwe binivîsim. Ji ber heta wê rojê, kengê derfeta min çêbûya, min di rojnivîsa xwe de kurt be jî çend nîşe digirtin û dîroka wê rojê li

ser dinivîsî. Hevalên şehîd bibûn, birîndar dibûn, bûyerên rojane diqewimîn, bi giştî di derbarê rewşa wê rojê de min dinivîsî û wisa bi xew ve diçûm. Min ji hevala Tekoşîn lênûsa xwe xwest, got di maşînê de maye. Hema yekser çû derve, çenteyê lênûsa min tê de bû anî û da dest min. Min ji civîna sibê dest pê kir. Rexne û nirxandinên di civînê de hatin kirin, çûyîna xwe ya kelhê, hestên min li wê derê jiyan kirîn, axaftina xwe ya li gel hevalên wê derê. Paşê Ebû şêro, hevalê Dogan û hevalê Mustafa. Ji wir şûn de min beşek dirêj di derbarê hevalên birîndar de nivîsî. Rewşa wan giştî, nirxandin û nêrînên wan, navên wan û bi taybet rexneyên ku ji ber neçûyîna me li min kirîn, min di lênûsa xwe de nivîsin.

Min di pirtûkekê de xwendibû. Behsa leşkerên bênav dihat kirin. Lewma ev gotin her di hişê min de bû. Lewma cihê ez diçûmê min navên hevalên ku min berê nas nedikirin dipirsî û ew nav li gel xwe dinivîsîn. Di encamê de ew mirov di bin berpirsyartiya me de beşdarî şer dibûn. Di şer de fermanên me bicîh dianîn. Lewma dema ez diçûm cihekê û min hevalên ku navên wan nedizanîn didîtin, ez li ber xwe diketim. Min ji xwe şerm dikir. Diviya ew nebin leşkerên bênav. Em rêhevalên hevbûn, diviya em navên wan, çîrok û serpêhatiyên wan, êş û janên wan, xeyal û daxwazên wan ên pêşerojê bizanin. Piştî min dîroka wê rojê li dawiyê nivîsî û şûn de, min lênûsa xwe cardin kir çenteyê biçûk de û danî ber serê xwe.

Min serê xwe danî ser balgî û xwest ez binivim. Ji ber bedena min xwe bi hev ve nedigirt. Lê tevî ku min dixwest ez binivim jî xewa min nedihat, hişê min şiyar bû. Gelek tişt di serê min de diçûn û dihatin. Min wê rojê zêdetir kêmasî û nebesiyên xwe dîtibûn. Carna mirov wisa lê tê ku nizane ka kîjan aliyên mirov kêm in. Şerê ku demek dirêj dihat meşandin, hêlabû em di gelek tiştan de îhmalkariyê bikin. Min kesayeta xwe di ber çav re derbas kir. Dema mirov nekare bibe kesayetek piralî, xwe di hemû aliyan de rêxistin neke, ziraviyên hemû tiştan fêm neke û li gorî wê nêzîk nebe, dikeve kêmasiyên mezin. Yekalî dimîne, xwe bi tiştekê tenê ve mijûl dike. Rewşa min jî wisa bû. Min tiştên destpêk û dawî tevlîhev kiribûn. Min di rastiya kesayeta xwe de ev lewazî dît. Lewma ti egera ku ez neyêm serdana hevalên birîndar nekim nebû. Tiştên min wekî eger didan pêş, di rastiyê de lewaziya min a xwe baş nerêxistinkirinê bû. Ew civîn û serdanên me yên hevalan baş bibûn. Hiştibûn ez xwe baştir bibînim. Lewma tevî ku di aliyekê de ez pê êşiyabûm jî di aliyê din de min jê hêz girtibû. Ji ber pêdiviyên hevalan hebûn, bendewariyên wan hebûn. Daxwaz û rexneyên wan, nêrîn û nirxandinên wan hebûn. Ev ji bo me girîng bûn. Diviya em bibûyan rêhevalên baş, bikarin bi hemû hevalan re baxivin, wan guhdar bikin. Lê hêj gelek heval hebûn me bi wan re ne axivîbû, me nedîtibûn û guhdarî wan nekiribû.

Di ber wan hizran re gelek heval hatin bîra min. Gelek pêvajoyên zor ên me derbas kiribûn, bîranînên me di

hişê min re derbas dibûn. Dîtina hevalan, civînên me çêkirîn hinekê barê min sivik kiribû. Lê ji ber pêngava li pêşiya me, her wisa rewşa her diçû giran dibû fikar û hizrên min ên cuda jî hebûn. Wan jî wekî mijekê xwe berdabûn ser hişê min, hişê min bi xwe ve mijûl dikirin û nedihiştin ez bi xew ve biçim. Di ber wan hizran re ez nizanim heta kengê şiyar mam û çawa bi xew ve çûm.

## XEWNEK

Ez li ser wî girê êvarê ez, hevala Tekoşîn, hevalê Mustafa û Dogan çûyîn lê bûm. Agir bi derdora gir hemûyê ketibû, wekî pêlên deryayê agir bi ser gir de dihat xwar. Ez tam li naverasta gir bûm. Derdorê min hemû çek bûn. Çekên kesî, doçka, BKC, B-7, narincok û her awayê çekan. Birayê min Dilxwaz, li aliyê din ê agir destên xwe li min dihejand. Ew demek dirêj bû min birayê xwe Dilxwaz nedîtî. Min jî destên xwe jê re dihejand. Min dizanî ez li Kobaniyê me. Her wiha min dizanî birayê min şehide. Min ev dizanîn, lê min nedizanî çi karê Dilxwaz li wê derê heye. Hemû hevalên berê min li herêma Cizîrê dîtin û em bi hev re mayîn li wê derê bûn. Hevalê Erdal, hevalê Ferhat hemû hevalên min nas dikirin li wê derê bûn. Lê her diçû agir ber bi min ve dihat, ez di çemberekî agir de dimam. Ez bi vî alî de direvîm, di aliyê din de direvîm. Lê her der agir bû, ti riyên ez bikarim ji nav derkevim nebûn. Min dest davêt çeka xwe û gule li ser pêta agir direşandin. Lê deng ji hemû guleyan nedihat,

carna teqînek biçûk çê dibû û hew. Min bi guleyên çeka xwe dixwest ez wi agirî bitefînim. Lê qet ti bandor nedikir. Min gazî hevala Tekoşîn dikir û digot, “zû agir bîne, agir bîne ku em vî agirî bitefînin.” Têkoşîn jî dihat dest tavêt çekek ji wan û gule berdidan agir. Min wisa dizanî ku bi guleyan agir ditefe. Lê min ji Tekoşîn agir dixwest. Min bi qîr û hewar gazî hevalan dikir. Hemû hevalên me li wê derê bûn. Hevala Narîn jî dihat û çekek dikir destên xwe, wê jî wekî me fîşek li agir reşandin. Kî dihat dest tavêt çekekê û dixwest agir bitefîne. Lê em hemû diketin nava agir û agir her diçû geş dibû. Hevalê Erdal û Ferhat li pişt agir temaşeyî min dikirin. Min ji wan re digot, “heval, ka hûn jî werin alîkariya me. Werin ji bo em bikarin bitefînin. Hevalê Botan, ka were alîkariya me.” Hevala Nûcan dihat gel min û digot; “Hevala Meryem, heval dibêjin em nikarin bên alîkariya wan. Em nikarin agir derbas bikin, ji ber destûra me nîne em bên wî aliyê agir.” Min cardin gazî hevalê Botan dikir û digot “ka bêje wan, bila bên. Çima nayên alîkariya me? Kî tê dikare derbas bibe, çima ew nikarin, destûra çi?” Min bi hêrs li hevalê Ferhat temaşe dikir û digot, “erê, erê hevalê Ferhat. Te di rojên herî zehmet de em bi tenê nehiştin, tu di her şerî de hatî. Çima tu nikarî bê agir vemirînî?” Digot, “heval, em dixwazin bên. Lê destûr nayê dayîn, em ji ber wê nikarin bên.” Botan jî dihat lingê xwe nîşanî min dikir û digot, “hevalno, piyê min birîndar e. Ez nikarim bêm wî alî, nikarim agir derbas bikim.” Dema wisa digot şaş dimam. Heta ba di ber qirika min re diçû min dikir qîr û hewar û min digot,

“bila agir negihêje me. Binêrin, çember teng bû, nehêlin agir bigihêje me.” Min navê bi sedan heval digot, ji wan re digot werin agir vemirînin. Hevala Nûcan dihat gel min, destê xwe davêt çekekê. Çeka destê xwe tavêtê şewitî bû, çek ji destên wê diket û li erdê hûr dibû. “Roza, Roza were.” Wexta Roza dihat ber min dikeniya. Min digot, “Roza zû xwe bigihine min, em vî agirî bitefînin bila negihije cihê me. Çekên me, hemû tiştên me li vê derê ne. Cûdî, ka tu were doçkayê bikar bîne. Were beriya her tişt biçe em vî agirî bitefînin.” Agir nêzîk dibû, wekî bablîsokê pêt li hev dizivîrin û bi ser me de dihatin. Min her destên xwe dihejand, gazî hevalan dikir. Hevala Tekoşîn û hevala Rûken dihatin kêleka min, pişta xwe didan min û berê xwe didan agir. Dixwestin nehêlin agir pêş de bê. Min Xalê Îsmet didît û digot, “Xalo, bi agir venamire, ka ji me re avê bînin, avê bînin em bikarin vemirînin.” Xalê Îsmet destên xwe li pêşiya xwe radikir jor, di wateya çare nîne de serê xwe dihejand. Min dikir qîr û digot, “xalo ma çawa çêbû? Ka gazî hevalê Sefqan wan bikin, bila xwe zû bigihînin hewara me.” Min her wisa dikir qîr û ez bi vî alî, aliyê din de diçûm.

Wexta ku min wisa kiriye qîr heval bi dengê min rabibûn. Lê dema ez hatim ser hişê xwe ez ji piya bûm. Ez ji ser cihê xwe rabibûm, hatibûm navenga odê. Min destê xwe wekî çemberekê lê kiribû û ji piya min dikir qîr. Hevalên navendê hemû li wê derê kom bibûn. Hevalan xwe gihand min, bi hatina wan re ez li xwe hesîm. Min temaşeyî derdor kir, min dît agir tine. Ez di

hundirê odê de, bi hevalan re me. Hevalan pirsîn ka çi bûye. Min ji wan re got tişt nîne. Hevala Tekoşîn got,

-Hevala Meryem, em hemû bi qîrên te şiyarbûn, çawa tiştek nîne? Te xewn dît, çi bû?

-Na, ez başim, tiştek nîne. Tişt nabe, ka biçin ser cihên xwe binivin.

-Te kabûs dîtiye. Dema mirov li ser piştê binive wisa dibe.

Ez bi xewna min dîtibû pir bandor bibûm. Min hewl dida ez wate bidim tiştên min di xewna xwe de dîtin. Hevalan avek dan min, min av vexwar. Min temaşeyî derdora xwe kir, çeka min li ber serê min bû. Heval hemû li wê derê bûn û baş bûn. Min telefon ji hevala Tekoşîn xwest. Tekoşîn Got;

-Çi bû hevala Meryem.

-Tişt tine, ka ez pirsa hevalên li eniyan bikim. Saet çend e?

-Hevala Meryem, ji xwe bêtêl heye, tiştek hebûya wê agahiya me çêbibûya. Ma tiştek bûye tu ji me re nabêjî? Saet çar û nîv e.

Ez li hevala Zozan, Biharîn, hemû hevalên li eniyan geriyam. Min ji hemûyan rewş pirsî, hemûyan jî gotin tiştek nîne û rewşa me başe. Hevala Biharîn kenî û got; "Te xêre, vê sibê zû tu çima ji xew rabûyî? An te xewn dîtiye?" Min jê re got nexêr, xewa min nehat, min xwest ez rewşa hevalan bipirsim. Ez pir zêde ketim bin bandora xewna xwe. Min ji xwe re digot ewqas kes, tişt çawa di xewnekê de hatin gel hev. Birayê min şehîd e, ev demek dirêje min qet di xewna xwe de nedîtibû. Çima destên xwe li min dihejand? Lê min ji hevalan xwest ku biçin binivin. Piraniya hevalan çûn, çend hevalan nexwest biçin û li gel min man.

Her çiqas hevalên mayîn pirsa sedema rabûn û destê xwe kirina çember a min kirin jî min got tişt nîne û ez çûm min dest û rûyê xwe şûşt. Piştî min rûyê xwe şûşt û ez hatim hundir, min ronahî tefand û me cardin xwe dirêj kir. Lê xewa min revîbû, ez her li ser xewna xwe dihizirim. Min ji xwe re digot, ev çi bû, gelo xewn bû, an bi rastî wê tiştek gelek nebaş rû bide û ev pêhesîna wê bû? Sibê em rabûn, ji bo taştê em hatin gel hevalan. Pirsên hevalan bi dawî nebibûn. Her cardin mijara bi şev pirsîn û gotin, "Tu nexweşî, an te xewn dît?" Min cardin ji wan re got tişt nîne û min nexwest ez xewna xwe ji wan re bêjim. Min ji qehwê pir hez dikir. Hevala Agirî pir baş qehwe çêdikir. Dema hevala Tekoşîn ji bo çêkirina qehwê rabû ser xwe, hevala Agirî got, "ezê qehweyek xweş ji we re çêkim." Hevala Agirî qehwe çêkir, piştî me qehwa xwe vexwar min fincana qehwa xwe qulipand. Ev

fêrbûnek bû di min de. Min kengê qehwe vexwariya, min fincana xwe diqulipand. Paşê hevala Agirî xwest li fala min temaşe bike. Lê ji ber hêj hemû heval li wê derê bûn, min jê xwest ku piştî çûyîna hevalan a ser kar li fala min temaşe bike. Piştî hevalan sifre rakirin û ji bo kar ji hundir derketin, hevala Agirî temaşeyî fala min kir. Ji bandora xewna min dîtî, min jî dixwest yek li fala min temaşe bike. Ji ber min wate nedabû tiştên min dîtî û her di serê min de dizivirîn ew dîmen. Hevala Agirî fincana min girt, çend caran bi ber çavên xwe re bir û anî. Paşê li nav çavên min temaşe kir û got; "Em dikevin şerekî giran. Şerek wisa ye ku heta niha nehatiye dîtin." Min jê re got "hevala Agirî, ji xwe em di şer de ne, heta niha em qet ji şer derneketine. Ma ev çi awayê şiroveya falan e?" Agirî serê xwe hejand û got, "Na, na. Ev şer naşibe yên heta niha. Şerek giran û berfireh e. Herkesî destên xwe danîne ser tetîka çekan, bûne rêz. Tê bêjî qey govendek mezin e, mirovên şer dikin hemû li kêleka hev in. Bawer bikin, divê em xwe baş amade bikin, şerek gelek dijwar li pêşiya me heye." Ez kenîm, wekî ku bixwazim wê gotina wê vala derbixim min got, "yê nezane wê bêje qey tu xwawîzanî. Ji xwe her roj bi çekên giran êriş dikin, xelekek fireh li derdora Kobaniyê heval hene. Ev ne fal e, dahûrîna rewşa şer e." Bi gotina min re renge rûyê wê guherî, awirên wê li ser fincanê tûj bûn û got; "Bawer bike ev firtoneyeke. Hemû mirov di şer de ne. Ser serê hev, pişta hev mirov xuya dikin. Wê di vî şerî de pir heval şehîd bibin. Zêde term li erdê ne." Êdî her ku çû ez ji awayê vegotina wê şaş mam û min got, "hevala Agirî,

ka bese, te dinya bi serê me de anî xwar.” Agirî fincan zivirand aliyê din û got; “Bila hevala Tekoşîn şahida me be. Bawer bike ez di dawiya vî şerî de şehîd dibim. Binêre di vê derê de kesek kamera di destan de dikeve erdê. Kesek dirêj e. Hevala Tekoşîn jî birîndar dibe. Ji ezmanan gilolkên agir dibarin. Mirovên hev nas nakin kom dibin, qelebalixek zêde heye di fala te de.” Min got rejima Sûrî êrîşên hewayî li ser me çênekin? Min temaşeyî rûyê Agirî kir, bi rastî jî di rûyê wê de îfadeyekî bi gotinên xwe bawer dikir hebû. Min jê re got;

-Agirî, gotine ji falan bawer neke, lê bêfal jî nemîne. Veca te hewayek wisa çêkir, hindik maye ez bi fala te vekirî bawer bikim.

-Ez çi dibinim, ez wê dibêjim. Bawer bike tê xweziyê bi van rojan bînî. Pêvajoyek ewqas zor û zehmet li pêşiya me ye.

-Ê? Wekî din ti riyên me nînin?

-Ti rê li pêşiya te nînin. Tê her li vê derê bimînî. Tu nikarî ji Kobaniyê derbikevî.

-Hevala Agirî, me got dibe ku tu tiştên xweş ji me re bêjî, te yekcar qiyamet rakir û agir bi axê xist.

Hevala Agirî bêyî ku dengê xwe derxe fincana min girt û çû mutfaqê. Piştî fincan şûşt û hat, hema hêj ji piya got:

-Tu dizanî hevala Meryem, min pêwîstî bi şûştina vê fincanê dît. Ji ber pir tişt hebûn min nekarîn ez ji te re bêjim.

-Hevala Agirî, tu hevalekî ciwanî. Carek din van tiştan neke, falan veneke. Tiştên wisa nînin, serê xwe bi tiştên wisa re mijûl nekin. Diviya ez pê bandor bibim, lê tu pê bandor bûyî. Carna mirov bi tiştên dibêje bawer dike, lê rastî ne wisa ye.

-Na, xeman nexwe, ez pê bandor nabim. Te çima xewna xwe ya şevê din ji me re negot? Ez dizanim te xewn dît. Her hûn bi me re mijûl dibin, ka em jî hinekê bi te re mijûl bibin. Ma tu pir diwestî, çima wisa li te hat?

-Min kabûsek dît, tişt nebû. Havîne, germe. Hemû heval diwestin, ez jî wekî hemû hevalan. Ez ji hevalan zêdetir tiştekê nakim. Hûn hevalên jin ên birîndar dibînin, hûn diçin serdana wan?

-Erê, em duh çûbûn gel wan. Heval hemû başin. Hevala Hevjîn birîndar bûye, dixwaze te bibine.

-Ji xwe me duh gelek heval dîtin, hevalan got ew li cihek din in. Emê îro biçin serdana hevalên me nedîtin.

-Hevala Hevjîn û sê heval nêzîkî vê derê ne. Ezê biçim ji wan re bêjim hûn hatine, bila ew bên vê derê.

Piştî hevala Agirî ji bo gazîkirina hevalan çû û deh deqîqan şûn de, hevala Hevjîn hat hundir. Me silav da

hev, hev hembêz kir. Birînên wê baş bibûn, rewşa wê baş diyar bû. Temaşeyî min kir û got:

-An tu nexweşî, an jî gelek diwestî. Çi bi te hatiye? Rengê te gelek hatiye guhertin, tu zer bûyî.

-Na, ez başim, tenê çend rojeke em hinekê westiyan. Wekî din tişt nîne.



Me wisa heta nîv saetekê sohbet kir. Ya rast ji bandora xewna min dîtî û her wisa fala hevala Agirî vekirî bû. Min dikir nedikir, ew dîmenên wê xewnê ji pêş çavên min nediçûn. Lê min nedixwest ez ji hevala Hevjîn û hevalên din re jî bêjim ka ez çi hestê dijîm. Ya balkêş şiroveya hevala Agirî ya fala min bû. Min xewna xwe jê re negotibû, lê wê dizanî min xewn dîtiye. Her wiha tiştên min dîtin û şiroveya wê nêzîkî hev bûn. Wê ez zêdetir bandor kirim. Ew dîmen û gotin wekî semagiran di hişê min de dizivirîn. Hişê min bibû dikeya wan, her diçû

zivirandina wan bi pirsên di hişê min de çêdibûn leztir dibû.

Piştî çûyîna hevala Hevjîn bi deh deqîqeyan ez li ser rewşa xwe hizirim. Dawiyê wekî ku ez ji xwe aciz bibim, min ji xwe re got, “eybe, ev çiye te xwe wisa xistiye bin bandora wê xewnê? Ji xwe jiyana me hemû şere, dibe ku her kêliyê li cihekê tiştek biqewime. An jî tiştên te berê dîtin û jiyan kirîn, pêvajoyên derbas bûyîn be. Dibe ku bandora pêngava dawiyê, şehîdbûna hevalên di wê pêngavê de be. Bese, xwe komî ser hev bike.” Ji xwe di demên derbasbûyî de di kêliyên herî zehmet de Gelê Bakur hat hewara me. Bi sedan mirov xwe li têlan dan, wan hişt em li ser piyan bimînin, hêz dan berxwedana me. Dibe ku tiştên min dîtin encama van tomarên li hişê min bicih bûyîn be.

Lê tevî min ji xwe re gelek tişt digotin û min dixwest ez şiroveya xewna xwe bikim jî heta êvarê jî her di hişê min de bû. Êvarê min tiştên ku di xewna xwe de dîtibûn, her wisa gotinên hevala Agirî li lênûsa xwe nivîsin. Piştî me şîv xwar û şûn de me hinekê guhdarî nûçeyan kir. Li herêma Cizîrê şer hebû. Her wisa hewldana dagirkeriyê dewam dikir. Min ji xwe re got, dibe ku wateya xewna min ev be.

Paşê ji me civîna xwe ya rêveberiyê çêkir. Ez, hevala Peyman, Narîn, hevalê Sefqan, Masîro, Mehmûd tevlî civînê bûn. Me di civînê de encama civînên bi hevalan re hatîn kirin, rewşa pêvajoyê bi giştî nirxand. Me di vê

civînê de biryar girt ku em zêdetir giraniyê bidin hevalên birîndar. Em bikarin bi hemû hevalan re baxivin, guhdarî wan bikin û nêrîn û pêşniyarên wan bigirin. Her wiha me got, divê heval perwerde bibin. Dewreyek ya perwerdê ku berpirsê wan hevalê Diyar û hevala Newroz Cizîrê bû li Miştenûrê hebû. Me biryar girt em wan hevalan jî beşdarî pêvajoyê bikin, ji bo wê dewreya wan bê temamkirin. Ji bo dema pêş me plansaziya xwe diyar kir û paşê civîna xwe qedand.

## XEWNA RASTIYÊ

Piştî ez ji bajêr veqetiyam bi çar rojan şûn de, carek din min xewnek dît. Heval dihatin û digotin, "zû rabe ser xwe, xwe amade bike serok Apo hatiye. Li cihê xaniyê hikûmetê ye, li benda we ye. Hemû heval li wê derê kom bûne, gel kom bûye, hûn jî werin wê derê." Ez bi lez radibûm, min xwe amade dikir û ez diketim pey wê hevalê. Hevalek jin bû, lê min nas nedikir. Me berê xwe dida xaniyê hikûmetê. Ez digihiştim wê derê, min destpêkê Eyşê Efendî û Xalê Îsmet didîtin. Min ji wan re digot kî hatiye? Eyşê Efendî berê xwe dida min, bi rûyekî ken digot; "gelek kes hatine. Hevala Sozdar Avesta û hevalê Cemal li gel serokatiyê hatine. Her wiha gelek heval kom bûne." Kesek din hebû, zilam bû. Min nas nedikir, nameyek dida destên min û digot tê ji me re bixwînî. Min berê xwe dida derdor, piştî nîvro bû. Tav bilind bibû, wekî guriyekî agir li raserî hewşa avahiya

hikûmetê ya bajêr sekini bû. Lê mirovên di hewşê de li ser kursiyan rûniştîn aram bûn, çavên her kesî li Serokatiyê bûn. Serokatî li ser kursiyekê rûniştibû, diaxivî. Lê keyfa wî nexweş bû, wekî ji tiştekê aciz be diyar dikir. Di ber axaftina xwe re li derdor temaşe dikir. Li derdora wî xelekek ji jinan hebû. Piraniya wan hevalên kevin bûn, min nas dikirin. Min ji xwe re digot ev ewlekariya serokatiyê digirin. Ew avahiya hikûmetê ya bajêr, paşê bibû navenda me hevalên YPJ. Hewşek mezin û bi şînkatî bû. Min ji xwe re digot evqas mirov kengê hatin vê derê, min çawa nedîtin. Paşê min ji Eyşê Efendî dipirsî û digot, "ma çawa derbasî vê derê bûne, evqas heval çawa hatine?" Digot, "qey agahiya te nîne? Têlên sînor qetandine û wisa derbas bûne." Min temaşeyî aliyê din dikir, çavên min bi hevalê Cuma diket. Li kêleka wî Ahmet Turk û Aysel Tugluk hebûn. Lê min nedikarî ez xwe bigihînim gel wan. Qelebalixek mezin hebû. Dema min didît herkes kom bûye û ez nikarim xwe bigihînim gel serokatiyê, min ji Eyşê Efendî re digot, "we gelek nebaş kiriye. We çima berê de agahî neda min? Me ne merasimek pêşwaziyê kir, ne amadekariyek me çêbû." Li ser gotina min, hevalê Mehmûd li pişt min bersiv dida û digot, "agahiya me jî jê çênebû. Me berê bizaniya, me wê amadekarî bikiriya. Lê em jî paşê pê hesiyan, gotin têl derbas kirine, sînor rakirine û hatine. Dema em pê hesiyan ew hatibûn vê derê." Hevalê Masîro jî li kêleka wî bû, bi ser milê xwe yê çepê re min serê xwe zivirandibû aliyê wan û guhdar dikir. Lê çavên min li pêş bûn, min dixwest ez biçim ji serokatiyê re bêjim ka me

çima amadekarî nekiriye. Hevalê Masîro jî digot; “serokatî ji bo rewşa me di cih de bibîne bê agahî hatiye. Ev şêwaza serokatiyê ye. Diyare rexneyên wî hene, xwestiye bi xwe bê û rewşa me bibîne.” Hemû gelê Kobaniyê jî li wê derê bû. Min ji hevalê Cûdî re digot, “em çawa dikarin xwe bigihînin serokatiyê?” Hevalê Cûdî digot, “hevala Meryem, bawer bike min agahî da hevalê Dogan. Lê em negihiştin ti amadekariyê bikin, hema ji nişka ve hatin.”Ewqas mirov li wê derê kom bibûn, navbera me û serokatiyê dûr bû. Me dikir û nedikir, ji ber qelebalixa li pêşiya me, em nedigihiştin serokatiyê. Serokatiyê ji gel re di axivî. Min tenê gotinek dibihîst û digot; “Kar bikin.” Her min dixwest ez tiştên din jî bibihîsim, lê tenê wê peyvê di serê min de lê dixist, gotinên din nedihatin guhê min. Min ji hevalên derdora xwe dipirsî ka serokatî çi dibêje. Hemûyan digot, dibêje kar bikin. Tenê ew peyva wî ji gel me dihat bihîstin û min ji kê dipirsî heman bersiv didan min. Min digot, “serokatiyê ji gel re jî civînan çêke û baxive?” Hevalan digot, “ji xwe civîn ji gel re çêkirine, niha bi hevalan re daxive. Dibêje kar bikin, ma deng nayê te?” Min digot, “belê deng tê min, lê ez tenê peyva kar bikin dibihîsim.” Wê peyvê di serê min de wekî zengilekê deng vedida. Her diçû dengê serokatiyê di serê min de bilind dibû. Lê tenê ew peyv bû; “Kar bikin.”

Ez sibê zû bi wî dengî ji xew şiyar bûm. Demek dirêj bû min Rêber Apo di xewna xwe de nedîtibû. Min ji hevalan re got; “hevalno, min îşev Rêber Apo di xewna xwe de

dît. Lê min nedikarî ez xwe bigihînim wî. Di navbera me asteng hebûn. Min dizanî di axive û tiştekê dibêje. Lê dengê wî baş nedihat min, tenê peyvek wî di serê min de lê dixist. Digot kar bikin, kar bikin.

Ev xewna min jî bi qasî ya beriya çar rojan bibû sedema hizirinadin û mereqê ji min re. Her hevalekê nêrînek da. Hevalekê got, “ev xewna te girêdayî tekmîla serokatiyê ji heyeta hevdîtinan girtiye. Heyeta hatibû vê derê û vegeriya çû giravê û rewş ji serokatiyê re gotiye. Diyare serokatî hinek tiştan na ecibîne, kêmasiyan dibine û ji bo wê dibêje kar bikin.” Dayîka hevalekê jî hatibû gel me, ew jî li wê derê bû. Şiroveyên piraniya hevalan wisa bûn. Lê dayê şiroveyek ji ya hevalan cuda kir. Got; “keça min, ger te serokatî xemgîn dîtibe û gel li aliyekê heval li aliyekê mabin, wê qutbûnek di navbera we û gel de çêbe. We hay ji xwe hebe, yên dixwazin gel ji we dûr bixin û we tenê bihêlin gelek in. Xewna xwe ji rêzê nebîne, carna xewn ji tiştên tu dibînî zêdetir tiştan dibêje. Serokatiyê vala negotiye kar bikin, ji derveyî zêdetir karkirinê çareya we nîne. Serokatî dixwaze herkes li dora Kobaniyê bibe yek. Ji bo wê bang kir û gelê bakur hat hewara me. Lê diyare ku ev nebes e. Hêj karên mezintir dixwaze.” Rêber Apo di xewna min de nedişibî wêneyên xwe yê ji girava Îmraliyê herî dawî hatibûn. Ciwan bû, li ser xwe bû. Min berê li Şamê serokatî dîtibû û dîmenê wî yê di xewna min de dimenek ji wê demê bû. Dayê ji min pirsî û got:

-We merasim çênedikir?

-Nexêr, min xwe bi hevalan re aciz dikir ka çima agahî nedane min. Lê ez matmayî dimam, min digot evqas kes çawa derbasî vê derê bûne û agahiya min çênebûye. Hevalan digot di sînor re derbas bûne, têlên sînor rakirine.

-Tu di xewna xwe de çawa bûyî, keyfa te xweş bû an ne?

-Moralê min nebaş bû. Ji ber min deng hemû nedibihîst, yek jî kesî berê de agahî nedabûn min. Ez ji vê aciz bibûm.

-Xwedê xêr bike keça min. Destên xwedê li ser serê we bin. Hay ji xwe hebin, hev biparêzin. Xewna te qazida hinek tiştan e. Xewn carna tiştên çêbûyî, carna jî tiştên wê bibin dibêje. Vêca kîjan be jî xwedê xêr bike.

Paşê hevala Dîlan û hevalê Sefqan hatin gel me. Min xewna xwe ji wan re jî got, wan jî hinekê şiroveyên xwe gotin. Hevalê Sefqan kenî û got; “dibe ku em vê derê azad bikin û serokatî bê gel me. Ger em li gorî xewnên te biçin kar temam e. Xewna te talimata serokatiyê ye. Ya rast divê em gelek kar bikin, karên zortir li pêşiya me hene.” Min ji hevalan re got, “ez nizanim çima, lê ev demeke ez xewnên wisa seyr dibinim. Dibe ku ji ber hizirandinên min, fikarên min ên di derbarê pêvajoyê de bin. Ev demek dirêje ji ber şer û pevçûnan laşê me hemûyan westiyaye. Dibe ku derûniya min bi xewnan

xwe dide der. Hema bêje şeva ku ez xewnekê nebînim nîne. Ji xwe derfeta em xew bikin nîne, hema ez bi xew ve diçim dest bi dîtina xewnan dikim û piştî şiyar dibim jî nikarim binivim." Min ji xwe re got, gelek pirs û fikarên min hene. Dibe ku binhişê min xwe bi riya van xewnan dide der. Ya rast riyek ji berê jî zehmetir û girantir li pêşiya me bû. Her diçû şer dijwar dibû, şehîdbûn û birîndariyên çêdibûn em di aliyê şer de didan zorê. Hevalên nû tevlî dibûn wekî yên kevin nedikarîn şer bikin, Kobanî di çemberek giran de bû. Lewma diviya em pir kar bikin.

Mirovên demek dirêj di şer de dimînin, ji bo wan êdî hinek tişt asayî dibin. Nêzî mehekê bû DAÎŞ'ê bi taxtîkek nû dixwest me ji hev belav bike, hêza me bi westîne û di cihên lewazî dîtin de êriş bike. Lewma her roj bi dehan guleyên topan, tankan davêt, li her eniyê bi çekên giran li çeperên me dixist. Hevalan jê re digot senfoniya çekên giran. Bi rastî jî ewqas dengên teqînên cuda bi hev re dihatin, carna wekî senfoniyekê lê dihat û ev deng di hinek cihan de êdî ji hevalên me re asayî dihatin. Ji ber bibû senfoniyek bê navber. Bi vê taqtîkê dixwestin me ji taqet bixin û me bêzar bikin. Dixwestin di eniyên me yên şer de, di şervanan de sistbûnê çêkin.

Kelekela havînê bû. Bi lêxistina çekên giran re toz û dûkêl tevlî hêlma germ a axê dibû û ber bi ezmanan ve bilind dibû. Tevî vî şerê derûnî û yê armanca wî belavkirin, bêzarkirin û sistkirina hêza me bû jî em di

çeperên xwe de bûn. Me hewl dida em di ti eniyan de rê ji lewaziyan re venekin, hêza xwe şiyar û haydar bihêlin. Ji ber li kêleka vê taqtîka dimeşandin jî her du sê rojan di eniyekê de êriş dikirin û xwe li aliyekê diceribandin. Lê di her ceribandinê de li rastî şer û berxwedana hevalan dihatin û nedikarîn pêş ve bên.

Di germayê de tiştên em herî didan zorê tîbûn û bêxewî bû. Me çiqas av vedixwar jî em her kêliyê tîbûn û ava me vedixwar wekî xwihdan dirijiya ji bedena me. Mirov demdirêj dikare bê nan û xwarin bijî. Lê dema mirov bê av û bêxew dimîne, beden ji diweste, mirov ji taqet dikeve. Ji xwe ji ber germaya zêde ava me vedixwar jî germ bû. Lê carna ji bêxewî çavên me ji ber xwe ve diketin ser hev. Germ û ronahiya rojê wekî ku bistan bixe çavên me şewatek di çavên me de peyda dibû. Me hewl dida em baş pêşiya xwe bibînin, lê hêza me ya dîtinê jî ji bêxewiyê bandor dibû. Gelek caran dema min bi dûrbûnê li cihekê temaşe dikir, wekî ku mijek giran ketibe pêşiya çavên min, merceka pêşiya dûrbûnê li pêş çavên min şêlû dibû. Rewşa piraniya hevalên me yên di eniyan de wisa bû. Ji ber hêza me ya em bikarin cihên hevalan biguherin nebû, bi rojan heval di wan çeperan de diman. Te li çavên kîjan hevalê/î temaşe bikiriya bêxewiyê di çavên wan de dikir qîr û digot ez li vê derê me. Vê yekê di me de carna asta lêhûrbûnê jî lewaz dikir, me ji germa û bêxewiya zêde nedikarî em bihizirin jî. Ji ber wekî ku mejiyê te li ber germê heliyabe, serêşek giran dest pê dikir di me de. Westandin, bêxewî, germa û

tîbûna me jî ne dikarî me ji wan çeperan qut bike. Ji ber kêmasî û nebesiyek biçûk jî dikarî rê li pêşiya gelek xeteriyan veke. Pir caran heval di çeperan de bi xew ve diçûn. Tevî gurmegurma dengê çekan jî şiyarkirina hinek hevalên ciwan zehmet bû. Ji ber bi demê re fêrî wan dengan bibûn, ji wan re asayî dihatin. Lê ji bo hevalên fermandar rewş cuda bû. Her hevalek berpirs neçar bû hêza di bin fermandariya xwe de, her wiha enî û çeperên di bin berpirsyariya xwe de biparêze û şiyar tevbigere.

Me taqtîka dijmin dimeşand dizanî. Lewma li hember hewla dijmin a westandin û ji hevxistinê, me ji hevalan re digot di kêliyên pevçûn nebin de bila heval bi dorê xew bikin. Lê dema me di çeperan de serê xwe datanî cihekê û me xew dikir, hêj pênc deqîqe derbas nebûyîn, bi carêkê de dengê gurmîniyekê dihat, em ji cihê xwe vediciniqîn. An dengê vizîniya guleyên topekê dihat guhên me, em neçar dibûn şiyar bibin. Xewa me êdî li ser deqîqeyan bû. Ti kesî nedikarî ji pênc- deh deqîqeyê zêdetir li ser hev xew bike. Li kêleka vê dijwariya hanê jî nexweşiyek jêneger ku li bedena me xwe dida pêçandin hebû. Ev nexwşiya ku jêre digotin Tîfo bi awayek gelamperî avaniya dorpêç kiribû û hevalên me ji hal dixist. Di nav şer de li ser destên bi dehan hevalên me kelebekên derziyan hebûn.

DAÎŞ'ê di pêvajoya şerê du salan de gelek çek bi dest xistibûn. Me agahiyên cuda cuda digirtin. Her carê hinek

agahî dihatin û digot, “çete çekên ji rejîma Sûrî û Iraqê girtîn derbasî herêma Kobaniyê dikin. Ji hêza wan a Muhacirîn pêncsed- şeşsed kes hatine herêmê. Di ser sînorê Tirkiyê re pêncsed çete derbasî herêma Girêspî hatine kirin” û her wekî van gelek agahiyên din dihatin. Hinekan ji bo hêza ku derbasî herêmê bûyî digot, “ev ne ji bo Kobaniyê hatine, dixwazin biçin Helebê. Xelîfeyê wan hatiye dixwaze derbasî bajarê Reqayê bikin. Ev hêza Muhacirîn ji bo ewlekariya xelîfeyê wan hatiye. Çekên giran û hêza anîne ji bo parastina xelîfeyê wan e.” Di derdor de her çiqas agahiyên wisa hebûn jî ji derveyî me kesî bawer nedikir wê bi van çek û hêza anîn êrişî Kobaniyê bikin.  Gelek kesan digot, “Ma çawa dibe ji bo bajarekê evqas çek û hêz bînin? Ne bi vê hêzê û vi van çekên giran dikare welatek bê bidestxistin. Kobanî bajarek biçûk e, nabe evqas amadekarî ji bo Kobaniyê hatibin kirin.”

Di qonaxên şer de ti agahî ne ji rêzê û bêwate ne. Ji ber her hêza şer dike, ti agahiyê vala belav nake, her agahî xwedî armanc e. Ji agahiyên dihatin hinek jê ji bo şikandina vîn, bawerî û hêviya hêza me, gelê me bû. Hinek jî bi armanca xapandin, bala me kişandina ser cihên din bû. Lewma hem dihat gotin ku hêzek evqas mezin hatiye, hem jî digotin nexêr ne ji bo Kobaniyê, ji bo cihên din hatiye. Ji xwe şêwaza şerê DAÎŞ’ê ji destpêkê ve diyar bû. Beriya biçe cihekê tirs, xof belav dikir. Ji xwe armanca kuştinên komî, revandin û dîlgirtina jin, zarok, mirovên sivîl ên wekî li Şengalê,

serjêkirina mirovan bi dîmen girtin û belavkirin bi vê armancê bû. DAÎŞ di warê propagandayê de jêhatî bû. Amûrên propagandayê baş bikar tanî. Dixwest beriya biçe cihekê vîn, bawerî, hêviya kesên li wê derê ya bi serkeftina li hemberî xwe bişkîne. Lê ew du salbû li Rojava nekarîbûn vê bi ser bixin. Lewma bi hêzek mezintir, çekên giran ên ji dewleta Sûriyê û Iraqê anibûn berê xwe dabûn herêma Kobaniyê. Em di vê mijarê de zelal bûn. Ji ber agahiyên me ji kesên Kurd ku di nav çeteyan bi xwe de bûn digirtin hebûn. Ji Cerablûs, Girêspî kesên ku agahî didan me hebûn. An ku di warê îstîxbaratê de me jî li gorî derfetên xwe ji cihên cuda agahî digirtin.

Me berê hinek emîrên wan girtibûn, her wiha belge û agahiyên wan ketibûn destên me. Me ji van belge û kesên me dîl girtibûn jî dizanî amadekariyek baş kirine, dixwazin êrişî ser Kobaniyê bikin. Ji xwe me ji wan emîrên wan jî dizanî ku hêza wan a pêşengiya şer dike piranî biyanî ne. Ne Ereb in. Kesên di destên me de û emîrên wan bûn, piranî biyanîbûn. Ji welatên derveyî Iraq û Sûriyê hatibûn. Hinekan yek peyva Erebî jî nedizanîn. Hejmara wan kesên di destên me de jî zêde bû.

Berê li ser riya Helebê çeteyan komek ciwanên ji Kobaniyê dîl girtibûn. Kesên xwendekar bûn, ji bo biçin dibistanê çûbûn û di rê de hatibûn dîlgirtin. Her wiha ji herêma Cizîrê û giştî Rojava nêzî sêsed kesên sivîl wekî

dîl hatibûn girtin û li gel wan bûn. Di vê pêvajoyê de ji me re agahî şandin û gotin, "hûn emîrên me yên di destê xwe de berdin, em jî wê ciwan û kesên me dîl girtîn berdin." Ji xwe girtina koma ciwanên ji Kobaniyê çûbûn Helebê her di rojevê de bû. ENKS rolek neyênî dilîst û di nav gel de digot, "naxwazin zarokên we rizgar bikin. Ger ew emîrên DAÎŞ'ê berdin, dê ew jî zarokên we, xelkê sivîl berdin. Hûn zarokên xwe ji wan bixwazin, bila emîrên DAÎŞ'ê berdin ku ew jî zarokên xwe bidin we. Heta ew emîrên wan bernedin, zarokên we jî nayên berdan." Ya rast, ENKS wekî berdevkê çeteyan di axivî. Gel li hemberî me sor dikir û dixwest gel li dijî me rake serhildanê. Her di wê demê de amadekariyên wisa jî ji aliyê ENKS ve dihatin kirin. Her wiha bi devê Tirkiyê û Erdogan diaxivin û digot, "xwe neçarî van nekin. Zivistan tê, tiştek van nîne bidin we. Di embaran de genim nemaye, qût nîne, çek û hêza li dijî DAÎŞ'ê şer bikin nîne. Ev dixwazin we di tevkujiyan re derbas bikin, ev Apo yî ne. Guhdarî van nekin. Tirkiyê wargehên Afadê çêkirine, hûn dikarin biçin di wan wargehan de xwe ji kuştin û tinebûnê biparêzin. Tirkiyê deriyên xwe vekirine, destên dostaniyê dirêj dike."

Beriya hatina gelê Bakur, gelek kesên ji vê rola xayîntiyê ya ENKS bandor bibûn û ji Kobaniyê derketîn hebûn. Yên bi van gotinan bandor dibûn, diketin fikaran jî hebûn. Gelek ciwanên Kobaniyê yên dikarîn parastina axa xwe, welatê xwe, gelê xwe bikin ji Kobaniyê revîbûn, çûbûn derveyî welat. Bi taybet Tirkiye û başûrê Kurdistanê tijî

kesên wisa bibûn. Ev di aliyekê de trajediya Kurd bû. Di tevahiya dîrokê de li kêleka berxwedanên mezin xayîntiyê jî her rûyê xwe yê qirêj dabû nîşan û di roja me de jî bi pêşengiya partiyên wekî ENKS ev dihat kirin.

Lê yên her tişt didan pêş çav, tevî hemû zorî û zehmetiyan, bêderfetiyan jî mabûn, rûmet û nirxên ax û gelê xwe diparastin gelek bûn. Bi taybet piştî hatina gelê Bakur, çûyîn êdî bibû şermek mezin, yên mayîn şerm dikirin behsa derbara malbatên xwe jî bikin. Dema behs dikrin jî li ber xwe diketin. Gelek kesan digotin, “ger em ji birça bimirin jî em dernakevin, emê parastina ax û gelê xwe bikin.” Lê di rastiyê de di warê debara malbatan de zehmetî jî hebûn. Ji ber Kobanî di çemberê de bû. Ti çandinî, bazirganî, çûyîn û hatina ji derve nemabû. Lewma ber bi dawiya havînê kesên ku demek dirêj bû bi me re di çeperên şer de bûn, li dijî çeteyan şer dikirin jî di mijara debara malbatên xwe de bi fikar bûn. Bi dawîbûna meha Tebaxê re gelek kesên ku dihatin eniyên şer û berê bi me re li dijî çeteyan şer dikirin, digot, “heval, zivistan hat, divê em debara zarokên xwe bikin. Em mehek du mehan biçin derve kar bikin û ji zarokên xwe re tiştekê bînin wê baş be. Em dizanin şerek giran li pêşiya me ye, pêdivî bi me heye. Lê em neçarin malbatên xwe jî xwedî bikin. Mehek du meh bese ji bo me. Emê paşê cardin vegerin.”

Me rewşa gel ya ji ber ambargoya dihat jiyîn dizanî. Bêderfetî û zoriyên cidî hebûn. Me ji van kesan re destûr

dida û diçûn. Ji xwe berê jî yên ji Kobaniyê derketibûn piranî xort bûn. Ciwanên Kobaniyê yên lehengiyên mezin kirin, li ber xwe dan û heta kêliya dawiya jiyana xwe jî dest ji rûmet û nirxên xwe bernedan ne kêm bûn. Gelek hevalên me yên bi lehengî şer kiribûn û şehîd bibûn zarokên vê axê bûn. Dilsoz û girêdayî nirx û rûmetên gel û axa Kobaniyê bûn. Lê hejmarek girîng a xortên Kobaniyê jî ji Kobaniyê derketibûn. Bi hatina gel û ciwanên bakur re, li Kobaniyê pêl bi pêl tevlîbûna jinan çêbû. Jinên ciwan berê xwe didan navendên me û beşdarî YPJ dibûn. Ji ber piraniya kesên ciwan ên li Kobaniyê mabûn jin bûn, di hemû eniyan de hejmara jinan ji a zilaman zêdetir bû. Jinên Kurd piştî tevkujiya Şengalê berê xwe dabûn nav refên YPJ, dixwestin li hemberî hovîtiya çeteyan di eniyên berxwedanê de cih bigirin. Ji gelek malbatan komî tevlîbûn çêdibûn. Yên dihatin tevlî dibûn digotin, “divê em wekî jinên Şengalê lê neyên. Em dixwazin fêrî şer bibin, li hemberî van hovan şer bikin û rûmeta xwe biparêzin. Divê ew nekarin êdî jinên Kurd li bazarên koleyan bifiroşin.” Ji ber fermana li Şengalê pêk hatî û dîlketina jinên Kurd, ji aliyê çeteyan ve firotina wan a li bazarên koleyan, ji hinek malbatan sê-çar xwişk, dotmam û xizmên hev di carêkê de dihatin û beşdar dibûn. Gelek malbatan keçên xwe bi xwe dianîn û beşdar dikirin. Temenê hinek ji wan biçûk bû. Lê me cardin digot, hema qet nebe, bila fêrî bikaranîna çekan bibin ku bikarin xwe biparêzin. Jinên temenê wan mezin jî dihatin û digotin, “me fêrî

bikaranîna çekan bikin. Em dixwazin bizanin xwe çawa biparêzin.”

Dîmenên Şengalê di hişê her mirovek Kurd, bi taybet di hişê her jinek Kurd de gelek zindî bûn. Lewma hema bêje hemû baregehên me tijî dibûn, tevlîbûnek gelek zêde hebû. Me jî biryar dabû ku em ti jinê ji mafê wê yê xweparastinê dûr negirin, li gorî şiyan û hêza wan, wan perwerde û amade bikin. Her hevalekê bi hesta ku divê Şengal dubare nebe, bi hemû hêza xwe ve bi wan jinên ciwan re mijûl dibû, perwerdeya wan didan. Hinek hebûn ji ber pir biçûk bûn, an jî berevajî wê dayîkbûn û temenê wan mezin bû me nedikarî em bişînin eniyên şer. Lê me cardin perwerdeya çekan dida wan, qet nebe ger pêwîst bike bikarin çekan bikar bînin, xwe li hemberî êrişan biparêzin. Di vê demê de me giranî da perwerdekarina jinên tevlî dibûn. Ji xwe piştî perwerdeya wan diqediya, ew jî li eniyên şer dihatin bicihkirin. Lewma bajarê Kobaniyê yê berê bi feodaltiya xwe dihat nasîn, bibû bajarê jinan û jinên Kurd di çeperên herî pêş de di eniyên şer de cih girtibûn.

Ti tişt bi qasî şer mirovan zû na sewîne. Şer xwedî hêzek wisa ye. Mirovên ku tevlî şer dibin, di qonaxên şer ên dijwar de cih digirin ji temenê xwe zûtir mezin dibin. Nirx û qîmeta jiyanê zêdetir dizanin û hesta berpirsyartiyê di wan de zû pêş dikeve. Ew demek bû me li derdora Kobaniyê hemûyê amadekarî dikirin. Me xendek kolabûn, li hinek cihan kelhe çêkiribûn. Di hemû

eniyên me de jî dewreyên perwerderdeyên leşkerî hebûn. Ji ber bi sedan ciwan ji bakurê Kurdistanê hatibûn. Ji van ciwanan yek jê hevalê Bahoz bû. Ew sê meh bû tevlî bûyî. Kesek xwedakar bû, ji zanîngehê beşdar bibû. Kesek zerîn, bejna wî zirav û dirêj bû. Dema dikeni mirov digot qey roj di çavên wî yên zer de diçe ava. Çavên wî dibiriqîn, paşê her kenê wî zêde dibû mêjangên wî yên dirêj dihatin ser hev û çavên wî biçûk dibûn. Bi qasî xweşikbûna xwe ya gewdeyî, her wisa xwedî hest, raman û pîvanên xweşik bû. Piştî du mehan perwerde dîtibû, bibû fermandarê taximê û wî bi xwe perwerdeya hevalên nû beşdar dibûn dida.

Dibêjin ti kesayetên çar çar nînin. Lê hinek kes hene mirov ji derveyî vê peyvê nizane çawa bîne ziman. Hevalê Bahoz wekî fermandarekî bi salane di şer de be pijiyabû. Kesê bawer nedikir sê meh berê beşdarî me bûye. Kesek bi qasî xwezayîbûna xwe giran, bi pîvan û zana bû. Di hemû aliyê xwe de mînaka milîtaniya Apo yî bû. Di perwerdê de kedek mezin dida, bêyî ku qet bêje ez westiyam, piştî saetên perwerdê jî yek bi yek bi hevalan re mijûl dibû. Bi wan re nîqaş dikir û di mijarên kêm diman de bi wan re dibû alîkar. Bi ziraviya hunermendekê nêzîkî şer û jiyanê dibû. Şêwaza spor dayîna wî jî mînak bû. Di her karê dikir de te digot qey nîgarkêşek pispor e û karên dikir li ser rûyê jiyanê dibiriqîn. Xwedî şêweyekî axaftinê yê rakêşîner bû, hevalan jê hez dikir û li dora wî kom dibûn. Bi zanebûna xwe, bi hesta berpirsyartiya xwe, sekna xwe ya giran û

bipîvan ji temenê xwe gelek mezintir bû. Dema hevalên kevin hevalê Bahoz didîtin, digotin “divê mirov cardin beşdarî vê rêxistinê bibe ku bikare bibe şervanê/a hevalê Bahoz.” Ji ber fermandarek bêqusûr bû. Kes nebû li gel hevalê Bahoz ji jiyana şervantiyê, felsefeya jiyana azad û baweriya bi serkeftinê bawer nebe. Ji ber bi qasî hêza îqnakirinê ya gotinên xwe, di sekn û kiryarên xwe de jî bi şiyan û kêrhatî bû.

Wekî hevalê Bahoz bi sedan ciwanên Kurd ji Bakurê Kurdistanê hatibûn. Lê xwe ayîdî wê axê didîtin. Dilnizim, fedakar, wêrek û dilsozên gelê xwe, hevalên xwe bûn. Her çiqas sînor di navbera Kurdan de hatibûn danîn jî Kurd di warê hizrî, giyanî û çandî de ji hev qut nebibûn. Wan mirovên ciwan û wêrek bi serkeftinê bawer dikirin. Bi rihê serkeftinê beşdarî şer û jiyanê dibûn. Ji xwe şer di jiyanê de tên qezenckirin an jî windakirin. Sedema lehengî û berxwedana di şer de dihat raberkirin, çand, exlak û pîvanên jiyana van mirovan bû. Ji ber wan ji mirovatiyê hez dikirin. Ji axa xwe, gelê xwe hez dikirin. Bi heval û hogirên xwe bawer bûn. Ew lêgerînvanên tiştên xweşik û bedew bûn. Şagirtên hizr û felsefeya azad, şervanên hêviyê û afirandina jiyana azad bûn. Bi vê ewqas bawerbûn ku mirovên ew nas dikirin dibûn evîndarên sekn û pîvanên wan.

Lewma kesê herî dihat hezkirin û bi pîvanên xwe mînaka hevaltiya rast bû, hevalê Emîn Erkendî piştî dewreyek perwerdê qediya hat gel min û got:

-Hevala Meryem, tu hevalê Bahoz nas dikî?

-Erê, ez nas dikim.

-Heval dibêjin nû ye. Lê ez bawer nakim kesekî nû tevlî me bibe wisa be. Tê bêjî qey deh salan di çiya de jiyan kiriye, di şer de pijiyaye. Ji xwe ez carna li jiyana wî temaşe dikim, mirov dibêje qey demek dirêje fermandar e û bi mirovan re mijûl dibe.

-Na, hevalekî nû ye. Ev sê mehe beşdarî me bûye. Lê wekî te gotî hevalekî jêhatî û dilovan e.

-Wile hinek mirov hene hema di dîtina yekê de keyfa te jê re tê, tu jê hez dikî. Ev heval jî wisa ye.

Hêj me wisa nîqaş dikir, çavên min bi hevalê Bahoz ket. Li pêşiya hevalan bû, ji bo merasima sondxwarinê amadekariyên sazûmaniyê dikirin. Piştî karê xwe qedand, hat gel me. Hevalê Emîn destê xwe li milê wî da û got, “dest xweş, te pir baş heval perwerde kirin. Te rastî bivê ev bîst sale ez vî karî dikim, lê ez bi qasî te perwerdê xweş nadim.” Dema hevalê Emîn wisa got, hevalê Bahoz li ber xwe ket, hinarkên rûyê wî yê spî sor bûn ji şerma. Xwihdanek hûrik eniya wî ya fireh girt, destê xwe avêt eniya xwe, di ber xwe de kenî û got, “heval Emîn, ez dizanim tu ji bo morala min xweş be van

tiştan dibêjî. Ez nagihêjim te. Ev cara yekê ye ez van karan dikim, lewma ez hinekê bi heyecan im. Dibe ku kêmasî hebin, lê emê bi demê re hîn bibin." Min jî got, "na, wile tu pir baş didî hevalê Bahoz. Ev ne pesindariye, lê bi rastî te heval matmayî hiştine. Kes bawer nake tu nû beşdar bûyî." Li ser gotina min hevalê Diyar Bagok got, "hûn fermandarên pêşerojê ne hevalê Bahoz. Heval rast dibêjin, pêdiviya vî gelî bi fermandarên wekî te heye. Divê mirov wekî çavên xwe temaşeyî we bike. Hûn ciwanên hêviyê ne. Heta yên wekî we hebin, wê ti hêz nekarin doza gelê me, berxwedana me bişkînin. Em dema tiştekê dikin, em di kesayeta we de ji bo pêşeroja gel, civaka Kurd dikin. Vêca hûn jî wê vê kevneşopiyê derbasî nifşên li pişt xwe bikin. Hevalên wekî te berendamên vê şopdariyê ne. Erka we girane, lê bi qasî giraniya xwe nirxdar û pîroz e." Her çû heval kom bûn, her yekî tiştek got. Min jî ji hevalan re got, "hevalno, çavên we hemûyan li ser hevalê Bahoz e. Çavan lê nexin, hûn wisa bikin ezê ji hevalê Bahoz re nivîştiyekê bidim çêkirin ku çavên we lê bandor nekin."

Hatina wan hevalan a ji bakur û her wiha hatina komek hevalên ji bo rêveberiyê henaseyek bi me da kişandin. Dema hevalê Bahoz wan dewreya xwe qedandin, ji bo dewreyek din dest bi amadekariyan kirin. Piştî merasima sondxwarinê û vesaziya hevalan, hevalên berpirsên eniyan hatin ku hêza biçin eniyên wan bigirin. Hevalê Kendal û hevala Zozan jî hatin. Herdu berpirsên

eniya Firatê bûn. Dema çavên min bi hatina hevalan ket, ez li hevala Narîn vegeriyam û min got;

-Hevala Narîn, ez îro çiqas aram bûm. Îro wekî ku barek ji ser pişta min rabe, ez xwe aram hîs dikim. Niha li hemû eniyan rêveberiyên me temam bûn. Her wiha çeperên me yên li eniyan tijî bûn.

-Wile, ez jî xwe wisa hîs dikim. Me bi hatina van hevalan henaseyek girt. Em pir westiyan, demek dirêje şer heyî. Lê hatina van hevalan moralek mezin da me, me westandina xwe ji bîr kir.

-Ger dijmin çend rojek din êriş nekiriya û me bikariya em van hevalan hinek din perwerde bikin, di qada pratîkî de hinek din bipijin, wê ti hêz bi wan nekare. Baweriya min bi van hevalan heye. Hem wêrek, hem jî ciwan û enerjîk in.

Me roja dawiya Tebaxê dewreyên perwerdê qedandin û heval belavî eniyên şer bûn. Piştî heval li eniyan belav bûn û şûn de em jî çûn cihên xwe. Roja duyê meha Îlonê çeteyan êrişî eniya Ebû Sirê kirin. Xwe di wê eniyê de ceribandin, xwestin pêş de bên. Lê hevalan derbeyek mezin li wan xist, piştî şerê rojekê neçar bûn ku pişt ve vekişin. Piştî êrişa çeteyan a li ser vê eniyê şikest, bi çekên giran cardin çeperên me yên hemû eniyan dan ber guleyan. Paşê ev awayê êrişên wan bûn rûtîn, her roj bi rêzê êrişî gundekê dikirin. Roja dî êrişî gundê Leqleqê kirin. Gundê Leqleq gundekî Ereban bû. Diket navbera

eniya Rojhilat û Ebû Sirê. Her wiha di heman rojê de êrişî gundê Korik kirin. Li gundê Korik gihiştin heta ber çeperên hevalan. Di wan gundan de tabûra hevala Xemlîn hebû. Hevala Xemlîn fermandarek şaraza û şiyar bû. Beriya çete êrişî ser wan bikin, wan agahî ji derdor girtibûn. Ji bo wê çend komên kemînê li pêşiya çeteyan bi cih kiribûn. Dema çeteyan êriş kiribû, hiştibûn ku nêzî çeperên wan bibin, hevalên di kemînan de jî ji pişt ve li wan xistibûn û derbeyek giran li çeteyan dabûn. Lewma li ser van hersê cihan jî nekarîn encam bigirin û di êrişan de şikestin.

Di vê demê de bûyerek dilêş û xirap hat jiyîn. Di eniya Ebû Sirê de hêzekî Siwar El Reqa hebû. Ew diketin navbera gundên Ereban. Yekî meha Îlonê çeteyan êrişek li ser wan pêk anîn. Lê awayê êrişê nedişibî êrişên li ser eniyên me dikirin. Di nav koma Ebû Îsa, an ku Siwarên Reqa de hinek kes hebûn ku malbatên wan li Reqayê ji aliyê DAÎŞ'ê ve hatibûn dîlgirtin. Lewma çete bi wan kesan re ketibûn têkiliyê, ji wan xwestibûn berdêla sax mayîna malbatên xwe xayîntiyê li hevalên xwe bikin û alîkariyê bidin wan. Dema êriş dikin, ew kesên ku bi wan re ketine hevkariyê hişedariyê digirin. Komên wan di xaniyan de ne û ji derveyî hişedaran kes ji derve namîne. Dema hinek hişedarên din ên haya wan ji hevkariya hevalên wan ên bi çeteyan re nîne dibêjin, "hûn kîne?" Hevalên wan ên pêşengiya çeteyan dikin bersiv didin û dibêjin, "em in." Ew jî dengê hevalên xwe nas dikin, dengê xwe li wan nakin û çete wisa derbasî nav komên

di hundirê xaniyan de dibin. Di wê êrişê de di encama xayîntiya navxweyî nêzî sih kesan ji wê komê şehîd xistin. Her wiha gelek kesên birîndar, an jî sax ketin dest birin Girêspî. Ji xwe çeteyan biryar dabûn koma Ebû Îsa, Siwar El Reqa tine bikin. Di meydana Girêspî de gel kom kiribûn, serê wan kesên dîl hatibûn girtin birîbûn û dîmenên wan di bi riya Înternetê belav kiribûn. Di wan dîmenan de gef li gelê Ereb û gelê herêmê giştî dihat xwarin û digotin, "me fitoya kuştin û tinekirina kafiran girtiye. Em hêzekî cîhadê ne. Em bi vê hêza xwe bixwazin kî derê bigirin, li ser kîjan hêzê plan çêkin em dikarin wan deran bigirin û wê hêzê tine bikin. Hûn dizanin me Tepka girt. Me balefirxaneya Tepka girt. Me Eyn El Îsa girt. Me cihê togaya Eyn El Îsa girt. Dê êdî bostek axa misilmanan jî di destên kafiran de nemîne. Wê hemû cîhan bikeve bin ala DAÎŞ' de û di bin vê alê de bijî. Me heta niha serkeftinên mezin bi dest xistin. Heta ala me li her cihî neyê daliqandin û em axa alema îslam ji kafiran paqij nekin, wê şerê me berdewam be. Yên ku vê fitoya hatî dayîn nepejirînin û li dijî derbikevin wê bên kuştin. Wekî van mirovan serê wan dê di meydanan de bên birîn. Bila ev ji we hemûyan re bibe îbret. Xayîntiyê nekin, nexwe wê koka we jî bê qelandin. Xwe ji bo cîhadê amade bikin, emê hemû kafiran wekî van xayînan serjê bikin. Ev fermana xwedê ye. Yên vê fermanê pêk neynin û beşdarî cîhadê nebin mafên wan ên jiyanê nîne. An jî yên li gel kafiran cih bigirin wê kevilên wan bên gurandin, serê wan û hemû malbata wan bên birîn."

Di heman dîmenan de navên gelek hevalên me yên di rêveberiya Rojava û Kobaniyê de rêz kiribûn. Gef dixwarin û digotin emê wan jî bînin Girêspî û serê hemûyan jê bikin. Ji xwe em Kurd wekî kafiran bi nav dikirin, ji şervanên Kurdan re jî digotin “Xenzîr” an ku beraz. Bi vî awayî hem dixwestin gelê herêmê bidin tirsandin û serweriya xwe li ser wan çêkin, hem jî zagonên xwe bi riya tirs û xofê di ser civakê de bidin sepandin û beşdarbûna mirovan a nava xwe bidin çêkirin. Ji xwe berê jî hinek hevalên me yên li Serê Kaniyê şehîd bibûn termên wan anîbûn Girêspî, gel kom kiribûn û li pêş çavên gel termên hevalên me bi maşînan ve kiribûn û di erdê re xirikandibûn. Her wiha gef li jinan xwaribûn ku yên li gorî zagonên şerîatê nejîn jî dê wan serjê bikin, termên wan bi maşînan ve bikin û li kolanan bixirikînin.

Rêbaza şerê derûnî ya DAÎŞ wisa bû. Mirovên dîl digirtin dibirin nav bajaran û hinek ji wan bi stûnên elektirîkên cadan ve girê didan. Bi rojan ew mirov bi wan stûnan ve girêdayî dihiştin. Gazî jin, zarok û xelkê wê derê dikirin û ew kes bi wan didan temaşe kirin. Paşê bi keviran didan recimkirin. Her wiha pêş çavên wan serê mirovan dibirîn, an jî kesên li gorî zagonên wan kêmasî bikiriyan bi qamçiyan dihatin sezakirin. Meydanên bajaran kiribûn meydanên serjêkirin, êşkence û gurandina laşê mirovan. Her wiha dema ew mirov bi qamçiyan seza dikirin, bi lêdana her qamçiyekê re dengê girî, qîr û hewara ji wan kesan bilind dibû tirsek mezin dixist dilê

xelkê bajêr. Dixwestin bi navê mirovatiyê ti tiştî di mirovan de nehêlin. Her zarokek, mirovek civakê bikin qesabek serjêkirina mirovan, gurandina laşê mirovan. Jiyan veguhartibûn dojehekê ji bo xelkê herêmê. Ji ber li gorî felsefeya wan, mirovên ku zagonên wan nedipejirandin kafir bûn. Kuştin, lêdan, tecawîz, talan, serjêkirin û êşkenceya bi kafiran ew li cihana din dikirin biheştî. Li gorî wan ev cîhan xapînok bû, ya girîng jiyana li cihana din bû, an ku piştî mirina fizîkî bû. Kî çiqas di vê cîhanê de zêdetir kafir bikuje, xelata wî li cihana din ewqas mezin e. Ji xwe di hemû şeran de li gel şervanên wan mifte û kevçiyek hebûn. Li gorî baweriya wan, yên ku dihatin kuştin wê li cihana din bi wê miftê deriyê biheşstê vekiriyan, bi wî kefçî jî li gel pêxemberê Îslamê HZ, Mihemed xwarina destpêkê bixwariyan.

DAÎŞ’ê ev tişt li her gund û bajarê di bin desthilatiya xwe de pêk tanîn. Li Minbicê meydana Tehrîr hebû. An ku meydana Şoreşê. Di dema rejîma Baas heyî de, opozîsyona Sûriyê bi giştî li vê meydanê meş û mîting dikirin. Ew meydan piştî girtina bajêr a ji aliyê wan ve bibû meydana serjêkirina mirovan. An ku selexaneya serjêkirin û gurandina mirovan. Li Cerablûs û cihên din jî heman tişt dihatin kirin. Ji xwe çûyîn û hatina xelkê ya derve qedexe kiribûn. Rengên cilan ji derveyî reş qedexe bûn. Hemû kuçe û kolan, riyên cadeyan bi reş hatibûn boyaxkirin. Cigarekêşan, derketina jinan a derve, çayxane, kafeterya û hemû tiştên girêdayî jiyana civakî qedexe kiribûn.

Di bajar, navçe û gundên Ereban ên derdorê de her ji bo gel li dijî me derxin propaganda dikirin. Kurd wekî pêşengên kafiriyê didan nîşan û fitoya kuştina Kurdan mîna xêra herî mezine belav dikirin. Bi taybet kuştina endamên YPG-YPJ wekî xêra herî mezin didîtin û dixwestin xelkê derdor beşdarî êrişên li ser me bikin. Lê gund û kesên ji eşîrên ereban ên berê li wê derê gelek caran xwe ceribandibûn, di gelek şeran de bi çeteyan re hatibûn û hejamerek mezin kuştî dabûn. Her wiha me bangawazî kiribû ku em hêza xwe li gel a Ereban, gelên derdor bikin yek û ji bo vê hewldanên me çêbibûn. Ji ber yên zilm û zor diditin ne tenê Kurd bûn. Gelên herêmê hemû hedefa êriş û zilma wan bûn. Lê ji ber çeteyan dizanî gelê herêmê hev nas dikin, agahiyan didin hev û ev agahî digihêjin me jî li ser gel terorek wisa dijwar dimeşandin. Digotin ên ku agahiyan bidin YPG-YPJ wê serê wan jî wisa bên jêkirin.

Ji aliyekê ve ji gel re wisa digotin û dixwestin gel bi tirsînin, ji aliyê din ve jî dixwestin tiştên dibêjin bigihêjin me û lewma ji gel re behsa ka dê çawa êrişî ser Kobaniyê bikin dikirin. Ji xelkê derdor re gotibûn, “şêst emîrên me di destên wan de ne. Li Kobaniyê tên girtin. Emê bihêz û çekên herî giran êrişî ser wan bikin. Emê destpêkê biçin emîrên xwe ji dest wan derxin. Emê paşê hemû berazên li Kobaniyê bikujin, yên sax bimînin jî bînin li van meydanan serjê bikin. Ji xwe me zilamên wan hemû kuştine, tenê jin şer dikin. Ji xwe hêza jinan a li hemberî me şer bikin nîne, em carêkê êrişek giran bikin wê hemû

bitirsin û radestî me bibin.” Ev jî rêbazek şerê taybet û propagandayê bû. Dixwestin agahiyên wisa belav bibin, gel bitirse, hêza me ya şer bêbawer bikeve.

Lê rastî berevajî van angaştan bû. Raste piraniya hêza me ya şer jin bûn. Lê giyana wan ji jinên Kurd diqetiya. Jinên Kurd wêrektiya xwe di hemû şeran de nîşanî wan dabûn. Dema çavên wan bi hevalên jin diketin rih di wan de nedima. Ji xwe li gorî baweriya wan bi destên jinan hatina kuştin, dihat wateya ku nikarin biçin biheştê. Lewma dengê hevalên jin jî ew ditirsandin. Lewma ev di nav hevalên me yên zilam de jî bibû pêkenokek. Pir caran di kêliyên germ ên şer de jî bi bêtêlan ji hevalên jin ên sekvanbûn re bi henekî digotin, “Hevalno, ka hûn werin van çeteyan bikujin, bila necin biheştê.” DAÎŞ’ê jin wekî mirov nedihesibandin. Ji xwe di fitoya didan de ji şervanên xwe re digotin, “Hûn biçin cihekê û wê derê bigirin mafê we ye hûn ji xwe re cariyan bînin. Ew xenîmeta şer in. Hûn dikarin wê kêliyê jî bikin jina xwe, an jî wekî cariye û koleya xwe bi xwe re bînin. Ji ber hûn şervanin, hûn di cîhadê de ne. Xwedê ev yek ji we re helal kiriye. Jin jî wekî mal û mil, zêr û pere li we helal e, xenîmeta şer e.” Lewma ji ber van henekên hevalên xort ez aciz dibûm. Min gelek caran dilê hevalan hişt û got, “Ez carek din vê henekê nebihîsim. Hûn carna wekî çeteyan dihizirin. Ma hûn nizanin ew ji jinên Kurd ewqas ditirsin ku ji xwe re hêcetek wisa peyda kirine? Ez bawerim wê demê bi hezaran ji wan çûne dojehê. Ji ber her carê bi dehan kes ji wan bi destên şervanên YPJ tên

kuştin. Ger bi qederê bawer dikin bila gazindan nekin. Diyare ku qedera wan ji aliyê xwedayê wan ve wisa hatiye nivîsin. An ku di qedera wan de bi destên jinên Kurd çûyîna dojehê li eniya wan hatiye nivîsin."

Ji xwe li ser propaganda û tirs û xofa çeteyan dixwest pê gel bandor bike, her roj agahiyên cuda dihatin belavkirin. Dîmenên çekên xwe yên giran ku li derdora Kobaniyê bi cih kiribûn didan nîşan. Li ser torên civakî bi dehan dîmenên ku têde serûsonda kuştina me dixwarin belav dikirin. Bi van amûran dixwestin wêrektiya gel û şervanên Kobaniyê bişkînin û tirsê belav bikin.

Di vê demê de ji aliyê dewleta Tirk ve jî dest bi planên nû hat kirin. Ji kesên ku ji bo kar çûbûn Tirkiyê û bakurê Kurdistanê re digotin, "xwe ji nav tevkujiyan xelas bikin. Werin me ji we re cihên ewle çêkirine. Afad demek dirêje ji bo we kar dike. Bajêr vale bikin, xwe vala nedin kuştin. Hûn çi bikin jî wê Kobanî bikeve û DAÎŞ wê bikeve Kobaniyê." Di aliyekê de ev gotin bi riya telefon û înternetan bi gel didan gotin û xelkê çûyîn wan deran agahî didan xizm û kesên xwe, ji aliyê din ve jî mayînên li ser sînor li hinek cihan paqij dikirin û rê ji hatina çeteyan a Kobaniyê re asan dikirin. Ji xwe berê jî cihê tirba Sileyman Şah ê xwe kiribûn cihê bazirganiya bi çeteyan re. Hem di wê xetê re çete dixistin Rojava, hem jî çek û alavên pêwîst ji wan re tanîn wê derê û fînasmana şer dikirin. Her wiha li wê derê bazirganî bi çeteyan re

dihat kirin. Di rastiyê de ev xayîntiya Erdogan a li hember dîroka Tirkiyê, pîroziyên gelê Tirk bû. Berpirs û payebilindên çeteyan diçûn wê derê, dewleta Tirk ew bi helîkopterên xwe ji wê derê dibirin Tirkiyê û di cihên herî lûks de ew bi cih dikirin. Plan û hesabên dagirkirina Kobaniyê bi hev re dikirin.

Ji xwe beriya êrişa mezin a li ser Kobaniyê dest pê bike, serokê artêşa wan Hulusî Akar hat Rihayê. Li wê derê plan û taxtîka ku dê di şerê Kobaniyê de bimeşînin çavdêrî kir. Hemû biryar û planên dagirkirina Kobaniyê li Tirkiyê dihatin kirin û navenda şer jî wekî bajarê Rihayê hatibû destnîşankirin. Her wiha ji wê derê bi riya ENKS dixwestin vîna gel a berxwedanê bişkînin. ENKS wekî berdevkê Tirkiyê yê li Rojava bû û hevkariya wan a bi Tirkiyê û raste rast nebe bi çeteyan re dihat kirin jî îxaneta herî mezin bû. Xayîntî li hember ax, welat, gel, nirx û rûmeta gelê xwe, her wiha keda dihat dayîn û xwîna zarokên wê axê dikirin. Di vê demê de bi awayekî eşkere hevkariya ENKS ya bi dewleta Tirk re derketibû holê û bêyî veşêre berdevkiya dewleta Tirk dikir. Xwe nûnerên hişmendiya dagirker a li ser Rojava didîtin.

## RONDIKÊN ŞENGALÊ Û DENGÊ KOLANÊN KOBANÎ

Li gorî baweriya min şer ji bo ti civakên mirovan ên asayî ne bijartekek bi dile, neçariyek e. Dibe ku ev hizra min ji ber Kurdbûna min be. Li gorî çîrok û serpêhatiyên dîroka me, wekî gelê Kurd me ti carî êrişî gel û civakek dî nekiriye. Lê kengê şer hatiye ber deriyê me û em neçarî şer bûne jî me ji herkesî baştir şer kiriye û dîroka me tijî bûye ji destan û serpêhatiyên lehengî û çelengiyên şer. Ji serdema Medan û vir ve hemû çîrokên me yên şer û şervaniyê xwe sipartine yek tiştî; Azadiya mirovan. Xweşikbûn û başiya hizrî, giyanî û kiryarî bûye felsefeya jiyana civaka me û beriya zarokên Kurd fêrî gotinan bibin ev felsefe bi wan tê hînkirin. Nîşane û sembolên me yên pîroz hemû tijî başî û ronahî, azadî û nirxdariya jiyana zindiyan in. Lê tevî vê têgihiştina me ya jiyanê jî em neçar mane şer bikin û dîroka me yek ji dîrokên tijî serpêhatiyên tevkujî talan û derbederiyê ne. Her wiha tijî berxwedan, xweragirî û lehengiyên mezin e.

Piştî qirkrina gelê Kurd ê Êzidî li Şengalê, devê birînên kûr ên li hişê me cardin vebûn. Dengê tevkujiyên Agirî, Geliyê Zîlan, Dêrsim û Helepçe jî tevlî giriyê Şengalê bûn û ji çavên jin û zarokên Kobanî bariya ser heriya Kobaniyê. Heriya Kobaniyê ya bi xwîn, xwihdan û rondikên çavan her şil bû, vê carê bi rondikên Şengalê şîna demboriya bi jan a gelê xwe digirt û pirsa çarenûsa

pêşerojê ji singa axa Kobanî bilind dibû û xwe li koçe û kolanan dida. Ew pirs li ser zimanê jinên Kobanî dibû çîrok û digotin;



“Ma wê ev çarenûsa reş qet neyê guhertin? Qey ev dinya, mirovatî kore ku deng û hewara me Kurdan nabihîse û kes bi hewara me ve nayê?” Paşê dest bi çîrokên Şengaliyan dihatin kirin û digotin, “de were bila di yek rojê de tofan li te rabe. Tofan hemû jiyana te bide ber xwe, ax û warê te, mal û milkê te, zarok û eyalên te hemûyan li ber xwe bibe. Tofane, tofanekî girane xwişkê. Hovên niha naşibin ejderha û dêwên di çîrokan de dihatin behskirin. Bi hezaran mirov di yek rojê de kuştin. Bi sedan mirov serjê kirin. Jin, zarok, ciwan, pîr û kal revandin.” Dengê li kolana dî bilind dibû digot, “xwezî li

kuştinê, xwezî li mirinê. Lê nexwezî ketina destê hovan. Tecawîza li zarokan tê kirin. Ne xwezî li jinên li bazaran tên firotin.  Xwişka min, ma ji tecawîzê mezintir mirin heye li ser rûyê cîhanê? Xwedêyê xwedêyo, qey Kurdan çi guneh kiribû ku te ev çarenûsa reş li eniya me nivîsî. Di be ku ji ber vê çarenûsa kambax be ku ev kesên êrîşî me dikin jî cil reşin?" Paşê dengên dî tevlî wî dengî dibûn û digotin, "ji xwe çarenûsa li eniya me Kurdan reşe. Lê qeda û bela li bextê xayîntiyê bikeve. Ma we di televîzyonan de nedît ew tirtirên mêran çawa revîn û Şengal û gelê Şengalê bi tenê hiştin. De bila xwedê pişta xayînan, tirsonekan bişkîne. Ma qey bi qasî keçikên me yên ciwan jî nedikarîn şer bikin û Şengal terkî qirkirinê kirin? Qey rûyê van xayîntiyan ji çarenûsa me Kurdan spîtir e?"

Her ku ev pirs û deng bilind dibûn dengên dî tevlî dibûn. Li kolanê dengê sehm û tirsê jî hebû, dengê şîn û girî, dengê bêçaretiyê jî. Lê hewara çareseriyê û dengê lêgerîna ji çarenûsa Şengalê rizgarbûnê jî tevlî van dengan dibû û digotin, "Ewrên reş û tarî bi ser me ve jî tên. Ma kî dizane wê ev hov sibe heman tiştî neynin serê me û emê li bazaran neyên firotin. Ne ti dewlet xwe li ber wan nagirin. Ma we nedît bajarê Musil çawa girtin? Em kulmek mirovin û derdora me girtiye. Xwarin û vexwarina me jî nemaye. Ne sibe bibe zivistan kulmek mazot nîne em zarokên xwe pê germ bikin. Qey ji dinyayê heta niha ji derveyî Kurdan û ciwanên Kurdistanê û şervanên me kê piştgiriya me kiriye? Em

ketine çemberekî agir û her roj şer e. Her roj zarokên me tên kuştin û birîndar dibin. Ma hejmara van ciwanan wê têra heta kengê bike? Ne roja em şehîdan nedin nîne. Ma dê moriyên heriya Kobaniyê çekan rakin? Ne ew jî çek rakin li hember vê tofanê têrê nakin. Roja deh ji wan neyên kuştin nîne. Lê roja dî sed kes tên şûna wan. Tê bêjî qey ji axê dizên û bûne lêhî bi ser me de tên." Ma pirs hebûn û kolan bê bersiv dima? Bersivên kolanê jî xurtbûn û digotin, "ji bêxweyîtî wisa li Şengalê hat. Lê artêşek me heye û ciwanên me şer dikin. Erê têrê nake, lê karê me çiye? Em jî tevlî wan bibin. Em jî fêrî şer û fêrî çekan bibin. Ji ber ger jinên Şengalê bi çek bûyan, dikarîn şer bikin û qet nebe dikarîn nekevin dest hovan û ger bihatiya xwestin xwe bikuştiyan. Qey di dîroka me de tiştên wisa kêm in? Ji bo nekevin destên neyaran jinan xwe di teht û zinaran de, di piran de, di dîwarên kelhan de avêtine. Pêwîste em dersan ji van derxin. Em hemû jinên Kobanî fêrî şer bibin. Şer hatiye ber deriyên me. Em neçarin ji bo parastina rûmeta xwe şer bikin. Qey keyfa kê ji şer re tê ne hov û dirinde bin wekî DAÎŞÊ? Em keçên xwe yên mayîn jî rêkin. Bila ew jî fêrî xweparastinê bibin. Deriyê çareseriyê ev e. Ma em hindik girîne heta niha? Lê girî bese. Divê em ji bo parastina xwe bikevin tevgerê." Û ji aliyê din ve ev deng dihat erêkirin û digotin, "erê wile raste. Ma we berê keça Eyşê nas nedikir? Nedikarî ji tirsa bab û birayên xwe derkeve ber derî. Lê niha sed mêr di bin fermana wê de şer dikin. Lê Fatê? Fatê beriya tevlî YPJ bibe şerm dikir silav bide xelkê. Lê niha dema derdikeve û daxive tê bêjî

qey Cemîl Horo strana Memê Alan dibêje.” Dengê kalan tevlî van dengan dibûn û digotin, “Kobanî ne Kobaniya berê ye. Kurdistan ne ew Kurdistana jin kedîkirî ya li malê ye. Bi salane keç û jinên me şer dikin. Bi çelengi şer dikin û dibin fermandar, bi lehengî şehîd dibin. Lê dest ji rûmet û doza xwe bernadin. Bila bi sedan mêrên tirsonek qurbana tiliyên wan ên li ser tetîkên çekan bibin. Ma êdî mirov dikare bihejmêre? Bûne bi hezaran û di her eniyê de niha li çeperên şer in. Nexêr, ew dema digotin, ‘jin dara şikestiye, cihê jinê li nava malê ye, jin xizmetkara bab û bira û mêrê xwe ye derbas bû. Na, na. Jin şerker in û jinên Kurd ev bi salane me ji hovan diparêzin. Wile hevjîna min heftê salî ye û ew jî bixwaze biçe şer bila biçe. Apo vala jin tevlî şer nekir. Xwedê bi destê wî ve bîne. Bi saya wî me korbûna xwe dît û xeta wî em ji nezanabûna berê xelas kirin. Camêrî şîrhelale. Ta ji wî milê dinyayê jî dizane ji sedî şêstê parastinê Kobaniyê ji aliyê jinan ve tê kirin. Dixwaze cihên din jî wekî Kobaniyê bin û silavan ji wan re dişîne. Ez qurbana binê piyê wî bibim, hegî ev serfirazî dayî me. Wileh, dema keçên me bi wan rext û çekên xwe, bi kofî û poşiyên xwe di televîzyonên xelkê de derdikevin wekî ku ez dibim ciwanekî çardesalî keyfa min tê. Qey serbilindiyekî ji vê mezintir heye? Qey heçiyê wijdan pêre hebe dikare qehremaniya Hêlîn Amed, Zelal, Rengîn, Berfîn, Avesta, Jîn, Serhildan, Sakîne, Sozdar, Derya, Zînê, Peyman, Nejbîr, Newroz, Agirî û Rûken û bi sedan çavbelek û karxezalên wekî wan ji bîr bike babo?”

Ne yên wan ji bîr bikin ji aliyê xwedê ve jî nayên hewandin.”

Van dengên kolanê yên têkel û bingeha xwe dispartin pirsa ‘ka wê çi ji me bê’ di jiyana me ya rojane de jî bandorên mezin dikir. Gelê me ji ber ezmûnên dîrokî ketibû nava hewldanên lêgerînê. Lê wekî wan jî gotî Kobanî wekî giravekê ketibû çemberek dijwar û dengê me wekî ku dihat xwestin ji derve nedihat bihîstin. Bi gotina pêşiyên me divê me bawerî nedaya bi siwariya hespên xelkê û me çareya xwe bi xwe bi afirandiya. Vê hewla lêgerînan hiştibû bi dehan malbat destên keçên xwe bigirin û berê xwe bidin navendên me yên YPJ. Hejmara hêza me ya jin her ku diçû zêde dibû. Ji derveyî beşdarbûnên nav hêza leşkerî serlêdanên jinên malan çêdibûn. Dixwestin ku perwerdeya çekan ji wan re bê dayîn. Her jina serlêdana fêrbûna çekan dikir, egera daxwaza xwe dispart rewşa jinên Şengalê. Di derbarê pêşeroja xwe de kûr û dirêj fikarên xwe dianîn ziman û ji bo wekî jinên Şengalê bi wan neyê bi israr dixwestin perwerdeya çekan ji wan re bê dayîn. Her wiha gelek endamên me yên ji gel êdî ji ber daxwaza hevjînên xwe digotin, “heval em nikarin çeka xwe ji malê bînin. Hevjînên me ditirsin û dibêjin me fêrî bikarkanîna çekan bikin û çekan li malê bihêlin. Her wiha carna ji ber tirsa wan di çûyîna peywiran de em zehmetiyê dijîn. Zarok û jinin, pirsên wan, tirs û fikarên wan hene. Lewma divê çareseriyek ji vê rewşê re bê dîtin.” Hema her roj malbat dihatin navendên me. Daxwaza sereke perwerdekirina

jinan bû. Gelek zilaman keçên xwe, xwişkên xwe, hinekan hevjîna xwe dianîn û digotin bila beşdarî YPJ bibin. Ji ber digotin, ‘ger jinên Şengalê bizaniyan xwe biparêzin, çek bikar bînin wisa bi wan nedihat.” Her çiqas vê nêzîkatiya wan xwe dispart têgiha kevneşop a ‘namûsê’ jî di aliyê din de bandora jinên şervan yên li qadê jî di têgihiştin û nêzîkatiya wan de xwedî bandorek mezin bû. Ji ber gelek hevalên jin li qadê bi lehengî şer kiribûn û li nav civakê bibûn nîşan û sembol. Gel hev nas dikir û guhertina jinên Kobanî di pêvajoya şoreşê de jiyan kirîn bi çavên xwe didîtin. Lewma navê wan lehengan li zarokên nû ji dayîk dibûn dihatin kirin. Di axaftin û sohbetên her malbatekê de hema bêje her roj serpêhatî û behsa lehengî, jêhatin û guhertina jinan dihat kirin. Êdî gelek eşîr û malbatan xwe bi navên keçên xwe yên di şoreşê de navbang bûyîn didan nasîn û digotin, malbat an jî eşîra filan hevala şehîd û filan fermandara YPJ. Ji ber di Kobanî de ji sedî şêstê hêza me ya di çeperan de jin bûn. Jinên Kurd bi vînek mezin li ber xwe didan. Berxwedan û sekna raber dikirin di warê erênî de bandor li civakê dikir û dihişt civak bi wan serbilind bibe. Berê bi gotina jinekê kirin jî di nav civaka Kurd de bi peyva ‘serjiniktiyê’ dihat biçûkxistin. Lê êdî di bin fermandariya jinekê de şerkirin û hevaltiya bi jinan re wekî pîvana pêşketin û şoreşgeriyê, wekî pîvana welatparêzî û nûjeniyê bû.

Bêguman, ev têgihiştin wisa hêsan çênebibû. Bi berdêla xwîn û keda bi sedan hevalên me yên jin çê bibû. Di

civaka me ya Kurd de hema bêje her mêr wekî şervan tê hesibandin û şerkeriya mêr tiştek ji rêzê dihat dîtin. Ji ber tevî îsyan û şoreşên li Kurdistanê çêbûyîn, di dîrokê de gelek caran şerên malbatî û eşîrî jî rû dabûn. Hema endamên her eşîr û malbatê yên mêr bi wan çîrokên bab û kalên xwe re mezin dibûn û ew jî fêrî şer û çekan dibûn. Her wiha di fêrbûna şerkirina mêran de rola qaçaxiya li ser sînoran û çanda nêçîrvaniyê jî hebû. Lê ji ber şerkirina jinên Kurd berê tenê di serpêhatiyên dîrokî an şoreşa PKK'ê de bihîstibûn û raste rast bi çavên xwe nedîtibûn. Heta şoreşa Rojava û çalak beşdariya jinên Kurd jî şerkeriya jinên Kurd zêde ji nêzîk ve nedîtibûn. Pir caran tiştên di derbarê jinan de dihatin gotin wekî pesindariyê dihesibandin. Lewma herî zêde mêran behsa lehengî, şerkerî û wêrektiya jinên Kurd a di şer de dikir. Her hevalekî ji eniyên şer diçû serdana malbata xwe û herî zêde behsa şerkeriya jinan dikir. Êdî di civakê de bi sedan, hezaran çîrok û serpêhatiyên şerkerî û lehengiya jinan dihatin behskirin. Van hemûyan bi xwe re di civakê de lênêrînek nû, çandek nû, bawerî û hêviyek nû di derbarê jinan de afirandibû.

Piştî fermana Şengalê me biryar da em di nav gel de dest bi rêzecivînan bikin. Ji ber ezmûna li Şengalê gelek tişt ji me re digotin. Di serî de civakek ku divê bawerî bide hêza xwe û xwe bi xwe rêxistin bike pêwîst bû. Me di civînan de nirxandina şoreşa Rojava û pratika heta wê rojê, sekn û xweragiriya şervanên Kurd û asta xweparastinê, amadekariyên ji bo pêşerojê wekî rojev

diyar kirin û li ser vî bingehî ji gel re civînên berfireh hatin kirin. Di civînan de guhdarî gel hat kirin. Nêrîn û pêşniyarên gel hatin girtin. Ev têgihiştin û pîvanek şêwaza rêveberiyê ya Rêber Apo bû. Ger tu di derbarê rewşa heyî de gel agahdar nekî û gel beşdarî nîqaş û biryaran nekî, nirx nedî nêrîn û daxwazên gel û gel beşdarî qonaxan nekî, tu nikarî di ti pêngava nû de bi ser bikevî. Ji ber ev şoreşa gel bûn. Barê şoreşê li ser pişta gel bû. Diviya gel di pêvajoya biryaran de xwedî gotin bûya.

Di aliyê din de ji ber beşdarbûna zêde ya jinan jî me biryarên nû girtin. Bi rastî di têkoşîn, berxwedan, vîn, bawerî û fedakariyê de, di dilsozî û barê şoreşê yê pratik rakirinê de pirsgirêka hevalên me yên jin nebû. Hemû dilsoz û girêdayî doz û têkoşînê bûn. Lê di warê zanabûna dîrokî û civakî, rêxistinî û bîrdozî de lewaziyên wan hebûn. Lewma dilsozî û girêdana wan tenê hestyarî bû. Lewma me biryar da em hemû hêza xwe ya jin perwerde bikin. Di van perwedeyan de me sê xalên sereke destnîşan kirin. Yek dîroka Kurdistanê û dîroka şoreşên Kurdan, rewşa sosyolojîk a civaka Kurd û di şoreşan de rola jinên Kurd. Wekî xala dawiyê jî şoreşa Rojava û di şoreşê de rola jinan. Her wiha di encama lêgerîn û nîqaşên hevbeş ên hevalên di rêveberiya jin de em gihiştin biryara ku em êdî yekîneyên serbixwe yên hevalên jin ava bikin. Ji bo pêbaweriya bi xwe zêde bibe me biryar da em di warê pratika şer de jî hinek gavên nû bidin destpêkirin. Van biryar û pêşdîtinên me xwe

dispart ezmûnên berê û her wiha me demek bû hêza xwe çavdêrî dikir. Me hewl dida em pirsgirêkên xwe yên sereke tespit bikin û li gorî wê bigihêjin hinek çareseriyan. Berê hinek ezmûnên me wekî jin çêbibûn. Hevalan çalakiyên serbixwe kiribûn. Di hinek çalakiyan de hejmarek zêde çek rakiribûn. Bi taybet hevala Hêlin di wî warî de kesek divê bê bibîranîn e. Ji xwe beriya hevala Hêlîn şehîd bibe nîqaşek me wisa çêbibû ku em giraniyê bidin van tiştan. Me biryar da komên sekvaniyê yên hevalên jin bi serê xwe êdî biçin çalakiyan. Her wiha komên sabotajê çalakiyên serbixwe bikin. Di aliyê din de me biryar girt em qursên ajovaniya maşînan vekin û hevalên me yên jin di eniyên şer de û karûbarên rojane de maşînên xwe bi xwe bajon. Ji ber çekên me yên giran li ser maşînan bûn û pir caran ji ber heval ne serwerbûn tirsa dê qeza û windahî çêbin peyda dibû. Lewma gelek caran hevalên berpirsên eniyan ên jin digotin, "hevala Meryem, filan heval ajovana me ye, tam fêr nebûye. Ger em hevalekî xurt jî bidin gel başe, nexwe dibe ku qeza çêbin." Lê her carê me ev daxwaz red dikir û digot, "bila hevalên jin fêr bibin û karên xwe bi xwe bikin. Lê ezmûn û şarezayiya wan têrê nedikir. Lewma qursên hînbûna ajovaniyê pêwîstiyek sereke bûn.

Bêguman, me xeter jî dabûn pêş çav. Dibe ku em di ezmûnên destpêkê de hinek windayiyan jî bidin. Lê ev ji bo me êdî neçariyek bû û em neçarbûn ezmûna xwe ya şer wekî jin bihêz bikin. Wekî min di destpêkê de jî got, em neçarî şer bûn. Ti tişt ji bo me ne ji rêzê bû û em ji bo

keyfa xwe neçûbûn wan çeperan û me şer nedikir. Diviya em xwe di parastina xwe û şerê xweparastinê de xurt bikin. Ji ber hêj me hemûyan şîna Şengalê digirt. Qêrînên jinên Şengalê, azar û janên wan di dilê me de deng vedidan. Lewma zorî û zehmetiyên me dijîn û dibe ku em bijîn diviya li pêşiya pêşketin, xwe xurtkirin û ezmûn girtina me nebûyan asteng. Lewma me komek hevalên jin ji bo ajovaniyê bijartin û ew şandin fêrgehan. Di şer de carna hevalên me yên ajovan jî şehîd dibûn û maşînên me dihatin armanckirin. Lewma pêdiviya me bi hejmarekî zêde jî hebû. Bila wekî tedbîr hevalên me yên vî karî baş dizanin hebin. Ji xwe li gel hevalên me yên jin ên berpirsên eniyan hemûyan hevalên jin ajovanî dikirin. Dema hevalên rêveber bawerî didan wan xurt dibûn û ji wê baweriyê hêz digirtin û baştir xwe pêş dixistin. Lê dema bêbawerî bihatiya dîtin, vê yekê derûniya hevalan xirap dikir û bandorên neyênî çêdikir. Mînaka vê ya berçav jî hevaleke me ya li gel hevala Evîn bû. Ji ber nebawerbûna hevala Evîn a bi wê, di dawiyê de hewla xwe kuştinê da û xwe birîndar kir. Lewma diviya ne tenê di warê hestyarî de tevlîbûn bê çêkirin. Diviya tevlîbûn bibin tevlîbûnên bîrdozî, siyasî û xwe bispêrin ezmûnên dîrokî. Me bi biryara perwerdê ev kiribû armanc. Lê ji ber em hêzek leşkerî bûn û hema bêje her roj di eniyên me yên şer de pevçûn hebûn û hevalên me di çeperen de bûn, di mijara wext de tevî pêdiviya me bi demek dirêj hebû jî me tenê sê roj wext diyar kir. Di sê rojan de qet nebe me di xetên giştî de dikarî em hinek tiştan bidin wan.

Ji xwe me nedikarî em li hemû eniyan hemwext bidin. Me plan kir em her carê perwerda eniyekê bidin. Ji bo dema perwerdê jî me biryar dabû em ji sibê heta êvarê bidin. Dema me biryara xwe ji hevalên eniyan re got, hevalan fikarên xwe anîn ziman û gotin, "heval, hejmar gelek kêm dimîne. Ji gel alîkarî bê dayîn jî bêyî heval di çeperan de bin bi şev tiştek çêbe em nikarin eniyê bi hêza dimîne biparêzin." Bi rastî jî hevalên jin di eniyan de piranî bûn. Derketina wan ji eniyê wê valatiyek cidî çêbikiriya. Me wekî hevalên rêveberiyê nêrîna hevalên li eniyan jî girt. Hevalan jî pêdiviya perwerdeyekî wisa didîtin ûbi xwestek nêzîk dibûn. Gotin, "em dikarin siba heta êvarê perwerde bibînin û êvaran jî biçin çeperên xwe." Li ser gotina hevalan me fikarên xwe anîn ziman û me got, "dibe ku ji ber westana zêde heval konsantreyî perwedê nebin. An di perwerdê de bi xew ve biçin û nekarin guhdar bikin. Ger wisa bibe jî wê wateya perwerda em bidin nemîne. Yek jî dê westanek zêde çêbe û heval zehmetiyan bijîn." Di encama nîqaşên me yên di derbarê wext de hemû hevalan gotin, "ger mijar balkêş bin û hevalên ku dersa bidin xwe baş amade bikin û bala hevalan bikişînin ser mijaran wê xewkirin çênebe. Bi vî awayî hem em dikarin perwerdeya xwe bibînin û hem jî çeperên me vala neminin. Bi vî awayî emê nebin sedem dijmin lewaziyê bibine û êriş bike."




Di derbarê amadekariyan de jî wexta me nebû. Lê mijarên me behs bikiriyan bi rojeva me ya rojane ve girêdayî bûn. Me roja yekê di xetên giştî de behsa dîroka Kurdistanê kir. Di dirokê de şer û raperînên gelê Kurd hatin behskirin. Tevî gelê Kurd di tevahiya dîrokê de li ber xwe dabû sedemên ku Kurd negihiştibûn armancên xwe çine, sosyolojiya civaka Kurdistanê çawa ye, kêmasî û nebesiyên di rola pêşengiyê de hatîn kirin çine, em li ser wan rawestiyan. Her wiha di dîrokê de jinên Kurd ên bi şer û pêşengiya xwe bûne mînak kîne, çi kirine, kesayetên wekî Perîxan Xatûna kelka Dimdimê, Rindexan, Besê, Zarîfe, Leyla Qasim û mînakên gelek jinên din hatin dayîn. Vê yekê gelek bala hevalan kişandibû.

Di Roja diduyan de me dîroka tevgera jinên Kurdistanê ya li bakur da. Bi derketina PKK'ê re jinan cihekî çawa di nav şoreşê de girtin, çima pêwîst bû jin beşdar bibe, nêzîkatiya Rêber Apo ya ji jinan re çibû, çawa beşdarî rêxistinê û şer bûn? Di dîroka PKK'ê de jinan xwe çawa

rêxistin kir, artêş, partî û rêxistinên xwe çawa ava kirin, me behsa van kir. Her wiha mînakên berxwedan û şerkirina jinên wekî Sakîne Cansiz, Zeynep Kinaci, Gulnaz Karataş û gelek jinên din hat dayîn. Di roja sisiyan de jî me behsa şoreşa Rojava kir. Ji destpêkê heta wê rojê çawa pêşket, rola jinan di şoreşa Rojava de çibû, YPJ çawa hat avakirin û rola jin wê di pêşeroja şoreşê de çawa be hat dayîn. Di vê beşe de jî beşdarbûna jinan li ser mînakên şênber ên ku gelek hevalan nas dikirin û jiyan kiribûn hatin dayîn.

Di pêvajoya van sê rojên perwerdê de ji pirs û nîqaşên hevalan em baştir pê hesiyan ku zanebûna dîrokî di hêza me de çiqas lewaz e û pêdiviya me bi xurtkirina vê heye. Nifşê nû bi teknolojiya serdema kapîtalîst û bi hişmendiya roj rizgarkirinê mezin bibû. Wekî nifşên berê bala xwe nedabûn dîrokê û di derbarê paşeroja xwe de ne xwedî agahîbûn. Lewma dema me mînakên kiryarên Daîşê û tiştên berê di şeran de bi serê jinan hatîn bi hev re şirove dikir û digot, pir heval nû pê dihesiyan jin wekî xenîmeta şer dîtin, di şeran de dîlgirtina jinan, wekî kole firotin berê jî bûye. Vê xalê zêde bala wan kişandibû. Mereqa helwesta hatî raberkirin di wan de gelek zêde bû. Lewma her dema navê jinek berxwedêr a di dîrokê de dibihîstin çavên wan bi mereq vedibûn. Pirsên ka di encamê de çi pê hatiye kirin. Tevî ku di wan şertan de perwerde dîtin zehmetbû jî piraniya hevalan bi baldarî guhdar dikirin. Carna ji westan û bêxewiyê çavên hinek hevalan diçû ser

hev û ji mijarê hinekê qut dibûn. Lewma dema vediciniqîn û şiyar dibûn, hema yekser digotin, “hevala Meryem, bibore min ew cihê te behs kirî baş fêm nekir. Tu dikarî dubare bikî?” Li ser daxwaza wan cardin min dest pê dikir. Lewma min hewl dida tiştên behs dikim di çavên wan de zindî bikim. Ji bo bala wan bikişînim wekî şanoyekê bilîzim min tevger dikir. Ev yek carna dibû sedema kenê hinek hevalan û digotin, “hevala Meryem, ya baş piştî şoreşê tu bibe şanoger.” Ji ber dema min behsa hinek jinan dikir, çawa li hespan siwar bûne, kofiyên xwe çawa girêdane, di şer de çawa pêşengî kirine, min bi liv û tevgerên xwe jî hewl dida ez zindî bikim. Dema min behsa kelha Dimdimê kir û ji wan re got ka jinên kelha Dimdimê çawa kelheya xwe parastine, hevala Berfîn rabû ser xwe û got, “hevala Meryem, di dawiyê de ew jin hemû xwe dikujin ne wisa ye? Ji ber babê min pirtûkek li ser kelha Dimdimê dixwend. Digot di dawiyê de ji bo nekevin dest neyarên xwe hemû xwe bi xwe dikujin.” Min behsa berxwedanê, sekna li hember berxwedanê dikir. Lê ji ber piraniya hevalan piştî rewşa Şengalê derûniyek wisa dijîn û digotin li şûna bikevin dest çeteyan dê xwe bikujin, min di dersê de awayê xwekuştinê nedixwest behs bikim. Ji ber pir heval ji mijarên me didan biyanîbûn û gelekan ew nav nû dibihîstin. Lewma min got, “erê pirtûkek wisa heye. Lê ew ne pirtûka bingehîn e û rast nabêje. Pirtûkên din jî hene. Di wan pirtûkan de behsa rastiya kelhê tê kirin. Jin xwe nakujin, şer dikin. Kelha xwe diparêzin û di dawiyê de bi ser dikevin. Ya tu behs dikî nêzîkatiyekî ya

serdestan e. Naxwazin serkeftinên me derbasî dîrokê bibin û tiştan berovajî dikin û didin." Her çiqas hevala Berfîn bi van gotinên min bawer nekiribû û wekî ku bêje, "wile ne wisa ye, lê bila wisa be" jî keyfa pir hevalên ciwan hatibû ku ew agahiya hevala Berfîn dayî ne wisa ye. Armanca me ji dayîna mînakên wisa ne ew bû ku hevalên me heman rêbazê pêk bînin. Şert û mercên me û yên wan jinan ji hev cuda bûn. Derfetên me pirtirbûn. Ew demek dirêj bû me li hemberî hovîtiyek mezin şer dikir û me xwe di şer de ispat kiribû. Bêguman, divê mirov rastiyên dîrokê rast bêje. Lê ji bo tu bikarî van rastiyan bêjî pêdivî bi wextek zêde yê şirovekirinê, sedem û encamên wan hebû. Rastî tenê wekî agahiyekê dayîn dikarî encamên neyênî jî bi xwe re bîne. Ji ber armanca me ji dayîna van mînakan bi xwe bawerî û xwe xurtikirina hêza jin bû.

Ji xwe hêj roja diduyan hevalên xort ên li eniyan gotin, "heval we çi daye hevalên jin. Tê bêjî qey di du rojan de ew çûne hinek din hatine şûna wan. Wisa bi xwe bawer û qure bûne, tê bêjî qey ne hevalên me yên berê ne. Berê gelek caran ji me alîkarî dixwestin. Dema niha em dixwazin di tiştekê de alîkariyê bidin wan yekser dibêjin, "spas, pêwîst nake. Em bi xwe dikarin bikin. Morala wan wisa zêde bûye, tê bêjî qey du roje ne çûne perwerdê, çûne seyranê. Dema bi maşînan vedigerin tê bêjî qey serhildan e û em hemû ji dengê tilîliyên wan şaş dimînin. Ka hûn çi didin wan bidin me jî. Qey em ne hevalên hev in?" Her çiqas para henekan di van gotinan de hebû jî bi

rastî hevalan moral û baweriyekî cuda girtibû. Ew derûniya ji ber bûyerên Şengalê di hevalan de nemabû. Roja diduyan a piştî perwerdê êvarê me navber da. Beriya hevala biçin cihên xwe hevala Peyman hat gel min û got, "hevala Meryem, şevê dî ez du saetan nivistim. Min di xewna xwe de Jan Dark dît. Karxaneyekî mezin a çekan hebû. Em hemû li wê derê bûn. Dijmin êrişî me dikir û me bersiva wan dida û şer derdiket. Di dawiyê de me hemû dikuştin û min ji ser wan ji xwe re M-16' yek digirt." Dema behs dikir dikenî û şad dibû. Ez jî bo wê keyfxweşiya wê keyfxweş bûm û min ji xwe re got, "diyare gotinên hevalan rastin. Hevalên me moral û baweriyek mezin girtine ji wan jinên leheng." Paşê jî hevala Xwînda hat û got, "hevala Meryem, dema te behsa jinên kelha Dimdimê kir diya min hat bîra min. Babê min li mal an ne li malbe, bi salane darekî diya min heye li pişt derî. Digot ez vî darî ji bo xêrnexwazan, ji bo yên bixwazin zerer bidin radikim. Dema yekê bi derengî li derî bidaya an dengek bihatiya diya min darê xwe digirt û diçû pişt derî. Rojekê babê min derengî şevê ji qehwexanê hat. Bû çikçika derî û diya min darê xwe girt û çû. Hema bi vebûna derî re darek li teşkên babê min da. Heta heftiyekê jî hê babê min ji ber derbeya diya min kulek dimeşî." Bi wê bîranîna wê ez û çend hevalên li gel me têra xwe kenîn. Paşê got, "Ger diya min dikare mala xwe bi darekê biparêze û jinên kelha Dimdimê bi keviran şer kirine çima em nekarin bi çek şer bikin?" Xwe gihandina ra û rişên xwe, di derbarê demboriya xwe de agahî girtin hêzek wisa, moralek wisa dabû

hevalan. Xwîndaya ciwan jî encamekî baş derxistibû û vê keyfa min hêj baştir kiribû.

Di kesayeta wan hevalan de jî me didît civak bi jinan tê guhertin. Asta bawerî, zanebûn û morala jinan civak li ser piyan dihişt. Ev di civakê de jî û di eniyên şer de jî wisa bû. Lê ji bo em bikarin civaka xwe di warê hişmendî de biguherin, di serî de pêdiviya me bi guhertin û zanabûnekî xurt hebû. Ev gavên me ji bo wê destpêk bûn. Lê xwedî wate bûn. Rêber Apo di hevdîtinekî ya bi parêzerên xwe re gotibû, "bila kantona Cizîr û Efrînê jî wekî Kobaniyê bikin. Bila herkes bibe leşker, bibe şervan û xwe biparêzin." Vê bandorek erênî û baş li hevalan kiribû. Keyfxweş dibûn dema dibihîstin ku Rêber Apo destpêkê hatiye Kobaniyê û wisa derbasî Rojava bûye. Xeyalên gelek jinan hebû hemû parçeyên Kurdistanê bibînin û li cihên din jî şer bikin. Di zozanan de mayîn, li ber çemekî herikbar rûyê xwe şûştin û di biharekî têr kulîlk de bazdan, di pevçûnekî li çiyayekî Kurdistanê de westan, xwihdayîn, piştî westana meşeke dirêj li ber agirek gerîla rûniştin û çay vexwarin xeyalên gelek ji wan jinên ciwan bûn. Xwe ne tenê şervanên Rojava, xwe şervanên Kurdistanê û parastvanên hemû jinan didîtin. Lê li ser cih û warên ku lê ji dayîkbûyîn şerekî dijwar dihat meşandin.

Roja diduyan êvarê me navber da perwerdeya me ya li eniya Rojhilat. Piştî navberê hêj heval ji bo çûyîna çeperan li maşînan siwar nebibûn agahiya li eniyê êriş

çêbûye hat. Hinek heval wisa bi lez siwar bûn di rê de dema diçûn çeteyan bi sekvanî hevalek birîndar kiribûn. Ji ber heval bi lez siwar bibûn û tam cihê wan nekiribûn hemû rûnin, hevala Zeynep ji destê xwe birîndar bibû. Piştî êrişa çeteyan şikest û ew heval anîn, me jê re got, hêj hûn tam fêrî rê û rêzikên şer nebûne. Divê hûn bizanin xwe çawa biparêzin. Lehengî ne ew e mirov wêrek be. Li gorî wê divê di şer de jîrbûn hebe. Tevgera dijmin ji berê de ferqkirin û li gorî wê xweparastin hebe. Lewma di roja sisiyan de me hinekê girîngî da behskirina van tiştan jî. Ji ber rojane me mînakên wisa didîtin. Mînakên dihatin dayîn girêdayî jiyana me bûn. Me bi roj li ser şer û bûyerên şer ên di dîrokê de bi roj perwerde didît. Bi şev em li eniyan diketin şer. Tiştên dihatin gotin dihatin jiyankirin di heman demê de. Bi dehan navên ku dihatin dayîn nas dikirin. Bi hev re mabûn. Bi hev re şer kiribûn, li ber çavên wan şehîd bibûn. Lewma asta bandorbûna ji mînakên dihatin dayîn zêde bû.

Dîtina perwerdeyekê ne çareseriya her tiştî bû. Lê di gelek aliyan de encamên jê hatîn derxistin hebûn. Ji ber di perwerdê de fikar û tirsên hevalan jî xwe bi pirsên dikirin re didan dest û digotin, “emê çawa li hember teknîk û serdestiya çekan a di dest çeteyan de bikarin li ber xwe bidin?” Me ji mînakên berê jî dizanî ku tişta hêzekê bi ser dixe ne tenê teknîk e. Erê teknîka di dest çeteyan de xurt bû. Lê vîn, bawerî, taktîk û wêrektiya me hebû. Bi xwe bawerbûna me, asta girêdan û dilsoziya me

ya bi gel û axa me re hiştibû em di gelek şeran de encamên baş derxin. Li hember teknîka wan qabîlyeta me ya em bikarin wê teknîkê vala derbixin û di warê taktîk de çalakiyên dewlemend û piralî bikin pêwîst bû. Di perwerdê de li ser van xalan jî hat sekinandin. Me hewl da heval bikarin di van aliyan de jî mijarê bi dest bigirin û bikarin li ser van mijaran jî lêhûrbûn bikin. Me mînakên çêkirina xendekan a li hember Hamr an da. Her wiha panzerên çeteyan ên bi mayînan hatîn îmhakirin hebûn. Lewaziyên her çekê hebûn. Lê diviya em bibin xwedî zanabûna dîtin û bikaranîna wan lewaziyan. Dema em li ser van tiştan diaxivîn hevala Delîla rabû ser xwe. Hevala Delîla di şer de çeka B-7 bikar dianî. Ji xwe bawer got, “wile ez bi xwe û çeka xwe bawerim. Mînak cihê plakaya Hamrê lewaz e. Em dikarin bi lêxistina wî cihî wê têk bibin.” Hevala Delîla hevalekî ji Geverê bû. Berê perwerdeya çekên giran dîtibû û xwedî agahî bû. Di navberê de hevalan belaya xwe li hevala Delîla xistin û dixwest xalên lewaz nîşanî wan jî bike.

Hêj perwerde bi dawî nebibû hevalan dest bi nîqaşa plan û projeyên xwe kiribûn. Ji hev re behsa tiştên ku dixwazin bikin dikirin. Paşê min ji wan re got, “hevalno, ev perwerde ne tenê çend roj guhdarkirina çîrokekê bû. Encama we girtî rast e. Divê her enî di nav xwe de nîqaş bike û xwe bigihîne plansaziyekê. Her tim, her yekîne dikare çi bike û li ser kû dixwaze çalakiyek çawa bike, derfetên di dest de çine û pê dikare çi bike zelal bike. Divê plana we ya keşfê hebe. Plana we ya êrişê ya

parastinê, sabotajê bi giştî di derbarê şer de çi tê xwestin divê hûn amade bikin û bi raporan pêşkêş bikin. Her tim bila rapora xwe bide berpirsên yekîneyê, yekîne bidin berpirsên eniyan û dawiyê em hemûyan binîn gel hev û binirxînin. Lê bila planên we li ser tiştên şênber bin. Ji ber şer tenê bi xeyalan nayê kirin. Şer bi zanebûn, hûr û kûr hizirandin û xwe baş plankirinê tê meşandin. Cih, çeper, gir, bi giştî cihê hûn biçinê çawaye, hûn bi çi awayî dixwazin çalakiya xwe pêk bînin, hêza çalakiyê wê ji çend kesan pêk bê, hûnê çawa bikarin êrişên dijmin vala derbixin, wekî van bi ziravî binivîsin. Xalekî dî ya girîng jî wê helwesta me ya di kêliyên zorî û zehmetiyan de be. Ez ji we re niha de dibêjim. Ev perwerdeya me ji bo xwe amadekarina çalakiyên ji bo tolgirtina jinên Şengalê bû. Emê bi çalakiyên xwe, bi sekna xwe bersiva çeteyan bidin û tola jinên Şengalê rakin. Dibe ku carnan em di şer de bi tenê jî bimînin. Hevalên xort ên li gel me an şehîd bibin an jî hêza wan têra berxwedanê neke û dest ji me berdin. Di kêliyên wisa de jî divê em baweriya xwe ya bi xwe winda nekin. Ev bi vîn û hêrsekî mezin a tolgirtina hemû jinên Kurd, bi taybet jinên Şengalê heta kêliya dawiyê jî li ber xwe bidin. Erê em radestî çeteyan nabin. Dema hat xwestin emê biryara xwe fedakirinê jî bibin. Lê heta çirkeyekê jî derfeta me ya şerkirin û kuştina dijmin hebe, em ti carî li çareseriyên din nagerin û xwe nakujin. Xwekuştin ne şêwaza şerê me ye. Wêrektî û lehengiya mezin heta kêliya dawiyê li ber xwe dayîn û şerkirin e. Dema hat xwestin em dikarin çalakiyên canbaxşane bikin. Lê kengê? Dema ku êdî ji sedî sed em

bizanin cepxana me nemaye. Wê demê li şûna em bi saxî bikevin destên dijmin emê xwe bi wan de biteqînin û kevneşopiya lehengiya jinên Kurd bidomînin."

Piştî me perwerdeyên hemû eniyan qedandin, wekî rêveberî em hatin gel hev û me encamên wê nirxandin. Her çiqas wexta me kêm bû û me nekarî em her tiştî bidin jî nirxandina di derbarê encamên perwerdê de erênî bû. Bandora xwe li tevlîbûna hevalên jin a li eniyan kiribû. Nîqaşên perwerdê derbasî eniyan jî bibûn û lêhûrbûnên hevalan dewam dikirin. Di dawiya wê civînê de me wekî YPJ biryar girt em bi çend çalakiyên serbixwe bersiv bidin tevkujiya li Şengalê û peyama xwe ya ji jinên Şengalê re bi çalakiyên xwe bidin.

## ÇEKÊN MEYDANÊ

Dîsa ji ber hesab û planên li ser herêmê ew demek bû me jî wekî tedbîr hêza xwe amade dikir. Me gazî gelek ketîbe an ku yekîne û hêzên li derdorê, komên Artêşa Azad ên mabûn kiribû. Me xwest em bi wan re li hev bikin û bi hev re devera xwe ji êrişan biparêzin. Lê hesabê dewleta Tirk ên qirêj li ser van hêzan hebûn. Beriya em gazî wan bikin, dewleta Tirk gazî wan kiribû û ji wan re gotibû, "werin gel me. Em dikarin we rêxistin bikin, çek û pêdiviyên we pêk bînin." Ev karê têkilî û hewla bikaranîna hêz û komên li herêmê ya li dijî me, ji aliyê MÎT'a Tirkiyê ve dihat kirin. Gazî wan koman gelekan

kiribûn û bi hinekan re li hev kiribûn. Di wan koman de hinek kes wekî sîxûr bicih kiribûn. Lê hinek ji wan bi rastî dirust bûn û hewl didan bi me re jî danûstandinan bikin. Ji ber ji nêzîk ve şahidiya têkoşîn û şerê me kiribûn û di pir aliyan de bandor jî bibûn. Ji xwe demek bû çend kom nêzîkî me bûn û li gel me diman. Cepxaneya wan, erzak û pêdiviyên wan ên rojane jî me didan. Hêzên bêyî rêxistin û belav bûn. Lê yên ji me aciz û alîgirên hêzên wekî Tirkiyê jî hebûn. Tirkiyê ji wan re gotibû hema neçin gel YPG-YPJ, hûn çi bixawazin em ê bidin we." Tevî me ev rastî hemû dizanîn jî me rîskek wisa da ber çav û me xwest em bi wan re li hev bikin.

Çembera li derdora Kobaniyê em xistibûn lêgerînên cuda. Me nedixwest Erebên herêmê Kurdan li hemberî xwe wekî xeter û neyar bibînin û me dixwest em pêşiyê li vê lîstika hêzên derve bigirin. Ji ber gelê Kurd û Erebên deverê demek dirêj bi hev re jiyan kiribûn û bibûn xizmên hev. Têkiliyekî wan a civakî, mafekî ciraniyê saz bibû. Ji xwe komên me dixwest em bi wan re bikevin nav têkiliyan jî komên biçûk bûn. Lê xelkên wê deverê bûn. Yek ji van koman ji gundê Gopê bû. Berê Daîşê êrişî gundê wan kiribû û gelek kes kuştibû. Ji wan gundan heft kes di gund de serjê kiribûn. Her wiha gelek kes ji aliyê çeteyan ve hatibûn girtin û winda bûn. Lewma nerazîbûnek tûnd a vê komê li hemberî Daîşê hebû. Lê ne wekî hêzek rêxistinî bû û nerazîbûnên wan eşîrîbûn. Me dixwest em van hêzan qezenc bikin û nehêlin bikevin kefk û planên hêzên dijberî me. Ji aliyekê ve van

hewldanên me û danûstandinên me dewam dikir, ji aliyê din ve êdî gelê bakur bi awayekî çalak piştgiriya me dikir. Gel hatibû ser sînor, di derbarê rewşa Kobaniyê de hişyariyek baş çêbibû.

Ji xwe cara yekê Daîşê di şerê gundê Zormixarê û Evdiko de şikestina herî mezin xwar. Ez bawerim di dîroka şerê wan de ew destpêkek bû. Tevî ku bi hemû hêza xwe, çek û şervanên xwe yên pispor ve êriş kirin jî nekarîn gav pêş de bavêjin. Tevî ku gelek caran xwest di pir cihan re êriş bike êrişên wan şikestin û nekarîn Kobanî bigirin. Rewşa li Kobanî dihat jiyankirin ji bo Daîşê jî tiştek nû bû. Daîş hêzek bi xwe bawer bû. Diçû kîjan cihî di nava çend rojan de vedigirt û kontrola wê dixist dest xwe. Lê li ser herêmên Kurdan heman tişt nedikarî bike. Li aliyê Cizîrê û Serêkaniyê jî êriş dikirin. Her cara êriş dikirin li wê derê jî dişkestin û nedigihiştin armancên xwe. Em ne wekî hêzên Artêşa Azad pariyek hêsanbûn ji bo wan. Berxwedanî û şerkeriya şervanên Kurd ew pêla êrişan a çeteyan jî sist kiribû. Ji ber dîtin ku her çiqas êriş çêdibin em li ber xwe didin. Her carê hejmarek kuştî û birîndarên cidî didin û dîsa jî nagihêjin tiştên armanc kirîn. Em wekî hêzên dî ne direvîn. Di warê bîr û baweriya xwe de em ji wan ne lewaztir, ji wan gelek xurtir bûn. Ji ber heta we rojê çi êrîş li hemberî wan çêbûbûn têk biribûn, alên xwe yên reş ên sembola hovîtî û tirsê li wê derê bilind kiribûn. Destpêka êrişan wisa nêzîkî me jî bibûn û digotin qey wê cihên me jî wisa hêsan dagir bikin. Lê daxwaz û niyetên wan pêk

nehatibûn. Ev xeyala wan bi berxwedanî û lehengiya bi dehan şehîdên me di qirika wan de mabû.

Ji xwe ji destpêkê ve dewleta Tirk piştgirî dida çeteyan. Lê piştî dîtin ku Kobanî wisa hêsan nakeve, vê carê bi konsemptekî nû dest bi kar kir. Mayînên li ser sînor paqij kir, gazî kom û hêzên li deverê kir. Bi rêxistinkirin û kişandina gel xwe ya hinek hêzan xwest tirsek mezin bide avakirin û gel ji Kobanî bide revandin. Li ser vê konsept û plana nû me xwest em dest bi pêngavekî nû bikin. Piştî me xeta Firatê hinek cih girtin û şûn de êriş jî zêde bûn. Tirkiyê vê carê ji ser sînor çete didan êrişkirin. Em neçar dibûn li wan bixin û dema me lê dixist jî digot "hûn dijberiya me dikin. Em vê yekê qebûl nakin, leşkerên me li ser wê xetê hene. Tirba şahê me heye." Lê tirba şahê xwe xistibûn cihê rêxistinkirina çeteyan û navenda bazirganiya li ser sînor. Bi vê riyê xwest bi me re jî têkiliyan deyne. Ne ku li ser niyetek baş, dixwestin bizanin ka plana me çiye. Dixwestin bizanin em pêngavekî çawa armanc dikin, hêza me çiye û agahiyan bidin çeteyan. Lewma me bi awayekî vekirî peyamên xwe ji wan re gotin. Me got, "cihên çete lê bimînin ji me re armancên êrişê ne. Çete li kû hebin wê hêza me êrişî wê derê bike. Ev mafê me ye. Emê radestî ti hêzek dixwaze axa me dagir bike nebin û emê têkoşîna xwe bilind bikin. Em di vê mijarê de serî li hember ti hêzekê natewînin." Piştî helwesta me ya di vê mijarê de dîtin, vê carê jî bi hêcetên nû xwestin me tengav bikin. Gotin, "nabe hêza girêdayî YPG-YPJ di deriyê sînor de bimîne.

Ger wisa be em destûr nadin ticaret bê kirin. Bila li şûna we komên Artêşa Azad ên li gel we derî ewlekariya deriyan bigirin. Ger wisa be em dikarin alîkariyên mirovî yên tên ji we re rêkin. Nexwe em destûr nadin tiştek derbas bibe.” Hêza Artêşa Azad a li qadê mayî gelek kêm bû. Lê Tirkiyê ew muxatab digirtin û heyîna me dikir hêcet û derbasbûna alîkariyên mirovî wekî gefekê li hemberî me bikar dianî. Helwestekî dijminane raber dikir. Li hemberî destkeftiyên me şerekî eşkere dikir êdî. Me ji wan re got, “hêza hûn behs dikin jî hêza me ye. Niha li gel me dimînin. Cudahiyek di navbera me û wan de nine. Lê em vê daxwaza we qebûl nakin. Ji ber hejmara wan gelek kêm e. Hêzek biçûk e li gel me dimîne. Ew hêza wan a bikarin bi serê xwe cihekê bigirin tine. Yek jî ev der cih û xaka me ye. Hêza vê derê ya fermî û rewa em in. Em dikarin bi hev re kar bikin û ti zererên me ji we re nînin.” Lê tevî van hewldanên me jî dewleta Tirk bi her awayî dixwest em derbeyên giran bixwin û ji bo vê piştgirî dida Daîşê.

Têkiliyekî piralî di navbera dewleta Tirk û Daîşê de hebû. Me berê jî ev hevkariya wan li gelek cihan dît. Li eniya Rojhilat, eniya Rojava di şer de dewleta Tirk ji bo piştgiriya Daîşê hevalên me şehîd xistin. Ji ber hem di warê îdeolojîk û çandî de, hem di warê berjewendiyên madî de nêzîkî hev bûn. Petrola cihên Daîşê ji rejîmê girtî hemû diçû Tirkiyê. Çeteyan li ser sînor, cihên wekî Girêspî deriyên ticaretê vekiribûn. Hemû derfetêm Sûriyê û Rojava pêşkêşî Tirkiyê dikirin. Heta bi parçeyên

ji karxaneyên Sûriyê hatîn dizîn karxaneyekî şekir a mezin bi hev re ava kiribûn. Lûleyên petrolê, parçeyên karxaneyan hema çi tişta di bazarê de bi kêr bê û pere pê bê dihat derbaskirin. Ji Musilê heta Reqa, Tepka xetekî ya ticaretê çêkiribûn û Tirkiyê ji vê qezencek mezin bi dest dixist. Lê ji bo bikare ji berhemên Sûriyê baştir sûd bigire, diviya Kobanî bihatiya girtin. Di riya Kobaniyê re tişt birina Tirkiyê nîzîktir dibû. Ji jora Serêkaniyê heta diçû Helep her cih di destê wan de bû. Tenê ya nekarîn bigirin Kobanî bû û ji bo girtina wê jî her hewl raber dikirin. Lê bi rewşa xwe ya heyî wekî giravekî ji çar aliyan hatibû dorpêçkirin bû.

Daîşê berê bajarê Reqa, balefirxaneya wê, cihên leşkerî yên artêşê, balefirgeha Tepka girtibûn. Di van cihan de bi hezaran leşker hatibûn kuştin, her wiha ewqas jî çete. Lê di dawiyê de ew cih girtibûn. Çekên artêşa Sûriyê yên herî pêşketî bi dest xistibûn. Lê cihekek bi navê Eyn El Îsa hebû. Eyn El Îsa cihê togaxaya çekên giran a artêşa Sûriyê bû. Tevî ku hemû cih û derdora wan hatibû girtin jî çeteyan nekarîbûn wê derê bigirin. Lê ew jî ketibûn nava çemberekî teng. Ji derveyî hewayî danûstandina wan bi ti cihî re nemabû. Her roja diçû rewşa wan girantir dibû. Ji ber piştî Daîşê bajarê Reqa û balefirgeha Tepkayê girtibû û şûn de artêşa Sûriyê nedikarî ti alîkarî û piştgiriyê ji wan re bişîne. Her wiha ji aliyê Heleb û Cizîrê jî nedikarîn destwerdan bikin û hêzê bişînin wê derê.  Hêza artêşê ya li vê derê piranî ji Elewiyan pêk dihat. Dilsoz û girêdayî dewleta Sûriyê bûn. Ji wan re

tabûra tankan digotin. Pir zêde çek li wê derê hebûn û hêza herî xurt a artêşa Sûriyê bû. Wê hêzê bi vê baweriyê ew cih bernedabû. Dikarîn wekî kes xwe rizgar bikin û biçin. Lê ger biçûyan ew çek hemû diman ji Daîşê re. Çekên wan ên bi navê çekên Meydanê hebûn. An ku Fûzeyên wan hebûn. Her wiha katoşên wan hebûn. Berpirsê wê derê jî serbazek Elewî bû. Ev hêza li Eyn El îsa mayî di warê fermiyetê de girêdayî fermandariya hêza Dêr El Zorê bû. Hêj Dêr El Zor hemû nehatibû girtin. Lê beşek girîng ê Dêr El Zorê ji aliyê çeteyan ve hatibû girtin. Fermandarê hêza Eyn El Îsa fermanên xwe ji fermandarên Dêr El Zorê digirt. Lê Fermandarê li Dêr El Zorê têkiliya wî bi Daîşê re hebû û bi wan re di nava hevkariyê de bû. Berê di Daîşê re têkiliyên ticarî saz kiriye. Paşê jî ev têkiliya wan veguheriye hevkariyek li pêştir û ji xwe li gorî angaştên piştî wê ji ber vê têkiliyê balefirgeha Tepka ketibû dest Daîşê. Paşê hat gotin ku her çiqas leşkeran li balefirgehê li ber xwe dan jî têkiliya fermandaran bi Daîşê re hebû û sedema esasî ya ketina balefirgehê ev têkiliya bi Daîşê re bû.

Di demekî ku me di her warî de tengaviya çek û cepxanê dîjî de van leşkerên li Eyn El Îsa agahî ji me re şandin û gotin em dixwazin bên gel we. Di peyama xwe ya ji me re şandîn de gotibûn, "rewşa me xirab e. Em naxwazin çekên me bikevin dest Daîşê. Ger hûn bi hewara me ve bên û me rizgar bikin em dixwazin bên gel we. Ji ber em bikevin dest Daîşê wê me serjê bikin." Beriya em ji wan re agahî bişînin em wekî rêveberî axivîn. Pêdiviya me bi

wan çekan hebû. Ya din jî bi dehan kes alîkariyekî mirovî ji me xwestibûn. Rastî jî rewşa wan nebaş bû û dibû her gav Daîş bi êrişek mezin biçe ser wan û leşkerên li wê derê hemûyan bikuje. Ji xwe ger ew çek jî biketiyan dest Daîşê ji bo me xetera heyî mezintir dibû. Li ser vê me jî agahî ji wan re şand û got, “emê parastina we bikin, hûn dikarin bên herêma me. Em soz didin emê parastina we bigirin ser xwe û em nahêlin tiştek bi we bê.” Li ser vê peyama me wan jî gotinên me erê kirin. Lê pergala artêşan cuda ye. Diviyan ji berpirsên xwe yên li Dêr El Zorê fermana vekişandinê bigirin. Bêyî erêkirina wê derê nedikarîn bi serê xwe derkevin û biryar bidin.

Di navbera me û wan de nêzî bîst û pênc kîlometreyan mesafe hebû. Ev cih hemû ji aliyê Daîşê ve hatibûn girtin. Em erdnîgariya wê jî nas nakin. Navber zêdebû û vê xeterek mezin dida avakirin. Dema fermandarê Eyn El Îsa rewşê ji fermandarên xwe yên jor re radigihîne ew vê daxwaza wan erê nakin û dibêjin, “hûn li cihê xwe bimînin, hindik maye em ji we re alîkariyê dişînin.” Ya rast bi dayîna pêş çav a çend windayiyan dikarîn piraniya wan rizgar bibin. Ji ber çekên wan başbûn û mirovên şerker bûn. Lê ji aliyê fermandarên xwe ve dihatin xapandin. Ne hêz diçû, ne jî destûra ew bi cihekê ve biçin ji wan re dihat dayîn. Wekî komekî dîlgirtiyan li wê derê hatibûn hiştin. Ji ber cih saxlem bû û çekên giran hebûn, her wiha hêzekî şerker û dilsoz li wê derê bû kesî îhtimala ketina wî cihî nedida. Her carê ji me re agahiyek din dişandin. Carna digotin em dixwazin bên

hinek çekên me xirabene û em bi tamîra wan re mijûl dibin. Carna digotin hêj fermana paşvekişandina me nehatiye dayîn. Piştî demek bi vî rengî çûyîn û hatina agahiyan gotin, em tên û me jî dest bi amadekariyên çûyîna Eyn El Îsa kir. Ji ber ger cepxaneya Eyn El Îsa bikeve destê me, ti hêz bi me nikare. Me ji wan re agahî şand û got, “hûn ji cihên xwe derkevin û ber bi me ve werin. Emê bi pêş de we biparêzin û heta hûn gihiştîn me, emê bi hev re paşve vekişîn.” Me li ser vê biryarê li hev kir û em ketin nav amadekariyên pêngavê.

Me hêza xwe kom kir û ji hemû eniyan heval ji bo beşdarbûnê hatin komkirin. Me bawer dikir em dikarin bi wan çekan eniyekî gelek mezin û fireh a şer ava bikin. Ji bo me ev biryarekî çarenûsê bû, stratejîk bû. Me hêzên ji gel di çeperên xwe yên di eniyan de bi cih kirin û hêza xwe ya şer hemû ji bo vê pêngavê amade kir. Hemû çekên me yên giran ji bo pêngavê di eniyên pêş de hatin bicihkirin. Me biryar da em eniyekê bidin pêşiya xwe, li Daîşê bixin, paqij bikin û derbas bibin. Heta em bigihêjin Eyn El Îsa jî wê gel wekî seferberiyê di çeperan de bimîne û parastina Kobanî bike. Piştî me hêza xwe kom kir û em ketin tevgerê, em heta cihekî nêzîkî wan çûn. Me ji wan re jî gotibû, heta cihekê emê bên, piştî wê hûnê bi tankan li çeteyan bixin û bikevin tevgerê. Cihê me xeter bû û me bajêr ji bo wan berdabû û em hatibûn wê derê. Dema me agahî şand, gotin” em niha nikarin derkevin û çend roja li benda me bimînin. Şeş tankên me xirap bûne û emê wan çêkin û wisa derkevin baştir e.” Li

ser vê daxwaza wan jî em sê roja man bendê. Roja sisiyan cardin li me geriyan û gotin, “me hinek çêkirine, lê hinek mane.” Me baş dizanî ku ji derveyî me ti riyên wan ên rizgariyê nînin. Wan jî ev digot û hêviya xwe bi me ve girêdabûn. Ji ber ji derveyî me ti hêza li wê derdorê bikariya li dijî Daîşê şer bike nemabû. Navbera wan û cihên dewletê yên herî nêzîk sed kilometre bû. Rastiyek wisa bû ku neçarbûn bên gel me. Herî dawiyê tevî hemû eger û mijûlkirinan me xwe li benda wan girt. Fikar û şikên me hebûn, lê me xetera hinek tiştan dabû pêşiya xwe. Me kesek ji gundê deverê veşartî şand gel wan, me jê re got, tu rê baş nas dikî. Em ji filan cihî ve tên, hûn jî heta wê derê werin. Tu ji wan re rêberiyê bikin, emê ewlekariya xetên Daîş tê de bigirin û hûn xwe zû bigihînin me.

Beriya em roja dawiyê bikevin tevgerê û ber bi cihê me diyarkirî ve bikevin rê, wekî rêveberî me di nav xwe de nîqaşek kir. Em komek heval ji bo dîtin û naskirina erdnîgariyê derketin cihekê û me bi dûrbûnan temaşeyî derdor kir. Di hinek cihan de em û çeperên Daîşê gelek nêzîkî hev bûn. Min ji hevalê Sefkan re got, “hestên min xirab in. Ne webe ku ev me bixapînin?” Hema li ser gotina min gelek hevalan heman fikarên xwe anîn ziman û gotin, “em jî wisa dihizirin. Ev çend rojin me mijûl dikin û ya tê dîtin di vî karî de tiştek heye. Plan û hesabek heye.” Me piştî temaşeyî derdor kir û şûn de hevalê Masîro got, “em dikarin korîdorekê vekin. Em ji vî alî ve, ew ji wî alî ve bên, em dikarin hev biparêzin jî. Em

dikarin di şevekê de wan ji vî cihî rizgar bikin. Dibe ku pevçûn di navbera me û Daîşê de çêbin, lê hêza me xurt e. Heta ew hêza xwe kom bikin û bên, emê xwe ji vê erdnîgariyê rizgar bikin û bigihînin cihên xwe. Ji xwe bi van çekan nikarin nêzîkî me bibin. Hêza van leşkeran a li hember çeteyan li vê ernîgariyê şer bikin nine. Lê ezmûna hevalên me heye. Bila heval leşkeran yekser derbas bikin. Ger şer çêbe jî em dikarin bi hêza xwe ya heyî şer bikin." Bi rastî jî hêza me ya tevlî vê çalakiyê dibû hêzekî xurt û şerker bû. Me berê bi vê hêzê li çend gundên di dest Daîşê de xistibû û şervantiyek egîdane raber kiribûn. Ew şer ne ji rêzê bûn û hêza me derbeyên giran li çeteyan dabû. Em bi xwe gelek bawer bûn û bi wê baweriyê me berê xwe dabû vê peywirê.

Wê rojê di rûyê her hevalekî de du hestên serwer diyar bûn. Yek keyfxweşiyek hebû, ya din jî fikarên heyîn xwe di rûyê hevalan de didan der. Hevalên me yên rêveberiyê nîqaşa vê dikirin. Hevalê Dilgeş, Emîn û Dijwar di axivîn. Hevalê Dijwar got, "hestên min nebaşin di derbarê vî karî de. Ji min re wisa tê ku em tên xapandin." Hevalê Emîn bersiv da û got, "em hemû di vê mijarê de wekhev dihizrin. Lê ka bihizirin ew çek ketine dest me. Em dikarin bi wan çekan şerekî sê qatî yê heta niha pê bidin meşandin. Ev jî coşek mezin dide min. Ez bawer dikim em hemû vê tiştê dijîn." Hemû heval ji ber vê yekê pir bi heyecan bûn. Biryardariyek mezin hebû, tevî şik û gumanan jî herkesî dixwest kêliyekê zûtir em dest bi vî karî bikin. Ez û hevalê Şoreş bi fermandarê

wan ê li Eyn El Îsa re axivîn. Me ji wan re got, “me hevalekî xwe şandibû gel we. Ji xwe ji duh ve ew heval li gel we ye, pêwîste tiştên bingehîn ji we re gotibe. Hûn îşev amade ne em bên?” Gotin, “erê, em amade ne. Lê agahiyên hevalê me yê çûyî gel wan dida cuda bûn. Me jê re gotibû hejmara çekan, rewşa leşkeran, hejmara wan, riyên çûyîn û hatinê, mesafa di navbera wan û cihên çeteyan de hemûyê fêr bibe. Bizane ka di vî karî de tiştek heye an ne. Her wiha me plan û şêwaza tevgerkirinê jê re gotibû û me gotibû ji fermandarê wan re jî ragihîne. Wî dostê me şandî gel wan got, “heval, sistbûnek di van de heye, lê ez tam fêm nakim çiye. An ditirsin, an jî ji cihên din fermanekî cuda girtine.” Li ser vê ber bi êvarê fermandarê togaya Eyn El Îsa cardin li hevalê Şoreş geriya û got, “Em îşev amade ne derkevin. Lê fermandarên me yên jor gotine divê ne hûn biçin gel wan, divê ew bên gel we. Gotiye bila ew bên gel we, riyekê vekin û wisa bi hev re derbikevin. Got bi tenê ji wê derê dernekevin û me fermanek wisa nedaye.” Me bi fermandarê wî behs dikir re gotinek wisa ne axivî bû. Biryara me ew bû dema em ber bi wan ve biçin, ew ji cihê xwe derkevin û ber bi me ve bên. Li ser van gotinên wî hevalê Şoreş xwe aciz kir û got, “we biryara hatinê da û ji me re agahî şand. Ev çend roje em li hêviya we ne. Me tiştek wisa bi fermandarên we yên din re ne axiviye. We got xwarina me nemay e, em zoriyê dijîn û dixwazin hûn me rizgar bikin. Çawa we negotiye emê vê derê berdin? Ma me zorî li we kir?” Wî jî got, “hûn mafdarin, ev daxwaza me bû û em hêj xwedî heman daxwazê ne.

Lê hûn karê artêşê dizanin. Em nikarin bêyî fermana fermandarên xwe yên jor ji vê derê bi serê xwe derkevin. Berê ji me re got hûn dikarin biçin gel wan. Bi wan re bikevin têkiliyan û ji wan daxwaz bikin bila bên we rizgar bikin. Ew dibêje bila ew bên gel we û bi hev re derkevin. Em amadene ji bo derketinê. Lê heta hûn neyên em nikarin derkevin." Li ser van gotinên wî hevalê Şoreş got, "başe, wê demê em îşev tên we dibin. Ger wisa nebe an hûn ji canê xwe an jî ji hatina xwe" Paşê dema em hatîn wê derê tiştên nû dernexin pêşiya me."

Êvarê bi tarîbûna hewayê re em ketin tevgerê û tabûrek me bi pêş de çû. Paşê hevalê Dilgeş tabûra xwe bir nêzîkî cihê Daîşê û li pêş cihê xwe girtin. Me cihê ku diviya em saxlem bikin digirt û hêza me ya din jî wê ber bi pêş ve biketiya tevgerê. Di wê navberê de ji nişka ve me dît li ser Eyn El Îsa birûskên ji agir belav bûn. Destpêkê du maşînên bombebarkirî xwe teqandin. Pêta agirê wan rabû hewa û wekî volqanekê pêtên agir belavî derdor bûn. Bi teqandina maşînan re dengê pevçûnan dest pê kir. Me cardin ji fermandarê wê derê re got; "derfeta we hebe derkevin û em li pêşiya we ne, li tankên xwe siwar bibin, bi qasî hûn dikarin çek bînin û bi riya em ji we re bêjin re derkevin derve. Ger hûn derbikevin emê ji vî alî ve lêbixin û ji we re riyekê vekin. Lê ji me re got, "Fermandarên me dibêjin li ber xwe bidin û wê derê bernedin. Ji vê saetê û şûn de em nikarin cihê xwe berdin. Ji xwe heta niha du-sê cihên me girtin. Em

derbikevin dê me hemûyan bikujin. Şerê li wê derê ji saet heştê êvarê heta sisê û nîvê şevê dewam kir. Te digot qey qiyamet li wê derê çêbûye. Dengê teqînan, pêtên agir ji kîlometreyan dûr ve dihat dîtin û bihîstin. Me piştî vê bûyerê zanî di vî karî de xayîntiyek heye. Ji ber heta wê rojê tevî hemû hewldanên girtinê û êrişan jî çeteyan nekarîbûn wî cihî bigirin û fermandar û leşkerên wê derê bi dilsozî şer kiribûn.

Saet sisê û nîvê şevê me hêza xwe ya di çeperên pêş de kişand. Em paşê pê hesiyan ku Daîşê bi fermandarê wan yê li Dêr El Zorê re li hev kiribû. Fermandar hemû agahî û krokiya cih dabû wan. Ji leşkeran re jî gotibû dernekevin û gazî hêzên YPG-YPJ bikin bila bên we rizgar bikin. Çeteyan malbata wî fermandarî dîl girtibû. Ji bo rizgarkirina malbata xwe xayîntî li hevalên xwe û leşkerên xwe kiribû. Daîşê jî li ser vê planek dorfireh ava kiribû. Baş dizanîn ku ji bo em xwe bigihînin wê derê hejmarek zêde şervan pêwîstin. Ger em biryara çûyînê bidin, em neçarin çeperên xwe yên li derdora bajêr vala bikin. Li ber bûn me bibin gel wan, li wê derê me bixin çemberê û hemû hêza me tine bikin. Ji xwe ger ew hêza me bihatiya tinekirin, girtina Kobanî êdî hêsan dibû. Di dawiyê de ew hêza li wê derê hemû tine kirin. Bi dehan leşkerên dîl hatîn girtin li ser coya avê ya di Eyn El Îsa de serjê kirin û li şûna avê xwîna wan di wê coyê de herikî.

Hêza dilsoz a bi mehan li ber xwe dabû di encama xayîntiya fermandarekê de hatibû tinekirin û bibûn

qurbanên berjewendiyên kesekî. Piştî kuştin û serjêkirina wan leşkeran Daîşê li wê derê bi sedan çekên giran, fûze, tank û panzer bi dest xistibûn. Wekî hevpeymana di navbera wan û fermandarê xayîn de hatî kirin, ew der bi dest xistibûn. Fermandarê xayîn soza xwe pêk anîbû. Lê berdêlên xayîntiyê jî hebûn. Piştî Daîşê Eyn El Îsa girt, fermandarê ku li hêza xwe xayîntî kirî jî ji xezeba hovan rizgar nebû. Hemû xayîntiya wî têra rizgarbûna canê wî nekir. Bi çend kesên din ên dîl hatîn girtin re anîn Girêspî û li wê derê di meydana bajêr de li pêş çavên gel serjê kirin. Yên sax mayîn li ser cadeyan rêz kirin û bi maşînan dan ser laşê wan û kuştin. Paşê ji bo teşîrkirina termên wan bi maşînan ve girêdan, li nav tevahiya bajêr, Eranûsê, gund û cihên di dest xwe de gerandin. Di dawiyê de ne tenê togay, hemû mirovên li Eyn El îsa radestî Daîşê hatin kirin. Xayîntiya kesekî bû sedema kuştin û serjêkirina bi sedan mirov.

Me heman şevê bi lez û bez hêza xwe vegerand û li eniyên wan bi cih kir. Ji ber me dizanî wê encamên vê êrişa li ser Eyn El Îsa çawa li me vegerin. Daîşê tank û topên li Eyn El Îsa ji hêza dewletê girtîn anîn û li derdora Kobanî rêz kirin. Piştî ev çek ketin dest wan, roja pêncî-şêst gule ne avêtiyan her eniyekî me nebû. Tank, panzer, hamr, topên ji wê derê girtin di warê çekan de ew bi hêztir kiribûn. Ji xwe berê jî ji Musil, Reqa, Tepka û gelek cihên din çek girtibûn û bi wan çekan li hemberî me şer dikirin. Tenê ji Eyn El Îsa panzde çekên jê re digotin ‘Recîme’ girtibûn, di her carekê de panzde gule bi hev re

davêt. Eyn El Îsa di warê derûnî de jî zererek mezin da derdor. Piştî gel pê hesiya ku Eyn El Îsa hatiye girtin pêlekî tirsê belav bû. Gel digot, "bi mehane Daîşê li wê hêzê dida û ji ber çekên wan nedikarîn wê derê bigirin. Niha piştî ketina wê derê wê wan çekan hemûyan li hemberî me bikar bînin." Bi rastî jî ji bo me jî qonaxekî nû dest pê dikir. Me dizanî encama ji wê derê girtîn ji bo Kobanî tê wateya plan û hesabên nû. Me wekî rêveberî ev rewşa nû nirxand. Ji bo girtina tedbîran em ketin nava tevgerê.

Piştî girtina Eyn El Îsa bi du rojan ez û hevalê Sefkan û hevala Narîn çûn gundekê. Me dixwest em dibistana wî gundi ji bo perwerdeya hevalên xwe wekî cihê perwerdê bikar bînin. Dema em gihiştin gund kalikekî em pêşwazî kirin. Hat gel me, xêrhatina me kir û got, "hûn li cih digerin?" Me got, "belê." Got xuyaye hejmara we gelek e." Me jê re got, "raste mamo, em dixwazin gel jî perwerde bikin, yek jî hevalên me yên nû beşdar dibin hene. Em dixwazin cihek baş bibînin ku em bikarin perwerdê bidin." Paşê serê xwe hejand û ji gel me çû. Piştî wî me dît kalekî dî temenê wî şêst û pêncsalî hat gel me. Kalek bi xwe bawer, rûken û gir û bilind bû. Em ji dil hembêz kirin, xêrhatina me kir û got, "ka werin em rûnin û çayekê vexwin. Hûn dîsa ketine nav liv û tevgerê. Diyare rewşa me ne başe. Gundên Ereban ên derdor gotine, Daîşê gotiye emê wisa li Kobanî bikin, kevir li ser kevir nehêlin. Ji xwe niha Eyn El Îsa jî girtin." Di çavên kalo de gotin zindî dibûn, wekî ku wan dîmenan bibîne janek

dijwar wekî mijekê xwe berda ser binahiya çavên wî û ji wê derê belavî xet û qermûçkên rûyê wî bû. Nave kalo Ebû Elî bû. Me jî hinekê axivî û got, “mamo, bibore wexta me ya em bikarin çayê vexwin nine. Lê morala xwe nexe, berê jî çeteyan gelek cih girtin. Ma Eyn El Îsa ji Reqa, Musil mezintir bû? Ew der girtin, lê dîsa jî nekarîn Kobanî bigirin.” Kalo keserek anî xwe û got, “raste mamo raste. Di dîroka me de rûpelên nû tên nivîsîn. Dema berê van eşîrên Ereban êriş dikir an me gundek ji wan digirt an jî wan ji me. Şerê me li ser bostek ax bû. Em li ser vê axê ji dayîk bûne. Lê we gelekan berê ev der nedîtine. Ne mala we, ne gundê we, ne malbatên we ne li van deranin. Lê hûn ji bo van deran canê xwe didin. Qey kî dikare mafê vê şîrhelaliya we bide. Hezar caran sihet xweş û destên xwedê li ser serê we bin. Lê xwezî hema tenê ev bûya mamo.” Kalo cardin ber bi gotinên xwe re hestyar bibû. Ji çavên wî yên westiyayî şilbûnek diyar bû. Rondikên xwe bi zendika kirasê xwe yê erebî paqij kir, cardin keserek kişand û temaşeyî nav çavên me kir. Me sedema giriyê wî pirsî, kalo got, “ka bihêlin ez çîroka xwe temam bikim. Kalbûn wisa ye, carna gotin di qirika mirov de dimîne. Ez pê dihesim mamo. Wê felaketek mezin bi ser me de bê. Tofanekî dijwar, lê baweriya min heye wê şerê we wekî keştiya nûh me ji tofanê rizgar bike. Min duh li ser rê çend ciwan dîtin. Min dît her yek ji wan ji cihek Kurdistanê hatine. Hinek ji wan zimanê me jî nizanin. Ji xwe yên ne Kurd û biyanî jî hebûn di nav wan de. Lê gotin em hatine Kurdistanê û ji ber Kurdistane hatine vê derê. Wile emê ji xwe bi ser

bikevin, lê emê gelek çavbelekan bixin bin axê. Vêca min ji wan re got bila bi hezaran wekî min qurbana binê piyê we bibin, hûn rih û canê min in. De başe ez zêde axivîm, ka werin em biçin çayê vexwin. Biborin min hûn westandin bi çîrokên xwe.”

Ew kalê berê wisa bi rûyekî ken, şad em pêşwazî kiribûn bibû kesekî din û li şûna ken rondik wekî taviyê ji çavên wî dihatin xwar. Me ji mamo destûr xwest û got, “bibore, em nikarin bên. Em dereng man, divê em karê xwe xelas bikin.”Kalo cardin em bi dil hembêz kirin, xatirê xwe ji me xwest û ber bi mala xwe ve çû. Wekî ku min di awirên wî de ew tiştên gotî dîtibe di serê min de diçûn û dihatin tiştên digot. Piştî me karê xwe qedand û em vegeriyan, min di maşînê de ji hevalê Sefkan hevala Narîn re got, “we ji kalo çi fêm kir?” Hevalê Sefkan hinekê rawestiya û got, “wile wekî xawîzanekê bû. Te digot qey pêşerojê dibîne û wisa diaxivî. Tiştên digot ne vala bûn.” Piştî gotinên hevalê Sefkan em hersê bêdeng bûn, me di pencereyên maşînê re li derdor temaşe dikir. Em gihiştibûn Çelebiyê. Li wê deverê girikên biçûk hebûn. Xelkê Kobaniyê jê re digot kuç. Min jî di ber hizra gotinên kalo re ji xwe re got, “ger dinya jî xirap bibe em van cihan nadin Daîşê. Emê li ser her girek van çeperan çêkin û çekên xwe yên giran li van deran cih bikin û kî êriş bike emê wan têk bibin.” Cihek mezin û fireh bû. Di navbera hinek hêzên me de bi qasî yek kîlometreyê, di hinek cihan de jî pênc kilometre navber hebû. Li cihên wisa ji hev dûr artêşekê dikarî di nav re derbas bibe.

Lewma diviya em zêdetir kesan perwerde bikin û van cihan bikin çeper û dagirin.

Piştî em ji wî gundi vegeriyan em çûn gel hêza wê deverê. Me bi hevalên berpirsên wê derê re axivî. Me hevalê Dilsoz şand nav gel û ji wan re got, divê êdî her hêz di nava gundên derdor de ji gel taxim û yekîneyên nû ava bike û em van cihên heyîn wisa bigirin. Ji xwe êdî seferberiye û gel bi ti cihên din ve nikare derkeve jî. Hêzên gel rêxistin bikin, dest bi perwerdê bikin û di eniyan de çeperan xurt bikin. Beriya Daîşê carna veşartî be jî hinek kesan dikarî biçin û bên. Lê piştî hatina Daîşê, gel êdî nedikarî bi cihekê ve bireve jî. Lewma tenê yek riya me hebû. Diviya em gel rêxistin bikin ku bikare parastina xwe bike. Ji ber ên ku biçûyan cihekê dihatin girtin û kî dihat girtin jî êdî bê ser û şûn dibû. Daîşê kî digirt winda dibû. Lewma me ji hevalan re got ji gel re civînan çêkin,rewşê ji wan re bêjin û gundên derdora eniya xwe hemûyan rêxistin bikin. Derdora pêncî- şêst gundan hebû. Ji wan re vekirî bêjin yên ku parastina gundên xwe nekin wê tine bibin. Daîş li ti Kurdekê nabore û rehmê li ti kesî nake. Lewma di civînên hatin kirin de gel di vê derbarê de hat agahdarkirin û li gorî wê dest bi amadekariyan hat kirin.

Dema em ji wê eniyê vedigeriyan çavên me bi ava Firatê ketin. Hevalê Sefkan got, “hevalno, ka li vê dîmenê binêrin. Tê bêjî qey hemû gund û dever ketiye ser pişta tirêjan û li ser ava Firatê melevaniyê dikin. Mirov

dixwaze bibeze û xwe bavêje nav vê dîmena xweşik. Çiqas dîmenek romantik e." Derdora avê pak û paqij xuya bû. Wekî ku dilê avê nehêle toz xwe bigihîne hevgihîna wê ya bi tirêjên tavê re bi hêlma belav dikir toz dişûşt û kenek zelal û xweşik li derdor belav dikir. Min piştî temaşeyî wê dimenê kir, min ji got, "bi rastî jî gelek xweşik e hevalê Sefkan. Ma kî dibêje emê van cihan berdin? Ev dinya hemû jî bê nikare me derxe." Wekî min tiştek şaş gotibe hevalê Sefkan got, "qey kê tiştek wisa gotiye te?" Min xwest bersiva wî bidim, lê hevala Narîn got, "hûn dizanin hevalno, ji bo hêza me ji hev nekeve em dema pêş dikarin di vê derê de xetek nû vekin. Heta em bikarin divê em valatiyê nehêlin navbera hêza xwe ya di eniyan de. Ger êriş zêde bibin û em zehmetiyê bijîn, em dikarin wisa bikin." Hêj wisa berê min bi kelheyekî me çêkirî ket. Min jî got, "wile çi dibe bila bibe divê em dest ji vê derê bernedin. Me berê ewqas kelhe çêkirine. Ger em hemû li vê derê şehîd bibin jî nabe em dest jê berdin." Hevalê Sefkan ji gotinên min aciz bû û got, "hevala Meryem, tu gotinên li dûrî hişê mirovan dikî. Ji bo em bikarin van cihan bigirin ji me re artêşek du qasî hêza me ya heyî hemûyê pêwîst e. Em xwe nexapînin, hêza me têra vê nake."

Li wê deverê du eniyên me hebûn. Eniyek jê hevalê Emîn Erkendî, eniya din jî hevalê Dijwar berpirsyar bû. Me digot divê di navbera wan herdu eniyan de valatî nemîne. Ger me valatiya wê deverê nedagirtiya, dibe ku dijmin bikariya di wan valatiyan re li pişt hêza me ya li

wan eniyan bizivire û wan bixe çemberê. Dema min digot divê em van cihan nehêlin jî tiştek di serê min re derbas dibû. Lê ji ber hevalê Sefkan plana min nedizanî, gotinên min jê re seyr dihat û dibû sedema nerazîbûnên wî. Dema em vegeriyan me gazî hevalê Rostem kir. Me bi hevalê Rostem re axivî, me hinek heval û doçkayek da gel wî û got, “divê hûn hemû gundên derdor rêxistin bikin. Bila dijmin bizane di van cihan de hêza me heye, pê nehese ku valatiyên wisa mezin hene. Ji ber li wê xetê nêzî şêst gundan hebûn. Piştî me axivî hevalê Rostem û heval Dilsoz taximek heval girtin gel xwe û ketin tevgerê. Hevalên nû bûn, lê ji xwe piraniya hêza me wisa bûn. Lê tevî nûbûna xwe jî hevalên jêhatîbûn û di rêxistinkirina gel de dikarîn rol bilîzin. Hêza wan a axaftin û îqnakirina gel hebû. Ji xwe hemû şert û mercên heyîn jî gel neçarî vê yekê dikir û ti çareyên me yên din nebûn. Di wan gundan de ji gel hinek kesan berê çek hebûn û hinek jî me dabûn wan. Hevalan hejmarekî baş kom kirin. Armanca me ne ew bû em wê xetê bi wan biparêzin. Lê me digot, qet nebe dema di wan cihan re tevgerek çêbe dikarin agahî bidin. Piştî demekê hevalan ew cihên me behs kirin bi kesên ji wan gundan rêxistin kirîn dagirtin. Piştî wê demekê me dest bi perwerdeya wan kir. Me biryar girtibû di her eniyê de berpirsyarên eniyan hêza xwe li gorî pêdiviyan perwerde bikin.

Paşê me ji bo hevalên birîndar dewreyekî perwerdê vekir. Hevalên ku berê di şer de birîndar bibûn. Ji wan hinek du sal berê, hinek çend meh berê birîndar bibûn. Ji

ber rewşa xwe ya birîndariyê di şer de nedikarîn çalak beşdar bibin. Hevalên jin û zilam bi hev re bûn. Me di vê dewrê de piranî giranî da şêwaza şer, textîka di dema pêş de bê meşandin û rexneya şerê berê. Hevalan li gundê Helincê perwerde didîtin. Rojekê ez ji bo dersdayînê çûm gel wan. Ew panzde roj bû dewreya wan dewam dikir. Hevalan jî bawer nedikir çawa ewqas demdirêj di perwerdê de mane û me dewreya wan belav nekiriye. Dema ez çûm ji min re gotin, hevala Meryem, pêşketinên nû hene. Tu bawer dikî emê bikarin perwerdeya xwe dewam bikin û bigihînin encamê?" Perwerdeya didîtin baş bû û xwesteka hevalan a perwerdê zêde bû. Piraniya wan jî demek dirêj bû perwerde nedîtibûn û pêdiviya wan bi perwerdê hebû. Min ji wan re got, "hevalno, vê carê ger şer bikeve nava Kobaniyê de jî em dest ji perwerdê bernadin. Ji ber divê destpêkê em di perwerdê de xwihdan birijînin ku em di şer de xwîn nedin." Dema min wisa got gelek heval keniyan û çûn rojên berê. Ji xwe berê xwin rijandibûn. Hinek ji piyê xwe, hinek ji destên xwe û hinek ji lebatên cuda yên laşê xwe birîndar bibûn.

Di rastiyê de pêdiviya me bi perwerdê hebû, lê di rewşek cuda de em neçar bûn hevalan belavî eniyan bikin. Ji ber tevî ku heval birîndar bûn jî di eniyan de fermandarî dikirin. Yên xwedî ezmûn û ji şer hinekê fêm dikirin ew bûn. Hevalê Rêzan çûbû li şûna hevalê Seydo çûbû Eniya Rojhilat. Hevalê Seydo jî hatibû beşdarî perwerdê bibû. Li ser gotina min got, "wile piştî ceribandina evqas çekên

ji Eyn El Îsa anîn ez bawer nakim em bi dawî bikin. Diyare wê di demekî nêzîk de êriş bikin. Lê qet nebe heta hingê em hinek perwerde bibînin. Ha ez mafê xewê jî nexwim. Bila hevalê Rêzan sax be, bi mehane bi qasî van rojan min xew nekiriye. Li eniyan heta sibê me nedikarî em xew bikin. Lê Ii vê derê çend roje em dikarin bêhna xwe vedin." Dema min bi hevalan re diaxivî tiştekê bala min kişand. Hinek hevalan dûrbînên xwe yên şevê bi xwe re anîbûn. Min ji wan re got, "hevalno, ev çiye? We çima dûrbînên xwe bi xwe re anîne, ma hûn ne hatine perwerdê?" Dema min wisa got ken bi hevalan ket û gotin, "hevala Meryem, me wekî tedbîr anîn. Ji ber em dizanin ne diyare. Te dît carekê de we gazî me kir û got di filan cihî de êriş heye. Ma em wê demê dikarin biçin bikevin pey peydakirina dûrbînan? Me ji bo wê anîn e." Heval mafdar bûn û di wî warî de ezmûnên wan hebûn. Ji ber berê gelek caran tiştên wisa hatibûn serê hevalên me yên di perwerdê de. Ji nişka ve me gazî wan kiribû, tevlî şer û pevçûnan bibûn.

Di wan deman de bayên şer êdî bi şehekî devtûj guliyên Kobaniyê şeh dikirin. Bi qasî amadekariyên êrişa li ser Kobaniyê dihat kirin, ji aliyê me ve jî ji bo xwe parastinê amadekarî dihatin kirin. Me dixwest em di vê navberê de hinekê bihêlin hêza me ya şer bêhna xwe veke û em hêza xwe li ser şêwaz, taktîk û stratejiya şerê dema pêş xwe amade bikin.  Ji xwe di dewreya perwerdê de jî me giranî dabû van mijaran. Me di vê demê de her wiha dixwest em komên xwe yên sekvanî û sabotajê zêde bikin. Çekên

di destê me de li hember çekên di destê Daîşê de lewaz bûn. Diviya bi sabotajan û çalakiyên sekvanî em bikarin pêşiyê li êrişên wan bigirin. Dîsa xalek din a sereke ya me xistî rojeva xwe çêkirina xendek û çeperên li derdora gundan û bajêr bû. Me dizanî êrişa vê carê bibe wê neşibe êrişa berê. Lewma me hewl dida em vê jî bixin rojeva hevalan û di derbarê giringiya şerê gelê şoreşgerî de çi ezmûnên me dizanîn me bi hevalan re jî parve dikirin.

Ji van ezmûnên me ji şerên berê dizanî û me dixwest em di qada xwe de jî pêk bînin yek jê, çêkirina xendekan bû. Li hember wesayîtên zirxî, panzer û tankan me biryar da em li derdora çeperên xwe û derdora bajarê Kobanî bi giştî xendekan çêkin. Ji xwe wekî ezmûna me ji şerên heta wê rojê girtîn, me komên xwe yên sekvaniyê û sabotajê zêde kiribûn. Ger bi xendekan jî ev hewldan bihatiya destketkirin me dikarî em baştir şer bikin. Lê di aliyê hejmarê de me zehmetî dijî. Ji ber di hemû eniyên me de rojane şer hebû, ji parastinê hejmarek zêde dihat xwestin. Lewma ji hêza mirovan zêdetir me hewl da em kepçeyan peyda bikin ku bikarin bi kepçeyan derdor bikolin û xendekên xwe çêbikin. Ev hem di warê wext de ji bo me dibû avantaj, hem jî em neçar nediman hemû hêza xwe ji bo vê bixin tevgerê, westan û ji hevketinek zêdetir di hêza me ya şer de çênedibû.

Beriya şerê Kobanî dest pê bike hevalê Diyar Bagok li Efrînê bû. Bi destpêkirina şer re ji hevalan xwestibû wî

bişînin Kobanî û di şerê Kobaniyê de cih girtibû. Hevalê Diyar kesekî ji Mêrdînê bû. Bab û birayekî wî di nava têkoşîna azadiya Kurdistanê de şehîd bibûn. Birayekî wî jî di girtîgehên dewleta Tirk de bû û cezayê heta hetayê lê hatibû birîn. Her çiqas hevalan ev daxwaza wî demekê neperjirandibûn û ji ber rewşa malbatê nexwestibûn wî bişînin jî xwe li ser rêveberiya qadê ferz kiribû û biryara xwe bi wan dabû erêkirin. Piştî wê komek heval girtibû gel xwe û berê xwe dabû Kobanî. Hevalê Diyar ev hatina xwe wekî pêkanîna Fermana Rêber Apo didît û digot, "banga Rêber Apo ya ji bo seferberiyê fermanbû ji bo her şoreşgerekê. Her çiqas hevala rewşa malbatê wekî eger didan nîşan jî min nekarî vê qebûl bikim. Ji ber em şoreşgerin û her şoreşger di ber biryarên dide de berpirsyar e. Min biryara pêkanîna fermana Rêbertiyê dabû. Ez bimayam minê bêmafî li daxwaz û baweriya xwe ya kesî bikiriya. Lewma min ji hevalan jî xwest rêz li daxwaza min bigirin û erê bikin. " Mirovek pîr û pak, dilsoz û wêrek bû. Bejna wî navîn û dagirtî bû. Hevalekî rengê wî genimî bû. Çavên wî reş û gir, mêjangên wî dirêj bûn. Ji ber her dem bi coş û moralek mezin dijî, çavên wî yên reş dibiriqîn û bi awirên xwe hestên xwe yên dilsoziyê belavî dilê herkesî dikir. Hevalê Diyar bi hatina xwe re hêzek mezin da kar û xebatên me yên li qadê. Ji ber hem ezmûna wî ya şer hebû, hem jî di kar û xebatan de mirovek xwedî danehevên hizrî, jîr û kêrhatî bû. Bi hatina wî re me biryar da ku hevalê Diyar li ser xebatên perwerdê û çêkirina çeperan bisekine.

Me digot divê em di nava meh û nîvê de van xendekan çêkin û heta ji me bê em giraniyê bidin perwerdekirina hevalan. Xeta me ya parastinê ya berê li hember asta êrişên dihat kirin têrê nedikir. Me di hinek cihan de xendek, di hinek cihan de çeperên ser erd û bin erd çêkiribûn. Lê di gelek cihan de valetî hebû û diviya em wan navberan hemûyan dagirin û derfeta xwe ya liv û tevgerkirinê xurt bikin. Lewma me ji biryargeha giştî xwest ku ji me re kepçan bikirin. Ji ber bi salan jî bi tevr û bêran me nedikarî em wan xendekên me çêkirina wan kiribû armanc çêbikin. Di şerê deştan de yek ji çekên herî pêwîst û dikare rol bilîze li gorî min kepçe ye. Ji ber di deşta rût de li hember çekên giran tiştek tu bikarî xwe li pişt biparêzî û şer bikî nine. Divê tu çeper û xendekên baş çêkî ku hêza te ya şer windayiyên mezin nede. Ji bo vî karî jî hevalê Masîro û hevalê Diyar Bagok xwe pêşniyar kirin. Me bi çêkirina van xendekan dixwest em pêşiyê li hatina maşînên bombebarkirî, tank û panzeran bigirin. Çêkirina wan xendekan ji me re karekî girîng û sereke bû. Ji ber vê pêşniyara hevalan hat erê kirin û herdu heval bûn berpirsên vî karî. Piştî hevalan dest bi kar kir û ev xebat rêxistin kirin, tenê me karî em du kepçeyan peyda bikin. Ew jî ji ber nebûna mazotê û kêmbûna parçeyên xirap dibûn wekî dihat xwestin ne dixebitîn. Carna bi heftiyan em li benda peydakirina mazotê, an ji bo tamîrkirina wan tiştên ku ji Tirkiyê dihatin diman. Hevalan bi cidiyet û ji dil kar dikirin. Lê hêj me ev kar neqedandî pêlên êrişan zêde bûn û ew karê me nîvçe ma.

## KEÇÊN KALO

Bêguman, ez ne nivîskarim û demek dirêj li ser tevna nivîsan nehizirîme. Lê her gotin û hevoka vê pirtûkê dilop bi dilop çavkaniya xwe ji şerê Kobaniyê digire û bûyer û rastiyên min jê re şahidî kirine. Tê bêjî qey resentiyek hemû giyana mirovan dîl digire li ser kavlên Kobaniyê hatiye nexşkirin. Ewqas resene ku xwe li dîwarên hişê te dide û hemû sînorên li pêşiya dîtinê dirûxîne. Ev rastî bi hemû ziraviyên xwe ve hêj jî li benda bersivên giranbiha ye û ji hişê niha gelek dûre. Tovek ji qelîştokên dîrokê xwe hildide û digihîne hişê me. Axek têr tove û tovên vê axê her diçe rûyê erdê diderizîne û dibe cîlwe. Çend sal berê zanyerekê ji bo Rêber Ocalan gotibû cîlweya dîrokê ye. Ev cîlwebûn bi kavlên Xeranê ve girê dida û digot 'dîrok ti car winda nabe.' Dîrok dibe avek kanzayî û xwe berdide nav qelşên axê. Bi demê re hildikşe jor û wekî rayekê dizê. Aha, Ocalan ev e. Axîr zeman peyveke Kurdî ye û ez ne şaşbim navê xwedê ye. Jixwe Ocalan jî cîlweya vê rastiyê ye. Gotinên vî mirovî li sînorên Xeranê wekî avek kanzayî dilop dilop xwe beridida nav hişê me. Dema hevalekî bi peyva Axir zeman ve girêdayî mijarek Avesteyê bi bîr anî, ez li ser vê peyvê gelek hizirîm. Hevalê ev mijar bilêv dikir, nedisekinî û pêve girêdayî gelek tiştên din digot. Li çeper û sengerên Kobaniyê şal û şepikên şervanên me darbiharî bûn. Şûtikên çar pênc metre yên li navtenga li nava xwe alandibûn bibûn mijara angaştên vî hevalî. Li gorî wî ev şûtik ji şûdhera Avestayê dihat.

Digot, “Navê Şelemeya Pêxember Zerdeşt Sûdhere û sê vecîzeyên wê yên navdar pênase dike. ‘Baş bihizire, baş bêje û baş bike’ bi sê badanên vê şûdikê tên ravekirin û niha jî bûye amûra têkûza çekên me.” Wekî mijara xwe xurt bike, ev peyvên wisa balkêş lê zêde dikir û dîsa vedigeriya ser mijara bingehîn. Jinan li Kobaniyê şer dikirin û bibûn hêza herî bingehîn a şerê Kobaniyê. Wekî Mamoyê me yê bi şerê hevala Peymana Zer ji ser xwe ve çûbû, vî hevalî jî heman tişt jiyan dikir. Her digot, “Wîjdan jine û ev di Avestayê de heye. Dema giyana mirov ji aliyê xwedê ve dikeve ber lêpirsînê, giyana mirov dibe keçek çarde salî. Dema bû keçek çarde salî diyare mirov tiştên gelek baş kiriye û wê biçe bihuştê. Ev keç, mirov di ser pira siratê re derbas dike û dibe bihuştê.” Li gorî min jî wijdana civakan jin e û civaka xwedî wijdanek ewqas bihêz, teqez dikare deriyê hemû bihuştan li ber xwe veke. Vê rastiya civaka me herî zêde xwe di şer û berxwedana Rojavayê Kurdistanê de da nîşan. Ger behsa wijdana mirovatiyê bê kirin, divê mirov temaşeyî rastiya jinên ciwan ên li Kobaniyê bike. Em îro beşa civîna tabûra bi dehan keçên şazdeh û hijdeh salî dinivîsîn. Bedewiya zimanê me ye. Her peyv şênbere û mirov dikare dest li peyvan bide. Civîn, an ku kombûna jinan mijara vê beşê ye. Wekî hevalê me yê serê xwe li ser Avestayê pir westandî jî gotî, jin wijdana civakê ye. Lewma nivîsandina van ciwanan wekî erkek wijdanî ye ji bo min jî.



Demsal û avhewa biharê bi hemû giraniya xwe ve xwe berdabû ser heriya Kobaniyê. Gul û şînkahiyên heyîn, weke xalîçeyek Kurdî xwe berdida ser bejn û bala keçikên vê axê. Simbil û firîkên gir dibûn wekî keziyên keçikên vê axê li ser qolincên axa bi berhem dihejiyan. Bi lêxistina baya hênik a biharê re ev simbil çep û rast libadibûn. Avahiyên bajêr jî weke hêka kewa gozel ya li ser çiqên dara çeqçeqokê çêkirî tevlî vê dîmena heyî dibûn. Zevî û bostanên derdora bajêr wekî fîstanek kesk xwe berdabû ser bejna demsalê û ev bajarê di dilê dîrokê de cih digirt dorpêç dikir. Germahiyeke gopalê xwe li hewaya havînê dida ji tîrêjên rojê belav dibû.

Çîrok kevnarin û ger bermahiyên wan heta roja îro xwe hatibin, ji bo mirovên heqîqetê diparêzin xwe di ser wan çîrokên kevnar de qevastin kêmasiyek mezin e. Du rastî û serpêhatiyên dijwar û dijberî hev ji nav kavlên Kobaniyê em dikşandin xwe û dibirin rojên berê.

Heyînek nazik û narîn li kêleka kanzayên wekî sergoyê lê hatiye û Kobanî kiriye kavil dijwariyek têr wate radixist pêş çavên me. Nêzî Girê Miştenûr Sikefta Keçan hebû. Li gorî gotegotên pîran li vê derê evîndar dihatin gel hev û sînorên li ser wan dihatin ferzkirin li vê deverê jibîr dibûn. Deriyê şikeftê di nav xecxecok, pelên xerdel û hîroyan de winda bibû. Ger peyv riya vebêja heqîqetêne, mirov nikare ji wan rizgar bibe. Lewma carna peyvek te li ser gelek rastiyan dide hizirandin û berê te dide riyên dûr û dirêj. Peyvên me bi qasî destpêka jiyanê kevinin û gelek wate li wan hatine barkirin. Şikeft û mizgeft jî wekî du şirîkên kevnar û têr wate li ser rûyê welatê min mişt in. Hinek mirov hene bi hemû hebûna xwe resen in û yên zimanê xwe ne. Min gelek mirovên wisa naskirin. Hinek jê wisa jê hatibîbûn û li ser zimanê Kurdî serwerbûn, te digot bi şîşikan goreyekê çêdikin. Li ser tevnek balkêş peyv digihandin hev, dikirin wateyên çil kezî û berdidan ser pişta roja me. Ez ji van jêhatin û jîriyên jinan fêrî gelek tiştan bûm. Têkiliya di navbera Şikefta Keçikan û Mizgeftan de jî berhema nîqaşek wan jinên bedew û wijdana civaka me bû. Hişê jinan ê zagonên îro nedipejirandin, her li pey rastî û heqîqetê di lêgerînek kûr de bûn.

* * *

Ez û hevaleke xwe ya ji wan bedewên ez behs dikim, li pêşberî Şikefta Keçikan rûniştibûn. Te digot qey heqîqeta dîrokê xwe berdabû ser awirên wê. Çavên wê

pak û zelal bûn. Hinekê beşişî û te digot qey kenê wê reng dide kulîlkên li ser Girê Miştenûr. Paşê got, “Hevala Meryem, ev demeke ez li ser zimanê Kurdî dihizirim. Tu dizanî, tîpa “j” binyat û stûna zimanê me ye?  Di heman demê de navê me ye. Jinê jî wekî avek kanzayî xwe berdaye nav hemû ziman û çanda me. Weke rayek avê her tiştî lê hertiştî şîn dike û xwedî dike. Li gorî min Mêj, an jî Nimêj jî fêkiyek vê avdanê ye û bûye namaz û îbadetên derdor. Te ji min re behsa zanyarê ji Rêber Apo re gotî cîlweyekî dîrokê ye kiribû. Aha ev lênûsa me ji nav kavlên Kobaniyê derxist û karê jinan vedibêje jî cîlveyek vê tiştê ye. Ger dîrok xwedî naz û cîlweyên wisa be, çima ev lênûsa civîna tabûra jinan ji vê rastiya qut be? Ma gelo Mêj ne mêjiyê me ye?” Piçekê kenî û berê xwe da Sikefta Keçikan. Dema dikenî hinarkên rûyê wê xwe ji dêmê wê dida der û wekî jêdera navê xwe lê dihatin. Li gorî bi giştî min ji gotinên wê fêm dikir, tişta bi jinê û mêjiyê jinê ve girêdayî jiyanî bû. Ne xof lê hatibû barkirin û ne jî dîlbûna mirov. Tevna wê ya jiyanê û hemû sembolên wê bi jiyanê ve girêdayî bûn. Li ser Girê Miştenûr serpêhatiya Kobaniyê û tiştên di vê lênûsa heyî de derbas dibûn ez dibirim wan kêliyên berê.

Welat û serpêhatiya welatê me ya kevnar di nav gelek çandên derdor de hatibû bicih kirin û bibû mijarên pirtûkên wan ên pîroz. Di vê kêliyê de min baştir coşa mamo fêm dikir ka çima wisa ji ser xwe diçû. Diyare di hişê kalo de dîrok bi hemû tevna xwe zindî dibû û êdî mîla demjimara elefirîngî li gorî dilê kalo dizîvirî. Ehda

Rêber Apo ya di xala herî lewaz de bawerî lê barkiribû, di rastiya civaka Kobaniyê de meydan li hemû ramanên cîhanê dixwend û ev ehd bi ser ketibû. Şûna dewsên Kalo yên giyayê li navikê diket diqelaşt, ji xecxecokan mîna soringê lêhatibû. Pesarên Miştenûrê wekî beran an jî dermaleyek salê yê bi soringê hatî sorkirin xuya dikir. Li vir dengê jinê bi awayekî gur belav dibû û mafdar bû jî. Xelekên dîrokî yên pêjna jinê ji Palmîra heta Sûra Anahîta û ji wir jî heta bajarê Amargî ku diket jêrî Reqayê li Kobaniyê digihîştin hev. Li gorî gelek zanyaran navê Sûrî ji Sûra Anahîta dihat û ev ehda dîrokî baştir bi wate dikir. Xelekek ji giyana jinê ev şoreşa dipêça û ji şoreşa Rojava re vala vala nedihat gotin şoreşa jinê ye. Ji xweliya xwe diafirî û coşa dilê Kalo diyar bû bêhemdî xwe lerzek ji pêlê dîrokê jiyan dikir. Keçikên Kalo hêjayî vê coşê bûn û weke berdevka wan min çend gotin û çend xetên stûr li ser lênûsê rêz kiribûn. Lênûsa keçikên Kalo di çenteyê hevala Viyan de tevlî çente winda bibû. Dema min bihîst lênûs hatiye dîtin, min digot qey ez cara diduyan ji dayîk bûme.

Lênûsa keçikên Kalo berî bigihîje goristana şehîdan gihiştibû destên min. Li ser bergên lênûsê hemû nîşanên şerê Kobaniyê xuya dikir. Mal bi mal gerîbû û bibû şahîdê hemû şervanan û şerên wan. Ez nizanim ji ber çi bû, lê xofekê dilê min dîl girtibû û xwe berdida nav şaneyên destê min. Destên min direcifîn li ser berga lênûsê. Ez û hevala xwe ya me bi hev re kêliyên dijwar parvekiribûn û me li ser şerê Kobaniyê gelek nîqaş

kiribû jî êdî wekî hev dihizirîn. Pêlûyên çavên min wekî baweşînê giran giran li dîmena serpêhatiyên lênûsê vedibûn. Xof derbasî wan jî bibû û hema hema dişibiyan destên min. Heçko deng ji lênûsê bên guhên min ez veciniqîm. Di wê kêliyê de ez hîn kûrtir gihîştim wateya pîrozan. Diyar bû tiştên pîroz, tiştên wisa ne. Hevala min bi çavdêriyek baldar ez dişopandim û bêyî yek gotinê bêje awirên xwe berdan ser lênûsê. Dîtina lênûsa parçeyek ji hiş û demboriya me bû. Her hevalekê herî kêm bi qasî min ji bo dîtina wê lênûsê ked dabû.

Piştî dîtina destpêkê ez hinek din aram bûm. Xofa min her diçû kêmdibû û rûyên hevalên jin yek bi yek li ser berga lênûsê zindî dibûn di çavên min de. Jiyankirina wê kêliyê ji bo min gelek zorbû. Lê diviya dilê min bikare wê rastiyê hilgire. Mirov car carnan li  hemberî şêwazê hebûn û heyînan aciz dibe. Hebûna şahane ku jêre mirov tê gotin bi parçeyek hesin ji nava me koç dikin. An jî nêzîkî me ne, lê hezkirin û bêrîkirinê hildikşînin aso. Ev amûra ku jêre lênûs tê gotin, bêyî tişt jê kêm bibe li cem me bû, lê hevalên me… Em êdî dizanin vê zagonê û fêrî wê bûne. Dil disoje û hemû lebetên me dikevin nav fêrbûnên ji wan mayîn. Carek, ducar û dibe ku heta dawiya jiyana mirov ev fêrbûnên mirov xwe dubare bikin. Hiş li hemberî soteya dil çiye gelo? An jî ev tişta tê sotin çiye? Me ji xwe re gotiye dile û em derbas dibin. Lê bi baweriya min ev ji dil gelek wirdetir e. Hemû bedena mirov ditevize û rayên laşê mirov tên hev. Ez niha baştir dizanim ev tişt xwesteka çûyîna gel wan e. Demarên

mirov rê li xwînê digirin û dilê mirov tînî dihêlin. Ez bawerim ev hişê qutbûnê nizane hişê herî raste. Gelo hîsa hizirandina şaneyên mirov di kîjan kêliyan de xwe didin der? Hîsa li ser şaneyê bedena xwe dihizire û mirov hemû bedena xwe hîs dike aha kêliyên wisa ne. Şane dizên û xwe bi şaneyên serpêhatiyên bi nirx zêde dikin. Ji ber vê rastiyê ye ez carnan ji xwezayê re diçim secdê. Dadweriya mirov ji xwezayê fêr bibe ev e û mirov bi wan dide jiyan kirin. Bedenên me li heriya Kobanê kiribûn destbirakên axê bi hemû giyana xwe di nava me de bi cih bibûn. Mirov ji ber vê piçekê balkêşe û divê zû bi zû mirov nebêje aha ez ev im. Xecxecok û nîsanokên ji axa hineyî serî hildabûn bi giyanên van hevalên me li çavên me bar dibûn. Miştenûra bi refên keçikên Kalo dikenî ji kanzaya têz û tinetê veguhezîbû kana komirê.

Avheweya biharê bi hemû kêrhatinên xwe ketibû nav karên paqijiya van dewsên mirovên şîrheram û nexşeya kenê keçikên Kalo lê serwer dikir. Bajarê Kobaniyê jî wisa bû.

Me hêdî hêdî xwe ji Miştenûr berda û em ber bi cihê tabûra YPJ'ê ve çûn. Gotin û vebêja vê kêliyê dibe hêsan be û heman hestê bi herkesî nede jiyankirin. Bêguman, ez ti kesî/ê ji ber vê rastiyê nadarizînim. Ger ez niha bêjim bajar diaxive an jî her dews gotinekê ji min re dibêje dibe ku baş neyê fêm kirin. Ger jiyan û dîmenek li gor hiş û hestên te nemeşe û badanên bi destên derve destwerdanê bikin, ji mirovan re tê. Gelo nexşeya Kobanî

û rastiya jiyana wê ya berê li hemberî vê rastiyê çi ji mirovan re dibêje? Di xeyal û hestên kê de rastiyek wisa hebû? Kê Kobaniyek wisa dihizirî û xeyal dikir? Gelo wê kîjan avhewa vê nexşeya heyberî ya mohra xwe li ser bedana me dayî û şopên mayînde li ser hiştî wekî xwezaya Miştenûrê paqij bike? Hevala min bibû şirîkê derûniya min û em bibûn cêwiyên heman rastiyê. Bajar bi jêma û bermahiyên xwe ve di ser hest û derûniya min re li çavdêriya hevala min diket û ew xistibû nav siyanetek mezin. Ji dengên Vîyana dengbêj û fermandar heta dengên kanzayî yên Kobanî ji binî ve dihejandin xwe li guhên me didan. Bajarek piştî lêhiyek mezin çawa rûxiya be, kolanên bajarê Kobaniyê wisa bûn.

Me xwe di ser çend sacên tenik re qevast û em çûn ber deriyê avahiya civîn lê hatî çêkirin. Wekî keştiyek ji ber pêl û bahoza deryayê felitîbe lê hatibû. Çend stûnên avahiyê bi ser derî de ketibûn û nîv bi nîv derî girtîbûn. Kêranê avahiyê kun kunî bibû û nîvê dîwar hatibû hilweşandin. Lê tiştek bi mêzeya min civîn li ser dimeşend nehatibû. Hevala min kursiyek li pêşiya mêzeyê danî û li ser rûnişt. Çend caran rabû û dîsa rûnişt. Min jî lênûs danî ser mêzeyê û li cihê civînê temaşe kir. Dema hevala min ber bi çavên min ket, wekî rondikek ez nekarim bisekinînim herikî ser hinarkên min. Min ji ber vê şerm nekir û min xwest bi awayek azad biherikin. Rondikên min dilê min diguvaşt û tîriyek ez têde hemû hinavê xwe di bin çavên xwe de hîs bikim jiyan dikir. Min lênûs vekir û danî ser mêzeyê. Lênûs,

pîroz a min bû. Hişdanka rojên kevnar, karika peyv û gotinên hevalên min bû. An ku rojnivîs û çîroka serpêhatiyên min bû. Piştî min lênûs vekir, hevala min hinek din xwe nêzî mêzê kir û dest bi xwendinê kir.

* * *

Em ketibûn pêvajoyek nû û her diçû me enî bi enî civîn çêdikirin. Di van rojên dawiyê de me giranî dabû ser civînên xweser. Keyfxweşiya di çavên van keçên ciwan de dişibe birqa di çavên zarokên di nav zeviyek genim de ketîn pey girtina xalxalokan.  Dema gotin û pêşketinên nû dibihîstin ewqas kêfxweş dibûn, wekî her gotin wan bi per û bas bike şad dibûn. Kêfxweşiya wan kêzikên biharekî têr gul û giya tanîn bîra min. Te wê bigotiya qey di destê her yek ji wan de qevdek gul heye û ber bi malê ve direvin û ji dayîkên xwe re dibêjin "dayê ka temaşe bike ev kulîlk çiqas xweşik in." Wê coş û birqandina çavên wan dihişt ez hêj zêdetir hevokên xwe baş bihonim û ji wan re wisa baxivim. Ji ber te digot qey qetine pey perperîkan û bi wan re wisa di nav gul û kulîlkên biharê de baz didin. Awirên wan wisa bi peyvên ji devê min derdiketin ve dibezîn, dixwestin gotin û peyvên tên kirin fêm bikin. Li ber çavên min her yek ji wan bibû perperîkek û ji kulîlkekê datanî ser kulîlka din.

Lê dema ez ji van hizrên xwe vedigerim û temaşe dikim, ez dibînim keçên ciwan in û temenê wan şazdeh, hivdeh, û hijdeh salin. Di nav wan de kêm heval hebûn temenê wan bist an jî jê zêdetir bû. Bi têgihiştina her peyv û

gotinê re kenê li ser lêvên wan serwer dibû û didanên wan mîna mercanan diyar dikirin. Te digot qey çavên wan neynik in û tux we di çavên wan de dibînî. Vê dîmenê dihişt heyecana min a jiyanê hêj zêdetir bibe û ez hêj bêhtir li ser fikir û ramanên xwe lêhûrbûnê bidim çêkirin. Min jî zêdetir dixwest bi gotin û hevokên xweş xemla rûyê wan ji ken dagirim.  Di wê kêliyê de ji min re wisa dihat ku bi hezaran kes ji min re digotin xemgînî li van keçên xweşik nayê. Bi dilek safî û hişek paqij li pêşberî min bûn. Vê rastiyê ez jî bandor dikirim û dihişt baweriya min a li hemberî gotinê hîn xurtir bibe. Çawa dayîkek li hemberî mezinbûna keça xwe kêfxweş dibe, me jî heman hest jiyan dikir. Hestên fermandarekê jî ji vê ne dûre û ya rast jî ev bi xwe ye. Raza serkeftinên mezin di vir de veşartiye û ya vê didin afirandin jî baldariya şervanên wê ye. Guman nîne jin vê rastiyê baştir xweşik dikin û didin xemilandin. Hevala Nalîn li kêleka min bi dengekî nizim got; “Hevala Meryem tu ji xwe re li van hevalan temaşe bike. Tê bêjî qey hatine cejnê.” Bi rastî jî dîmenek wisa li pêşberî min bû. Min kêliyekê destên xwe danî ser lamên xwe û bêdeng temaşeyî wan kir. Giyan û derûniya wan bi hemû giraniya xwe di bejn û bala wan de diyar dibû. Porên şehkirî, cil û tesîsatên leşkerî di nav ahengek gelek xweş de bû. Awirên wan wekî nîşana li heman xalê hatî girtin, li ser rû û devê min kom bibûn. Dema min şîroveya pêvajoyê dubare kir, awirên min jî mîna yê wan dişemitî ser bejn û bala wan. Hemûyan ez bi baldarî guhdar dikirim. Vê jî dihişt ez wekî herikandina avekê hevokên

xwe li pey hev rêz bikim û bihêlim baldariya wan zêdetir bibe. Berî ez nirxandina pêvajoya dawiyê biqedînim, destê hevala Viyan bi ber çavên min ket. Destê xwe yê rastê rakiribû û dixwest pirs bike an jî tiştna bêje. Hevala Viyan fermandara tabûrê bû. Bejna wê ya di nav cilên YPJ'ê de mîna hîroyek gulanî ya hemû gulên xwe vekirî diyar dibû. Van cilan ji amûrek leşkerî zêditir mîna keskahiyek biharê xwe li cavên mirov dida. Ji xwe dema axivî û gotin ji dev derketin, wekî şalûlekê lê hat û çavên min bi gotinên wê ve hatibûn mifte kirin. Wisa digot hevala Viyan:

- Heval bi rastî pêwîstiya me pir bi tiştekî wisa heye. Me hemûyan tecrûbe girtiye û em êdî dikarin bi awayekî aram tevlî pratîkê bibin. Bila dilê we aram be. Ez dizanim li pêşiya me firtoneyekî mezin heye û wê bi ser me de bê. Em ê ji bo vê firtone û bahozê amadebin. Baweriya min bi hêz û vîna me ya şer heye û em dikarin li hemberî her awayê êrişan li ber xwe bidin.

Min bi baldarî lê guhdar kir û piştî gotinên wê bi dawî bûn, min jê pirsî: "Heval Viyan tu dikarî bi serê xwe bimînî û bi hêza xwe têkevî nava şer?" Li ser pirsa min hinekê beşişî, temaşeyî hevalên derdora xwe kir û got; "Bi rastî jî min piştî çend çalakî û gotinên niha bihîst gelek bawerî bi min re çêbû." Dema li min temaşe kir û dît ez dixwazim guhdar bikim dewam kir: "Berê min hin caran bi xwe bawer nedikir. Min digot dibe ku ez nekarim di şer de ji hevalên xort re fermana bidim û wan

bi rêve bibim. Lê piştî şerê Girê şehîd Hogir, şerê Zor Mixarê û şerê li Lîwa Leşkerî çêbû, min pir bawerî bi xwe anî. Min dît hêza min a veşartî çiye.” Gotinên heval Viyan bala herkesê kişandbû û diyar bû çîroka herkesê digot. Herdu destên xwe mîna mirovekî nimêj dike gihandibûn hev û axaftina xwe dewam kir: “Min digot dibe ku ez takekesî dikarim şer bikim. Lê min dît di rastiyê de ez dikarim kesên li derdora xwe jî bidim şerkirin. Ev ji bo min hesta coş û dilxweşiyek mezin bû. Wekî ji dayîkbûnek nû ye. Ev rastî ji bo me jinên Kobanî tiştek pir girînge. Berê ji me re digotin hûn jin kêm in û bêhêz in. Lê min dît di çeperên şer de dijmin çiqas bi dijwarî tê ser me. Ev kêlî ji bo jinekê gelek girîng in û ez bawerim şoreşa jinê ya kesayetê ji vir destpê dike. Ger tu di wê kêliyê de bi ser bikevî, tu her tiştî bi bin dixî û baweriyek gotina wê zore xwe li te dipêçe. Kevneşopî û serpêhatiyên xwedavenda dayîk an jî destên wê li ser milên te ne. Yek kêliye, yanî tu çavên xwe digirî û vedikî. Dema ku tu henaseyekî kûr dikşînî û destê xwe datînî ser tetîkê her tişt li pey wê tê. Dema ez dibinim ez dagirkerên li ser axa xwe bi erdê re dikim yek, baskên min çêdibin û ez dikarim bifirim. Birastî di vî şerî de min ewqas hêza xwe naskir ku ez dikarim bibim teyrek û bifirim. Bila heval şaş fêm nekin. Ev gotinek mecazî ye. Lê hesta ez dijîm wisa ye. Eger ez xwedî vê biryara xwe bim, ezê nehêlim ti kes destên min bigirin û ezê bi xwe bifirim. Zemanê fira jinan di vê tekoşîna me de dibe rastiyek jêneger. Êdî em ne teyrên bê baskin. Em dikarin bi baskên xwe bifirin û êdî em dikarin her cihî ji xwe re

bikin hêlîn. Heger em xaka xwe azad nekin, emê bibin teyrên bê hêlîn.”

Gotinên hevala Vîyan coşa min kiribû deh qat û ez biribûm rojên berê. Fira teyran pênaseyek xweş û bedew bû û li vê axê dihat. Hemû serpêhatî û bîaranên jinên vê tekoşînê ji vê fire destpê dikir. An emê bifiriyan, an jî wê hinekan baskên me bişkandiyan. Vîyan çîroka min û hemû hevalên min jî vedigot. Xelekek xweş û qewîm li vê heriya Kobanî bi xeleka jinên tekoşer vedibû. Mirov hestyar dikir van gotinên bi wate û tijî coş. Min kêliyekê li hevala Nalîn temaşe kir û min dît ew jî bi baldariyek hestyar çûye rojên berê. Keç perwerdekirin û encam girtin xeyala hevalên me yên jin hemûyan bû. Gotinên xweş bûn û wekî herikandina Avaşîn ji çiyayên asê dihat. Awirên wê jî li cihekê aliqîbûn û diyare li ser tiştek bi jan dihizire. Paşê got; “Ji bo em bikarin hêlînek azad çêkin û zarokên ji van gundan koçberbûne û penaberitiyê jiyan dikin tê de bi cih bikin, ji bo em carek din wan vegerînin gund û dibistanên wan divê em xwe hêj xurtir bikin.Erka me hevalên jin ev e. Divê em bikarin xwe xurt bikin û em bikarin cardin dilê wan zarokan şad bikin. Em mertalên li pêşiya dilê dayîkan in. Divê em bes bihêlin dilê dayîkên me bi mirin û penaberbûna zarokên wan bi êşe. Ev erk û berpirsyartiya me ya dîrokiye. Heval bila dilê we aram be. Bi rastî jî me ezmûnek pir xurt derbas kir û ev ezmûn jî bi keda şehîdan ava bû. Me gelek berdêlên giran dan. Me gelek hevalên xwe yên hêja dan. Weke Botanê Reş, weke Botanê Sor, weke heval

Agirî, Avesta û Berfîn. Ezê bi biryardarî tevlî vê pêvajoyê bibim. Ezê kesayeta xwe li gorî xwebûn û berjewendiya azadiya jin amade bikim. Ezê weke keçeke Kobanî û Kurd, weke jinekî ku serokatiyê jê re silav şandîn xwe xurt bikim.  Ezê bi wan silavan bikarim bi hemû hêza xwe berxwedanê bikim."

Axaftinên civînên me car carnan li gorî bernameyê nediçûn û li gel me bibû şêwazek xwe pênasekirinê. Dibe ku ji ber rastiya heqîqet yekpare ye be jî me ti carî ev şaş nedît. Kesayet, pêvajo û nirxandinên derdor di yek carê de dihatin gotin. Lê nivîsa raporên van civînan hinekê zehmet dibû. Lewma ji derveyî hevala ku rapor binivîsiya, ev nirxandin li xweşa her kesekê diçûn û carna ji me re wekî helbestan dihatin. Me guhdarî dengê dilê hev, hestên hev dikir û bi qasî şerê me asta me ya hev fêmkirinê jî girîng bû. Avaniya tabûrê ya heval Viyan jê berpirsyar bi aramî fermandara xwe guhdar dikirin û ji xwe re dikirin pesnek pênasa wê zor. Diyar bû wê jî ev dizanî û mîna xelaca pembo bûyer û diyarde di nirxandina xwe de ji hev dikirin. Çavên wê her li ser mêzeya dîwanê bû û ji nişka ve li avaniya xwe temaşe kir. Di bin lêvên xwe de kenî û nirxandina xwe domand; "Di kesayayeta min de herî zêde tişta hişt ez bibim xwedî vê wêrektî û baweriyê şahîdiya min a berxwedana gelê Bakur e. Min her demê cihê xwe di eniya li ser sînor de girt. Min dît gelê me yê Bakurê Kurdistanê çiqas bi biryardarî tevdigere û çiqas girêdayî ax û têkoşîna li Kobaniyê ne. Lê ez vê derê tenê weke Kobanî nabînim û

ez weke hemû Kurdistanê dibînim. Dema dayîkan, ciwanan û mirovên kal û pîr destên xwe li wan têlên badayî dixistin û xwîn ji destê wan dihat, te digot ew ne têlên rêsayîne, pemboye di bin destên wan de. Hîs û vîna wan, dil û hişê wan bi hemû awayî wekî tîra kevanê bi Kobaniyê ve hatibû miftekirin. Wê ev rastî têra min bike ku ez weke navê xwe tevbigerim." Min li lênûsa xwe pir tişt nenivîsand, lê min bi baldarî guhdar dikir. Bala min çû ser lênûsa tabûrê û nivîskara wê. Serê wê di ber de bû û diyar bû gotinên hevala Vîyan xal bi xal derbasî lênûsê dikir.  Bi bêdengiyê re min serê xwe zivîrand û min fêm kir ku nirxandinên hevala Viyan xelas bûne. Çend dest li hewa bûn û dixwestin mafê axafinê bigrin. Min xwest Hevala Viyan rûne û ez mafê axaftinê bidim hevalên din.

Peyva mafê gotinê, an jî axaftinê dayîn peyvek girêdayî rê û resma fermiyetên me ye. Di kombûn û civînên xwe de em bi rêzê di axivin û kesa/ê dixwaze baxive ji kesên civînê rêve dibin destûr werdigirin. Dema mafê axaftinê tê dayîn, kes radibin ser xwe û dest bi axaftinê dikin. Min carêkê dît hevala Rêvan ya cavreş, esmer û bejîn zirav mafê axafinê xwest. Bêyî ku ez wê bidim rawestandin min mafê axaftinê dayê û wê dest bi axaftinê kir: "Heval bi rastî ez pir ne kevn im. Lê ez pir dixwazim perwerdeyekê bibînim. Ji bo ez hêj xurtir bikarim tevlî bibim, pêdiviya min bi perwerdê heye." Heval Rêvan dema deste xwe rakîr te di got qey hemû şaneyên bedena wê di tevgerê de ne. Bi rengekî lez rabibû ser xwe. Bi lêvên xwe yên tenik ev çend gotin kir û li benda

bersivên me ma. Gotinên wê di serê min re diçûn û dihatin, lê berî ez tiştekê bêjim min xwest ew bi xwe bigihêje encamek rast. Min got, “hevala Rêwan tu bi xwe fermandara yekîneyê yî.” Rêvan bi awayekî lez bersiva min da û got; “Raste ez fermandara yekîneyê me, lê min perwerdeya şervanên nû nedîtiye. Ji bo ez bikarim baş tevlî vê pêvajoya pêşiya me bibim, ez pêwîst dibinim demek kurt perwerdeya xwe ya şervanên nû bibinim û wisa tevbigerim. Li gorî min bi vî awayî wê tevlîbûna min baştir bibe.”

Carnan hemû hiş û tiştên di hundirê mirovan de heyîn xwe di çend gotinan de didin der û tu nikarî van gotinan nepejirînî. Bi rûyek şîrîn û çavên narîntiyek xezalî dihebînin li pêşberî me bû. Ji bilî hevalekê me hemûyan nêrînên wê pejirandin. Berevajî biryara me, Hevala Vîyan rabû û got; “Heval pêwîstiya me bi heval Rêvan heye û bila heval bimîne. Pirsgirêka wê ya ezmûna şer û tevlîbûnê nîne. Ez bawerim mana wê, wê ji çûyîna wê ya perwerdeya şervantiya nû sûdwertir be.”

Rêvana me nedixwest bêrêziyê li fermandara xwe bike, lê dixwest ji hatina me ya wê derê û gotinên fermandara xwe hevsengiyek li gorî xwesteka xwe çêbike. Çavên wê ev xwesteka wê dida der û wekî bêje, hevalno, ji bo xwedê ez dixwazim hêj baştir tevlî bibim. Bihêlin ku ez tevlîbûnên xwe baştir bikim. Her çiqas me di çavên wê de ev xwendibe jî di nêrîna xwe de israr kir. Nêzî çend xuleyan pêvajoya beşdarbûna xwe anî ziman û wekî

tiştek li gotinên xwe zêde bike nemabe bêdeng bû. Wekî hundirê hişê me bixwîne, xwe di dilê me de bicihkiribû û aramiyek xweş rûyê wê dorpêç kir. Me çend hevalên rêveberiyê bi serê xwe nêrînên wê erê kirin û ew êdî rêwiya baregeha şervanên nû bû. Rêvan li gorî şêwaza xwe serkeftiyê civînê bû û coşek mezin ew rapêçabû. Me navbera xwarina nîvro dayê. Piştî xwarinê jî civîn bi heman şêwazî domiya. Piştî civîn û perwerdeya vê tabûrê xebatên me yên tabûrên xweser dewam kir û encamên erênî yên li ber çav dida. Mîna gulek biharî li wan dihat û motavîsyona wan a jiyanê gelek xurt dibû. Dengên gur û hêviyên pêşerojê di hemû kar û pêşniyarên pêvajoyê de jî diyar dibûn. Germahî û hêviyên jiyanê di xeta xweser de hîn li pêş bûn.

* * *

Lênûs bi vê beşê bi dawî dibû û zeman bi hemû giranî û heyberên ber çav xwe li ser me ferz dikir. Heyber û gotin li ser giyana me ketibûn nav şerek gelek mezin û bi hêviya têkbirina me şerê xwe didomandin. Gotin û serpêhatî ji bo derûniya me ya wê kêliyê li me baştir dihat. Lê jiyana heyî bi hemû serweriya xwe em dikşandin zemanê rast. Me lênûs girt û em li pêşberî hev rûniştin. Tam di wê demê de hevalek jin ket hundir û çay ji me re anî. Hişê hevala min çûbû ser sergotara tabûra Roza. “Ma gelo wê kesek me bi bîr bîne û rojekê wê kesek me binivîse.” Belê sergotar ev bû û ji xwe bi hemû zindîbûna xwe di serê min de diçû û dihat. Hevala min

temaşeyî rûyê min kir û çend gotin li yê Roza zêdekirin: “Fermandariyek wisa bi wate ye. Hevalên me ji serkeftina şer piştrast in û qet behsa tiştek ji derveyî serkeftinê nakin. Lê pirsa ‘ma gelo wê kesek me binivîse’ pirsek bi qasî serkeftinê watedar e. Ger serkeftin neyên nivîsîn çi wateya wan heye? Hevala Roza birîna me Kurda destnîşan dike. Me gelek şer kirin, lê me qet nenivîsîn. Li gorî min divê fermandarî bi vê bê pîvan.”Qurtek li çaya xwe da, porê xwe vekir û dîsa şidand. Mîna biçe cengek mezin destên xwe avêt lênûsê û xwendina xwe dewam kir.

* * *

Belê gotinên Roza ev bûn û nîqaşa me li ser gotinên sergotara lênûsê bûn. Kenê li ser rûyê Roza bi peyvên lênûsê difûrî û xwe li tilê avahiyê  dida. Ez ji ken û gotinên Roza gihaştibûm gotinên Zînê.

Zînê bi rûyê xwe yê spî, çavên zer û hingivînî wekî wêneyê bi firçeya şêwekarek pispor hatî çêkirin û hemû xewn û xeyalên xwe yên xweşikbûnê lê barkirî li pêşberî me bû. Lêvên xwe yên gilyasî ji hev vekir  û got: “Ez bi vî zemanî bawerim. Zeman zemanê jina ye û tişta em jî dikin tevna wê ye. Wê teqez hinek me binivîsin û ez ji niha ve rûyê wan xeyal dikim.” Roza bi gotinên Zînê beşişî û bersivek balkêş da; “Jixwe Kurd baş dizanin Zînê binivîsin. Berê jî nivîsîne. Hîvî dikim nivîskarekî wekî Ehmedê Xanê dîsa ji dayik bibe.” Navên me ne jixwe bûn û xwedî giyanek dîrokî bûn. Nav giyana xwe jî çêdikin. Ji

ber wê jî Zînê bersiva Roza da û got, “Navê te jî ji navê Roza Luksembûrg tê. Yên nezanin wê bêjin qet li ser nave Roza tiştek nehatiye nivîsin.” Axaftinên wan mirov keyfxweş dikir û hêviyên mezin di mirov de çêdikriin. Li ser vê heriya Kobaniyê mijarên gelek kûr û bi wate dihatin vegotin. Min jî xwest ez dengê xwe tevlî yê wan bikim û min got, “Ya rast dîrok zindiye û rihê dîrokê niha li vir e. Dibe ku ew niha ne li vir bin û hûn niha di dewsa wan de jiyan dikin. Wê hinek din jî di dewsa we de navê we li xwe bikin. Her yek ji me jixwe wisa ye. Ji ber jiyan zindiye û her demê rihê dîrokê heye. Yek nebe jî navê wê dimîne. Divê em bizanin jiyana me ya her roj parçeyek ji dîrokê ye û ev dîrok jî wê teqez were nivîsîn. Lê hinek dîrok şaş tên nivîsandin û hindek jî bi heqiqeta xwe tên nivîsandin. Ji bo em bikarin heqiqeta vê dîrokê binivîsin, divê em vî dijminê li beramberî xwe têk bibin. Ger em bikarin dagirkerî û bi taybet desthilatdariya zilam bin bixin, wê gavê em dikarin hêviya azadiyê di nav civaka xwe de xurt bikin.” Ev çend roj bûn bê navber me nîqaş dikir û ti westandin di me de nedida çêkirin. Gotina Rêber APO hat bîra min. Rêber Apo digot, “Ez ji karên ne ji dil hez nakim û ji min re wekî peywirên tên. Lê dema ez di armanca karekê de zelal bim, ez ti car nawestim. Çi enerjiya pêwistbe armanca min diafirîne û min nawestîne. Bi rastî rewşa me jî dişibiya vê. Karên zêrîn mirovan newestînin. Navber bû lê me bênavber nîqaş dikir. Roza piştî min ji zû ve dest bi axafinê kiribû; “Tiştek di dilê min de heye û dixwazim bi te re parve bikim. Ewqas guhartin hatine çêkirin ku ez nizanim

çawa ji te re bêjim. Dema ez li hevalên me dinêrim di çavên min de pir xweşik bûne û şer ew spehî kirine. Di rûyê her hevalekê de biryarbûnek pir cuda heye. Ev jî dihêle ez pir bihêz bibim û baweriya min xurt be. Dema tu îro di axivî min li pişt xwe temaşe kir û dîmenek di serê min de zindî bû. Te digot qey hişê her hevalekê li ser tevnekê dixebite. Hemû bi kûrahî dihizirîn û wekî endazyaran di serê xwe de tiştekê ava dikin. Her hevalek niha di serê xwe de bername û planekê ava dike. Tê bibînî emê di demek kurt de encamên wan hizrên kûr bibînin. Baweriya min bi me xurt bûye. Ger em bixwazin û pê bawer bikin, em dikarin gelek tiştan bikin."

Nîqaşa me êdî zîvirîbû ser mijarên şer û girtina derdor. Li gorî Roza ev nîqaşên çend rojbûn dihatin kirin û bi taybet jî yên di derbarê hevalên jin ên şehît de bandorek mezin çêkiribûn. Di şert û mercên zor de biryara azadiya jinê û sekna bi vîn ya dihat raberkirin de gelek derfet û rê û rêbazên nû di afirand. Nîqaşan baweriya wan hîn xurtir kiribû û dihişt baştir bi xwe bawer bikin. Ji bo girtina cihan a ji aliyê jina ve tiştên nû digotin û dixwestin baştir xwe bi cih bikin. Lê car carnan ji gotinên serpêhatiyên kevn encamên şaş jî derdixistin. Ger kêlî bi kêlî li ser nehatibûya sekinandin dijberiyek zûwa ya li hemberî hevalên xort pêş diket. Gotinên hevala Medya piçekê nêzî vê rastiyê bûn: Hevala Medya dest bi axaftinê kir û got, "Ez jî tevlî heval Roza dibim. Li vê eniyê li gel me gurubek hevalên xort hene û êvaran tên hişedariyê. Jixwe herdu girên me jî me bi tena serê xwe

ne. pêwîst nake ev hevalên xort êvaran jî bên. Çar pênç hevalên din jî bidin me û bila eniya me seranser êdî tenê ayîdî me be. Em dixwazin êdî bi serê xwe bimînin û tenê şer bikin. Bila taximek ji tabûra me ya hêza pispor jî li gel me be û em besî xwe ne.”

Gotin û nirxandinên bi wate diviya bi nîqaşên wisa encam nebûyan. Di tekoşîna jinê ya kevin de dijberiyên mafdar û di cih de dihatin raberkirin. Lê niha rewşeke wisa astengiyan ava bike nemabû û dijbertiyek wisa ne rastbû. Wekî tayek zirav be jî dijberiyek teorîk xwe hildida nav karên pratîkî jî. Di vê hêlê de rê û rêbaz nîşandan tişta herî girîng bû. Min li ser vê rewş çend nirxandin kir û ez piçekê aciz jî bûm. Wê gavê mînaka hevala Newroz dan min û xwestin piçekê be jî ez wan fêm bikim. Wan digot qey ez ji wan fêm nakim. Hevala Newroz hevalek qelew bû. Hevalên xort nexwestibûn bi wan re biçe şer. Ji ber bawer dikirin wê qelewiya wê bibe asteng û nikare şer bike. Lê mînaka hevala Newroz ez bawerim ti carî nayê jibîrkirin û li gorî gotinên doktoran vê hevalê sînorên beden û fîzîkê derbas kiribûn. Di pevçûnê de ji zikê xwe birîndar dibe. Ew bi xwe zikê xwe girê dide û li ser vê jî du çekên hevalên li kêleka xwe jî hildigre û wan jî xelas dike. Fîzîka wê ya digotin astenge veguhezîbû hêzek ti kes ne li bendê be. Dîroka tekoşîna jinê piçekê be jî di pratîka heval Newroz de dubare dibû û bibû mînakek mayînde. Bûyerek bi serê xwe divê bê nivîsandin û baş bê ravekirin e. Fermandarê li gel bîrîndar dibe xelas dike. Tevî ew jî

bîrîndare bêtêlê jê digire û bi hevalan re dikeve pêwendiyê. Ji devê fermandarê wê bi zor peyv derdikevin û tişta derdikeve jî dibe lêborîn. Heval Newroz şervanek nû bû û seraser bibû mijara me ya civînê. Diviya mafê wê bihatiya dayîn. Dîsa li hemberî gotinên hevala Medya ên çors mînakek herî şênber û bi wate bû hevala Newroz. Li eniya hevala Roza lê dima hevalên kevin kêmbûn û yên hebûn jî bi gotina heval Mizgîn diviya rola xwe bilîzin. Vê mijarê her tim bala hevalên nû dikişand û wekî rexneyekê li ser xwe digirtin. Ev nêzîkî saatekê bû civînê li vir destpê kiribû. Tam di wê kêliyê de hevala Zîn destê xwe rakir û tevlî nirxandinê bû: "Heval ez dixwazim tiştekê bêjim, kevinbûn û nûbûn tine ye. Ya girîng em bikarin rast tevbigerin. Gelek hevalên nû hebûn û hevalên temenê wan biçûk bûn. Rola xwe pir baş lîstin û hiştin ku dijmin bişkê. Ev ji bo me xaleke pir girîng e û pêwîste em di kesayetên xwe de vê ji xwe re bikin mînak." Hevala Zînê gelek tund û radîkal bû. Gotina xwe ji kesekê re nedihişt û dibin gotinan de nedima. Kesên ku di hamleyê de erka xwe neanîbûn cih jî rexne kir û paşê rûnişt.

Diyar bû dor hatibû hevalên ciwan û hevala me Zînê rê ji wan re vekiribû. Piştî wê Newala biçûk rabû ser xwe û ji cihê Zînê mayî dewam kir: "Ez dixwazim nêrînên xwe bêjim. Heval dibêjin bila hevalên ciwan tevlî şer nebin. Ger heval me tevlî şer nekin, em ê bi serê xwe tevlî bibin. Erê em ciwan in, lê belê dema dijmin bê nabêje hûn ciwan in, an jî hûn pîr û kal in. Dijmin ti car vê nabêje. Ji

ber dijminek hov li himber me şer dike. Pêwîste em ti caran li pêşiya xwe tiştek nekin asteng. Em taximek hevalên ciwan hene. Heval me li vir didin sekinandin û em tevlî vê nêzîkatiyê nabin. Pêvajo girînge û pêwîste em jî biçin eniyên şer. Divê em jî bikarin beşdarî şer bibin û rola xwe bilîzin. Di vir de mezinbûn û biçûkbûn nîne. Dijmin çawa zarokên danzde û sêzde salî birin? Ma ev rastî ji bîra hevalan çûye? Niha li bazarên ereban wan difiroşin. Ez dibêjim êdî ji me re biçûk bûn û mezin bûn ne maye û divê pêşiya mafê me yê xweparastinê neyê girtin. Em ne biçûkin heval. Ev van nêzîkatiyên hevalan ên me ji derveyî şer dihêlin rast nabînin.”

Dema Newala biçûk wisa got, min di çavên hemû hevalên ciwan de ronayiyek dibiriqe derdor dît. Weke bêjin rast dibêje û em hemû tevlî wê dibin bi hejandina serê xwe gotinên wê erê dikirin û dixwestin em jî vê daxwaza wan bibînin. Di wê navberê de, Sema, Şîlan û hevala Jiyan jî destên xwe rakirin û xwestin tevlî şîroveyê bibin. Coşa Newala biçûk avakiribû wekî lêhiyekê herikîbû ser dil û hişê hevalên ciwan. Coşek wisa bû, dikarî mijara civînê biguhere an jî rojevek cuda ava bike. Di wê kêliyê de ez neçar mam destwerdan li vê pêşketina nû bikim. Ji bo ez bikarim pêşiyê li wan bigirim min got; “Ka deqîqeyekê rawestin. Heval mafdarin rexneyên xwe bikin, nêrîn û pêşniyarên xwe bêjin. Raste hinek mijar nazikin û em li gorî wê nêzîk dibin. Kesekê ne gotiye em we naxin nav şer. Lê heta derfet hebe em naxwazin hevalên ciwan di şerê germ de

cih bigirin. Ha, wexta şer hat ber derî ji xwe çare nîne. Wê demê hemû heval bi neçarî wê beşdar bibin. Kesek nikare mafê we yê xweparastinê ji dest we bigire. Ne ez û ne ti hevalek din. Lê divê hûn jî hinekê li gorî pîvan û nêzîkatiyên giştî yên rêxistinê nêzîkî vê mijarê bibin. Ji ber nazik nêzîkbûna mijarê ya hevalan, hûn hevalên berpirsyar tewanbar nekin. Ji ber tişta em dikin rast e û tişta rast heta ji me bê divê em we nebin cihên şerê germ lê tê kirin. Lê kengê pêdiviya xwe parastinê û şerkirinê çêbû, wê demê kes nikare pêşiyê li mafê we yê xweparastinê bigire. Hûn jî wê demê dikarin bi hemû hêza xwe vex we biparêzin." Dema ku min wisa got, hinekê keyfa wan xweş bû. Fêm kiribûn ku em ne ku bi wan bawer nakin û wan naxin nava şer. Wekî bêjin dengê me hat bihîsin dilê wan aram bû û kenek şirîn xwe berda ser rûyê wan.

Her diçû mijarên civîna me şênber dibûn. Hevalan xebatên xwe dinirxandin û nêrîn û pêşniyarên nû dihatin kirin. Koma me ya sekvaniyê rabû tekmîla xebata xwe da û hevalan xebata xwe nirxand. Hevalên di koma sekvaniyê de rol lîstibûn pêşniyara mezinkirin û xurtkirina komên sekvaniyê kirin. Nêrîn û coşa bi wan re hêz dida mirov û dihişt mirov her tiştê wan bi ziravî guhdar bike. Gelek nêrîn û pêşniyar hebûn. Ji bo nêrînên wan baştir encam bigrin û bigihêjin plansaziyekê, min ji wan re got; "Bila hemû heval piştî civînê nêrînên xwe bi awayekî rêk û pêk binivîsin. Pêşniyarên her komê, taxim, yekîne û tabûrê bên girtin û em van bigihînin bername û

plansaziyekê. Her taxim, yekîne û tabûr dikare plana xwe ya çalakiyan bi ziravî vebêje. Wê bikare çi bike, li kû û çawa hemûyan binivîsin. Em paşê wan nêrîn û pêşniyaran hemûyan binirxînin û bigihînin encamekê. Em dikarin li ser wan encaman plansaziyek nû ya çalakî û xebatan pêk bînin."

Roja diduyan a civînê hevalan girêdayî van nêrîn û pêşniyara min nêrîn û pêşniyarên xwe bi nivîskî dan me. Piraniya hevalan plana çalakiyên dihizrin li ser Embara genim a Sirînê çêkiribûn. Di nav wan de nêrîn û pêşniyarên hatîn kirin de, nêrîn û pêşniyara hevala Berfîn a karê sekvaniyê dikir balkêş bû. Rapora xwe ya çalakiya fedayî nivîsîbû û wê çalakiya dihizire çawa bike bi hemû ziraviyan ve nivîsibû. Gelek nêrînên wisa balkêş hebûn û di vê derbarê de jî rapor hatibûn nivîsandin. Civînên me yên nîv bi nîv perwerde bingeh digirtin gihaştibûn encamê. Lêhûrbûn û hizirandinek baş bi xwe re derxistibûn holê. Tişta ez bi baldarî li ser disekinim jî mijara bi xwe bawerbûnê bû. Ya girîng ev bû. Ger ev hebe dikarî li pey xwe gelek tiştan bi afirîne. Bi wê xwebaweriyê me dikarî em serkeftinan bi dest bixin. Lewma min digot bawerî û bawerî mifteya hemû tiştan bû. Şerên Kobaniyê bi rastî jî şerê Kobaniyê bû. Kobana tijî zilam û ji pesnên wan derbas nedibû veguhezîbû cihê artêşek jin. Ji şervan heta fermandar rengek jinê serwerbû û ev bi xwe jî nîşana serkeftin û guhertinê bû. Di gelek eniyên me de du xuşk û bira, an jî bab û keçan bi hev re şer dikirin. Me di vê civînê de xwest vê jî bidin

guhertin, lê bertek pir zêde bûn. Xwesteka wan a li gel hev mayînê pir zêde bû û vê jî em tengav dikirın. Hevala Bêrîtan û Berîvan yek ji vê mînakê bûn. Me bi zorê vesaziya wan da çêkirin.

Mijarek balkêş û di bernameya civîna me de nebû, mijara hevala Zîlan Qeremox bû. Ev hevala me berê ji tevgera azadiya Kurdistanê qut bibû û çûbû malê. Me dest bi civînan kir û şûn de, min dît babê wê ew anî û hatin cihê me lê civîn çêdikir. Civînên me wekî zibareyên kevin ên çanda me Kurdan bûn. Dema civînên hevalên jin çêdibûn bala hemû şêniyên derdor dikişand û bi baldarî dişopandin. Kombûna jinan wêrektî û xweşikbûnek li derdora xwe belav dikir û dibûn rengek jiyanê yê nûjen. Te digot qey rojên cejnê ne. Hewaya civînên me wisa bûn. Em dihatin gel hev, me hev didît û rewşa xwe dinirxand. Ken û berjengên xweşikbûnê mîna dûkêlê ber bi ezmanan ve hildikşiyan jor û wekî Rêber Apo dibêje dilop bi dilop dibarîn li ser axê. Berî em dest bi civînê bikin min û hevala Nalîn xwest em guhdarî hevala Zîlan bikin. Bi şermek dêmê wê sor dike û gotinan bi zorê ji gewriya derdixe axivî û got; “Ez berê ji hinek tiştan aciz bûm û ji nav tevgerê revîm. Lê ez niha dixwazim tevlî vê pêngavê û şerê xweparastinê bibim. Min berê çeka B7 bi kar dianî û ez dixwazim heval cardin çeka min bidin min. Ev mehek çêbû ez çûme û niha dixwazim cardin vegerim. Ez dixwazim tevlî hevalên xwe bibim. Ji ber gelek hevalên berê em bi hev re bûn şehîd bûn. Min bi şehîdbûna wan ferq kir ku ez nikarim

ji vê jiyanê û hevalên xwe dûr bijîm û henase nagirim. Ez dixwazim di taxima heval Nûcan de cihê xwe bigrim." Kêm zêde gotinên hevala Zîlan wisa bûn. Me ew tevlî civînê kir û piştî nirxandinên hevalan û rexneyên wan lê hatin kirin tevlî bû. Me piştî tevlbûna hevala Zîlan her saloxên xweş û serkeftî jê bihîstin.

## EMÊ MIRINA BI RÛMET BI KEN PÊŞWAZÎ BIKIN

Dema civîn û perwerdeya me ya vê eniyê bi dawî bû, herkesê dest bi dîlanê kir û bi ruhê em bikarin serkeftinê misoger bikin derdor ji tilîliyan hejî. Biryar û drûşmeya civîna me jî "Emê mirina bi rûmet bi ken pêşwazî bikin" bû. Ji ber di her civînê de ev dihat gotin, êdî di nav me de bibû wekî dirûşmeyekê û hemû hevalan bikar tanî. Me di jiyana xwe de ji zû ve mirîn bin xistibû û dema min li wan dinêrî rûdawek wêrek û bi vîn xwe misoger dikir li ser hişê min. Van keçan di hemû zorî û zehmetiyan de ji zû ve mirin kuştibûn. Di dawiya her civînekê de min digot; "Keçên di jiyana xwe de mirin bin xistine û bi ken dicin şehadetê bê mirin in. Şoreşgerên bi ken diçin şehadetê. Her ciqas herkes wate nade vê rastiya me û fêmkirina wê zehmet be jî ev heqîqeta şoreşgerên vê axê ye.  Kesên ewqas ji jiyanê hez dikin bi ken diçin mirinê. Ji xwe hevalê Kemal Pîr vala negotiye, 'Em bi qasî ku di oxira wê de biçin mirinê ji jiyanê hez dikin.' Di kesayetên

wan keçan de, ew ruh herdem di pêş debû. Bi rastî jî her yekê ji wan destanek nivîsand. Di jiyana xwe de her demê keniyan û ne giriyan.  Girî jî di cihê xwe de bê kirin bi wate ye. Mirov car carnan ji keyfa jî digirî. Lê êdî rikberiyek be jî ev keç nedigirîn û ken ji rûyê wan ên bedew kêm nedibû. Mîna biçin dawetekê bi coş û keyfxweşî tevlî şer dibûn.




Coş, biryardarî û tevlîbûna jinan dihişt em di warê xebatên jinan de jî gavên nû bavêjin. Piştî me civîn li hemû eniyan çêkirin û şûn de, me biryar girt em tabûrek jinan bi nave şehîd Sozdar ava bikin. Wekî pêdiviyekê me dixwest bi avakirina vê tabûrê em pergala xwe bihêztir bikin û hemû saziyên me di vê tabûrê de bikarin cih bigirin. Biryara vê tabûra jinan a serbixwe jî berhema van civînan bû. Di vê pêvajoya nû de li her eniyê tabûrên xweser an ku yên jinan dihatin rêxistinkirin. Li gorî eniyên li Kobanî tabûrên me dibûn pênc. Armanca me ji

van tabûran zêdekirina hevalên jin û girtina ewlekariyê bû. Dema me biryara tabûra xweser a bi nave tabûra Şehîd Zozdar da, birastî kelecanek pir cuda bi xwe re anî. Dengê hile hila lehiya dorpêçkirina Kobaniyê dihat û avakirina van tabûrên me biryarên di cih de bûn. Li hemû derê hebûna jin û rêxistina wê ji bo me amena bû. Her biryarek wisa kelecanek cuda bi me re dida avakirin. Vê jî di her hevalekê de ruheke cuda dida çêkirin. Wateya vê bi xwe gelek girînge. Li cihekî mîna Kobaniyê serwerkirina jinê serkeftina tekoşîna azadiyê bû. Xelekên xweser, li xelekên heyî zêdekirin ji şer hîn zortir bû û serkeftina vê serkeftina şer jî diyar dikir. Her heval bi vê zanebûnê tevdigerî û berî zemanê îlankirina tabûrê bi rojekê her hevalekê di hemû aliyan de xwe amade dikir. Çawa gewde û bedena mirov ji lebetên fîzîkî pêk tê, rixistin jî wisa ye û vê jî dihişt her hevala me ya jin wekî gulekê geş bibe. Wekî nimêj û îbadetê pîrozkirina vê rojê hiştibû amadekariyên me veguhezin pîrozkirina cejnekê. Me hemû malbatên hevalan û gelê Kobanî vexwendibû roja merasima îlankirina tabûrê. Cihê tabûra me diket kêleka Kobaniyê û derdora wê vala bû. Mîna jînwarekê lêhatibû û ji cihek leşkerî zêdetir cihê jiyan û hêviyan bû. Di dîrokê de cara yekê bû cihê jinan hebûn. Ev çend metre be jî di cîhanek wisa de li cihekî teng be jî henase girtin gelek pîroz bû. An jî mirov dikare bêje cihekî jina yê jiyanê hebû. Jinan ji hemû serwerî û desthilatdariya heyî dûr û bi hêza xwe, xwe rixistin dikirin. Ev wekî aserek giranbiha û bi nirx bû ji bo me. Bi wê kelecan û moralê amadekariyên avakirina tabûrê

dihatin kirin. Hêj tu ji cihê tabûrê kilometreyekê dûr bûya jî deng dihat te û te digot qey cejn û dawet e. Qîrqîr û coşa hevalan ya provayên amadekariya îlana tabûrê digihişt sînorê Bakur. Dema hevalan çek digirt dest an jî dema fermandarên wan diketin pêşiyan moralek cuda dida mirov. Rime rima lingên wan wekî bixwazin bigihêje leşkerên Tirk ên li ser sînor guhên mirov diêşandin. Lê dîsa jî xwedî aheng û vînek mezin bûn. Zîncîra keştiyan çawa xwe li avê dide, rêza lingên wan bi ahengek wisa li erdê diket û radibû. Şeqe şeqe çekên wan yên datanîn ser mil û danîna wê ya erdê mîna orkestrayek têr alavên muzîkê bû. Ewqas bi rêkûpêk bûn, mirov digot qey bi salane di nava artêşek fermi de mane û wisa hatine provayan. Hemû heval weke libên tizbiyekê rêz bibûn û li benda destpêkirina îlanê bûn. Ronahiyên gulûpên derdora tabûrê li wan didan û siyek bêqusûr li meydana lê bûn çêdibû. Provayên amadekariyan ên bi berbangê re dest pê dikirin, bi derketina rojê re bi dawî dibûn.

Tava havînê ya dibû sedem cilên mirovan bi laşê wan ve bizeliqe û germ ji serê sibê ve dest bi şewitandina bedena mirovan dikir. Lê tava dijwar û kela germê jî nedikarî pêşiyê li coş û kelecana me bigire û hevalên me yên amadekarî dikirin bandor nedikir.  Tevî germa û westana zêde jî coşa wan bilind bû. Çavên hemûyan li ser çûyîna me û ya gel a li pêşiya wan bû. Dayîkên gelek şervanan ji wan re diyarî û pasta amade kiribûn. Hayê hemû Kobaniyan ji vê îlanê hebû û hema hema Kobanî

ketibû nav liv û tevgerê. Ji ber tabûr bi qasî xweser bû, di heman demê de tabûra Kobaniyan jî bû. Çapemaniya me jî ji bo kişandina dîmenên têr û xweşik kamerayên xwe girtibûn û ketibûn nav vê karwana mirovên Kobanî. Xirecire û dengên awazên ji bo pîrozbahiyê û teqereqa qûçxana ketiye nav hev. Dîmenên li vê derê heyîn ji bo gelek şervanên Kurd ên berê li çiyayên Kurdistanê mayîn balkêş dihatin û di heman demê de moralek mezin jî dida wan. Maşînan hatina yekîneyên şervanan a ber bi cihê şahiyê ve ji bo gelek şervanên Kurd tiştek nû bû. Dema yekîneya hevala Roza wisa hat û mîna başokan xwe ji maşînan avêtin û peya bûn, dîmenek giranbiha bû ji bo herkesî/ê. Teperepa ji lingên wan dihat û pergala wan hêviyên avakirina tabûrên wisa hîn zêde dikir di mirovan de. Hevala Roza heta tu bêjî jinek xuşik bû. Narîntî û dijwartî anîna kêleka hev û di yek bedenê de komkirin rûyek rakêş çêdike. Bejin bilind û por xelek bû. Çavên wê yên zeytûnî û rûyê esmer bi perdeyek rengzelal ji hev cuda dibûn û reşiya çavên wê serweriyek bedew dida dêmê wê. Dema xweşikbûn li dijwartiyê tê barkirin, dilê mirovan ji zîzbûnê rizgar dibe û heyraniyek bê pênase di mirov dide çêkirin. Roza bi vê bejn û bala xwe çeka xwe rakir û çû pêşiya hevalan. Dema mirov li çeka wê mêze dikir, mirov digot qey ev çek ne qilêş demance ye destê wê de.

Roza bi dengek narîn û bi xwe bawer got; “Merheba hevalno, hûn çawa nin baş in?” Vî dengî xwe berda kerika guhê her kesê û ji wir xwe berda nav hêlîna dilê

hevalên wê. Herkesê hev nasdikir û moral ji hev digirtin. Nêzîkî nîv demjimêrê hatina yekîneyên şervanan domiya. Paşê hatina gel dest pêkir û hêdî hêdî li cihê ji bo wan hatî amadekirin rûdinişitin. Rojê gavên xwe fireh dikir û li nîva qumbeta ezman tîrêjên xwe berdida ser şêniyên pîrozbahiyê. Wekî xwezayê jî dixwaze tevlî pîrozbahiya me bibe xwe dişidand û di nîva meydanê de bablîsokek şûm dizivirand hewayê. Kit û matên tûmên hişk ên li derdor mayîn dikişand nav xwe li ber hewayê dixist. Qirşik û zilikên li ber bayê diketin wekî teyroka sipî di toza heyî de li ezmanan li ber bayê rast û çep diçûn û ji çavan winda dibûn. Te digot qey xweza dixwaze ji me re bêje ‘ez serwera dem û temenê we me. Ma hûn ji xwe re dibêjin em mezin in? Ma ne hêj duh bû, hûn hemû zarok bûn û we li ser singa min ev lîstoka rakirina qirş û qewalan bi caran dilîst.’ Dîmenên hebûn hestek wisa bi mirovan dida jiyîn. Ya rast xweza jî li gorî zagonên xwe tevlî vê lîstika me ya şad û serfiraz bibû. Piştî henekên xwezayê me hêdî hêdî dest bi îlankirina tabûrê kir. Em ketin pey hev û em çûn pêşiya girseyê. Êdî kelecana min jî tevlî kelecana hevala bibû. Em pênc heval li pêşiya hevalan û girseya heyî sekinîn û me berê xwe da wan. Li milekî me heval, li milê din jî hevalên ragihandinê sekinîbûn. Kelecana van hevalên ragihandinê ji ya me ne kêmtir bû. Li rûyê her hevalî temaşe dikirin û berî ku berê deklanşora wênegirên xwe bidin wan, rûyê wan bi çavan dipîvan ka dê wan çawa têxin nav çarçoveya makînê. Tevgera wan nû destpê kiribû. Car carnan xwe diçemandin û dibin berê

kamerayên mezin re diçûn û dihatin. Hiş û vê teknîkê bi awayek hevbeş dîmenên hebûn mayînde dikirin û dixistin malê dîrokê. Mîna di nav şer de bin hev kordîne dikirin û hevsengiya sê-çar kamerayên xwe wisa çêdikirin. Heta vê kêliyê jî me û girseyê li hev temaşe dikir. Kip ji kesekê dernakeve û bêdengiyek bêdengiyê dibihîse serwer e. Kute kuta dilê min bala min kişand û bêhnek bû min sedema wê mereq dikir. Heçko cara yekê bû ez diçûm pêşiya hevala û rayên xwihdanê xwe ji dêmê min berdidan jêr. Heyecanek bêhempa ez girtibûm. Kobanî hemû li peşberî min bûn. Heçko hemû giraniya Kobaniyê xwe berdabû ser milên min û lêdana dilê min zêde dikir. Ev ne bes e, hişê min gewdeya min digirt û dibir Şengalê. Li berî û çoltera ez jê xerîb û jinên Kurd dîl girtine û li bazaran difirotin yek bi yek li ber çavên min diketin. Min di nav vê derûniyê de dest bi axaftinê kir. Nizanim ez çend xuleyan axivîm. Lê min gotinên ji dilê min dihatin got. Piştî gotinên min xelas bûn, min armanc û îthafa tabûrê ji bo şehîdan û Rêber APO kir û axaftina xwe qedand. Bi qedandina axaftina min re bi dengê dirûşmeyan zimînî bi meydana cihê şahiyê ket û bi yek dengî dirûşmeya bijî serok APO bilind bû. Hevalên me yên di rêza merasimê de serê çekên xwe pesartibûn ranên xwe û bi çepik û tilîlî dengên xwe hêj bilindtir dikirin.

Dîmena li pêşiya me, dîmeneke xweşik û dişibî hewdek kulîlkên biharê yên li ser kaniyek avê dianî bîra mirov. Cil û bergên wan ên kesk û şîn di bin keziyên stûr û dirêj,

li ser bejnên narîn û bin çavên hingivîn û zeytûnî de çavên dilên mirovan didagirtin. Dîsa mîna zeviyek genimê sorgulî rêz bi rêz meydana heyî dagirtibûn û îlana tabûrê pîroz dikirin. Bi sekna wan û gotinên min wefadariya me ya ji Rêber Apo û şehîdan re mayîn de dibû. Min li gorî herikandina dilê xwe axivî bû. Bi gotina "Em di serî de ji vîr heta Îmrayê li ser navê hemû şervanên YPJ'ê, ji germahiya Kobaniyê û deşta Sûrûcê, ji hêviya pêxemberan, ji welatê ku Derwêşî Evdî lê hespê xwe daye bezandin, ji Rêber Apo re silav û hezkirinên xwe dişînin. Em minetdariya xwe ya ji şehîdan û Rêber Apo re raber dikin. Em bejna xwe li ber bîranîna hemû şehîdên têkoşîna azadiyê ditewînîn û malbatên şehîdan bi rêzdarî silav dikin. Em sond dixwin bi xwîn û giyana pakrewanên vê axê û dibêjin emê DAÎŞ'ê bin bixin û emê azadiya vî welatî misoger bikin. Wê ev hêza ji pola hatiye honandin bibe hêza çêker a dîrokek nû." Van gotinên min, sekn û heybeta di qadê de rê ji coşek mezin re vekiribû.

Piştî axaftina min û bêhnek xweş bilindbûna dengê dirûşm û tilîliyan, deng hinekê kêm bûn û dora axaftinê gihiştibû Eyşê Efendî. Eyşê Efendî li ser nave Kantona Kobaniyê dest bi axaftina xwe kir. Heyecanek bê pênase hebû û kê mîkrefon dixist destê xwe kelecanekê ew jî dorpêç dikir û di kêliya destpêkê de ev kelecan dihat hîskirin. Xweşbû. Vê kelecana ji dil wekî sitlek avê ya pê av ji bîrekê dihat derxistin hestên me ji dilê me derdixist der ve û kela dilê me difûrand. Kelecan rêbera gotinên bi

wate ye. Rewşa Eyşê jî hema hema wisa bû û bi wê kelecana ji dilê wê difûrî dest bi axaftina xwe kir û got; “Îro min carek din êşa şehîdbûna Şervanê xwe ji bîr kir û ez pê hesiyam ku ne tenê Şervanê min heye. Belê navê lawê min jî Şervan bû û şehîd ket. Şervanê min, Viyana min û Sakîna min serê xwe rakin û li vê dîmena heyî temaşe bikin. Îro bi hezaran jin çekên xwe girtine û amadene. Sozdara min de ka were, îro li ser şopa te bi sedan şervan dimeşin. Ketine nav govenda azadiyê û bi tilîliyên xwe ezmanê Kobanî dihejînin. Ew parazvanên Kobaniyê ne. Ev e dihêle em careke din weke jin bi moral, bi hêvî û bawerî bikarin tevbigerin û ew ruh di me de dide avakirin. Carek din ez bi qurbana van keçên çek û rext dane milê xwe bim. Bila ez gorî we bim ku hûn hene û hûn in yên serê me li sîwana ezmanan dixin. Ji ber vê ye em bi we ser bilindin. Hûn xwediyê destana Kurd a serkeftinê ne.” Dengê Eyşê Efendî her diçû bilind bû û digihîşt sînorê Bakur. Hêza li hemberî sekinî bû dilê wê difûrand û hêz dida gotinên wê. Mîna bixwaze dengê xwe bi ser aparlorê bixe tund diaxifî: “Bila dijmin bizanibe ev der Kobenî ye. Wê kesek nekare bi keçên me. Bi van keçên ciwan jî mabe, wê nehêlin dijmin di Kobaniyê de serkeftinê bi dest bixe. Em dizanin birîna dilê me giran û kûr e. Êşa Şengalê, êşa keçên me yên Şengalê yên li bazarên Erebana tên firotin em ji bîr nakin. Xwezî ew jî mîna we bi çek û di nav we de bûna. Hûn hêza tolhildana vê ehda me ne.”

Eyşê Efendî axaftinek dirêj kir. Lê her gotinên wê bi wate û dagirtîbûn û xwe dispartin êşa dilê dayîkên Kurd. Di heman demê de xwedî zanebûnek dîrokî û civakî ya kûr bû. Bi rastî jî ez heyrana axaftina Eyşê mam. Hêstên dayîktî û şoreşgerî kiribû yek. Ji dil diaxivî û gotinên xwe belav nedikir. Heman coşa tabûrê berdewam bû. Mîna fînala dawiyê ya avakirina tabûrê, pêvajoya civîn û perwerdê bi dawî dibe diruşme bi rêz dikirin û tîlîlî jî toxavka wê bûn. Dema dengê tilîlîyan bilindbû Eyşê Efendî jî  li ser mîkrefonê bi awazek xweş tîlîlî li wan zîvirand û êdî bû cejn. Di wê kêliyê de fermandar Adalet derket pêşiya wan û got; “rawestin, amade bin û xebat xweş hevalno.” Dema ku wisa got her kesê teq req çekên xwe girtin û bi lez ji hev belavbûn. Wekî perdeya şanoyekê çawa tê vekirin û dawiyê tê girtin, merasima me jî di tamek wisa de bi dawî bû. Beşa yekê ya şanoya me bi dawî bibû. Perde cara diduyan ji bo beşek din vedibû.

Taximan erkên xwe dizanîn û dest bi amedakariya kişandina xwarin û vexwarinê kirin. Li nav aqara derdor sifre rêz kirin û gel û heval bi hev re rûniştin derdora sifreyan. Dayik li kêleka keçên xwe rûniştine û wisa xwarinê dixwin. Ev dîmenên serkeftinê bûn. Cihê şanaziyê bû. Mirov nedixwest ev dîmen bi dawî bibin û dixwest her wisa bimîne. Di hişê me de mîna peykerek ti car ji şûna xwe neyê rakirin bi cih bû. Hevala Şîlan Guyî li kêleka min bû û me bi hev re xwarin dixwar. Porê wê yê dirêj û reş ji ser pişta wê digihîşt erdê. Pora wê wekî

çiqên bîşengan xwe li ser qolincên wê berda bû jêr û pişta wê di bin siha pora wê de mabû. Xemseyên wê dişibiyan çalikên li ser bihokên payîzê. Dema dikenî û diaxivî dîmena rûyê wê xwezî li peykerên kevnar dianî. Li min temaşe kir û got; "Heval Meryem, pirovayên tabûra ma pir xweş bûn ne wisa?" Encamên amedekariyên tabûrê hewceyî ti gotinê nedikir û ji zû ve xwe berdabû nav dilê hemû şêniyên kobaniyê. Alternatîfên serkeftinê nînin. Hebin jî dijberî wê ne û nabin şirîkên wê. Şîlanê di rûyê min de encamên provayên tabûrê ji zû ve xwendibû û ev derbasî rûyê wê jî bibû. Van hestan mirov xweşik û xwerû dikir. Rû hêjayî her tiştî bû û bibû zimanê herkesê. Rû neynika şaneyên mirov e û hemû liv û tevgerên şaneyên mirov xwe di rûyê mirov de didin der. Bi kurtasî şanoya dil rûyê mirovan e. Dilnizmbûn taca serkeftina dil e û zimanê bedewiyê yê din jî dilnizmbûn e. Şîlan digot; "min hêj dikarî baştir bikim, lê derfetên min ên perwerdekirinê zêde nebûn. Bi alîkariya gelek hevalan ev encam bi dest ket, lê di rastiyê de serkeftina heyî ya dilê wê bû. Piştî vê coşê em derbasî pergalkirina tabûrê bibûn. Me çend biranşên baş hilbijartin û xistin pêşiya tabûrê. Beşa nivîs û xwendinê, beşa perwerdeya şervantiya nû, beşa lêhûrbûnê û beşek jî ya ciwanan bû. Me pergala tabûrê li gorî taybetmendiyên xwe yên bîrdozî bi rêk û pêk kir. Tabûr ji rêxistinkirina şer wirde, avaniyek jiyanê bû. Tişta şer xurt bike jî ev şêwazê jiyanê ye. Me beşek folklor û hunerê jî lê zêde kir. Li gorî nêrîna min ev pergalbûn ji kevin de hebûn. Lê ti kesî bi ser nexistibû û

nekarîbûn xwe ji agirê şer rizgar bikin. Hunervanên şer Sûn Tûz jî vê dibêje. Ger şer û şervan bi van şêwazan neyên xurtkirin wê ji civakê qut bibin û bibin mirovên çors. Şêwazên me di kesayeta jinan de şer û jiyan dikir yek parçe. Ji ber jiyan yekpare ye.

* * *

Xwendin û axaftinên hevala min a lênûs dixwend bibû parçeyek jiyana min û ev kêliyek bû min digot qey hêj jî dixwîne. Bi destê wê yê ser milê xwe ve ez bi ser xwe ve hatim. Tabûra jinan ez biribûm û ez li kîjan kêliya jiyanê me bi min dabû jibîrkirin. Dengê hevala min jî yek ji wan bû. Min digot qey Şîlan, an jî Roza ye. Rastî yekpare ye û ev raste. Ew jî endamek vê tabûrê an jî fermandara wê bû. Me bi hev re kêlî bi kêlî tevna wan rojan dihona û dubare zindî dikir. Di lênûsê de ev beş bi dawî bibû. Çi dema ez xemgîn dibûm ew dikeniya û dixwest min ji vê rewşa heyî rizgar bike. Di xemgîniya min de janek bê pênase hebû û vê xwe li rûyê min dida. Êdî di çavên min de her kêlî û her dem ew kêliyên kevin bûn û ew heval yek bi yek di ber çavên min re derbas dibûn. Di vê xakê de gelek berhamiyên mirovan matmayî dihêlin ji bin axê derdixistin û mirov hîn jî nikare pênaseyek baş di derbarê wan de bike. Tors û peykerên ji Xerabreşkê heta Telxilaf ji hestên mirovên wê demê afirîne. Gelo wate û xweşikahiya hestên mirov çend salî ye? Ger ev peyker û bermahî nebûyan, me yê çawa bizaniya mirovan wisa jiyan kirine? Tişta wan nemir dike ev rastî ye.

Fermandariya şer û hunermendiya xweşikbûnê mîna du serê şûrên li hemberî hev di kodika yek dilî de bicihkirin dibe ku zor be. Lê gul bi striyên xwe xweşik in. Mirov jî wisa ye. Sondaja gotin û nîgarên di kûrahiya dilê min de veşartî kirin, an jî ya wan şervanên xweşik karekî zor bû? Çepgirên ji êla me ango Marksîstan, ji bo van kesan wisa digotin, "karkerên xweşikahiyê." Lê di rastiyê de ev ji wê gelek wirdetir bû. Çavdirêya dil û wêrektiya parvekirinê hemû tewek û qaşilên li ser mirov e radikir û dixist destên çavdêra te. Li gorî wê jî ew ne karker, ew hevala te ya herî nêz e. Bi gotin û pirsên tên kirin rûyê te ji halekî dixe halekî din û wan dikşîne nav giyana peyvên bi wate. Giyan li te kom dibin û tu dubare wan jiyan dikî. Hêza mirov a li hemberî jiyankirina dubare, gelek caran lewaz dibe û mertalên pêlûyên çav diderizîne. Ji keyfxweşî û ji janê firmeskên dibarin ser dêmên mirov hêjayî lêkonê ne. Jan û kêfxweşî gelek caran firmeskên mirov dixapînin û ji kîjanê dibarin mirov ji hev dernaxe. De îcar kîjan nivîskar dikare van ji hev nasbike, ger ne hevala te ya herî nêz be. Min serê xwe rakir, herdu destên xwe danîn ser mêzeyê û bi herdu çavan li hevala xwe temaşe kir. Heçko hemû xweşikahiya keçên Kalo derbasî ser dêmê wê bibûn. Reşahiya porê Roza, rengê hingivîn yên çavên Peyman û giyana Newala biçûk xwe ji porên wê berdida ser çav û giyana wê. Rû nexşene li gorî min. Cil û bergên YPJ'ê yên li xwe kiribûn ez kêlî bi kêlî dibirim wan rojên berê. Rewşa me balkêş bû û niha ez tesvîr û nîgara vê hevala xwe ya şirîka wan kêliyên min ên hestyar e dikim.

Li gorî min di kêliya nivîsê de vebêj jî nivîskar dinivîsîne û nivîs ev bi xwe ye. Binemaliya jan û bêriya hevaltiyê ji dêmê wê difûrî û ji jana heyî hinarkên wê wekî du rûpelên serpêhatiyan xwe li ser rûyê wê nîşa didan. Em hemû dîlên jan û xweşikahiya welatê xwe bûn. Ji vî rûyê bûyî nexşeya hestên me yên hevpar, awirek da min û got; "Hevala Meryam ez bawerim tu gelek dûr çûyî. Lê dûrbûna te ne bi gavên erdê ne, dûrbûnek zemanî ye." Rast di got û min bi kenek bê deng ew erê kir. Ji bo bidestxistina vê lênûsê wê jî hewldanek mezin raber kiribû û ketibû ferqa hestên min. Bermahiyên ji wan kêliyan mayîn barekî gelek giran li min bar dikir. Ji nû ve jiyankirin, ji bona nivîsê pêwist bû, lê erdheşên mezin di serê min dida çêkirin. Me bi xwendina vê beşa lênûsê pêngavek cîdî ya serpêhatiyên dilê min derbas dikir. Wêrektiya vî tiştî ji ya şer gelek zortir û girantir bû. Me xwe û serpêhatiyên xwe dahev û em ji avahiya tabûrê derketin. Rojê bi hemû giraniya xwe xwe berdabû ser asoyên beriya rast. Li vê derê ba ji erdê dihat û te nedikarî tu aliyên wê an jî berên wê ji hev derbixî. Erd jî wekî berek pêncemîn têkelî van leyîstokên xwezayê dibû. Hêlmek hênik ji rûxarên erdê radibû û xwe li rûyê mirov dixist. Me dixwest em piştî vegera ji avahiya tabûrê biçin goristana şehîdan û rêhevalên xwe bibînin. Berî roj ji çavan bikeve û winda bibe me berê xwe da wir û em hêdî hêdî meşîn. Roj diçû ava û em diçûn tewafa pîrozên xwe.

## GUNDÊ EHMEDIYÊ

Tebaxê konê xwe yê tirêjên awirtîr li ser beriya Kobanî vedabû. Kelekela germê singa axê diqelaşt, bêrikirinên baranan xwe di henaseya heriya Kobanî de bi hêlma ji axê radibû de digihand ezmanan. Ba û bahoza li axa bûyî xwelî dixist, tozek gewr xwe li rûyê demê dipêça. Bablîsokên li beriyê radibûn lodên tozê bilind dikirin û mohra xwe li henaseya demsalê didan. Bi rojan bû tevî germaya zêde, wekî ji devê ejderhayekê derbikeve bayek têhn agir xwe li dêmê beriya Kobanî û şervanên Kurd dida. Dêm û çermê şervanan ji ber dijwariya tavê êdî dişibîn heriya Kobanî. Lêv û qirikên li ber germa û baya têhn agir zûha dibûn jî herikbarî û coşa şervanên Kurd asteng nedikirin. Demsala Tolhildanê di dilê her şervanek Kurd ên li Kobanî de sewî bû. Hêza hêviya serkeftinê bistên tirêjên tavê li ber vîna şervanan ditewandin. Ax û heriya Kobanî bi kenê wan xuncegulên hêviyê dibişkivand.

Bi rojan bû li ser hemû eniyên Kobanî şerek dijwar hebû. Li eniya Sirînê beriya du rojan êrişên dijwar rû dabûn. Her wiha rojek berê êrişî gundê Borêz û Degirmen hatibû kirin. Lê tevî dijwariya êrişan jî çete paşve hatibûn şikandin û êrişên wan bê encam mabûn. Ew demek bû çeteyan cardin gundê Evdiko û Kendalê ji me girtibûn. Xeta me ya berê wekî tîpa “I” heta ber ava Firatê diçû, êdî wekî tîpa “L” lê hatibû. Di hinek cihan de

me bi çeteyan re rojane bi qilêşan fîşek davêtin hev û dengên ne diçûn hev.

Di vê dema em ewqas nêzîkî hev bûyîn de çeteyan textîka ji hevxistin, hincirandina hêza me bingeh digirt. Hema her roj di çend cihan de êriş dikirin. Dema êrişên wan dişkestin bi çekên giran li çeperên me dixistin. Her wiha di kêliyên şer û pevçûn kêm dibûn de jî ji bo em nekarin bêhna xwe vedin, hêzên me neçar bimînin di çeperan de bimînin û bêxew bimînin bê navber fîşek tavêtin. Her pênc deqîqeyan carekê wekî ku serdegirtin û êrişek dijwar rû bide her awayê çekan bikar tanîn. Armanc hemû sistkirin û ji taqetxistina hêzên me bû. Ya rast di hinek cihan de wisa li hevalên me hatibû, êdî kêliya dengê çekan nehatiya wekî rewşek awarte dihat hesibandin. Dewamkirina vê rewşê wê bibûya sedema dest ji xwe berdan û sistbûnê. Ji ber êdî hevalên me êrişên wan wekî henek didîtin.

Ji bo em pêşiyê li vê rewşê û êrişên çeteyan ên li ser eniyan bigirin, her wiha ji bo em cardin xeta xwe ya ew ketîn navberê bi dest bixin, me biryara êrişê da. Piştî girtina vê biryarê me gundê Ehmediyê wekî cihê êrişa destpêkê diyar kiribû. Bi vê boneyê tabûra hevalê Bahoz keşfek berfireh kiribû li ser vî gundî. Gundê Ehmediyê dikeve eniya Rojhilatê Kobanî. Gund bi nêzî yek kîlometrî dûrî sînorê bakurê Kurdistanê ye. Piraniya hêza me ya li vê eniyê li gundê Curn, Huriyê û Xanê bû.

Piştî keşfa hatî kirin me biryara çalakiya li ser pênc gundan da. Lê armanca çalakiyên me du gundên sereke bûn; gundê Ehmediyê û gundê Evdiko. Ji bo vê pêdiviya me bi amadekariyan hebû. Ne tenê hevalên li wê eniyê, ji hevalên li eniyên din jî hêz hat xwestin. Ji bo xeta me ya parastinê neyênî bandor nebe hêzên me yên tabûrên ji gel hatin rêxistinkirin û di eniyan de hatin cihkirin. Her wiha amadekariya cebilxanê hat kirin. Erk û berpirsyartiyek giran diket ser milên hevalên ku diviya parastinê bikin. Lê di aliyê din de diviya amadekariyên çalakiyê bi veşartî bihatiyan kirin. Lewma tenê ji fermandarên tabûran re agahî hat dayîn û ji wan hat xwestin amadekariyên xwe li gorî rewşa çalakiyên bên destpêkirin bikin. Êdî ezmûna şerê me asta amadekariyên me jî lez kiribû. Piştî agahî hatî dayîn di demek kurt de hevalan xwe amade kirin, tedbîrên pêwîst hatin girtin. Her wiha hevalên berpirsên eniyan jî bi wê şiyarbûnê tevgeriyabûn. Ji hêza xwe re negotibûn çalakî heye. Gotibûn hevalên rêveberiya giştî hatine, wê civînan çêkin û ji her eniyê çend heval beşdarî civînan dibin. Dibe ku civîn çend rojan berdewam bikin. Bi vêboneyê ji eniyên xwe komên beşdarî çalakiyan bibin girtibûn û anibûn gundê Xanê. Hevalê Emîn, komek mezin heval digire gel xwe, ji hevalên eniyê re dibêje ezê biçim serdana hevalên li eniya Rojhilat û bi du maşînan hatin gel me.

Dema hevalê Emîn bi komek hevalên jin û komek hevalên xurt re gihişt gel me, te digot qey diçin govendê.

Coş û morala hevalan bilind bû. Doçkaya xwe, çek û cepilxaneya pêwîst bi xwe re anibûn. Piştî gihişt cihê civînê bi kelecan ji maşînê derket û silav da hemû hevalan. Dema dît gelek heval pêşiya wî gihiştine wê derê û em beriya wan kom bûne, wekî dereng mabe geşbûna rûyê wî çilmisî. Hinekê nêzîkî min bû, di ber guhê min de got; "Nebêjin me plansazî çêkiriye û tu dereng mayî. Ger tiştek wisa bibe ezê gelek aciz bibim." Ya rast wext hebûya min dixwest ez hinekê wî aciz bikim û bêjim me plansazî çêkiriye. Lê dema me ya henekan nebû. Karek cidî li pêşiya me bû. Min jê re got, "Na hevalê Emîn. Me nîqaş dikir, plansazî maye." Piştî van gotinên min henaseyek kûr kişand, ew coşa wî ya berî çend çirkeyan ji rûyê wî bar kirî vegeriya. Bi rûyekî ken temaşeyî hemû hevalan kir û got; "Hevalno, ev cihê we ji çalakiyê diyar kirî cihek gelek baş e. Başe ku we hêj plansazî çênekiriye. Ev demeke em jî li ser van cihan dihizirîn û me xwe amade dikir. Ez vê erdnîgariyê baş nas dikim. Li van gundan hevalên me yên wekî Botanê Reş şehîd bûn. Min sond xwariye ez tola Botan bi destên xwe rakim. Vêca pêşniyara min ew e dema em plansaziyê nîqaş bikin vê daxwaza min pêş çav bigirin. Ez dizanim hêza hatî hemû ne ji bo beşdarbûna çalakiyan hatiye. Lê ger ez beşdarî vê çalakiyê nebim wê dilê min aram nebe."

Hêj em bi awayek asayî di navbera xwe de di axivîn, hevalê Emîn hewaya heyî bi gotinên xwe guhertibû. Ji bo hewaya hestyar ya çêbûyî belav bibe, hevalê Cûdî destê

xwe li milê hevalê Emîn da û got; “Hevalê Emîn, hêj me çalakî nîqaş nekirî te em xistin nav çalakiyê. Ka bisekine em xêrhatina te û hevalan bikin, em rewşa hev bipirsin.” Me hemûyan hestên hevalê Emîn parve dikirin. Hevalê Emîn temaşeyî rûyê hevalê Cûdî kir û got; “Heval biborin. Hûn dizanin hevalê Botan demek dirêj li gel min mabû. Dema ez gihiştim vê derê û min hûn wisa kom dîtin, min got dibe ku ez dereng mabim û we hertişt nîqaş kiribe. Ev lezkirina min hinekê ji ber wê çêbû.” Ji xwe me hemûyan ev rastî dizanî û hevalan bi hejandina serên xwe gotinên wî erê kirin. Paşê hevalê Cûdî gazî du hevalan kir û ji wan re got; “Hevalên ji eniya Sirînê hatîn bibin cihên wan. Xwarin û vexwarina hevalan, pêdiviyên wan pêk bînin. Tima hevalên jin jî bibin cihê hevalên jin, bila heval bêhna xwe vedin.” Li ser gotina wî herdu heval bi bazdan ber bi komên hatîn ve çûn û ew birin cihên wan. Hevalê Emîn û Masîro li kêleka hev rûniştibûn. Hêj hevalê Cûdî gotinên xwe nû qedandibû, hevalê Emîn cardin rojeva çalakiyê vekiribû û ji hevalê Masîro re behsa cihê çalakiyê dikir. Ew coş û daxwaza nîqaşkirina plana çalakiyê wekî nexweşiyekî vegir belavî hemû hevalan bibû. Dengê hevalê Emîn cardin bi ser dengên din diket, bala hevalan li ser gotinên xwe civandibû. “Li gorî min riya herî xeter û çarenûsa çalakiyê diyar bike navbera Ehmediyê û Evdiko ye. Herî kêm bi qasî yek kîlometreyê divê mirov li ser sing biçe. Ger em bikarin wê derê saxlem derbas bikin, li gorî min çalakî wê bi ser bikeve. Ya, hevalno; ev kembaxa vê erdnîgariyê wekî serekî keçel e.” Bi vê gotina hevalê Emîn pilqîniyek ken

bi hevalan ket. Kenê me bala hevalên derdor jî kişandibû û çend hevalên ciwan ên di derî de hişedarbûn bi kenê me re ber bi deriyê odeyê ve nêzîk bûn û dengê piyên wan gihişt hundir. Paşê hevalê Masîro rondikên xwe yên ji ber ken bi pişta destê xwe li ser hinarkên rûyê xwe malişt û li hevalê Cûdî vegeriya û got; "Hestên hevalê Emîn ji pêlên ava Masîro xurtir in. Ger em pêşiyê lê negirin wê me li ber xwe bibin û rojeva me ber bi cihek din ve biçe. Ka heval amade bin, em dest bi rojeva xwe ya sereke, plansaziya çalakiyê bikin." Piraniya hevalên beşdarî plansaziyê bûyîn cih nas dikirin. Her wiha hevalên ku berê ewder nedîtibûn jî bi roj keşfek ji dûr ve kiribûn. Ji xwe cihê me lê çalakî bikiriya, ji cihê me yê em lê diman bi çav dihat dîtin û nêzîk bû. Wekî rêveberî bi qasî saet û nîvê me nîqaş kir, plansaziya çalakiyan diyar kir.

Li gorî plansaziya hatî kirin wê şêst heval beşdarî çalakiyê bibûyan. Hevalên din jî wê derdora xetê xurt bikiriyan, ger pêdivî pê bihatiya dîtin hêza çalakiyê biparastiyan. Li pişt gundê Ehmediyê gundê Spîkiran hebû. Gundê Spîkiran gundekî Ereban bû, tam diket ser sînor. Li kêleka Ehmediyê jî gundê Denayîkê hebû. Spîkiran gundekî mezin bû. Ew demek bû me bi çav jî nava gund didît û em ewqas nêzîkî hev bûn. Lê dîsa jî di çarçoveya keşfê de me bi ziraviyan ve keşif dikir, hewl dida em rewşa gund baş bizanin. Bi roj kolanên gund tijî jin û zarok bûn. Me berê bi wî gundi re li hev kiribû. Di gelek paşvekişandinan de hevalên me di wê riyê re

derbas bibûn û gundiyan eleqeya xwe ji wan ne anîbûn. Lewma ev cih wekî riya komek me ya êrişê hatibû diyarkirin.

Piştî nîqaş û plansaziya rêveberiyê temam bû, me hêza xwe ya beşdarî çalakiyê bibe li gundê Xanê kom kir. Hejmarek zêde heval kom bibûn. Ew demek bû çeteyan li ser hev êriş dikir, dixwestin hêza me ji hev bixin û pêş de biçin. Her wiha ji ber gundên wekî Evdiko û Kendalê yên me berê tê de zêde şehîd dayîn ji me girtibûn, vê yekê di her hevalek me de hêrsa tolgirtinê û daxwaza beşdarbûna êrişa li ser çeteyan zêde kiribû. Piraniya keşfê ji aliyê tabûra hevalê Bahoz ve hatibû kirin. Piştî kombûna bi kelecan, hemû çavên şervanan ên tijî mereq vegeriyabûn ser hevalê Cûdî. Hevalê Cûdî kesek bejin navîn, dagirtî bû. Hevalekî dêm girover, spî bû. Lê ji ber germaya tavê rûyê wî şewitî bû, bi qasî mirovek esmer rûyê wî jî reng guhertibû. Hevalê Cûdîderket pêşiya hevalan, zendên xwe hinekê hilda û got, “Hevalno, em dizanin daxwaza hemû hevalan ew e beşdarî vê çalakiyê bibin. Lê em hêzekî şer in. Em li gorî hest û daxwazên xwe yên kesî nikarin tevger bikin. Pêdiviya me ya bi hêzê çibe, çiqas hejmar pêwîst be wê heval ewqas beşdar bibin. Hevalên dimînin jî divê xwe aciz nekin. Ji ber ev tenê pêngava destpêkê ya vê qonaxa me ya çalakiyan e. Biryara me ew e ku em êriş bikin. Ji îro û pêve li her cihî emê êriş bikin. Divê heval li gorî vê nêzîk bibin.” Kelecana Cûdî di çavên wî yên zer û mezin de wekî pêtên agir xwe didan der û bi coş di axivî. Her diçû kelecana

wî, hêrsa li ber çeteyan di dengê wî de jî xwe dida der. Paşê xazezek ji berika şalê xwe derxist, hinekê lê temaşe kir û got; “Ji bo çalakiyê me şêst heval diyar kirine. Hevalên dimînin wê parastina hevalên diçin çalakiyê bikin, rê û xetên diçin gundên din bigirin. Armanca me ya sereke pênc gund in. Emê hemwext li çeteyên li her pênc gundan bidin. Gundê bingehîn yê em bigirin gundê Ehmediyê û gundê Evdiko ye. Wekî navenda gundên din e. Komek me wê di navbera gundê Ehmediyê û gundê Evdiko re biçe. Hevalên biçin vê derê koma sabotajê ye. Wê li ser vê riyê di du cihan de mayînan deynin. Yek pêşiya hersê malên li ser girê dikeve pişt gund, ya din jî li cihê me wê rojê lê tank teqandî. Ev kom wê li cihê xwe kemîn bavêje û li benda koma kemînê ya bingehîn bimîne. Koma diçe gundê Evdiko çarenûsa çalakiyê diyar dike. Cihê wan xeter e û ger kifş bibin çalakî bi ser nakevin.”



Cûdî piştî şiyariyên ji bo vê komê kirin, darikek ji erdê rakir, li çavên şervanan temaşe kir. Tenê çavên wan bi mereqek mezin dibiriqîn û deng ji kesekê nedihat. Bi baldarî guhdarî wî dikirin, liv û tevgerên wî doşopandin. Cûdî serê darikê di destê xwe de danî ser axa li pêşiya xwe, wekî nexşeyekê bi darik xêz bike serê darik di nav axê de bir û anî. Paşê cardin serê xwe rakir û got; “Em pênc koman dişînin ser gundê Ehmediyê û Evdiko. Piştî komên sabotaj û kemînan cihê xwe girtin, komên êrişê wê bikevin tevgerê. Wê komek di pişt gund re xwe bigîhîne malên destpêkê. Xaniyek mezin û deriyê wê kesk heye. Hevalên çeka bêsîvîngê bikar tînin wê destpêkê li vî xanî bixin. Paşê hevalên din wê bi narincokan xanî bikin armanc. Lê di çûyîna vê komê de divê heval haydar bin, haya wan ji serbanan hebe. Li cihên bilind kê bibînin divê destpêkê wan bikin armanc û tine bikin. Ev mal baregeha wan e. Piştî hevalan ev mal girt û şûn de koma din wê sing bi sing ber bi nava gund ve biçe. Koma pêncan wê gund derbas bike. Gundek dî biçûk heye li pişt gundê Evdiko. Heval dizanin wekî gundê traktoran tê nasîn. Ev kom wê xwe bigihîne wê derê û navbera wan gundên derdor qut bike. Ger ji wî alî ve destwerdan çêbe, wê ev heval bersiv bidin û hevalên di herdu gundan de biparêzin. Ji xwe wekî tedbîr wê komek me biçe ji aliyê gundê Curn, komek jî ji aliyê gundê Huriyê ve biçe û hêza çalakiyê ji êrişên ku ji derve bên biparêzin. Ji derveyî van hevalên beşdarî vê çalakiyê dibin, hevalên bimînin wê biçin aliyê gundê Kizalî. Ji ber em dixwazin li wî alî dimen bidin, bala çeteyan bikişînin

ser wî alî. Lewma li wî alî pêdivî bi tevgerek veşartî nine. Lê dîsa jî ger çete bixwazin êriş bikin jî hêza em dişînin vê derê wê êriş bikin û hewl bidin zêdetir balê bikişînin ser xwe.”

Cûdî bi armanca bi çavan mesafeya di navbera gundan de bipîve berê xwe zivirand aliyê Rojhilatê gundê Xanê. Rûyê wî yê li ber tavê qemirî bi hêza tirêjên tava Tebaxê dibiriqî, xwihdanek tenik li eniya wî diyar bû. Paşê darikê di destê xwe de rakir jor, vegeriya aliyê Rojava û got; “Hevalno, hûn dizanin li pişt gundê Ehmediyê gundê Spîkiran heye. Ev gundê Ereban e. Li gorî keşfa me kirî çete tê de nînin. Bi rojane em dişopînin tenê zarok û jin, mirovên sivîl di gund de xuya dikin. Lê dîsa jî divê em haydar bin. Ji ber gund li ser sînor e û dewleta tirk piştgiriyê dide çeteyan. Komên me yên biçin ser gundê Ehmediyê wê di pêşiya vî gundî re derbas bibin. Li aliyê din yê gund jî gundê Denayîkê heye. Gundek biçûk e. Komek heval ji bo parastinê wê derbasî wê derê bibin.”

Awirên şervan û fermandarên koman wekî ku bi darikê wî re ji wê derê bar kiribin, li kolan û beriya Bahoz behs dikir digeriyan. Di her awirekê de çend xeyal, çend bêrî, hêvî û hestên tolhildanê di singa axa beriyê de nûqî demê dibûn kesê nedizanî. Fermandarên beşdarî plansaziyê bibûn hevalê Emîn Erkendî, Cûdî, Dilgeş, Biharîn û Jiyan her yekê xeyala çûyîna çalakiyê dikirin. Di wan gundan de gelek hevalên xwe, şervanên xwe di şer de winda kiribûn û di wan de hesta serwer hesta

tolhildanê bû. Nêrîna hevbeş pêdiviya qonaxek êrişan bû. Çi dibe bila bibe diviya em wan gundên ji me hatîn girtin û navbera xeta me ya parastinê qut dikirin bigirin. Di wan gundan de lehengî û qehremaniya şehîdên me xwe li bîra hişê me dida û vê yekê daxwaz û baweriya me ya pêkanîna çalakiyên wisa xurt dikir.

Di ber vegotina plansaziyê re gurme gurma guleyên topan, teqereqa dengê fîşekên doçkayan carna gotinên hevalê Cûdî difetisandin. Lê wekî tiştek ji rêzê be herkes di cihê xwe de bû û li benda bi dawîbûna dengên cors diman. Hêj civîna me dewam dikir, hevalan ji gundê Kopirlik agahî dan û gotin tankekî çeteyan ji gundê Ehmediyê ber bi gundê Spîkiran ve çû. Her dema tankên wan bi rê diketin heman bi heman şêweyî ji her alî ve çek diteqandin. Ji hinek cihan guleyên tankan, ji hinek cihan doçka, li hinek cihan jî topên hewan bikar tanîn. Bi zêdebûna deng re hevalê Cûdî navberek kurt da civînê. Hevalê Cûdî berpirsyarê wê eniyê bû. Cîhaza xwe ya bêtêl girt, hinekê xwe da aliyekê û gazî hevalên eniyê kir. Piştî rewşa hemû çeperan pirsî û şûn de vegeriya û got; “Heval dibêjin tişt nîne. Diyare ji ber çûyîna wê tankê deng wisa zêde bû. Em ji cihê mayî dest pê bikin û vesaziya hevalan bixwînin.”

Tirêjên rojê her diçû melûl dibûn. Tîna tavê ya di saetên nîvro de hinark û eniyên şervanan dişewitand nerm bibûn. Ber bi êvarê bû. Civîna me bi dawî bibû, vesaziyên hevalan hatibûn xwendin. Hevalên me kom bi kom li hev

civîbûn. Roja diçû ava cihê xwe ji pele ewran re dihişt. Di meha Tebaxê de dîtina ewrên wisa bala herkesî kişandibû ser xwe. Te digot qey dawiya beriyê deryayek bê ser û biniye. Bi bandora tirêjên tavê yên dûr diketin curerengiyek balkêş li ser ewran peyda bibû. Rengên reş, sor, şîn li ser singa asîman di pêşbirka xweşikbûnê de bûn. Hevalê Bahoz serê xwe rakir jor û got; "Hevalno; bi dawîbûna civîna me re roj dûrket û çû ava. Li şûna xwe ewr hişt. Hûn dizanin ev ewr çima kom bûne? Ez dibêjim ev şîna çeteyên li van gundan e. Niha ev ewr jî dibêjin, 'hûn her çekan bavêjin. Heta sibe wexta we maye û wê şervanên Kurd wekî van ewran bi ser we de bigirin. Ev roja we ya dawiyê ye.' Qey kî ji we heta niha ewrek wisa xweş li vê beriyê dîtiye. Yek jî di meha Tebaxê de. Hevalên tevlî min nebin hene?"

Bi pirsa hevalê Bahoz re dengê çepikan bilind bû. Hevalên li derdor gotinên wî bi çepikan erê kirin û dengê ken, çepik û axaftinan têkil dengê guleyên top û fîşekên doçkayan bûn. Di vesaziyan de hevalên jin alîkarên fermandarên koman bûn. Her carê hevalek dihat û ji bo beşdarî çalakiyan nehatiye kirin nerazîbûn raber dikir. Ji derveyî hevalên navên wan di komên çalakiyan de hatîn xwendin, di hevalên din de bêmoralbûnek peyda bibû. Hinek heval jî ji ber cihên wan ne bi dilê wan bûn dihatin û dixwestin em cihên wan biguherin. Yek ji van hevalan jî hevalê Çiya bû. Min bi hevalekê re sohbet dikir, çavên min bi hevalê Çiya ket. Kefiya xwe li serê xwe şidandibû, bi hers ber bi hevalê

Masîro ve dihat. Hevalê Masîro li kêleka me bi hevalek dî re di axivî. Çiya kesek esmer, dirêj û bejinzirav bû. Porek reş û hilû li ser serê wî bû. Çavên wî reş û mezin bûn. Berê demek dirêj di wê eniyê de mabû, gelek hevalên pir jê hez dikir di wê eniyê de şehîd bibûn. Hevalê Çiya ji gundê Kizelî bû. Gundê wan nêzîkî wê derê bû. Me di vesaziyê de biryar dabû hevalê çiya li ser doçkayê bimîne û nekeve komên êrişê. Ji ber berê çend caran li ser hev birîndar bibû. Her carê hêj birînên wî sax nebûyî berê xwe dida çeperan û tevlî şer dibû. Çiya bi lez dimeşiya. Hat li ber hevalê Masîro sekinî, rextê xwe yê narincoka yê li pişta xwe rast kir. Paşê herdu destên xwe avêt plasqeya li pişta xwe û got; "Hevalê Masîro, ez di vê çalakiyê de neçim êrişê, soz ez carek dî tevlî şer nebim. Ha ezê niha rext û çeka xwe deynim û biçim. Ez ji nîqaş û gotinan re ne vekirî me. Ev gotinên min ên dawiyê ne. Vêca hûn dizanin." Li ser gotên wî ez ber bi wan ve çûm. Li ser gotinên wî yên bi biryar û soza dayî hevalê Masîro li bersivekê digeriya û bêdeng guhdar dikir. Ez gihiştim gel wan, min jê re got; "Ha, hevalê Çiya te Evdoyê şîşko dît?" Evdo birayê wî bû. Berevajî Çiya evdu qelew bû, me jê re digot Evdoyê şîşko, an jî Evdoyê Kizalî. Evdo ji bo girtina cepilxanê hatibû gel hevalê Cûdî, wî û Mehmûdê Qeremûxî li ber dîwarekê cepilxane li maşînê bar dikirin. Min bi tiliya xwe cihê wî nîşan da û got; "Ka temaşe bike li wê derê ye. Ma we hev nedîtiye? Biçe silavekê bidiyê." Bi gotina min re got, "Na wile ev hefteyeke min nedîtiye." Paşê ji bo silavdayînê destê xwe li Evdo rakir. Lê ji ber mijûl bû silava wî nedît û karê xwe dewam kir. Çiya li

min zivirî û got; “Tişt nabe, emê paşê hev bibînin. Tu nabînî ew jî mijûle, ez jî. Niha karên me yên girîngtir hene.” Çavên çiya ser rûyê hevalê Masîro asê mabûn. Di ber axaftinan re jî her temaşeyî hevalê Masîro dikir û dixwest bersiva li bendê ye bigire. Hevalê Bahoz pir israr kiribû li gel wî bimîne. Ji ber gelek caran bi wî re tevlî şer bibû. Mirovek wêrek, dilsoz û jêhatî bû. Di şerê xwe de xurt bû û mêrxasiya wî ji aliyê hemû hevalan ve dihat zanîn. Hewla min a rojev guhertinê jî têra şikandina rika wî nekir. Hevalê Masîro nedixwest dilê wî bihêle. Berê xwe da min, min jî ji derveyî erêkirinê ti çare nedîtibû. Paşê berê xwe da hevalê Çiya û got; “Başe hevalê Çiya. Bila vê carê wekî te be. Lê piştî vê çalakiyê emê baxivin û vê rewşê bigirin dest.”

Piştî pêşniyara wî hat qebûlkirin kenek ji dil belavî rûyê wî bû. Herdu destên xwe li pêşiya singa xwe hist nav hev û di wateya silav û serkeftina biyardariya xwe de hinekê xwe tewand û bi lez ji gel me dûr ket. Çavên me herduyan jî mabûn ser liv û tevgerên wî. Çeka xwe girt û hat pêşberî me li kêleka hevala Peyman rûnişt. Çeka wî û ya hevala Peyman wekî hev bû. Herduyan jî çekên BKC bikar tanîn. Çeka xwe vekir, paçek kir dest xwe û dest bi paqijkirina çeka xwe kir. Destê xwe wisa nazik û narîn bi ser lûleya çekê re dibir û dianî te digot qey pora wê şeh dike. Hevalê Masîro ji liv û tevgerên wî zêde bandor bibû. Di ber xwe de got, “Tê bêjî qey Çiya serê zarokekê şeh dike. Wekî çeka wî mirov be nêzîk dibe.” Çiya şerîtên çekê li ser naylona li erdê rast dikir, paçê di destê xwe de

hêdî hêdî bi ser re dibir û tanî. Min ji hevalê Masîro re got, “Hevalê Masîro tu çîroka hevalê Çiya dizanî?” Hevalê Masîro kenî û got, “ Kîjan çîroka hevalê Çiya? Her roja hevalê Çiya çîrokek e. Vêca ez nizanim tu behsa kîjanê dikî.” Hevalê Masîro rast digot. Hevalê Çiya bi qasî navê xwe kesekî asî û serbilind bû. Mêrxasî û lehengiya çiya her roj çîrokek li çîrokên jiyana xwe zêde dikir. Min got, “Hevalê Çiya bi destgirtî bû. Piştî şer dest pê kirî, biryara tevlîbûnê daye. Çûye gustirka xwe ya nîşaniyê daye dayîka xwe û jê re gotiye, dayê, tu vê gustîrka min bigire gel xwe. Soz heta axa me azad nebe ez ne zewicim. Kengê me axa xwe rizgar kir, em jî wekî xelkê azad bûn, ezê hingê dawetek mezin li dar bixim û wisa bizewicim. Ger ez ji bo vê dozê şehîd bibim, tu bizane ez bi axa welatê xwe, doza xwe re zewicîm e. Ji bîr neke, ger ez şehîd bibim jî wekî roja zavatiya min tiliyên min hine bike û li ser min bilîlîne.” Hevalê Masîro ev çîroka wî nedizanî. Cardin berê xwe da Çiya û got; “Helal be ji wê dayîka ew anî dinyayê re. Heta Egîd û xweşmêrên wekî wî li vê axê hebin, ti dijmin nagihêjin armancên xwe.”

Li aliyek din hevalê Dilgeş û hevalê Bahoz di navbera xwe de di axivin. Hevalê Bahoz ji hevalê Dilgeş re dibêje;

-Hevalê Dilgeş ev çiye, we hejmara hevalên jin ewqas zêde kiriye?

-Hevalên jin çiqas zêde bin, ewqas başe. Diyare tu di şer de bi hevalên jin re nemayî. Di çeperan de bi hev re mayîn têra naskirinê nake. Di vî welatî de heqîqetek

heye, diyare te hêj nedîtiye. Ger di şer de hevalên jin bi te re hebin, bila dilê te aram be. Ji ber jin dilsozên baweriyên xwe ne.

-Wile ez bi wan re nemame. Lê di vê çalakiya me de meş heye, emê di gelek cihan de li ser zik xwe bixuşikînin. Li gorî min hejmara wan zêde ye.

-Wisa nebêje. Ger bi gotinên te bihesin wê nehêlin tu bi wan re biçî çalakiyê.

Di ber dengê wan re hevala Biharîn destwardan dike û dibêje;

-Çiye evqas navê me derbas dibe? Ger mijar li ser me ye, hûn dikarin bi me re jî parve bikin.

Li ser gotina hevala Biharîn hevalê Dilgeş dibêje; “Me behsa çekên li gel we dikir. Hevalê Bahoz dibêje çekên hevalên jin ji yên me baştir in.” Paşê çavên xwe li Bahoz dineqîne û dibêje;

-Li vê derê ew hikûmet in. Nabe tu tiştekê ji wan re bêjî. Wan berê jî xwe di şer de ispat kirine. Min berê jî gelek hevalên jin dîtibûn û di şerê xwe de baş bûn. Lê vê dawiyê hevalên me yên jin xwe derbas kirine. Ka ez ji te re tiştekê bêjim. Ha, na ez niha nebêjim, dema te bi xwe dît û şûn de em baxivin. Bes şaş nebe ji tiştên tu bibînî.

-Hevalên beşdarî çalakiyan dibin hevalên kevn in, an nû ne?

-Hevalên nû ne. Hemû hevalên ji vê deverê beşdar bûne. Lê bila xema te nebe ji min û te ne kêmtirin di şerê xwe de.

Li ser gotina hevalê Dilgeş, hevalê Bahoz hinekê dikeve nav dudiliyekê. Gelo tiştên hevalê Dilgeş jê re gotîn çiqas rastin, di hişê xwe de dipîve û paşê dibêje;

-Hêvîdarim gotinên te rast derbikevin. Ger ne wisa be bi vê hejmara zêde ya hevalên jin emê zehmetiyê bijîn.

Hevalê Dilgeş demek berê ji destê xwe birîndar bibû. Dema me biryara çalakiyan da ew li nexweşxanê bû. Bi bihîstina rojeva çalakiyan re ji nexweşxanê derketibû û hatibû eniya şer. Di vesaziya çalakiyan de xwest di komên pêş de cih bigire, lê ji ber rewşa birîndariya wî me destûr neda. Bi serê xwe hatibû û hêj birînên wî baş nebibûn. Me dizanî em beşdar nekin wê bi serê xwe bikeve nava koman. Lewma ji bo em bikarin pêşiyê lê bigirin, vesaziya wî li gel hevalên kordînê hat çêkirin. Dema min ji gel hevalê Masîro berê xwe da wan û xwest biçim gel herduyan, hevalê Dilgeş bi ken ber bi min ve hat. Em çend metreyan dûrî hevalê Bahoz li ser tilmek axê rûniştin. Hevalê Dilgeş ev diyaloga di navbera wî û hevalê Bahoz de derbas bûyî ji min re got. Hêj me sohbet dikir û hevalê Dilgeş bi reşwa hevalê Bahoz dikenî, çavên min bi komên biçin navbera gundê Evdiko û Ehmediyê ket. Koma hevalê Rodî û hevalê Dêrsim wê biçûyan wê derê. Cihê hevalan digot xeter e û wê çarenûsa çalakiyan diyar bike ew der bû. Dema me vesaziya çalakiyan çêkir

gelek hevalan xwe ji bo wê derê pêşniyar kirin. Lê hevalê Cûdî, hevalê Rodî pêşniyar kir. Hevalê Rodî beriya demek kurt di pevçûnekê de şikandin jiyabû. Ji wê rojê û pê ve morala wî ketibû, rewşa wî zêde nebaş bû. Dema hevalê Cûdî ew pêşniyar kir, hevalê Bahoz ket navberê û got; “Na heval, pêşniyara min ez biçim wê derê.” Li ser gotina wî, hevalê Rodî axivî û got; “Ez diçim wê derê. Ez erdnîgariyê baş nas dikim. Ez baş dizanim heval behsa kî derê dikin. Ez berê jî bi sed carî di wê riyê re çûme û hatime. Ew der ji bo min baştir e. Lê pêşniyara min hevalê Dêrsim berpirsê komê be, ez jî wekî alîkarê wî biçim.”

Dersim heta wê kêliyê jî bêdeng bû. Te digot qey ew nîqaş ne li gel wî dibin û gotin naçin guhên wî. Serê xwe danibû ser çûka xwe û kûr çûbû. Yê ew dever herî baş nas dikir hevalê Dêrsim bû. Li ser pêşniyara hevalê Rodî me jî guncav dît û got, dibe. Lê cardin deng ji Dêrsim nehat û ti bertekek raber nekir. Hevalê Îrahîm bi îşareta çavan Dêrsim da nîşan, bi hejandina serê xwe rewşa wî pirsî. Min jî bi heman awayî di wateya bela xwe jê veke de serê xwe hejand. Paşê ez li Dêrsim vegeriyam û min got; “Hevalê Dêrsim, qet deng ji te dernakeve. Te ne got erê, ne got na. Ger tu nexwazî em te naşînin. Ger nêrînek te ya nebe, em te naxin çalakiyê.” Dêrsim serê xwe rakir û got; “ Ezê biçim heval. Min negotiye ez naçim.” Bi rastî jî ger neçûya wê bi egera nehatiye şandin çend rojan xwe bê moral bihiştiya. Me ev yek dizanî. Hevalên bi wî re diçûn jî başbûn û baweriya me bi wan hebû. Lewma

me çûyîna wî erê kir. Hevalan xwe ji bo çûyîna çalakiyê amade dikir. Hevala Nûcan û hevalê Rodî diçûn heman cihî. Hevalê Dêrsim û Şêro jî diçûn heman cihî û wê wekî du koman di wê xetê de cih bigirtiyan.

Her diçû tarî dibû, şevê konê xwe yê reş li ser beriyê veda. Çavên şervanên Kurd wekî stêrkên di bin pelewran de carna geş dibûn û ditefiyan xuya dikirin. Kelecan di asta herî jor de bû. Hevalan hevalan şîva xwe xwaribûn û ji bo ketina rê xwe amade kiribûn. Çûyîna çalakiyan bi meş bû. Barên hevalan giranbûn, hemû pêdivî û cepilxane bi pişta xwe dibirin. Bi demê re her komcivat dibe xwedî çandek hevpar û tiştên mirovan bi hev didin girêdan ew rêzik û zagonên nehatîn nivîsin in. Lê di heman demê ji aliyê her endamek wê komê ve tên zanîn. Çanda me ya xatirxwestinê ku beriya her çalakiyê dest pê kiribû. Koman bi hev re wêne digirtin, xatir ji hev dixwestin, barên xwe radikirin û ber bi cihên xwe ve diketin rê. Di çanda me şervanên Kurd de xatir xwedî cihek girîng e. Xatira hev girtin, nîşaneya nirxdayîn û hezkirinek bi peyvan nayê vegotin e. Tişta em li ser piya dihiştin û dikirin hêzek xurt dilsozî û hevaltiya me, qedr û qîmeta me dida hev bû.

Komên dawiyê jî pîlên cihazê xwe, telefonên xwe kontirol kirin. Ronahiyên bêtêlan bi lezqeyên reş hatin pêçan. Bi xatirxwestina komên dawiyê re lêdana dilan jî zêde bibû. Jivana hevdîtinê ya piştî çalakiyan navenda gundê Ehmediyê bû. Cihê koma hevalê Rodî û Dêrsim

diçûnê xeter bû. Vê di me hemûyan de tirsek dida avakirin. Ger kêmasiyek biçûk jî derbiketiya wê bibûya sedema windayiyên mezin. Lewma destên me li ser dilê me bûn û em bi kelecan li benda gihiştina hevalan a cihên çalakiyê bûn. Şer lîstikek bi sûrpîz e. Wê li kû çi derbixwe pêşiya te nediyar e. Lewma şer her tim li gorî planên li ser kaxezan tên xêzkirin nameşin û carna sûrprizek tu qet ne li bendêyî derdikeve pêşiya te. Ewrên li ezmanan jî bi reqsa dilê me re ketibûn tevgerê, wekî masûran xwe li hev dipêçan û bi liv û tevger bûn. Koma hevalê Dêrsim û Rodî bi qasî yek kîlometrê bi meşa qazan çûbûn. Van kêliyên bendewariyê dihişt em nekarin li cihê xwe rawestin, di henasegirtinê de me zehmetî dijî.

Dengê hevalê Rodî lerza dilê ne zêde kir. Bi cihazê gazî kir û got; “heval em gihiştin cihê xwe. Ji bo pîvazên Rêzan karê xwe dewam bikin.” Ev gotin ji bo me mizgîniya xêrê bû. Pîvazên Cûdî guleyên çekên giran bûn. Me wekî şîfre lêxistina çekên giran wekî çandina pîvazan bikar tanî. Vê agahiyê em hinekê aram kiribûn. Lê di aliyê din de deng ji komekî me nedihat û vê fikarên me zêde dikir. Koma ku diviya biçe li pişt Ehmediyê bizivire riya xwe winda kiribû û deng ji wan nedihat. Piştî çend caran me bi cîhazê gazî kir derketin. Her em dibêjin hûn gihiştin cihê xwe an ne, ew dibêjin em negihiştine. Ba û bahozek xurt dest pê kiribû, ji beriyê tozek têr qirş û qewal bilind dibû. Ji ewr û tariya heyî hevalan riya xwe winda kiribûn. Ger em li benda wan

bimayan, me nedikarî em çalakiyê bidin destpêkirin. Me ji wan xwest tedbîrê xwe li gorî rewşa destpêkirina çalakiyê bigirin. Koma diçû baregeha wan a gundê Ehmediyê jî riya xwe xelet kiribû. Li şûna biçe xaniyê deriyê wî kesk ê hevalan tarîf kirî, çûbûn pêşiya xaniyek dî. Navenda çeteyan li pişt wan dimîne. Digihêjin ber xaniyekê, deng ji hundir tên. Çete di hundir de bi dengê bilind di axivin, dengê piyalên ça û qehwê tên. Hişedarê wan bi ser hev gazî dike û dibêje hûn kîne. Dema wisa dibe, heval dibêjin qey çeteyan ew dîtine û hêj koma diduyan cihê xwe negirtî ew kom narincokên xwe di pencereyan re tavêjin hundir. Bi avêtina narincokan re dengê teqînan tevlî ba û bahoza şevê bû. Bi komên gihiştîn cihê xwe çalakiyan dest pê kir. Dema li xaniyê yekê dixin, carekê dibînin ji pişt ve, ji aliyê hemberî wan jî fîşek tên. Hevala Peyman Tolhildan çeka xwe digire û ber bi serê ban ve dibeze. Hevalê Bahoz ji beza wê şaş dibe û dibêje; Tê çi bikî? Tu bi kû ve diçî?" Peyman xaniyê hember nîşan dide û dibêje; "Tu dibînî ji wî xanî fîşekan tavêjin. Ezê ji ser ban li wî xanî bidim. Yek jî ji hevalan re cihên fîşek jê tên avêtin bêjim û wan kordîne bikim."

Hevala Peyman û hevalê Tirko çekên xwe yên BKC digirin û her yekê derbasî ser banekê dibin. Dema ew cihê xwe digirin, hevalên dî baştir dikarin tevger bikin. Bahoz ji sekna hevala Peyman, şerkeriya wê li ber xwe dikeve û gotinên hevalê Dilgeş tên bîra wî. Hevalê Çiya jî çeka xwe digire û ber bi pêş ve dikeve êrişê. Bi xistina

xaniyê destpêkê re çete ji hemû aliyê gund dikevin êrişê. Hevalê Çiya piştî demek kurt birîndar dibe. Piştî hevalê Çiya, hevalê Baz jî birîndar dibe. Heval wan tînin pêşiya xaniyê destpêkê û wan dixin bin pêpilkên xanî. Agahî didin koma taqwiyê û dibêjin werin hevalên birîndar bibin. Dema hevalên teqwiyê diçin, hevalê Çiya ji bin pêpilkan derketiye derve. Ji ser hişê xwe çûye. Wî digirin û ji wê derê dibin. Lê nizanin hevalê Baz jî li wê derê ye û wî li wê derê dihêlin. Koma diduyan dereng dimîne û heta digihêjin cihê çalakiyê çar heval birîndar dibin. Ji wan hevalê Bakur giran birîndar dibe û neçar dimînin paş ve vekişin. Koma diviya rola xwe ya sereke bilîze bi derengmayînê dibe sedema windayiyan.

Koma hevalê Rodî û hevala Nûcan rola sereke di çalakiyan de lîstin. Dema çeteyan xwest ji bo destwerdanê hêz bişîne mayînên wan bi maşînên çeteyan ve teqîn û heşt çete li ser hev tên kuştin. Maşîna diduyan jî tê, hevalê Rodî bi guleyek bêsîvingê wê jî dirûxîne. Her wiha li maşînên din dixin û çete neçar dibin paş ve vekişin. Rodî şikestina çalakiya berê ji ser xwe avêtibû. Wekî koma herî serkeftî ya çalakiyê rol lîstibûn. Dengê wî li ser cîhazan wekî zengil geş û gur dihat. Ji dengê wî mirov dizanî Rodî ne ew Rodiyê beriya çend rojan bi xwe nebawer û bê moral e. Hevalê Rodî li ser cîhazê pêşniyar kir komên wan ji wî alî ve bikevin gund. Dema me hejmara birîndaran bihîst û koma li pişt gund zivirî negihişt cihê xwe, me pêşniyara wan erê kir. Me komên wan şandin nava gund û ji hevalan xwest

paşve vekişin. Em neçarî biryarek wisa man. Derengmayîna du koman û zû destpêkirina çalakiyê ya em ne li bendê encamên nû bi xwe re anîn. Tişta me dihizirî û ya pêk hatî hev ne digirt. Ji bo em hejmarek zêdetir windayî nedin me biryara vekişandinê da hevalan.

Xetera herî cidî li ser koma me ya çûyî pişt gund û riya xwe winda kirî bû. Vê carê hemû hewldana me bo rizgarkirina vê komê. Di dema vegerê de me ji wan xwest di pêşiya gundê Spîkiranê re paşvekişin. Dema kom gihişt pêşiya gund, ji gundê Spîkiranê û gundê Ehmediyê ji du milan ve çeteyan fîşek li wan reşandin û di wê navberê de heval xistin kemînê. Em neçar bûn hêzekî din bişînin alîkariya wan ku em bikarin wan ji wê derê derbixin. Heta wê rojê gundê Spîkiranê li hember me şer nekiribû. Lê wê rojê xayîntiya herî mezin wan li me kir. Bi roj zarok û mirovên sivîl dihatin gund, şev jî cihên xwe ji çeteyan re dihiştin û diçûn gundek din. Agahiya me ji vê rewşê nebû û em ketibûn vê kefka wan a fêlbaz. Bi alîkariya koma teqwiyê heval ji wê dorhêlê hatin derxistin. Dema heval dikevin kemînê, hevalên birîndar li cihekê datînin û dibêjin heta pevçûn qediya emê we bibin. Dema heval ji bo anîna birîndaran diçin wê derê dibînin ku hevalê Bakur ne li cihê xwe ye. Hevalê Bakur kesek xwîngerm û şerker bû. Heval dibêjin, misoger êrişî çeteyan kiriye û şehîd bûye, termê wî ketiye destê çeteyan. Hevalên din hemû anîn û gihiştin cihên saxlem.

Di hemû çalakiyên me yên li wê eniyê de dema birîndar û şehîd hebûyan hevalê Evdo, an ku Evdoyê Kizalî bi maşînê dihat heval dibirin nexweşxanê. Hevalê Evdo birayê hevalê Çiya bû. Du egîd û mêrxasên Kurd bûn û di şer de tirs û dudilî kuştibûn di xwe de. Dema maşîn tê û hevalên birîndar li maşînê tên siwarkirin agahiya hevalê Evdo ji birîndariya hevalê çiya nîne. Maşînê lez dajo û dixwaze hevalan zû bigihîne nexweşxanê. Di rêde hevalên li kêleka wî dibêjin; "Hevalê Evdo, te hevalê Çiya dît?" Ew dibêje, "Nexêr. Min hêj nedîtiye." Paşê ew heval dibêje; "Hevalê tu dibî nexweşxanê hevalê Çiyaye. Tu bibînî baş e." Dema wisa dibêje Evdo matmayî dimîne. Dibêje kîjan Çiya? Çiyayê birayê min e?" Hevalê dî bi hejandina serê xwe bersiva pirsên wî dide û dibêje erê. Paşê Evdo pê li gazê dike, wekî bixwaze maşîn bifire dajo. Lê hevsengiya xwe winda dike, rondikên wî pêşiya dîtina wî şêlû dikin. Hevalê li gel wî dibêje; "Ka ez maşînê bajom, tu biçe gel hevalê Çiya." Evdo maşînê disekinîne, diçe li dawiya maşînê siwar dibe. Destê xwe datîne ser singa birayê xwe. Vejenînên rayê laşê wî sekinîne. Dibîne hevalê Çiya şehîd bûye. Herdu destên xwe li navtenga wî di alîne û heta jê tê dike qîr. Ji xwîna Çiya bi şiliya li ser laşê xwe dihese û agirek dojehî derbasî nava dilê wî dibe. Dibêje; "Maşînê vegerînin, ezê Çiyayê xwe bibim gund. Bila diya min wesyeta Çiya pêk bîne. Gustîrka wî bike tiliyê û li ser kurê xwe bilîlîne. Çiya, berxikê diya min. Ne te pişta min şikand bira, te em bi tenê hiştin."

Lê li derdor hêj cih cih pevçûn hebûn û riya çûyîna gundê Kizalî xeter bû. Tevî hewldana hevalan jî kesê nekaribû hevalê Evdo qane bike. Hevalan agahî dan me û em çûn gel hevalê Evdo. Piştî axaftin û mijûlbûnek dirêj me hevalê Evdo qane kir ku sibê termê hevalê Çiya bibe gund.

Sibê dema heval ji çalakiyê vegeriyan morala hevalê Bahoz xirap bû. Lê te digot qey hevalê Rodî û hevala Nûcan wê bifirin. Rûyê wan geş û gur, ji xwe bawer û bi moral bûn. Bi xwe baweriya Rodî meşa wî jî bandor kiribû. Çeka xwe xistibû destê xwe yê rastê, bi serbilindî li pêşiya koma xwe ber bi me ve hat. Navmilên wî rast bibûn, taviyek xunava ken li ser rûyê wî belav bibû. Rodî xwe di wê çalakiyê de keşif kiribû. Hêza xwe, jêhatina xwe dîtibû. Vê yekê Rodî kiribû yekî bi xwe bawer û serbilind. Bayên tirsê ji wî dûr ketibûn. Rûyê wî bibû nexşeyek ji hêvî û bawerî, wêrektî û şanaziyê.



Hevalê Bahoz ji sekna hevala Peyman şaş mabû. Berpirsê komê ew bi xwe bû. Lê di dema çalakiyê de bi awayekî xwexayî hevala Peyman rola wî jê girtibû, kordîneya çalakiyê kiribû. Vê yekê hevalê Bahoz hem dabû şermê, hem jî ji ber gotinên xwe yên rojek berê pêdiviya hizirandina li ser rastiya jinan dîtibû. Ez û hevalê Dilgeş rûniştibûn, ber bi me ve hat û li kêleka me rûnişt. Me dizanî dixwaze tiştekê bêje, tiştên di hişê wî re derbas dibûn di rûyê wî de xuya dikirin. Ji xwe min gotinên wî yên rojek berê bihîstibûn. Lewma min jî mereq dikir ka wê çi bêje. Du caran li ser hev kuxî, qirika xwe paqij kir û got; "Hevalê Dilgeş, gotinên te rast derketin. Min duh got qey hevala Peyman fermandareke bîst salan e. Wê çalakiya me kordîne kir. Rastî wêrektiya van jinan cuda ye. Ez niha ji xwe şerm dikim. Çawa heta niha min bi çavek din temaşeyî hêz û wêrektiya jinan kiriye. Wê ji min re digot wisa wisa bike. Tevî dijwariya êrişan û fîşekên wekî taviyên teyrokê li ser me dibarîn jî hevala Peyman aram bû. Bêyî bikeve kelecanê û bandor li ser dengê wê jî bibe bi aramî ferman dida. Beriya em biçin fikarên min hebûn. Lê paşê min got xwezî koma me hemû hevalên jin bûna. Min hêzek mezin ji hevala Peyman girt. Ez lêborîna xwe ji hemû hevalên jin û we dixwazim. Ez mereq dikim hevala Peyman kengê tevlî me bûye û erka wê çiye."

Hevala Peyman jinek bejin zirav û dirêj bû. Du çavên hingivîn li ser dêmê wê yê glover bê qusur disekinîn û rûyekî lihevhatî hebû. Pora xwe ya zer û dirêj dikir kezî

û tavêt ser qulincên xwe. Dema çeka xwe tavêt ser milê xwe û dimeşî, te digot qey cîhan hemû di bin piyê wê de dibe du gav. Ji xwe bawer, serbilind bû. Bi wê rewşa xwe wekî hikûmdara hemû serdeman xuya dikir. Em li ber deriyê xanî rûniştibûn. Dema hevala Peyman ji hundir derket, çeka xwe cardin danibû ser milê xwe û ber bi komek hevalên li xaniyê din ve meşiya. Hevalê Bahoz li çûyîna wê temaşe kir û got; “Wile tê bêjî qey ev çek ji bo hevala Peyman taybet hatiye çêkirin. Mirov ji sekn û meşa wê jî bandor dibe. Vêca xwezî we di şer de bidîtiya.” Dema wisa got ez û hevalê Dilgeş herdu jî kenîn. Ji ber ji dil digot û çavên wî li ser meşa hevala Peyman bûn. Min jî jê re got; “Raste, wisa ye. Min di şer de jî dîtiye. Hevalê Bahoz, ne tenê hevala Peyman, piraniya hevalên jin wisa nin. Ka te ji hevalê Rodî bipirsiya hevala Nûcan rolek çawa lîstiye.”

Bi giştî tevî ku hejmarek zêde çete hatibûn kuştin jî em negihiştibûn armanca xwe. Em neçarî paşvekişandinê mabûn. Ya herî xirab û em hemû pir pê bandor bûyîn mayîna termê hevalê Baz bû. Hevalê Baz li cihê mayî şehîd ketibû. Çeteyan termê wî girtibûn û li nava gund bi pey maşînan gerandibûn. Hemû heval ji vê rewşê neyênî bandor bibûn. Lê yê herî aciz bûyî û ev rewş nedipejirand hevalê Emîn bû. Hevalê Emîn wê rojê hemûyê heman tişt dubare got; “We bihiştiya ez li ser wê komê biçim tiştek wisa nedibû. Min gund baş nas dikir. Me dikarî em vê çalakiyê bi ser bixin. Piştî termê hevalê Baz ket dest dijmin û şûn de hezar çete jî hatibin kuştin

ji bo min bêwate ye. Diviya min xwe ferz bikiriya û ez biçûyam gund." Tevî hemû hewldanên me jî vê hesta xwe tewanbar dîtinê dest ji hevalê Emîn ber nedida.

Di çalakiyan de sê heval şehîd hatibûn diyarkirin. Hevalê Baz, Çiya û Bakur. Me rewşa hevalê Çiya û Baz dizanî, lê me hevalê Bakur nedîtibû û nedizanî çi bi termê wî hatiye. Lewma wekî me bi dehan şehîd dabin, giraniyek bêhempa hestên me diperçiqand. Babê hevalê Bakur, Mehmûd Qeremûxî jî li heman eniyê berpirsê tabûrek ji gel bû. Hevalê Mehmûd windabûna kurê xwe bihistibû. Lê ji malbat û hevjîna xwe re nûçeya windabûna wî nedabû. Hevalê Mehmûd kesek esmer û bejna wî navîn bû. Heta wê rojê sê-çar caran birîndar bibû. Lê dest ji karê xwe bernedabû. Di wê eniya lê dima de nêzî sih gundi hebûn. Kesên xwebexş ên ji wan gundan tabûrek ava kiribûn û hevalê Mehmûd berpirsê tabûrê bû. Kesek dilnizim, fedakar, şerker û di şerê xwe de wêrek bû. Hevalê Mehmûd bi vegera hevalan re hat hat ber derî, bi dengek nizim got, "Hestên min dibêjin Bakur saxe. Ger Bakur şehîd bibûya wê dilê min bi şehîdbûna wî bihesiya. Ez bawer nakim hevalê Bakur şehîd bûbe." Lê me hemûyan ji xwe re got, ji ber êşa xwe wisa dibêje. Wê rewşa wî, aramiya wî dilê me hemûyan êşand.

Saet danzdeyê nîvro dengê hişedaran bilind bû. Hemû heval ber bi wî alî ve bezîn. Hevalek hat hundir û ji me re got, "Hişedar dibêjin vaye hevalê Bakur tê." Em jî bi bazdan derketin derve û ber bi cihê hevalan behs dikir

ve çûn. Beriya wê nîv saetê babê wî ji gel me çûbû. Bi hatina wî re me agahî da babê wî û me xwest vegere gel me. Komek heval bezîn pêşiya wî, ew rakirin û anîn. Rengê wî spî bibû. Te digot qey di carekê de deh kilo daye. Bedena wî lewaz bibû, laşê wî heriçîbû ji ber xwe xişikandinê. Ji tîna û windakirina xwînê lêvên wî qelişîbûn, xwîn li ser lêvên wî wekî qalikek reş lê hatibû. Dibe ji rizgarbûn û xwegihandina hevalên xwe be, tenê çavên wî nîşaneya jiyan dike raber dikir. Çavên wî yên reş dibiriqîn. Hewl dida çavên xwe veke, bi çavên şaqizmayî li derdor û hevalan temaşe dikir. Hevalê Bakur berê jî hurik bû. Lê wekî nîvê gewdeya heyî jî çûbe, biçûktir bibû, wekî zarokekê li ser destê du hevalan disekinî.

Bi hatina wî re coşek bêpênase di hevalan de peyda bû. Ew bêdengiya ji sibê ve heyî vegeriyabû dengê çepik, ken û axaftinên hevalan. Yekser derbasî hundir hat kirin, doktor destwerdana yekê li wê derê kir. Ji zik û milê xwe yê çepê birîndar bibû. Hevalên tima tendurisiyê laşê wî paqij kirin, bi serûman rûyê wî şûştin û serûm bi milê wî ve girêdan. Hêj destwerdana destpêkê neqediya bû, babê wî di derî de xuya kir. Bi lez ber bi kurê xwe ve hat, eniya wî maç kir. Ji ber birînên wî nedikarî tam hembêz bike. Hinekê xwe tewand, herdu lamên wî maç kir û paşê ji keyfxweşiyê çavên wî tijî rondik bûn. Li pişt serê wî çok hat û got; “Min dizanî tu saxî. Min ji hevalan re got, dilê min dibêje Bakurê min sax e.” Paşê got, çi bû Bakur, tu çima ji cihê xwe çûyî û tu bûyî sedem em evqas biêşin?”

Dengê wî bi bandora kefxweşî û kelecanek xemtêkel direcifî. Hevalê Bakur zêde nedikarî baxive. Çavên xwe danî ser hev, wekî biçe wan kêliyan got; “Dema em birîndar bûn hevalan em anîn ber xaniyekê. Ez û hevalê Baz, hevalê Çiya. Birînên wan herduyan giranbûn. Min rê nas dikir, min digot ez dikarim xwe bigihînim hevalan. Ez heta cihekê baş hatim. Lê paşê ez ji ser hişê xwe çûbûm. Dema ez şiyar bûm, min cardin xwe bi erdê re xuşikand, her çend metreyan carekê navber da heta min xwe gihand vê derê.” Gotin ji devê wî bi zorê derdiketin. Di ber her gotina xwe re hewl dida henaseyek kûr bigire, dema henase digirt rengê rûyê wî bi bandora êşa birîna li zikê wî diqurmiçî. Hewl dida bersiva pirsên babê xwe bide. Têkiliyek balkêş û ciwan hebû di navbera wan de. Herdu jî endamên heman hêzê bûn û di yek eniyê de şer kiribûn. Têkiliya bab û kur, hezkirin û dilsoziya hevaltiya dozê jî li xwe zêde kiribû. Hevalên doktor jê xwestin ne axive. Ji xwe her diçû zimanê wî sist dibû û rewşa wî giran bû. Di wê navberê de hevalan maşîn amade kiribûn. Me ji hevalê Mehmûd jî xwest bi wî re biçe nexweşxanê. Lê wî ev daxwaza me bi gotina; “Pêwîstî bi min nîne. Heval pê re ne, ez nikarim hevalên tabûrê bi tenê bihêlim” nepejirand. Piştî me hevalê Bakur şand nexweşxanê, hemû heval li derdora babê wî kom bûn. Awirên hevalê Mehmûd wekî ewrekî têr tavî li ser reşikên çavên wî xuya dikirin. Tenê çavên wî di axivîn.



Çavê her kesî mabûn awirên hevalê Mehmûd. Di wan awirên kûr de jan, êş, tirs, hêvî, dua û daxwazên saxbûna kurê wî hebûn. Heta maşîn ji ber çavan winda jî bû, gotin ji devê wî derneket. Paşê li heman cihê lê sekinîbû rûniştî erdê û cigareyek pê xist. Du-sê pêşên kûr li cigareya xwe da û got; "Çavên we hemûyan ronî bin. Ez dizanim hûn jî bi qasî min keyfxweş bûn. Niha destûra we hebe ezê biçim cihê xwe." Yekser rabû ser xwe, çû destên hevalên li wê derê û ber bi maşîna xwe ve çû. Li maşînê siwar bû û berê xwe da cihê tabûra xwe. Piştî çûyîna wî bi çend rojan şûn de hevalan agahî dan û gotin; "Rewşa hevalê Bakur baş e. Xetera şehîdbûnê derbas kiriye." Bi rastî jî vê agahî hema bêje em hemû heval bi qasî hevalê Mehmûd keyxweş kirin. Bakurê me yê biçûk pişta mirinê dabû erdê. Vîn û xweragiriya wî ji bo me bibû cihê şanaziyek mezin. Her kes xwe amade kir ji bonî encamê civînê bera xwe da dibistana serzorî. Ji bo rewşa dawî

binirxînin. Edî di çavên her kesî de bêhîvîti koç kiribu u di dewsa wê de hevî u serkeftin hatibû hûnandin.

DAWIYA BERGA YEKÊ

***

# BERXWEDÊRÊN KOBANÊ

## Bi rêzdarî bibîrtînîn



Sembolên Wêrekiyê

**Heval ANDOK**

Lehengê ku dile xwe kiriyê mertal



**Botan REŞ**



**Şehid SORO**

Ye ku evina xwe kiriyê kurbana welatê xwe



**Çiye Kizali**

Ji bo em azad bijin me ciwanti destpê kir eme ciwanti serbikevin.



**Adil Ciwan**



**Ş. Jiyen Rojhelet**



Ne tinê dimenê me çepere dile me jî ji bo Kobanê çepere

Awazên me sinora radikin



**Ş. Siyeband - Ş. Kendel**

Kenê li ser levê  te zuve mirin bin xistiyê.



**Ş,Berfin**

Eger lehengên wek te hebin Gelo ma kes dikare xakê dagir bike



**Ş. Hewar Afirin**



Şoreşa Jinên Rojava Şoreşa Cihaniyê.

Ne tine Ba û Bahoz bablişoka çê di ke, Dile Cesur ji dikare Bablişoka çe bike li ser xaka wi welati



**Ş.Çiye Ş.Bahoz**

Ez ne Siyabendê Xece me , Ez Siyabendê evindarê ax û welatê xwe me.



**Ş. Siyebend Kobane- Meryem Kobane**

Ma gelo çi wê rûmettirê ku mirov bikari be bedenê xwe ji bo

Hevalê xwe bike çeper



Botan Sor( ye ku mayin deste da) Ye ku yekêmin li Kobanê ji bo ku Hevalên xwe ye çenbera dijmin da rizgar bike çalakiya canbexsane dike.